

FIRAT CEWERÎ
KULTUR, HUNER Û EDEBIYAT
NÛDEM

KULTUR, HUNER Û EDEBIYAT

Firat Cewerî

KULTUR, HUNER Û EDEBIYAT

Firat Cewerî

Weşanên NÛDEM

Weşanên Nûdem: 25
Kultur, huner û edebiyat
Çapa Yekem: Stockholm 1996

© Weşanên Nûdem
Pergala bergê û rûpelan: Nûdem
Wêneya bergê: Rembrandt
ISBN 91 88592-251

Navnîşan: Termov. 52
176 76 Järfälla- Sweden
Tel û fax: 8-583 564 68

ÇEND GOTIN

Hê di destpêka salên 80'ê de min dixwest ez bi nivîskarên kurd re bipeyivim û hevpeyvînên bi wan re mîna pirtûkekê çap bikim. Min di destpêka 1984'an de ji Qanatê Kurdo re nameyek nivîsand û pêşniyaza amadekirina pirtûkeke wilo jê re bir. Wî pêşniyaza min maqûl dît û bi xebateke wilo kêfxweşiya xwe anî ziman. Lê ji ber zehmetiya şerdên Sovyetê, min îmkana peyivandina bi wî re nedît, piştî demekê wî wefat kir û di dîroka rewşenbîriya kurdî de cihekî mezin vala hişt. Hingî Cegerxwîn li Swêdê dijiya, dîsa di 84'an de ez li mala Cegerxwîn bûme mêvan û min bi niyeta naskirina wî çend saetên dirêj pê re derbas kiribû. Min hingî pêşniyaza xwe ji Cegerxwîn re jî biribû, wî jî pêşniyaza min di cih de dîtibû. Hema di wê navê de Cegerxwîn jî wefat kir. Di wan salan de min jî alîkariya kovara Enstîtuya kurdî ya Parîsê *Hêvî* dikir. Ji ber ku têkiliyên min yên bi nameyan bi Nûredîn Zaza re hebû, me di civîna redaksiyona *Hêviyê*, di sala 1986'an de, biryar girt ku ez bi Nûredîn Zaza re li ser pêşgotina wî ya ku wî ji *Memê Alan* re nivîsandiye, hevpeyvînekê çêbikim. Min pêşniyaza xwe bi nivîskî ji Nûredîn Zaza re şand Swîsreyê. Piştî kurtedemekê bersiva wî hat û pêşniyaza min bi kêfxweşî qebûl kiribû. Lê hê berî ku ez bigihîjim pirsên xwe amade bikim, wî jî ji nava me koç kir. Ji ber tirsa ku wê Rewşen Bedir-Xan û Osman Sebrî jî ji nav me koç bikin, min hebekî lez da

xwe û ji bo dîtina wan ez di sala 1987'an de çûme Sûriyê. Min Rewşen Bedir-Xan li Baniasê û Osman Sebrî jî li Şamê dît. Herçiqas hevpeyvînên bi wan re ne bi rêk û pêk bin jî, ji bo min dîtina wan rûmeteke mezin e. Wan hêvî, bawerî û tecrubeyên jiyanê dane min. Lê min ji wan re soz da ku ez ê dîsan herim seredana wan, seredana duwemîn ji min re nebû qismet, ew jî li dû hev çûn. Di sala 1990'î de, piştî deh salan, ez li bajarê xwe yê xortaniyê, li Nisêbînê vegeriyam û min Apê Mûsa (Mûsa Anter) dît. Min hevpeyvînek bi wî re çêkir û di eynî salê de ew hevpeyvîn di Kurdistan Pressê de weşand. Di 92'an de Apê Mûsa bû hedefa gulleyên hovan û şehîd ket.

Her yek ji van şexsiyetek bû, dîrokek bû, bi cildan pirtûk bûn. Ev xezîneyên kurdan li dû hev çûn, bêî ku em tiştekî mezin ji wan re bikin. Ev rastiyek e, ku kurdan zêde qîmet nedane şexsiyetên xwe. Celadet Bedir-Xan, Kamuran Bedir-Xan, Nûrî Dêrsimî, Îhsan Nûrî Paşa, Faîq Bûcak, Kemal Badilî û bi dehan nivîskar û rewşenbîrên kurdan di nava bêdengî, tenêtî û belengaziyê de ji nava me koç kirine. Ji ber ku tavilê şûna wan nehatiye dagirtin, birîna civata me girantir bûye, bidestxistina mafê me bi salan derengtir maye û çirûskên rewşenbîriya kurdî vemirîne.

Gava di sala 1992'an de min dest bi weşandina kovara *Nûdemê* kir, min xwest ez hevpeyvînên bi hunermend û nivîskarên kurdan re bidomînim. Ev pirtûka di destê we de, ji nivîs û hevpeyvînên deh-panzdeh salên dawî pêk hatiye, lê resimekî sedsalane yê hunerî, kulturî û edebî radixe ber çavan.

Bê hêviya ku wê bi dilê we be.

Firat Cewerî
Gulan 1996

SEDSALIYA CELADET ALÎ BEDIR-XAN

Di 26'ê nîsana 1893'an de, yanî berî niha bi sed salî mizgînî digihîje Emîn Alî Bedir-Xan, ku jê re lawikek çêbûye. Emîn Alî Beg bi vê mizgînî û nûçeya han kêfxweş û dilşa dibe, pêlên evîna dilê wî ya li hemberî jina wî ya çerkez xurt û gur dibin û navê vî zarokê nûçêbûyî dike Celadet. Celadetê biçûk, zarok û neviyê Bedir-Xaniyan, ji dinyayê bêhay, ji sirgun û zehmetiyên jiyanê bêxeber mezin dibe; zarokekî esmer, xwînşêrîn, biaqil û qedirgir jê derdikeve. Rewşa vî zarokî malbatê kêfxweş dike, biaqilî û giraniya wî dilê bavê wî Emîn Alî Beg fireh dike, hêvî û baweriyeke xurt dide malbat û merivên wî. Bavê wî yê xwende û dinyadîtî, ji bo ku lawê wî yê çeleng li Stenbolê di nava çerxa asîmîlasiyonê de asîmîle nebe, ji kultur û zimanê xwe, ji stran û çîrokên xwe yên kurdî bi dûr nekeve û mîna kurdekî xwenas bigihê, ew ji welatê xwe, ji kevnebajarê kultur û medeniyetê, ji Cizîra Botan, dengbêj û stranbêjên kurd tîne Stenbolê û Celadetê biçûk û jîr bi stran û çîrokên kurdî, bi hest û hîsên kurdî mezin dike. Celadet car caran naveroka stran û çîrokên xwe ji hevalên xwe yên çerkez, ermen, yunan û tirk re dibêje, bi wî temenê xwe yê biçûk kultura xwe bi wan dide naskirin, bal û meyla wan dikişîne ser kultur û zimanê xwe.

Celadet di xortaniya xwe de hewesa xwe berdide ser eskeriyê, dixwaze di dibistaneke eskerî de bibe xwedî rutbe û nîşanan û di ordiya Osmanî de têkeve cepheyan. Celadetê ku wê paşê xwe bi hemû hêza xwe ve biavêje meydana kultur û ziman û bibe humanîstekî bêhempa, ji bo çi eskerî bala wî dikişîne û ji bo çi ew dixwaze tê-

keve dibistana herbiyê, dê û bawî bi xwe jî pê nizanin. Heta tê gotin ku ev biryara wî bêî dilê dê û bavê wî bûye. Lê wî biryara xwe dabû, wî ê bixwenda. Wî biryara xwe bi cih anî, kete dibistana herbiyê, dibistana xwe bi serfirazî qedand û bû zabitekî jîr û jêhatî. Celadetê Zabit di dema şerê cîhanê ê yekemîn de, di ordiya Osmanî de dikeve cephê û ji sînorên Tikiya îro bi dûr dikeve, dihere Qefqasyayê û li Baku û Tebrîzê dimîne. Lê ordiya wan zêde li ber rûsan xwe nagire û ew împeratoriya ku ji Qefqasyayê bigire heta welatên Balkan bi sedsalan hukumdarî kiribû, hêdî hêdî ji hev de dikeve, ordiyên wê cih bi cih dişikên û ew împaratoriya ku bi sedsalan jiyana xwe domandibû, êdî dimire. Hem împeratoriya Osmaniyan dimir, hem jî tu nemabû ku Tirkiyeya îro jî ji navê rabûya. Lê di bin serokatiya Mustefa Kemal û bi alîkarî û piştgiriya kurdan, şerê bi gotina tirkan "xelasiyê" tê dayin û welat ji bin destê bi gotina tirkan "dagirkeran" derdikeve, piştî kongreyên Erzerom û Sîwasê bingehê Cumhûriyeta îro tête avêtin û ew roj ev roj e îdeolojiya avakirê cumhûriyetê Mustefa Kemal "Kemalîzm" dibe mîna vîrusekê û dikeve laş û mêjiyên bawermendên vê îdeolojiyê. Digel ku ev heftê sal in di ser avakirina Cumhûriyetê re derbas bûye jî, hê jî ji vê nexweşiya han re tu derman nehatiye dîtin, serê bijîjk û operatorên ku xwestine vê vîrusê bikujin, an çareyekê ji vê nexweşiyê re bibînin, hatiye jêkirin û ev heftê sal in ku gelê kurd ji derdê vê nexweşiya han dinale.

Celadet Beg û beşek ji malbata xwe li dijî neheqiyên sîstemê derdikevin û dixwazin ji bo kurdan, ji bo nasnav û welatê wan têkoşînê bidin. Cumhûriyeta ciwan nikarîbû ev debar bikira, bi rê û metodên nemirovane çûn ser vê malbata bermayên mîrekên Cizîra Botan û gelek ji wan êşandin, kuştin, ji welêt bi dûr xistin, sirgûnî welatên xerîbiyê kirin. Di nava yên sirgûnbûyî de Celadet Bedir-Xan û malbata xwe jî hebûn. Stemkarî û sirgûna kambax ev malbata esil-

zade û zexim ji hev de dixist, berê wan bi welatên xerîbiyê vedikir. Bavê Celadet Emîn Alî Beg û birayê wî yê mezin Sureya Beg xwe diavêjin welatê xwediyê medeniyetên kevnar Misrê, Celadet û kekê xwe Kamûran Beg jî berê xwe didine Almanyayê. Ev mirovên bi disiplîn û xwedî berpirsiyar li Almanyayê nabin hêsîrên jiyana sirgûnê û têk naçin, lê bi jîrî dest bi xwendina unîversîteyê dikin, di dersên xwe de gelekî bi serketî dibin û zû xwe dixin çavên mamosteyên xwe û ji bo kurdan dibin mînakên çak û qenc. Celadet Beg ji derveyî dersên xwe yên dibistanê jî gelek berhemên cihê cihê dixwîne, li ser tevger, nêrîn û felsefeyên cihê cihê radiweste. Mîna gelek ronakbîrên wê demê ew jî gelekî ji Nietzsche hez dike, cih bi cih di bin tesîra felsefeya wî de dimîne û pirtûka wî ya bi navê "Zerdeşt Wilo Kerem Kir" ji ber serê xwe hilnayne û bi xwe jî dibîne ku ev filosofê Alman yê mezin bê çiqasî di bin tesîra felsefeya pêxember Zerdeşt de dimîne. Piştî wê bi salên dirêj ew ê beşekî biçûk ji pirtûka Nietzsche di Hawara xwe de biweşîne û bi wî awayî Nietzsche bi bîr bîne.

Lê her hişê wî li ser welatê wî ye, her liv û tevgereke ku li welatê wî çêdibe dilê wî şa dike, hêviya wî xurt û qewîn dike. Gava di sala 1925'an de di bin serokatiya Şêx Seîd de li Kurdistanê serîhildan çêdibe, hêviyên Celadet Beg xurt dibin, ji bo biserketina şoreşê tiştê ji destê wî tê ew dike. Lê pir naçe, artêşa tirk bi ser serîhildanê de digire, serok û birêvebirên serîhildanê digirin, bi rê û metodên nemirovane li nava kuçe û kolanên gund û bajarên Kurdistanê gulebaran dikin. Gund û bajaran jî wêtan dikin û heta gorî ku carinan kal û pîrên kurdan niha behs dikin, heçê navê wan bi tîpa "Ş" dest pê dike, ew têne kuştin. Gava ordiya tirk ji Kurdistanê vedikişe, li dû xwe gundên wêran, xaniyên xerabe û di nava şewat û dixanê de zarokên sêwî û stûxwar dihêle. Ev bûyera han tesîreke neyînî li Celadet Beg dike, hêviya wî dişikîne, demekê destê wî li kar û xebata si-

yasî sist dike...

Serîhildana Şêx Seîd şikest, ew birayên ku bi tirkan re ji bo xelasiya Tirkiyeyê şerê "xelasiyê" kiribûn, ji aliyê birayên xwe yên tirk û musulman ve hatin gulebarankirin, gundên wan hatin wêrankirin, daristanên wan hatin şewitandin. Ev hemû ji bîra Celadet Beg naçin. Ew bi wan bîranînan radizê, bi wan radibe. Gav û saet ew di bîra wî de ne. Ew li riyekê digere. Li riya xelasî û serbixwebûnê. Li riya felatê... Ew bi wî serê xwe yê tijî fikrên têvel berê xwe dide Libnanê, diçe Bêrûdê. Li Bêrûdê kurd gihane hev. An jî rewşa kambax, stemkarî, jiyana sirgûnê ew anîne ba hev. Wan di nava xwe de komeleyek bi navê "Xoybûnê" ava kirine û ew dixwazin tola xwîna şehîdên xwe wergirin, welatê xwe yê ji dest çûye bi paş de bistînin û ji wê jiyana zehmet ya welatên xerîbiyê rizgar bibin, li ser axa welatê xwe bi azadî û xweşî bijîn. Celadet Beg tavilê xwe digihîne vê komeleyê û dibe yek ji endamên wê yê girîng. Hîn wilo sal dibe 1927 û di bin serokatiya Îhsan Nûrî Paşa de, li Agiriyê kurd radibin ser xwe û dixwazin biyaniyan ji welatê xwe biqewirînin. Ev serîhildana ku li çiyayê Agiriyê diqewime bi alîkarî û piştgiriya Xoybûnê dibe. Komeleya Xoybûnê tavilê li hev dicivin; axa, serokeşîr, pêşengên civatê li hev dicivînin û dixwazin serîhildanê berfireh bikin. Ew xeberê digihînin serokatiya serîhildanê û bi wan didin zanîn ku ew ê ji milê Sûriyê de li tirkan bixin û bi wî awayî serîhildanê fireh bikin û bikin berxwedaneke Kurdistanî. Lê tirk bi artêşeke xurt, bi tanq û top û balafiran digirin ser Agiriyê û çi benderuh dikeve ber wan ew dikujin. Serokê serîhildanê Îhsan Nûrî Paşa xwe dide alî, diçe Îranê û piştî bi salan di nava tenêtî û bêdengiyê de, bi hesreta welêt çavên xwe digirin û ji vê dinyayê koç dike.

Ev şikandina han jî dilê Celadet Beg bêhawe dişikîne, heta tê gotin ku piştî wê baweriya wî bi siyasetê sist dibe, ew xwe bi hemû hêza xwe davêje meydana kultur, ziman û edebiyata kurdî. Ew dibîne

ku piştî şikestina serîhildan û liberxwedanên kurdan, kurd ji aliyê moral ve jî dişikên û ji tirsa karbidestên Cumhûriyeta Tirkiyeyê ew ji ziman û kultura xwe bi dûr dikevin, dibin biyaniyên xwe. Ew tê-digihîje ku piştî nifşekî du nifşan dê gelek kurd asîmîle bibin, ji xwe û ji nasnava xwe bi dûr bikevin û dê bi wî awayî navê kurd û Kurdistanê ji ferheng û nexşeyên cîhanê bête maliştin. Ji bo ku ew pêşî li vê yeka han bigire, ew tavilê dest diavêje alfabeya xwe, ya ku wî di salên 1919'an de nîvcî hiştibû û wê li ser hîmê alfabeyên latînî durust û têkûz dike. Ji bo ku ew bikaribe alfabeya xwe di nava kurdan de belav bike, zimanê kurdî yê nivîskî bi wan bide zanîn, ew biryara derxistina kovarekê dide û navê kovara xwe dike HAWAR. Ew hejmara pêşî ya Hawarê di panzdehê gulana 1932' de derdixe. Di pêşgotina hejmara pêşî ya kovarê de, di derheqa armanca kovarê de wilo dibêje: "*Hawar dengê zanînê ye. Zanîn xwe nasîn e. Xwe nasîn ji me re rêya felat û xweşiyê vedike. Her kesê ko xwe nas dike; dikare xwe bide nas kirin. Hawara me berî her tiştî heyîna zimanê me dê bide nas kirin. Lewma ko ziman şerta heyînê a pêşîn e.*"

Ew wî zimanê ku li ber mirinê ye jîndar dike, dixe warê nivîsandinê û bi wê yekê şerta heyina kurdan a pêşî diyar dike.

Ji bo ku kovara wî di çarçoveyeke teng de nemîne, nebe malê grûp, partî, an jî bi tenê îdeolojiyekê, lê belê ew bibe malê hemû kurdan, dengê hemû kurdan, ew dîsan di pêşgotina hejmara pêşî ya Hawarê de weha dibêje: "*Hawar ji niha û pê ve bi her tiştê ko kurdanî û kurdîtî pê bendewar e, dê mijûl bibe. Tinê siyaset jê dûr e, xwe naêxe siyasetê. Hawarê siyaset ji civatên welatî re hiştiye. Bi siyasetê bila ew mijûl bibin. Em jî di warê ziman, hiner û sinhetê de dê bixebitin.*"

Û ew li ser ya xwe dimîne. Ew mîna ronakbîrekî kurd, bi her tiştê ku hemû kurdan eleqeder dike ve mijûl dibe, lê xwe tenê bi nêrînekê, an jî bi îdeolojiyekê ve girê nade, heta dawiya jiyana xwe, ew

Kurdîstanî dimîne. Lê ez bawer dikim gava ew dibêje ku ew ê bi siyasetê ve mijûl nebe, ne ku ew ji rastiya Kurdistanê direve, hebe tune be, ew naxwaze xwe bi rêxistinekê ve girê bide. Ger wî bi hemû awayî destê xwe ji siyasetê bikişanda, wî ê hewcedariya ku ew nameyeke dirêj ji Mustefa Kemal Atatürk re bişîne, nedîta. Erê, ew di sala 1933'an de, yanî piştî weşandina kovara xwe bi salekê û piştî avakirina Cumhûriyeta Tirkiyê bi deh salan di bin navê "*Ji Reîsî Cumhûrê Tirkiyê Xazî Mustefa Kemal Paşa re Nameyeke Vekirî*" nemeyeke dirêj dişîne. Ew wê nameya xwe bi munasebeta bîranîna dehsaliya Cumhûriyetê û efûya giştî, ku Cumhûriyetê soz dabû, dişîne. Celadet Beg di vê nameya xwe ya dirêj de, ku paşê mîna pirtûkekê çap dibe, bi ilmî rexneyan li Mustefa Kemal digire û wan ji bo sozdayina wan derewîn derdixîne. Herweha ew di nameya xwe de li ser kurdan, li ser nasyonalîzma tirkan radiweste û bi metodên lîngiwîstik mînakan ji zimanê kurdî dide. Ew di wir de dide xuya kirin, ku kurd ne tirk in û ew xwediyên kultureke cihê, zimanekî cihê û miletekî cihê ne.

Em vegerin ser Hawarê. Dema ku Celadet Beg dest bi weşandina Hawarê û belavkirina alfabeya xwe dike, hejmara kurdên xwende kêm e, çi bigire tune ye. Lê, çend xortên din ên serxetî, ku ew jî ji ber gelek sedeman mecbûr mabûn, ku welatê xwe terk bikin û koçî binxetê bikin, digihên Celadet Beg û bi alîkarî û teşwîqên Celadet ew dibin xwediyên navên mîna Qedrîcan, Nûredîn Zaza, Osman Sebrî, Cegerxwîn...

Gava min di hevpeyvîneke bi Osman Sebrî re, pirsa ku wî "kengî dest bi nivîsandinê kiriye" kiribû, wî gotibû ku wî bi xêra Celadet Beg dest bi nivîsandina kurdî kiribû û ku ne ji Celadet Beg bûya, wî nizanîbû ku zimanê kurdî zimanê nivîsandinê ye an na. Herweha Nûredînê xort jî deyndarê Celadet Bedir-Xan e. Tê gotin ku her tim Celadet Beg Nûredînê xort dipesinand û ji bo teşwîqkirina nivî-

sandinê ew beramberî Anton Çexov dikir.

Çexov bi xwe jî di dema xwe de xort dipesinandin, ew teşwîqî nivîsandinê dikirin û gelek caran bi wan dida zanîn ku ew ê bi nivîsandina berdewam bibin nivîskarên mezin û navdar. Mirov wê nefsbiçûkahî û ruhiyeta teşwîqê di Celadet Bedir-Xan de jî xweş dibîne. Ji bilî navên mîna Qedrîcan, Osman Sebrî, Nûredîn Zaza û Cegerwxîn; ger zarokekî, şivanekî an jî xwendevanekî jê re nameyek bişanda, wî tavilê ew name di Hawarê de diweşand, pesnê wan dida û ew jî mîna nivîskarên Hawarê dinavandin.

Em dibînin, ji roja ku Celadet biryara xwe daye ku ew ê bi ziman û kultura kurdî dakeve, ew pê dadikeve, bi xebat û fedekariyên xwe yên şexsî ji me re bingehê zimanê me yê ku biyaniyê nivîsandinê bû dihêle.

Wek me li jor jî qal kiribû, gava Celadet Beg dest bi weşandina kovara xwe dike, hejmara kurdên xwende kêm e, ji xwe hejmara kurdên ku bikaribin bi kurdî bixwîne tune ye. Lê ew yeka han wî bêhêvî nake. Tunebûna xwendevanan wî dilşikestî nake û destê wî li karê wî sist nake. Wî xwe bi xwe digot:" Ger xwendevanên kurdî tunebin sedemên wê hene." Sedemên wê xuyabûn. Kurdistan Serbixwe nebûbû, erdên Kurdistanê yên rizgarkirî tunebûn, zimanê kurdî nebûbû zimanê nivîsandin û perwerdiyê. Rastiya welêt û rastiya miletê wî ji wî ve xuya bû. Loma wî pir bi sebir, lê bi enerjiyeke bêhawe dixwest ku zimanê kurdî têxe warê nivîsandinê û bi wê yekê kurdan bike xwedî nasnav û şexsiyetê.

Di sala 1987'an de gava ez li mala xanima wî Rewşen Bedir-Xan bûbûm mêvan û min pirsa ku Celadet Beg çawan Hawar derdixisit, jê kiribû, wê ev bersiva han dabû min: "Şev û roj li rehmetî tune bûn. Gav û saet kaxezin di dest de bûn, dixwend, rast dikir, diçirand, dîsan ji nû ve dinivîsand. Hawara wî mîna zarokeke wî bû. Her ku hejmareke nû ya kovarê derdiket, ew mîna zarokekî dilşa di-

bû. Lê hemû bar di stûyê wî de bû. Ew gelekî pê re diwestiya. Di mehên destpêkê de ez nikarîbûm jê re bibûma alîkar, lê paşê gava ez hînî rêzkirin û ambelajê bûm, min karê wî hebekî hêsan kir."

Ez baş bi tîraja Hawarê nizanim, lê tiştê ku Rewşen Xanimê ji min re behs kir, wê tîraja wê ne ewçend bilind be, wê li dor çend sed libî be. Piraniya wê li nava kurdên binxetê, yanî kurdên Sûriyê dihate belav kirin, çend lib digihîştin Tirkiyeyê, çend lib digihîştin Iraqê û ez ne şaş bim çend lib jî digihîştin Îranê. Lê ew çend libên ku digihîştin wan welatan jî li hemû hezkirên zimanê kurdî belav dibûn. Ji ber vê yekê ye ku em di kovarê de li gelek navên kurdên başûr rast tên. Yanî kovar di nava kurdên her welatî de bûbû pireya hevdunasînê. Di kovarê de mirov ji bilî kurmancî li zaravayê soranî jî, lê bi alfabeya latînî rast tê. Wilo xuya dibe ku di wê demê de bi fermî destûra zimanê kurdî li wan welatan hatibûya dayin û hejmara kovar û rojnameyên kurdî zêdetir bûya, em ê îro ji problema alfabeyên erebî û latînî xelas bûbûna û wê mîna ku di Hawarê de jî belav bûbû, hem kurmanciya jêr, hem jî kurmanciya jor bi alfabeya latînî bihata nivîsandin û wê ferqiyeta herdu zaravayên kurdî yên mezin hêdî hêdî hindiktir bibûya. Wek tê zanîn, Hawar li welatekî ku alfabeya erebî dihate bikaranîn, bi alafabeya latînî derdiket. Em wê tesîra Hawarê û xwediyê wê Mîr Celadet Alî Bedir-Xan îro jî dibînin. Îro di nava kurdên me yên Sûriyê de yên ku kurdî bi alfabeya erebî dinivîsînin, çi bigire tune ye. Digel ku xwendina wan bi erebî ye, digel ku ew di dibistanan de hînî alfabe û nivîsandina erebî dibin jî, dîsan ew xwe hînî alfabeya zimanê xwe ya latînî dikin û îro bi sedan nivîskar, bi çendan kovar û pirtûkên kurdî ji aliyê kurdên me yên Sûriyê ve têne derxistin. Ev yeka han bivê nevê ji tradisyona Celadet Bedir-Xan û bi xêra kovara wî Hawarê dibe. Û tiştê ku Celadet Bedir-Xan jê ditirsiya, bi serê kurdên Tirkiyeyê ve hatiye. Piştî şikandina serîhildan û berxwedanên kurdan, tirk bi metodin ji mirovatiyê

dûr çûne ser kurdan, ew êşandin, girtin, bi dar ve kirin, zimanê wan li wan qedexe kirin û dema ku Celadet Beg kovara xwe li Şamê derdixist, ji bo her gotineke kurdî li Tirkiyeyê cezayê peran dihate dayin, ji cezayê peran wêdetir, pirê caran cezayên bi salan heps dihate dayin. Piştî nivşekî, kurd di ber çerxa polîtîkaya asîmîlasyonê ya tirkan de heliyan, ji zimanê xwe bi dûr ketin. Ger car caran di hin cihan de çirûskin pêketibin jî, dewlet bi xurtî çûye ser wan, bi girtin, lêdan û îşkencê dengê wan birîne. Em dibînin ku ew tesîra han ji ruhiyeta kurdên Tirkiyeyê derneketiye, şoreşger û têkoşerên kurd, ku di ber Kurdistana pîroz de serê xwe didin, ji bo bidestxistina zimanê kurdî bi salan di zîndanan de radizên, lê ew bi xwe hewl nadin ku bi zimanê xwe binivîsînin, bi zimanê xwe bixwînin, bi zimanê xwe bifikirin. Ez carinan ji xwe re difikirim, ku em kurd tenê mehekê tirkî protesto bikin (di vir de mexseda min ne ew e ku divê em li dijî tirkî bin, ez bawer im tirkên bi rastî dilxwazên kurdan jî wê li dijî biryareke wilo dernekevin) kovar û rojnameyên xwe bi kurdî derxin, kovar û rojnameyên bi tirkî nekirin, li dikan û çayxanên xwe bi kurdî bipeyivin, li mehkemayan bi kurdî îfadeyên xwe bidin, yanî bi kurtayî di her warê jiyanê de bi kurdî bipeyivin û bi kurdî binivîsînin. Erê, tenê mehekê. Ez bawer im bi cihanîna biryareke wilo jî wê ne ewçend zehmet be. Hingî em ê bibînin ku wê çawan cih li dewletê teng bibe, dinyaya ku pirsa me bi terorîzmê ve girê dide, wê çawan li bin guhên hev bikeve. Gava ez van çend rêzan dinivîsînim, ez di bin tesîra tevgera Mahatma Gandî de dinivîsînim. Gandî ji xelkê Hindistanê daxwaz kir, ku ew kincên îngilîzan li xwe nekin, tiştên wan nekirin. Û xelkê wilo kir. Bi wê biryara hindiyan gelek fabrîkayên îngilîzan çûne îflasê, darbeyeke mezin ya ekonomîk li îngilîzan ket û biryareke wilo bû sedema dawîhatina împaratoriya Birîranya ya li Hindîstanê.

Lê îngilîzan zimanê hindiyan qedexe nekiribûn. Ger îngilîzan zi-

man û nasnava hindiyan qedexe bikirana, mirov texmîn dike, ku dê Gandî li hemberî bûyereke wilo, xelkê hindî vexwenda protestokirina zimanê îngilîzî.

Bi a min biryareke wilo ji bo me çekeke mezin e. Bi biryareke wilo hem em ê bikaribin hebûna xwe bidine îspatkirin, hem em ê bikaribin hebûna zimanê xwe bidine îsbatkirin, hem em ê mehkeme û daîreyên resmî yên tirkan mecbûrî wergêran bikin, hem em ê tîraja kovar û rojnameyên tirkan li Kurdistanê û li Tirkiyeyê bixînin, hem jî em ê dawîanîna polîtîkayeke ku heftê sal in li ser înkariya miletê me hatiye avakirin, bînin.

Gava mirov li xebatên Celadet Bedir-Xan vedigere, mirov texmîn dike, ku ew niha li jiyanê bûya wî ê pêşniyareke wilo bianiya. Ji ber ku wî ziman, yek ji şertên heyinê yê pêşî didît. Ma qey ziman ne yek ji şertên heyinî yê pêşî ye? Ma gelekî bê ziman, neteweyeke bê ziman hatiye dîtin? Ger ziman yek ji şertên miletbûn û netewebûnê be, çima em wesiyetnameya zanayê xwe Mîr Celadet Beg bi cih naynin û li zimanê xwe hûr nabin? Çima em bi zanebûn an bi nezanî xwesteka dijminan bi cih tînin û ji fikra ku ew dibêjin zimanê kurdî tune ye, miletek bi navê meltê kurd tune ye, re dibine alîkar?

Gelek ji me li Ewrûpayê bi Celadet Bedir-Xan û xebatên wî hesiyan. Bi alîkariya ronakbîr û weşanxaneyên kurdan piştî şêst salî xebatên wî ji nû ve di nava kurdan de belav dibûn. Pêşî Mîrza Hemreş Reşo mizgînî gihande me û Hawara ku li ber windabûn û jibîrbûnê bû, ji hejmara 24'an ta hejmara 57'an mîna pirtûkeke qalind weşand û belav kir. Piştî wê weşanxaneya Jîna Nû kovara Mîr Celadet Bedir-Xan ya bi navê Ronahî, hejmara 1-28 bi hev re weşand. Herî dawiyê jî Mihemed Bekir ji hejmata 1'ê Hawarê heta hejmara 9'an bi çapeke bedew li Swêdê çap kir. Di vê navê de ji hejmara 10'an hetanî 23'an neçapkirî maye. Em hêvîdar in ew ê jî di nêzîk de bête çap kirin, ew kahniya ku kultur û edebiyata kurdî

jê diherikî, ji nû ve der bibe.

Bi xêra van heval û weşanxanyên kurdan, xebatên Celadet Bedir-Xan piştî bi pêncî-şêst salî ji nû ve ji me ve xuya dibûn. Gava em niha li zimanê wî, li nêrîn û felsefeya wî dinihêrin, em dibînin ku ew kurdekî întelektuel, pirhêl û dûrbîn bû. Mirov di nivîsên wî de zanebûneke kûr, nefsbiçûkiyeke ku ji zanebûna kûr diza û kurdayetiyeke pak û bedew rast tê. Herweha ew karekter û şexsiyeta pak û bedew di nivîskarên din yên Hawar û Ronahiyê de digerin, ew jî mîna Celadet Beg dibin xwediyê navên nemir û avakerên fikir û ramanên kurdperwer û lîberalên çak.

Ew xebat û keftelefta Celadet Beg, ya ku îro ji gelekî xwediyê nifûseke bi dehan milyon mirov re bûye mîna kitêbên pîroz û ji bo ruhiyeta kurdayetiyeteke xurt bûye mîna aleke pîroz, bi hezar zehmetî, serêşî û bêîmkanî hatiye pê. Wek me li jorê qal kiribû, ku ji xela xwendevan û nivîskaran pê ve, problema ekonomîk yek ji problemên herî mezin bûn. Herçiqas li hin der û doran tête zanîn, ku Fransizan alîkariya Celadet Beg û kovarên wî dikirin jî, li gorî malûmatên ku xanima wî Emîre Rewşen Bedir-Xanê dane min, Fransizan alîkariya Celadet Beg ya ekonomîk nekirine, lê bi destûra Fransizan kovarên wî derketine. Di derxistina van kovar û pirtûkên xwe de Celadet Beg ji bilî tab û keda xwe, ew di warê ekonomîk de jî gelekî êşiyaye, pirê caran ew hewcedar bûye. Ji bo ku ew bikaribe kovara xwe berdewam bike, li gorî ku mirov ji hin nivîsên wî yên di Hawarê de têdigihê, wî carinan kaxez zêde bi dest dixistin û ew li Bêrûdê, li bazara reş difirotin. Lê xuyaye vê yeka han zêde alîkariya wî nekiriye, loma ew carinan mecbûr maye ku navbirê bide kovarê û wê rawestîne. Herçiqas ji hin axayên herêma Cizîra binxetê carinan alîkariya aborî bi Celadet Beg hatibe kirin jî, xuyaye wê jî têr nekiriye. Loma Celadet Beg rojek ji rojan mecbûr maye, êdî ji bo ku ew bikaribe malbata xwe û zarokên xwe xwedî bike û çend

quruşên ku bi ser bikeve jî pê kovarê çap bike, li deriyê dostekî xwe î xwedîerd dixe û jê tika dike ku erdê wî yê pembo bi nîvî biçîne. Dostê wî wê pêşniyaza wî bi kêfxweşî qebûl dike û erdê xwe didiyê. Celadet Begê ku belkî di jiyana xwe de li karekî wilo nefikirîbû, tavilê xwe kar dike, ji bo ku dostê xwe fedîkar dernexe û ji bo jin û zarokên xwe dilşa bike, herweha ji bo bikaribe karê xwe yê çapemeniyê bidomîne, dixwaze bi metodên nûjen erdê dostê xwe bi kar bîne û berekî baş jê wergire. Ji bo ku ew bikaribe berekî baş jê wergire, av lazim e. Ji bo avê kolandina bîrekê lazim e. Celadet Beg tavilê bîrekê dide kolandin û ji nava wî erdê bi bereket aveke zelal derdixe.

Lê pir tê re naçe, Celadet Beg di bîra xwe, ya ku wî navê "Bîra Qederê" lê kiribû, wer dibe û bi hemû xeyal û xewnerojkên xwe, digihîje kerwanê şehîdan.

Celadet Bedir-Xan bi navên cihê cihê

Celadet Bedir-Xan gelek navên cihê bi kar anîne. Wî ji bilî navê xwe yê rastîn, Xwediyê Hawarê, Bavê Cemşîd, Herekol Ezîzan, Bişarê Segman, Seydayê Gerok û çend navên din jî ku ez nikarim bi dest bixim, bi kar aniye. Wî di bin van navan de gelek nivîsên cihêreng nivîsîne. Li ser gramerê, li ser eşîrên kurdan, li ser devokên zimanê kurdî, li ser klasîkên kurdan, nivîsên civakî, yên dîrokî, helbest, çîrok, werger û hwd... Gava mirov bala xwe dide nivîsan, di kîjan warî de dibe bila bibe, mirov hostetiyekê tê de dibîne û ji şoperiyên nivîskarekî ecemî gelekî dûr e. Wek mînak, gramer û bingehê zimanê kurdî ku wî berî bi heftê salî avêtiye, em kurdên îro hê jî negihîştinê. Ya din, gava wî bingehê gramera kurdî avêtiye, ji bilî zaravên kurdî yên mezin û sereke, ew li devokên herêmî jî fikirî ye, daye ber gelek zimanên Hindû Ewrûpayî û li gorî wê yekê bingehê zimanê me avêtiye. Herweha nivîs û lêkolînên civakî jî tu dibêjî qey

ew îro ji aliyê nivîskarên me yên herî xurt ve hatine nivîsandin. Heçî werger in, wî ji nivîskarên mîna H. C. Anderson, Guy De Maupassant ku li dinyayê navdar û nemir in wergerandiye kurdî. Di warê helbestnivîsandinê de jî ew dikarîbû bibûya yek ji şaîrên dema xwe yê herî navdar. Gava min helbesta wî ya bi navê "Bilûra Min" ku wî di bin navê Seydayê Gerok de nivîsandibû, xwendibû, min gelekî jê hez kiribû û heta mehekê jî kîjan hevalê ku hatibû mala min min jê re xwendibû û heyraniya xwe ya helbestê anîbû ziman. Vê helbesta ku Celadet Beg di sala 1941'ê de, di Hawarê de belavkiribû wilo bû:

Bilûra min a şîrîn
tu di sariya sibehê
û hingûra êvarê de
hevalê bêhevalan,
destbirayê şivan û dilketiyan î.
Dengê te
hêstirên dilên xemgîran,
silava ji hev-veqetiyan,
girîn û zarîna dilketiyan
tîne bîra min.
Bilûra min tu î,
xemrevîna terkeserên dinyayê!
Dengê bilûra min,
çiya û zozanên bilind,
kaniyên bi gul û rihan dorgirtî,
guhê şikeft û serê zinaran
guhdarên te ne!
Û sura bayê xerbî
te di nav pelên darê de digerîne.

Bilûra min, were em ê
bi wî çiyayê bilind re
bi hewa kevin,
û bibin cîranê bayên xurt
û hevalên kimtên wan
yên bi mij û dûman,
û tê de dengê xwe berdin,
û zarîna dengê me
bikeve nav kortal û geliyan
û bêcaniya erdên jêrîn
bihejîne;
û pêlên ava heftreng
ên xemzebaz
nalîna me bigehîne
deşta Sirûç û Diyarbekrê;
û kalîna berxan
tev şehîna hespan
li me vegerînin.

Bilûra min, binêre û bibihîse!
Roj çû ava,
stêra êvarê bû geş,
kolosên çiyan ên gewr
û hewraniyên wan ên sor û zêrîn
bûne çûn;
û pêlên ava şevê ên reş
ketine deşt û newalan
heta rûyê gir û kepazan.
Di qeraca de
kevir piyê şevgera dixapînin

û bêdengiya şevê de
pêjna lingên mêrxasan tên.

Bilûra min,
dengê xwe berde!
Dinya, mîna zarokekî berşîr,
ket dergûşa xwe;
Dengê xwe berde, bilûra min,
û jê re bilorîne,
xema wê birevîne!
Bilûra min tu î
xemrevîna terkeserên dinyayê;
û li rohelatî
dema ko dinya hişyar dibe
ji xew radibe
ji me re
strana azahî û serbestiya
Kurdistanê
binehwirîne,
û dengê wê stranê, bila,
mîna tîrêjên rojê ên pak û zêrîn
bikeve nav dil û guhên me.
Bilûra min,
Tu î xemrevîna dilketiyên welêt.

Nûdem, No: 8, 1993

Mûsa Anter di pêşgotina pirtûka bîranînên xwe de xwe wilo dide naskirin: "*Kurdistan herêma Tirkiyeyê ya herî lipaşmayî ye; Mêrdînê bajarê Tirkiyeyê yê herî lipaşmayî ye; Nisêbînê qeza Mêrdînê ya herî bi derd e; Stilîlê nehiya Nisêbînê ya herî belengaz e; Zivingê gundê Stilîlê yê herî lipaşmayî ye. Li gorî nifûsa min ez li şikefta jimar dido ya vî gundî hatime dinyayê*".

Erê, mîna ku Mûsa Anter jî dibêje, bi awira pêşî mirov dikare bibêje; ma wê çi ji vî zarokê şikeftê derkeve? Lê belê ev zarokê ku li şikeftê tê dinyayê û dibe xwediyê navekî nemir, ev çil pêncî salên dawiyê ji rojeva Tirkiyeyê derneket.

Mûsa Anter hê di zaroktiya xwe de bavê xwe wenda dike, li ber destên diya xwe digihê. Diya wî, ya ku ew ê heta mirinê ji bîr neke û di bin tesîra wê de bimîne; piştî mirina bavê wî, ew Mûsakê piçûk bi tenê nahêle, hem jê re bavîtiyê, hem jî dayiktiyê dike. Ev dayika şareza ya ku paşê di nava malbatê de bi zana û mêrxas tête navandin, dibe muxtarê gund û gelek caran ji peyan bêtir xwe dide pêş. Tu gundî vê yeka han ji wê re kêmasî nabînin, berevajiya wê, gelek ji jin û peyayên gundiyan dilê xwe dibijînin jiyana wê, xatir û qîmeteke bêpîvan didine vê jinebiyê. Lê belê her çawan be, Mûsakê piçûk xwe di nava heval û hogirên xwe de stûxwar dibîne, ji ber tunebûna bavê her tim bi fikir û raman e. Lê carinan be jî ew xwe ji wan fikir û ramanan bi dûr dixe, xwe serserî berdide nava gund, bi zarokên gundiyan re li hev dicive, ji xwe re bi veşartokê, xezalê, holî, qijimkal, çirê û hwd dileyize. Di lîstikên xwe de fenan nake, lê mîna

ku di lîstikekê de bi ser bikeve, ew ê xelatê bistîne, xwe bi hemû hêza xwe dide lîstikan, bi serfirazî rojên xwe dibe serî.

Roj derbas dibin, çûyin û hatina esker û tehsîldaran ya gund zêde dibin, diya wî ji ber nezaniya zimanê tirkî xwe lal hîs dike, li hemberî esker û tehsîldaran devê wê dikeve hev; çiqas dipirse, digere, yekî tirkîzan nabîne, ji ber vê yekê ew biryara xwe dide û Mûsakê piçûk di sala 1927'an de dişîne dibistana Kercewsê. Gelek gundî li ber vê yekê dikevin, dibêjin wê Mûsayê mulahîm û hurmetgir bi xwendinê xerab bibe, li ser serê me bibe efendî û tade û zilmê li me bike. Piştî ku Mûsa salekê li Kercewsê dixwîne, paşê derbasî dibistana Mêrdînê dibe. Dibistana Mêrdînê ji 90 xwendevanan pêk dihat. Zarokên eşîr û serokeşîrên Omeriya, Surgûciyan, Kîkanan, Dêrika Çiyayê Mazî, Tilermen, Mahsertê, Şermixê û hwd...bû. Ew yeka han, piştî avakirina Cumhûriyetê, metodeke asimilasiyonê bû. Dewletê dixwest bi asimilekirina axa û serokeşîran kurdan, kurdan asîmîle bikin û bi wê yekê ji pirsa ku îro jî bela serê wan e, xelas bibin.

Mûsa bi jîrî dibistana xwe dixwîne, di demeke kurt de fêrî tirkî dibe, êdî wergêra gundî û eskeran dike, diya xwe jî ji wê bêzariyê azad dike. Diya xwe azad dike, lê hêdî hêdî bi zilm û stema leşkerên tirkan ya bêsedem dihese. Ji ber wê zilma wan ya nedîtû ji bêçaretiya xwe di hundurê xwe de dişewite. Eskerên siwarî yên ku carinan ji nişka ve digirin ser gundê wan, bêsedem dewarên xelkê dikujin, mirîşk û heywanên navmalê didin ber singûyan, ger di ber bîstanan re derbas bibin, bi sedan petêx û şebeşên nûgihiştî didin ber singûyan, û bi wê yekê dixwazin gundiyan çavtirsandinî bikin, da ew ji dewlet û hêza dewletê bitirsin. Wê zilma nedîtû û bêmane kir ku Mûsa Anter li sedemê wê bigire, lê bi salên xwe yên biçûk, dikir nedikir tiştek ji hev dernedixist.

Mûsa Anter bêhawe ji dibistanê hez dikir. Ji xwendinê hez dikir. Ji ber hezkirina xwe ya xwendin û dibistanê bû, ku ew bûbû yek ji

şagirtên dibistanê yê herî jîr. Wî xwe zû dixist çavên mamostayên xwe, mamostayên wî jî ji ber jîrî û xwendinheza wî zû meyla xwe berdidan ser wî, jê hez dikirin, destên xwe di ser serê wî re dibirin û pê didan zanîn ku ew ê di pêşerojê de bibe mirovekî zana, mezin û bi qîmet. Vê zanebûn û şarezabûna wî ya dibistanê bala diya wî jî dikişand, loma wê jê dixwest ku ji ber pîrbûna xwe, êdî divê ew têkeve şûna wê. Mûsa herçiqas neketibû şûna wê, yanî nebûbû muxtarê gund jî, ew her tim li pêşiya eskeran radibû, bi tirkî bi wan re dipeyivî, derd û kulên gundiyan bi wan didane zanîn. Gundî bi tirkîpeyivandina Mûsa gelekî ecêbmayî diman, hinan jê tika û lava dikirin ku wî zimanî hînî wan jî bike, da ew jî ji zimanê dewletê fêhm bikin. Vî zimanê dewletê ku armanca wê ji navêrakirina kurdan bû, bi kêrî Mûsa Anter dihat, wî piştî dibistana destpêkê, rojekê mîna lawê axayekî xwe girê dide, li hespê siwar dibe, xulamekî malbatê jî bi qantirê dide kêleka xwe û ji bo xwe li dibistana navîn binivîsîne berê xwe dide bajarê Mêrdînê. Ew li Mêrdînê dikeve îmtihana dibistana navîn û lîseyê û piştî bi du mehan ji rojnameyan dibihîze ku wî lîseya Edenê qezenc kiriye.

Ew êdî xort e, çardeh salî ye; diya wî doza zewacê lê dike, lê ew ji ber hezkirin û evîndariya xwe ya xwendinê pêşniyaza diya xwe bi xemgînî bi paş ve vedigerîne, biryara xwe ya xwendinê dide, dixwaze bixwîne, zana bibe, da meriv û gundiyên xwe ji wê nezanî û cehaletê rizgar bike. Lê belê diya wî li hemberî wê biryara wî derdikeve û naxwaze lawê wê dev ji gund berde, wan bi tenê bihêle û heta bajarê Edenê here.

Mûsa Anter gelekî li ber wê biryara diya xwe derdikeve, digirî, difikire, li riyekê digere ku diya xwe serwext bike û here bajarê Edenê. Gelo çi bike, çi neke, rojekê radihêje rojnameya ku navê wî û yên din ku dibistan qezenc kirine tê de ye û diçe ba midûrê Nehiyê. Bi wê xortaniya xwe li wir jî hêsiran dirijîne, dilê midûr gelekî bi vî

xortê çeleng û evîndarê xwendinê dişewite û jê re soz dide ku ew ê wî bi awayekî ji bo xwendinê bişîne bajarê Edenê. Midûr li ba xwe senaryoyekê çêdike, bangî diya wî dike, Mûsa bi diya xwe re dikeve odeya midûr, midûr ji cihê xwe radibe, xêrhatinê dide diya wî, wê dide rûniştandin, jê re dibêje ku hetanî niha wî ew li emberî dewletê parastine, lê ji niha pê ve, yanî ger ew Mûsa neşînin dibistanê, ew nema dikare wê û zaroyên wê li hemberî dewletê biparêze; paşê midûr daqûl dibe, ji çavîka maseya xwe desteyek kaxez datîne ser masê û dibêje ev ewraqên han ji Ankarayê hatine, di ewraqan de dewlet dide xuyakirin ku Mûsa neçe dibistanê, dê hemû malbat ji cih û warên xwe bêne surgûnkirin. Feslaya reben li ber midûr digere, bi stûxwarî jê re dibêje, ma me çi xerabî bi dewletê kiriye ku ew ê me surgûn bike? Herçawan be midûr rola xwe baş dike, dixe serê xaltiya Feslayê û ji bo xwendinê berê Mûsa didine bajarê Edenê. Mûsa ji kêfan difire, di serê xwe de dinyayek xeyal û fenteziyan çêdike. Gava Mûsayê xort û meraqdar li stasyona Edenê ji tirênê dadikeve, ji ber rêwîtiya dirêj û cihê nexweş, gelekî westiyaye; lê ew dîsan jî mîna cinan çavên xwe li der û dora xwe digerîne, ew bajarê Edenê yê mezin, avahiyên bilind, tirimpêl û mirovên pir wî ecêbmayî dihêlin. Baholên wî di destên wî de ne û di nava bajarê Edenê de dimeşe. Her tişt li vî bajarî bala wî dikişînin, ew nivîsên li ser lewheyên dikanan yek bi yek dixwîne, di wê navê de gava çav li xortekî ku şevqakî xwendevanan li serî ye dikeve, hema bi lez nêzîkî wî dibe û bi tirkiyeke devoka Mêrdînê jê pirsa: " Ma tu xwendevan î?" dike. Lawikê xwendevan ku ew jî ji Mêrdînê ye, li ser daxwaza wî, wî digihîne dibistanê. Yek ji berpirsiyarên dibistanê ji bo derengmayîna Mûsa pê re dixeyide, erza wî dişikîne û pê dide xuyakirin ku ew ê nikaribe li wê dibistanê bixwîne. Mûsayê ku bi hêviyên mezin berê xwe dabû wî bajarê dûr û mezin, ji ber gotin û tewrên berpirsiyêr gelekî li ber xwe dikeve, tûyê wî sor dibe, hêviya wî ya xurt û geş ji

bo kurtedemekê be jî, dişikê. Lê pir tê re naçe, ji ber nûçeya ku midûr didiyê, kêfa wî difûre û Mûsayê Zivingî li bajarê Edenê dest bi xwendina xwe dike.

Destpêka xwendina wî ya li Edenê dibe destpêka jiyana wî ya siyasî jî. Ji ber ku ew ji gund hatiye û lixwekirina wî ne mîna ya bajariyan e, hin xortên dibistanê zimandirêjiya dikin, qerf û henekê xwe pê dikin, lê Mûsa bi jîrî û jêhatîbûna xwe, xwe zû dixe çavên mamostayên xwe, wê nêrîn û tewra şaş ya xwendevanan ji ser xwe davêje û di demeke kurt de dibe yek ji bokê sinifê.

Rojên Mûsa Anter li Edenê xweş derbas dibin, dersên wî baş in, kêfa wî li cih e. Di her nameya ku ew ji diya xwe re dişîne, ew behsa başbûn û xweşbûna dersên xwe û bajarê Edenê dike. Diya wî ji ber wî serbilind dibe, bi serê wî sond dixwe û êdî çavên wê li riya mirovekî xwende û mezin e. Guhên Mûsa jî li bajarê Edenê her li ser xwendinê ye. Ew ji bilî dersên xwe yên dibistanê dest bi xwendina pirtûkên felsefî jî dike. Ew hê di wê demê de Rousseau, Kant, Bergson, Feuerbach, Nietzsche û Shcohennaur dixwîne. Ew filosofên Yunan yên mîna Sokrat, Eflatun, Aristo dixwîne. Victor Hugo û Puşkîn dixwîne. Hema çi bigire hemû klasîkên rûs û fransizan dixwîne. Bi kurtî ew gurekî xwendinê ye; tiştê dixwîne jî mîna Beduîzeman Seîdê Kurdî di bîra wî de dimîne. Ew ji xwe bawer, piştî demekê dikeve îmtihana beşa felsefeyê ya mamostetiya bilind ya Stembolê. Li hemû Tirkiyeyê tenê sê kes vê dibistanê qezenc dikin û ji van sê kesan jî yek jê Mûsa Anter e.

Lê her çawan be, Mûsa Anter kurd e, welatê wî li paş maye, miletê wî nezan û belengaz e; her ku zanebûna Mûsa Anter zêdetir dibe, ew bêtir bi rewşa gel û miletê xwe haydar dibe, bêtir têdigihê ku kurd e, xwediyê zimanekî cihê, kultureke cihê, cografiyeke cihê ye. Ew nêrîna han dike ku Mûsa Anter di pirsa kurdan de hessas bibe, li hemberî her celeb zulm û tadeyiya li ser kurdan derkeve, bix-

waze kurdan jî bike xwedî maf û rûmet.

Mûsa Anter zarokê demeke wilo ye, ku her ji çend salan carekê bûyereke mezin li der û dora wî qewimî ye. Cumhûriyet nû ava dibe, serîhildana Şêx Seîd dest pê dike, serîhildana Dêrsimê dest pê dike, lê ji bêhêzî û bêalîkariya kurdan, kurd dişikên. Ev serîhildan û liberxwedanên kurdan ji nivşê xwenda û nûgihiştî re dibe şoperiyek û armanceke pîroz. Mûsa jî dide ser wê riyê, ji ber wê yekê bi hin xwendevanên dibistanê re pevdiçe, tê girtin û di nava destên polîsan de gelek heqaret lê tête kirin.

Sal dibe 1941. Mûsa Anter digel rojên xweş û nexweş lîseya xwe li Edenê bi dawî tîne. Ew êdî bûye narkomanê xwendinê, nikane dev ji xwendinê berde û vegere gund, lê ji bo xwendina unîversîteyê berê xwe dide Stembolê. Çawan gava ew ji Nisêbînê çûbû Edenê, Edene jê re mezin û ecêb hatibû, gava ew ji Edenê jî diçe Stembolê, Stembol jê re bêhawe mezin û xweş tê. Ew li Stembolê dest bi xwendina fakulteya edebiyatê dike. Kêfa wî gelekî ji xwendina fakulteyê re tê. Piştî ku ew li wir bi gelek xwendevanên kurd re dibe dost, ew bêtir bi dibistanê ve tête girêdan. Yek ji hevalê wî yê pêşî siyasetvan û şaîrê kurd Faîk Bûcak e. Herdu xwendevan û aktivîstên kurd bi dîtina hev gelekî dilşa dibin, hema ku ji dersan firsendê dibînin, li ser rewşa kurdan bi gişti, li ser rewşa xwendevanên kurd li Stembolê û li ser Kurdistanê gelek sohbet û gotûbêjan dikin.

Meh û sal derbas dibin, Mûsa Anter ji jiyana gundîtiyê bi dûr dikeve, her diçe bi jiyan, liv û tevgera xwe dibe mîna Stemboliyekî. Lê mîna Stemboliyekî bi kultur... Ew kultura xwe ya nûjen li ser kultura kevnare ava dike. Ew hem ji çîrok, stran û destanên kurdî hez dike, hem jî ji muzîka tirkî ya hunerî. Ew hem berhemên Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran dixwîne, hem jî Balzak, Hugo û Tolstoy... Rohilat û roava di wî de digihên hev, dibe yek. Ev yeka han wî dike xwediyê zanebûneke kûr û perspektîveke fireh.

Ew dibe demokratekî bêhempa û humanîstekî zarşîrîn. Rewşa wî ya taybetî hem wî bi heval û dostên wî şîrîn dike, hem jî gelekî bala keçikên Stembolê dikişîne. Heya wê demê jî, herçiqas ew bi gelek keçikan re rabûye û rûniştiye, dîsan ji bilî Ayşeya Edeneyî wî ji kesî hez nekiriye. Lê keçên Stembolê ku ji neteweyên cuda pêkdihatin, xweşik bûn. Bejnên wan zirav, laşên wan li hev bûn. Ev keçên bedew li dora Mûsayê çeleng diçin û tên; ji bo bi wî re bibin dost û heval can davêjin. Lê Mûsa xwe ji wan diparêze, ew her dixwaze bi keçeke esil kurd re bizewice, zarokên wî ji jineke kurd bin. Ew çavên xwe digerîne û dawiyê bi keça Abdurrehîm Rehmiyê Hekariyê, bi Stiya Haleyê re dizewice. Niha ji Hale Xanê sê zarokên wî yên mezin Anter, Dîcle û Reşê hene. Hem her sê zarok, hem jî Xanima Hale li Swêdê dijîn. Çawan destpêka jiyana Mûsa Anter ya Edenê destpêka hişyarbûna wî bû, destpêka jiyana Mûsa ya Stembolê jî, dibe destpêka jiyana wî ya rewşenbîrî. Piştî ku ew li Stembolê bi cih dibe, hem di xwendina xwe de, hem jî di nava komele û sazgehên xwendevanên kurdan de aktîv dixebite. Ji ber xebata xwe ya aktîv, ew her tim derdikeve pêş, di nava heval û hogirên xwe de dibe xwedî xatir û qîmet. Li Stembolê ew wextê xwe qet vala nabuhurîne, dixwîne, dinivîsîne, dixebite. Saetên xewa xwe kêm dike. Bi xwendevanên kurd re civat û civînan li dar dixe. Kurdan li mala xwe ya mezin û xweş ya li Stembolê, ku bi keda xwe bi dest xistibû, dicivîne, ji wan re behsa rewşa Kurdistanê, girîngiya ziman û kultura kurdî, hişyarî û yekîtiyê dike. Kes ji Mûsa Anter aciz nabin. Zimanê wî yê xweş, qerf û henekên wî, rûyê wî yê bi ken, nazikî û kubariya wî, hemû guhdaran dike heyrana xwe.

Mûsa Anter mezin dibe, ew loma bi mezinên kurdan re radibe û rûdine. Ew bi gelek navdarên mîna Abdurrahîm Zapsû, Şükrü Baban, Şêx Şefik Arvasî, Mehmet Mihrî Hilav, Doktor Mehmet Şükrü Sekban, Beduîzeman Seîdê Kurdî, Bedirxan, Raşîm Mûrat Beg, Şêx

Selahetîn Înan, Şêx Alî Riza, Şêx Abdulbarî Kufrewî, Şêx Maşûk Efendî, Tevfîk Demiroğlu, Müftü Salih Efendî, Şêx Seyda, Nûrî Dersimî, Kamran Bedir-Xan, Edîp Karahan, Nacî Kutlay, Canip Yildirim, Tarık Zıya Ekinci, Yaşar Kaya, Abdurrahman Qasemlû û bi sedan kesên din.

Ji xwe Abdurrahman Qasemlû, ji Kurdistana Îranê tê Stembolê û li ba Mûsa Anter û birayê xwe yê mezin bi cih dibe. Piştî ku demekê li wir dixwîne, dixwaze biçe Parîsê. Gelekî kêfa Mûsa Anter jê re tê, bi Kamiran Bedir-Xan, ku wê demê li Parîsê bû, dikeve danûstandinê û bi alîkariya Kamiran Beg Qasemlû diçe Parîsê.

Mûsa Anter ne tenê alîkariya Abdurrahman Qasemlû kiriye, wî alîkariya her kurdên bi rûmet dikir. Wî pariyê devê xwe dida wan, dilê wî her bi wan re bû. Heta berî şehîdbûna wî bi demeke kurt, gava mirov jê dipirsî û digot " Apê Mûsa çi bigire tu di hemû kovar û rojnameyên kurdan de heyî", wî digot: "Lawo, ez weqfa kurdî me".

Ew bi rastî jî mîna weqfeke kurdî bû. Wî hemû hebûna xwe, malê xwe, canê xwe di riya kurdîtiyê de dida. Herçiqas ew bi çepîtî hatibû naskirin jî, di eslê xwe de wî ji bilî kurdîtî û standina mafê kurdan li tu ferqeke îdeolojîk nedinihêrî. Çepîtiya wî û danûstandinên wî yên bi komunîstan re jî, bi gotina wî, ji ber ku rastên Tirkiyeyê pirsa kurdan qebûl nedikirin, kurd înkar dikirin û pirê caran nêrînên wan nêzîkî yên faşîstan bûn. Lê baweriya Mûsa Anter bi çep û komunîstên tirkan jî nedihat. Wî digot: "Ez dizanim ew di mesela kurdî de ne ji dil û semimî ne, lê belê çawan be ew behsa kurdan dikin, ev yeka han jî min têr dike".

Mûsa Anter ne şerxwaz bû, ew di her warê jiyana xwe de aştîxwaz bû. Wî dixwest mafê gelê kurd bi riyên aştî, bêî ku dilopek xwîn birije, bête dayin. Ew pir caran li ser navên herdu gelan dipeyivî, behsa bihevrebûn û biratiya wan dikir. Lê belê behsa kurdan

kirin, bi kurdî peyivîn bi serê xwe sûc bû, carinan jî sûcekî mezin bû. Ji ber vê yekê jî Mûsa Anter li ber çavên dewletê û karbidestên wê sûcdarek bû, diviya bû bihata cezekirin. Loma dewletê pêxîla wî bernedida, ew her dem digirt, diavêt pişt deriyên hesinî, zîndanên kûr, hucreyên teng. Lê Mûsa Anter li ber xwe dida, di mehkemeyan de bi zanûbûn doza xwe diparast, carinan wî henekê xwe bi hakim û sawciyan dikir, carinan jî bi gorinên xwe yên mîzahî ew dikenandin.

Baweriya Mûsa Anter bi felsefeya belengaziyê nedihat. Wî feqîrî nametek nedidît. Wî dixwest rewşa her kurdî baş bibe, kurd ji humalî, perîşanî û belengaziyê rizgar bibin; bixwînin, bixebitin, dewlemend bibin. Loma wî bi xwe di pratîkê de dikir. Ma gava ew ji Nisêbînê çû Edenê çiyê wî hebû? An jî gava ew ji Edenê çû Stembolê ma ji bilî du baholên pirtûkan çiyê wî hebû? Tiştekî wî tune bû... Lê wî ji malên xwendevanan bigire, heta xwarinxane û restorantên mezin û luks vekirin. Ew di hemû karên xwe de jî bi ser diket. Li Stembolê perên wî pir bûbû, mala wî mezin û xweş bû, jiyana wî dewlemend bû; ew têra xwe navdar bû. Ger wî bixwesta, ew dikarîbû di nava sosyeteya Stembolê de bibûya xwediyê cihekî xuyayî.

Lê gava piştî demeke dirêj ew seriyekî diçe welêt, rewşa welêt ya kambax dibîne, feqîrî, şerpezetî, xela û bêçaretiya welêt dibîne, agir bi dilê wî dikeve; bi hêrs û bi girt berê xwe dide Stembolê û li xebat û keftelefta ji bo kurdan kar dibe. Ew hê bêtir bi doza welêt ve tête girêdan, dilê wî ji bo welat û welatiyên wî hê bêtir lê dide. Îcar ne tenê bi gotin, civîn û semîneran, lê ew bi pênûsa xwe, di kovar û rojnameyan de êrîşî polîtîkaya dewletê dike, ji bo çêkirina rê, avakirina kargehan, bi destxistina mafên mirovî û demokratîk yên kurdan, bala karbidestên dewletê dikişîne ser pirsa, bi zimanê wê demê "şerqê". Ji xwe rewş bi tevayî gelekî xerab e. Hemû berxwedan û

serîhildanên kurdan ji aliyê dewletê ve bi erdê ve bûne yek. Hemû berpirsiyar û birêvebirên serîhildan û liberxwedanan bi rê û metodên cihê hatine kuştin, zilm û stemkariyeke bêhempa li ser kurdên herêmên serîhildanan bûye, ev zilm û stemkariya nedîtî dipijiqe hemû deverên Kurdistanê, esker bêsedem digirin ser gundan, li gundiyan dixin, bi şeref û namûsa wan dileyizin, gund û malên wan xerab dikin. Ev hemû ji Mûsa Anter ve xuya ne, ew tavilê bi hevalin xwe re li hev rûdinên, bi hev re komîteyeke parastina mafê kurdan ava dikin. Ji bo ku komîteya wan ji aliyê çep û komunîstên tirkan ve şaş neyê fêhm kirin, ew di destûra xwe de didin xuyanî kirin ku armanca komîteya wan tenê parastina mafê kurdan e û ne dijminatiya gelên tirk, ereb û faris in.

Ji bo ku ew bikaribin dengê komîteya xwe bi raya gîştî ve bigihîne, ew bi hevalên xwe Hüseyin Dikiciyê Diyarbekirî, Talat Saygın û Velî Doluyê Bidlîsî re hevdu dibînin, dûr û dirêj dipeyivin û bi hev re digihên biryara derxsitina rojnameyekê. Ew navê rojnameya xwe jî dikin "Dicle Kaynağı" yanî "Çavkaniya Dîcleyê".

Ji ber ku hevalên wî bêpere ne, Mûsa Anter hemû mesrefên rojnameyê digire ser xwe û dibe sernivîskarê rojnameyê. Ew di nivîsa xwe ya pêşî de bi firehî li ser rewşa Kurdistanê dinivîsîne û resimekî realîst yê Kurdistanê radixe. Herwisa ew bi rêzê li ser serîhildan û tevgerên Şêx Seîd, Agirî, Sason, Dêrsim, Pira Reş, bûyera Sî û Sisiyan, ku paşê dibe çavkaniya helbesta Ahmed Arif ya bi navê "Sî û Sê Gulle" dinivîsîne.

Êdî li Tirkiyeyê dem dihate guhertin. Tirkiye ji yekpartîtiyê derbasî pirpartîtiyê dibû. Yanî êdî xwedêgiravî dawiya dîktatoriya CHP'yê dihat, partiyeke din bi navê Partiya Demokrat (DP) ava dibû. Mûsa Anter jî bi niyeta ku êdî Dicle Kaynağı dema xwe dagirtiye, ew rojnameyê digire, lê piştî demeke kurt di Şûna wê de rojnameyeke mehane bi navê Şark Mecmuası derdixe. Tenê du hejma-

rên Şark Mecmuasıyê derketin, paşê ew jî hate rawestandin. Mîna Dicle Kaynağıyê, giraniya nivîsên Şark Mecmuasıyê jî li ser rewşa kurdan û welatê wan Kurdistanê bû. Mûsa Anter êdî bêhawe diweste. Çi bigire berpirsiyariya pirsa kurdî ji zaroktiya wî û heta salên pêncî mîna siwariyan li dû wî bû. Ji girtinê, ji taqîbên polîsan, ji karên pir mîna yên restoran û malên xwendevanan, ji stres û leza bajarê Stembolê aciz bûbû. Wî dixwest bi niyeta ku bêtir bi kêrî gelê xwe were, vegere welatê xwe û qet nebe çend salan jiyaneke bêdeng û bêstres bijî. Wî çapxaneya xwe û gelek tiştên xwe yên din firotin û berê xwe da gundê zaroktiya xwe, Zivingê. Mûsa Anterê, mîna ku me li jor jî qal kiribû, narkomanê xwendin xebatê bû, nikane hema li gund xwe li ser piştê dirêj bike, tu karî neke û bi teralî bijî. Ew traktoreke nû dikire û li gundê xwe dest bi çandiniyê dike. Jiyana gund jê re basîd, bêmane, lê heta cihekî hêsan tê. Ew çend salekî wisan dibuhurîne. Lê rojekê ji kevnedostên wî yên li Diyarbekirê pişniyaz tê û dixwazin ji bo avakirin û xebitandina hotêlekê Mûsa Anter dest ji gund berde û here Diyarbekirê. Mûsa Anter pêşniyaza dostên xwe Yusuf Azizoğluyê parlementerê DP'ê û Abdullah Ekinci dipejirîne û li ser daxwaza wan dîsan gundê xwe dihêle û berê xwe dide Diyarbekirê. Li Diyarbekirê bi fikir û ramanên Mûsa Anter hotêlek tête avakirin. Mûsa Anter dibe midûrê hotêlê. Dekor, servîs û bi rêk û pêkbûna wê hotêlê dibe mîna yên Stembolê yên herî luks û mîna yên Ewrûpayê. Dibêjin wê demê li Diyarbekirê darên çaman tune bûne. Lê Mûsa Anter çil-pêncî daran ji der ve dide anîn û li der û dora hotêlê dide çandin. Bi xêra Mûsa Anter e ku îro bajarê Diyarbekirê tije darên çaman e.

Ew hotêla ku Mûsa Anter lê midûrtiyê dike, di demeke kurt de, nav û deng dide, êdî piştî demekê, ji parlementer, walî, kaymakam, Emerîkî û Ewrûpiyan pê ve, ji nebûna cih, hew kesî digirin hundur. Wê ji ber wê bi rêk û pêkbûnê be ku Stevensonê Emerîkî, ku bi fer-

qeke hindik serokatiya Emerîkayê wenda kiribû, piştî seredaneke hotêla Mûsa Anter, di deftera hotêlê de ev çend rêzên han nivîsandibûn: "*Ez li rojhilat li bendî tiştekî din bûm, lê min li Diyarbekirê xwe li New Yorkê hîs kir. Em çiqasî di derheqa rohilat de şaş fikirî ne. Ez di şexsiyeta Mûsa Anter de, hemû rohilatê û rohilatiyan pîroz dikim.*"

Di salên 54'an de reîsê cumhûr Celal Bayar jî li Mûsa Anter dibe mêvan û gelek gotinên pesintijî ji bo wî dibêje.

Lê armanca Mûsa Anter ne ew bû ku bi wê hotêlê kêfa siyasetvan û serokan bîne. Armanca wî bi wê hotêlê ew bû ku gaveke nûjen biavêje û berê welatiyên xwe ber bi jiyaneke nûjentir bike.

Piştî hilbijartinan û biserketina Partiya Demokrat DP'ê, êdî hotêla Mûsa Anter dibe cihê hevdîtina siyasetvanên kurdan. Li wê hotêlê gelek kombûn çêdibin, bingeh û planên gelek tiştan têne avêtin û herweha di navbera siyasetvanên kurdan de gelek şer û pevçûn jî derdikevin.

Erê dawiya dîktatoriya CHP'yê hatiye, lê rejîma DP jî ne ewçend ji CHP'yê çêtir e. Ger hin guhertinên biçûk çêbûbin jî, ji bo kurdan tu guhertinên ber bi çav çênabin. Welatê kurdan dîsan tune ye, hebûna kurdan dîsan têtе înkarkirin, zimanê kurdî dîsan qedexe ye. Herweha zilm û neheqiya li ser kurdan jî her berdewam e. Ev ji ber çavên Mûsa Anter narevin, hemû jê ve xuya ne. Loma ew dîsan dest davêje pênûsa xwe û bi hevalin xwe re rojnameyeke bi navê Şark Postası (Posteya Şerqê) derdixe. Di Şark Postasıyê de quncikek bi navê Geciken Posta (Posteya derengmayî) ji Mûsa Anter re têtе veqetandin. Mûsa Anter her roj di wê quncika xwe de bêtirs li ser rewşa Kurdistanê dinivîsîne û bi zimanekî tûj dewlet û berpirsiyaran rexne dike. Ji ber nivîsên Mûsa Anter tîraja rojnameyê ewçend bilind dibe ku tenê li Diyarbekirê hezar lib têne firotin. Gava rojnameya Hürriyetê pêncî lib jî nedihat firotin, firotina hezar libên Şark

Postasıyê hejmareke pir bû.

Gava ew piştî rawestandina Şark Postasıyê bi çend salan bi Canip Yıldırım re rojnameya Diyarbekirê İleri Yurtê ji nû ve vedijînin, ew jî eynî mîna rojnameyên din deng dide û di demeke kurt de bi hezaran têtе firotin. Ji ber ku tu rojnamyên din rastiya kurdan nedinivîsandin. Tenê rojnameyên ku Mûsa Anter derdixistin dibûne dengê kurdan, hêvî û bawerî dida wan. Piraniya caran jî tenê ji bo ku Mûsa Anter dinivîsand ew rojname ewqasî dihatin firotin û ewqasî zû cihê xwe di nava kurdan de digirtin.

Di rojnameya İlerî Yurtê (1958) de êdî Mûsa Anter dest pê dike û gotinên kurdî di nava nivîsên xwe de bi kar tîne. Gelek caran jî ew semivîsên xwe bi kurdî datîne. Di wê demê de jî bi kurdînivîsandin, xwe bi saxî avêtina nava êgir bû. Loma êdî her nivîseke wî dibe mijara gelek munaqeşeyan, çi bigire ji bo her nivîseke xwe mecbûr dimîne berê xwe dide dadgehên Tirkiyeyê. Her ku ew bi ser Mûsa Anter de diçin, Mûsa Anter ewçend lê gurr dibe. Carekê ew hê bêtir stûyê xwe dide ber kêrê û di rojnameya xwe de helbesteke kurdî bi navê "Qimil" dinivîsîne. Ew helbesta wî hemû Tirkiyeyê li nava hevdu dixîne. Di gelek kovar û rojnameyan de li ser Mûsa Anter û helbesta wî ya bi kurdî têtе nivîsandin. Hin dibêjin, ma tiştê wilo dibe, çawan dikare bi kurdî bête nivîsandin, hin dibêjin, armanca wî perçekirina Tirkiyeyê ye, hin jî gelekî bi pêş de diçin û dibêjin, divê serê wî bête jêkirin. Tek tûk kes jî dibêjin, bavo çi bû ye, helbestek e û hatiye nivîsandin.

Lê ew helbesta wî hem çapemeniya Tirkiyeyê demekê mijûl dike, hem jî dike ku Mûsa Anter li ber deriyên dadgehan bête kişkişandin. Di her dadgehan de jî ji bo parastina wî bêhejmar avûkatên welathez beşdar dibin, ji bo piştgiriya wî jî ji her derê kurdên welathez berê xwe didin mehkemeyên Mûsa Anter. Êdî ew ji bo xelkê dibe mîna Ghandiyekî. Xelkê kurd azadiya xwe di şexsê Mûsa Anter

de dibîne. Ew jîrîtiya wî, ew enerjîkbûn û toletansa wî, ew ruhiyeta wî ya têkoşer ji xelkê re dibe hêviya azadî û ji bindestiyê rizgarbûna wan.

Êdî ne tenê Mûsa Anter, lê di dema Mûsa Anter de û bi Mûsa Anter re tibabek rewşenbîrên kurd ên din jî gîha bûn. Ji nava kurdan gihîştina zana û rewşenbîran, herçiqas ji bo kurdan mizgîniya xêrê bû, ji bo serdestên kurdan jî nîşana tirsê bû. Miletekî bêî zana û rewşenbîr, miletekî kor e, bê dest û ling e, bawî ye. Lê belê êdî kurdan ji nava xwe rewşenbîrên xwe derdixistin; rewşenbîrên bîrewer, xwedî berpirsiyar û bi rûmet. Bi xêra wan rewşenbîran bû ku civaka kurdî di hundurê hişyarbûn û xweguhertineke bi lez de bû. Ev yeka han ji ber çavên dewletê nedireviya. Bi a hin berpirsiyarên dewletê diviya bû ev rewşenbîr ji navê rabûna da wan bikarîbûna, qet nebe çend deh salekî din jî kurdan di xew de bihêlin, paşê jî wan asîmîle bikin û winda bikin. Dewlet bi xurtî derdikeve nêçîra rewşenbîrên kurd û pêncî kesên bijarte digire. Ew pêncî kesên ku niha bûye dîrok û bi navê "49'an" têtе navandin, ji bo kurdan dibe darbeyeke mezin. Mûsa Anter jî di nava van pêncî kesan de ye. Hem di nava wan de ye û hem jî yek ji wan yê herî xuyayî ye. Ev pêncî rewşenbîrên kurd ku bi biryara Celal Beyar û Cevdet Sunay têne girtin, nêzîkî salekê di hucreyên teng de, di nava pîsî û qirêjê de, bi rişk û spî derbas dikin. Gelek ji wan nexweş dikevin, dikevin haletê mirinê. Emîn Batuyê Nisêbînî dimire. Ev 49 kesên ku dimînin, di wan şerdên nemirovane û xerab de bêtirs li ber xwe didin, carinan êrîşî yüzbaşi û binbaşiyan dikin, li hemberî wan serî hildidin, ji bo ku ji wê jiyana kirêt û wahşet xelas bibin, ji xwe re riya di riya welêt de şehîdbûnê dipejirînin.

Lê şerd çiqas xerab dibe bila bibe, îşkence çiqas hebe bila hebe, gava xwesteka jiyanê, bawerî û berxwedan hebe, mirov dê bi ser bikeve. Ev 49 mirovên me jî, di gel ku bi mehên dirêj di hucreyên

mirinê de mane jî, dîsan ew jiyan, hinan xebata xwe bi xurtî domandin, hin jî westiyan û li malên xwe rûniştin. Yên ku ji ber gelek sedeman li malên xwe rûniştin jî, dîsan dilê wan ji bo kurdîtiyê lê didan, kengî ku fersend ketiye destên wan ew rabûne sergovendê.

Ger em salên Mûsa Anter yên Stiîlê nehesibînin, ew her di nava xebat û keftelefê de bû. Xebat û keftelefta wî jî ew her ajotiye ser girtin, îşkence û surgûnan. Gelo ji bo çi berpirsiyar evqasî bi tundî diçûn ser vî ronakbîrê kurd? Ma ev eşqiya bû, mêrkuj bû, xayin bû?... Na, ev welathez bû, nerm bû, aştîxwaz bû, li dijî şer û pevçûnan bû. Wî ji bo lihevhatina herdu gelan bi şev û roj bang dikir. Her destê wî yê ku ji bo aştiyê dirêj bûye, hatiye jêkirin, mêjiyê wî hatiye qeyd kirin. Ew hatiye girtin, hatiye berdan, lê tu carî jî hêviya xwe wenda nekiriye. Hem hêviya xwe wenda nekiriye, hem jî hêvî daye kurdên bêhêvî. Çep bûye, lê çepan nikanîbûne wî ji xeta wî ya milî bi dûr bixin. Enternasyonalîstbûna wî ne li ser înkarkirin an jî biçûkdîtina nasyona wî bû. Bi zimanên din dizanîbû, lê kurdî ji bo wî girîng bû. Ew hinekî Seîdê Kurdî, hinekî jî Bedirxanî bû. Tije bû. Piyesa xwe "Qimil" ya ku ew di nava kurdan de kiriye navekî nemir, di zîndanê de, di şevekê de nivîsandibû. Ferhenga xwe ya bi Kurdî-Tirkî di hundur de nivîsandibû.

Wî gelekî guh dida zimanê kurdî. Mîna Seîdê Kurdî dixwest li Kurdistanê dibistanên kurdî vebin. Mîna Celadet ziman yek ji şertên miletbûnê didît û pêk tanî.

Lê bi tenê bû, dilopek ji deryayê bû, bêî piştgir û alîkarî bû. Heta gelek kurdan bi xwe jî ew xebat û keftelefta wî ya ji bo ziman û edebiyata kurdî an biçûk didîtin, an jî bêmane... Ji xwe ji nava tirkan yên ku nêzîkî wê fikra wî bibûna tune bûn. Kemalîstan kurd înkar dikirin, dîndaran umet derdixistin pêşiya milet, komunîst jî xwedêgiravî enternasyonalîst bûn, wan jî mîna dîndaran enternasyonalîzm derdixistin pêşiya nasyonalîzmê. Lê her çawan be, li gorî

ku Mûsa Anter di bîranînê xwe de dibêje: Partiyên Tirkiyeyê hemû faşîst bûn, gelekî dûrî pirsa kurdî bûn, jê ditirsiyan, jê direviyan. Lê belê komunîstan xelasbûna kurdan jî di sosyalîzmê de didîtin. Yanî qet nebe wan hebûna kurdan qebûl dikirin.

Herçiqas Partiya Komunîst ya Tirkiyeyê li dû Mûsa Anter digere jî, ew nabe endamê wan. Lê belê ew komunîstên Tirkiyeyê yên sereke mîna; Nazım Hikmet, Mehmet Ali Aybar, Behice Boran, Aziz Nesin, Rıfat Ilgaz, Kemal Sülker, Dr. Hikmet Kıvılcımlı, Nihat Sargın, Sadun Eren, Mihri Belli û bi dehan kadro û serokên komunîstên tirkan nas dike, bi wan re dibe heval. Ew li ser pirs û pirsgirêkên dinyayê li hev dikin, lê di pirsa kurdî de gelekî ji hev dûr difikirin. Mûsa Anter pirsa kurdî pirseke bingehîn ya Tirkiyeyê dibîne û bêî çareserkirina vê pirsa bingehîn, ew ne bawer e wê sosyalîzma ku komunîstên tirkan behs dikirin, bi cih were.

Wek me li jor jî gotibû, herçiqas fikrên Mûsa Anter milî bûn jî, wî ji çep û komunîstan wêdetir kes nedît, da ew ji bo pirsa kurdî bi wan re bixebite. Loma ew dikeve nava TİP'ê (Partiya Karkerên Tirkiyeyê). Ew di nava TİP'ê de ji dil dixebite û heta kı jê tê ew li ser Kurdistanê û riyên çareserkirina pirsgirêka kırdî endamên partiyê yên din agahdar dike. Ew di nava hevalên xwe yên partiyê de ewqas bi pêş de diçe ku, di hilbijartina parlementoyê ya 1965'an de, ji bo berendametiyê, ji wî pê ve kes nayên bîra partiyê. Ew jî wê pêşniyaza partiyê dipejirîne û ji bo hevdana dengê kurdan xwe berdide nava gund û bajaran. Ew piraniya propoganda xwe bi kurdî dike, piştî kurtedemekê ew ewqasî tê naskirin û hezkirin ku cihê ew diçiyê milet radibe ser piyan. Ew bi têra hilbijartina sê parlemenran dengan dide hev, lê lîstika partiyê wî ji parlementoyê bêpar dihêle.

Hemû jiyana Mûsa Anter ya bi rêkxistinî tenê ew kurtedema endametiya TİP'ê bû. TİP jî partiyeke legal bû. Digel ewqas xebata siyasî û kulturî, ne berî wê, ne jî piştî wê ew nekete tu partiyan, di tu

partiyan de kar û berpirsiyarî hilnegirt ser milên xwe. Heta gava di salên 60'î de DDKO (Devrimci Doğu Kültür Ocakları) ji aliyê kurdan ve tête avakirin, Mûsa Anter her alîkariyê pê dike, lê aktîv di nava wê de naxebite.

Herçiqas ew aktîv di nava DDKO'yê de cih negire jî, ew ji ber çavên dewletê nareve, hertim di bin kontrolê de ye. Gava di 12 Adara 70'yî de tête girtin, ji ber kurdîtiya xwe îşkenceyên nedîtî dibîne. Êdî kal e, bê taqet e, lêdan û îşkence wî bêtaqettir dike. Gava tê berdan, ji hêrsan, ji westandinê, ji stresê, ji ber girtin û lêdanê xwe dide alî û li gundê xwe vedigere. Dixwaze çend salên ku maye, li gund, di nava nas û dostên xwe de derbas bike. Pêşî li Zivingê, paşê jî li Stilîlê bi cih dibe. Ji xwe re li Stilîlê xaniyekî ava dike, erdan dajo, heywanan xwedî dike. Jiyan basît e, lê xweş e. Jiyana bi zanebûn xweştir e. Mûsa Anter xwedî zewq e, bi kultur e, dîtiye. Ew dixwaze li gund jiyaneke xweş ava bike. Bi xwezayê re bibe yek. Ew bexçê mala xwe dixemilîne, di hewşê de cihokên biçûk çêdike, tê de masiyên curbecur xwedî dike; mirîşkan, kiroşkan, pisîkan di hewşa xwe de xwedî dike. Ji zarokan hez dike, nerm e, rûbiken e. Xwarinên curbecur çêdike, gundiyan diezimîne, dixwaze qet nebe gundiyên xwe biguhere, wan hişyar û zana bike. Pêşî baş e, gundî lê guhdarî dikin, xatir û qîmet didinê. Ew paşê li jiyana vî peyayê ku zarokê herêmê ye, ecêbmayî dimînin. Hinek dibêjin Mûsa dîn e, hinek henekê xwe pê dikin, jê re xeberan didin. Mûsa dibîne ku ew ê nikanibe gundiyan biguhere, lê her ku diçe ew bi xwe tê guhertin, bi xwe di bin tesîra gundiyan de dimîne.

Ew gelek salên dirêj bêber, li gund rûdine. Ew nanivîsîne. An jî dinivîsîne lê çap nake. Tevger xurt e, partî û rêkxistinên kurdan ên îlegal pir bûne. Lê Mûsa Anter nakeve nava wan, li derveyî wan dimîne. Tu carî li dijî wan jî ranaweste, alîkariya ku dikeve ser milê wî, ew ji dil dike.

Carekê ku ew ketibe deftera dewletê bes e, dewlet pêxîla wî bernade. Bi gotineke kevin, ew "mîmlî" ye. Ji ber vê yekê her ku bûyerek, protestoyek, an jî tevgerek li herêmê çêbibe, dewlet li deriyê Mûsa Anter dixe; şev be, roj be, ferq nake, wî bi wê kalîtiya (pîrîtî) wî ji malê dibin, bi rojan girtî dihêlin, heqarera dinyayekê lê dikin. Piştî bêdengiya 10-15 salan êdî Mûsa Anter hew debar dike, wê bêdengiya dirêj diçirîne û li kevnedosta xwe, yanî li pênûsa xwe vedigere. Lê vedigere û bêwestan dinivîsîne. Mîna ku tola salan hiltîne, bi girr dinivîsîne, xurt dinivîsîne, çi bigire ji hemû kovar û rojnameyên kurdan re dinivîsîne. Bi gotina Yaşar Kaya, ew dibe derwêşek. Li hemû civîn, kongre û konferansan amade ye. Mîna xortekî ye, enerjîk e, bêtirs e. Lê hêza neqenc dest ji vî qencî bernade, li dû wî ye, jê bi tirs e. Ji ber wê tirsa xwe êdî debar nake, loma bi zanebûn, wî li serbajarê welatê wî bi xayintî dide kuştin. Mûsa Anter li kuçeyek ji kuçeyên bajarê Diyarbekirê, di nava xwînê de vedigevize; bi dilekî pak û wijdanekî rehet...

Nûdem, No: 11, 1994

NÛREDÎN ZAZA Û ÇÎROKÊN WÎ

Dr. Nûredîn Zaza, yê ku di nav koma hevkarên Hawarê de yê herî xort bû, jiyana wî jî mîna ya pirr ronakbîrên kurd trajîk; lê bi rûmet, pirrhêl, rengîn, bi tecrubeyan tijî û dewlemend derbas bû. Wî ji welêt bêtir dûrî, xerîbî û sirgûnî dît. Hê di deh-yanzdeh saliya xwe de ew mecbûr dimîne, digel kekê xwe Dr.Nafiz cih û warê xwe terk dike, ji ber zilm û zora tirkan, ji ber taqîbkirin û stemkariya polîsên wan nake der, riya azadî û rizgariya xwe di revê dibîne. Ew û kekê xwe Dr. Nafiz baz didin û derbasî Sûriyê dibin. Ew pêşî diçin Helebê, paşê jî bi alîkariya hin kurdên nas û welathez li Şamê bi cih dibin.

Nûredînê biçûk û kekê xwe demekê ji hev diqetin. Ji ber ku kekê wî doktor bû û welathezekî dilşewat bû, ji bo ku alîkariya kurdan bike, wan derman û derzî bike; ya girîngtir jî wan ji nezanî, belengazî, perîşanî û bindestiyê rizgar bike, berê xwe dide beriya Cizîrê û li wir di nexweşxaneyekê de wek bijîjk û di nav gel de jî wek mamosteyekî azadiyê dest bi xebatê dike.

Nûredînê Biçûk, lê yê ku niha di dibistana Fransizan de xwendiye û xwe gihandiye, bûyerên Tirkiyeyê roj bi roj taqîb dike û dilê wî her ji bo gelê wî lêdixe. Loma, ew bombebarandina dewleta Tirk ya li ser Dersimê tehmûl nake, ji bo protestokirina van kirinên dewleta Tirkiyê, bi hin hevalên xwe re (ku paşê di bin navê Hêvî de komeleyekê ava dikin) li sefaretên hin welatên Ewrûpayê digerin, ji bo piştgiriya gelê kurd û lidijderketina ordiya hov, ji wan alîkariyê daxwaz dikin.

Nûredîn Zaza li pir welatan digere. Pêşî Sûrî, paşê Iraq, Lubnan û Siwîsre... Ew di vê gera xwe de, an jî di vê jiyana xwe ya sirgûnê de pir caran tê girtin; lêdan, îşkencê û zulmê dibîne. Ew di zîndanên kûr û tarî de hesreta çirûskek roj dikişîne. Girtin, lêdan û îşkenca ku lê dibe, wî hê bêtir ber bi xebatê ve dikişîne û ew hê bêtir li xebatê gurr dibe. Ew bi mamosta Cegerxwîn re dibe yek û bi helbestên wî, ku wê demê ji bo kurdên razayî, zengilê jixewşiyarkirinê bû, pê xelkê ji xewa nezanî û kirêt şiyar dike; bi Osman Sebrî re, ku ew jî weke wî mecbûr mabû, welatê xwe terk kiribû û li Sûriyê bi cih bûbû, yekemîn car, di sala 1957'an de bingehê Partiya Demokrat a Kurd (P.D.K.) datînin. Berî lidarxistina Partiyê, ew li Ewropayê, di sala 1949-an de bi hin hevalên xwe re "Komela Xwendekarên Kurd Li Ewrûpa" ava dikin û berpirsiyariya wê jî hildigire ser milên xwe. Bi avakirina vê komelê re gelek êrîş têne ser Nûredîn Zaza. Ev êrîş ne bi tenê ji welatên dagîrker, herweha ji komunîstên dogmatîk yên welatên dagîrker jî dihatin. Van celeb komunîstan Nûredîn Zaza bi nasyonalîstî sûcdar dikitin û xwe jî bi înternasyonalîstî didane pêş. Lê, ew înternasyonalîstiya wan, hindik ba jî, dîsan gelê kurd jê destkewtî nedibû û jê bi qasî misqalekî fêde nedidît.

Nûredîn Zaza di sirgûnê de her sirgûn dibû, xwe nedida dest, dîlî û bêdengî nedipejirand; her li ber xwe dida, her dixebitî... Wek mînak; wî li Sûriyê partî danî, li Swîsê komele ava kir û rojnameya bi navê "Dengê Kurdistan" derxist, li Bêrûdê berpirsariya radyoya kurdî, ku bermayê Mîr Kamiran Bedirxan bû, girt ser milê xwe.

Vî ronakbîrê kurd ê bi rûmet, tu carî li ber zilm û zorê, neheqî û pîkoliyê serî dananî. Lê mixabin, kansera kambax pençê xwe avête vî camêrê rûspî, seriblind, zana û têgihiştî û li xerîbiyê serê wî danî. Vê zerara mezin dostên kurdan xemgîn û dijminên wan jî dilşa kir.

Dr. Nûredîn Zaza heta bi wefatkirina xwe jî li Swîsreyê dima. Ew li wir bi jineke swîsrî re zewicî bû û bavê lawekî bû. Ew li welatê

xwe yê sirgûnê doktora xwe li ser "Herikîna Personalist di ramana filosofê fransiz Emmanuel Monnier" de dike û ji bilî xebatên xwe yên milîtanî û siyasî jî gelek bend û nivîsên bi kurdî, erebî û fransizî dinivîsîne û pirtûkeke helbestan bi navê "Şerê Azadî" çap dike. Du pirtûk jî bi fransizî "Contes et Lé gendes du Kurdistan" û "Ma vie de Kurd" derxistine. Romana Ereb Şemo wergerandiye, destana kurdî "Memê Alan" digel pêşgotineke gelek dirêj û bedew amade kiriye û hê jî gelek tiştên wî yên neçapkirî hene.

Lê, digel hemû tiştan, di gel xebatê wî yên siyasî, nivîs, bend û pirtûkên wî jî, dîsan ji bo min tiştên herî balkêş li ba Nûredîn Zaza, çîrokên wî ne. Ew di aliyê nivîsandina çîrokan de xurt, têgihiştî û li gorî dema xwe nûjen bû. Hê di bîst û du saliya xwe de gava çîroka wî ya yekemîn "Xurşîd" di kovara Hawar, hejmar 27, 15 Nîsan 1941-ê de derketibû, ez bawer im dê pir kêfa xwendevanên Hawarê hatibe.

Ev çîroka wî ya ku di bin navê Nûredîn Ûsiv de hatiye nivîsandin, di derheqa peyakî bi navê Xurşîd de ye. Xurşîd dewlemendê gund e. Rojekê ji vî dewlemendê gund re lawek çêdibe. Ev camêr ji bo navê lawê xwe diçe mala melê gund. Mele peyakî welathez e û navê wî Cemşîd e. Ew vî navê xwe yê şîrîn diyarî lawê Xurşîd jî dike. Xurşîd bi vê yeka han pir dilşa dibe û bi kêfxweşî ji ba melê dide rê û diçe malê.

Piştî şanzdeh salan, ji bo ku lawê Xurşîd, Cemşîd, bi serfirazî dibistana xwe xelas dike, bavê wî ji bo dayina mewlûdekê dîsan diçe nik melê. Mele dîsan bi rûkenî Xurşîd qebûl dike û ji bo serfirazî û zîrektiya lawê wî mewlûdeke kurdî dixwîne.

Piştî heşt salên din, vê carê jî Xurşîd ji bo mehra lawê xwe diçe mala Melê. Mele bi kêfxweşî mehra wî jî dibire. Heya berî ku kurê Xurşîd, Cemşîd, bi dû destikên keştiya xwe di avê werdibe û difetise, Xurşîd wek xortekî bextiyar e. Ew dilşa ye, bi hêvî ye, xurt û li

ser xwe ye. Lê piştî windakirina kurê xwe, yê ezîzê ber dilê xwe, Xurşîdê weke çiyayekî dikeve, kal dibe, rû lê diqermiçe, piştlê ditewe û por û rih lê spî dibin. Û ew bi wî awayî diçe ba melê, bi stûxwarî wê nûçeya reş digihînê. Mele yê ku hem zane ye û hem jî welathez e, Xurşîd teselî dike, ew bi zanebûna xwe û Xurşîd jî bi malê xwe bi xortên gund re dixebitin, xwestina Cemşîd tînin cih, wan didin xwendin û daweta çil xortên hêja û miletperwer, digel ku Xurşîd di sergovendê de ye, çêdikin.

Di hezîrana 1941-ê, di hejmara 29-an de jî bi navê "*Derketî*" çîrokeke Nûredîn Zaza heye. Ev çîroka ku bi bêhnekê têtexwendin û weke helbesteke bedew diherike, li ser derketiyan e.

Derketî; ew kesên ku ji welatên xwe derketine, terka welaltê xwe kirine, bi çol û çepelan ketine û ji xwe re li dûriyê li starekê geriyan e. Zaza di vê çîroka xwe de dide zanîn ku dûrî çiqas xweş be jî, dîsan mal, yanî welat xweştir e. Xwarin, lixwekirin, vexwarin, xweza û stranên welêt bi mirov xweştir û şîrîntir in.

Di eynî hejmarê de, yanî di hejmara 29 ya 10'ê hezîrana 1941'ê de çîrokeke wî ya din jî bi navê "*Gulê*" heye. Gulê mêrê xwe, yê ku bê dilê wê ye dikuje, paşê bi qiralê çiyan, Qoçoyê Pola re derdikeve çiyê. Gulê jineke bejinzirav, spehî, şîrîn û mêrxas e. Lê di çavê gundiyan de jineke qehpik, bênamûs û xerab e. Qoçoyê Pola ku gelek xerabî û rêbirrî kiriye, ji bo ku êdî li hemberî dijminê gelê xwe şer bike, di hizûra gundiyan de sond dixwe.

Nûredîn Zaza hatina Qoço wilo salix dide:

"*Gundî di mêvanxana Reşo de rûniştibûn û daxiftin. Dijmin ji gund bi tenê qonaxekê dûr bû, nixta gundê Şadiya di nêzîk de wê biketa axa bav û kalan.*

Herkes diponijîn û li çarekê digeriyan. Ezman girtî bû, bandevekê ji reşiya şevê re hîn bêtir tirs dida. Di vê gavê de derî bi şidet vebû; qiralê çiyan, Qoçoyê Pola bi heşt mirovên xwe ve kete hudir. Cilên wan

şil bûn, av di tivingên wan re dihate xwarê. Gunidyan gişan da ber qîran: Poloyê kurd, sergevazê çiyayên Kurdistanê, fermo".

Qoço bi çil gundiyan re li hemberî dijmin kemînê vedigirin û bi hêrs û rik li hemberî dijmin şer dikin. Gulê radihêje xencerekê û demekê winda dibe. Paşê gava ew di reşayiya şevê de ji hember tê, gundî û Qoço wilo têdigihîjin ku Gulê ew xistine xefka dijmin; loma gundî Qoço hêrs dikin û Qoço jî berê tivinga xwe bi Gulê vedike û bi hêrs berdidiyê.

"Berikê wek qîrekê tariya şevê çirand û armanca xwe a zirav wek çarşeveke hevrîşim raxiste erdê"

Lê paşê gava zora dijmin dibin û li gund vedigerin, di malekê de tiştekî ecêb dibînin.

"Serê zabitê dijmin ji laşê wê hatibû birrîn û xencer bi xwîn bû... Di kulma zêbit a guvaştî de gurzek porên Gulê ên zer pêl didan".

Gava qiralê çiyan Qoçoyê Pola vê mêrxasî û binamûsbûna Gulê dibîne û bi rastiyê dihese, rohnî di çavan de namîne, radihêje xencerê û bi bayê bezê derdikeve û nema xuya dike.

Çîroka *"Keskesor"* jî di derheqa serîhildana Şêx Seîd de ye. Ev çîroka ku bi forma kesê yekemîn hatiye nivîsandin, xuya ye bîranîneke Nûredîn Zaza ya zaroktiyê bi xwe ye.

Nûredîn zarok e, diçe dibistana tirkan. Tam di destpêka biharê de ye. Yanî gava êdî zivistan cihê xwe ji biharê re û sarî jî cihê xwe ji germê re dihêle, Nûredîn guhertinekê di mirovan de dibîne, tiştin dibin. *"Gelo ev çi ye, çi dibe?"* Nûredînê xwendevan ji xwe dipirse. Lê paşê ji çûyin û hatina mezinan, ji tevgera wan, ji rabûn û rûniştina wan, ji peyv û gotinên wan têdigihê, ku şerek dike dest pê bike; şerê kurdan, serîhildana wan li hemberî dewleta tirkan. Têkoşerên kurd demekê baş li ber xwe didin, xwe ji ber êrîşên dijmin diparêzin û paşê jî dijmin ji bajarê xwe derdixin.

Zaza vê yeka han wilo salix dide:

"Esker top mitralyozên xwe berdidan û direviyan. Mezinên bajêr yên ko berê berberî bi hev re dikirin, li hev dihatin û çek didan mirovên xwe".

Şerkerên kurd yên ku ji bajêr derketibûn û dabûn ser pişta dijmin, milet bê sebir li bendî vegera wan e. Dû re gava pêjna hatina wan dikin, "*Hatin, nêzîk bûn, kurd hatin*" dibêjin. Ev yeka han zû di nava bajêr de belav dibe, her kes pê dihesin "*Xort û mêr bi çekên xwe ve, hin bi dehol û zirne, hin siwar, hin peya; bi hezaran û bi den-"gê her bijî kurd! her bijî Kurdistan! her bijî serbestî!* ve pêrgî şervanên xwe tên.

Xuya ye ev azadî û kêfxweşiya milet zêde dom nake. Dijmin bi hemû hêza xwe ve digere ser wan; kêfxweşî û dilşahiya wan li wan dike dûjeh, wan şerpeze dikin. Yanî wê azadiya ku wan ji bo kurtedemekê bi dest xwe xistine, bi hovîtî ji wan distînin.

"Ala rengîn, şan û rûmeta me çirandin, avêtin ber lingên xwe, pêlê kirin û li şûna wê ya xwe, ya xwînxwaran danîn. Ziman û stranên kurdî bend kirin û tirsek dijwar xistin dilê xelkê."

Çîroka bi dû vê de jî ya bi navê "Stêrk" e. Stêrk çîrokek evînî ye, ji "Les Étoiles", D'alphose Daudet adaptation e. Ez dikarim bêjim ku ev çîrok yek ji çîrokên kurdî ya herî xweş û bedew e ku min xwendiye û jê hez kiriye. Ev çîroka ku gelekî nêzîkî realîzmê ye, lê di eynî demê de pirr romantîk e, di derheqa şivanekî û keça axê, Mijganê de ye. Di derheqa evîna wan de ye, an jî di derheqa evîna şivên ya nîvplatonîk de ye.

Ew xortê diltenik, dilketiyê Mijganê, li ba bavê wê şivan e. Cihê şivên bi qonaxekê dûrî mala axê ye. Ew di xaniyekî mîna holikekê de dijî û ji panzdeh rojan carekê xwarina wî jê re diçe. Piraniya caran, pîrê, ku ew jî li ba mala axê xizmetkar e, xwarina şivên jê re dibe. Rojekê pîrê ne hazir e û kesekî din ku bikaribin xwarina şivên jê re bibe tune ye, ji ber vê yekê keça axê, Mijganê, digel xwarina şi-

vên ya panzdeh rojan li hespê siwar dibe û berê xwe dide zozên, ba şivên.

"Mijgan bi bejna xwe ya zirav û narîn, bi çavên xwe yên çeleng û bi cilên xwe ên xemilandî û giran spehîtî bi xwe bû. Ciyê wê bajar, xaniyên delal û îşê wê govend reqs û straran bû; lê ne çiya, rêl û qantir bûn."

Gava şivan bi wî awayî çav li Mijganê dikeve şaş dibe, bi çavên xwe bawer nake.

"Mexlûqa çeleng! Çavên min jê nedibûn. Cara pêşî min ew ji pirr nêzîk de didît. Niha ew li ber min sekinîbû û tenê ji bona çavên min bû."

Lê ew yeka han ji şivên re ne ewçend hêsan bû. Ya ku ew di xewn û xeyalan de lê difikirî, niha li ba wî, zadê wî yê panzdeh rojan jê re anîbû. Ji ber vê yekê jî ew şaş bûbû. Gava ew pê re dipeyivî jî, dilê wî hildavêt, hişê wî diçû û qirika wî dihate girtin.

Ji ber ku baran tê û çem weke lehiyekê radibe, Mijganê nikare li çem bixe, derbasî aliyê din bibe û here malê, loma bi tirs ber bi şivên ve vedigere. Şivan vê mêvana xwe ya ezîz bi dilxweşiyeke bêhempa qebûl dike, ji bo ziwakirina kincên wê jê re agirekî dadide, di wê navê de jî jê re xwarinekê û tasek şîr amade dike. Paşê jî jê re ji pûş û ji postê mihê cihekî razanê çêdike.

Ew yeka ku ji bo şivên bi tenê xewn û xeyal bû, niha rastî bi xwe bû. Loma jî wî tu caran ezmanek mîna ezmanê wê şevê kûr û stêrk weke yên wê şevê geş nedîtibû.

Keça axayê wî ye, şeveder maye û xwe spartiye wî. Şivanê diltenik ji evîna wê pê ve li tu tiştekî din nafikire. Yanî li gor gotina şivên, *"Li tiştekî xerab nafikire."*

Xuya ye di wê holikê de li ser wî pûşî xewa Mijganê direve, ew radibe ser xwe û derdikeve der.

"Deriyê holikê vebû û wek hîva çardeh şevî keçika delal jê derket."

Di hejmara 35'an a kovara Hawarê de jî çîrokek Zaza bi navê "*Perîşanê*" heye. Perîşanê ya li ser xeyalekê hatiye avakirin, wilo dest pê dike:

"*Li taxa mahciran, ji oda xwe temaşa baxçeyên Şamê dikim. Ji nişkê ve zozanên Kurdistanê ên bilind, bi dar û avên cemîdî tên bira min. Ez xwe li wê derê, li ser kanîkê, li bin daran dibînin.*" Û wilo dom dike, di van xeyalan de kûr diçe, digel xweşî û spehîbûna Kurdistanê, ew zilma leşkeran, stemkariya wan, perîşanî, belengazî, paşdemayîn û nezaniya kurdan û welatê wan dibîne û di vê rêwîtiya xeyalan de dîsan bi paş de tê Şamê, dikeve oda xwe û li ber pencera xwe xuya dike. Bê hemdê xwe keserekê dikişîne û ji xwe re dibêje:

"*Nezanî... Nezanî... Nezanî...*"

Evîna Perîxanê jî di hejmara 37'an a Hawarê de weşiya ye. Çîroknivîs vê bûyerê ji destpêka sedsala 19'an distîne. Ev evîn ne evîna ku em pê dizanin, ne evîna xortekî ye. Evîna Perîxanê evîna welêt e, evîna gelê wê ye. Evîna bavê Perîxanê jî evîna gel bû, evîna welêt bû. Lê bavê wê yê girs, çeleng, dewlemend û miletperwer di ber vê evîna xwe de şehîd dikeve. Şehîdketina bavê Perîxanê gelekî tesîrê lê dike, dilê wê yê tenik perçe dike. Perîxanê, keça kurd a zana û têgihiştî zêde reş girê nade û şûnê nagerîne. Ew dixwîne, xwe digihîne, bi dil û can û bi bawerî dide ser riya bavê xwe. Di demeke kurt de gelek mirov li dor xwe dicivîne û dibe serok û şîretkera wan. Lê mixabin, ew jî mîna bavê xwe ji wê evîna pak re dibe gorrî, lê ji aliyê din jî li ser riya hizir û ramana wê kurd cih bi cih rizgar dibin.

"*Nûçeyên serdestiya Kurdistanê dihatin. Xelkê hêstirên şîn û şahiyê dirijandin û giyanê Perîxanê di tava ala rengîn de diçirisî û ji giyanê bavê xwe re dikenî.*"

Nûredîn Zaza di hemû çîrokên xwe de zimanekî sivik û zelal bi kar anî ye. Ez bawer nakim ku wê tu xwendevan di xwendina van çîrokan de zehmetiyê bikişîne. Digel sivikbûn û zelalbûna zimên,

ew felsefe û psîkolojiyeke kûr jî bi kar tîne. Mirov vê jêhatîbûna mamaosta Nûredîn Zaza di pêşgotina Destana Memê Alan de baş dibîne.

Mirovekî ji Kurdistanê, ku li Ewrûpayê bi pîvana întelektuelên ewrûpayî dijiya, lê wek kurdekî welathez û bi rûmet serî danî, divê ku neyê jibîrkirin. Divê kurd ji ber mirovekî nola Nûredîn Zaza serbilind bin, ji nûjentiya fikir û ramanên wî destkewtî bibin û cihekî pak jê re di quncikeke dilê xwe de çêbikin.

Karlstad, 1986

LI MALA CEGERXWÎN

Berî niha bi du sal û çend mehan, êvareke havînê min ji mala Cegerxwîn re telefon vekir. Jinekê bersiva telefonê da. Min ji jinikê pirsî:

– Gelo ma Seydayê Cegerxwîn li mal e?

– Tu kî yî ?

– Ez Firat im, Firat Cewerî...

– Ha, deqîqeyekê, jinikê got.

Ne deqîqeyek lê du–sê deqîqe di navberê derbas bûn, dûre Cegerxwîn hate ser telefonê. Wî bi dengê xwe yê gurr got:

– Elo!

– Êvarbaş Seyda!

– Êvarbaş. Min tu nas nekir bavo, tu kî yî ?

– Ez Firat im Seyda, Firat Cewerî...

– Tu çawa yî, tu baş î Firat ?

– Ez baş im Seyda, spas. Tu çawa yî?

– Ma ez ê çawa bim, wî bi derd got. Dara ter û hişk, ya ciwan û bi emir nabin wek hev. Gava mirov kal û pîr dibe, êş û jan li giyanê mirov peyda dibin, mirov li bendî mirina xwe radiweste.

Wilo xuya bû ew pir nexweş bû, loma ez zêde pê re nepeyivîm. Min gotiyê:

– Baş e Seyda, min dil hebû ku ez sibehê werime ba we, ma gelo hûn ê sibehê li mal bin?

– Erê we, kerem bike.

Dotira rojê, ez digel gurzek gul çûme mala wan. Baş nayê bîra min, ez wilo bawer im an kevaniya wî bû, an jî neviya wî bû li min derî vekir. Min solên xwe ji pê kirin, çakêtê xwe bi dar ve kir ez derbasî oda rûniştinê bûm. Cegerxwîn li ser yanê rûniştibû. Gava ew çav li min ket, wî xwest ku ew rabe ser xwe û bixêrhatiniyê bide min, lê wî kir û nekir ew nikarîbû rabûya ser xwe. Hingî min destê wî hejand, destê xwe da ser milê wî û got:

– Ez rice dikim Seyda, tu li cihê xwe rûnê.

Ez li kêleka wî rûniştim, me hebekî li hal û wextê hev pirsî, em hebekî jî li ser Swêdê û rewşa wê peyivîn. Dû re wî ji min pirsî:

– Firat, tu ji Dêrika Çiyayê Mazî bûyî ne wilo?

– Belê Seyda, ez bi eslê xwe ji wir im.

Wî bi tiliya xwe ya girdikê birûyê xwe rast kir û peyva xwe domand:

– Dêrik gola kulturê ye. Min li Dêrikê meletî kiriye. Ger ez neçûbûma Dêrikê, min Girê Tûrcelê, Pozê Qîza Qirêl, Xab, Kulêbê û ew dehl û rezên Dêrikê nedîtiba, ez bawer nakim ku ez bibûma tu şaîr. Min îlhama xwe û şaîrtiya xwe ji Dêrikê stendiye.

Em li dor nîv saetê li ser Dêrikê, li ser başbûn û mêvanperweriya dêrikiyan peyivîn. Dû re heta ku çay û mêwe hatin, wî ji min re behsa serpêhatiyên xwe kirin.

Cegerxwînê ku bi sê emran ji min mezintir bû, mîna ku em hevalên hevdu bûn ew bi min re ketibû gotûbêj û sohbetê. Piştî em bîskekê jî li ser rewşa xwe û li ser rewşa welêt peyivîn, êdî me peyv dagerand ser huner û edebiyatê. Ji ber ku Cegerxwîn di hevpeyvîneke xwe de li hemberî helbesta serbest derketibû, min jê pirsî:

– Çima Seyda, ji bo çi em helbesta modern nenivîsin?

– Ji ber ku guhê kurdan hînî muzîkê bûye. Helbest jî divê musîkî be, bi wezin be.

Min jî wî re ji helbestkarê rûsî, Mayakovskî, helbestek, ji helbest-

karê kurd Rojen Barnas jî helbestek xwend û min çend mînak jî ji helbestên modem yên ku bûne stran, dan.

Cegerxwîn serê xwe hejand, kûr kûr fikirî û di awirên wî de mirovhezî, nevspiçûkî û ji bo xwenûkirinê hêvî difûriya.

Kurdistan Press, 1985

LI MALA OSMAN SEBRÎ

Ez her tim li navekî rast dihatim. Min kîjan kovar û rojnameyên kuradan yên kevin vedikir, navek dihate ber çavên min. Di binê pir helbest, çîrok, bend û nivîsên li ser ziman de navekî ku ji min re ne biyanî bû, hebû. Dû re li Ewrûpa di bin navê Apo de pirtûkeke helbestan derket. Ev nav roj bi roj dihate dîtin û li ser dihate peyivandin. Ev nav, navê Osman Sebrî bû. Navê hevalê gorbuhiştên Celadet, Cegerxwîn û Qedrîcan bû. Navê hevalê mamoste Nûredîn Zaza bû.

Rojek ji rojên nîsana 1987'an ji bo ku ez xwediyê vî navî bibînim, ez digel dostekî, li Şamê, bi Ruknedîn ve bi hewa ketim. Ruknedîn bilind e, weke çiyayekî ye. Xanî di qûn hev de û li ser hev hatine lêkirin. Gava mirov ji jêr ve lê dinihêre, xanî taa bi serê çiyê weke derencan dixuyin. "Tu vê taxa han dibînî, heya bi serê çiyê piraniya wan kurd in" dostê ku bi min re bû ji min re got. "Kurd her tim xwe wilo li cihên bilind digirin". Ma bilindahî jî peyv e, heta ku em gihîştin ber mala Osman Sebrî, ez di xwêdanê de mabûm. Em hebekî li ber derî rawestiyan, me xwêdana xwe pakij kir û paşê me li derî da. Pir tê re neçû, peyayekî kal û bejinkurt ji me re derî vekir. Ew peya Osman Sebrî bû. Me destê hevdu hejand û min ew bi hesreta salan hemêz kir. Gava wî destê min guvaştibû, bawer bikin destê wî mîna destê xortekî bîst salî zexim bû. Bi wî awayî wî da pêşiya me û em birin odeya xwe ya rûniştinê. Ode piçûk bû, an jî ew ji min re piçûk hat. Raxistina odê ji du dîwan, maseyeke piçûk û çend kursiyan pêk dihat. Her çar dîwar jî bi wêneyan ve xemilandî bûn.

Piştî ku min çavek li hundur gerand, êdî min awira xwe dagerande ser wî. Bala min her li tevger, peyv û rabûn û rûniştandina wî bû. Min ew peyayê mezin û bi nav û deng, di odeyeke piçûk de zept kiribû.

– Ê apo, tu çawa yî, saeta te çawa ye?

Ji ber ku guhên wî giran bûbûn, deng neçûyê. Min pirsa xwe ducare kir:

– Apê Osman tu çawa yî, tu rehet î?

– Wele ji aliyê giyanî ve ez çûme û min tu caran jî rehetî nedîtiye. Kurdên bi namûs û rehetî? Serê me kurdan her tim di bele û teşqeleyan de ye. Dijminê me jî mar e, ew xwe bi hêsanî berdide nava me û jehra xwe di nava me de belav dike. Kengî ku me ev marê fenek kuşt, hingî em ê rehet bibin...

Wî ji nişkê ve peyva xwe birrî, weke çipiskê ji cihê xwe pekiya ber derî û bi dengekî bilind bang kir:

– Kewêê!... Kewêê!... Ka tu ji mêvanan re çayekê çênakî keça min?

Piştî kurtedemekê Kewê çaya me anî. Apê Osman sênîk ji destê wê girt û wî bi xwe çayê li me belav kir.

Hîn berî ku ew li cihê xwe rûnê, mîna ku wî dizanîbû ez ê çi jê bipirsim, dest bi peyvê kir:

– Rehetî? Ji me re rehetî tuneye, bavo! Dermanê rehetiya me yekîtiya me ye. Lê hezar heyf û mixabin ku em nabin yek. Em bûne eşîr û em bi serê eşîrtiyê dimeşin. Em do çi bûn, em îro jî ew in. Em bûne peyayên xelkê. Hin ji me bûne peyayên ereban, hin bûne yên farisan û hin jî bûne yên tirkan. Dibêjin em komunist in, lê bi serê bûrjûvazî dimeşin. Ma welê dibe? Em ê bi vî awayî çi safî bikin?

Gava dipeyivî, carinan hêrs dibû, radibû ser xwe û dîsan rûdinişt. Bi qasî ku ew bi dev dipeyivî, ew ewqasî jî bi destan dipeyivî.

– Dibêjin em komunist in, lê bi zimanê xwe napeyivin, naxwazin

bipeyivin. Li malên xwe, bi jin û zarokên xwe re bi tirkî, bi erebî û bi farisî dipeyivin. Lê bi kurdî napeyivin, naxwazin... Ma komunistî welê dibe? Wey xwelî li serê me be!...

Herçiqas min pirsên li ser edebiyat û kulturê jê dipirsî jî, ew dîsan dadigeriya ser siyasetê.

– Ger em ji xwe re nebin, kes jî ji me re nabin û em ji kesî re jî nabin. Kengî ku em bûne destek, hingî dê herkes li ber me bigerin. Lê ka ew roj? Ne ku ew roj nayê, lê wê pir bikişîne. Divê em pir bixebitin, pir xwe biêşînin, da ku em bigihîjin mafê xwe. Na, ku em li malên xwe rûnên, lingên xwe biavêjin ser hev û behsa azadiyê bikin, em ê her tim welê bindestê xelkê bin.

Tiştên ku min ji peyv û gotinên wî fêhm kirin, ew ji nivîskar û helbestkarekî wêdetir têkoşerek bû. Têkoşerekî ku bi salan bêwestan xebitîye, bêhejmar car hatiye girtin, îşkence û lêdana nemirovî dîtiye û digel vê jiyana bi trajedî jî, ew hîn bi hêviya Kurdistaneke azad dijî.

Kurdistan Press, 1987

LI MALA REWŞEN BEDIR-XAN


Piştî rêwîtiyeke dirêj, ez berdestê êvarê, li Baniasê, ji otobusê peya bûm. Banias bajarekî xweş e, bi a min yek ji bajarên Sûriyê yê herî xweş e. Bajar li kêleka deryayê hatiye avakirin. Bi awira pêşî piraniya bajarvaniyan dewlemend dixuyin. Dibe ku jî mirov dewlemendiya wan di lixwekirin û otomobîlên wan de dibîne. Herçiqas rûniştevanên bajêr ereb jî bin, dîsan mirov peyayên bi çefî û egal û jinên sernuxumandî kêm dibîne. Li vî bajarê Sûriyê yê nûjen, xanimeke kurd dima. Keça Salih Begê, dotmam û kevaniya Celadet Begê... Kaxeza navnîşana vê Xatûna han di destê min de bû û yên ku ez pêrgî wan dibûm, min navnîşana wê ji wan dipirsî. Gotineke pêşiyên me heye, dibêje "Mirov bi pirsê dihere Xursê". Ez jî bi pirsê gihîştim ber avahiyekê, hebekî li ber deriyê avahiyê rawestiyam û min hêdî bi heyecan li derî da. Ya ku ji min re derî vekir berdestka wê bû. Jinikê bi tirkiyeke osmanî, lê bi devoka çerkezan bixêrhatinî da min, çenteyê min ji destê min girt û ez birim odeya rûniştinê, ba Rewşen Xanimê. Rewşen Xanimê jî bi mêvanperweriyeke kurdî û bi rûyekî bi ken bixêrhatinî da min û ez bi cih kirim.

Ez jî bi dilşahî rûniştim. Piştî kurtesohbetekê min çavên xwe li resimên li dîwêr gerandin. Resimên ku pêşî li ber çavên min ketin, resimê hersê biran; Sureya, Celadet û Kamûran Bedir-Xan bûn.

Piştî şîva êvarê min ji Rewşen Xanimê pirsî:

– *Gelo tu ê bikaribî bi niyeta kurtehevpeyvînekê xwe bidî naskirin?*

– Ez keça Salih Bedir-Xan û jina Celadet Alî Bedir-Xan im, got û jê pê ve tu tişt negot.





Reuşen Bedir-Xan û Firat Cewerî (1987)

Ji xwe bes e jî. Kurdên ku navên Salih û Celadet Bedir-Xan nebihîstibin pir kêm in. An jî kurdên xwende û bîrewer yên ku haya wan ji Celadet û xebatên wî tunebin, çi bigire nîn in.

– Ê baş e, xebat û xwendina Rewşen Xanimê bi xwe çi ye û çi bû?

– Weke kar, min mamostetiya zimanê erebî dikir û ez demekê jî midûrê dibistanê bûm. Erebiya min ji kurdî û tirkiya min çêtir bû û çêtir e jî. Ji ber vê yekê xebatên min yên rewşenbîrî jî bêtir bi zimanê erebî dibû. Min bêtir bi erebî dinivîsand û ji zimanên din werdigerande erebî. Min pirtûkek jî bi navê "Hin Rûpel Ji Edebiyata Kurdî" bi erebî, berpêşî xwendevanên ereb kiriye. Min carna jî hin bend di Hawarê de belav dikirin.

Gava ew bi kurdî dipeyivî wê hin zehmetî dikişand, ew carna di nav re bi min re bi tirkî dipeyivî; bi tirkiyeke pir xweş û bê kêmasî...

– Niha jî ez vê pirtûka han werdigerînim erebî. (Pirtûkek li ser Sulta Evdilhehemîd bû).

– Ji bo çi ev pirtûk û ne yeke din?

– Weşanxaneyekê ev ji min xwestiye, bêtir vê bala wan kişandiye. Tu ya rastî bixwazî, bi wergerandina vê pirtûkê çend quruş pere jî digihîjin destên min.

Bivê nevê sohbeta me carna diçû dema rehmetî Celadet Beg û kovara Hawarê.

– Yadê, tu dikarî ji kerema xwe re bi kurtî behsa dema Hawarê bikî? Hawar li ku û çawan derdiket, yên zîrek ku tê de kar dikirin kî bûn?

– Çapxaneya Hawarê li mal bû. Yek ji mijûliyên rehmetî yê sereke derxistina Hawarê bû. Min jî alîkariya wî dikir. Piştî demekê, gava ez hînî rêzkirin û ambelajê bûm, kar hêsantir bû. Hingî Osman Sebrî û Qedrîcan jî li ba me diman, herdu jî pir jêhatî bûn. Dû re Îbrahîm hebû, ew bi rastî jî rewşenbîr bû. Osman Sebrî çar mehan li cem me mabû, hîn jî min nizanîbû ku ew Osman Sebrî ye. Wan

Osman Sebrî, bi Hecî Husên bi min dabûne naskirin.

– Hin kes dibêjin ku kovara Hawarê bi alîkariya fransizan derdiket, ma rast e?

– Na, ne rast e. Hawar ne bi alîkariya fransizan, lê bi destûra wan derdiket. Ne bi tenê Hawar, her wisa Roja Nû jî bi destûra wan derdiket.

– Gelo ku îro fransiz li vir bûna, wê rewşa kurdan çawan bûya?

– Wê rewşa kurdan her wilo bûya. Fransiz jî kolonyalîst in û yên ku em îro di bin destên wan jî de ne kolonyalîst in.

– Ma rast e ku armanca Celadet Beg avakirina Kurdistaneke monarşî bû?

– Kî vê bibêjin ew bêbextiya li rehmetî dikin. Wî tu caran tiştekî wilo ne gotiye, ne jî daxwaz kiriye. Wî her digot, divê Kurdistan bi destê hemû kurdan bête ava kirin. Çi karker, çi gundî, çi mele, çi axa û beg hemû xwediyê Kurdisranê ne. Armanca rehmetî Kurdisranek demokratîk û yekbûyî bû. Ji xwe Kurdistan yek e. A niha jî hin xort dibêjin em ji Kurdistana Tirkiyê, hin dibêjin em ji Kurdistana Îranê, hin dibêjin em ji Kurdistana Iraqê û hin jî dibêjin em ji Kurdistana Sûriyê ne. Bi a min ev ne rast e, şaş e. Kurdistan yek e û sînorên ku li Kurdistanê hatine kişandin ji derveyî îrada kurdan hatiye kişandin. Ew sînorên emperyalîzmê ne.

– Ew Celadetê ku îro ji aliyê hemû kurdan ve têtе hezkirin, gelo ji Rewşen Xanimê re çawan bû?

– Ew ne bi tenê mêrê min, lê ew her tiştê min bû. Ew bavê min, birayê min, hevalê min, mamostayê min bû. Ez jî yek ji wan kurda me ku îro kêmasiya tunebûna wî dikişînim.

– Windabûna vî peyayê bi rûmet çi tesîr li jiyana te kir, ev trajedî çawan çê bû?

– Mirina wî ez mehû kirim, dinya bi ser min de hilşand. Mesûliyeteke siyasî, civakî û aborî di stûyê min de hişt. Ji xwe dawîhatina

jiyana wî ya bi trajedî jî, ji bo başkirin û hebekî bipêşdexistina aboriya xwe bû. Lê nebû, ew kar bû sedema mirina wî.

– Çi bû ya ku bû sedema mirina wî?

– Tacirî, pembo... Em gelekî destteng bûbûn. Ji ber vê yekê rehmetî rabû zeviyên hevalekî xwe bi nîvî çand, kire pembo. Ji ber kêmbûna avê, wî dest bi kolandina bîrekê kir û navê bîra xwe jî kire "Bîra Qederê". Ew di wê bîra xwe wer bû û mir. Wî bîra xwe bi destê xwe kola.

Piştî van gotinan Rewşen Xanimê demekê bêdeng ma, kûr kûr fikirî û cigarek vêxist. Wilo xuya bû ku wê hê jî ew bûyer ji bîr nekiribû. Min jî nexwest ez zêde bi dû sedemên ku çima "wî bîra xwe bi destên xwe kola" bikevim, min gotin dagerande ser tiştekî din:

– Çi ji xortên kurd yên li Ewrûpayê dikeve serê te? Ew dikarin çi bikin?

– Ger ew bibin yek, ew dikarin her tiştî bikin. Yekîtî, divê hûn yekîtiyekê di nava xwe de çêbikin. A niha bi dehan kovar û rojname derdikevin, çira? Ma ger hûn werin ba hev û sê–çar kovar û rojnameyên bi kalîte derxin, ne çêtir e?

Heya ku ez li ba wê bûm, wê ji min re got, got û got. Destê min ji vê mirova gotinxweş, zarşêrîn, zana û rewşenbîr nedibû. Di mêvandariyeke kurt de wê ez hînî pir tiştan kirim, dîrokek ji min re got...

Kurdistan Press, 1987

ŞOREŞGERÊ KURD; EDÎP KARAHAN

Dêrik pir xweş e, hêja ye pesnê
Çi bikim nakeve dest ji ber vê xeşmê
Qedrîcan

Dêrik bêtir bi Dêrika Çiyayê Mazî tê naskirin. Dêrikê di quntara çiyê de ye; çiyayên wê bi darên mazî ve xemilandî ne, an jî xemilandîbûn. Dêrikê ji sala 1882'an û bi vir ve bûye bajar, zêde mezin nebûbe jî wê bajarbûna xwe parastiye. Ji aliyê dar û beran Dêrik bi nav û deng e. Zeytûn, hinar û hijîrên Dêrikê heta îro jî ji aliyê çîrokbêj û stranbêjên kurd ve têne pesinandin. Ava bajêr hênik e, hewa wê xweş e, lawên wê zexim û mêrxas in. Keçên wê bejinzirav, spehî û şêrîn in. Dayikên wê lawên bi rûmet, welathez, mêrxas û şerker anîne dinyayê.

Yek ji van lawan Edîp Karahan e. Ev mêrxasê han di sala 1930'î de tê dinyayê, dixwîne, xwe diêşîne û dibe avûkat. Di ber xwendinê re ruhuyeteke welatparêziyê pê re çêdibe, rastiya welatê xwe dibîne û ji bo hişyarkirin û bipêşdexistina miletê xwe, dev ji navê xwe û malê dinyayê berdide û xwe bi hemû hêza xwe davêje meydana şer.

Edîp Karahan herçiqas di hoyên ne xweş û di demeke kêmkadro de jiya be jî, dîsan tiştên ji destên wî hatine wî texsîr nekiriye. Ew bi ronakbîran re bûye ronakbîr, bi karkeran re bûye karker, bi gundiyan re bûye gundî û di meydan û kolanan de bi têkoşeran re bûye têkoşer. Ew peyayekî têgihiştî, zana, giran, nefsbiçûk û xwende bû. Ya herî girîng jî ew welathezekî mezin bû. Di kovar û rojnameyên cihê cihê de li ser rewş, jiyan, ziman û kultura kurdan nivîs û bendên hêja nivîsandiye, polîtîkaya dewleta Tirkiyeyê ya di dereqa kurd û Kurdistanê de rexne kiriye, ji bo rastîdîtina rastiya neteweya kurd

ronakbîrên tirk hişyar kiriye. Di bendeke xwe ya bi sernava "Hin Nixte" de rojnamevan û ronakbîrê naskirî Abdi İpekçi rexne dike û wilo dibêje: "Li Tirkiyeyê hunermend û ronakbîrên ku bi zimanê Mau-Mau dizanin hene, li ser wan helbest û stranan dinivîsînin û di meyxaneyan de ji bo azadî û serbixwebûna reşik û çermsoran qedehan li hev dixin û noşan dikişînin. Lê gava mirov ji van celebhunermend û ronakbîran re behsa kurdan dike 'Welat ji dest diçe, welat perçe dibe' dibêjin û weke dînên cin li wan bixe, baz didin".

Edîp Karahan bê tirs û bi mêrxasî geh bi pênûsa xwe di nav rûpelên kovar û rojnameyan de dihate dîtin, geh jî di civatên gundî, karker û xortan de doza wan bi wan dida nasîn. Ew Gandiyekî kurd yê bi felsefeya materyalîst bû.

Berî niha bi kurtedemekê, gava gotin ji Edîp Karahan û xebatên wî vebû, xortekî Dêrikî ku pêrgî wî bûbû û ew ji dûr ve nas dikir, wilo got: "Berê zarokan rajname li çarşî û çayxaneyan digerandin, bang dikir û difirotin. Mezinan qet ev kar nedikirin. Dibû ku li bajarên mezin dikirin, lê li Dêrikê tu peyan ev karê han nedikir. Lê min her tim peyayekî dirêj, bi navmil, porspî, bi simbêlên mezin û komek rojname di bin çengan de didît. Ji min we bû ku ew rojnamefiroş bû. Tê bîra min ku min henekê xwe pêkiribû û min di dilê xwe de gotibû, li qelafetê wî binihêrin û weke zarokan rojnameyan difiroşe. Min rojekê ev yeka han ji bavê xwe re got. Bavê min pêşî bi tiqînî keniyabû, dû re bi carekê ve kenê xwe birîbû û weke bi mezinekî re bipeyive ji min re gotibû, ew Edîp e lawê min, Edîp Karahan... Ew ne rojnamefiroş e, ew wan rojnameyan gişî dixwîne. Ew ebûqat e û ji bo azadiya kurdan dixebite.

Sala 1974'an min Edîp Karahan li serbajarê Tirkiyeyê, li Ankarayê, li pirtûkxaneyekê dît. Gava min ji wî re behsa serpêhatiya xwe kiribû, ew bi pîrqînî keniyabû".

Ne bi tenê rojnameyên rojê, lê ji nivîsên wî xuya dibe ku ew gu-

rekî xwendinê bûye. Wî di bin navên cihê cihê de (Wek Edîp Osmanoğlu, Mahmut Bayraktar, Hamit Mazidağlı û Konuk Yazar) di kovar û rojnameyan de nivîsên teorîk nivîsandine, dû re gava bi rola kultur û edebiyatê ya di têkoşîna gelê kurd de hesiyaye, di sala 1962'an de dest bi weşandina kovara DÎCLE-FIRAT kiriye. Mixabin, mîna gelek kovarên kurdî, jiyana vê kovara bi rûmet jî pir dom nekiriye. Bi tenê heyşt hejmar derketiye. Hejmara dawî ya kovarê di çardehê gulana 1963'an de derketiye.

Ji ber nivîs û bendên ku wî di DÎCLE-FIRAT de nivîsandibûn, du sal ceze lê hatiye birîn; salekê li Stembolê, salekê jî li Ankarayê razaye. Ji ber xebatên xwe yên di kovara FORUM de jî sala 1967'an 9 mehan li Diyarbekrê girtî dimîne û sal û nîvekê ceze lê tê birîn. Di sala 1971'ê de jî sal û nîvekê girtî û heyşt salan ceze...

Digel ku Edîp Karahan jiyaneke bi eziyet, bi stem, bi îşkence û lêdan derbas kiriye jî, dîsan bi qasî qirşekî tiştek ji hêviya xwe winda nekiriye û ta bi mirina xwe (1976) bi hemû hêza xwe ji bo hişyarkirin û azadiya netewa kurd têkoşîn daye. Lê bi barkirina xwe cihekî mezin vala hiştiye. Bi hêviya ku wê nivşê nû şûna wî dagire...

SWÊD, ALFRED NOBEL Û XELATA WÎ

Swêd welatekî biçûk e, lê di dinyayê de xwediyê roleke mezin e, ji welatê me bi hezaran kîlometre dûr e û di dilê Skandinavyayê de ye. Swêdiyên ku îro bi mulahîmbûn û bêdengiya xwe di dinyayê de navdar in, neviyên Vîkîngên hov in. Bapîrên swêdiyên îro Vîkîngan, jiyana xwe bi şer û pevçûn, talan û wêrankirinê ve derbas dikirin. Wan bi keştiyên xwe yên zexim derya û girav derbas dikirin û cihên ku ew digihîştinê bi talankirinê ji bo demên derbasî lê bi cih dibûn. Bermayên van Vîkîngan demekê li Ewrûpayê jî hukum dikirin û hemû welatên biçûk yên Skandinavyayê di bin destên xwe de hiştibûn. Hêdî hêdî welatên bindestên wê gihîştin azadî û serbixwebûna xwe û welatê ku dawî bi riyeke aştî ji Swêdê veqetiya, Norvecê bû. Di sala 1905'an de bêî ku dilopek xwîn birije, bi raya gîştî ya gelên herdu welatan, Norvecê gihîşte azadî û serbixwebûna xwe. Norvec welatekî biçûk, xwediyê nifûseke çar milyon e û di tixûbên Swêdê de ye. Gava di sala 1980'ê de ez hatibûm Swêdê û min bihîstibû ku di navbera tixûbê Swêd û Norvecê de têl û mayin tune ne, ez ecêbmayî mabûm. Niha jî ez ecêbmayî dimînim ku serxet û binxet bi têl û mayinan ji hev hatine veqetandin, meriv û malbat ji hev hatine bidûrxistin û di nava wan têl û mayinan de bê hejmar mirovên bê sûc ji jiyanê hatine birrîn.

Erê, Swêd û Norvec bi dostanî ji hev veqetiyan, îro jî ew dost û cîranên hev yên herî nêzîk in. Wan ji berdêla rijandina xwînê, wêrankirina gund û bajaran, şewitandina mal û daristanan; riya aştî û jiyanê ji xwe re hilbijartin. Niha jî ew weke du welatên cîran di xwe-

şiyê de, hevwelatiyên wan jî di geşiyê de dijîn.

Ev welatê ku nifûsa wê heyşt milyon e û ji van heyşt milyonan milyonek jê biyanî ne, ku mirov bûyera sala 1905'an a veqetandina Norvecê bide ber çavan, mirov dê bibîne ku ev welat di warê demokrasiyê de bi kêmanî 90 salan di pêşiya Tirkiyeyê û welatên cîranên Tirkiyeyê yên ku îro serdestiya kurdan dikin, de ye. Herweha ew di warê civakî de jî ewçend li pêş e. Herçiqas sîstema Swêdê sîstemeke monarşîk be jî, lê di dema nêzîk de welat ji aliyê sosyal demokratan ve hatiye îdarekirin. Bi gotina "monarşî" hûn nexapin. Ev ne dişibe monarşiya Tsar, ne jî dişibe ya Şalı... Li gorî qanûnên Swêdê mafê qirêl û mijûliya polîtîkayê bi sînor e. Ew tenê weke sembolekê heye. Car caran mirov dibêje qey mafê hevwelatiyekî normal di warê gotina polîtîkayê de ji yê qirêl bêtir e. Qiralê Swêdê ne qiralekî zulmdar e, lê dîsan jî ew qiral e. Xatûna Swêdê ku bi xwe jî ne swêdî ye, ji aliyê gelê Swêdê ve gelekî tê hezkirin û hebandin û pirrê caran ew weke dayika nasyonê têtе pêşkêşkirin. Li vî welatê bi qiral û bi xatûn, wek me li jor jî got, bi salên dirêj ji aliyê sosyal demokratan ve têtе îdarekirin. Tenê carinan di nav re cihê xwe ji kualisyona partiyên rast re dihêle, lê demeke dirêj tê re naçe, dîsan sosyal demokrat bi riya hilbijartinên demokratîk karînê bi paş de distîne.

Sîstema ku îro li Swêdê heye, pirrê caran ew bi navê "Modela Swêd" an jî "Sosyalîzma Swêd" tê bi nav kirin û gelek welatan xwestine vê modela ha li welatên xwe bi cih bikin, standarta jiyana hevwelatiyên xwe bilind bikin, azadiya şexs û ramanê lê bi cih bikin.

Piştî hilweşandina sîstema Sovyet û sosyalîzma reel, heyetek ji Sovyet û kevnewelatên Sosyalîst ji bo ku vê modela ha li cihê cih tahlîl bikin û berên van civatên bermayên şoreşa cotmehê bidin vê modelê, ew hatibûne Swêdê. Lê ji aliyê din ve jî, di destûra Partiya Komunîstên Çep (VPK) de Swêdê weke welatekî emperyalîst î bi-

çûk û birçî dihate nasandin.

Ev Swêda ku wê jî îro para xwe ji krîza ekonomîk stendiye, berî şerê cîhanê yê duwemîn gelekî perîşan, belengaz û feqîr bû. Carinan gava mirov rewşa Swêdê ya wê demê, di derheqa jiyana wan salan de ji devê kal û pîran dibihîze, dilê mirov bi wê rewşa wan dişewite.

Bayekî wilo yê belengaziyê hebû, ku bi sedhezaran Swêdî mecbûr man ku welatê xwe terk bikin û li kujê cîhanê yê din ji xwe re li starekê bigerin û pariyek nanê bi rehetî bixwin. Bi deh hezar û sedhezaran swêdiyan mal û erd û hebûnên xwe bi buhayekî mirî firotin axa û keşîşên çavvekirî û bi zar û zêçên xwe ve ketin riya dûr; riya çûyin û nehatinê, ya welatê ku di xewnerojka wan de, Emerîkayê. Hin li wir şerpeze bûn, bê kar man, li kuçan raketin û hin jî bi ser ketin. Ew nifşê ha îro li Emerîkayê bi navê "Swêdî-Emerîkî" tên binavkirin.

Ew çûn. Cihûyên di nava wan de jî ji xwe re xelas bûn. Dengê teperepa lingên sosyalîstên nasyonal hêdî hêdî li Ewrûpayê olan dida. Cihû, cengene, qehpik, homoseksuel, komunîst, sosyalîst, mirovên bi uzur bê pirs dihatin kuştin, hayûhûyek bi nava mirovan ketibû, Cihûyan vir de û wir de sînor gav dikirin û ji xwe re li starekê digeriyan. Her ku çû şer mezin bû û hê berî ku birîna şerê cîhanê yê yekemîn bikewe, şerê duwemîn dest pê kir. Swêda ku niha jî neutral e, di neutralbûna xwe ya şerê cîhanê yê duwemîn de jî bi polîtîkaya xwe ya durû, gava ku dinya li nav guhê hev ketibû, wêran dibû, wê alavên şer difirote Almanya û bi wê yekê ew ji şer û ji kirîza dinyayê destkewtî dibû û pê ekonomiya xwe baş û bilind dikir. Wê ekonomiya baş piştî şer jî dom kir. Swêda ku berê ekonomiya wê şerpeze bû, swêdiyên ku berê hewcedar û belengaz bûn, piştî rawestandina şerê cîhanê yê duwemîn, gava ku dinya bi "jinûveavakirinê" ve mijûl bû, ew êdî xwediyê ekonomiyeke baş û pêşerojeke rohnî bû. Ew

pereyên ku wan di dema pêvajoya şer de bi dest xistibûn, ne hewce bû ku wan pê gund û bajarên xwe ji nû ve ava bikirana, avahiyên xwe ji nû ve lê bikirana, ji bo saxkirina nexweş û birîndarên xwe bi milyonan pere xerc bikirana. Ji ber vê yekê bû ku wê piştî kurtedemekê li pêşiya gelek welatên Ewrûpayî xist. Srandarta jiyanê li Swêdê bilind bû, xaniyên wê xweş, îmkanên wê pirr bûn. Vê hebûn, xweşî û rehetiyê bi xwe re serbestî û azadî jî anî. Azadiya fikrê, azadiya îndîvîd, azadiya hilbijartinê, azadiya weşanê û çapemaniyê li vî welatî bê sînor bû. Hemû hewcedariyên bingehîn yên ji bo pêwîstiya mirovan li vî welatî pêk hat. Bêkarî nema, lê kar pirr bû. Endustrî bi pêş ket. Ji bo bersivdayina pêşketina endustriyê di salên 70'ê de Swêd deriyê xwe ji karkerên biyanî mîna girêkiyan, tirkan, yugoslaviyan û hwd. re vekir. Ew karê ku hevwelatiyên swêdî li xwe daneranîn ku bikin, biyaniyên ku ji derve hatibûn bi kêfxweşî û dilşahî dikirin. Bi vî awayî Swêdê hebekî ji îzolebûna xwe jî rizgar dibû û xwe hêdî hêdî ji gel û miletên din yê cîhanê re vedikir. Nemaze piştî bûyerên polîtîk yên dinyayê, Swêdê hê bêtir di warê humanîzm û comerdiya xwe ya li hember biyanî û kesên bindest hate naskirin. Li Şîlî hatina Pînoçet ya li ser hukum, li Îranê hatina Xumeynî, li Tirkiyê di bin serokatiya Kenan Evren de hatina Cûntayê, li Etopya problemên Erîtrêya, li Guatemala, Elsalvador û welatên din yên Emerîka Latînî hatinên dîktatoran, bû sedema ku siyasetvan, têkoşer û demokratên wan welatan ji ber zilm û zora karbidestên welatên xwe bazdin û werin xwe bavêjin vê Swêda biçûk. Swêdê jî heta ku jê hat hemêza xwe vekir, ji van kesên ku ji ber zilm û zorê, tade û îşkencê reviyabûn, ew bi mêvanperweriyeke dilsoz qebûl kirin.

Kurd jî yek ji van gelên cîhanê bû ku di ser gelek welatan re, bi gelek zehmetî û dijwariyan xwe gihandine Swêdê. Ger em ji dîroka 1980 dûrtir neçin, piştî 1980 bi hatina cûntayê re, gelek kurdên ku neketin xefka 12'ê îlonê, ji ber kuştin, îşkence û îdaman bazdan;

wan jî xwe li vî welatî girtin, ew jî bûn mêvanên vî welatê biçûk û sar.

Nifûsa kurdên li Swêdê îro di ser deh hezaran re ye. Li gorî statîstîkên ku di nava grûbên biyaniyan de çê dibin, grûba kurd grûba herî aktîv û bi ber e. Bi dehan komeleyên wan hene, radyoyên wan yên herêmî hene, pirtûk, rojname û kovaran derdixin, grûbên wan yên folklorê, tiyatroyê û fûtbolê hene. Bi dehan nivîskar û bi sedan jî xwendevanên kurd li vir gihan. Ew zû hînî swêdî bûn û gelek ji wan zû adepteyî civata swêdiyan bû. Pirr kesan ev welatê ku ewçend ji welatê me dûr, bi nas û dostên xwe, gundî û bajariyên xwe dane naskirin. Ew Swêda ku berî niha bi panzdeh bîst salan pirr kesan navê wê nebihîstibû, niha ew ji her kesî re nas e. Niha haya wan ji av û hewa Swêdê, demsalên wê, qanûnên wê hene. Tê bîra min, berî bi dîroka vê nivîsarê bi deh salan cîranekî min ji welêt ji min re nameyek şandibû û wî di nameya xwe de dabû xuya kirin, ku ew û hevalekî xwe li ser îklîm û av û hewa Swêdê ketibûn qirika hev, yekî gotibû li Swêdê her şev e; yê din jî gotibû na, li Swêdê her roj e. Herdu hevalan li ser vê yekê bi şerd lîstibûn û bi ya kê derketa ew ê ji yê din re diyariyek bi qîmet bikiriya.

Ne tam xebera wan be jî, şev û rojên Swêdê li gorî şev û rojên welatê me gelekî cihê ne. Zivistanên Swêdê bêhawe dirêj, sar û tarî ne. Ji çend saetên ronahiyê pêve, zivistanan li Swêd her tarî ye, her şev e. Lê havînên wê yên kurt û xweş, berevajiya zivistanên wê, ji çend saetan pê ve, her roj û rohnkayî ye. Li jora Swêdê, nîvê havînê, rojekê roj naçe ava. Dîtina vê yeka han bûyerek e.

Digel qanûnên entresan yên xwezayê, li vî welatî hin qanûnên din hene, ku ji bo hevwelatiyên me yên li welêt gelekî balkêş in.

Di sala 1987'an de gava ez seriyekî ji Swêdê çûbûme Sûriyê û li Qamîşlokê li kurdan bûbûme mêvan, di civatekê de peyayekî navsal ku ji xwendinê hez dikir, ji min pirsî bû:

– Gelo rast e, ku li Swêdê diz têkevin mala mirov û bişemitin, lingê xwe bişikînin, heqê mesrefa wan ya nexweşxanê li ser mirov e?

Gava min gotibû erê û min hebekî bi firehî behsa hin qanûnên Swêdê kiribû, civat şaş û ecêbmayî mabû û hin kes ji kenan li ser piştê li erdê ketibûn.

Dîsan li Qamîşlokê gava min li restoranteke biçûk xwarin xwaribû, çavê min li dîwêr li posterekî ABBA yê mezin ketibû. Paşê ku min posterekî EURUPE li ba pirtûkfiroşekî dîtibû ez zêde ecêbmayî nemabûm.

Swêd weke rûyê xwe yê humanîstî (Mixabin di vê dema dawî de ew di derheqa kurdan de kerr e) di warê teknîk û kulturê de jî bûye navekî navneteweyî. Volvo, Saab, Sas, Elektro Lux, Ericsson yên Swêd in. August Strindberg, Selma Lagerlöf, Artur Lundqvist, Astrid Lindgren, Ingmar Bergman, Ingrid Bergman, Greta Garbo, Roxet swêdî ne. Björn Borg ji Swêd e...

Digel van hemûyan jî, dîsan navê ku ji salê carekê Swêdê bi bîra dinyayê ve tîne, çapemaniya dinyayê meşgûl dike, navê Alfred Nobel e.

Alfred Nobel di 21'ê cotmeha 1833'an de li serbajarê Swêdê, li Stockholmê ji malbateke teknîkhez û teknîkzan hatiye dinyayê. Malbata wî Nobelius hê di salên 1600'î de navdar û xwedî gelek keşif (dîtin, servebûn) bûn. Bavê Alfred, Immanuel Nobel bi xwe jî gelek keşif kirine; ew peyayekî zana, bêhnfireh û yê endustriyê bû. Her çiqas ew ji Swêdê û ji herêma Kristianstadê bû jî, dîsa wî wek peyayekî endustriyê gelek salên xwe li Petersburgê buhurandine. Mayinên binavê yên ku ji aliyê Immanuel de hatibû dîtin di şerê Krimê de hatin bikaranîn û wan wê demê bala gelek welatan dikişandin. Gelek welatên din yên di şer de, dixwestin ku van mayinên binavê ji xwe re bi dest bixin û pê bi hêsanî zora dijminê xwe bibin. Immanul Nobel tenê bi dîtina mayinên binavê nehate ser, wî paşê

bê hejmar dîtinên din jî kirin.

Ji vî bavê xwedî zanebûneke kûr ji bilî Alfred sê lawên wî yên din jî; Robert, Ludvig û Emil çêbûne.

Gelek caran zarok li dê û bavê xwe nayên, li hember wan serî hildidin, dibin berevajiyên dê û bavên xwe. Lê herçar zarokên Immanul wilo nebûn, wan dane ser şopa bavê xwe û mîna ku tiştên li vê dinya me ku heye têr nakin, wan jî wek bavê xwe dest bi dîtina tiştên nû kirin. Dîtinên vê malbata ha ya xwedî paşerojeke rohnî, nizanim çima, lê her aletên şer bûn. Bi dîtina van, dema şûr û mertalan li paş dima, merdî û mêrxasî dimir, demeke jîrî û zîrektiyê dest pê dikir.

Weke me li jor jî got, Alfred Nobel li Stockholmê hatiye dinyayê, lê wî bi salên xwe yên gelek biçûk koçî Sankt Petersburgê kir û pirraniya emrê xwe; zaroktî û xortaniya xwe li wî bajarê dîrokî û xwedî kultureke kûr jiya. Hem di dema zaroktiya xwe de, hem jî di dema xortaniya xwe de wî qîma xwe bi jiyana rojane û basît nedianî, wî dixwest hertim li der û dora wî tiştin biqewimin, tiştin nû derkevin, civat bête guhertin. Loma jî ew gelekî digeriya û her welatê ku ew diçûyê ew hînî tiştên nû dibû. Ew hînbûna tiştên nû ji bo keşifên nû ji wî re dibûn weke çirayê. Di nav gerrên xwe yên welatên cihê cihê de, ew salekê ji bo xwendina kîmyayê li Parîsê jî ma. Ew xwendina wî ya li Parîsê ji bo keşifên wî bû bingeheke baş.

Heta ku ew li jiyanê bû wî zêdeyî hezar keşif û sêsed patent kir.

Piştî şerê Krîmê (1853–1856) malbara Alfred ji Petersburgê vedigere welatê xwe. Lê Alfred ji bo ceribandina patentên xwe bi malbatê re venagere, ew piştî wan bi çend salan, di payiza 1863'an de vedigere. Ew piştî vegera xwe ranaweste, dengê teqîna alavên şer ew ji xewê dipengizandin, ew dixistin liv û tevgerê. Vê malbata bi girr, her wekî li Petersburgê, li Swêdê jî xebata xwe berdewam dikirin. Lê li Swêdê di sala 1863'an de bobelatek bi serê malbatê de tê,

hemû endamên malbatê xemgîn dike û ew di nava hizin û şînê de digerîne. Ev bobelata ha li derveyî mala wan, di laburatuara Alferd Nobel, li Heleneborgê dibe.

Dibêjin, gava birayê Alfred, Emîl Nobel bi teknologekî xwe re li laburatuarê serbixwe dixwazin nîtroglicerînê pak bikin, prova wan diteqe, wê teqîna kn bi alavên keşifê yên din, kn pirranî ji alavên şer pêk hatibû, dikeve, teqîn hê xurttir dibe, taxê dihejîne; pencerên malan dişikîne, teknologekî ciwan, keçeke bermalî, şagirtekî biçûk û delalê ber dilê malabata giran ya Immanuel, Emîl tên kuştin.

Ev bûyera trajîk tesîreke ecêb li malbatê dike, demekê destên wan li kar sist dibin, lê pirr tê re naçe Alfred Nobel perdeya şînê û hiznê ji ser rûyê xwe davêje û bi dû prova Emîlê bîst salî dikeve. Ji bo ku çavên kekê wî yê biçûk Emîl li paş nemînin û ew di gorra xwe de bi rehetî binive, Alfred xwesteka wî bi cih tîne, navê keşifa xwe dike "dînamît" û bi wê di sala 1867'an de patenta xwe distîne.

Ew keşifa wî ya ku paşê dibe bingeha avakirina fabrîka alavên şer û çekên giran, Boforsê, ew bûn sedema gelek şerên mezin li dinyayê û kuştina bêhejmar mirovên di emrê birakê wî Emîl de.

Alfred Nobel vê dawiyê bêhawe dewlemend dibe. Ew dibe xwediyê fabrîkan, malan, makînan... Lê digel vê dewlemendî û şarezabûna xwe dîsan ew bi tenê bû; hevalên wî kêm bûn, ji mirovan bi dûr bû. Ji xwe di warê evînê de qet şansê wî tunebû, ew tu caran nezewicî, zuriyeta wî çênebû. Tenê ew carekê li Viyanayê keçikekê nas dike. Naskirina wî ya bi keçikê re wilo çê bûye; Alfred Nobel li Viyanayê vexwendiyê xwarinê ye, ew jî kincên xwe yên şîvê li xwe dike, xwe diedilîne, ji bo kirîna gurzek gul diçe dikaneke gulfiroş. Li dikana gulfiroş keçikeke ciwan, bejinzirav û rûbiken kar dike. Keçika gulfiroş bi wê rûbikenbûnê xwesteka Alfred Nobel bi cih tîne, jê re destek gulên geş di nav kaxizeke spehî de dipêçe û bi dostaniyek germ didiyê. Ew keçika nazik, şêtîn û diltenik dilê wî germ

dike, wî ji bêhna barûd û keşifên wî bi dûr dixe û ber bi derya evînê ve dikişîne. Erê, Nobelê ku bi bîst-sî salan ji keçikê mezintir bû, bejinkinik, çeloxwarî, nelihev, lê weke cin zekî bû.

Alfred Nobel hewesa xwe berdide ser keçikê, dildar dibe, lê bêî ku pê re bizewice, bi salan pê re dimîne. Zaroka ku dawiyê ji jinikê re çêdibe, diyar dibe ku ew ni ji Alfred Nobel e, lê ew ji yekî dî ye. Digel vê hindê jî Alfred Nobel ji bo ku bi zaroka xwe re hewcedar û stûxwar nemînin, alîkariyek mezin ya peran bi wê dike, riyên xwe ji hev vediqetînin û her kes bi riya xwe de diçin. Lê oxira Alfred Nobel ne dûr bû, riya wî her ku diçû kurttir dibû, heta pirrê caran dihate gotin, ku Nobel dixwest bi rê û metodên cuda xatir ji dinya me bixwaze, koç bike, here û hew vegere.

Alfred Nobel di dawiya jiyana xwe de aciz bûbû, ew xwedî serweteke mezin û navekî bilind bû; lê bê heval, bê evîn û bê jiyaneke rind bû.

Tê gorin ku Nobel carna poşmaniya xwe ji bo dîtin û keşifên xwe yên mîna dînamît û alet û alavên şer yên din tanî ziman. Her çiqas mijûliya wî ya jiyanê dîtina alavên şer bû, lê ew aştûxwaz bû û wî piştgiriya tevgerên aştiyê yên dema xwe dikir. Loma jî wî berî mirina xwe ji bo ku ew girîngiya aştiyê îsbat bike, poşmaniya xwe ya dîtinên alavên şer tanî ziman, xwesteka xwe ya ji bo jiyaneke xweş û cîhaneke bê şer û pevçûn bigihîne nivşên dahatû û navê xwe nemir bike, wî di wesiyetnama xwe de nivîsand, ku ji serweta wî salê di warê aştiyê, edebiyatê, fizîkê, kîmyayê û fîzyolojiyê de xelat bi navê wî bêne dayîn.

Alfred Nobel di sala 1896'an de, di vîlaya xwe ya bi navê "Mio Nido" li San Remo, li Italyayê, di nav tenêtiyeke bêdeng de çavên xwe digire, ji dinya me koç dike û diçe.

Alfred Nobel piştî mirina xwe, serweteke mezin li dû xwe hişt. Wî bi pereyên wê demê sih û yek milyonên swêdî li dû xwe hişti-

bûn. Lê mal û milk û pereyên wî belawela bûn; hinek veşirtî bûn, hinek di bankeyên Fransayê de bûn. Piştî mirina Nobel, herçiqas fransizan xwestin dest deynin ser pereyên wî jî, lê dîsan swêdiyan nehiştin û ew pere ji nav lepên wan revandin û ew gihandin welatê zaroktiya wî, Swêdê. Herçiqas Nobel pirraniya jiyana xwe li derveyî Swêdê derbas kiribe jî, dîsan ew hevwelatiyê Swêdê bû û wî nasname û paseporta Swêdê hildigirt. Wî pirraniya jiyana xwe li Petersburgê, Italyayê û Fransayê buhurandiye. Lê dîsan dilê wî ji bo welatê wî lêdixist, mêjiyê wî ji bo danasîna welatê wî bû. Loma jî welatê wî û hevwelatiyên wî jî bi kêfxweşiyek bêhempa li vî peyayê biçûk, lê bi navê mezin xwedî derdiket û bi hebûna wî xwe di nava gel û neteweyên dinyayê de dilşa û serbilind hîs dikir. Ji bo ku navê wî nemire, xebata wî bertelaf neçe, perên wî vir de û wê de bê mane neyên xerc kirin, li ser navê wî komîteyek hate avakirin. Ew komîta ku ava bû, perên wî, serweta wî ji cih û deverên cihê cihê dane hev û ew hemû li Swêdê civandin. Niha bi navê xelata Nobel di şeş şaxan de; şaxa edebiyatê, aştiyê, fizîkê, kîmyayê, fizyolojî û tibbê de xelata Nobel tê belavkirin. Her ji bo şaxekî komîteyek hatiye avakirin. Akademiya Swêdê ku ji 18 kursiyan pêkhatiye, berpirsiyarê xelata Nobel ya edebiyatê ye. Ev xelata ha hem li Swêd, hem jî li dinyayê xelateke balkêş e. Piştî wê jî xelata aştiyê tê, ku ew jî li serbajarê Norvecê, li Osloyê tê dayin. Bi rêzê jî xelatên din tên.

Li gorî destûra akademiya Swêdê mirov bi xwe nikare xwe weke kandîdatê (aday) Nobelê nîşan bide. Herweha sazgeh jî nikarin kesan ji bo xelata Nobelê pêşniyaz bikin. Lê kes ji aliyê kesan ve têne pêşniyaz kirin.

Ev xelata ha ya ku ji sala 1901'ê û vir de tê dayin û salinan dibe mijara munaqeşe û nêrînên cihê, her sal di dehê meha donzdehan de, di roja bîranîna wefata Nobel de, ji aliyê qiralê Swêdê bi şahî û sermoniyeke xweş, digel gelek beşdarên navdar, li serbajarê Swêdê,

li Stockholmê tê belavkirin. Meha donzdehan li Swêdê sar e, reş e, dirêj e... Şahî û sermoniya Nobelê vê meha nexweş xweş dike, wê dixemilîne, wê dijîne.

Heta niaha ji gelek qitan û welatan nivîskaran xelata Nobelê girtine. Di gel ku carinan giraniya îdeolojîk tê de hebe jî, dîsan bi gelemperî bêî ku ferqiyeta reşik û spiyan, musulman û cihûyan, Ewrûpî û Efrîkayiyan bê kirin, nêzîkî sed nivîskaran ji her beşê dinyayê bûne xwediyê vê rûmeta bilind. Herweha welatên ku ev nivîskarên mezin afirandine, xwe di nava gel û miletên dinyayê de serbilind hîs kirine. Lê hem Tirkiye, hem jî welatên cîranên Tirkiyeyê yên ku îro serdestiya kurdan dikin, ji vê rûmetê û serbilindahiyê bêpar mane, nebûne xwediyê vî navê nemir.

Lê kengî ku ew li humanîzmê vegerin, li hember karbidestên xwe derkevin, êş û elema kurdan, têkoşîna wan a ji bo jiyaneke bi rûmet, banga wan, liberxwedana wan, stiran û xwezaya welatê wan di berhemekê de bicivînin, ez bawer dikim wê çaxê wê kurd bi xwe wan pêşniyarî akademiya Swêdê bikin. Lê ne dûr e, ku kurd berî wan bibin xwediyê vî navê gerdûnî.

Mixabin, îsal ne wan, ne jî kurdan stendin; xelatê xwediyê xwe li peravê giravekê, li bin siya darên xurman, li ser qûma hûr û nerm dît.

Xelatgirê Îsal, Derek Walcott

Gava îsal serokê Akademiya Swêdê Sture Allen deriyê xwe ji çapemaniyê re vekir û mizgîna xelatgirê îsal Derek Walcott da, herkesî ev mizgîna ha bi kêfxweşî hemêz kirin. Ji tu kesî dengê protestoyê nehate bihîstin. Lê tenê, gava xwediyê xelatê Walcott ev nûçeya ku dibû bingeha guherandina jiyana wî û ew bi şeş milyon û nîvê Swêdî dewlemendtir dikir bihîstibû, pêşî bawer nekiribû, paşê bi dengekî bi kêf, ku di qirikê de mabû, gotibû: " Çima nemaze ez? Li din-

yayê ewqas nivîskarên mezin hene".

Lê Akademiya Swêdê, li gorî nêrîn û pîvanên xelatê, îsal ew mezintir dîtibû.

Ew mezinahiya wî ji aliyê rexnegirên edebiyatê ve, li seranserî dinyayê di rûpelên kulturê yên rojnameyên rojane û di kovarên edebî û kulturî de jî bi xurtî hatin dîtin. Tu kesî li ru cihan nerazîbûna xwe ya li hemberî biryara Akademiya Swêdê ya îsal neanîn ziman. Herkesî ev biryara ha pesinand, ev şaîrê nîvreşik, hevalê xelatgirê Nobelê yê sala 1987'an Brodsky, ji kûraniya dilê xwe pîroz kirin. Ev navê ha her çiqas ji xwendevanên kurd re nenas be jî dîsan hêjayî pesindayinê ye. Ji ber ku ew nîvreşik e, ji qitak dûr, ji neteweyek bindest e. Rexnegirekî Swêdî ew weha dabû naskirin " Derek Walcott ne tenê nivîskarekî nûjen, lê ew herweha şaîrekî reşik yê Emerîkî ye jî". Lê bi a me jî ew ne tenê şaîrekî reşik yê Emerîkî, ew herweha şaîrekî gerdûnî ye jî. Ew ne tenê malê kujeke cîhana jibîrkirî, lê ew ejderhayekî cîhanî ye. Loma jî, di vê dema me ya ku ji berdêla aştiyê şer, ji berdêla biratiyê dubendî heye de, ji vî camêrê pênûstûj re bi girsî çepik lêketin. Mezinahiya vî mirovê ji neteweyek biçûk, lê xwediyê dîrokeke kûr û dirêj ji aliyê serokê Akademiyê Sture Allen, di nav şewq û çiqe çiqa kamerayên japonî de bi riya çapemaniyê di rojekê de bi dinyayê ve hate gihandin.

Derek Walcottê nîvreşik, ji dê û bavekî reşik û spî hatiye dinyayê. Tevliheviya xwînê di giyanê wî de bûye hîm û asasê kultureke dewlemend, du qita gihandine hev. Ew hin caran xwe weke Ewrûpayî hîs dike, di nava kultur û medeniyeta Ewrûpa de bi avjenî dilîze, hin caran jî xwe serserî berdide binê derya kultura Efrîkayê ya kevin û wê bi hemû hêza xwe derdixe rûkala dinyayê.

Derek Walcott hê di salên xwe yê zaroktiyê de bal û hewesa xwe berdabû ser huner û edebiyatê û di hîjdeh saliya xwe de berhema xwe ya pêşî bi navê "25 Helbest" ku bi rastî jî ji 25 helbestan pêk-

hatibû, bi alîkariya diya xwe, ku ew jî hezkira poesiyê bû, çap kiribû û di dema xwe de baleke baş kişandibû. Wî piştî wê pirtûka xwe bê hejmar pirtûkên din jî nivîsandin. Ji bilî nivîsandina helbestan wî xwe li nivîsandina piyesan, senaryoyên sînema û hwd. jî rakişand. Weke helbestkariya xwe, ew di warên din jî yên nivîsê de şareza ye û di berhemên wî de şoperiyên kultureke kûr û zanebûneke pirr dixuyin. Lê Walcott bi berhema xwe ya bi navê "Omeros" ku ji çend cildan pêk hatiye, hate naskirin û bi wê bû xwediyê navekî gerdûnî. Û ew bû sedema ku Akademiya Swêdê îsal ew layiqê vê xelata navdar dît.

Derek Walcottê Karîbî yê 63 salî, bi jin e û bavê sê zarokên gihiştî ye. Ew ji sala 1983'an vi de li Massachusetts, li unîversîteyên Harvard û Bostonê mamostetiyê dike.

Erê, ev şaîrê nîvreşik, nivîskarê Homeros, bibûrin, "Omeros" niha bi tena kurtepantolonê xwe li bin siya darên xurman rûniştiye, herdu lingên xwe dirêj kirine, li aliyekî xwe şeş milyon û nîv kronên swêdî danîne, li aliyê din jî pirtûk û rûmeta xwe ya nivîskariyê... Ka em binêrin bê di pêşerojê de kîjan zora kîjanê dibe.

Nûdem, No: 4, 1992

ŞAÎRÊ KURD KÎ YE?

Ev demek e di nava rûpelên kovar û rojnameyên kurdan de munaqeşeya edebiyata kurdî û di edebiyatê de bikaranîna zimanê kurdî tê kirin. Ev tiştekî baş e, hêviyekê dide mirov. Lê belê çi bigire an hemû an jî piraniya van munaqeşeyan bi tirkî dibin. Ev yeka han jî şaşiyek e; ji ber vê şaşiya ku bi salan hatiye kirin em îro nikarin bi kurdî binivîsînin, em berhemên xwe yên edebî bi tirkî didin. Ev berhemên ku bi tirkî têne dayin malê kîjan zimanî ye, edebiyata kîjan zimanî ye û ji kîjan zimanî re xizmetê dike? Mumkun e ev problema han ji bo zimanên serbixwe çareser bûbe, lê ji ber ku nasnava kurdan, di rewşa îro de bi zimanê wan ve girêdayî ye, bêşik divê edebiyata kurdî bi zimanê kurdî were dayin. Ji bo min ziman berî mijarê tê. Yanî mijara berhemeke edebî çi dibe bila bibe, ger ew berhem ne bi zimanê kurdî hatibe nivîsandin, ez ê nikaribim wê têxim kategoriya edebiyata kurdî. Ew berhem berhemeke edebiyata tirkî ye. Ev ji bo hemû şaxên edebiyatê; roman, çîrok, helbest, piyes û hwd. yek e.

Ger mijar berî zimên bihata me ê îro piyesa "Zimanê Çiya" ya Herold Pinter, romana "The Diplomat" ya James Aldridge, romana "Hakari'de Bir Mevsim" ya Ferit Edgü û gelek berhemên bi vî awayî berhemên edebiyata kurdî bihesibandina. Em dizanin ku "The Diplomat" û "Zimanê Çiya" du berhemên edebiyata Îngilîz in û "Hakarî'de Bir Mevsim" jî berhemeke edebiyata tirkî ye. Yanî di vir de ji bo min miliyeta nivîskar ne muhîm e, ya muhîm zimanê ku nivîskar bi kar aniye. Ev nivîskar dikarin bi eslê xwe kurd bin jî,

lê zimanê ku ew bi kar tûnin ne bi kurdî be, ez nikarim wê berhemê mîna berhemeke edebiyata kurdî bihesibînim. Mîna tê zanîn, li Tirkiyeyê bi sedan berhemên edebî ji aliyê kurdan ve bi tirkî hatine nivîsandin. Di edebiyata Dîwanê de şaîrên wek Nesîmî, Nabî, Fuzûlî; di destpêka tevgera Jon Turkan de şiîrên rewşenbîrên mîna Abdullah Cevdet, Ziya Gökalp; Berî û piştî Cumhûriyetê Ahmed Haşîm, û hê derengtir Ahmed Arîf, Cemal Süreya, Kemal Burkay, Orhan Kotan, Hicrî Îzgören, Aydın Alp, Yılmaz Odabaşı; romanivîsên wek Yaşar Kemal, çîroknivîs û romannivîsên wek Esma Ocak, Seyit Alp û gelekên din. Gava em lîsteyê dirêj bikin, em ê bikaribin bi hêsanî nêzîkî sed navî ji edebiyata tirkî hilbijêrin ku bi eslê xwe kurd in û bi tirkî nivîsandine. Lê mirov dikare van bike du kategorî; kategoriyek jê kurdîtiya xwe înkar dike, yek jê jî hem kurdîtiya xwe înkar nake, hem jî bi profesyonelî siyasetvaniya kurdî dike. Lê bi a min ji bo ku mirov berhemên wan yên edebî mîna berhemên kurdî bihesibîne, bi profesyonelî siyaset jî têr nake.

Em dizanin ku Cemal Süreya yek ji şaîrên Tirkiyeyê yê herî baş e, kurd e, lê li kurdîtiyê xwedî derneketiye. Ahmed Arîf geh kurd bûye, geh jî tirk, lê belê ew jî şaîrekî zimanê tirkî ye. Kemal Burkay û Orhan Kotan ku zêdeyî nîvê emrê xwe di siyaseta kurdî de buhurandine jî, ez nikarim şiîrên wan şiîrên kurdî bihesibînim. Herçî Kemal Burkay e, ew niha bi kurdî dinivîsîne û cihekî şiîrên wî yê qedirgir di edebiyat kurdî de heye. Lê "Gülümse" ya ku Sezen Aksu distirê, ne şiîreke zimanê kurdî ye. Herweha şiîrên Orhan Kotan îro ji aliyê Ahmed Kaya ve têne stran. Herçî Îzgören û Yılmaz Odabaşı ye, digel ku şaîrên baş in û li Tirkiyeyê xwediyên xelatan in jî, dîsan ez ê nikaribim wan mîna şaîrên zimanê kurdî bihesibînim. Ji ber ku ew şiîra tirkî dinivîsînin û herweha ew dikevin kategoriya edebiyata tirkî. Yanî di rewşa îro de, çi kurdên ku xwe înkar dikin û çi jî kurdên ku ji bo kurd û Kurdistanê têkoşînê didin, ger zimanê

berhema wan ya edebî bi tirkî be, ew nivîskarê zimanê tirkî ne.

Ji ber ku rola zimên di binavkirina berhemê de her tim girîng bûye, loma em îro dikarin bi hêsanî navên hin şaîran bidin ku tu şik di şaîrbûna wan ya kurdî de tune ye. Zelalbûna vê pirsgirêkê ji bikaranîna wan ya zimanê kurdî tê. Yanî her kes îro bi hêsanî dikare bibêje ku Ehmedê Xanî şaîrekî kurd e. Ji ber ku Ehmedê Xanî berhemên xwe bi kurdî nivîsandine. Her kes bi hêsanî dikare bibêje ku Melayê Cizîrî şaîrekî kurd e, ji ber ku wî berhemên xwe bi kurdî nivîsandine. Eynî tişt ji bo Feqiyê Teyran, Melayê Batêyî, Siyahpûş, Pertew Begê Hekarî, Hecî Qadirê Koyî, Cegerxwîn, Qedrî Can, Osman Sebrî, Mehmed Emîn Bozarslan, Rojen Barnas, Malmîsanij, J. Espar û hwd. jî derbas dibe. Ji ber ku ev şaîrên me berhemên xwe bi kurdî dinivîsînin.

Bi destûra we be, ez dixwazim van çend gotinên xwe bi çend nimûneyên şîra kurdî dawî bînim.

Kurdino, merdino, pir xweş e serxwebûn,
Ew demên tar û teng ko me dî vane çûn,
Dest bidin hev hemî, pêş kevin em hemî,
Da biçin bo welat, yan mirin yan felat.
(Cegerxwîn)

Gula sor
Hil bû jor,
Bîn da dor,
Gula sor...
(Qedrî Can)

... Di hemêza Firat û di paşila Dîcle de
Axek hêşîn bû seranser

Bi berrî û deşt, kortik û pehnav
Bi çiyayên bilind û geliyên kûr
Xakek bi kûrahî zayok
Erdek li berayî bi xêr û ber
... (Rojen Barnas)

Hevalo, gula xas tim venabe, jê ra dem divê
Li gor derdî derman, gor birînê melem divê
Te dinyayek delal xwast, azad û aştîxwaz
Lê ka ew merivên nu, gor behrê belem divê
... (Kemal Burkay)

Yeni Politika, 1995

ÇEND GOTIN LI SER ZIMANÊ KURDÎ

Ji avakirina Cumhûriyeta Tirkiyeyê û bi vir de, hovîtî û stemkariyeke bêhempa li ser gelê kurd dom dike. Nêrîna tirkan ya li ser kurdan, hem di dema yekpartîtiyê de, hem jî di dema pirrpartîtiyê de eynî bûye. Tirkiyeya ciwan hertim bi îdeolojiyekê hatiye îdarekirin û wê îdeolojiya serdest jî rê nedaye raman û nêrînên cihê, nehiştiye gel û grûbên etnîk li Tirkiyê bi ziman û edebiyata xwe dakevin, bi kultura xwe dakevin; ew kulturên kevnar û xwedî dîrokên dûr û dirêj ji nû ve bêne vejandin û mozaîka ku heye hê bêtir bête xemilandin, tovê biratî û dostaniya rastîn li ser axa welêt bête reşandin. Na, wê ev nekiriye, wê polîtîkaya xwe li ser hîmê zilmê û înkariyê ava kiriye, wê pêşketina kulturên din, ji hebûna xwe re talûke dîtiye, loma jî ew bi hemû metodên jinavêrakirin û asîmîlasiyonê hatiye ser gelê kurd. Wan xwestine ku ew zimanê kurdî bidine ber kêrê, bi vî awayî kurdan lal bihêlin, da ew nikaribin ji bo azadî, serbestî û serbixwebûna xwe bang bikin, ew bi vî awayî li ber çavên dinyayê ji navê rabin û navê gelê kurd ji ferheng û nexşeyên cîhanê bête maliştin. Serdestên me di vî warî de gelek caran bi ser ketine, gelek caran tiştên ku xwestine bi serê gelê kurd de anîne, ew asîmîle kirine û pirr ji kurdan di nava wê asîmîlasiyona kirêt de, zimanê xwe winda kirine, bi windakirina zimên re, ji kultura xwe bi dûr ketine, bûne qurbana îdeolojiya fermî û gelek ji wan bi wê jî nehatine ser, vêca wan bi xwe, xwe înkar kirine, li dij hebûna xwe tevgeriya ne. Digel van hemû bûyeran, digel vê hemû zilm û zorê, êdî jinavêrakirina kurdan ne mimkun e. Ne mimkun e, ji ber ku îro di gel berxwe-

dana siyasî, kurdan bi xurtî xwe avêtine meydana ziman, edebiyat û kulturê û bi mêrxasî li ber xwe didin.

Bi hatina 12'ê îlonê re, têkoşer û welathezên kurd yên ku neketin xefka 12'ê îlonê û xwe avêtin welatên Ewrûpa, ew li Ewrûpa bi girîngiya ziman û kulturê hesiyan, loma wan milên xwe lê wergerandin û mîna ku ew heyfa salan hilînin, wan dest bi hînbûna zimanê kurdî kirin, dest bi lêgetîna berhemên kurdî kirin, dest bi xwendin û nivîsandina bi kurdî kirin. Berhema vê xebata kurdên me yên li Ewrûpayê bû bi dehan kovar û rojname, bi sedan pirtûk û bê hejmar nivîskar...Wek tê zanîn ev xebata ha bi xurtî piştî sala 1980 bû. Digel ku tradisyoneke xwendin û nivîsandina kurdî li nav kurdên me yên binxetê û li nava kurdên me yên Kevnesovyetê hebû jî, dîsan bi tesîra kurdên Ewrûpa ew jî îro hêdî hêdî ber bi zimanekî standart ve gavan davêjin.

Zimanê Standart

Wek tê zanîn yên ku di salên 80'yî de dest avêtin ziman û edebiyata kurdî, yên ku di dibistana siyasî de derbas bûbûn, yên ku hê jî xwedî raman û nêtîneke siyasî bûn. Loma çi partî, çi grûp û çi kesên serbixwe, her kesî ziman li gora xwe bi kar tanîn û celebê bikaranîna xwe ya zimên jî li gora xwe rast didîtin. Kovar, rojname û pirtûkên ku derdiketin bi alfabe û rêzimanên cihê cihê bûn. Heta gelek caran di nava rûpelên eynî kovarê de çend alfabe û rêzimanên cihê dihatin bi kar anîn. Demeke kurt be jî, ji berdêla berberiya siyasî, berberiyeke zimên di navbera me de dest pê kiribû. Lê zû aqilê me hate serê me, em têgihîştin ku ziman ne tenê yê îdeolojî, komik an jî sinifekê ye. Ziman yê gelekî e. Karker û gundî jî, axa û bûrjûvazî jî bi eynî zimanî dipeyivin. Vê yeka han kir, ku piştî hin minaqeşe, civîn û konferansan, em dev ji rika şexsî û siyasî berdin, em zimanekî kurdî yê standart pêk bînin. Ji bo pêkanîna zimanê kurdî yê

standart jî, hê di salên sihî de, ji aliyê Mîr Celadet Bedir-Xan ve bingeh hatibû avêtin. Mîna ku em li xezîneyekê rast hatibin, me bi lez û bez hejmarên kovara HAWAR'ê dane hev, ew ji nû ve çap kirin, piştî şêst salan ew ji nû ve di nava kurdan de belav dibû.

Erê, bingehê zimanê kurdî yê standart, bi alfaba latînî, hê di salên sihî de hatiye avêtin. Gelek ji me, piştî bi pêncî-şêst salî, li xebat û keftelefta ronakbîrekî kurd, ku bi hezar zehmetî û bêmecaliyan ji me re bingehê zimanê me avêtibû û di bêdengiyê de di bîra xwe ya "Qederê" wer bûbû û miribû, dihesiyan. Mîna her xebatên ku ji bo gel û milet tête kirin, winda nabin, ev xebata hêja ya Mîr Celadet Bedirxan jî winda nebû û îro ji bo yekîtiya zimanê me, ku bingeha yekîtiya gelê me ye, bûye bingeh. Di gel ku heya niha em negihîştine rêziman û rastnivîsandina ku Celadet Bedir-Xan ji me re bingeh avêtiye jî, nayê wê maneyê ku wê li ser rêzimana Celadet Bedir-Xan zêde nebe, kêmasiyên ku hene neyêne girtin, şaşiyên ku hene neyêne rast kirin. Li gorî hewcedarî û pêşketina civak û zimanê kurdî, bivê nevê wê di rêziman û rastnivîsandina ku HAWAR'ê ji xwe re kiribû bingeh de jî guhertin çêbibin, wê lê kêm û zêde bibin. Celadet Bedir-Xan bi xwe jî hem di alfabê de, hem di rastnivîsandinê de, hem jî di tîpên alfabê de li gorî hewcaderayên zimanê kurdî guhertin kirine. Wek mînak, wî di hejmarên pêşî yê kovara HAWAR' ê de tîpa "k" di şûna "q" de bi kar tanî û tîpa "q" jî di şûna "k" de bi kar tanî. Mînak, navê "Kemal" bi "Qemal" dihate nivîsandin, "qelem" bi "kelem" û hwd...

Lê paşê, bi alîkarî û pêşniyariya zimanzan, xwediyê "Ferhenga Kurdî Ya Nûjen" Elî Seydo Goranî, Celadet Beg şûna tîpan bi hev guherandin û "q" bi "q", "k" jî bi "k" bi kar anî.

Gava em bi dû dengên wilo bikevin, divê em alfaba kurdî ji 31 tîpan bikine çil û belkî jî hê zêdetir. Ji ber ku di kurdî de gelek dengên din, mîna "ç', t', k', p'" hene. Dîsan, li ser van dengan jî Os-

man Sebrî û Celadet Bedir-Xan li hev nedikirin, gelek caran diketin qirika hev.

Gava Celadet Bedir-Xan, piştî xebata salên dirêj, bingeha alfaba xwe ya latînî datîne, bi zana û nezan, xwenda û nexwenda re li ser alfabê civînekê çêdike. Di wê civîna ha de Osman Sebrî jî beşdar e. Li ser wê civîna ha û li ser tîpên " ç' " "ç'emê Nisêbînê", " p' " "p'îra Eyşê", " k' " "k'aya kadînê", " t' " "t'eyr û t'ilûr", Osman Sebrî di destpêka avakirina Enstîtuya Kurdî ya Parîsê de, gotarek li ser zimên ji kovara Enstîtuyê "Hêvî" re şandibû. Di wê gotara xwe de ew weha dibêje: "...Piştî em bi ser û ber li elîfbêya pêkhatî hûr bûn, Celadet ji me pirsî û got:

– Ma hûn tiştekî kêmanî di vê elîfbêyê de dibînin?

Kesekî ji hevalên di civînê de deng nekir. Hingî min got:

– Erê, ez tê de çar tîpan kêm dibînim ku di zaravê kurmancî de hene. Divê em çavên xwe li ser tinebûna wan negirin. Tinebûna wan di elîfbêya me de kêmaniyeke berbiçav e.

Hingî Celadet li min vegerand û got:

– Tîpên kêm kîjan in?

Min gotê:

– ç' p' k' t' ne, ku zaravayê kurmancî ji van tîpan dagirtî ye.

Hingî rehmetî li min vegerand û got:

– Rast e, ev herçar tîp di zaravê kurmancî de hene. Lê em dikarin ji tîpên nêzîkî wan (ç, p, k, t) destkewtî bibin, herwekî me bi tîpên erebî dinivîsandin. Va ye hemî alfabeyên Awropî di navbera 29–31 tîpan de ne. Ev e, alfaba me bûne 35 tîp... "(Hêvî, No. 1. r. 19)

Lê civînê giranî nedabû ser pêşniyaz û nêrînên Osman Sebrî û alfabeya kurdî ya latînî bi 31 tîpan bi sînor kiribûn.

Ez bawer dikim Osman Sebrî hê jî ji ser ya xwe daneketiye, lê ew naxwaze bi serê xwe jî wan tîpan di alfaba kurdî de bi kar bîne. Ew li bendî Enstîtu û Akademiyên kurdî ye, ku dest biavêjinê û girîn-

giya wan tîpan ya di alfaba kurdî de di ber çav re derbas bikin. Rehmetiyê Qanatê Kurdo jî di berhema xwe ya rêzimanî "Zimanê Kurdî" de dest davêje wan tîpan û tew ew alfaba kurdî ji 31 tîpan dike 38 tîp. Bi a min, ew tîpên ku Osman Sebrî û Qanatê Kurdo dixwazin li alfaba kurdî zêde bikin, di rewşa îro de ne di cih de ye. Ji ber ku wek Celadet Bedir-Xan jî dabû xuya kirin, divê em alfaba kurdî zêde nekin. Ji ber ku bi vî awayî jî, yanî bi 31 tîpan jî, dîsan alfaba kurdî yek ji alfabeyên latînî yê herî pirr e. HAWAR, RONAHÎ, ROJA NÛ bi alfabeyeke 31 tîp derdiketin û bi hêsanî bersiva zimanê kurdî didan. Bi a min, digel ku gelek salên dirêj di ser re derbas bûne, ew alfabe û rêzimana ku ji aliyê Celadet Bedir-Xan ve hatiye danîn û di kovarên wî de hatiye bikaranîn, îro jî bersiva hewcedariya zimanê kurdî dide û qet ne pêwîst e, em rêzimanin din, ku gelekî teng û herêmî ne, bi kar bînin. Yek jî, îro hin kovar û rojnameyên kurdan yên hêja, rewşa xwendevanên kurdan li Tirkiyeyê didine ber çavan û ji bo ku zimanê kurdî bi hêsanî bête xwendin û di nava xelkê de belav bibe, ew ji berdêla tîpên kurdî hin tîpên alfaba tirkî bi kar tînin. Bi awira pêşî ew dikare hêsan bixuye, lê paşê mirov têdigihê ku ew derzekê li zimanê kurdî dixe, awa û qeydeyên zimên xerab dike, ji berdêla zimanekî yekbûyî, dubendiyekê dixe navbera zimanê kurdî. Îro li hawîrdora dinyayê; li Sûriyê, li Kevnesovyetê, li Iraq û Îranê û li tevaya Ewrûpayê, hemû bi awa û qaîdeyên rêzimana Celadet Bedir-Xan diçin û ne mîna alfaba tirkî "ı" û "i" bi kar tînin. Mirov dikare bibêje, xem nake, tenê tîpek e, alfabê û rêzimanê naguhere; lê ne wilo ye, gotin ji tîpan pêk tên û tîpek dikare mana gotinê bi tevayî biguhere, mancyeke berevajî bidiyê. Gava em li gora alfaba tirkî herin "ı" di şûna "i" de û "i" di şûna "î" de bi kar bînin, wê mana gotinan ji bin bête guhertin û wê serên xwendevanên kurd, ku ev heftê sal in ji xwendin û nivîsandina zimanê xwe bêpar mane, tevlîhev bibin. Ew zimanê ku berê ji wan re zehmet tê,

dê zehmettir were. Loma, ez bawer im, ji berdêla ku em îro serê xwe bi avakirina hin rêzimanên nû biêşînin û ji aliyê xwe ve gotin û termên nû yên rêzimanî biafirînin, em li ser rêziman û rastnivîsandina ekola HAWAR'ê herin çêtir e. Ji ber ku ew rêzimaneke rast e, li ser kurmanciya eslîn hatiye avakirin, ne teng e, ji bo kurdên her cih û deverên Kurdistanê hêsaniyek e.

Gava îro şexsin bi xwe bixwazin ji xwe re li gora xwe qaîde û awayê zimên bi kar bînin jî, em ê bêjin xem nake, sibeh dikare pêşî lê bête girtin û xebatên wî/wê dikare di nava xebata tevayî û têkûz de bihele. Lê talûka mezin ew e, ku îro Enstîtu û Akademiyên kurdî, organîzasiyon û partiyên kurdî di aliyê zimên de ji hev bi dûr bikevin, her yek zimên di tenga xwe de, li gora xwe bi kar bînin. Wê çaxê, ji berdêla yekîtî û hevgirtina miletê kurd, wê perçebûn û dubendî têkeve nava milet. Ji ber vê yekê, berî ku ev talûkeya ha di nava me dest pê bike – ez di vî warî de xweşbîn im, ku wê tiştekî wilo di navbera me de dest pê neke – divê sazgehên kurdî, çi li welêt, çi li derveyî welêt li hev rûnên, hemû zimanzanên kurd li hev bicivînin, bi hev re bidin û bistînin, bi hev bişêwirin û bi hev re bigihîjin netîceyekê. Paşê jî civîneke mezin, bi beşdariya hemû kovar û rojnameyên kurdî, yên li her derên cîhanê, divê li dar bikeve û ji bo rastbikaranîna zimanê kurdî berbihevhatinek çêbibe.

Yê me, wek kovara NÛDEM, heya wê çaxê em ê giraniyê bidin ser rêziman û rastnivîsandina Celadet Bedir-Xan. Lê em ê heya demeke dirêj jî nikaribin zimanê kovarê standart bikin, ji ber ku nivîskarên me ji her cih û deverên Kurdistanê û cîhanê ne. Digel vê jî, em ji bo avakirina zimanekî standart bi şev û roj dixebitin û li ber xwe didin. Divê em destên xwe dirêjî hev bikin, bi hev re bixebirin û zimanekî şêrîn û delal ji zarokên xwe re diyarî bikin. Ew zarokên ku hêviyên pêşeroja me ne, avakerên civaka me ya jihevdeketî ne, mêrxasên bipaşdestandina rûmeta me ne...

DIVÊ EM EDEBIYATEKE KURDÎ YA NETEWEYÎ BIAFIRÎNIN

Li serbajarê Swêdê, li Stockholmê paneleke edebiyata kurdî ji aliyê Yekîtiya Rewşenbîrên Kurdistanê ve hatibû lidarxistin. Panel ji aliyê Şerefxan Cizîrî ve hate îdarekirin û beşdarên panelê jî Rohat, Mehfûz Mayî, Mehmed Uzun û ez bûm. Ev celebpanel ji bo kurdên Kurdistana Tirkiyeyê hem nû ye, hem jî nûyîtiyek e. Heta niha bêhejmar civîn, semîner û panelên siyasî çêbûne, lê semîner û panelên edebî gelekî bi sînor in. Ji xwe berî 1980'ê çi bigire ne mumkun bû. Di van deh-panzdeh salên dawî de, bi xwehesîna rewşenbîrên kurdan, di ziman û edebiyata kurdî de jî liv û tevgerek çêbûye. Rojnameyên hefteyî yên xwerû bi kurdî, kovarên edebî û çandî û nivîskariya kurdî êdî ji me re ne mîna xewnekê, lê rastiyek e. Gava di vê beşa jiyana me ya jibîrkirî de liv û tevger çêdibe, bal û meyla xelkê me jî ji vê yekê re çê dibin. Gava mirovên me bi zimanê xwe tiştekî spehî dixwînin, hezkirin û evîna wan ji zimanê wan re çêdibe, ew bal û meyla xwe berdidin ser kovar û rojnameyên xwe, nêzîkahiyê li şaîr û nivîskarên xwe dikin. Ev yeka ha, gorî hevalên nivîskar yên Kurdistana Federe ku behs dikin, li ba wan gelekî eşkere û vekirî ye. Kovarên edebî bi deh hezaran difroşin, pirtûkên kurdî bi hezaran û dîsan bi sedan û bi hezaran beşdariya semîner û panelên edebî têne kirin. Lê ev ji bo me kurdên Tirkiyeyê hê nû ye. Herçiqas kovar û rojnameyên me zêde neyên firotin jî, pirtûkên me zêde neyên xwendin jî, semîner û panelên me yên edebî ne ewçend balkêş bin jî, dîsan ji bo me demeke nû dest pê kiriye. Em di destpêka ronesansekê de ne. Şewq û tîrêjên hêviya ilim û zanebûnê, li

axa welatê me ya bi ber geş dibe. Ev yeka ha dilê me şa dike, hêviya me ya ku heye xurttir dike.

Di panela me ya Stockholmê de, ji ber gelek sedeman, digel ku beşdarên panelê ne ewçend pirr bûn jî, dîsan li gor nêrîna min û ya hevalên din panel baş û bi serfirazî derbas bû. Digel ku hem hevalên beşdarên panelê, hem jî hevalên guhdar di aliyê îdeolojî de ne mîna hevdu difikirîn, panel bi rexne û munaqeşeyan di hewayeke gelek demokratîk de bihurî. Vê yeka han jî nîşan da, ku divê em ji danûstandin, diyalog û hevkariyê nerevin. Ger em ji van birevin, em ê her tim hevdu şaş fêhm bikin, hevduşaşfêhmkirina me jî wê bibe sedemên gelek kirin û bûyerên neyînî.

Wek me got, sohbet û munaqeşeyên siyasî di nav me de gelekî dibin. Jiyana me bi xwe siyaset e. Tu sohbet, gotûbêj û hevdudîtinên me bêî vekirina mijara siyasî derbas nabin. Û divê wilo be jî. Ji ber ku rewşa em tê de ne rewşeke kambax e, divê her li ser bête peyivandin, rê û metodên azadî û rizgariyê bêne munaqeşekirin. Lê divê ev neyê wê maneyê ku em hêlên din ên civaka xwe ji bîr bikin. Civaka me ya kurdî mîna hemû civakên dinyayê xwedî kultur, ziman, edebiyat û huner e. Xwedî pirtûk e. Herçiqas ji ber sedemên xuyayî ve ev bi pêşde neketibin jî, yên ku civakekê digihîne dereca netewetiyê ev in. Bêî van civat xav e, nê şên e, hov e. Ev xeml û xêza civatekê ne.

Herçiqas bi derengî be jî dîsan em dibînin ku îro meyleke baş li ser ziman, edebiyat, huner û her celeb çanda kurdî heye. Gava meyl û heweseke wilo çêbibe, zimanê kurdî bi awayekî nûjen têkeve warê nivîsandinê, edebiyateke kurdî pêk were, ew ê li ser wê edebiyatê hewcedariya sohbet û munaqeşan jî were holê. Sohbet, munaqeşe û rexneyên di vî warî de wê bibe hîmê bipêşdexistina ziman û edebiyata kurdî. Ew ê edebiyata kurdî qeyd û merbendên xwe bişikîne û wê bixwaze bi lez xwe bigihîne edebiyata cîhanê ya nûdem.

Dîroka huner û edebiyatê gelekî kevin û dûdirêj e. Ger em edebiyata devkî ya Babîlonan û Misriyan ku bi kêmanî berî zayina Îsa bi 3000 sal in, nehesibînin, ya nivîskî bi sedsalan berî zayina Îsa, li Yunana Antîk bi Homeros dest pê kiriye. Herdu eposên Homeros yên navdar; Îliaden û Odyssé ku bi texmînî berî Îsa bi 700-800 salî ne, îro jî aktuel in, li seranserî dinyayê rewşenbîrên ku wan bi zewq û best nexwînin tune ne. Herweha Oidupusa Sofokles ku bi kêmanî berî niha bi 2450 salî hatiye nivîsandin, îro jî li ser dik û sahneyên dinyayê tête leyistin û bi çepikên temaşevanan ji nû ve jîndar dibe. Dîsan Euripides, Aristofanes, Sapho yên wê demê ne. Ev tevgera huner û edebiyatê ya gurr ya Yunana Antîk piştî demekê dipijiqe Romayê û nivîskar û fîlosofên mîna Vergilius, Cattulus, Horatius, Ovidius, Cicero û hwd. digihîne. Herweha ev yeka bi pêşketina civakê re bi pêş dikeve, di demên cihê cihê de bi nav û nêrînên cihê cihê derdikevine pêş me. Tevgera huner û edebiyatê ya ku ji ber sedemên dînî çendsedsalekî bêdeng mabû, di salên 1300'î de bi destpêka ronesansa Îtalî, dîsan meyl û heweseke xurt ji huner û edebiyata antîk re çêdibe û ew meyl û hewesa ha dibe destpêka li hemberderketina forma jiyanê ya dêrên katolîk. Bi vê jinûvezayinê zincîrên dîlîtiyê yên salan têne şikandin û mirov li celebekî jiyana azad û xweser digere. Humanîzma ku zaroka ronesansê ye, di kurtemekê de li hemû Welatên Ewrûpayê belav dibe, nivîskar û hunermend ji bo azadî û humanîzmayê bi dengên bilind bang dikin. Ew êdî bêtirs havênê zarokên fenteziyên xwe di serê xwe de dimeyinin û bi serbestî û azadî tevdigerin. Bê şik ji bo şikandina wê zincîra zingargirtî gelek jan û êş jî têne kişandin. Mîna ku di dema Antîk de bûye, di demên din de jî li Ewrûpa cihê huner û edebiyatê her tim bilind hatiye girtin. Paşê bi pêşkerina civakê û bi guhertinên demê re, huner û edebiyat di bin nav û tevgerên cihê, mîna; Klasizm, romantîzm, realizm, naturalizm û hwd, derketiye. Ji bilî van navan jî ji

ansîklopedîstan bigire heta futurist û dadaistan hunermend û nivîskaran mohrên xwe li dîroka huner û edebiyatê xistine.

Lê ji ber sedemên xuyayî ve, me nikanîbûye cihên xwe di nava tevgerên huner û edebiyatê de bigirin, xwe têxin kategoriya tevgereke edebî. Ji ber ku heta niha ji edebiyata me ya klasîk pê ve, edebiyateke me ya nûdem çênebûye. Ji ber ku edebiyat tunebû, munaqeşe, sohbet, an jî rexneyên edebî jî tunebûn. Serdestan tu caran mecal nedane me ku em li zimanê xwe hûr bibin, bi zimanê xwe edebiyateke bedew a nûjen biafirînin.

Îro ji bo me demeke nû dest pê kiriye. Divê em vê firsendê nerevînin, serê xwe zêde bi edebiyata partî, an jî edebiyata sinifekê ve neêşînin, em edebiyateke kurdî biafirînin. Edebiyata neteweya kurd... Da sibe ev edebiyata me sînorên xwe gav bike û bibe gerdûnî.

Welat

EM HEWCEDARÎ ROJNAMEYEKE KURDÎ YA ROJANE NE

Bêşik e, ku di dîrokê de ev cara yekemîn e, li bakurê welêt rojnameyeke rojane ya bi tirkî ji aliyê kurdan ve tête derxistin. Derxistina rojnameyeke rojane ne hêsan e; lê ji bo kurdan pêwîstiyeke bingehîn e. Loma divê kurd rojnameya xwe mîna çavên xwe biparêzin. Rojnameyeke wilo, ku bi hezar zehmetî û fedekariyan derdikeve, divê bibe dengê hemû kurdan, bibe dengê gelê Kurd. Divê hemêza wê ji hemû kurdan re vekirî be, li hemû kurdan xwedî derkeve û divê hemû kurd jî wê hemêz bikin û li wê xwedî derkevin. Xebat û hevkariya kurdan ya bi hev re tu caran ne li dijî fêda gelê kurd e, berevajiya wê, ew hêvî û moral dide gel, pişta wî qewîn dike, hêviya pêşerojeke xweş didiyê. Çi cara ku pêşengên gelê kurd ber bi hev hatine, hêvî û baweriya gel xurt bûye. Û çi cara pêşengên gel ji hev bi dûr ketine, ewrekî reş yê şînê xwe berdaye ser welatê kurdan, hêviya wan çilmisandiye, jiyan li wan herimandiye.

Kê bi çi awayî nerazîbûna xwe ya li dijî dewletê anîbe ziman, kî bi çi awayî li dijî dewletê derketibe, kê bi çi awayî ji bo bidestxistina mafên gelê kurd têkoşîn dabe, dewlet hera niha bi eynî metodên nemirovane çûye ser wan, ji bo tefandin û ji navêrakirina wan tiştên jê hatiye kiriye. Loma jî divê kurd hemû, nêrînên wan çi dibin bila bibin, ji bo doza gelê kurd, ji bo bidestxistina mafên gelê kurd, ji bo ji navêrakirina stemkarî û hovîtiya biyaniyan ya li ser gel û welatê xwe, ber bi hev werin, destên xwe dirêjî hev bikin, dilên xwe, yên ku ji bo eynî dozê lêdixin, ji hev re vekin, ji bo gelê xwe bibin hêviya pêşerojeke rohnî .

Berbihevhatin û hevkariya kurdan ya bi hev re destpêka pêkanîna neteweya wan û herweha destpêka bidestxistina nasnavê û bi rûmet û serbilindî jiyana wan e. Divê em êdî li benda sibehê ranewestin, tiştên ku divên îro bêne kirin, divê em îro bikin, an na wê gelek tişt ji van hêjayên neteweya me winda bibin û bi windabûna van hêjayan em ê di rojên pêş de gelek zehmetî bibînin û heye ku em nikaribin van hêjayan dîsan bi dest bixînin û neteweyeke handîkap bimînin. Digel ku em pirr dereng mane jî, dîsan divê em îro bi lez dest biavêjin avakirina enstîtu, akademî û sazgehên nereweyî, yên ku bi xebatên zanistî û kolektîv, bikaribin birînên neteweya me ya nexweş derman bikin, civaka me ya jihevdeketî ji nû ve vejînin, pişta gelê me ya tewiyayî rast bikin, serê me yê berjêr bilind bikin. Kilîta vê yeka han ziman e. Ziman yek ji nîşanên pêkhatina neteweyekê ye û ji bo kurdan belkî ya herî girîng e jî. Folklor, edebiyat, kultur û her danûstandinê civakekê li ser zimên û ji zimên ava bûne. Bêî wan pêkhatina neteweyekê ne mumkun e. Ev navgîna herî girîng ya bingehê pêkanîna neteweya me li ber mirinê ye. Bi mirina zimanê kurdî ew ê kultura kurdî jî ji navê tabe; bi jinavêtabûna kultura kurdî re ew ê neteweya kurd jî hêdî hêdî ji hev bifeşkile û ne dûr e aqûbeta ku hatiye serê cîranên me asûriyan were serê me jî. Ji ber vê yekê divê em zimanê xwe û rola wî ya ji bo hebûn û rûmeta xwe, ji bîr nekin, pê bipeyivin, pê binivîsînin, pê bixwînin. Ji ber ku zimanê me hebûna me ye, em bi zimanê xwe hene. Gelo ma îro zimanê me ji navê tabe, çi ferqa me û cîranên me tirk, faris û ereban dimîne? Rengê me, dînê me, xwarina me, av û hewa me yek e. Ziman me ji hev vediqetîne û bi zimên em her yek dibine neteweyek. Yê ku zimanê wî here, ew jî dihare. Di malê de bi kîjan zimanî were peyivandin, li wê malê kultura wî zimanî di giraniyê de ye. Sed heyf û mixabin, ku li Tirkiyeyê bi milyonan kurdên me asîmîle bûne, winda bûne, bûne tirk, hin bi wê jî nayêne ser, vêca kurdan jî înkar di-

kin. Ma îro gelek ji parlementer û wezîrên Tirkiyeyê ne wilo ne?

Ez bi xemgînî dibêjim, ku îro li Tirkiyeyê û li bakurê Kurdistanê zimanê kurdî bi tenê zimanê gundiyan, zimanê nezan û cahîlan maye. Yên ku îro li Tirkiyeyê bi kurdî dipeyivin gundî ne, nexwendî ne, barkêş û belengaz in. Yên ku hebekî hal û wextê wan xweş dibin, yên ku li bajaran an jî li bajarên mezin bi cih dibin, yên ku dibistanên bilind dixwînin, an jî dibin entelektuel dev ji kurdî berdidin, hin ji wan zimanê kurdî zimanekî li paş mayî û jar dibînin, gelek ji wan jî li xwe danaynin bi vî zimanê xweş û şêrîn bipeyivin.

Zimanê kurdî ne bi qasî ku têtе texmînkirin jar û li paş e. Zimanê kurdî digel ku bi fermî nehatiye bikaranîn jî, dîsan ne kêmî gelek zimanên herêmê ye. Zimanê kurdî zimanekî kevin, xwediyê dîrokeke dûr û dirêj e. Bi vî zimanî berhemên ku dikare bi edebiyata dinyayê re qayişê bikişîne hatine nivîsandin û îro jî digel pirr astengiyan têne nivîsandin. Şîrên ku Eliyê Herîrî berî niha bi nehsed-hezar salî bi kurdî nivîsandine, îro jî bêî ku mirov tu zehmetiyan bikişîne, mirov bi hêsanî ji wan tê digihê. Kêm berhemên gel û miletên din yên evqasî kevin hene ku mirov bêî alîkariya ferhengan bikaribe jê têbigihê. Ev yeka han jî zeximbûn û esilbûna zimanê kurdî bi me dide zanîn. Lê ger em îro bi xurtî li vî zimanî xwedî dernekevin, ne dûr e ku pêşketina îndustrî û teknolojiyê dawiya jiyana vî zimanî bîne. Ew ê ji aliyekî ji ber zor û zulmdariya sazûmana Tirkiye, ji aliyekî jî ji ber ramana enternasyonalîstiya çepîtiya nedurust be, ku îro xwende û entelektuelên kurdan li Tirkiyeyê ji zimanê xwe bi dûr ketine û hin ji wan mijûlbûna bi ziman û edebiyata kurdî ramaneke paşverû û kevneperest dibînin. An jî bi tirkî peyivandin, bi tirkî nivîsandin û celebê jiyana tirkan ji xwe re mînakgirtin weke nîşanên nûjentiyê dibînin. Kurdên li derveyî welêt ev zincîra kirêt qetandine û xwe ji wê ramana kufukgirtî azad kirine. Ji kurdên li derveyî welêt jî, nemaze kurdên li Swêdê gaveke baş avêtine. Di vê civaka ku yek ji civakên

dinyayê ya herî li pêş e, kurdan nasnava xwe bi dest xistine, ji dîndaran bigirin heta bi nasyonalîst û komunîstan kurd li zimanê xwe hûr bûne, bi folklor, edebiyat û kultura kurdî daketine. Berhemê vê xebata han bûye bi dehan kovar û rojname; bi sedan pirtûk û nivîskar û bi hezaran jî xwendevan. Di demeke wilo kurt de, bi hezaran kîlometre ji welêt dûr, zimanekî kurdî yê standart ava dibe, dibe ekolek û dikeve dîroka me. Avakirina zimanê standart, bal û meyla xwendin û nivîsandinê bi riya çapemanî û weşanên kurdî çê dibe. Ma gelo kirina vê yeka han li Tirkiyeyê jî ne mumkun e? Ma ne şerm e ku em îro nikarin li Tirkiyeyê du kovarên bi kurdî, çar rojnameyên bi kurdî derxin? Em ê bêjin dewlet zulmdar e, rê nade, em nikarin; lê ne rast e, ger fikra xwestinê hebe, wê bibe! Em ji çapemaniya kurdan dixwînin, ku weşanên bi kurdî nayêne firotin û gelek weşanxaneyên kurdan mecbûr mane deriyên weşanxaneyên xwe girtine. Ma gelo ji bo ku ev zimanê ku bi fermî heftê sal in qedexe ye, bête xwendin, em çi dikin?

Erê xwişk û birano, bersiva van hemûyan û bersiva gelek tiştên din jî rojnameyeke rojane ya xwerû bi kurdî ye. Rojnameyeke kurdî ya milî ye. Gelê me îro hewcedarî rojnameyeke bi vî celebî ye. Loma jî divê nêrînên me çi dibin bila bibin, em li ser hîmê fêda gelê xwe, ji bo rastîkirina vê xewna han werin ba hev. Rojnameyeke rojane ya bi kurdî wê zimanê me bi me şêrîn bike, wê me bajo ser edebiyat û kultura me, wê nasnava me bi dest me bixîne û wê hew kes bikaribin vî zimanê me yê şêrîn ji me bistînin.

Êdî sebra min nema ye, ez dixwazim her sibeh bi vexwarina qehweya xwe re rojnameya xwe ya bi kurdî jî bixwînim.

Rojnameya Welat

ÇÎROKA KURMANCÎ DI KOVARÊN HAWAR, RONAHÎ Û ROJA NÛ DE

Avakirina Cumhûriyeta Tirkiyeyê, dibe destpêka qirkirin û bendkirina ziman û edebiyata kurdî. Şîîra kurdî ya xurt ku ji tradisyona medreseyan dihat, bi avakirina Cumhûriyetê re diçilmise, piştî demekê dimiçiqe û reheke gelê kurd diqete. Ev reha edebiyatê ku pê giyanê mirovan şa dibe, ji kurdan tê birrîn, zimanê kurdî fermî tête qedexekirin, kultur û edebiyata kurdî tête înkarkirin. Di bin sazûmaneke weha hovane de, bi zimanekî qedexekirî, geşkirina edebiyatekê ne mumkun e. Ne bi tenê çîrok, lê em di şaxên edebiyatê yên din de jî tu tevgerê nabînin. Ji avakirina Cumhûriyetê û heta salên heftê û heştê em bi tenê dikarin çend navan bihejmêrin ku xwestine ji ziman û edebiyata kurdî re tiştekî bikin, an jî du kevir ji bo edebiyata kurdî danîne ser hev. Hin ji van navan Mûsa Anter, Edîp Karahan, Faîk Bûcak, Kemal Badilî, Mehmed Emîn Bozarslan û çendên din in. Ji van navan jî Kemal Badilî li ser gramerê, Mûsa Anter li ser ferheng û piyesê, Faîk Bûcak li ser helbestê, Mehmed Emîn Bozarslan li ser ziman û kurteçîrokê xebitî ye. Em dibînin di dîrokeke heftê salane de, li Tirkiyeyê bi tenê pirtûkeke çîrokan derdikeve. Ew jî ya Mehmed Emîn Bozarslan ya bi navê *Meyro* ye. Ji bilî pirtûka Bozarslan, hin şîîr û serpêhatî di hin kovar û rojnameyên kurdan de derketine.

Di sala 1980'ê de li Tirkiyeyê kovareke hunerî, edebî û çandî bi navê *Tîrêj* dest bi weşanê dike. Di vê kovarê de digel helbest û nivîsên edebî, çend çîrokên Rojen Barnas yên di bin navê Filît Totanî de, çîrokeke M. Elî bi navê Diz û hin çîrokên bi dimilî jî hatine be-

lavkirin. Ev kovar jî bi tenê du-sê hejmarên wê li Tirkiyeyê derdikeve, piştî hatina cûntaya heştêyî ew jî mecbûr dimîne ku derkeve derveyî welêt û li derveyî welêt jî dawiya vê kovarê tê.

Ji xwe, ji bo zaravayê kurmancî û bi giştî kurdên Tirkiyeyê, derketina wan ya derveyî welêt dibe destpêka bidestxistina zimanê kurdî û bi vî zimanî avakirina edebiyateke kurdî ya nû. Di dîroka Kurdistanê de, du deman mohra xwe li geşkirina ziman û edebiyata kurdî xistine. Yek jê, mîna me got, nivşê ku ji ber cûntayê xwe dane alî û li Swêdê bi cih bûye, nivşê din jî bazdayên Sûriyê ne. Ev du ekolên ku hêvî dane ziman û edebiyata kurdî, ne bi tenê di warê nivîsandina çîrokan de, herweha di warê ziman, siyaset, werger, dîrok û hwd. din de jî xwediyên rolên berbiçav in. Em ê zêde li ser nivşê Swêdê nesekinin û zû derbasî salên sihî û kovarên Hawar, Ronahî û Roja Nû bibin; wan tev bidin, di nava rûpelên wan de li kurteçîrok û nivîskarên wan bigerin û bi çend gotinan rola malbata Bedirxaniyan bînin ziman.

Bêşik di dîroka rewşenbîrî û hişyariya gelê kurd de rola malbata Bedir-Xaniyan mezin e. Ger em Bedir-Xaniyên ku di nava asîmîlasiyona Cumhûriyetê û Kemalîzmê de heliyane, nehesibînin, bi qasî ku dîroka rewşenbîrî û çapemeniyê bi Bedir-Xaniyan dest pê kiriye, wilo jî heta dîrokeke nêzîk bi wan berdewam kiriye.

Li Şamê û li Lubnanê çar kovarên bi kurdî derdiketin. Kovara pêşî "Hawar" ku di bin xwedîtî û berpirsiyariya Celadet Bedir-Xan de derketiye, ya ji bo dîroka ziman û edebiyata kurdî herî bingeh e. Di vê kovarê de, cara pêşî alfabeya kurdî ya bi tîpên latînî tête bi kar anîn û cara pêşî kovareke xwerû bi kurdî; kulturî û edebî derdikeve. Ji sala 1932 û heta 1943'an 57 hejmarên vê kovarê derdikeve. Ji sala 1942 û heta 1945'an, kovareke din "Ronahî" di bin xwedîtî û berpirsiyariya Celadet Bedir-Xan de derdikeve. Di vê kovara ku gelekî cih dide nûçeyên şerê cîhanê yê duwemîn de, gelek nivîsên

folklorî, dîrokî, kulturî û edebî jî hene. Ev kovar jî 28 hejmar derdikeve. Kovareke din "Roja Nû" ku bi celebê magazîn derdikeve û ew jî digel nivîsên kulturî û edebî, pir cih dide nûçeyên şer û hêzên yekbûyî, di bin berpirsiyariya Kamuran Bedir-Xan de, li Bêrûdê derdikeve. Ev kovara ku hefteyî derdiket, ji sala 1943 heta 1946'an 73 hejmar derketine. Dîsan kovarek din bi navê "Stêr" di bin berpirsiyariya Kamuran Bedir-Xan de li Bêrûdê derketiye û bi tenê du hejmarên wê di destên me de hene.

Mîna ku me di destpêkê de got, dîroka edebiyata kurdî ya modern bi kovara Hawarê dest pê dike.

Serîhildana Şêx Seîd têk çûye, Agirî vemirî ye, yek ji endam û birêvebirên Xoybûnê Celadet Bedir-Xan destên xwe ji siyasetê kişandiye û xwe bi hemû hêza xwe avêtiye meydana kultur, ziman û edebiyata kurdî. Lê mixabin, mîna gelek pêşiyên xwe ew jî ne li welatê xwe ye, li sirgûnê ye, li Şamê ye. Şam di wan salan de dibe cihê hevdudîtina kurdên bazdayî. Piraniya van kurdên bazdayî ji malmezinên kurdan in; Mîr in, arîstokrat in, axa ne, beg in... Lê welathez û miletperwer in.

Gava Mîr Celadet di sala 1932'an de dest bi weşandina kovara Hawarê dike, ew weha dibêje: "*Hawar ji niha û pê ve bi her tiştên ku kurdanî û kurdîtî pê bendewar e, dê mijû bibe. Tinê siyaset jê dûr e, xwe naêxe siyasetê.*"

Û Hawar li biyanîstanê dest bi weşana xwe dike. Ew ji siyaseta grûbî dûr e, Kurdîstanî ye, armanca wê vejandina zimanê kurdî, avakirina edebiyata kurdî ye. Ew ji hejmara yekê heta hejmara dawî wê politîkaya xwe ya Kurdistanî û lîberal dimeşîne. Ew bi laş û gewdê xwe ve bi kultura kurdî û kurdayetiyê ve girêdayî ye, bi wê riyê dixwaze deriyê kultura kurdî ji cîhanê re jî veke, an jî pirekê di navbera kultura kurdî û ya cîhanî de ava bike. Ew bi hevalbendên xwe yên din re, li ser stranên folklorîk, klasîkên kurdî, efsane û destanên

kurdî, dersên gramerê, werger û çîroka hunerî û hwd dixebitin.

Berî salên sihî çîroka kurmancî ya hunerî hatiye nivîsandin an na, haya min zêde jê tune ye. Bi tenê çîrokeke Fûadê Temo di sala 1913'an de di kovara Rojî Kurd e belav dibe. Lê belê çîroka kurmancî ya hunerî bêtir bi weşana kovara Hawarê ve dest bi şexsiyetekê dike û hêdî hêdî di kovarên mîna Ronahî û Roja Nû de jî berdewam dike.

Gava em her sê çar kovaran bi hev re bigirin, (1932-1946) ji aliyê heft-heşt nivîskaran ve bi qasî 187 kurteçîrok hatine nivîsandin. Ji van 187 kurteçîrokan 15-20 heb jê ji zimanên cihê cihê hatine wergerandin û adaptasiyon in, hinekên wan çîrokên folklorî ne, lê nêzîkî sedî jî çîrokên hunerî ne.

Herçiqas ji ber zimanzanî û pirhêliya Celadet Bedir-Xan çîroknivîskariya wî zêde dernakeve pêş jî, dîsan em dibînin yê ku di kovarên Hawar û Ronahiyê de bêtir çîrok nivîsandine Celadet Bedir-Xan e. Celadet Bedir-Xan li ser hev 40-50 çîrok nivîsandine. Ji van çîrokan hejmareke biçûk çîrokên folklorî ne, hin ji wan werger in, lê piraniya wan çîrokên hunerî ne.

Herçî birayê biçûk Kamuran Bedir-Xan e, ne bi qasî kekê Xwe Celadet Beg be jî, wî jî gelek çîrok nivîsandine. Hejmara çîrokên Kamuran Bedir-Xan yên di kovarên Hawar û Roja Nû de 17 ne. Çawan mîna ku em çîrokên Celadet Bedir-Xan di kovara Roja Nû de nabînin, em çîrokên Kamuran Beg jî di kovara Ronahiyê de nabînin.

Ji bilî herdu biran, çend kesên din hene ku gihîştine refê Hawarê û çîroknivîskarên baş in . Yek ji van Nûredîn Zaza ye, ku bi zaroktiya xwe koçî Sûriyê kiriye û bûye yek ji nivîskarên Hawarê yê herî xort. Em Nûredîn Zaza bi tenê di kovara Hawarê de dibînin, yanî ew di kovarên Ronahî, Roja Nû û Stêrê de tuneye. Herçiqas Nûredîn Zaza ji gelek nivîskarên ekola Şamê kêmtir çîrok nivîsandibin jî,

dîsan ew mîna çîroknivîs yê herî li pêş e. Dibe ku, ev yeka han jî ji ber pesindayina Celadet Bedir-Xan be, an jî ji ber ciwanî û zîrektiya Nûredîn Zaza bi xwe be. Tê gotin ku Celadet Bedir-Xan ew bi Çexovê kurdan dinavand. Digel werger û adaptasiyonên xwe, Nûredîn Zaza di bin navê Nûredîn Ûsiv û Nûredîn Zaza de deh çîrok nivîsandine.

Nivîskarekî din ku bi hîmavêjê şiîra kurmancî ya modern tê naskirin jî, Qedrî Can e. Qedrî Can di dema ku nezanî û nexwendinî li Kurdistanê hakim bû, ew mamoste bû. Mamoste Qedrî Can digel helbestên nûjen, di kovarên Hawar, Ronahî û Roja Nû de 10 kurteçîrok nivîsandine.

Nivîskarekî din î zîrek bi navê Bişarê Segman heye ku em wî hem mîna çîroknivîskarekî hemdemî, hem jî mîna wergêr di nava rûpelên wan kovaran de dibînin. Zimanê wî û celebê wî yê nivîsandinê gelekî dişibe yê Celadet Bedir-Xan, lê heta niha ez li lêkolînerekî kurd rast nehatime ku bibêje Bişarê Segman jî Celadet Bedir-Xan e.

Gava rehmetiyê Mihemed Bekir, di pêşgotina çapa Hawarê ya nû (Hej. 1-9) de navê Celadet Bedir-Xan yên cûda dihejmêre, ew van navên han dihejmêre.

Herekol Azîzan, Xweyiyê Hawarê, Hawar, Stranvan, Stranvanê Hawarê, Bavê Cemşîd, Bavê Cemşîd û Sînem.

Lê em dizanin ji bilî van navan jî Celadet Bedir-Xan bi navê çîrokbêj û Seydayê Gerok jî gelek nivîs nivîsandine. Lê herçawan be, di van kovaran de, di bin navê Bişarê Segman de 10 kurteçîrok hatine nivîsandin.

Çîroknivîskarekî din heye, ku em wî ne di Hawarê de, ne jî di Ronahiyê de nabînin, lê ew di Roja Nû de derdikeve pêşberî me. Ew jî bi navê Silêmanê Hesenê Mercî ye û wî jî 10 çîrok nivîsandine.

Osman Sebrî ku yek ji nivîskar û hevkarên Hawarê yê aktîv e, di-

gel nivîsandina şiîr, nivîsên civakî û dîrokî, di kovarên Hawar û Ronahî de 12 çîrok jî nivîsandine.

Nivîskarekî din bi navê Mistefa Ehmed Botî heye ku bi tenê di Hawarê de nivîsandiye û 6 çîrok nivîsandine.

Jê pê ve em li hin çîroknivîskaran rast tên ku bi tenê çîrokek an du-sê çîrok nivîsandine û nivîskariyeke berdewam nekirine. Hin ji wan navan jî ev in; Cemîlê Haco, Sibhiyê Diyarbekirî, Fûad Cemîl Paşa, Hesenê Hişyar, Namî, Sebrî Birahîm, Emayê Cilînî û hinin din in.

Ez dixwazim qet nebe navê çîrokên ku me hejmara wan dane bînim ziman û bi kurtî behsa naveroka hinan ji wan bikin.

Em ji çîrokên Celadet Bedir-Xan yên di Hawarê de dest pê bikin û bi dorê pê de biçin:

1) Ber Tevna Mehfûrê, hej. 4, 1932.
2) Mar û Mirov, hej. 6, 1932.
3) Dîk û Rovî, hej. 6, 1932.
4) Şîrîniya Zimanê Kurdî, hej. 8, 1932.
5) Çîroka Bîngolê, hej. 11, 1932.
6) Siyabendê Silîvî, hej. 11, 1932.
7) Biyaniyekî Çi Dîtine, hej. 19, 1932.
8) Xurtiya Binahînê, hej. 20, 1932.
9) Elyas Efendî, hej. 21, 1933
10) Ehmedê Zeydan, hej. 26, 1935
11) Çîrokeke Misra Kevin, hej. 56, 1943

Çîrokên Celadet Bedir-Xan yên ku di Ronahiyê de belav bûne jî hin ji wan ev in:

1) Maçeke Dirankêr û Cezayê Wê, hej. 6, 1942

2) Daweta Kêzê, hej. 7, 1942
3) Ji ê Mêrtir Re, hej. 8, 1942
4) Xwe Kuşt An Hate Kuştin, 1942
5) Maçikên Ku Mirov Pê Dinivistin, 1943
6) Çîroka Seyên Birîndar, hej. 12, 1943
7) Tîmsahê Hefttilî, hej. 16, 1943
8) Şêro û Pîvaz, hej. 18, 1943
9) Jin Jî Hene Jinkok Jî Hene, hej. 19, 1943
10) Cihû û Kurê Têcir, hej. 21, 1943
11) Çûk û Pîrê, hej. 22, 1944
12) Ehmed Çelebî, hej. 17, 1943

Çîrokên Kamûran Bedir-Xan yên ku di Hawarê de hatine weşandin:

1) Du Egîd, hej. 2, 1932
2) Lawikê Min, hej. 4, 1932
3) Dildiziya Gulekê, hej. 5, 1932
4) Mîr û Mar, hej. 9, 1932
5) Mîr û Keşe, hej. 9, 1932
6) Leylana Rastiyê, hej. 10, 1932
7) Mîr û Gund, hej. 10, 1932
8) Ker, Gur û Rêvî, hej. 12, 1933
9) Du Dengbêj, hej. 20, 1933
10) Eyloyê Pîr, hej. 21, 1933
11) Nivîsevan, hej. 22, 1933
12) Koçera Mîran, hej. 26, 1935

Çîrokên Kamûran Bedir-Xan yên di Roja Nû de:

1) Du Nêçîrvan, hej. 17, 1944
2) Pîra Sihêrdar, hej. 45, 1944
3) Ez Jî Ji Cehenemê Têm, hej. 55, 1945
4) Kew û Rovî, hej. 55, 1945
5) Mela û Gundî, hej. 55, 1945
6) Şirîkahiya Dîk û Rovî, hej. 55, 1945
7) Hekîm û Sê Keçik, hej. 56, 1945

Çîroknivîskarê sêyem Nûredîn Zaza ye ku me vê biharê berhevoka çîrokên wî di nava Weşanên Nûdemê de derxistiye. Tevî werger û adaptasiyonan Nûredîn Zaza di bin navê Nûredîn Ûsiv de, bi tenê di kovara Hawarê de ev çîrokên han nivîsandine:

1) Xurşîd, hej. 27, 1941
2) Gulê, hej. 29, 1941
3) Keskesor, hej. 30, 1941
4) Ji Xortan Re, hej. 30, 1941
5) Şîretên Ehmedê Xanî, hej. 32, 1941
6) Perîşanî, hej. 35, 1941
7) Hevîna Perîxanê, hej. 37, 1941
8) Xatûn An Piling, hej. 44, 1942
9) Dê An Xûşk, hej. 44, 1942

Çîrokeke wî bi navê Şerê Mêşan jî di sala 1965'an de di kovara Hêviya Welêt, ku li Almanyayê derdiket de, hatiye weşandin.

Çîroknivîskarê çaran jî Qedrî Can e. Çîrokên Qedrî Can yên di kovara Hawarê de belav bûne, ev in:

1) Besreka Zêrîn, hej. 5, 1932
2) Sond, hej. 35, 1941
3) Guneh, hej. 39, 1941
4) Rojên Derbasbûyî, hej. 52, 1943

Çîrokên Qedrî Can yên di Ronahiyê de jî ev in:

1) Sehên Zozanan, hej. 14, 1943
2) Gulçîn, hej. 16, 1943
3) Nêçîra Berazan, hej. 28, 1945

Du çîrokên Qedrî Can jî di kovara Roja Nû de derketine. Yek ji van çîroka Nêçîra Berazan e, ku di hejmara Ronahî ya 28'an de weşiya bû, ya din jî çîrokeke bi navê Muhra Silêman e ku di hejmara Roja Nû ya 39'an, 1944'an de hatiye weşandin.

Navekî din ku ji aliyê raya giştî ya kurdan ve têtе zanîn jî Osman Sebrî ye. Osman Sebrî digel nivîsên li ser zimên, nivîsên siyasî û dîrokî, di Hawarê de 5 çîrok û di Ronahiyê de jî 7 çîrok nivîsandine.

Çîrokên wî yên di Hawarê de ev in:

1) Li Goristaneke Amedê, hej. 21, 1933
2) Nêçîra Hirçan, hej. 48, 1942
3) Warê Dil
4) Pîra Gêndêrê, hej. 52, 1943
5) Şeytan Qûnî, hej. 55, 1943

Çîrokên Osman Sebrî yên di Ronahiyê de:

1) Terşê Şevê, hej. 14, 1943

2) Seyê Ko Gur Tanî Fêza Pêz, hej. 15, 1943
3) Beraz û Berazî, hej. 16, 1943
4) Mijo û Xanê, hej. 17, 1943
5) Têrlan, hej. 20, 1943
6) Jîna Jinekê , hej. 21, 1943

Em ê niha jî bi kurtî ji her çîroknivîskarekî çîrokek-du çîrokan bidin naskirin da haya we ji naverok û stîla wan çêbibe.

Ji ber ku em di nivîsa li ser Nûredîn Zaza de li ser çîrokên wî rawestiyabûn, em ê di ser wî re gav bikin û ji Qedrî Can dest pê bikin. Qedrî Can ji Dêrika Çiyayê Mazî ye. Ew jî mîna Nûredîn Zaza bazdayî ye û li Şamê bi cih bûye. Qedrî Can yek ji hevkarên kovara Hawarê yê xwende bû. Di demeke ku nezanî û cehaletî li Kurdistanê hakim bû, Qedrî Can mamoste bû. Hingî, xatir û qîmetê mamosteyan di civatê de gelekî bilind dinate girtin. Mamoste neynika civatê ya pêşerojê bûn. Qedrî Canê bazdayî jî gihîştibû Celadet Beg û di kovara wî de yek ji nivîskarên berdewam bû. Ew ne mîna Nûredîn Zaza bi tenê nivîskarê Hawarê bû, wî herweha nivîskariya xwe di kovarên Ronahî û Roja Nû de jî berdewam kiriye. Ji xwe gava mirov rûpelên Hawarê di ser hev re diqulupîne û bala xwe didiyê, mirov dibîne ku Qedrî Can hem di destpêka Hawarê de yek ji nivîskarê wê ye, hem jî hê di salên sihî de çîrokên wî belav bûne. Lê tiştê ecêb, digel ku wî ji Nûredîn Zaza bêtir çîrok nivîsandine jî, dîsa mîna çîroknivîs ew weke Nûredîn Zaza zêde derneketiye pêş. Ev jî mumkun e ji pirhêliya wî tê. Ji ber ku ew di dema xwe de şaîrekî kurd î bijarte bû. Ew yek ji şaîrên kurd e ku deriyê şîîra modern li kurdan vekiriye. Hin kes îro wî mîna hîmavêjê şîîra kurmancî ya modern dibînin. Lê, mirov gelekî vekirî vê moderntiyê di çîrokên wî de jî dibîne. Wî di hemû çîrokên xwe de zimanekî zelal, stîleke hunerî û edebî bi kar aniye.

Em nizanin bê çîrokên Qedrî Can yên neçapkirî hene, an na, lê ger em li gora kovarên Hawar, Ronahî û Roja Nû biçin, em ê bibînin ku Qedrî Can li ser hev deh çîrokên hunerî belav kirine. Mijara piraniya kurteçîrokên wî li ser bêrîkirin, bîranîn û hevaltiyê ne. Naveroka wan ji propogandaya siyasî dûr e, wî zêde tiliya xwe daneniye ser pirsgirêkên siyasî, lê ji gelek çîrokên wî welathezî û kurdayetiyeke pak difûre.

Gava mirov ji çîroka yekê ve dest pê dike û ber bi ya herî dawiyê ve diçe, mirov bi rastî jî bêhna çîroknivîskarekî nûjen dike.

Ji bo çi vî şaîr û çîroknivîskarê me zêde nenivîsandiye û nebûye xwediyê berheman, eşkere û li ber çavan e. Ew jî dîsan bi rewşa kurdan ya kambax ve girêdayî ye. Cumhûriyet nû ava bûye. Serîhildanên kurdan ku piştî Cumhûriyetê bûne, ji aliyê tirkan ve bi hovîtî hatine pelçiqandin. Hejmara gundên şewitî, gundiyên kurdan yên kuştî bêhejmar in. Qedrî Can zarokê miletekî weha bêşans e. Hingî ne rojname, ne kovar, ne televizyon û ne jî xwendevan hebûne. Di nava hoyên ewqas xerab de û li sirgûnê berdewamiya nivîskariya bedew, ez bawer dikim wê ne ewçend hêsan be.

Em çîrokeke Qedrî Can ya pêşî di hejmara Hawarê ya yekê (1932) de dibînin. Ev çîroka zehf kurt pêşkêşî Osman Sebrî hatiye kirin. Nivîskar di vê kurteçîrokê de bi diyaloga bav û kurekî rewşa welêt û xwesteka azadkirina welêt bi xwendevanan dide zanîn.

Di hejmara Hawarê ya 5'an, 1932'an de bi navê Besreka Zêrîn çîrokeke wî heye. Ev çîroka han li ser tore û eşîrtiya kurdan e. Motîva çîrokê jin e. Mîrzoyê Burca Metînan, keça Meksoyê Mîrê Besreka Zêrîn ji xwe re dixwaze. Ji xwestinê wêdetir, ew dixwaze keçikê, yanî Pîrozê bi kotekî ji bavê wê bisrîne û bi wî awayî xurtbûn û otorîteya xwe bide nîşandan. Mîrzoyê Burca Metînan bi peyayên xwe ve bi ser Besreka Zêrîn ve digirin, Pîrozê bi kotekî ji bavê wê distînin û Besreka Zêrîn jî xerab û wêran dikin. Mîrzoyê Burca Me-

tînan bi wê kirinê, dibe xwediyê otorîteyê. Herçî Mîrê Besreka Zêrîn Mekso ye, ji ber vê binketinê debar nake, serê xwe li zinarekî dixe û dawiya jiyana xwe tîne.

Qedrî Can di vê kurteçîrokê de hunera bi celebê namê bi kar anîye.

Sond (1942), Hawar, hej. 35.

Sond di derheqa xwînbiratiyê de ye. Ev xwînbiratiya ku bi riya mêtina xwîna hevdu dibe, di nava gelek kulturan de heye. Bokeyê çîrokê zarok e, diçe dibistanê. Li dibistanê zarok xwîna hevdu dimêjin û dibin xwînbirayên hev. Bi wê yekê, birayê xurt birayê qels û jar diparêze. Egosentrîzma bokeyê çîrokê wî dajo ser xwînbiratiyê. Gava xwînbirayekî wî çêbibe, ew ê wî ji darên mamostê biparêze. Lê xwînbirayê wî yê bi navê Sindik, ne bi tenê wî ji darên mamostê diparêze, herweha rojekê dixwaze wî ji kûçikekî har jî biparêze. Lê Sindikê zarok ji ber pencên kûçikê har xelas nabe û dimire.

Guneh (1942) Hawar, hej. 39.

Bokeyên vê çîrokê jî zarok in. Çend heval diçin nêçîra çêlkewan. Şikeftên ku lê nêçîr têne kirin, cihên cin û pîrebokan in. Bokeyê çîrokê dixwaze mêraniya hevalekî xwe bi navê Cemo biceribîne. Ew xwe di şikeftê de vedişêre û pix dikiyê. Cemo ji tirsa dikeve û êdî zimanê wî nagere. Ev bûyera ku cinan li Cemo xistiye di nava gund de belav dibe. Çi bikin çi nekin, dê û bavê Cemo biryar didin ku Cemo bibin ba şêx, da şêx bi riya lêdana cinan, wî rehet bike. Heta ku ji Şêx Sedeqe tê, ew bi şiveke terr li Cemoyê zaro dixe. Bi lêdana Şêx ruh ji Cemo tête kişandin û Cemo di nava destên Şêx de can dide.

Digel ku bîst û çend salek jî di ser bûyerê re derbas dibe, bokeyê çîrokê wê bûyera trajîk ji bîr nake. Cemo jî her diçe xewna wî, li hemberî wî radiweste û jê re dibêje; bêbext... bêbext!...

Rojên Derbasbûyî (1943) Hawar, 52.

Rojên derbasbûyî serpêhatiya mamosteyekî ye, ku bi şîreta doktor, divê dev ji Amûdê berde û here Endîwerê. Cihguhertin bi mamoste zehmet tê, ew bi çavên tijî hêsir ji Amûdê derdikeve. Nivîskar di nava çîroka xwe de gotineke şaîrekî bi bîr tîne û çi bigire çîrokê li ser çend rêzên şaîr ava dike. Şaîrê navnediyar vê dibêje: "Gava meriv li cihekî dimîne, bi însan û axa wê derê ve bi benên nexuyayî tê girêdan, kînga meriv ji wir diçe, ev benê ha dilê meriv ber bi xwe ve dikişîne û diêşîne..."

Di piraniya çîrokên Qedrî Can de bêrîkirin û bîranîna rojên buhurî heye. Herweha ew bokeyên xwe ji jiyana rastî û ji zarokan hildibijêre. Wê ji ber karê wî yê mamostetiyê be ku zarokên ku ew dike mijara çîrokên xwe jî şagirtên dibistanê ne. Piraniya çîrokên wî bi forma kesê yekemîn hatina nivîsandin û motîvên wan ji civaka realîst in.

Celadet Bedir-Xan digel nivîsên din yên cûr be cûr, tibabek çîrok jî nivîsandine. Ji ber kêmbûna demê em ê bi tenê behsa du çîrokên wî bikin. Çîroka wî ya pêşî "Ber Tevna Mehfûrê" di kovara Hawarê (1932), hejmara 4'an de derketiye. Herçiqas ev çîroka wî di sala 1932'an de hatibe weşandin jî, di binê çîrokê de, 1927 hatiye nivîsandin. Yanî piştî serîhildan û têkçûna tevgera Şêx Seîd bi du salan e. Loma jî tesîra wê bûyera dîrokî gelekî li ser vê çîrokê heye. Bengî Axa bi lawê xwe yê mezin û bi pismamên xwe re di şerê ji bo azadiya welêt de şehîd dikevin. Qewîtiya Bengî Axa ew e ku lawê wî yê biçûk, Gefo bixwîne, zana bibe, bi zanebûn bide ser şopa wî û welatê xwe ji destên neyaran rizgar bike. Ew nebiserketina kurdan bi nezaniya wan ve girê dide.

Piştî mirina Bengî Axa malbat cihê xwe diguhêze. Loma jî rewşa malbatê ya aborî jî xerab bûye. Ji bo xwendina Gefo, karkirina herdu xwişkan, Rindê û Zîzê pêwîst e. Herdu keçikên zaro bêî westan dixebitin, dixwazin birakê wan bixwîne, bide ser şopa bavê wan û

ber bi azadiyê ve bimeşin. Herdu keçik, digel temenên xwe yên zaro, bîra kurdîtî û Kurdistanê dibin.

Mesaja Celadet beg di vê çîrokê de vekiriye. Mesaja wî bi zanebûn ji bo Kurdistanê xebatkirin e.

Celadet Beg di hejmara Hawarê ya 8'an de jî bi navê "Şêrîniya Zimanê Kurdî" serpêhatiyek nivîsandiye. Ew ji bo kirîna kaxezên Hawarê diçe Bêrûdê. Piştî salixdayineke tenik ya Meydana Burcê, ew dikeve nava pêla mirovan û dixwaze ber bi armanca xwe ve here. Ew şareza ye, xelkên her miletî, ji lixwekirin û devokên wan nas dike. Ew di nava wê pêla mirovan de pêrgî çend kurdan jî tê. Ew bangî kurdekî ji wan dike û ji bo hilgirtina kaxezên Hawarê wî bi xwe re dibe dikana kaxezan. Celadetê Mîr bi xortê barkêş re dikeve sohbeteke germ. Sohbeta wan li ser kurdan û zimanê kurdî ye. Gava xortê barkêş têdigihîje ku ew ji Bedir-Xaniyan e, pir kêfa wî tê, lêborînê dixwaze, radibe ser xwe û destê wî maçî dike.

Xortê barkêş pir kêfa xwe ji kurmanciya Mîrê xwe re rîne û dibêje: "*Ax, ez xulam, tu nizanî kurmancî çiqas şêrîn e!...*"

Celadet bi vê serpêhatiya xwe mesaja şêrîniya zimanê kurdî dide û kurdên ku ji zimanê xwe bi dûr ketine, teşwîqî fêrbûn û jêhezkirina zarê kurdî dike.

Piraniya çîrok û serpêhatiyên Celadet Bedir-Xan li ser rewşa kurdan e û di wan de mesajên bi giranî fêrbûna ilim, fêrbûna zimên, hezkirina folklor û kultura kurdî û bi erda welêt ve girêdan heye.

Mijarên çîrokên Kamûran Bedir-Xan jî ne dûrî yên Celadet Beg in. Di kovara Hawarê, hejmar 2, 1932'an de kurteçîrokeke Kamûran Bedir-Xan bi navê "Du Egîd" heye. Herdu Egîdên kamuran Beg dîl ketine, ew di destên dijmin de ne. Ew dibihîzin ku serîhildana welêt têkçûye, kurd şikestine, serok û birêvebir hatine girtin. Kamûran Beg di diyaloga herdu Egîdên dîl de, hêrs û rika wan ya ji bo bidestxistina welêt tûne ziman. Yanî di çîrokê de welat û xebata

ji bo welêt berî jin û zarokan tê. Wê ji ber vê nêrînê be ku ew ê paşê slogana kovara xwe "STÊR" bike "Welat berî her tiştî."

Di hejmara Hawarê ya 4'an de jî çîrokeke Kamuran Bedir-Xan ya bi navê "Lawikê Min" heye. Çîroka Lawikê Min bi forma "Tu" hatiye nivîsandin. Di vê çîrokê de jineke kurd bi mêrê xwe yê ku şehîd ketiye re, dipeyive. Di destpêka şer de lawikek ji wan re çêdibe. Piştî ku bav şehîd dikeve bi pênc salan, lawik ji diya xwe daxwaz dike ku ji bavê wî re binivîsîne û jê re bibêje, êdî lawê te mezin bûye, bes e, vegere, were.

Hema çi bigire piraniya çîrokên kovara Hawarê bi naverokên siyasî ve tije ne. Mesaja gelekan ji wan şer û têkoşîna ji bo Kurdistanê ye. Mîna me di destpêkê de jî gotibû, ji bo demeke weke dema wan, dayina mesajeke bi wî babetî jî gelekî normal e û di cih de ye. Gelek serîhildanên kurdan şikestine û kurd di bin tade û neheqiyeke nedîtî de ne. Hîn bîna şewata gund û termên mirovên kurd diçe wan. Ew jî hemû sirgûn bûne û bi hêviya ku wê rojekê vegerin welatê xwe dixebitin.

Lê bi kurtî ez dikarim vê bibêjim, rola dibistana Şamê di dîroka ziman û edebiyata kurdî de gelekî bilind e. Ger berdewamî di vê dibistanê de çêbibûya û derbasî nivşê nû bibûya, wê îro digel çareserbûna gelek pirsên siyasî, pirsên ziman û edebiyata kurdî jî çareser bibûna. Herweha ez bawer im me ê îro bikarîba behsa gelek nivîskarên kurd yên unîversal jî bikira.

Lê mixabin piştî wefata Celadet Bedir-Xan ew ekol ji hev de dikeve û rûpelekî girîng ji dîroka edebiyata kurdî tête çirandin. Herçiqas hin dengên kurdên Tirkiye û Sûriyeyê ev bêdengî carina xera kiribin jî, û kurmancên Kevnesovyetê û Iraqê, bi alfabeyên cihê hin berhemên çîrokan dabin jî, dîsan bi girseyî li derveyî welêt ev çirûska salên sihî dest bi şewqdayinê kiriye û hêviya pêşerojeke rohnî dide mirov.

* Di konferansa edebiyata kurdî, ku ji aliyê Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistanê ve di sala 1995'an de li Stockholmê hatibû lidarxistin, hatiye pêşkêşkirin

Çavkanî: Kovarên Hawar, Ronahî, Roja Nû û Stêr. Herweha Nûdem hej. 11, Ferhad Pîrbal.

Firat Cewerî: *Bi hatina 12'ê Îlonê re hem tevgera kurdî, hem jî tevgera demokratîk a Tirkiyeyê darbeyeke mezin xwar. Bi hezaran mirov di îşkenceyên nedîtî re derbas bûn. Pirr ji wan hatin kuştin. Hinekan jî xwe bi hoyin gellek zehmet gihandin Ewrûpayê. Îro, bi alîkariya wan kurdên ku xwe gihandine Ewrûpayê mirov dikare behsa edebiyateke kurdî a nûjen bike. Bi dîtina hin kesan hatina 12'ê îlonê ji vê yeka han re bû sedem. Gelo hatina Cûntayê ji bo geşkirina ziman û edebiyata kurdî baş bû, Mahmûd Lewendî ?*

Mahmûd Lewendî: Ji bo ku kek Xelîl jî li vê derê ye, ez nabêjim edebiyata kurdî bi tevayî, lê ez ê bêjim edebiyata kurdên Tirkiyeyê. Ji ber ku edebiyata kurdî li Kurdistana Iraqê heye û berê jî hebû. Ji alîyekî de mirov kare bêje, piştî heyştêyî grûpek ji kurdên Tirkiyê ku xwe gihandin Ewrûpa, di warê edebiyatê de hin tişt kirin. Lê gelo cûnra nehata wê çawa ba? Berî cûntayê jî edebiyata kurdî hebû. Qels ba, siyasî ba, yan ê grûban ba jî, Roja Welat hebû bi kurmancî û tirkî bû. Tîrêj hebû bi kurmancî û dimilî bû; Têkoşîn hebû derdiket. Kovara Özgürlük Yolu hebû cih dida Kurmancî. Kovara Rizgarî hebû cih dida kurmancî. Ger cûnta nehata, dibe ku edebiyata kurdî li welêt bêtir geş bibûya. Di şertên herî xerab de li zîndanên Tirkiyeyê kurdan di navbera sala 1980 û 84'an de çar kovar derxistin. Hin ji van kovaran bi kurmancî, hinek jî bi tirkî bûn. Ez dikarim bêjim, mirov dikare li eksê wê jî bifikire. Lê jiyana surgunê tiştin din nîşanî me daye. Em hatin Ewrûpayê, mumkun e, ew tesîra

welatên Ewrûpa, tesîra ku me gellek tiştên din yên kurdî dît, ku me li Tirkiyê nikarîbû bidîta, li me bûye. Me têkîlî bi kurdên Iraqê û perçeyên kurdîstanê yên din re danî; bi vê yekê, mirov dikare bêje, ku edebiyatek li derveyî welat çêbû, edebiyatek kurdî ji bo Kurdistana Tirkiyeyê. Lê eger cûnta nehata mumkun e, ku ev yeka han li Kurdistana Tirkiyê geş bibûya. Ji ber ku me got ya, bi Tîrêjê dest pêkir, bi Roja Welat dest pê kir, bi Rizgarî dest pê kir, dîreksiyona vê karîbû bihata guhertin. Ji ber vê yekê, ez dibêjim, mirov nikare bêje, ku baş bû cûnta hat û bi vê yekê edebiyata kurdî derket. Lê digel her tiştî mirov kare bêje ku edebiyata kurdî li derveyî welêt pêş de çûye û mirov vê yeka han jî ji kovar, rojname û pirtûkên kurdî ferq dike.

Firat Cewerî: *Giraniya sohbet û gotûbêja me ya îro wê li ser edebiyata Kurdistana Tirkiyeyê be. Yanî bi gelemperî li ser edebiyata Kurdistana Tirkiyeyê ya surgunê û bi taybetî jî li ser romanên Mehmet Uzun. Tu bêjî nebêjî edebiyata kurdî li Kurdistana Tirkiyê berê jî hebû. Wek Mahmûd Lewendî jî got, li Tirkiyeyê Tîrêj derdiket, Roja Welat derdiket, Rizgarî derdiket... Ji nav van hersê kovaran ya xwerû bi kurdî û hunerî û edebî bû, Tîrêj bû. Hem di nav hevkarên Tîrêjê de, hem jî di nav yên derveyî Tîrêjê de gelek mirovên jîr û jêhatî hebûn, ku karîbûn di warê huner û edebiyata kurdî de tiştên pirr baş û bi qîmet bikirana.*

Lê bi hatina çûntayê re ev agirê ku karîbû gurr biba, hate vemirandin. Pirr mirovên me mecbûr man ku koçî Ewrûpayê bikin. Ew tevgera kurdî ya ku ji aliyê cûntayê ve darbe xwaribû, di hundirê xwe de jî darbeyên mezin xwarin û bi vî awayî valahiyeke siyasî çêbû. Weke ku li gelek welatan bûye, kurdan jî xwestin şûna valahiya siyasî bi edebiyatê dagirin. Yanî piştî heyştêyî demekê siyaset têk çû, lê edebiyat geş bû. Mirov vê yekê ji weşanên kurdî yê piştî heyştêyî ferq dike. Piştî heyştêyî li Ewrûpayê bi dehan kovar û rojnameyên kurdî, bi se-

dan jî pirtûkên kurdî çap bûn. Bi vê yekê re jî di her şaxê de nivîskarên Kurd çê bûn. Gava mirov çavekî davêje paşeroja xwe û li avakirina Cumhuriyeta Tirkiyeyê dinihêre, mirov dibîne ku ji avakirina cumhuriyetê û heta bi sala 1980'yî, ji çaran yekê weşana kurdî, ku di van deh salên dawî de li Ewrûpa pêk hatiye, li Tirkiyê pêknehatiye. Di demek wilo kurt de, di bin hoyên demokratîk de edebiyata kurdî ewçend bi pêş de çûye, ku mirov kare bêje di warê pêşketina edebiyata kurdî de ev yeka şoreşek e. Kek Xelîl Dihokî tu çi dibêjî ?

Xelîl Duhokî: Bi rastî ez bi xwe jî vê yeka han di warê edebiyat û rewşenbîriya kurdî de şoreşeke mezin dizanim. Li Kurdistana Iraqê, ez dikarim bêjim, li devera me ya Behdînа, me di sala 1970'ê de dest bi edebiyata kurmancî kir. Hingî bi rastî hemû xwendina me bi erebî bû. Lewra bi rastî di salên 70'ê de tu tişt ji kurdistana Tirkiyeyê nedigihîşt destên me. Ne helbestek, ne romanek... Ji ber hindê jî ev ne sûcê xelkê bû. Ez bawer im, di nav kurdên Kurdistana Tirkiyeyê de jî bi hezaran rewşenbîr hebûn, dinivîsandin, lê nivîsandinên wan bi tirkî bûn. Li Kurdistana Tirkiyeyê, ji avakirina Cûmhûriyetê û vir de kurdî qedexe bûye. Yanî te li welatê xwe nikarîbû bi kurdî biaxifta, bi kurdî binîvîsanda. Ji ber vê yekê edebiyat bi pêş nakeve, rewşa siyasî bi pêş nakeve, rewşa civakî bi pêş nakeve. Bi hatina cûnta leşkerî, pirraniya rewşenbîrên kurdên Tirkiyeyê yên hatin girtin, di zîndanan de tade û neheqiyên mezin dîrin, yan jî bazdan derveyî welêt. Ev însanên ku hatin derveyî welat, hemû însanên şoreşger bûn, hemû însanên welatperwer bûn. Ev însanên ha nikarîbûn li malên xwe rûnên û tiştekî nekin. Diviyabû ku tiştekî bikin û xizmeteke mezin bo welatê xwe pêşkeş bikin, bo cûnta û hemû kevneperestan misoger bikin, ku ev xelkê şoreşger, ev xelkê welatparêz, erê ji welatê xwe reviya ne, lê her tim welatê wan di dilê wan de dijî, her tim fikra pêşde birina welatê wan li bîra wan e. Ez yek ji wan kesa me ku vê pêşketina ha dibînim. Bi rastî di hundirê van deh sa-

lan de gellek tiştên bi qîmet derketine. Weke ku we jî behs kir, ku bi dehan kovar û rojname derdikevin. Tê bîra min, berî niha bi deh salan hin hevalên kurdên Tirkiyeyê li Kurdistana Iraqê li dev me bûn, wan nikarîbûn bi hêsanî bi kurdî bipeyivin. Niho ez wan hevalan dibînim, ku nivîskar in, rojnaman derdixin, kovatan derdixin. Bi rastî kurdên li derveyî welat zehmetî dane xwe, xwe êşandine, ku edebiyateke kurdî biafirînin.

Firat Cewerî: *Gelo emdi karin çi navî li vê bikin ? Ma em dikarin navê "Edebiyata kurdî ya surgunê" lê bikin?*

Xelîl Duhokî: Bi baweriya min, herdu bi hev ve ye. Nivîskarên kurd nikarin xwe ji welatê xwe bi dûr bixin. Nivîskarên kurd, rewşenbîrên kurd, heta siyasetvanê kurd, gava ku li derveyî welat dijîn, hemû fikir û hizrên wan ber bi welatê wan de diçe, ber bi Kurdistanê diçe. Ji ber hindê ew ji Kurdistana xwe nahitine cûdakirin. Erê, rast e ev tiştan li derveyî welat, li surgunê têtе kirin, lê ez nikarim bêjim, ku ev ji welêt cûda ye. Lê dibe ku ev xelka li welatê xwe bûna, wan afirandinên baştir bianîna pê. Çunku gava însan ji welatê xwe derdikeve, ji nav mirov û dostên xwe derdikeve, azar û derd û xemên wî pirr dibin. Ji ber ku her roj xeberên nexweş dibihîzin, dengê lêdan, îşkence û neheqiyê tê guhê wan. Ji ber vê yekê jî ew her xwe perçeyek ji welatê xwe dibînin. Ew tu caran xwe ji miletê xwe mestir nabînin. Ez bawer im ku siberoj rewşa welêt baş bibe, ew ê pirr ji van hevalan vegerin welatê xwe û ew ê li welêt tiştên hîn baştir biafirînin. Ji ber ku ew diçin nav cergê miletê xwe, diçin nav derd û kul azarê miletê xwe. Li vê derê gelek tişt hene ku mirov nabîne, tenê mirov bi riya radyo, televizyon û rojnaman dibihîze. Ji ber hindê, bi rastî ev qonaxa hanê ku piştî heyştêyî li derveyî welêt, li Ewrûpayê dest pêkiriye, ji bo kurdên Kurdistana Tirkiyeyê şoreşek mezin e. Berî sala 1980 mirov berê xwe dida kitêbxana kurmancî mirov deh kitêb tê de nedidît; lê niha mirov bi sedan kitêban

di kitêbxana kurdî de dibîne. Mirov bi dehan nivîskarên baş dibîne, bi dehan rojnamevanên baş dibîne. Ji ber hindê ev xebata niha ku di warê edebiyata kurdî de dibe, ez karekî gelek baş dibînim.

Firat Cewerî: *Wek tê zanîn, di nav edebiyata me ya surgunê de di her beşt de gavên baş hatine avêtin. Helbesta bi forma klasîk li paş ma û şûna wê helbesta serbest û nûjen girt. Jê wêdetir jî gellek çîrok û roman hatin nivîsandin. Yek ji romannivîsê me yê berdewam Mehmed Uzun e. Mehmed Uzun li dû hev çar roman nivîsand. Romana wî ya pêşt "TU" di sala 1984'an de, "Mirina Kalekî Rind" di 87'an de, "Siya Evînê" di 89'an de û "Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê" jî di 91'ê de derket. Di heft salan de çar roman. Ev hîseke çawa ye, Mehmet Uzun?*

Mehmed Uzun: Tu pirsek pirr dijwar ji min dikî. Ez ê nikaribim dîrek bersiva vê pirsê bidim, lê gava romana min ya yekemîn derket, ez gelek serfiraz û kêfxweş bûm. Bê guman, gava mirov kitebekê, romanekê, eserekê derdixe weke ku zarokekî nuh were dinyayê, bi mirov re eynî hîs çê dibe. Lê ez bêtir serbilind im, ku kitêbxana kurdî bûye xwedî çar romanên din û kitêbxana kurdî dewlemend bû ye.

Firat Cewerî: *Wek me berê jî behs kiribû ku edebiyata kurdî bêtir li surgunê şax daye. Xuya ye ev surgun qedera nivîskar û hunermendan e. Dîroka surgunê dirêj e, digihîje Yunana Antîk û Romayê. Helbestkar û nivîskarê Romî, Ovidius, surgunî perê Derya Reş bû. Descartes, Gombrowicz, Alberti, Kundera hin ji nivîskarên surgunê ne. Ji xwe di dema Nasyonal Sosyalizma Almanyayê de, bi girsî nivîskarên alman surgun bûn, an jî ji xwe re jiyana surgunê helbijartin. Di jiyana xwe ya surgunê de gelek êş û zehmetî kişandin, lê gelek afirandinên nemir jî afirandin. Ji xwe jiyana surgunê pirr êş û zehmetiyan jî bi xwe re tîne. Mirov ji warê xwe, ji heval û hogirê xwe, ji av û hewa welatê xwe diqete; mirov demekê wek peza ku ço li serî keti-*

be, gêj dibe. Bi vê gêjbûnê û ji welêt dûrbûnê, çawa dibe ku nivîskarek dikare berhemên wilo nemir biafirîne, an jî di bin vê tesîra han de te çawan karîbû çar roman binivîsanda Mehmed Uzun?

Mehmed Uzun: Wek min di nivîsarek xwe de jî behs kiribû, surgun hem dikare mirovan bikuje, hem jî bi pêş bixe. Êdî ew girêdayî wî merivî, wê grûbê, an jî wî miletî bi xwe ye. Meriv çawan dikare surgunê bi kar bîne, çi armanc û hedef û programa mirov bi xwe heye. Gava mirov nikaribe xwe biguhere, nikaribe civata nû, zimanê nû, çanda nû, danûstandinên nû fahm bike, xwe bigihîne wan, bi wan re yekîtiyekê ava bike; wê çaxê ez bawer nakim, ku surgun dikare merivan bi pêş bixîne û merivan nû bike. Ez bi xwe ev çardeh sal in ku li surgunê me, çardeh sal in ku ez li Ewrûpayê, li welatê xerîbiyê me. Romanên min hemû li surgunê derketine û ez bi xwe jî li surgunê bûm nivîskar. Berî ku ez derkevim surgunê, ez ne nivîskar bûm. Ji ber vê yekê, ez bawer im tesîrek gelek baş û pozîtîv li min çêbûye. Tesîra surgunê pirr baş li min çêbûye. Berî du salan min jina Gombrowicz li vê derê dîtibû. Gombrowicz bi xwe nivîskarekî surgunê bû. Eslê wî ji Polonyayê bû, lê ew ji welatê xwe dûr, li surgunê jiya. Bi qasî bîst û çend salekî li Arjentîna bû, paşê hate li Firansayê bi cih bû. Jina wî hebekî ji min re behsa Gombrowicz kir. Digot, Gombrowicz her gav bi hesret bû, bi hesreta welatê xwe dijiya, lê di eynî wextê de bi xurtî li bûyerên der û dora xwe jî dinihêrî. Tiştên ku li Arjentîna dibûn, tiştên ku li Firansayê dibûn, gelekî bala Gombrowicz dikişand. Gombrowicz ne derveyî bûyerên der û dora xwe bû. Yanî Gombrowicz ne li derveyî Firansa û zimanê firansizî bû, ne li derveyî zimanê Îspanî û edebiyata Îspanî bû. Ew baş hînî zimanê Îspanyolî nebûbû, lê bi nivîskarên Arjentînî re, bi nivîskarên Firansizan re radibû û rûdinişt, bi wan re hevaltî dikir, her gav bi wan re bû.

Ez bawer im, ev yeka han dikare surgunê bike meydana xwepêş-

xistinê. Wekî dinê ez ne bawer im. Yanî bi sedan, bi hezaran, bi sedhezaran jî însan windabûne, têk çûne. Gelek nivîskarên baş hatine, lê li surgunê nikaribûne bi ser kevin, lê têk çûne. Yanî gotina min ew e, divê mirov xwe li surgunê nû bike, ev pêwîst e. Şert û îmkanên vê jî hene. Gava meriv zimanekî nû hîn dibe, wê çaxê meriv wî zimanê nû û zimanê xwe dide ber hev. Gava meriv rastî çandeyek nû tê, civatek nû tê, meriv yên nû û yên xwe dide ber hev. Bi vî awayî meriv dikare hîn kûrtir, hîn baştir û hîn firehtir yê xwe jî fêhm bike. Ew mesafa ku di navbera meriv û welêt de jî heye, dikare alîkariya merivan bike, ku hîn firehtir û xurttir bikaribe bûyerên welatê xwe, meselên welatê xwe, meselê çanda xwe bibîne. Ez carna vê mîsalê didim, ku pirr caran gava meriv di nav daristanê de ye û li daran dinêre, hingî meriv darekê an du daran dibîne, lê gava meriv li derveyî daristanê ye, em bibêjin, gava meriv li ser girekî, li ser çiyayekî li daristanê dinêre, meriv hemû daristanê dibîne. Surgun dikare wisan be, ku meriv li ser girekî, li ser çiyayekî ye û li daristanê, li welêt dinêre û dikare wê hemû bibîne.

Xelîl Duhokî: Ez dixwazim tiştekî din lê zêde bikim, bi rastî jî sohbeta me bêtir li ser mersela Kurdistana Tirkîyeyê ye, yanî li vê derê tiştê herî girîng ew e, ku li Swêdê, li Ewrûpayê, ji bo însanên nivîskar azadiyek gelek mezin heye. Yanî berî niho bi rastî li Tirkiyeyê ziman qedexe bû, mumkun nebû xelk bi zimanê xwe biaxife, qedexe bû tu rojname û kovaran derêxî, qedexe bû tu kitêban çap bikî, qedexe bû tu semîneran pêşkêş bikî; ji ber hindê di rewşek wisan de, mirov nikare bi pêş keve jî. Bes niho gelek derî li ber nivîskarên Kurdistana Tirkiyê vekitûne, ku di vê azadiya niho heye de, tu bi azadî dikarî semîneran bidî, dikarî kitêban çap bikî, dikarî kovar û rojnaman derêxî, tu dikarî van tiştan bigihênî xelkê jî. Ev pirtûk û kovarên ku ji aliyê nivîskarên Kurdistana Tirkiyê ve têne çapkirin, mirov bi hêsanî dikare wan bigihîne Tirkiyê, bigihîne Sûriyê, bigihî-

ne Îraqê û bigihîne Îranê. Yanî, mirov dikare vê mersela surgunê bike bingehek mezin ku ji vê derê tiştan bigihîne welêt. Li Kurdistanê ev îmkan nîne, lê li vê derê heye.

Firat Cewerî: *Gelo mirov dikare bibêje ku em kesên li surgunê me hem xwe û hem jî welatê xwe li surgunê baştir nas kir ?*

Mehmed Uzun: Berî niha bi mehekê, li Stockholmê, sempozyomeke edebî hebû. Ev sempozyom ji aliyê komîta Nobelê ya Akademiya Swêdê ve hatibû amadekirin, gelek nivîskar beşdarî wê sempozyomê bûbûn. Yek ji wan jî şaîrê Mexsîkî Oktavio Paz bû.

Ez bi xwe jî beşdarî wê sempozyomê bûbûm. Oktavio Paz di xeberdana xwe de tiştekî gellek baş got. Got ku em nivîskarên Amerîka Latînî ku bi Spanyolî dinivîsînin, me welatê xwe, zimanê xwe û Emerîka Latînî li Parîsê nas kir. Digot, gava em li Mexsîkayê bûn, Mexsîka ji bo me cîhan bû. Ne hemû Mexsîka jî, lê tenê perçeyekî Mexsîkayê. Me Perû nas nedikir, me Kolombiya nas nedikir, me nivîskarên din nas nedikirin, lê em li Parîsê gihîştin hev, me mêze kir, ku em hemû endamê malbatekê ne. Hemû nivîskarên Emerîka Latînî, mîna endamê malbatekê ne, mîna ferdê malbatekê ne. Bi vî awayî dikare gelek fêda surgunê bibe. Lê mîna milet, mîna gel, kurdan baş ji surgunê îstîfade nekirine. Du miletên gellek jîr hene ku ji surgunê gellek destkewtî bûne, yek cihû ne, yek ermen in. Van herdu miletan surgun pirr baş bi kar anîne û jê pirr baş îstifade kirine.

Firat Cewerî: *Mehmed Uzun mînakek ji gotinên helbestkarê Meksîkî Oktavio Paz da. Bi gotina Paz wan xwe û welatê xwe li Parîsê nas kirine. Gelo berî vê jiyana surgunê me çiqasî Dihok, Zaxo, Silêmanî, Mehabad, an jî cih û perçeyên Kurdistanê yên din nas dikir. Wek hûn dibînin ku vê jiyana surgunê em kirine endamê malbatekê. kurdên Mêrdînê, yên Wanê, yên Swêregê, yên Çolemêrgê, yên Xarpêtê, yên Diyarbekrê, yên Mûşê, bi kurtî yên her quncika Kurdistana Tirkiyeyê hevdu bi pirranî li derveyî welêt nas kirin. Jê wêdetir jî kur-*

dên her perçeyê Kurdistanê li derveyî welêt gihan hev, li derveyî welêt hevdu naskirin. Wan bi hev re komele ava kirin, bi hev re kovar derxistin, bi hev re zewicîn... A niha pirr ji me kurdên Tirkiyeyê hînî soranî bûne, pirr ji hevalên kurdên Iraq û Îranê jî hînî zaravayê me yê kurmancî bûne. Gava em ji vê yeka han bi rê bikevin, gelo em karin bêjin, ku me Kurdistana mezin, ziman û edebiyata wê li derveyî welêt baştir nas kir ?

Mahmud Lewendî: Rast e, me baştir nas kir. Ji bo min derveyî welêt kare Sûrî be, kare Iraq be û dikare Ewrûpa be. Gava em ji welêt derketin, me gelek kurdên perçeyên din nas kir. Êdî her kesî li gor xwe bi kurdên derve re têkîlî danîn. kurdên siyasî bi yên siyasî re danîn, yên ku ji edebiyatê hez dikirin, bi yên ku bi edebiyatê mijûl dibûn re dan û standin. Hema ez xwe mînak bidim, berî ku ez derkevim derveyî welêt min soranî nebihîstibû. Ez derketim min soranî bihîst. Min bihîst ku li Kurdistana Iraqê bi hezaran tişt derketine, kitêb derketine. Gava hevalên Kurdistana Iraqê ji me re behs dikirin, ku li Kurdistana Iraqê lîse heye, unîversîte heye, bi kurdî ye, em ecêbmayî diman. Me ev hemû li Ewrûpa bihîstin. Yanî ji aliyekî de em pêş de çûn, gelo ji aliyekî de jî em ji koka xwe nehatin birrîn ?

Xelîl Duhokî: Mirov dikare bêje ku pirraniya nivîskarên Kurdistana Tirkiyê li Ewrûpa dest bi nivîskariyê kirin. Bi baweriya min van demên dawî di navbera nivîskarên kurd yên li Ewrûpa û di navbera xelkên li welêt danûstandinek çêdibe. Ev yeka han gelek girîng e. Ez bi xwe çûm Kurdistanê û min bi dehan pirtûkên kurdî bi xwe re birin. Yanî mirov niho bi hêsanî dikare pirtûk û weşanên kurdî bigihîne welêt. Gava ev welê be, fêdeyên surgunê pirr in. Lê eger tiştên ku li vir derdikevin negihîjin welêt, mirov dikare bêje, ku zerara wê heye, mirov ji koka xwe diqete. Bi baweriya min nivîskarên kurd ji koka xwe neqetiyane. Li vir salê bi çendan pirtûk û kovar çap dibin,

kitêbxana kurdî dewlemend e, lê mixabin xwendevan kêm in. Ez bi xwe yek ji wan nivîskara me, ku gelek li ber dikevim ku xwendevanên min kêm in. Lê eger li Kurdistanê ba, wê ne wilo ba. Berî niha bi sê mehan ez çûbûm Kurdistana Iraqê, min li wir li ser edebiyata kurdî hin semîner dan, bi hezaran xelk dihatin. Li bajarekî wekî Dihokê me mêhrîcaneke edebî bikira bi hezaran guhdar û temaşevan dihatin. Li vê derê, li Stockholmê em semînerekê dikin, bîst kes tên, sîh kes tên. Divê nivîskarên kurd vê hizrê bikin ku- ew ne ji bo Swêdê dinivîsin, ew ji bo Kurdistanê dinivîsin û ev kitêbên ha her wê bigihine Kurdistanê. Ji ber ku niha rê hene. Ji ber hindê ez bawer im, nivîskarên nû fêde ji jiyana surgunê kirine. Lê divê em zehmetiyê bidin xwe û nivîs û berhemên xwe bişînin û bigihînin nava welat. Ez bawer im em ê hingî baştir bi miletê xwe ve bêne girêdan.

Firat Cewerî: *Mehmed Uzun romana xwe ya pêşî, ya bi navê "TU" di sala 1984'an de li Swêdê derxist. Roman li ser jiyana xwende û rewşenbîrekî kurd yê nûgihiştî ye. Di gel ku ev romana ha di sala 1984'an de jî derketiye, ez bawer dikim, wê haya pirr xwendevanên kurd yên li Kurdistanê ji romanê tunebin. Ji ber vê yekê ez bawer dikim hem ji bo kurdên li welêt, hem jî ji bo kurdên li derveyî welêt wê baş be ku em bîskê behsa vê romanê bikin. Mehmed Uzun, gelo te di nivîsandina vê berhema xwe ya pêşî de çi zehmetî kişandin ?*

Mehmed Uzun: Zehmetiya min ya pêşîn ziman bû, zehmetiya min ya herî mezin dîsan ziman bû. Heya wê çaxê min tiştin bi kurdî nivîsandibûn, lê nivîsarên kin bûn, hindik bûn. Min heya wê çaxê eserek dirêj bi kurdî nenivîsî bû. Bi rastî jî min nizanîbû, ka bê ez ê bikaribim esereke dirêj bi kurdî binivîsînim. Zehmetiya herî mezin ev bû. Zehmetiya dudan jî, di warê nivîsîna romanê de tu tecrube tune bû. Tradisyonek wisan tune bû.

Mahmûd Lewendî: Yanî tradisyoneek kurdî tunebû?

Mehmed Uzun: Belê, tradisyonek kurdî, ya kurdên Tirkiyê tunebû. Min dixwest ez derdên xwe, fikrên xwe, bîr û baweriyên xwe ji heval û dostên xwe re bibêjim, bikaribim bi wan re diyalogekê, danûstandinekê çêbikim, belkî ez karibim ji wan hinek fikir werbigirim, belkî teşwîq bibim, belkî di vî karê min de alîkariya wan jî çêbibe, lê nedibû. Ji ber ku mefûma romana kurdî di serê hevalên min de tune bû. Diyalog çênedibû, tradisyonek, tecrubeyekî wisan tunebû. Evana du zehmetiyên min yên esasî bûn.

Firat Cewerî: *Piştî romana te ya yekemîn te sê romanên din jî li dû hev nivîsandin. Gelo ew zehmetiyên esasî ku te ji bo nivîsandina romana xwe ya pêşî behs kirin, ji bo romanên te yên din jî derbas dibin ? An jî ew dost û hevalên te, ku bawer nedikirin tu ê bikaribî romanekê bi kurdî binivîsînî, ew niha te fêhm dikin an na?*

Mehmed Uzun: Tu bêjî nebêjî, zehmetî her hene, lê ew zehmetiyên min yên di nivîsandina romana min ya pêşî de hêdî hêdî ji ortê rabûn. Lê di her nivîsandina esereke nû de hin zehmetiyên nû derdikevin pêş mirov. Gava ez paş de vedigerim û li romana xwe ya "TU" dinihêrim, ez zehmetî û kêmasiyên xwe baş dibînim. Ez bi tu romanên xwe jî ne razî me. Kêmaniyên wan gelek in. Lê em bêjin di werê zimên de, kêmanî di "TU" de pirr in. Gava ez îro lê vedigerim û lê dinihêrim, ez dibînim ku min çiqas xwe êşandiye da ez bikaribim zimanê kurdî ji bo esereke dirêj bikarbînim.

Mahmûd Lewendî: Ez dikarim di vir de pirsek biçûk bipirsim?

Firat Cewerî: *Fermo!*

Mahmûd Lewendî: Tu dibêjî ku te di warê ziman de zehmetî dikişand. Baş e gelo te di warê avakirinê de jî zehmetî nedidîtin? An jî di warê teknîka romanê de zehmetiyên te tune gelo?

Mehmed Uzun: Na, di warê tekuîka romanê de, di nivîsandina romana "TU" de tu dijwarî û zehmetiyên min tunebûn. Bilakîs, min pirr bi hêsanî tekuîka romana "TU" ava kir. Min ew pirr bi hê-

sanî nivîsî. Lê zehmetiya min çi bû ? Nivîskariya min ne nivîskariyek kemilî bû. Ger ez îro "TU" binivîsînim, mumkun e, ku ez gelek tiştan jê derxim, mumkun e ku ez bêtir romanek konsantre jê derxim, mumkun e ku ez hin tiştên edebî lê zêde bikim.

Firat Cewerî: *Mahmûd Lewendî, ger tu romana "TU" û romana ku piştî wê derketiye, "Mirina Kalekî Rind" bidî ber hev, tu çi guhertinan di romannivîskariya Mehmed Uzun de dibînî?*

Mahmûd Lewendî: Her çiqas ez ji romanan fêhm nakim jî, lê dîsan, bi a min di aliyê teknîka romanê de, "TU" ji "Mirina Kalekî Rind" baştir hatiye nivîsandin.

Firat Cewerî: *Gava tu dibêjî "Teknîka romanê" tu dixwazî çi bibêjî?*

Mahmûd Lewendî: Di romanê de qehremanê romanê bêtir derdikeve pêş, mirov bêtir meselê vekirî dibêje. Mirov ji tiştên ne diyar bêtir bi dûr dikeve. Di "TU" de ew heye. Wek hûn jî dizanin, ku însanek, di hucreyekê de, bi kêzikekê re qise dike û bi wasita wê kêzikê dest pê dike, diçe heta malbata xwe, diçe dewra xwe ya kevn, dîsan tê hepisxanê, rewşa xwe ya pisîkolojîk radixe ber çavan, rewşa diya xwe... Mirov bêtir tiştekî weha modern tê de dibîne. Di "Mirina Kalekî Rind" de min bi xwe ew tê de nedît.

Xelîl Duhokî: Em ê dîsan vegerin ser rewşa miletê kurd. Rewşa miletê Kurd ya siyasî, ya aborî, ya civakî... Ji bilî van çar romanên Mehmed Uzun miletê Kurd xwedî çend romanên din e? Bavê Nazê hindek nivîsîne, Mehmûd Baksî hinek nivîsîne, Birîndar hinek nivîsîne, wekî din çend biraderên din hene li Kurdistana Iraqê hin roman nivîsîne. Lê li Kurdistana Iraqê dibistanên kurdî hene, unîversîte hene, profesorên zimanê kurdî hene, bi hezaran kitêbên kurdî hene, lê bi tenê çend roman hene. Bi nêrîna min eger hin şaşiyên Mehmed Uzun di romana "TU" de hebin jî gelek normal e. Di deh salan de eger mirov bikaribe çar romanan binivîsîne bi a

min karekî mezin e. Ez bi xwe yek ji wan kesa me, ku gelek xatir û qîmet didim van nivîskarên me yên li derveyî welat, ku romanên xwe, çîrokên xwe, helbestên xwe û lêkolînên xwe pêşkêş dikin. Gava ez van romanên kurdî, wek ya Bavê Nazê, "Çiyayê Bi Xwînê Avdayî", "Siya Evînê" dixwînim, bi rastî Garcia Marquez tê ber çaven min. Ev romannivîsên me ne kêmtirî romannivîsên tirk û ereban in, romannivîsên mezin in.

Mahmûd Lewendî: Ez di vir de bi kak Xelîl re me. Ji ber ku çavkaniyên min romanên tirkî ne, gava ez "TU" û "Siya Evînê" dixwînim ji min re wek roman tên. Lê "Mirina Kalekî Rind" û "Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê" di aliyê tekuîka romanê de ne ewçend xurt in.

Xelîl Duhokî: Bi a min ev romanên ha hem di aliyê teknîkê, hem jî di aliyê form û naverokê de bi serketî ne. Cara pêşî min romana "TU" berî niha bi pênc-şeş salan li Şamê dît. Ez hingî ji ber dîktatorya faşîst a Iraqê reviyabûm. Min girtin, lêdan û îşkence dîtibû. Gava min romana "TU" xwend, min xwe û jiyana xwe tê de dît. Ez bawer im ku hemû însanên kurd xwe di vê romana "TU" de dibîne.

Firat Cewerî: *Rast e, di "TU" de her kurdekî welathez û têkoşer ku hatiye girtin, lêdan, îşkence û stemkarî dîtiye, dikare xwe di "TU" de bibîne. Di salên 70'yî de tu jî yek ji wan kurdan bû, ku para xwe ji girtin, lêdan û îşkencê dît. Gelo mirov dikare bêje, ku ev roman serpêhatiya te bi xwe ye?*

Mehmed Uzun: Ev beşek ji serpêhatiya min e. Di hin hêlên qehremanê romanê de hin serpêhatî û tecrubeyên min hene, lê ew ne ez im. Ji min bêtir min xwest kn ez şexsekî tasfîr bikim, ku kurd karibin xwe tê de bibînin, xelk karibin xwe tê de bibînin. Yanî bibe tecrubeyekî muşterek, dibe hîseke muşterek... Ji ber vê gelek tişt lê zêde bûne. Tiştên min dîtine, ez jiya me, bi awayekî edebî lê zêde

bûne. Beşekî biçûk ji romanê serpêhatî û tecrubeyên min in, lê pirranî çêbûyî ye, ava bûye.

Firat Cewerî: *Tu di romana xwe de jiyana xortekî nûgihiştî, zana, bîrewer û jêhatî radixî ber çavan. Ev xortê ha yê nûgihiştî pirr ji xwendinê hez dike; hem li derve, hem jî di girtîgehê de gelek pirtûkan dixwîne, bi mirovên navdar û navsal re dide û distîne, digel temenê xwe yê biçûk, bi wan re hevaltî û dostaniyê datîne. Qehremanê te bi temen biçûk e, lê di aliyê fikrê de mezin e. Ew wê mezinahiya xwe di girtîgehê de bi alîkariya xwendin û danûstandina bi mirovên zana û navdar re bi dest dixîne. Carina di sohbetê me yê şexsî de tu her dibêjî, ku girtîgeh ji te re bûbû dibistan, ku te xwe li girtîgehan gihand...*

Mehmed Uzun: Gava ev romana min derket, ez li çend cihan li ser wê peyivîm. Carekê yek derket, got, "Tu navê ewqas nivîskaran didî, gelo xortek dikare ewqas nivîskar bixwîne û wan nas bike". Erê, dikare. Ji ber ke dema ez li girtîgeha Diyarbekrê girtî bûm, ew kitêb hemû hebûn. Gava ez hatim girtin ez hîjdeh salî bûm. Min zêde dinya nas nedikir, min kurdayetî nasnedikir.

Tê bîra min ku min di girtîgehê de kitêba Dimitrov, "Faşizme Karşı Birleşik Cephe" yanzdeh caran xwend. Min kitêba George Politzer, "Felsefenin Temel İlkeleri" şanzdeh caran xwend. Wê çaxê tenê şeş kitêbên Şolohov bi tirkî derketibûn, min ew her şeş kitêb di panzdeh rojan de xwend. Hewa û atmosfera hepsê a wê çaxê wisa bû. Hepisxana 70'ê tu caran ne wek hepisxana 80' ê bû. Ji hev pirr cihê bû. Hepisxane ji bo min bû neynika civaka min. Ji ber ku ji her sinif û tebaqê mirov tê de hebûn û em hemû bi hev re bûn. Em sed û şêst, sed û heftê kes bi hev re bûn. Çavên min li girtîgeha Diyarbekrê vebûn, kurdayetiya min li wir dest pêkir. Ez vê yeka ha jî heta mirinê ji bîr nakim. Ger hûn bala xwe bidin romanê, qehremanê wê pasîv e. Ew bi xwe observator e. Tişt bi tenê li der û dora

wî diqewimin. Ew bi xwe nizane bê çima hatiye girtin, lê tê girtin. Ew naxwaze îşkencê bibîne, lê dibîne. Yanî gelek pasîv e. Tenê di xeberdanên xwe de bi kêzê re aktîv e. Min bi zanebûn ew wilo pasîv kiriye, ji bo ku ez bikaribim observasyona wê demê ya civatê bidim. Di vir de ez çiqas bi ser ketime ez nizanim. Lê wisa ye. Tiştekî din jî heye, ku min di vir de behsa hepisxanê kiriye, lê ev sed salên welatê me ye ku hepisxane ye.

Firat Cewerî: *Gava min herdu romanên Mehmed Uzun, "TU" û "Mirina Kalekî Rind" xwendin, min pevgirêdanek di navbera wan de dît. Qehremanê romana pêşî ku bi "TU" hatiye navandin; lêdan, îşkence, tade û neheqî dîtî ye, tê berdan, ji ber zilm û zorê, ji ber stemkarî û neheqiyê bazdide, bi gelek zehmetî û dijwariyan li hidût dixe, derbasî Binxetê dibe û ji wir jî xwe digihîne serbajarê Swedê, Stockholmê. Qehremanê romana pêşî, "TU" di "Mirina Kalekî Rind" de dibe Serdar Azad. Serdar hê berî ku xwe bigihîne Ewrûpa, ew li Binxetê, li gundekî Qamişlokê ê biçûk, li Kalekî ecêb rast tê. Kalo bi her awayê xwe ji bo Serdar Azad balkêş e. Seradar Azadê ku rewşenbîrekî dema me ye, gelek sirên veşirtî di Kalo de dibîne, loma jî dev jê bernade, bi şevan, bi rojan li dû Kalo digere, û dixwaze wan sirên Kalo yên veşirtî ji xwe re eşkere bike. Ew bi înadiya xwe dide dû vê ramanê û piştî demekê vî kalê xwedî tecrube, zana, sirtijî, geriyayî û kûpê kulturê nas dike. Mirina Kalekî Rind li der û dora Kalo û Serdar Azad dihare û tê. Hêvî û armancên wan, hîs û xewnên wan, daxwaz û ramanên wan tîne ziman. "Siya Evînê" ku romana te ya sisiyan e, dîsan li ser jiyana rewşenbîrekî Kurd yê destpêka sedsala nozdehan hatiye nivîsîn. Ev romana te ya ku bi hostatiya nivîskariyek kemilî hatiye nivîsîn, û ji aliyê xwendevan û hin nîvrexnegiran ve hatiye ecibandin, xewn û xeyal, evîn û hezkirin, edebiyata bedewî, şer, pevçûn, serhildan, netewehezî, xerîbî, dûrî te ev hemû di şexsiyeta rewşenbîrê kurd Memduh Selîm Beg de civandine. Yanî, gava mirov*

çavekî davêje van hersê romanên te, mirov wek tema jiyana rewşenbîrîya kurdî tê de dibîne. Lê te di romana xwe ya çaran de tema guhertiye û derbasî epîkê bûye. Te "Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê" nivîsandiye. Wek hûn dizanin her nivîskarek pesnê roman an berhemek xwe dide û jê hez dike. Wek mînak, gava ku Gabriel Garicia Marquez xelata Nobel a edebiyatê bi romana xwe ya bi navê "Tenêtîya sed salan" girt, wî got ku romana ew herî pirr jê hez dike, ne "Tenêtiya Sedsalan" lê "Duşema Sor" e.

Mehmed Uzun, gava mirov pirsek wilo ji te bike, tu ê navê kîjan romana xwe bidî?

Mehmed Uzun: Mixabin, ez ê nikaribim bersiva vê bidim. Ji ber ku min di her romaneke xwe de xwestiye zimanekî nû, teknîkeke nû, stîleke nû bidim. Zehmetiyên her romanek min cihê bû. Gava ez romanên xwe dinivîsînim, ez berî her tiştî ji bo xwe hin mefhûman tesbît dikim û romanên xwe li dora wan radixim. Mesele mefhûmên surgunê, humanîzmayê, welatevîniyê, zimanevîniyê, hevaltiyê, evîn bi xwe, îxanet, tiştên weha ez li dora romanê xwe dicivînim. Û di her romanê de hinek ji van li pêş in. Ji ber vê yekê ji bo min pirr zehmet e, ku ez bêjim, ez di vê romanê de, an jî di romaneke din de bi serketime û jê hez dikim. Lê ez karim tiştekî bêjim, ku ez ji yekê ji wan jî bi temamî ne razî me.

Firat Cewerî: *Lê ez bawer dikim wê Xelîl Dihokî ji yekê ji wan bêtir razîbe, loma ji nav hemû romanan romana bi navê "Siya Evînê" helbijartiye, li ser wê dixebite û li ser wê nivîsek dirêj nivîsandiye. Ji bo çi nemaze "Siya Evînê" û ne romanek din kek Xelîl?*

Xelil Duhokî: Wek me berê jî behsa Memduh Selîm Begê kir, ku bi rastî jî "Siya Evînê" baştirîn romana Mehmed Uzun e. Ew hem ji aliyê ziman, ji aliyê naverokê, ji aliyê teknîkê ve romanek bi serketiye. Di vir de ez naxwazim dûr û dirêj behsa romanê bikim, ji ber ku min bi xwe tiştekî dirêj li ser nivîsî ye û ez ê wê di pêş de çap

bikim. Bi a min ev roman romaneke girîng e.

Firat Ceweri: *Kek Xelîl tu ê karibî di aliyê girîngbûna romanê de çend mînakan bidî?*

Xelîl Duhokî: Wek min berê jî got, min li ser romanê nivîsek gelek dirêj amade kiriye, û ez ê di nêzîk de li ser wê semînerekê bidim. Ji ber vê yekê, bibûre, lê ez ê pirsa te bê bersiv bihêlim.

Firat Ceweri: *Mamûd Lewendî tu di vê derheqê de çi dibêjî?*

Mahmûd Lewendî: Wek kek Xelîl got, bi a min jî di aliyê teknîka romanê de mirov dikare bibêje ku roman e. Heya niha çar romanên Mehmed Uzun derketine, lê bi a min tenê du heb ji wan roman in. Ew jî "Siya Evînê" û "TU" ye. Lê herdiwên din "Mirina Kalekî Rind" û "Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê" naşibin romanan. Ez karim bêjim ku "Siya Evînê" romana Mehmed Uzun ya herî bi serketî ye. Ew di wê romana xwe de, digel pirr şer û pevçûn û nexweşiyê jî, dîsan evînê baş bi kar tîne.

Xelîl Duhokî: Berî niho jî me got, bi rastî di rewşek weha de, ku pirraniya dergehan li ber me girtîne, bi taybetî jî li Kurdistana Tirkiyeyê, loma di deh salan de ger mirov bikaribe van afirandinên ewçend mezin biafirîne, qonaxek gelek bilind û karekî pirr pîroz e. Gava tu berê xwe bidî medeniyeta ereban, tirk û farisan, ku xwedî dewlet in, xwedî bi hezaran weşanxane û enstîtut in, lê ê me nivîskarekî me yê hejar ji hepsê derketiye, hatiye li Ewrûpa ji me re çar roman nivîsandine. Bi a min ev karekî gelek pîroz û hêjaye. Ez bi tevayî qîmeta romanên Mehmed Uzun digirim, lê bi taybetî "Siya Evînê". Ez qîmeta hemû nivîskarên Kurd ku ji welatê xwe bi dûr ketine, di gel problemên civakî, aborî û siyasî ku ewçend berhemên hêja nivîsandine digirim. Ez ji romana Bavê Nazê, "Çiyayê Bi Xwînê Avdayî" jî hez dikim. Bi rastî romanek gelek baş e.

Firat Ceweri: *Gava "Siya Evînê" derket, hin kesan pirsîn, gelo ev "Memduh Selîm Beg" kî ye? Pirraniya xwendevanan navê Memduh*

Selîm Beg bi derketina romana "Siya Evînê" re bihîstin. Gelo bi nivîsandina Siya Evînê, armanca te çi bû Mehmed Uzun? Te xwest tu perçeyek ji toreya kurdî ya ku li ber jibîrbûyinê ye bidî pêş, an jî jiyana rewşenbîrekî kurd zelal bikî?

Mehmed Uzun: Berî ku ez bersiva vê pirsa te bidim, ez tiştekî biçûk li ser gotina we bêjim. Gava ez nivîkariyê dikim, ez naxwazim ferqê têxim navbera vê romanê, an jî wê romanê. Bi a min nivîskarî divê berdewam be. Ev yeka han pirr pêwîst e, lê mixabin li ba me kurdan çênebûye. Yek derketiye romanek nivîsandiye, kurteçîrokek nivîsandiye, helbestek nivîsandiye, lê paşê maye, dewam nekiriye. Divê mirov berdewam be, bikaribe nivîskariyekê ava bike û di nav wê nivîskariya xwe de pênc berhem, deh berhem, panzdeh berhem, bîst berhem hebin. Ji nav van jî tenê hin derdikevin pêş. Ew jî ne nivîskar bi xwe, lê xwendevan û rexnegir wan derdixînin pêş. Îro ger ku Marquez bi romana xwe ya "Tenêtiya Sedsalan" ve tê nas kirin, ne ku Marquez ew xwestiye, lê xwendevanan, rexnegiran û xelkê ew xwestiye û dane pêş. Nivîskarên dinyayê hemû wisan e, ji bo wê ez nizanim, ka kîjan romana min baş e, an ne baş e.

Firat Ceweri: *Ji bo çi nemaze Memduh Selîm Beg û ne rewşenbîrekî din?*

Mehmed Uzun: Ez ê niha werim ser wê jî. Bi baweriya min gava mirov romanekê an jî esereke edebî dinivîsîne, şertên ku mirov tê de ne, gelek tesîrê li nivîskariya mirov dike. Tiştê ku tu dinivîsînî, babet dibe ku gelek kevin be, an qet peywendiya wê û şertên tu tê de dijî bi hev re nîn bin, lê dîsa şertê te gelek tesîrê lê dike. Ez niha li surgunê me. Cara pêşî min navê Memduh Selîm Beg li Sûriyê bihîst. Li Tirkiyeyê ez berpirsiyarê kovarek kurdî bûm, li der û dora kovarê jî gelek ronakbîrên kurd hebûn, lê ne min, ne jî hevalên din kesî ji me navê Memduh Selîm Beg nebihîstibû. Gava dûre min navê Memduh Selîm Beg bihîst, bi rastî min ji xwe şerm kir. Û ez pirr

bi jiyana wî êşiyam. Di nav wê neçariye de miriye. Min behsa wê neçariya wî nekiriye. Heger we dîqet kiribe, roman heta salên sî û pêncan tê, esas piştî wê neçariya wî ya mezin dest pê dike. Min nexwest ez zêde bikevim nav wan. Lê gava min wa çavên xwe li jiyana ronakbîrên kurd gerand, min mêze kir, ku jiyana Memduh Selîm Beg mîna jiyana te ye, mîna jiyana kek Xelîl e, mîna jiyana Mahmûd e, mîna jiyana min e. Em hemû Memduh Selîm Beg in. Jiyana ronakbîrên kurd kêm zêde mîna hev e, mîna jiyana Memduh Selîm Beg e. Ji ber wê, min xwest ez bi şexsê Memduh Selîm Beg dîsan tawirek kolektîv tasfir bikim. Tabî tê de armanca min a ku Memduh Selîm Beg ji nû ve bê vejandin, ji nû ve bê nasîn, tasfîra dîroka wê demê, hemû armancê min tê de hene. Lê, berî her tiştî armanca min ew bû, ku ez bikaribim romanek kurdî, li ser şexsekî pêşketî yê kurd, lê di eynî wextê de siûda kurdan binivîsînim.

Firat Ceweri: *Wek çawan ku te Memduh Selîm Beg di jiyana xwe ya surgunê de nas kir, me jî ew di jiyana xwe ya surgunê de nas kir. Û nemaze bi derketina romana te ya "Siya Evînê" re navê Memduh Selîm Beg roj bi roj hat bihîstin û li ser dema wî, li ser jiyan û rewşenbîriya wî gotûbêj û sohbetên dirêj di nava xwendevan û ronakbîrên kurd de dest pê kir. Pirr kesan ji me hewcedariya lêkolîna jiyana vî rewşenbîrê kurd ê jibîrkirî dît. Kek Xelîl, ez bawer im te ê jî ev hewcedarî dîtibe, loma te li ser "Siya Evînê" lêkolînek kiriye.*

Xelîl Duhokî: Rewşa welatê me hinde xerab e ku nikare li ronakbîr û qehremanê xwe bifikire. Ji ber çi? Em bêjin niha li Kurdistana Tirkiye, kî dikare, kîjan kovar heye ku bikaribe li ser şoreşa Şêx Seidê Pîran binivîse. Ka kovarek, ka rojnameyek ku bikaribe li ser rewşa Îhsan Nûrî Paşa, yan li ser Cumhûriyeta Mehabadê binivîse? Bi baweriya min, miletê kurd, bi taybetî ronakbîrên kurd her demekê ku dergeh bo wan bêne vekirin, sînor bêne şikandin, ew dê bo ronakbîr û welatparêzên xwe pirr bi wefa bin.

Mahmûd Lewendî: Her tim dijmin pêşî li me girtiye. A îro ku li Kurdistana Tirkiye hebekî nermî çêbibe, ew ê bi sedan Memduh Selîm Beg ji nav me derkevin. Yanî hukûmetê nehiştiye em li ser xwe û dîroka xwe lêkolînan bikin. Em bêjin ku Mehmed Uzun ev bi riya romanê kiriye, hinin din dikarin bi riya nivîsin din ronakbîrên kurd bidin naskirin.

Firat Ceweri: *Gelo em karin bêjin, ku "Siya Evînê" ji jiyana Memduh Selîm Beg wêdetir, danasîna perçeyek ji dîroka me ya jibîrkirî ye?*

Mahmûd Lewendî: Rast e, mirov dikare bêje ku ev perçeyek ji jiyana siyasiya kurdî ya dema 1920 heta 1930 ye.

Firat Ceweri: *Kek Xelîl, gava te "Siya Evînê" xwend, tu di derheqa jiyana siyasî ya Kurdistana Tirkiyê de çi fikirî û tu hînî çi bû? An jî "Siya Evînê" çi da te ?*

Xelîl Duhokî: Di derheqa jiyana siyasiî ya Kurdistana Tirkiyeyê, berê zanebûna me hebû. Me bi komela Xoybûnê dizanîbû, me serîhildana Agirî nas dikir, haya me ji serîhildana Şêx Seîdê Pîran hebû. Lê Mehmed Uzun di vir de rewşa siyasî, bi hunermendî aniye ziman. Wek fîlmekî li ber çavên me raxistiye. Karekî baş û biserketî kiriye.

Mahmûd Lewendî: Ez karim vê yekê bêjim ku Mehmed Uzun xwe xistiye şûna Memduh Selîm Beg û li ser xwe romanek nivîsandiye. Ew di xeyalên xwe de çûye Şamê, çûye Bêrûdê, çûye Stenbolê. Yanî di vir de ez hin kêmasiyên teknîkî dibînim. Mesele, Mehmed Uzun behsa wê demê û keçikên qehpik dike, ez bawer im di wê demê de ev tiştên ku Mehmed Uzun behs dikin, tune bûn, lê ev tiştên ku ew behs dike, niha, li Parîsê heye.

Mehmed Uzun: Belê, di wê demê de jî û ji wê demê gelekî kevintir jî ew şiklê jiyanê hebû. Berî ez vê romana xwe binivîsînim, min li ser jiyan û kultura Misrê ya wê demê xebatek dûr û dirêj kir,

min jiyana Qahîreyê ya wê demê ji nêzîk de nas kir.

Xelîl Duhokî: Bi baweriya min Mehmed Uzun rast dibêje. Di salên heyştsedî, nehsedî, dema hîn Împeratoriya Osmanî hebû, bi rastî fesadî û pîsî û neheqiya di nava wê Împeratoriyê de hebû, li tu tarîxa dinê de nebûye. Ez bawer im ku Mehmed Uzun gelek bi zîrekî nêzîkî vê meselê bûye, bi raybetî jî meselê jinê. Em di romanê de dibînin, ku gava Memduh Selîm Beg êdî ji bin barên giran rana-be, xwe davêje hotel û malên jinan. Ev jî heqê Memduh Selîm Beg e; ji ber ku Memduh Selîm Beg însan e û hîsên wî ên însanetiyê ne.

Firat Ceweri: *Mehmed Uzun, tu ji jiyana rewşenbîrekî kurd der-basî romanek epîk, an jî folklorîk bûyî. Te "Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê" nivîsandiye. Li welatê me yê ku navê Evdalê Zeynikê nebi-hîstibe çi bigire tuneye. Lê mixabin kes nizane Evdal kî ye, ji ku ye, çi kes e. Lê wek bersiva vê pirsa han te hin cih di romana xwe de dane. Te Evdalê ewçend nas, lê dîsan jî nenas bi me daye naskirin. Gelo "Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê" kure bibe çavkaniya rewş û jiyana Evdalê Zeynikê?*

Mehmed Uzun: Mîna hemû berhemên edebiyata devkî, stiran û çîrokên li ser Evdal jî pirr in û varyasonên wan gelek in. Yanî li gora her varyasonê Evdal ji derekê ye, bi awakî jiyaye, ji derekê hatiye çû-ye derek din. Ew tiştên li ser wî hatine gotin û tên gotin hevdu na-girin. Berî ez dest bi nivîsandina romanê bikim, min xwest ku ez hemû varyasonan bicivînim, lê min dît ku tiştekî wilo rast û bi cih nîn in. Li gora her varyasonê her kes tiştekî dibêje. Her kes dibêje, Evdal ji vê derê ye, ji wê derê ye. Navê cih û derên ku di stiranên Evdal de derbas dibin, min ew nav danîne. Lê wekî din min tu nav danîne.

Ew li ku bûye, kengî bûye, li ku jiya ye, li ba kê jiyaye, di vê der-heqê de tu malûmat tune ne. Lê tenê min behsa mîrekî kurd kiriye, ew mîr ji xwe çêkirî ye, mîrekî wisan tuneye.

Firat Ceweri: *Ez bawer im wê çaxê ev berhem wê nikaribe ji nivîskar û lêkolînerên kurd re bibe çavkaniya lêkolînê li ser Evdalê Zeynikê...*

Mehmed Uzun: Na, wê nikaribe bibe çavkanî ji bo lêkolîna li ser Evdalê Zeynikê. Ji ber ku ev roman e, min xwestiye ez romanekê binivîsînim. Ji sedî nod û pêncê bûyerên, danûstandinên, şexsên qehremanên romanên çêkirîne. Ew hemû xeyalî ne. Lê gava min ev xeyal avakirine, kaniya min Evdalê Zeynikê û stiranên Evdalê Zeynikê bûne. Mmin xwestiye bi alîkariya Evdal hin tiştên din ava bikim. Ji bo wê divê ku ev kîtab mîna lêkolînekê neyê dîtin.

Firat Ceweri: *Mirov di vê romana te de nêzîkahiyeke stîla Yaşar Kemal dibîne. Ger em romana Yaşar Kemal "Efsaneye Çiyayê Agirî" nehesibînin, di romana wî ya bi navê "Erd Hesin Ezman Sifir" de Evdalê Zeynikê heye. Efsaneya wî heye, qulung heye, vebûna çavên Evdêl heye. Tema herdu romanan nêzîkî hev in, herdu jî ji kaniya zargotina kurdî dizên.*

Mehmed Uzun: Mixibin, min romana Yaşar Kemal "Erd Hesin Ezman Sifir" nexwendiye, lê min film dîtiye. Em ji bîr nekin ku hemû çavkaniyên romanên Yaşar Kemal ji zargotina kurdî ye, stiranên kûrdî ne, destanên kurdî ne. Efsanên kurdî, stiranên kurdî, destanên kurdî, çîrokên kurd; eger em li tarîxa edebiyata xwe binihêrin, em ê bibînin ku ji bo me jî çavkanî ne. Yanî edebiyata me li ser wan ava bûye. Bi rastî jî dewlemendiya zimanê me, dewlemendiya gotina kurdî di wan de ye, yanî di edebiyata devkî de ye. Divê ku em xwe bigihînin wê. Yek ji wezîfeyên me jî ew e ku em wê ji nû ve vejînin. Bi stîlên nû, formên nû, teknîkên nû bikaribin qalibekî nû, kirasekî nû li wan bikin û wan ji bo nivşê nû bikin entresan. Gava nivşê nû bixwînin hem bikaribin xwe tê de bibînin, hem jî bikaribin bi tarîxa xwe re danûstandinek xurt ava bikin. Gelek nivîskarên pêşketî yên miletên din weha kirine. Ez mînakekê bidim; James Joyces he-

ye, nivîskarekî Irlandiye, romana wî ya herî mezin "Odysseus" li ser destana Odysseus ava dibe. Wî destana Odysseus ji xwe re esas girtiye, lê jiyana Dublînê tasvîr dike. Mînakên wilo bi hezaran e. Çima em nekin? Tiştên ku niha ji bo min pirr muhîm û balkêş in, ez dixwazim di zimanê kurdî de gelek stîl û teknîkan bikarbînim. Zimanê kurdî ji bo kîjan stîlan, ji bo kîjan teknîkan rê dide. Ji ber ku min xwest ez romaneke epîk jî binivîsînim.

Firat Ceweri: *Gelo em dikarinbi bêjin, gava em behsa modernîzmê bikin, divê em xwe, zimanê xwe, kultura xwe û paşeroja xwe baş nas bikin. Em li ser koka xwe nûjen bibin?*

Mehmed Uzun: Belê, her wisa ye. Xwediyê xelata Nobelê Eliot, ku hem modernîst û hem jî tradisyonîst bû, gotiye : Ew modernîzma ku li ser tradisyonekê ava nebe, ne modernîzme. Tu nikarî modernîzmê ji ezmanan, an jî ji welatin din bînî, divê li ser tiştekî ava bibe. Edebiyata me ya nivîskî ne dewlemend e, lê edebiyata me ya devkî pirr dewlemend e, ev yeka ha ji bo me kehniyek e.

Firat Ceweri: *Kek Xelîl tu çi dibêjî?*

Xelîl Duhokî: Em weke milet li paş mane, bindest û neçar mane. Hemû medeniyetên me, hemû folklora me, hemû destanên me, hemû serîhildan û berxwedanên me, di stiran û çîrokên me de ne. Ez bi xwe yek ji wan kesa me, ku gelek qîmet didim stiranbêj û çîrokbêjên kurd. Mirov pirr tiştan di stiran, û çîrokên kurdî de dibîne. Bi baweriya min nivîskarên zîrek dikarin pirr tiştan ji stiran, çîrok û destanên kurdî hîn bibin. Ji ber ku bi rastî arşîva kurdî ya nivîskî vala ye. Ji ber vê hindê divê em tiştên kevin bi yên nû ve girê bidin û pêşerojek rohnî jê derêxin.

Firat Ceweri: *Wek hûn jî dizanin, di kurtesohbeteke wilo de peyivandina li ser edebiyata kurdî ya surgunê û li ser çar romanên cihê cihê ne hêsan e. Edebiyata kurdî ya surgunê bi serê xwe hêjayî gotûbêjeke taybetî ye. Her weha, her romanek jî bi serê xwe mijara munaqe-*

şe û sohbetekê ye. Ez hêvîdar im, ku bi vê munaqeşeya me, hindik be jî wê haya xwendevanên li welêt ji edebiyat û çapemaniya kurdî ya derveyî welêt çêbibe û bi vê munasebetê hewcedariya xwendina berhemên kurdî bibînin...

Nûdem, No: 1, 1992

EDEBIYATA KURDÎ

Edebiyat carinan di dema têkçûna siyasetê de, carinan jî bi gurrbûna tevgera siyasî re geş dibe, bi pêş dikeve, xurt dibe.
Mîna ku li gelek welatên dinyayê bûye, li welatê me jî bi guhertinên rewşa siyasî re, rewşa ziman û edebiyata kurdî jî tête guhertin û rengekî nû distîne. Bi hatina Cûnta leşkerî, 1980, xwendevan, siyasetvan û ronakbîrên kurd bi girsî, ji neçarî koçî welatên Ewrûpayê kirin. Demekê tevgera kurdî sist bû, cih bi cih têkçûna wê hate hîskirin, lê ronakbîrên kurd yên ku derketibûn Ewrûpayê, xwe nas kirin, gelek ji wan ji fikir û ramanên xwe yên berê gerriyan, dev ji wê ramana xwe ya ku "bi ziman û edebiyata kurdî re mijûlbûn, paşverûtî ye " berdan.

Gava mirov ji welatê xwe bi dûr dikeve, şerd û şirûdên biyanîstanê, jiyana biyanîtiyê mirov stûxwar dike, hîsî dike, diltenik dike. Ev hersê faktorên han kirin ku kurd li xwe vegerin û xwe nas bikin. Li xwevegerîn û xwenasînê jî kir ku em li nasnava xwe xwedî derkevin. Li nasnava xwe xwedîderketinê em ajotin ser ziman û edebiyata me. Em têgihîştin ku miletek bi ziman, edebiyat û kultura xwe heye û bi van mijûlbûn jî ne paşvetûtî, ne jî dijminatiya tu gelan e. Berevajiya wê, bêî van biratiya bi gelên din re ne mumkun e. Xwendayên kurd yên ku ev yeka ha fêhm kirin, milên xwe lê wergerandin û her yekî ji hêla xwe ve dest avêtin vî karê pîroz. Yên helbest nivîsandin, yên çîrok nivîsandin, yên roman nivîsandin, yên ku lêkolîn û hevpeyvîn ceribandin, yên dest bi wergerandina berhemên dinyayê

kirin. Ew zimanê ku bi salan ji ber sedemên xuyayî ve nehatibû bikaranîn, tenê zimanê gundî û şivanan mabû, di demeke kurt de bû zimanekî nivîsandinê. Di tevayiya Ewrûpa de zimanekî yekgirtî û edebî pêk hat. Hêdî hêdî standartek çêbû.

Rêkxistin û partiyên kurdan weke berê ne bi tirkî, lê wan di civîn û semînerên xwe de zimanê kurdî bi kar anîn, belavokên xwe bi kurdî nivîsandin, navên kurdî li zarokên xwe kirin; hebe tune be wê ji ber girr û nefretê be, navên xwe yên bi tirkî û erebî guhertin û di şûna wan de navên kurdî li xwe kirin. Şaîr, nivîskar û hunermendên kurd, yên ku bi her awayî ji ziman û nasnava kurdî bi dûr ketibûn, li Ewrûpa bi xwe hesiyan, xwe nas kirin, hînî zimanê xwe bûn û dest pê kirin li gorî îmkanên xwe bi kurdî berhemên xwe afirandin. Li derveyî welêt bêhejmar weşanxaneyên kurdî ava bûn, sazgehên demokratîk û kulturî ava bûn, kovar û rojnameyên bi kurdî derketin, fîlmên bi kurdî çêbûn. Mirov kane bêje ku ronesanseke ziman û edebiyata kurdî dest pê kiribû. Lê mixabin, ev tevgera kultura kurdî tenê li derveyî welêt dima, ew nedigihîşte hevwelatiyên me yên li welêt. Tew demek hat ku kurdên li derveyî welêt û yên li welêt di aliyê zimên de ji hev bi dûr ketin. Di danûstandin û diyalogan de bi zehmetî ji hev têdigihîştin. Ev xebat û keftelefta kulturî ya bi salan li Ewrûpayê bû, nedigihîşte welêt, hevwelatiyên me yên li welêt ji vê tevger û pêşketinê destkewtî nedibûn. Heya demeke nêzîk jî haya wan ji xebat û tevgera Ewrûpayê tune bû, wan navên nivîskar, kovar û rojnameyên bi kurdî nebihîstibûn. Xebata kulturî ya ku bi gelemperî li Ewrûpayê û bi taybetî jî li Swêdê geş bûbû di dolava xwe de mabû.

Ta ku di van salên dawî de, bi xurtbûna tevgera kurdî li welêt, bi avakirina pira danûstandinê di navbera kurdên li Ewrûpa û yên li welêt, bi avakirina weşanxane û weşandina weşanên bi kurdî li Tirkiyê, kurdî di demeke kurt de bi pêş ket û tîrêjên hêviyê berda dilê

me.

Lê gava mirov bi tevayî dinihêre, hîna jî pirraniya ronakbîrên kurdan li Tirkiyê dev ji ramênên xwe yên berê bernedane, ji berdêla mijûlbûna ziman û edebiyata kurdî ew ji xwe re ziman û edebiyata tirkî hildibijêrin. Ew bi hev re, di nav xwe de bi tirkî dipeyivin, guh nadin ziman û edebiyata kurdî, serê xwe bi kultura kurdî re naêşînin. Digel ku ev camêrên ha bi kurdiya devkî dizanin jî, ew hewl nadin ku xwe hînî kurdiya nivîsandinê bikin, hebe tune be, ew ê ji tembelî be, ew gazinan ji zehmetiya zimanê kurdî dikin.

Kategoriyeke din ya nivîskaran heye, ku hem kurd in, hem kurdîtiyê dikin, lê ji ber sedemên siyasî, civakî û cografî kurdiya xwe ji bîr kirine, berhemên xwe bi tirkî dinivîsînin. Nivîskarên di vî celebî de heya do kêm bûn, lê îro hene. Yek ji van nivîskaran Cemşîd Bender e. Bender di hejmara Nûdemê ya çaran de wilo dibêje: " Di pêvajoya dîrokê de edebiyata kurdî bi zimanê serdestan bi pêş ket. Ebû Muslum Horasanî, Ebû'l Vefa, Şehabedîn Suhreverdî, Abdul Kadîr El-Geylanî, Şêx Adî, B. Mîdsafîr bi erebî nivîsandine. Di dema Selçûkiyan de Husamettîn Çelebî yê kurd bi zimanê resmî farisî nivîsandiye. Seyit Nesîmî, ji şaîrên me yên dîwanê Nabiyê kurd û Fuzûlî bi erebî û Osmanî nivîsandine. Di dema me de jî gelek şaîr û nivîskarên kurd bi zimanê resmî bi tirkî nivîsandine. Ji xwe ev heftê sal in nivîsandina bi kurdî li Tirkiyê qedexe ye. Lê ez nivîskarekî kurd im û ez bi vê jî serbilind im. "

Em jî bi serbilindahiya Cemşîd Bender serbilind dibin û ger ew xwe weke nivîskarekî kurd dihesibîne ser çavan, lê yên ku wî navên wan hejmartine nivîskarên kurd in an na? Wan xizmet ji ziman û edebiyata kê re kirine? Fuzûlî şaîrê kîjan zimanî ye?

Gelek şaîrên edebiyata dîwanê kurd bûne... Lê wan berhemên xwe bi kurdî nenivîsandine. Loma jî ew îro weke şaîrên tirk yên dîwanê têne pêşkêş kirin. Lê kes nikane ji Ehmedê Xanî re bibêje ew

tirk e, an jî şaîrekî tirkan e. Ji ber ku Ehmedê Xanî berhemên xwe bi zimanê kurdî nivîsandine. Kes nikane ji Melayê Cizîrî re bibêje ew şaîrê ereban, farisan an jî tirkan e. Ji ber ku Melayê Cizîrî berhemên xwe bi kurdî nivîsandine. Kes nikane bibêje Eliyê Herîrî, Melayê Batêyî, Feqiyê Teyran ne şaîrên kurdan in. Ji ber ku wan berhemên xwe bi kurdî nivîsandine. Lê Fuzûlî, Nabî, Nefî, Ahmed Haşîm, Nafiz û gelekên din ku bi eslên xwe kurd in, lê berhemên xwe bi kurdî nenivîsandine. Gelo mirov ê bikaribe ji van re bibêje şaîrên kurdan?

Musa Anter di hejmara Welat ya 48'an (1993) de di nîvîseke xwe ya li ser Yaşar Kemal de wilo dibêje:" Heyfa Yaşar Kemal. Lê yên ku heyfa wan e ne Kemal bi tenê ye. Yên wek wî ji berê ve û niha jî pirr in. Wek şaîrên dîwanê Nefî, Nabî, Ziya Gökalp, Silêman Nafiz, Elî Emîrî û hwd. Heta ez karim xwe jî bêjim, ma çi îşê min bi tirkan re heye? Pirraniya nivîsên min heya îro bi tirkî ne. Rica min ew e ku ji îro û pê ve xortên kurdan me paqij bikin. Em ne xayin in, lê em nezan û bêmecal bûn, em mecbûr diman li pîpîka dijminan bixin."

Lê ew nezanî û bêmecaliya ku Musa Anter behs dike îro nema ye. Hin şaîr, nivîskar û xwendayên kurd, ku bi tirkî dinivîsînin û bi tirkî tevdigerin, gazinan ji zehmetiya zimanê kurdî dikin. Ma gelo bi rastî jî hînbûna zimanê kurdî bi qasî ku ew dibêjin zehmet e? Ji bo gundiyekî nexwendî dibe ku zehmet be, lê ji bo ronakbîr û siyasetvanekî bi tenê karê çend mehan e. Ronakbîrekî ku bi tenê çend mehên xwe bide hînbûna zimanê kurdî, ew ê hîn bibe û ew ê bi hêsanî bikaribe bi kurdî binivîsîne û ji xelkê xwe yê nezan re bibe mînak. Lê mixabin, ronakbîrên me vê nakin, hin bi zanebûn, hin jî bi nezanî ji ziman, edebiyat û kultura kurdî bi dûr dikevin. Ew vî barê giran li ser milên gundî û hejarên kurdan dihêlin. Loma jî di nava gundî û hejarên kurdan de wilo bûye ku her tiştên biçûk, kirêt û ne

spehî malê kurdan e. "Kera kurmancî", "Mirîşka kurmancî", "Em kurmancên reş in" û hwd. Kompleksa xwebiçûkdîtinê, nebaweriya bi xwe, li ba kurdan di giraniyê de ye.

Şikandina vê yeka han bi xwenasîn û bi rûmetbûna ronakbîrên kurd ve girêdayî ye.

Gelî ronakbîrên kurd ên bi rûmet! Li xwe vegerin, xwe nas bikin, bi zimanê xwe tevbigerin! Li ser koka xwe rabin, li ser hîmê xwe geş bibin! Mirov ancax di nava miletê xwe de serbilind e, di nava miletê xwe de serbilind bibin! Biratiya bi gelên dinyayê re bi hebûna mirov dest pê dike. Li hebûna xwe xwedî derkevin! Hebûna we zimanê we ye, kultura we ye, edebiyata we ye!

Me ji mêj ve dixwest em li ser nivîskarên ku bi eslê xwe kurd in, lê bi tirkî dinivîsînin munaqeşeyekê vekin. Hevalê me Husên Düzen di hejmara me ya sisyan de li ser Esma Ocak bendek nivîsandibû. Esma Ocak kurdeke Diyarbekirê ye. Ew van demên dawî bi çîrok û romanên xwe li Tirkiyê hatiye naskirin û di kurtedemekê de navdar bûye. Pirtûkên wê ji aliyê rexnegiran ve têne pesinandin, çîrokên wê bûne film, filmên ku ji çîrokên wê çêbûne bûne xwediyê xelatan. Cemal Süreya yek ji şaîrên Tirkiyê yê herî navdar û nûjen e. Cemal Süreya kurd e. Herweha Ahmed Arîf jî yek ji navdartirîn şaîrê Tirkiyê ye. Ahmed Arif kurd e. Yaşar Kemalê ku îro romannivîskarê Tirkiyê yê herî li pêş e û pirtûkên wî bi zêdeyî çil zimanan hene, kandîdatê (aday) xelata Nobelê ya edebiyatê ye, bi eslê xwe kurd e, lê ew weke nivîskarekî tirk tête pêşkêşkirin. Ger em navên hemû şaîr û nivîskarên ku bi eslê xwe kurd in lê bi tirkî dinivîsînin, di vir de binvîsînin, wê lîsteya me dirêj bibe û dibe ku rûpelên me jî têrê nekin.

Lê ji bo zelalkirina vê pirsgirêkê û bi armanca vekirina munaqeşeyekê me bi çend pirsan nêrînên hin nivîskarên kurd girtin.

Nûdem, No: 5, 1993

Pirsên me:

1– *Hişyarbûna kurdan ya siyasî û civakî, hişyarbûna kulturî û intelektuelî jî bi xwe re tîne. Îro kulmek nivîskar û intelektuelên kurd gihîştiye. Ji van hinek bi kurdî û hinek jî bi tirkî dinivîsînin. Lê herdu hêl jî xwe weke nivîskarên kurd dizanin. Bi a we çawa ye? Gelo mirov kane ji berhemên ku bi zimanin din têne nivîsandin re bibêje berhemên kurdî an jî edebiyata kurdî?*

2– *Hem li Tirkiyê, hem jî li welatên din yên ku îro serdestiya kurdan dikin gelek nivîskar hene, ku bi eslê xwe kurd in, lê bi zimanên serdestan berhemên xwe diafirînin. Digel ku ew ji dê û bavekî kurd in, lê ew xwe weke kurd nahesibînin. Gelo mirov kune çi navî li van celebnivîskaran bike? Ma mirov kane ji wan re bibêje nivîskarên kurd?*

3– *Kategoriyeke din ya nivîskaran heye, ku hem kurdîtiya xwe înkar nakin, hem jî temayên wan jiyana kurdan û çavkaniyên wan kultura kurdan e. Lê ew berhemên xwe bi zimanê serdestan diafirînin. Edebiyatzan û rexnegir jî wan weke edebiyatvanên serdestan pêşkêş dikin. Bi a we çawa ye?*

4– *Yek ji van nivîskaran Yaşar Kemal e. Yeşar Kemalê ku di cîhana nivîskariyê de xwediyê navekî bi rûmet e, pirtûkên wî bi nêzîkî çil zimanan hene, kandîdatê (adayê) xelata Nobel ya edebiyatê ye, bi eslê xwe kurd e û camêr li gelek cihan jî kurdîtiya xwe înkar nake. Bi a we Yaşar Kemal nivîskarekî kurd e an nivîskarekî tirk e? Ger hûn wî weke nivîskarekî tirk bibînin çilo û bi çi awayî, na, ger bi a we ew nivîskarekî kurd be, ji bo çi?*

Nûdem, No: 5, 1993

Rohat: 1- Dema em qala edebiyata kurdî dikin, bêguman em berhem û afirandinên ku tenê bi zimanê kurdî hatine nivîsîn, fam dikin. Di navbera edebiyat-zimên de bendên gelek xurt hene. Berhemeke ku bi zimanê biyanî hatiye nivîsîn (tirkî, farisî, erebî, an jî almanî, îngîlîzî) mirov nikare beşeke edebiyata kurdî bihesibîne (herçiqas nivîskarên van berheman kurd bin jî). Ji ber ku her edebiyatek li ser bingehên hêz û îmkanên wî zimanî pêk tê û pêş dikeve. Di vê babetê de pîvana mezin çawa tê xuyan ziman e. Bêguman ev baweriyan, ji bo welatekî ku li ser ziman û nivîskarên wî zordestî û qedexebûn tunin, derbas dibin. Ji aliyê din, li welatekî wek Kurdistanê li ser ziman zordestiyeke mezin heye, ew ziman qedexe ye, di vê rewşê de mirov rastî nivîskarên bi du ziman (wek kurdî-tirkî), an jî nivîskarên ku ji der zimanê xwe dinivîsin, tê. Îro çawa em dibînin, wek mîsal li Tirkiyê beşek nivîskarên kurd hene bi tirkî dinivîsînin, lê belê xwe wek nivîskarên kurd dihesibînin. Herçiqas ew bi tirkî binivîsînin jî, dema ew xwe wek kurd qebûl dikin, vê carê mirov nikare wan wek nivîskarên tirk bi nav bike. Li vira pîvana mezin, pîvana îdentîfikasyonê ye. Ji ber ku bêdaxwaziya wan, bê îrada wan, zimanê wan ji destê wan hatiye girtinê, nayê bi kar anîn, li welat zimanê perwerdekariyê-komînîkasyonê nîne. Ew mecbûr bûne, an jî mecbûr dibin, bi tirkî dinivîsin. Bi kurtî dema dixwazin bersiva kî nivîskarê kurd e? Kî nîne? Pêwîst e, em du pîvana bidin ber çavan a) Ziman, b) îdentîfikasyon. Ji aliyê din mefhûmên "edebiyat" û "nivîskar" du kategiriyên ji hev cuda ne. Nûnerên edebiyata kurdî û nivîskarên kurd jî, wek du kategoriyan dikarin ji hev bên cihê kirin. Mîsala herî berbiçav bêguman *Şerefxan* e, yê nivîskarî herçiqas berhema xwe ya dîrokî **Şerefname** bi farisî nivîsîbe jî, ew wek nivîskarê kurd tê zanîn. Ji ber ku wî xwe kurd hesibandiye, li vira pîvan ne ziman e, pirsa îdentîfikasyonê ye.

2– Me çawa li jor jî got, di warê navkirinê de hin pîvan di destê me de hene. Ji der van pîvanan, herçiqas dê-bavê wî-wê kurd be jî, dema ew xwe kurd nehesibîne, mirov nikare wî/ wê kurd, an jî nivîskarên kurd bihesibîne, wek Ziya Gökalp...

3 – Îro gelek nivîskarên ku dê-bavên wan kurd in, ji ber ku bi zimanekî mayîn dinivîsin, bi navê edebiyata ku ji wî zimanê biyanî hatine afirandin, tên hesab kirin. Di nav vê beşa nivîskaran de tiştê bala mirov dikşîne, ji der ziman, ji aliyê din de ew xwe wek kurd jî nahesibînin, hatine asîmîle kirin, serêşî, nerehetiyên wan yên îdentîtetê-îdentîfikasyonê hene. Di nav berhemên wan de cîhgirtina dema kurdan bi serê xwe wek pîvanekê mirov nikare bide ber çavan, bifikirin! nivîskarekî Alman, an jî Ermenî di nav berhemên xwe de cihekî fireh bide tema kurdan, mirov dikare van nivîskaran, wek nivîskarên kurd bihesibîne? Naxêr, tiştekî wisan nabe, wek Îsmail Beşikçi...

4 – Yaşar Kemal heta niha berhemên xwe hemû bi tirkî nivîsîne, bûye nivîskarekî tirk. Bend û peywendiyên nivîskar-xwendevan-berhem di vê rewşê de, beşeke hebûna edebiyata tirkî pêk tînin. Herçiqas Yaşar Kemal kurd be jî, di berhemên wî de kurd cihekî taybetî digrin jî, ew xwe wek nivîskarekî tirk dihesibîne. (Wek şexs ew xwe kurd dihesibîne). Sibe-dusibe wek Yılmaz Güney, ew jî rabe bêje; "Ez hunermendekî kurd im", vê carê çawa me li jor jî şirove kir, rewş diguhere. Êdî mirov nikare bêje, ew nivîskarekî tirk e, em bêjin jî, dema ew nebêje, çawa tê xuyan ji destê me tiştek nayê, realîta kurdan, serêşiyên kurdan yên îdentîtet û îdentîfikasyonê îro ji etabeke nuh re derbaz dibin. Ger û lêkolîna mirovan çawa em dibînin tehr û teşeyên nuh werdigrin, dinya û serê wan jî tevlihev e. Ji ber ku îro li Tirkiyê rewş, merc-hoyên azad tunin, riyên xweîfadekirinê

hatine xitimandin, mirov pêwîst e, jan-serêşiyên nivîskarên wek Yaşar Kemal jî fam bike, hebûna wan yekcar înkar neke...

Dema em dibêjin "Nivîskarên kurd" em du tiştan fam dikin; a) Kesê ku kurd e û berhemên xwe bi kurdî dinivîse, b) Kesekî mecbûr maye bi zimanekî biyanî dinivîse, kurd e û xwe wek nivîskar, nivîskarekî kurd dihesibîne.

Rewşa Yaşar Kemal ji van herdu tarîfan cudatir e. Ew her çiqas wek şexis xwe kurd dihesibîne jî, wek nivîskar ew nivîskarekî tirk tê zanîn, bi peyvên din, ew jî wek nivîskar xwe nivîskarekî kurd nahesibîne. Bi kurtî wek nivîskar (ne wek şexis) Yaşar Kemal bêşik di nav edebiyata tirkî de cîh digre. Bi edebiyata tirkî ve xwe îdentîfe dike. Bêguman ev pirsên kesname (îdentîtet) nivîskaran, ji bo gelên wek kurdan pey koka xwe ketine, dixwazin kesnama xwe biparêzin, pirsên rojane ne û girîng in, ji bo gelên azad, ev pirsan îro nayên munaqeşekirin, ewqas jî girîng nayên dîtin. Ji ber li her welatekî azad, her nivîskarek heta ku pêwîstîk tune be, bi zimanê xwe berhemên xwe dinivîsin û kesnama wan zelal û kifş e.

Nûdem, No: 5, 1993

Nacî Kutlay: Li ser vê pirsgirêkê hewceye ku meriv lêkolîn û munaqeşeyên girîng bike. Ez nizanim ka we çiqas rûpelên NÛDEM'ê ji bo vê pirsê veqetandiye. Meriv dikare vê pirsê bi taybetî, bi serê xwe munaqeşe bike. Wê çaxê meriv dikare bi gelek aliyan ve li pirsê mêze bike. Ez hêvîdar im ku di rojên pêş, firseteke weha wê derkeve. Lewra, niha, çiqas ji destên min tê, ez ê kin û kurt dîtinên xwe pêşkêş bikim.

Pirsên we ku bi hev re girêdayî ne, ez jî dixwazim bersivên wan bi tevayî bidim, lê belê pirsa dawî ya di derheqa Yaşar Kemal de ji yên din piçekî cuda ye. Lewra ez ê di dawiyê de bi taybetî çend pirsan ji bo vê meselê bêjim.

Bi dîtina min, pirskirina bi vî tehrî gelekî ne bi cî ye. Ji bo ku hemû nivîskar ji hevdu cuda ne û xusûsiyetên wan ên taybetî hene. Meriv bi gelek aliyan wek hev in, lê belê, bi hinek aliyan jî ji hev cuda ne. Nivîskar jî weha ne. Meriv dikare bi van xusûsiyetên wan binhêre û wan têke nav kategoriyan. Ev metod bi pirranî di dibistanan de, ji bo ku şagirt hêsa hîn bibin tê şuxulandin. Meriv dikare li gor xusûsiyetên wan nivîskaran, an jî nivîskarên hine deman, wan ji hevdu cuda bike. Wek naturalîst, romantîk û realîst wh. An jî li gor deman, klasîk, nûdemîn wh. Lê belê meriv nikare angorî van kategoriyan, nivîskarekî bide naskirinê. Ev têrê nakin.

Hela bi taybetî, angorî eslê wan î etnîkî, kategorîkirina nivîskaran ne durust e û ne jî ilmî ye.

Bi vî tehrî û bi vê dîtinê, kategorîkirina nivîskaran di jiyanê de ne mumkun e, pirr zehmet e. Wek qaîde yên fizîk û kîmya nîn e. Di jiyanê de meriv yê herî bi qîmet e. Ne wek "tiştan" e. Divê meriv bi vî çavî û bi vê dîtinê li niviskaran binhêre. Alet û wesîta çand û edebiyatê "ziman" e. Edebiyata kurdî, ji wan berhemên ku bi kurdî hatine nivîsandinê an jî bi kurdî hatine gotinê tên holê. Meriv dikare tenê qala wê edebiyatê bike ku bi wî zimanî hatiye nivîsandin. Meriv bi hine sebebên an jî hine demên taybetî bi zimanê xwe nikare binivîse û bêje. An zimanê xwe rind nizanibe û an jî zimanê wî/ wê qedexe be. Ji bo van sebeban, nivîskar berhemên xwe ku bi zimanekî din nivîsîbe, ew berhem ne ji edebiyata milletê nivîskar in, ya rast ji edebiyata ew zimanê ku hatine nivîsandinê ne. Em nikarin bi tehrekî din qebûl bikin. Wisa qebûl kirin li dijî jiyanê û xusûsiyetê "tişt" an e. Edebiyata kurdî ji berhemên bi kurdî, edebiyata tirkî jî ji berhemên bi tirkî hatine nivîsandinê çê dibin. Milletê wî nivîskarî meseleke duemîn e. Caran xwendevan milletê wî nivîskarî qet nayne bîra xwe. Yê herî girîng, zimanê berheman e.

Nivîskar, pirsên gelê xwe, folklor, muzîk, edetên xwe bi zimanekî

din nivîsîbe ew berhem nabe edebiyata milletê wî. Yê bibe edebiyata wî zimanî ku pê hatiye nivîsandin. Wek, bi swêdî, meriv hinek bûyerên ku li der-dorên Diyarbekirê qewimîne binivîse, dewet û şînên wan herêman bîne ser ziman, em dikarin ji xwe bipirsin, ev dibe berhemek ji edebiyata kurdî? ha min nivîsîye, ha Svensson nivîsî ye, çi ferq heye?

Bi ya min, di bingeha van munaqeşeyan de dijîtiyek heye. Ew jî, kurd çima bi tirkî, erebî, farisî an jî bi rûsî dinivîsîne. Ev tiştekî cuda ye ku ana ne ciye ku em li vir li ser bisekinin. Di nav sedan gelê dinyayê û dewlemendî û zehmetiyên tarîxî hemû tişt bi angorî dilê meriyan nabe. Meriv caran nexwaze jî, zimanê dê û bavê xwe baş an jî qet nizane.

Ev tiştekî vekirî ye, ku xwandiyên kurdên Tirkiyê, gelekên wan xwendin û nivîsandina bi tirkî ji ya kurdî baştir dizanin. Lewra jî gelekên wan bi tirkî dinivîsin. Bi vî tehrî alîkariya edebiyata tirkî dikin. Em nexwazin jî wisan dibe. Ji bo wê, meriv dikare çi bike, ev tiştekî din e.

Di nav pirsên we de tiştekî din jî heye; nivîskarek ku ji malbateke kurdî be û bi kurdî nenivîsîbe, hûn dipirsin ku em ê yên weha çi behesibînin? Bi a min, ev tiştekî vekirî û şexsî ye. Meriv xwe çilo dihesibîne wilo ye. Kesên ku xwe kurd nehesibînin û bi kurdî nenivîsînin em ê jê re çi bibêjin.

Em bên ser pirsa Yaşar Kemal: Ez bi xwe Yaşar Kemal baş nas dikim û me pirr caran li ser vê pirsê jî xeber daye. Yaşar Kemal ji malbateke kurd e. Kurdiya xwe li hemû deran, angorî xwe tîne ser ziman. Li Edenê mezin bûye, lewra kurdî baş nizane. Kurdiya wî qels e. Lê belê hostekî zimanê tirkî yê mezin e. Folklora kurdî û karekterên kurdî di berhemên xwe de gelek caran dûr û dirêj nivîsîye. Eslê wî kurd e, lê bi tirkî nivîsî ye. Li gor dîtina min ku li jor min got, Yaşar Kemal nivîskarekî bi eslê xwe kurd e lê nivîskarê Tirkî ye.

Em ku bi taybetî li ser eslê nivîskaran bisekinin, em naxwazin jî, tesîr û sînorê wî/wê yî navnetewî teng dikin. Yaşar kemal bi vê hostatî û navnetewiya xwe, di berhemên xwe de folklor û gelê kurd bi dinyayê dide naskirinê.

Ev neheqiyeke mezin e, ku hinek kes hertim dipirsin û li serê wî dixin ku Yaşar Kemal çima ne bi kurdî lê bi tirkî dinivîse.

Nûdem, No: 5, 1993

Hesenê Metê: 1- Mijara berhemekê, bi taybetî jî mijara berhemeke edebî li ser çi dibe bila bibe, li ku derbas dibe bila bibe, lê bi kîjan zimanî hatibe nivîsandin, edebiyata wî zimanî ye. Nimûne: Li ser dema Hîtler berhemên edebî jî hatine nivîsandin. Bûyer li Almanyayê, li Swîsreyê, li Polanyayê derbas dibe. Bi fransî, bi swêdî, bi îngilîzî û îtalî hatine nivîsandin. Baş e, em ê çawa bibêjin ku ev berhemên ha edebiyata almanan e? Bi ya min, na! Pirtûk bi kîjan zimanî be, edebiyat jî dibe edebiyata wî zimanî.

2- Nivîskarekî bi pîrika xwe, bi dê û bavê xwe kurd be, bi kurdî nenivise û tew di ser de jî rabe bibêje: "Ez ne kurd im, an jî naxwazim bibim kurd!" Wê çaxê jî mafê tu kesî tuneye ku ji wî zatî re bibêje: "Ew kurd e, an jî tiştekî kurd e." Ev dibe tiştekî wekî pîne, an jî boç û bi wî zatî ve dizeliqe. Bi ya min, ku meriv bi zimanê lîteraturî nîgara wî bike, divê meriv bibêje: Bi pîrik, an jî bi dê û bavê xwe kurd e, bi kurdî nanivîsîne û naxwaze weke kurd jî were naskirin. Ewqas! Lê ku meriv bi zimanekî polîtîkî nîgara wî bikin, mirov ê gelek tiştên din bibêjin. Gelek caran meriv dibihîze ku dibêjin: Kurdekî xwefiroş, xayîn... Lê ez bi xwe naxwazim bi vî zimanî bipeyivim.

3- Bi ya min edebiyatzan û rexnegîr rast dibêjin. Kurdekî ku nikane bi kurdî binivîsîne, lê bi tirkî xwediyê berhemên edebî ne, bi zima-

nekî lîteraturî meriv ê nikanibe ji wan re bibêje nivîskarekî kurd e. Lê bi zimanekî sosyolojîk meriv ê bibêje, îdentîteta wî kurd e.

4 - Ku Yaşar Kemal bibêje "Ez kurd im" ew kurd e. Ku bibêje: "Ez nikanim bi kurdî binivîsînim" ew jî rast e. Berhemên hêja afirandine, li gor xwendevanan ew jî rast e. Lê dema ku dîsa bi zimanekî lîteraturî were gotin, divê meriv neheqiyekê li wî, an jî li gelê kurd nekin û nebêjin: Nivîskarekî kurd e. Herçiqas li Hindistanê îngilîzî jî tê pêyivîn, lê Salman Ruştî êdî ne nivîskarekî hindî ye. Lê hinek rewşn awarte jî hene. Tolstoy bi fransî jî berhem afirandiye. Berhema wî ya fransî weke edebiyata fransî be jî, gelek berhemên wî bi rûsî ne, rûs e û Tosltoy nivîskarekî rûs e.

Nûdem, No: 5, 1993

REWŞA EDEBIYATA KURDÎ

Em dizanin ku edebiyata kurdî ya klasîk gelekî dewlemend e. Herçiqas me berhemên Elî Herîrî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Ehmedê Xanî û hwd. baş nexwendibin jî, gava behsa edebiyata kurdî ya klasîk dibe, em dikarin bi hêsanî navên wan bihejmêrin û ji ber hebûna wan xwe di nava gel û miletên dinyayê de serbilind hîs bikin. Ev şaîrên me yên klasîk di dema xwe de ne kêmî şaîrên miletên cîran bûne. Di aliyê bilindbûna zimên, kûraniya felsefê, form, naverok û dûrbîniyê de, şaîrên me xurt bûn; ji ber wê yekê ye ku gava em îro jî berhemên wan dixwînin, em bi zewq dixwînin.Wê ji ber vê kûraniya wan ya felsefî be, ku Nûredîn Zaza di pêşgotina Memê Alan de Ehmedê Xanî beramberî Hegel û Marx dike û dibêje ku Xanî berî wan bi dîalektîkê hesiya ye û felsefeyeke kûr di hunera xwe de bi kar anî ye.

Lê belê gava em edebiyata klasîk beramberî ya îro dikin, em dibînin ku em îro gelekî jar û li paş mane. Ev jarî û lipaşmayîna me, mixabin ku bi sedemên siyasî ve girêdayî ne. Di dema împeretoriya Osmanî de ziman ne qedexe bûn, milet nedihatin înkarkirin; her miletî di hundurê sînorên împeratoriyê de dikarîbû hunera xwe bi pêş bixista, edebiyata xwe biafiranda, bi zimanê xwe perwerdeya xwe bikira. Lê, bi avakirina Cumhûriyeta Tirkiyê re, ji berdêla ku dê êdî civat bêtir bi pêş biketa, azadî bêtir bibûya, demokrasî û bajarvanî xurttir bibûya; berevajiyê wê bû, Cumhûriyet li ser yeknetewetiyê ava bû, perwerdeya bi gelek zimanan dawî hat, înkarkirina hin gel û miletan dest pê kir. Bi vê yekê re, gelê kurd jî hate înkarkirin,

ziman û her celeb toreya wî hate qedexe kirin.

Gava rewşa Tirkiyê weha be, rewşa ziman, edebiyat û kultura kurdî jî li ber çavan e. Ziman û edebiyat di bin sîstemeke nedemokratîk de bi pêş nakeve. Lê di gel vê jî em dibînin ku lawên kurdan li ber xwe dane, dest avêtine ziman, edebiyat û rewşenbîriya kurdî. Mûsa Anter, Kemal Badilî, Edîp Karahan, Mehmed Emîn Bozarslan hin ji wan rewşenbîrên kurdan in ku dest avêtine ziman û edebiyata kurdî, digel pir zehmetî, girtin, îşkence û surgûnan xebatên xwe domandine, ji me re çend berhem li dû xwe hiştine. Lê xebatên wan mîna dilopek ji behrê bûn. Berhemên wan qedexe bûn, belavkirina wan zehmet bûn, nedigihîştin xelkê. Ji xwe gava mirov ji avakirina Cumhûriyetê û ta 1980 li edebiyata kurdî dinihêre, mirov dibîne ku bi qasî tiliyên destekî jî, berhemên bi kurdî nehatine çapkirin.

Xuyaye ku di vê bêdengiya dirêj de, dibistana salên sihî ya di bin serokatiya Celadet Bedir-Xan de derneketiba pêşberî me, dibû ku îro zimanê kurdî di talûkeya mirinê de bûya.

Gava li Tirkiyê kurd dihatin înkarkirin, zimanê kurdî, zimanê tirkên çiyayî dihate dîrin, Celadet Bedir-Xan daket gund û bajarên Kurdistanê, dest bi hevdana gotinan û peyvikên kurdî kirin, dest bi weşandina kovarekê kir, di nav weşanên kovarê de dest bi weşandina pirtûkên bi kurdî kir. Herweha wî gelek xort li dora xwe civandin û ew hînî nivîsandina bi kurdî kirin. Ev dibistana ku dikarîbû ji bo hemû Kurdistanê bibûya hêviyeke mezin, bi windabûna Celadet Beg re, vemirî, ew hêviya ku li ber geşbûnê bû çilmisî.

Bi vemirandina wê ekola salên sihî re, em dibînin ku di warê xebatên li ser zimên û tevgerên edebî de bêdengiyeke mezin çêbûye. Li Tirkiyê deng tune ye, li Sûriyê deng tune ye, ji Sovyet û Iraqê jî em bêpar in. Vê bêdengiya han heta sala 1980 ajot. Herçiqas di navbera salên 70 û 80 de hin çirûsk li Tirkiyê pêketin jî, dîsan kêm

û bi sînor bûn. Lê piştî 1980, bi derketina kurdan ya welatên Ewrûpayê re, bi xurtbûna hîsên welatperwerî û kurdayetiyê re hêdî hêdî li vir û wir, dengê nivîskaran hate bihîstin, şaîrên nû derketin, di şûna tirkî de zimanê kurdî bû zimanê me yê civakî û siyasî, me civîn û semînerên xwe bi kurdî kirin, di kongreyên xwe de em bi kurdî peyivîn. Vê tevgera bi kurdî bêtir li Swêdê dest pê kir. Ji ber ku kurdên ku hatin Swêdê bêtir kurdên xwende bûn. Herçiqas di destpêka 80 de jî hin kesên tûj li hember xebatên şexsî yên şaîr û nivîskarên kurd bi şik bûn jî, piştî demekê ew şik ji navê rabû. Gelek şoreşger û têkoşerên kurd yên ku li Tirkiyê ji kurdî bi dûr ketibûn, kurdî ji bîr kiribûn, an jî ji ber hin sedeman nedixwestin bipeyivin, li vî welatî li xwe vegeriyan, xwe zû fêrî kurdî kirin, gelekan ji wan mîna prensîp êdî bi kurdan re hew bi tirkî peyivîn; li her derê, li her civîn û civatê behsa girîngiya ziman û edebiyata kurdî kirin. Ji xebatên van mirovan Federasyoneke komeleyên Kurdistanê ava bû, zimanê Federasyonê yê resmî bû bi kurdî; kurdên Mêrdînê, Diyarbekirê, Serhedê, yên Sûriyê, yên Îran û Iraqê di bin siya vê Federasyonê de hevdu nas kirin û xebatên xwe li ser kurdî ava kirin. Paşê jî mîna organa Federasyonê kovarek bi navê Berbangê dest bi weşanê kir, gelek şaîr û nivîskarên kurd di kovarê de nivîsandin û di nava rûpelên kovarê de munaqeşeyên li ser edebiyat, li ser ziman û hwd dest pê kir û ew jî bû sedema ku keç û xortên kurd bêtir teşwîqî nivîskariya kurdî bibin; kultura xwe, zimanê xwe, edebiyata xwe bêtir nas bikin. Xebateke mîna ya Federasyonê li Parîsê jî, bi avakirina Enstîtuya Kurdî ya Parîsê re dest pê kir. Di avakirina Enstîtuyê de navên gelek şaîr, nivîskar û hunermendên kurd hate bihîstin, ew xebata kulturî û edebî ku di nava ya siyasî de fetisîbû an jî hatibû jibîrkirin, derket pêş, kovareke bi navê Hêvî dest bi weşanê kir, di wê kovara hunerî, edebî û çandî de gelek şaîr û nivîskarên kurd nivîsandin. Ji bilî Berbang û Hêviyê gelek kovar û rojname derketin; êdî ne tenê

nivîsên siyasî û îdeolojîk, herweha gelek nivîsên edebî; çîrok, helbest, hevpeyvîn, lêkolîn û hwd di van kovaran de cih girtin. Herweha gelek kovarên mîzahî, kovarên zarokan, kovar û rojnameyên din, ger ne xwerû bi kurdî bûna jî, mirov di nava rûpelên wan de pêrgî çîrok, helbest û nivîsên din ên kulturî û edebî dihat.

Bi kurtî piştî salên 80 bi gelemperî li derveyî welêt û bi taybetî jî li Swêdê, ziman û edebiyata kurdî dest bi geşbûnekê kir. Li gorî hewcedariyên vê geşbûnê weşanxaneyên kurdan hatin avakirin, ji wergerandin û çapkirina klasîkên kurdî bigirin, heta edebiyata kurdên Sovyeta kevin û Iraqê jî hatin çapkirin. Di vê navê de ji vir û wir nivîskar gihîştin, pirtûkên çîrokan çap kirin, helbest çap kirin, roman çap karin; ji edebiyata dinyayê gelek werger kirin. Yanî di hundurê deh salan de hejmara weşanxaneyên kurdan tenê li Swêdê bi ser bîstan ket, hejmara nivîskarên kurd gihîşt sihî-çilî. Ewqasî ji welêt dûr, lê bi hêviya ku wê rojekê berî rojekê vegerin welêt, giranî dane xebata kulturî û edebî. Îro bi saya serê van kurdên welathez in ku pirtûkxaneya kurdî bûye xwediyê bi sedan berhemên bi kurdî. Peydabûna nivîskaran, peydabûna berhemên edebî, peydabûna kovarên edebî hewcedariya munaqeşeya edebiyata kurdî û teoriya edebiyatê bi giştî anî meydanê. Me jî ji bo zelalkirina hin pirsên edebiyatê, rola rexne û rexnegiriyê, rewşa roman, çîrok û helbesta kurdî; rewşa edebiyata kurdî bi giştî ji nivîskarên kurd Tosinê Reşîd, Şerefxan Cizîrî, Nacî Kutlay, Şahînê Bekirê Soreklî, Rojen Barnas, Rohat, Hesenê Metê, Mahmûd Baksî û Mehmed Uzun pirsîn...

Nûdem, No: 10, 1994

TOSINÊ REŞÎD: "DÊMÊ HER EDEBIYATÊ BI PEXŞANA WÊ XUYA DIBE"

Nûdem: *Tu dikarî behsa dîroka edebiyata kurdên Kevnesovyetê bikî? Li ku û kîjan demê edebiyata kurdî li wir geş bû? Teşwîq ji ku dihat?*

Tosinê Reşîd: Gava gilî tê ser edebiyata kurdên Kevnesovyetê divê em berî gişkî li ser edebiyata kurdên Ermenîstanê rawestin. Ji Ermenîstanê der çend kesan li Gurcistanê dinivîsîn, lê ew kes xelkê Ermenîstanê bûn, li Ermenîstanê xwendibûn, berhemên xwe li Ermenîstanê çap dikirin.

Destpêka salên 30'î çend çirûskan li Azerbeycanê jî xuya kir, lê Azeriyan bi lez û bi hovîtî ew çirûsî vemirandin.

Edebiyata kurdî li Ermenîstanê ji salên 30'î dest pê kir, hema em dikarin bêjin ji ronahîdîtina rojnama Riya Teze (adar 1930). Ev edebiyata bi biryara partiya komunîst û hukûmeta Ermenîstanê dest pê bûye. Ji ber vê yekê jî ne ku wan mirovan dest pê kir binivîsin, ewên dayina Xwedê bi wan re bû, merîfeta wan ya nivîskariyê hebû, lê hema kî xwendin û nivîsara kurdî zanîbû, di rê û dirbên çapkirina pirtûkan de jêhatî bûn.

Hinek ji wan bûne bela serê edebiyata me û heya îro jî em nikarin ji wan bifilitin.

Vê edebiyatê ji cihê vala dest pê kir, tu pêwendiyên wê bi edebiyata me ya klasîk û ya wê demê re tune bû. Lewma jî nivîskarên wê demê ji bo xwe wek mînak edebiyatên ermeniyan û rûsan hildan.

Wan salan Erebê Şemo, Heciyê Cindî, Emînê Evdal, Casimê Celîl, Wezîrê Nadirî, Ehmedê Mirazî di nav edebiyata kurdî de cihên

xwe girtin û berhemên xwe çap kirin.

Naveroka vê edebiyatê propoganda sosyalîzmê, jiyana nû û rexnekirina jiyan û erf û edetên kevin bû. Edebiyata kurdî wan salan bi tîpên latînî çap dibû.

Bi kêm û kurtiya ve tevayî, ev edebiyata ji bo duwarojê bû bingeh. Vê rewşê heta sala 1937'an dom kir. Wê sala reş rojnama Riya Teze û dibistanên kurdî hatin girtin, jimareke mezin ji kadroyên kurdan, di nav wan de Erebê Şemo, Heciyê Cindî, Ehmedê Mirazî, Cerdûyê Gênco avêtin girtîgehan û surgûn kirin. Piştî cenga cîhanê ya duwemîn dîsan dest bi çapkirina pirtûkên kurdî bû, li hemberî salên 30'î jimara wan çend caran kêm bûn. Ji sala 1955'an rojnama Riya Teze ji nû ve çap bû. Lê ev gişk êdî bi tîpên kirîlî bûn. Edebiyata kurdî li Ermenîstanê di destpêka salên 60'î de geş bû.

Şoreşa Kurdistana başûr, ku Yekîtiya Sovyetê wê demê piştgiriya wê dikir û çapemeniya Sovyetê li ser wê pir dinivîsî, di nav kurdan de hişyarbûneke netewî, ya pir pêş de anî. Kurdên Sovyetê bi piraniya xwe ve, cara yekemîn xwe perçekî gelê kurd didîtin, Kurdistan wek niştiman, welatê xwe, yê netewî dîtin. Tema Kurd û Kurdistanê cihê xwe yê hêja di nav edebiyata kurdî de girt.

Mana duwemîn jî, ew guhastinên mezin bûn, ku di nav jiyana gelên Yekîtiya Sovyet ya berê de, piştî mirina Stalîn cih girtin.

Wan salan navên nû ku hatin nav edebiyata kurdên Yekîtiya Sovyetê, ew bûn ku dixwestin ji bandûra edebiyatên biyanî rizgar bibin. Nirxên mirovatiyê û yên netewî şûna propoganda erzan û sloganên siyasî girtin.

– Pêşketinê xwe di kîjan şaxê edebiyatê de nîşan dida? Xwendevan hebûn?

– Kurdên Yekîtiya Sovyetê ya berê, îro xwediyê edebiyateke pirşax in, lê ew şaxana wek hev bi pêş ve neçûne. Ez dixwazim hinekî li ser pirsê rawestim.

Çiqasî jî nivîskarên me yên bi nav û deng Erebê Şemo, Heciyê Cindî, Eliyê Evdirehaman, Seîdê Îbo romanên xwe çap kirin, çiqasî jî ew roman bi giştî ji aliyê xwendevanan ve hatin pejirandin û heta cihekî jî dikarî bêjî ne xetab bûn, lê dîsan jî ew ne anegorî pîvanên edebî, yên rojên me bûn. Lê çawan be jî ew bûne hîm ji bo pexşana edebiyata kurdên Sovyetê û di demeke ne dûr de divê romanên hêja derkevin meydanê. Kesên bikaribin wan romanan binivîsin îro hene. Edebiyata me îro bi wan romanan ve avis e.

Di dereca çîrokan de gavên baş hatine avêtin, çend nimûnên baş çap bûne, lê dîsan jî îro li meydanê berhemeke wisan tune, ku bi giştî anegorî pîvanên edebî, yên rojê bin. Lê em dikarin ji berhemên nivîskarên cihê berhemeke wisan derxin.

Di dereca şanogeriyê de rewş wek ya romanan e. Ji salên 30'î dest pê kirî, gava li Ermenistanê şanoya kurdî, ya dewletê hebû, nivîskarên kurd dest bi nivîsandina piyesan kirin. Piştî girtina şanoya kurdî sala 1937'an nivîskarên me terka nivîsandina piyesan kirin. Lê ji salên 70'î gava li Ermenîstanê (Gundê Elegezê) û li bajarê Tiblîsê şanoyên kurdî vebûn, ji bo wan şanoyan piyes jî hatin nivîsandin. Çendek ji wan piyesan derketin ser dikê, baş hatin pejirandin. Lê ew yek ne ewqasî ji başiya piyesan bû, çiqasî ji hisreta kurdan bi zimanê xwe şanoyê bibînin.

Bi baweriya min di dereca helbestkariyê de pêşketineke baş heye. Ji salên 60'î dest pê kirî, bi hinek kêmaniyên zimên ve, tevayî çend pirtûkên baş çap bûne. Helbesta kurdî, bi nimûnên xwe yên baş ve îro pirdeng û pircûre ye. Naveroka wê dewlemend e. Di nava wê de hesînên zêndî şûna temayên zêrandî û maşandî girtine. Helbestvanên îro dixwazin cihê xwe di nav edebiyata kurdî ya giştî de bibînin, ew dixwazin helbesta wan bibe pareke wê edebiyatê.

Lê em gerek tu caran ji bîr nekin wekî dêmê her edebiyatê berî gişkî bi pexşana wê xuya dibe. Edebiyata xurt di vê xwediya pexşana

xurt be. Eger em bi vê pîvana edebî beramberî edebiyata kurdên kevnesovyetê bikin ew edebiyat hê jî ji edebiyata cîhanê, ya rojên me bi şûn ve dimîne. Problema xwendevanan tim jî li pêşiya me bûye. Jimara mirovên bi kurdî bixwînin tim jî kêm bû.

Hetanî dawiya salên 30'î kurd di gundên cihê de ser hev (kompakt) diman. Wan salan di gundên kurdan de xwendin bi zimanê kurdî bû. Bi wê yekê re, bi tevayî wan salan karekî hêja hate kirin. Ji kurdan kêm mirovan xên ji kurdî zimanên mayîn zanibûn. Ev şertana gişk ji bo zêdebûna jimara xwendevanên edebiyata kurdî dibûn bingeh. Lê surgûn û zulma salên 30-40'î, dijwariyên aborî, yên salên cenga cîhanî ya duwemîn û salên piştî cengê kurd ji hev belav kirin. Hejmareke kêm ji kurdan di gundên kurdan de man. Ji ber ku dibistanên kurdî êdî nehatin vekirin, tenê di dibistanên gundên kurdan de heftê du saetan zimanê kurdî dixwendin. Di van şertan de jimara xwendevanên edebiyata kurdî kêm bûn. Dîsan jî piraniya kurdan, bi xwe fêrî xwendina kurdî dibûn û ji me re dibûn xwendevan. Lê bi baweriya min, gava nivîskarekî kurd pênûsê dixe destê xwe, bi bawerî dinivîse, wekî berhemên wî dê rojekê li welêt bêne çapkirin û xwendin.

– Pîvanên edebî çi bûn? Rewşa rexnegiran çawan bû?

– Pirsa pîvanên edebî û rexnegiriyê nexweşiya edebiyata me ya mezintir bû û wisan jî dimîne. Rojnama Riya Teze çapemeniya me ya tenê bû û gotarên rexnegiriyê diviya di rûpelên wê de çap bibûna. Lê ji sih û pênc salan zêdetir berpirsiyarê wê rojnameyê Mîroyê Eset bû, endamê komîta navendî, ya partiya komunîst ya Ermenîstanê bû, endamê parlementoya Ermenîstanê bû. Wî bi temamî rê li pêşiya rexnegiriyê girtibû. Bi baweriya wî, eger gotarên rexnegiriyê çap bibûna, ji rojnamê û kesîtiya wî re problem dê çêbibûya. Problema edebiyata kurdî wisan jî ji wî re nebûne xem. Wî karê xwe yê şexsî di ser derd û kul û problemên edebiyata kurdî re digirtin. Ji

serokatiya Ermenîstanê re mirovên wisan dest didan û wan piştgiriya wî dikirin.

Ji bextê me re îro jî pêşewitiyên gelê kurd nîn in, wekî ew li her cihî bi navê kurdan dipeyivin.

Helbet carinan biryar ji jor dihatin stnadin, ku bêtir guh bidine rexnegiriyê. Hingê rojname neçar dibû gotarekê, du gotaran çap bike. Lê nivîskarin wisan dihatin rexnekirinê, ewên ji wan ziyan tune bûn, di destên wan de tu tişt tune bû. Pir caran ew berhemên ku dihatin rexnekirin gelekî ji yên mayîn baştir bûn. Dema rexnegiriya dilpak û objektîv tune be, pîvanên edebî jî çênabin.

– Em dizanin digel kul û kêmasiyan dîsan jî kurdên Sovyetê ji xwe re zimanekî standart ava kiribûn. Îro gelek berhem bi wî zimanî û bi alfabeya krilik hene. Lê ji ber rewşa siyasî û alfabeyên cihê, haya me gelek kurdan ji wan berheman tune ye. Gelo mirov ê bikaribe navê çend berheman bide, ku hem di edebiyata kurdî de, hem jî di edebiyata cihanê de xwediyê cihekî bin?

– Çiqas ne pir be jî, lê berhemên wisan îro li meydanê hene; ez li vir navên wan berheman nadim, ji ber ku navdayîn barekî gitan e.

– Carinan li hin cihan tê bihîstin ku hilweşandina sîstema Sovyetê ji hemû gelan bêtir ji bo kurdên li Sovyetê xerab bû. Gelo ev rast e? Ger mirov muqayesekê di navbera edebiyata kurdî ya berî hilweşandinê û piştî hilweşandinê bike, çi guhertin hene? Rewşa edebiyata kurdî niha li wir çawa ye?

– Belê, rast e. Piştî hilweşandina sîstema Sovyetê û sertbûna pêwendiyên navnetewî, bi milyonana mirov ji cihên xwe bi dûr ketin. Lê eger azerî çûne Azerbeycanê, ermenî çûne Ermenîstanê, alman, yunanî û neteweyên mayîn çûne welatên bav û kalanên xwe, dewletên wan li wan xwedî deketin, kurd li meydanê bê xwedî man.

Bi sed hezaran kurd bûne penaber, ew bi zorê ji malên wan hatin derxistin, malên gelekan hatine şewitandin, lê heta îro jî kesek li

wan nebûye xwedî, rêxistinên navnetewî bi pirsa wan ve mijûl nabin, heta mafê penaberiyê jî nadine wan. Di vê rewşê de pirsên çandî vedikşine ser plana duwemîn.

Ji ber dê ji niha û pêve alîkariya hukûmetê tune be û her kes divê berhemên xwe ji kîsê xwe çap bike, ez bawer nakim di van demên nêzîk de dê tiştek çap bibe.

Lê dîsan jî nivîskarên rast divê di nav problemên rojê de winda nebin û pênûsê ji destê xwe daneynin. Ew nivîskar niha bêtir nêzîkî derd û kul û armanc û daxwazên gelê xwe bûne û divê em li benda afirandina berhemên baş bin.

–Va ye tu jî tevlî refê nivîskarên surgûnê bûyî. Surgûn dijwar e. Piştî şoreşa Bolşevîkan gelek nivîskarên ku berambera Tolstoy û Dostoyevskî bûn, ji Rûsyayê baz dan. Piraniya wan têk çûn, di nava problemên şexsî û psîkolojîk de fetisîn, winda bûn. Digel hezar zehmetiyan Nabokov û Nîna Berberova navên xwe parastin. Ji bo ku nivîskarên kurd jî bikaribin navên xwe biparêzin û surgûnê ji bo fêda xwe bi kar bînin divê çi bikin?

– Bi baweriya min problema me û ya nivîskarên rûs yên ku piştî şoreşa Bolşevîkan surgûn bûne, ne yek e. Ji bo nivîskarên rûs problema mezin ew bû, wekî bi carekê ve her tişt di welatê wan de wergeriya. Ew gelê ku nivîskaran ji bo wî dinivîsî, pirtûkên wan li meydanan dihatin şewitandin. Dixwestin jiyana xwe bi înternasyonalê bimeşînin.

"Em ê cîhana kevin ji binî ve hilweşînin"

Piştî şoreşa Bolşevîkan ne tenê nivîskarên li surgûnê, lê wisan jî gelek nivîskarên li welêt an hatin girtin, an hatin kuştin, an winda bûn, an jî wan bi xwe, xwe kuştin.

Lê nivîskarên rûs, ku di van salên dawî de surgûn bûn, yên wek Soljenîstîn û Brodskî zanîbûn ji wan çi tê xwestin, loma ew winda nebûn.

Ya me jî wisan e. Em zanin gelê me çi ji me dixwaze. Gelê me berê xwe ji me neguhertiye. Hela di ser de ew li benda berhemên me ye. Em gerek tu caran ji bîra nekin, wekî barekî giran li ser milê me ye. Em divê gelê xwe ji bindestiya çanda gelê zordar rizgar bikin. Helbet li vir problema xwendevanan heye. Lê ez bawer im roj bi roj jimara xwendevanên me wê zêde bibe. Lê divê em tiştekî ji bîra nekin, xwendevanê rast haya wî ji edebiyata cîhanê heye, ew bi kêmanî ji bil zimanê kurdî zimanek du zimanên din jî dizane û bi wan zimanan hêsantir dixwîne. Ji ber vê jî em gereke wisan binivîsin, wekî ew xwendevan qîma xwe bi berhemên me bîne, nivîsarên me bipejirîne. Lê çawan be jî edebiyata baş zû an dereng xwendevanê xwe dibîne.

– Tu edebiyata kurdî bi giştî çawan dibînî? Tu hêvî heye?

– Gava pirs tê ser edebiyata kurdî, divê em ji bîra nekin, ku edebiyata me bi bêtir ji zaravayekî belav dibe. Em dibînin ku edebiyata kurdî ya bi zaravayê kurmancî di van salê dawî de gavine baş avêtiye. Eger salên berê ji bil kurdên Sovyetê çend nivîskaran bi kurdî dinivîsîn, (rasttir e mirov bêje çap dibûn) îro jimara wan nivîskaran gelekî zêde bûye û bi sedan kes, li hemî perçên Kurdistanê û ji welêt der, dest bi nivîsandina kurdî kirine. Ev yeka eger ne îro, wê sibe berê xwe, yê hêja bide.

Tiştekî şabûnê ye, wekî pîvanên edebî çêdibin. Eger 10-15 sal berê di rûpelên kovarên kurdî de bêtir helbest û çîrokên sist çap dibûn, ew ên sloganên siyasî bûn û tu pêwendiyên wan bi edebiyata rast re tune bûn, îro ji wan kovar û rojnaman, yên baş deriyê xwe li ber nivîsarên sist û ne hêja girtine.

Ji alî mayin ve em nikarin nebînin, wekî çiqasî jî bi dijwarî, lê em ber bi zimanekî standart ve diçin, ez bi xwe îro ne mîna deh sal berê dinivîsim.

Bi baweriya min ya sereke ew e, wekî çiqas dijwarî be jî, çapeme-

niya kurdî li welêt ji xwe re rê dibîne. Bi saya serê vê çapemeniyê, em ê di demeke nêzîk de bibin şahidê berhemên hêja

Lê divê em tu caran ji bîr nekin, wekî tenê di şertên hebûna rexnegiriya xurt de edebiyata xurt dikare were meydanê.

Nûdem, No: 10, 1994

ŞEREFXAN CIZÎRÎ: "FELSEFE EVÎN BI XWE YE"

Nûdem: *Pevgirêdana edebiyatê bi felsefeyê re çi ye?*

Şerefxan Cizîrî: Bi kurtî mirov dikare weha bibêje; pevgirêdana civatê, dîrokê, kultur û jiyana sosyal çiqasî bi felsefê re hebe, ya edebiyatê jî ewqasî pê re heye. Felsefe jiyan bi xwe ye. Nivîsandina edebiyatê çalakiyek sosyal û kulturî ye. Weke çalakî edebiyat hinek raman û normên estetîk tîne ziman. Di hemû babetên edebiyatê de raman, ziman û pîvanên estetîkî têne şirovekirin. Ev pîvanên estetîkî dikarin veşartî an jî vekirî bêne îfadekirin. Çawan bibe bila bibe, di tekstên edebî de sîstemeke îdeolojî heye. Raxistin û îfadekirina ramanan bi awayekî estetîkî tê nivîsandin. Li ser başbûn an xerabbûna estetîkî mirov dikare şirove bike. Lê kesê ku bibêje di tekstên edebî de îdeolojî û felsefe tune, bi xwe ji edebiyat û çalakiyên edebî tiştek fahm nekirine. Di tekst û berhema edebî de, ji sedî sed felsefe heye, îdeolojî heye, jiyana çînayetî heye, sempatî û antîpatî li hember bûyer û kesan heye, bilindkirin an jî biçûkkirina tîpên sosyal û hwd... heye. Li aliyê din jî tiştekî pir vekirî heye. Pirsa felsefê û pirsa metoda xebatê pir ji nêzîk ve bi hevdu ve girêdayî ne. Hilbijartin û şirovekirina hinek mînak, bûyer û tîpên sosyal di çalakiyên edebî de, bi metoda xebatê û nêrînên felsefî ve têne xurtkirin û xemilandin. Metoda xebatê normçêkirin e. Metoda xebatê dilbijandin e. Metoda xebatê meşrûkirin an jî mehkûmkirina hinek raman, nêrîn û normên civakî ne. Metod û felsefe, bi hemû awayî pîvanên zanyariyê li bêjingê dixe û ji nava genimê sor zîvan, qirşik û keviran derdixe. Metod û felsefe paqijiya malan dikin. Felsefe evînî ye. Lê ev evînda-

rî evîndariya zanyarî û paqijiyê ye. Edebiyata ku bêî felsefe be, weke girara rijî ye û bi zewq nikare bê xwarin. Lê kesên ku girara rijî jî bi zewq dixwin hene!

Em dizanin ku yên çalakiyên edebî diafirînin mirov in û ev çalakî jî behsa jiyana mirovî dike. Cihê ku jiyan lê hebe hilbijartin jî lê heye. Mirovê ku hilbijartinê nekin jî, di rastiyê de dîsan hinek tiştan hildibijêrin. Hilbijartina bûyer, tîp û ramanan li gora metodên felsefî û hinek pîvanên estetîkî têne meydanê. Ziman ji bo edebiyatê çi be, felsefe jî ew e.

Aliyekî din yê girîng jî heye ku divê bê diyarkirin; ger mirov li dîroka edebiyatê baş binihêre, ew ê çend tiştên bingehîn ji bo me zelal bibin. Weke xetên edebî û metod, weke têkîliyên edebiyat bi civatê re, weke edebiyata deman, weke analîzkirina tekstên edebî û hwd... Ez bi kurtasî bêjim; bi awayekî giştî edebiyatvan û nivîskarên kurd haya wan ji van problemên metod û dîroka edebiyatê tune ye. Bi zanistî li ba kurdan kes metodên Marksîstî, struktualistî, eksistensialistî, rexnegirî û hwd di berhemên edebî de bi kar nayine. Edebiyata me heya nuha ji şirovekirin û bikaranîna metodên edebî mehrûm maye. Bi raya min ev yeka kêmasiyeke pir mezin e û divê zû bê çareserkirin.

– Marksizm bi perspektîveke çawan li edebiyatê dinihêre?

– Bi raya min pîvan û çavkanî divê Marks û Engels bi xwe bin. Pir caran kesên weke Zdanov, Stalin an jî hinek serok li vî alî û wî alî li ser navê Marks û Engels, di warê edebiyat û hunerê de dîtinan pêşkêş dikin. Lê di rastiya xwe de têkiliyên van dîtin û ramanan bi Marksizmê re tune ne.

Teoriyeke Marks û Engels ya bi taybetî heye; materyalîzma dîrokî. Li gora vê teoriyê, civat ji du beşan pêk tê, avaniya binî û avaniya jorîn. Avaniya binî, bi raybetî çalakiyên ekonomîk û pêşketina maddî ye. Avaniya jorîn jî bi giştî ji çalakiyên ramanî, hunerî, huqûqî,

îdeolojî, kulturî û hwd. pêk tê.

Edebiyat û huner beşek ji avaniya jorî ye. Bi guherandina avaniya binî avaniya jorîn jî tê guherandin. Di navbera avaniya jorîn û avaniya jêrîn de danûstandinek diyalektîkî heye. Herdu avanî jî tesîrê li hevdu dikin. Tesîrên ku binî li jorîn dike, ji tesîra ku jorîn li binî dike qalindtir, xurttir û mezintir e... Avaniya jorîn tu carî ne pasîf e.

Pir caran li ser navê materyalîzma dîrokî dîtinên çewt hatine parastin. Nezanê çepan weha gotine; Avaniya binî bi hemû awayî avaniya jorîn li gora xwe tekûz dike. Edebiyat û huner jî para xwe ji vê yekê digire. Lê li gora dîtinên Marks û Engels di navbera avaniya binî û edebiyat û hunerê de danûstandineke asîmetrîk heye. Yanî pêşketin û bişkivandina edebiyat û hunerê raste rast ne girêdayî avaniya binî ye. Weke mînak, Marks huner û edebiyata Grekî ya klasîk nîşan dide. Marks dibêje ku heger hunera Grekî ya klasîk hîna jî di pir waran de weke berhemên mînak têne nîşandan, ev yeka otonomî û "azadiya" hunerê nîşan dide.

Marks û Engels di jiyana xwe de pir qîmet didan huner û edebiyatê. Li ser huner û edebiyatê dîtinên wan sîstematîk nebûn. Di hinek pirtûk, name û xebatên felsefî û ekonomî de pirsa edebiyatê û huner wana aniye ziman. Ji edebiyata klasîk ya Grekî bigirin heta edebiyata hemdemî, Marks û Engels xwediyên hin dîtinan bûn. Marks ji berhemên Aischylos, Goethe, Sheakspeare, Balzak, Diderot, Walter Scott, Henrich Henie, Schiller û hwd agahdar bû. Niviskarê realîzma burjuvazî li Îngilîstanê, Fransayê, Almanyayê û welatên Skandinavyayê baş nas dikirin. Marks pir berhemên Sheakspeare ji ber dizanî bûn. Balzak li ba Marks û Engels weke niviskarekî pir hêja dihate pejirandin. Di dîtina xwe ya polîtîk de Sheakspeare, Goethe û Balzak kesê kevneperest bûn. Digotin ku tiştên em ji Balzak li ser civata kapîtalîstî û çîna bûrjûvazî li Fransayê fêr bûne, em tu caran ji dîrokvan, ekonomîst û statîstîkvanan fêr nebûne. Di ber-

hema Balzak de hilweşandin, fen û sextekariya bûrjûvazî hebû. Li ba Balzak çewsandina gundiyan hebû, ji bo peran xwe firotin hebû, qehpetiya bûrjûvazî hebû. Balzak di nivîskariya xwe de xeteke realîst dimeşand. Yanî rastî çi bû, wî ew dinivîsand.

Bi kurtî, wextê ku edebiyat û huner realîst bûna, wan dikarîbûn ji xebatên ilmî hîn bêtir zanyarî biafirandina. Gava ku Marks û Engels ji hev re name dişandin û li ser huner û edebiyatê dîtinên xwe dianîne ziman, gotinên weke; Shaekspearîzekirin an Schillîrîzekirin bi kar dianîn. William Shaekspeare nivîskarekî îngilîz yê navdar e û yek ji pêşkêşê realîzma edebî ye. Friedrich Schiller jî nivîskar û filosofekî alman e ku yek ji pêşkêşê romantîzma edebî ye. Shaekspeareîzekirin ji bo metoda realîzma objektîf dihat bikaranîn û Schilirîzekirin jî, ji bo metoda subjektîf û romantîk dihat bikaranîn. Marks û Engels di huner û edebiyatê de metoda realîzma objektîf diparastin. Lê ji bo wan realîzm ne normekî abstrakt bû û li ser serê pêşketina dîrokî bû. Realîzma Homeros û realîzma Balzak ne weke hevdu bûn. Realîzm pêşketina dîrokî bi xwe bû û li gora dema dîrokî dihat guhertin.

Marks û Engels li ser huner û edebiyata polîtîk jî xwedî dîtin bûn. Ew di maneyeke teng û dogmatîk de, hergav li dijî polîtîzekirina edebiyat û hunerê derdiketin... Ma ku ne weha bûya, wê çawan Marks bikarîba Balzak û Shaekspeare bibira ba perê ezmana?

– Di dema Bolşevîkan de behsa edebiyata partiyê dihate kirin. Nêrîneke wilo hê jî heye. Tu di derheqa edebiyata partiyê an jî edebiyata îdeolojiyê de çi difikirî?

– Bersiva vê pirsê bi bersiva yekê ve girêdayî ye. Ez hevalbendê edebiyata realîst im. Edebiyat dikare realîzma Homeros me, dikare edebiyata kurdî ya devkî be, dikare realîzma Honoré de Balzak be û dikare realîzma ku Maksîm Gorkî tîne ziman be. Baweriya min bi Marksîzmê heye û Marksîzm jî vê yekê weha dinivîsîne. Bi kurtî dî-

tinên Marksîstî di vê mijarê de, min di bersiva yekê de dan. Ew dîtinên han raste rast ji çavkanî û xebatên Marks û Engels hatibûn neqandin. Vêca ew kesên ku dixwazin huner û edebiyat bikevin bin bandora polîtîkaya rojê, bi raya min dîtina wan ne li ser xeteke Marksîstî ye. Eşkere ye ku ew nêrîn çewt in.

Di dema Bolşevîkan de şiroveke pir kûr û hêja li ser huner û edebiyatê hebû. Wek mînak mirov dikare navê Plechanov, Troçkî û Lunaçarskî binivîsîne. Ew dîtinên ku tu dibêjî di dema Stalîn de hatin ziman. Ev dîtin nikare hemû Bolşevîkan girê bide û ewên ku Bolşevîkan ji ber kirinên Stalîn biricimîne ew ê raste rast çewtiyê bike.

Lê di vir de divê tiştek baş bê rohnîkirin: Edebiyata partî û edebiyata îdeolojî tiştek e û edebiyata ku kesên xwedî partî û xwedî îdeolojî dinivîsin tiştekî din e. Kesên ku endamên partiyên polîtîk bin dikarin berhemên pir hêja biafirînin. Lê endambûna nivîskaran di partiyeke polîtîk de tu caran nabe garantî ji bo berhemên hêja û hunerî. Bi raya min mirov divê antî-partî nebe. Mafê hemû cûre partiyan heye ku dîtinên xwe li ser edebiyat û hunerê program bike. Nivîskarên ku endamên partiyê bin dikarin berhemên xwe li gora programa partiyê biafirîne. Lê belê ev tu caran nikare bibe pîvan ji bo kesên hunermend û edebiyatvan. Dema ku Bolşevîkan behsa edebiyata partiyê dikirin, wan behsa edebiyata ku ji aliyê endamên partiyê ve dihate nivîsandin dikirin. Diyar e ku mafê hemû partiyan heye ku ji endamên xwe hinek tiştan û sixletan bixwazin. Ma gelo Nûdem weke kovareke edebî û hunerî ji endamên redaksiyona xwe hinek pîvan û sixletan naxwaze?

Li ser polîtîzekirina edebiyat û hunerê dîtinên Marks û Engels hene. Di vî warî de xeta edebî ya ku bi navê "Almanya xort" û li Îngilîstanê jî bi navê "Edebiyata bûrjûvazî" tê naskirin, weke mînak, ji bo edebiyata polîtîzekirî tê nîşandan. Ev herdu xetên edebî, heta ku

ji wan dihat berhemên xwe tije sloganên polîtîk dikirin. Di berhemên edebî de ew slogan weke tiştekî pînekirî dihat xuyanîkirin. Ji ber vê yekê jî Marks û Engels ev edebiyata polîtîzekirî rexne dikirin û digotin ku divê kesê nivîskar dîtinên xwe yên polîtîk vekirî di berhemên xwe de ranexîne. Dîtinên polîtîk divê ji mantiqê bûyerê û rewşa dîrokî derkeve pêş. Kesê ku zêde giranî dide slogan û gotinên polîtîk, ji aliyê huner de zeîf bûn. Li gora Marks û Engels kesên ku ji aliyê huner û edebiyatê de xurt bûna, wan daxwaziya polîtîk bi awayekî hunerî û edebî karîbûn anîbûna ziman. Yanî polîtîka nikare di şûna edebiyat û hunerê keve, lê belê hunermend û edebiyatvan bi metoda xwe dikarin bûyerên polîtîk raxin û bi kar bînin. Ew kesên ku zêde behsa polîtîzekirina edebiyat û hunerê dikin, ji pir aliyan de bêkêr in. Dixwazin kêmaniyên xwe yên hunerî û edebî di bin siya sloganên polîtîk û "xeta partiyê de" veşêrin. Lê ez bawer nakim ku kesên weha tu caran, li tu welatan û li Kurdistanê jî bi ser bikevin û bibin pêşeng ji bo edebiyatê.

– Edebiyata kurdî dikare ji edebiyata dinyayê çi fêr bibe? Berpirsiyarên nivîskarên kurd çi ne?

– Edebiyata kurdî dikare ji edebiyata cîhanê pir tiştan fêr bibe. Bi raya min heta ku em edebiyata cîhanê, dîroka edebiyatê û dîroka ramanî û felsefê baş fêr nebin, em ê şaşiyên mezin bikin. Mirov ne hewce ye ku Emetîkayê ji nû ve keşf bike, Emerîka berî 500 salî hatiye keşf kirin. Lê ku agahdarî û zanyariya kurdan li ser keşfa Emerîka tune be, bi hêsanî ew ê bikaribin Gola Wanê weke Okyanûsa di navbera Ewrûpa û Emerîkayê de nîşan bidin. Wê çaxê ew ê fereca huner û edebiyateke kûr ku li welatê me wekî pêwîstiya nan û avê ye, li paş bikeve û entegrasyona rewşenbîrê kurd bi edebiyat û zanyariya cîhanê re derbeke mezin bixwe. Îzolasyon ne alîkariya bûrjûvazî ne jî alîkariya sosyalîstan dike. Tiştên ku rewşenbîrên kurd ji cîhanê fêr bibin pir in. Lê ez di wê baweriyê de me ku cîhan jî dikare

pir tiştan ji Kurdistanê fêr bibe. Danasandina huner û edebiyata Kurdistanê, afirandina berhemên hêja, naskirina edebiyata kurdî ya devkî û lêxwedîderketin û parastina mîrasa kulturî ya welêt, dikeve ser milên rewşenbîrên kurd.

Nûdem, No: 10, 1994

NACÎ KUTLAY: "EZ JI BER PÊŞEROJA EDEBIYATA KURDÎ NE XEMGÎN IM"

Nûdem: *Di edebiyata tirkî de heta demeke dirêj munaqeşeya romana gundan û ya bajaran dihate kirin. Dibe ku ev yeka han li pêşiya edebiyata kurdî be jî. Gelo romana gundan û ya bajaran çi ye? An jî gelo di romanê de klasifikasiyoneke weha di cih de ye?*

Nacî Kutlay: Di van 20-30 salên dawiyê de, di edebiyata tirkî de, gelek munaqeşeyên bi gelek alî çêbûn; wek "romana gundiyan" çi ye û di dema rojane de çima awqas cî digire? Lê di van salên herî dawî de, em dibînin ku ev babet êdî nayê munaqeşekirin. Li ser vê babetê gelek lêkolînên giranbiha hatin amadekirin. Lewra, di derheqê vê pirsê de, pêwîst e ku meriv dûr-dirêj xeber bide. Bi ya min, gelek zehmet e, em niha li vir, di rûpelên Nûdem'ê yên bi sînorkirî de li ser bisekinin. Lê dîsa, kurt be jî, meriv dikare çend tiştan bêje.

Di edebiyata tirkî de cihê romanan, berî 1950 ewqas ne fireh bûn. Meriv dikare navên romanên ku heta wê demê hatibûn çapkirinê bi hêsanî bijmêre. Dixwazim bêjim ku jimara wan ne zêde bûn. Lê piştî nîvsedsala bîstî, piştî Şerê Dinyayê yê Duwemîn, rewşa ekonomîk û civatî hate guhartin. Fikrên demokratîk pêşta çûn û sermayedarî hemleka mezin kir, kirrîn-firotin û teknîka fabrîkeyan gelekî hat guhastinê. Li Tirkiyeyê, heta wê demê gundî kêm dihatin bajaran û têkiliyên wan bi bazarwendiyê ve pir qels bû. Partiya ku Tirkiye îdare dikir nêzîkî faşîstiyê bû, ew ji erkê dûr ket û kêm be jî, serbestîke nû hat Tirkiyê. Burjûwazî jî hewcedariya karkeran bû, lewra gelek gundiyan berê xwe dan bajaran û hatin li wir bi cî bûn. Erdê wan têre wan nedikir, lê ev gundiyên duh, di bajarên nûhatî de,

bûn karkerên bê kalîte. Gelek ji van gundiyan koç kirin çûn Ewrûpa, bi taybetî jî çûn Almanyayê. Di navbera 1940-1950'î de ji" Köy Enstitüleri"yan gelek xortên nû, hinek jî ji gundan bûn, bala civatê kişandin. Wan xwe nêzîkî "xelk"ê didîtin û di bin tesîra klasîkên Yûnanî, edebiyata Fransiz, Îngîlîz û bi teybetî jî Rûsan de mabûn. Dixwestin halê gundiyên Tirkiyeyê, bi tehrekî nû ku ew hîn bûbûn, nîşan bidin û binivîsin. Wisa jî kirin. Gelek çîrok û roman hatin nivîsandinê û di wan pirtûkan de babet gundî bûn, halê wan î perîşanî bi tehrekî balkêş dihat qalkirinê. Gelekî jî romantîzma van guhartinên salên dawiyê tev dikirin û aliyê civatê ve hatin qebûl kirin. Kesên paşverû û merivên ku rejîma kevin dixwestin û bûrjûwaziyê mezin ji vê guhastinê hez nekirin, lê nikaribûn gelek tiştî jî bikin. Bi vî tehrî "romana gundî" bû mode. Lê gelek romanên pêşketî çêbûn, çi heye, di vê navberê de "populîzm"eke gundîtiyê jî xwe nîşan da. Neheqiya axan, feqîran, gundiyan, zordestiya jendirme û qaymeqaman, hema hema di van hemû romanan de babeta yekemîn bû. Yên wek Yaşar Kemal, ev pirsegirekên gundiyan bi tehrekî gelekî giranbiha û hunermedî nivîsîn. Hinek ji van nivîskarên "romanên gundî", min bi xwe jî nas kirin, bi hinekan re hevaltî kir. Wek Talip Apaydın, Fakir Baykurt, Memet Başaran, Mahmut Makal, Halil Aytekin...

Lê roman, çîrok an helbest wek neynika civatê ne, pirsên civatê nîşanî meriya didin. Ji bo wê jî, di wê demê de wek 20-30 salî, çîrokên gundî, romanên gundî dom kirin. Lê belê, êdî ev babet wek berê bala kesî nedikişand, xwendevan êdî ji van romanan têr bûbûn, mîna berê xweşik nedihat xuyanê. Ya herî mezin jî, êdî civat hatibû guhartin. Ew civata gundî kêm bûbû, bajar her zêde bûbûn, gundiyan meselên xwe bi xwe re anîbûn bajaran. Bêkar, bêxanî û di rewşeke civatiya gelekî nizim de jiyan êdî meseleyên sereke bûn. Li bajaran hişyarbûneka civakî her bilind dibû. Gundiyên nexwendî êdî

di bajaran de tiştên nû hîn dibûn, partî, komelên karkeran, yê xwendevanan dengekî nû bû. Ne gelek be jî, radyo û rojname dikete destê insanan û insan dihatin guhartinê. Lewra êdî romanên gundî wek berê bala kesî nedikişand û munaqeşeyên li ser vê babetê dest pê kirin. Piştî cûnta eskeriyê ya sala 1971'ê zorbetiya rejîma eskerî û bûrjûwaziyê, jiyana kesên bajarî bûn babetên romanan. Meseleyên civakî, yên bajaran li pêş her tiştî bûn û vê carê jî romanên bajarî hatin nivîsandin û ev tiştekî gelekî normal e. Lewra di van munaqeşeyan de "romana gundî" û "romana bajarî" hatiye ser ziman. Ev klasifikasyona di cî de be, an ne di cî de be, ev ne girîng e, lê ev rastiyeke jiyanê ye. Demek hatiye, pirsên civakî yên gundîtiyê li pêş hatine xuyanê û lewra jî ev babet di romanan de cî girtiye û paşê civat hêdî hêdî hatiye guhartinê û têkiliyên bûrjûwaziyê di bajaran de bûye meselên sereke û di edebiyatê de vê babetê gelekî cî girtiye. Em bixwazin an nexwazin, ev navkirin û ev babet heqîqetên jiyanê ne. Bi ya min ev tehr wê di edebiyata kurdî de jî wisa be. Ana jî wisa ne, mora "gundîtî"yê li ser edebiyata kurdî ye. Ji kerema xwe re li roman, çîrok û helbestan binihêrin. Edebiyatê bidin alîkî, babeta gundîtiyê di pir alî ve xwe nîşan dide. Ber ku em piranî civateka gundî ne. Hûn navên me yên "anonîm" binihêrin, "Gundî, Gavan, Şivan, Zinar, Çiya, Berxvan..." navên herî zêde ne. Ev tiştekî pir normal e ku edebiyata me jî wê demeke dûr-dirêj "gundî" be.

– Tu rewşa romana kurdî ya îro çawan dibînî? Di pîvanên romana roavayî de mirov dikare behsa romana kurdî bike?

– Ya rastî, civat ku pêş de diçe, ji meriya napirse û meriv zû zû jî ferq nake, lê piştî çend salan meriv dibîne ku civat pêş de çûye. Ev di warê edebiyatê de jî wisa ye. Civata kurdî, bi taybetî ya Kurdistana Tirkiyeyê, kurdî nenivîsî ye û nexwendî ye, lewra di hêla edebiyata kurdî de gelekî şûn de maye. Civat jî pitanî gundî bûye, her çiqas van salên dawiyê guhastineke bajarî çêbûye jî, hela hê tesîra xwe

di edebiyatê de nîşan nedaye. Divê meriv bê kompleks rastiya xwe qebûl bike. Di warê romannivîsandinê de em pir şûn de mane. Bi hemberî romana roavayî, ez curet nakim qala romana Kurdî bikim. Bi ya min, ana di vê gavê de, ev ne durust e. Jimara romana Kurdê Tirkiyayê çend heb in, yên kû min bi dest xistin û xwendin ji kurdên Iraq, Îran, Sûriye û Rûsya jî ne gelekin. Lewra, ez romana kurdî qels dibînim, lê, ez gelekî hêvîdar im ku wê di demeke kin de pêş de here.

– Di berhemeke edebî de rola zimên çi ye? Ji bo avakirina edebiyateke kurdî ya modern zimanê kurdî têr dike? Ger "na" be problem çi ne?

– Di berhemeka edebî de du-sê tişt herî girîng in; wek naverok, hevdemîbûn û ziman. Meriv dikare bêje ku xurtbûna berheman bi gelek aliyan ve girêdayî zimanê wê ye. Ziman ne tevlîhev be, rast û bi dengekî xweş bê guhê însanan pê kêfxweş dibe û rihet dixwîne. Wek meriv di nav daristanekê, di nav baxçekî de bîhna gulan hilde û bi rê ve here, meriv rûpelên wan berheman bi kêf diguhuze. Bi ya min, tiştê herî girîng ziman e. Lê, waxta ku meriv li zimanê kurdî mêze dike, dibîne ku, kurdî ne zimanekî teng û feqîr e, lê tiştek heye, bi sed salan nehatiye bikaranîn. Zimanê edebî di vî warî de li paş maye. Di jiyanê de hertişt wisa ne, dema ku neyê şuxulandinê, her diçe qels dibe. Meriv di vê jiyana xwe ya kin de jî dibîne, piştî çend salan em bi xwe jî ferq dikin ku, zimanê me yê edebî pêş de çûye, lewra gerek meriv rucara nesekine, hewl bide xwe her zêde binivîse. Ji bo avakirina edebiyateka kurdî ya nûjen, ev salên ku em tê de dijîn, zimanê kurdî têrê nake, meriv dijwariyê dikişîne, lê belê, her roj ev dijwarî her diçe kêm dibe. Piştî demekê, ez bawer im ku em ê êdî vê dijwariyê nekişînin. Ziman di gelek waran de girêdayî rewşa wê civatê ye, ana, civata kurdî nîvgundî û nîvbajarî ye, ew jî bajarên Kurdistanê ne pêşta çûyî ne, ji bo wê jî kurdiya me hela hê ne pêş

de ye. Ser de jî di van salên dawiyê de gundiyên ku koçî bajaran kirin, Kurdî hê jî tev li hev bû. Lê piştî waxtekê zimanê me yê biedile. Divê em vê jî bêjin, Kurdiya bajarvaniyên me ne kurdiyeke paqij e, gelek caran pirs û termên tirkî bi formekî kurdî girtine. kurdiya dewlemend û paqiş di nav xelkê de tê xeberdan. Bi ya min gerek meriv ji tu tiştekî netirse, ziman jî wek zarokan e, wê mezin û dewlemend bibe, lê belê demeka dirêj dixwaze. Ji bo ku em ziman ji pirsên nekurdî paqiş bikin, gerek em tişt û hewildanên bêaqil nekin. Ev di jiyana hemû gelan de weha bûye. Sebireke mezin û hewildaneke bi aqil dixwaze. Yekê jî, dema ku civata kurdî piranî rencberî û heywan xweyî kirine, bi diyalektîk, bi pirsên van babetan ve kurdî dewlemend e, lê belê di aliyê bajarvaniyê de ne wisa ne, bi ya min, wê bête guherandin. Çawa ku em zanin, ziman wek rewşa civatê wisa zû nayê guhartinê.

Problemeke zimanê kurdî, hela hê gramer û qaîdên kurdî wek zimanên Ewrûpayî di cihekî de nesekiniye. Hinek kes bi tehrekî din û qaîdên cur bi cur kartînin. Wisa tê xuyanê ku ev rewş wê demekê dom bike. Bikaranîna elifba latînî, erebî û krîlî jî nahêle zimanê kurdî bi xurtî pêş de here. Ji bo vê sebebê kurdên bakûr, başûr û rojhilat di hêla ziman ve gelekî nêzî hev nabin, ev jî dijwariyek e. Ji bo elifbayekê hela hê hemû Kurd pêwîstiyê nabînin, lê ez bawer im ku rewşa siyasî û civakî wê me hemûyan jî mecbûr bike.

– Gazina piraniya nivîskarên kurd ji nexwendina edebiyata kurdî heye. Gelo ji bo li welêt entresa xwendin û nivîsandina kurdî zêdetir bibe, divê çi bêne kirin? Kî dê van bike?

– Ez dikarim ji bo kurdên Tirkiyeyê bêjim, hê piraniya civatê gundî ye, xwendinê nizane an jî jê hez nake, ev tiştekî normal e. Gelekên wan, van babetan bi tirkî dixwînin û him jî, ji bo ku di dibistanan de tirkî xwendine, ji kurdî zûtir û rihettir dixwînin. Eger meriv bi serê xwe û bi zanebûn li ser nesekine wê weha here, lewra

pêwîst e ku însan bi mêjû û zanebûn hewl bidin bi kurdî binvîsin û bixwinin.

Tiştekî din jî heye, rejîma Tirkiyeyê gelek tade û zordestiyê nîşan dide, hemû kes ditirsin kurdî bixwînin û binivîsin. Gelek berhem qedexe ne an jî însan nikarin li her derê bixwînin, an jî naxwazin ku kesên din bizanibin ew, tiştên weha dixwîne. Însan ne serbest in, ji karên xwe tên avîtinê, li qereqol û mehkeman tên girtinê. Gerek em qebûl bikin wisa ne hêsa ye. Em yên ku li Ewrûpayê rûdinin, vê dijwariyê rind fêhm nakin.

Divê meriv dîsa jî qebûl bike ku rewşa ekonomîk her diçe giran dibe, pirtûk û rojname jî ne erzan in, mala kurdekî feqîr bînin pêş çevên xwe, rojnemek bi 10 hezar û pirtûkek jî kêmasî bi 70-100 hezar lîra ye. Rewşa aborî, hejmara xwendevanan bibê nebê kêm dike. Ev tiştekî normal e ku gerek hemû kes di hêla xwe de hewil bide û xwendevan zêde bibin, mixabin ku riyeke din jî tune. "Kî dê van bike?" Nûdem dipirse. Birayên delal, ez çi bêjim? Gerek hemû kes bikin, ev deynê hustiyê civatê ye, ne tenê yê hinek kesan e.

– *Tu pêşeroja edebiyata kurdî çawan dibînî? Di kîjan şaxî de pêşketin heye?*

– Ez ji ber pêşeroja edebiyata kurdî ne xemgîn im, ev pêşeroj, bi gelek waran ve girêdayî rewşa siyasî û civakî ye. Bi ya min, bi gelek dijwariyên xwe ve, her roj di vî warî de, pir tişt tên guhartinê û pêşdeçûyinek li ber çavan e. Kurdên gavên mezin bavêjin. Dinya ber bi aşîtiyê û demokrasiyê ve diçe, ev hal wê tesîra xwe li ser civata kurdî û ew welatên ku kurd tê de dijîn jî nîşan bide û edebiyata kurdî wê ji hinek dijwariyan xelas bibe.

Zimanê kurdî bi deng û rîtmê xwe, ji nivîsandina helbestan re her baş e, lewra hozantî pêş de diçe û wê hê jî here. Hemû kurd pir hindik dixwazin helbestan binvîsin, bi taybetî di ciwantiya xwe de.Nivîsandina çîrokan jî wek berê nîn e, her diçe berhemên bi kalî-

te derdikevin. Roman û tiyatro, ev herdu şax di esasê xwe de ne wek helbest û çîrokan in. Pêşdeçûyin di van babetan de, qet nebe di vê demê de, ne xuya ye.

Núdem, No: 10, 1994

ŞAHÎNÊ BEKIRÊ SOREKLÎ: "EDEBIYAT DIVÊ DI NAVA XELKÊ DE BIJÎ"

Nûdem: *Gelo mirov dikare îro behsa edebiyateke kurdî ya modern bike? Edebiyata modern çi ye?*

Şahînê Bekirê Soreklî: Divê em berê xuya bikin ka edebiyat çi xwebêjê dide. Ji bo hinan, heye ku edebiyat afirandina berhemên wek yên Goethe, Sartre, Thomas Mann, Necîb Mehfûz û yên wek wan bi nav û deng bin. Xwediyê ramaneke wisa dikare bibêje, na edebiyata kurdî nîn e, ji ber ku çi nivîskarên kurdan nikaribûne berhemên xwe bigihînin pîvana nivîskarên cîhana edebiyatê yên bi rûmet. Li milê din, werin em bixwînin, ka ferhenga OXFORD çi xwebêjê dide bêjeya "edebiyat". *Literature: Literary culture; literary production, the literary profession; realm of letters; writing of a country or period; writing whose value lies in beauty or form or emotional effect; the books etc., treating of a subject; printed matter.* Bi gotineke din, nivîsandina ku merov dikare wek berhemên çanda gelekî bi nav bike; nivîsarên welatekî, yan qonaxeke dîrokê; nivîsarên nerxa wan di qencî, babet û bandora atifi de tê dîtin; pirtûk û yên wek wan; lênerîna bi nivîs û hemî berhemên bi nivîs edebiyat e. Heger merov vê xwebêja ferhenga li cîhanê bi rûmet bipejirîne, wê demê çi guman nîn e ku edebiyata kurdî heye. Bi dîtina min, nivîsandina nameyeke qenc jî edebiyat e. Dema ciwanek nameyekê ji evîndara/evîndarê xwe re binivîsîne û yê/ya name girtî wê bixwêne û bi gotinên tê de dilşa yan dilxemgîn bibe, bêguman ew nameya berhemeke edebî ye. Heye ku giraniya wê nameyê ji bo me ne çi giranî be, lê ew tiştekî din e.

Li dû gotinên li jor, em dikarin bi hêsanî bibêjin ku, erê, merov dikare behsa edebiyateke kurdî ya modern bike. Dema xwendevanekî kurd romaneke Mehmed Uuzun, Mehmûd Baksî, Bavê Nazê û hwd, yan helbesteke Şêrko Bêkes bixwîne, ji wan fêhm bike û lezetê di xwendina wan de bibîne, wê demê kesek nikare bibêje, na, edebiyata kurdî ya modern nîn e. "Edebiyeta modern" ya kurdî ji bo min vê xwebêjê dide: berhemên wek romanan, kurteçîrokan, helbestan, şanoyan, gotarên edebî û folklorî û lêkolînan yên di sedsala bîstan de li gor gramera nivîsa kurdî hatine nivîsandin û hejmareke ji kesên dikarin bi vî zimanî bixwînin jê fêhm dikin. Bi gotineke din, hebûna kovareke wek RONAHÎ ya duhu, NÛDEM ya îroj û pirtûkên nivîskarên kurd ku îroj têne weşandin îspatên hebûna edebiyateke kurdî ya modern in.

– Tu pêşketinê di kîjan şaxê edebiyata kurdî de dibînî?

– Edebiyata kurdî ya soranî di gelek şaxan de pêş ve çûye, lê eger em li vir behsa kurmanciya bi tîpên latînî dikine, wê demê pêşveçûna herî mezin di warê helbestan de ye, ji yên ber Cigerxwîn û Cigerxwîn hevalên wî, bigir ta helbestvanên me yên wek Ehmed Huseynî, Jan Dost, Rojen Barnas û gelekên din. Li dû helbestan kurteçîrok tên. Tevî ku hejmara kurteçîrokan di salên dawîn de ber bi pêş çûye jî, kurteçîrokên baş, mixabin, gellekî hindik in. Di çend salên borîn de romana kurdî jî pêşve çû, herweha berhemên xwe bi lêkolînê ve eleqedar dikin, wek yên Rohat, Malmisanij, Zeyelabidîn Zinar û hwd. lê em hê di destpêka rê de ne.

– Tunebûna rexnegiran çi tesîra neyînî li edebiyata kurdî dike? Rola rexnegiran di edebiyatê de çi ye?

– Berî rexnegirên baş bi hejmarên layiq hebin xwendevan pêwîst in. Dema xwendevan bi deh hezaran, sed hezaran, yan bi milyonan bin, wê demê hejmara rexnegiran jî dê bêtir be, lê di rojên îroj de xwendevanên berhemên kurdî gellekî hindik in. Li milê din, hejma-

ra nivîskaran bi xwe pirr û pirr bi sînor e. Hema-hema hemî kesên bi kurdî dinivîsînin, ji dûr ve, yan ji nêzik ve hevûdin dinasin. Li gor ku ez ji dûr ve dibînim, pirraniya mezin ya kesên di derheqê berhemekê de rexneyekê dinivîsînin, yan dostê nivîskêr in, yan ji nivîskêr hej nakin. Di dema nivîsandina rexneya xwe de, ew bi şêweyeke kûr dikevin bin bandora hestên xwe yên atifî û nikarin bi şêweyeke objektîv wê berhemê binirxînin. Rexnegeriya kurdî hê di destpêka xwe de ye û çi rexnegirên hoste û pispor li holê nîn in, ji ber ku nivîsandina bi kurdî bi xwe hên di gavên destpêkê de ye. Bêguman e ku rola rexnegiriyê di pêşveçûn û nerxdana edebiyatê de mezin e, lê di derbarey edebiyata modern ya kurdî de, em hê di elif û bayê de ne. Rexnegirî dikare bi sedsalan bajo, wekî di fakûlteyên edebiyatê yên cîhanê de îroj diyar e. Li milê din, nivîskarekî ku îroj qedra berhemên wî nayê girtin, pêkan e li nik nifşên pêşerojê bibe nivîskarekî navdar. Ji xwe ji bîr nekin, ku KAFKA berî mirina xwe ji hevalê xwe tika kiribû, bila hemî berhemên wî bişewitîne. Gellek nivîskarên cîhanê yên bi dehan sal berê nan nebû bixwin îroj li dû mirina wan pirtûkên wan di zanîngehan de têyên xwendine. Lê divê em ji bîr nekin ku rêya li pêş me rêyeke dûr û drêj e. Me ne xwendegeh, ne zanîngeh hene û ne jî mamostayên fakûlteyên edebiyata kurdî hene. Edebiyata me gellekî li dû edebiyata zimanên wek almanî, înglizî û frensî maye. Berhemên me yên edebî îroj bi pirranî hê negihîştine pîvanên felsefî û edebî yên bilind, ji ber ku me hema-hema ji sifrê dest pêkiriye. Wek nîşe, ji bo edebiyateke wek ya almanî, ber Böll û Brecht û Mann... Heine, Nietzsche, Fontane... hebûne. Berî wan yên wek Goethe û Schiller hebûne û herweha. Nivîskarên almanî ya îroj berhemên edebiyata xwe li ser hîmekî lêdikine ku yên ber wan bi sedan sal tê de xebitîne. Loma, divêt nivîskarê kurd ji kêmasiyên li holê dilsar nebe û guh nede wan kesan ku iddîa dikin me çi edebiyat nîn e, yan diyar dikin, ku baştir

e em li hêviya damezirandina dewleteke kurdî bimînin. Heger nivîskarên îroj ji yên sibe re hîmekî nehêlin, ew ê jî wek me ji sifrê dest pê bikin. Di bîst salên borîn de gavine pirr mezin di pêşvebirina edebiyata modern ya kurdî de hatin avêtin. Ew jî bi saya hejmareke bi sînor ji merovên kurd. Ev fidakariya divêt bidomîne, rexnegirî hebe, nebe. Pêşveçûn û dewlemendbûna edebiyatê dê rexnegiriya rêk û pêk jî, zû-dereng, têbigihîne.

– Bi ya te problemên edebiyata kurdî yên bingehîn çi ne? Ji bo başkirin û bi pêşdexistina edebiyata kurdî divê çi bête kirin?

– Problemên edebiyata kurdî pirr in, ku bi dîrok, ziman û rewşa îroyîn ya gelê kurd ve grêdayî ne. Gelşa herî mezin îroj nivîsandina bi zarav û elfebayên cuda ye. Dû re tê nebûna xwendevanan. Edebiyata neyê xwendin dibe wek berhemên têkevin entîkxaneyan. Edebiyat divêt di nav xelkê de bijî, hem bandorê li wan bike, hem jî bandora wan lê bibe. Dema wisa be, nivîskarê baş jî hêzê ji xwendevanên xwe digire û berhemên hê baştir diafirîne. Peyva "nivîskar" wê xwebêjê dide, ku karê wî merovî nivîs e. Di rewşa îroj de, ma gelo çend nivîskarên kurd xwe bi pereyên frotina berhemên xwe xwedî dikin, da em bibêjin ku ew rast nivîskar in?! Nivîskarên serkewtî yên neteweyên din hemî kat û pêkaniya xwe dixin xizmeta afirandina berhemên xwe. Ji bo wan merc û şertên hêsan li holê ne. Pirraniya nivîskarên kurd, li milê din, tenê di dema razan û vêsîkirina xwe de dinivîsînin û bi hezar bela û axekufê pirtûkeke xwe didin weşandin. Problêmine din: nebûna ferhengên rêk û pêk, nebûna bêjeyên teknolojî û têrmên nûjen, hebûna hejmareke ji "parasîtên" nezan û nîvzan kn bandoreke xirab li ziman û edebiyata kurdî dikine, mayîna hin nivîskaran di bin bandora zimanê tirkî de, nebûna dezgehên knrdî yên perwerdekirina nivîskarên sibe û gelek gelş û problêm û astengên din.

Li gel hemî kêmasiyan jî, divê were gotin ku ew nivîskar, huner-

mend û hemî kesên sûd di panzdeh salên borîn de gîhandine çand û edebiyata kurdî, layiqî rêz û pesindanê ne. Wan bi xîret û fidakarî û xebata xwe beşekî valahiyeke mezin tijî kirin. Heger îroj pirtûkên kurdî, rojnameyên kurdî, kasêtên mûzîka kurdî û heta filimên kurdî, hebin, ev ji bo gelekî bindest û bêmaf ne hindik e. Geline cîhanê yên xwedan dewlet îroj ne xwediyên weqa berhem in.

Nizanim ji bo başkirin û pêşdexistina edebiyata kurdî çi divê bête kirin! Hemî dijwariyên edebiyata me ji nebûna mafên me yên netewî li Kurdistanê têyên. Gellekî hêsan e mirov bibêje, "divê wisa bibe û wisa nebe." Lê di pratîkê de gotin û kirin nabin yek. Bi dîtina min, partiyên Kurdistanê divêt roleke mezintir di warê pêşvexistina ziman û edebiyata kurdî de bilîzin, lê bêguman, kirineke wisa jî zanistî û pâkaniyê dixwaze. Ev partiyên han ta radeyeke mezin nivîsarên xwe bi tirkî, farsî û erebî dinivîsînin, bêyî kı bikaribin graniyeke mezin bidin pêşvexistina ziman û edebiyateke kurdî ya yekgirtî. Ta roja îroj rola şexsan di pêşvebirina edebiyara kurdî de ji ya partiyên kurdî mezintir bûye. Sereketiya partiyên siyasî divê alîkariya nivîskarên qenc bikin, bêyî şert û bêyî sînorkirina azadiya nivîsê, da rola wan di pêşvebirina edebiyata kurdî de yeke bi nirx be. Edebiyat û propagandaya siyasî li gel hev naçin. Dîrokê, ji împaratoriya Roma de bigir heta jihevbelavbûna Yeketiya Sovyêtî, ev yeka îspat kiriye. Rola edebiyatê di azadiya gelekî de tiştek e, bikaranîna edebiyatê ji bo propagandayê tiştekî din e.

Bêyî ziman û edebiyata kurdî kurd ne kes in! Mirovê hişyar û hêja piştgiriya nivîskar û hunermendên xwe dike. Gellek kurd ne amade ne deh qurşan jî ji bo kirîna rojnameyekê, pirtûkekê, yan kasêtekê xerc bikin. De van kesan çi maf heye daxwaza mafan ji hukûmatên serdest bikin? Dibêjin li Ewropayê nîvmilyon kurd dimînin. Gelo çend ji wan pirtûkeke kurdî dikirin?! Li welatên cîhanê yên din wêne eynî wêne ye. Bi kurtî, divê mirovê kurd, partiyên kurdan li

çand, ziman û edebiyata kurdî xwedî derkevin. Heger ev nebe pêşveçûna edebiyata kurdî dê bi sînor be û dê tenê li ser milên hejmareke biçûk ji nivîskar, hunermend û entellektuelên kurd bimîne. Dema rêberekî ziman û edebiyata gelekî, merovekî mezin yê wek Celadet Bedir-Xan, ji ber xwedîlêderneketinê di "bîra qederê" de jiyana xwe wenda bike, wê demê ne tiştekî matmayînê ye ku neteweya li kesên wek wî xwedî derneketî di şevreşiya bîra nezantiyê de salên dûr û drêj ji ronahiya edebiyat û zanistiyê bêpar bimîne. Bila em ji şaştiyên wisa fêrî dersan bibin.

– *Wek tê zanîn edebiyata kurdî li dervayê welêt, li sirgûniyê geş dibe... Gelo rîska ku piştî demekê nivîskarên kurd li sirgûniyê têk herin tuneye?*

– Neteweya kurd neteweyeke mezin e. Ne wisa bûya, ew ê ji mêj ve biheliya. Cîhê dax û mixabê ye ku vî gelî dewlemendiya çand û hunera xwe bi şêweyeke devokîn tenê pêşve biriye. Lê çawa be, hebûna edebiyata kurdî, li gel hemî astengên berê û nuha, wê xwebêjê dide ku ev edebiyata ji vir û şûnve, heger pêşve neçe, ew ê paşve jî neçe. Hêvî ew e, ku ji vir ta destpêka sedsala 21em gelê kurd dê bi kêmasî li beşekî Kurdistanê, qe nebe, mafên çandî bi dest xe. Berhemên nivîskarên îroj li sirgûniyê dinivîsînin ê sûdê bigihînin, û gîhandine, nivîskarên li welêt jî. Çi bibe, çi nebe, merovên kurd ê her li derve jî hebin. Heger ne Swêd be, ew ê li Lubnanê hebin; heger ne Lubnan be, ew ê li Emerîka hebin... Li milê din, îroj li Başûrî Kurdistan, li Sûriyê, li Rohilatê Kurdistanê û heta li Tirkiyê pirtûkên kurdî têne çapkirin. Lê tiştê girîng ew e, ku kurd bi xwe li edebiyata xwe xwedî derkevin, bi kurdî bixwînin û xwe fêrî rêzgirtina ji pirtûk û berhemên edebî û çandî re bikin, yan bi kêmasî piştgiriya aborî û manewî bikin. *Nûdem, No: 10, 1994*

ROJEN BARNAS: "PÊŞEROJA EDEBIYATA KURDÎ GIRÊDAYÎ PÊŞEROJA GELÊ KURD E"

Nûdem: *Gava em li dîrokê dinihêrin, em dibînin ku edebiyata kurdî ya klasîk dewlemend e, di pîvanên edebî de ne kêmî yên cîranan e. Sedemên wê yên dîrokî û civakî çi ne?*

Rojen Barnas: Ji edebiyatên klasîk ên cîranan ez bi tenê edebiyata tirkî/osmanî dinasim. Asûrî, ereb, ermen û faris cîranên me ne û yên herî kevin in, lê mixabin di bareya edebiyata wan de tiştekî nizanim ku bikaribim ya me û yên wan bidim ber hev û bêjim edebiyata me ya klasîk ne kêmî yên wan e an ji yên wan çêtir e. Ji edebiyata kurdî jî tiştê ku ez dikarim li serê du gotinan bêjim, edebiyata kurmancî ye.

Di pey vê zelalkirina pêwist de bi dilekî fereh dikarim bêjim ku edebiyata kurmancî ya klasîk ji aliyê çawahînê (qualité) ve ji ya tirkî/osmanî qet ne kêmtir e. Ji aliyê çendahînê ve jî hejmara şairên me yên klasîk ne hindik in. Lê mixabin berhemên gelek ji wana winda ne an hê derneketine ronahiyê.

Vêca em bên ser sedemên dîrokî û civakî yên dewlemendiya edebiyata me ya klasîk:

Şairên kurmanc ên klasîk bi piranî melayên têr xwendî û têrgihîştî yên ilmên dînî yê îslamê û wekî dinê yê felsefê, edebiyatê, matematîkê, stêrnasî, tarîxê û h.w.d bûn. Bi erebî, farisî û tirkî û bi taybetî bi edebiyata ereb û farisan baş dizanibûn.

Hin ji wan ji bo xwendina xwe çûne li Îranê, Hindistanê, Sûriyê, Misrê geriyane, alim, edîb û zanayên zemanê xwe nasîn e. Ji aliyê ilmî û edebî yê li gora zemanê xwe, ew bi xwe otorîte bûn. Di med-

reseyan de mela digihandin. Hawîrdorên wan xwenda û zana bûn. Ew bi xwe kesên xwedî cihekî girîng yê dîwana siyasî ya otorîteya navçeyî bûn (dîwana mîr).

Şi'rên wan bi riya mela û feqehên wan (xwenda û zanayên zeman) bi hezkirinî li dîwanên mîr û şêxan (otorîteyên siyasî û dînî), li medereseyên dinê (nawendên kultur û entellektuelî) di nav xwenda û zanayên dinê (rewşenbîrên welat) de belav dibûn. Li gora hêjayiya şi'rê rûmeta şairê wê digirtin.

Ku şair zana û xurt, şi'r hêja û gurr û xwenda an guhdar an civak têgiha û rûmetzan be, dawînî dê çawa be?! Dawînî dê bibe maka edebiyateke dewlemend.

– Gelo nivşê îro çiqasî edebiyata xwe ya klasîk nas dike? Ji bo têgihîştin û jêfêdedîtina edebiyata kurdî ya klasîk pêwistî bi çi heye?

– Kesê ku edebiyata klasîk a tirkî an farisî baş nexwendibe û li xwe nexunaftibe, zor e ku ji edebiyata klasîk baş fam bike û zewq jê bistîne. Zimanê edebiyata me ya klasîk mîna Farisiya Nû tevlîhev e: Yê Osmanî jî wisa ye. Zimanê ya me ji bêjeyên erebî, farisî, kurdî û piçek jî ji tirkî-moğolî pêk tê. Bêje, cama bi serê xwe tu manekê nade, ew nima (mezmûn an sembol) ye, divê meriv pê bizanibe. Divê meriv ji mîstîzmê-sûfîzmê agahdar be ku mebesta şair fam bike. Divê meriv bi hunerên edebî yên wê bizane da bigihîje zewqa naskirina ziraviya hunermendiya şair.

Ji bona jê têgihîştinê hînkirina (education) bingehîn divê, ku tirk di lîseyan de sê salan di gel edebiyata gelêrî, tekyayî û rojavayî vê didin xwendin. Riyeke din çapkirin û belavkirina berhemên şairên klasîk bi şerh û tefsîr dê bibe alîkar ji bona jê têgihîştinê.

Wek ferd jê feydedîtin li ser daxwaziya meriv e, lê wek gel an netewe jê feyde dîtin bi vê riyê dibe ku ewê girêdana di navbera nifşên niha û pêşerojê bi pêşiyên me re zeximtir bike, serbilindiya neteweyî dê di giyanê mirovên me de biçîne.

– Îro behsa helbesta kurdî ya modern dibe. Pîvanên modernîzmê çi ne? Tu Cegerxwîn dixî kîjan kategoriyê?

– Di şi'ra klasîk de hin pîvanên bingehîn hebûn: 1. Kêş, erûz bû. 2. Teşe an form, xezel, qesîde, mesnewî, rubaî, mustezad, murabba', muxammes û h.w.d bû. 3. Ziman, zimanê bilind ê ji erebî, farisî û kurdî têkel. 4. Aheng, bi beşavendên (qafiye) dawiyê û redîfan dihate dayîn. 5. Bikaranîna hunerên edebî û mezmûnan (sembolan) nîşana hunermendiya şair bû.

Ji kovara Jîn û pê de em rastî gerriyaneke (cereyan) dinê dibin: Ew ne edebiyata klasîk e û ne jî ya moderna îroyîn e. 1. Kêşa kîteyî dewsa erûzê digire. 2.Teşe bişihibe xezel an mesnewî jî ne ew in. 3. Ziman, zimanê gelêrî yê sade ye. 4. Mijara şi'rê li ser Kurdistanê û miletê Kurd e; ji ber vê jî bi piranî di uslûba şîretkirin, hişyarkirin û navtêdanê de ye. 5. Ahenga rêz an malikê li ser beşavenda li dawiya rêzê ye; lê beşavend fena ya klasîk ne zengîn an tam e. 6. Endîşeya şair ya bikaranîna hunerên edebî ji binî tune, ew lê dixebite ku mesaja xwe ragihîne. Ebdurrehîm Rehmî û Osman Sabrî du nimûnendeyên vê yên herî ber bi çav in.

Bi hin şi'rên Cegerxwîn wekî "Heval Pol Robson", "Kî me Ez" û hin şi'rên Qedrî Can di reng, rûçik û hilma şi'ra kurmancî de guherîn xuyan bûn. Ev guherîn hê jî berdewam e.

Meyla îroyîn a şi'rê ber bi vî aliyê ve ye. Hera niha ez rastî tu pîvanên tesbîtkirî nehatime. Lê hin xisûsiyetên muşterek ên vê şi'rê hene:

1. Kêş serbest e.

2. Ziman sade ya gelêrî ye.

3. Muzîk li gora hunermendiya şa'ir bi beşavendên hundir, dawîn û redîfan tê peydakirin, lê ne ew çend girîng e.

4. Mijara şi'rê bi piranî li ser pirsên civakî, siyasî û welatî ye. Yên evînî gelek kêm in.

Cegerxwîn di şi'ra kurmancî de pireke gelek xurt û zexm e ku edebiyata klasîk û ya nû digihîne hev. Hersê dîwanên wî yên pêşî xala çara ya vê bendê û lîrîzm û forma edebiyata klasîk digihînin hevdû û di hevûdu de dikelînin.

– Peywendiyên helbestê bi çîrokê re çi ne? Roman çawan ji çîrokê vediqete?

– Di kurmanciya jêrîn (soranî) de helbest ji bona stran (kilam) dibêjin. Me jî ev bêje bi şaşî bi maneya "şi'rê" girt û bi kar anî, lê "helbest" ne şi'r e û şi'r jî ne "helbest" e.

Du awayê vegotinê hene: Vegotina bi nezmê û vegotina bi nestê. Şi'r vegotina bi nezmê ye, lê her perçe-nezm an menzûme ne şi'r e. Şi'r perçe-nezm an menzûmeya bi vegotinê gırr û bi pejnê dagirtî ye.

Di edebiyata klasîk de çîrok bi nezmê dihatin nivîsandin. Mem û Zîna Ehmedê Xanî, Mewlûda Melayê Batê, Leyl û Mecnûn a Şêx Mihemed Can çîrok in û çîrokên menzûm in. Lê êdî kes îro çîrokan bi vegotina nezmê nanivisîne.

Ji awayê vegotinê çîrok û roman bi nesrê (pexşan) têne nivîsîn.

Çîrok serpêhatiya kesekî an xelekek ji serpêhatiyên kesekî ye. Di çîrokê de kesekî sereke an qehremanê çîrokê heye, serpêhatiyên kesên dinê yên bi serê xwe nînin; serpêhatiyên kesên dinê perçekî ji serpêhatiya qehremanê çîrokê ye, yanî ji bilî qehremanê çîrokê kesên dinê figuran in.

Roman jî serpêhatî ye, lê bûyer xelek bi xelek in: Qehremanê an qehremanên romanê di hin xelekan de dibe ku qet xuyan nekin an jî bikevin dereca figuranî. Di romanê de bûyer ji bûyeran derdikevin an bûyerên ji hevûdu cihê dibin sedemê hin tiştan an bûyeran û ew tişt an bûyer tên di xelekekê de digihîjin hevûdu.

Çîrok bi nîsbet romanê kurtir e. Vegotina çîrokê bi nîsbet ya romanê gurrtir û kintir e, ji vegotina bi hûrikî (detalj) ya tişt û bûye-

ran direve.

Çîrok û roman hene ku vegotina wan herikandî, teswîrên gurr û bûyerên wan pejinê xwendevan hildikin, wisa ku meriv naxwaze heta dawiyê dev jê ber de: Ji yên vê cureyê re uslûba şi'irkî dibêjin.

– *Edebiyata kurdî bi giştî xwediyê pêşerojeke çilo ye?*

– Pêşeroja edebiyata kurdî bi temamî girêdayî pêşeroja gelê kurd e. Ku gelê me bikare bigîhije mafên xwe yên siyasî û demokratîk, ez bawer dikim ku di demeke kurt de emê bikarin vê valahiya mezin telafî bikin û bi hindikî bigihîjin sewiya edebiyata cîranên xwe.

Ku hema bi tenê rojnama Kurdistan, kovara Jîn, Hawar, Ronahî, Roja Nû li Tirkiyê nehata qedexe kirin û bidest biketa, ku hema bê alîkariya dewletê biwa jî bi tenê bi kurdî nivisandin û belavkirin nehata qedexe kirin, ewê rewşa edebiyata me ya kurmancî îro bi awakî dîtir biya.

Em li van deran dikarin malê xwe yê belawela berhev bikin, xwedî lê derkevin û bergeha edebiyata xwe ya pêşerojê ya li welat xweş û paqij bikin. Edebiyata miletekî di nav wî miletî de pêş dikeve û geş dibe.

Nûdem, No: 10, 1994

ROHAT ALAKOM:
"EDEBIYAT JI NÛ VE AFIRANDINEKE ESTETÎK E"

Nûdem: *Edebiyat çi ye, tu dikarî têkiliyên edebiyatê yên bi folklorê re şirove bikî?*

Rohat: Eger em folklorê bi "edebiyata devkî" bi nav bikin, wê çaxê sînorên folklorê û edebiyatê gelekî nêzîkî hev dibin. Hem folklor (berhemên devkî), hem jî edebiyat (berhemên nivîskî) du dewlemendî û çavkaniyên hunerî ne. Edebiyat, afirandin û ji nûh ve afirandineke estetîk û bedewiyê nîşan dide. Ji der vê tarîfa teng, edebiyat di babetekê de hemû çavkaniyên nivîskî jî hildiçîne nav xwe. Eger em tenê tarîfa jorîn bidin ber çavan, folklor û edebiyat ji alîkî de zêdetir ji hev cuda dibin, ew jî tiştekî şeklî ye, tenê mirov dikare bêje ku nivîskarên berhemên folklorîk ne kivş in, lê belê nivîskarên berhemên edebî diyar in. Dema em ji van gotinên klasîk dûr dikevin, em dibînin ku di navbera foklorê û edebiyatê de têkilî, pêwendî û nêzîkahiyên gelek jîndar hene.

Civateke wek civata kurdî bi dirêjahiya salan di zikê tebiyetê de jiyaye, ziman lê hatiye qedexekirin, dijmin timê ajotiye ser, vê civatê çawa em dibînin bi saya folklorê tenê xwe îfade kiriye, dil û mêjûyê civatê fonksiyonên hunerî, artîstîk ji xwe re peyda kirine. Gelek berhemên hunerî bi salan li ser zar û zimanê civatê mane, hatine gihîşrine van rojên îroyîn. Folklora me, ji bo edebiyateke nûjen dewlemendiyeke herî mezin e, ji me re îmkanên bêsînor pêşkêş dike. Eger ev îmkanan neyên zanîn, neyên berevkirin û neyên lêkolandin, mercên afirandina edebiyateke nûjen û hevdem tune ne. Ji ber ku folklor ne tenê ji aliyê temayên cuda, ji aliyê stîl, ziman û çandî de

pencereyên dewlemendiyên nûh li pêşiya me vedike.

– Gava edebiyata devkî derbasî ya nivîskî dibe, divê li çi bête fikirîn? Tu avakirina romanê ya li ser berhemên folklorîk çawan dibînî?

– Berhemên folklorîk dema tên berev kirin, derbasî ser kaxizê dibin, ji devê xelkê çi derketiye, pêwîst e wisan jî bê nivîsîn. Kesên berevkar mafê wî tune ye ji ber xwe tiştan tevî van berheman bike an jî van berheman angorî xwe serobino û berovajî bike. Ji ber ku karê folklorîstan ne ajîtasyon û propaganda ye, karê wan berevkirin û şirovekirin e. Dema hemû şax û versiyonên van berheman hatin berev kirin, derbasî ser kaxizê bûn, êdî ew dibine malê xelkê, nivîskarek mafê wî tune ye, li van berheman xweyî derkeve û wek nivîskarê wan xwe bide nîşan kirin. Ji aliyê din nivîskarek dikare berhemeke folklorîk ji berhemeke xwe ya nûjen û edebî re bike bingeh. Lê belê pêwîst e ji giyanê (ruh) vê berhemê yê dîrokî û civakî dûr nekeve. Eger nivîskarek dema dixwaze şaxeke edebî ya van berheman ji nûh ve binivîse, pêwîst e bingeh û stûnên berhemên folklorîk zêde nehejîne û kincên mayîn, kincên "xerîb" li mêrxasên van berhemên folklorîk neke. Dema her tişt hate guhartin, wê çaxê ew tam û lezeta ku di wê berhemê de heye, winda dibe, berhem dibe berhemeke rijî û bêtam, hejmara "mêrxasên nenas" zêde dibin. Tiştê ku nivîskar di vê berhema nûh de dikaribe nîşan bide, ne guhartina naverokê mêrxas û derdor e, zêdetir îfade, bikaranîna zimên û îmkanên hunerî ne. Ev yeka ji bo romaneke ku li ser berhemeke folklorîk hatiye nivîsîn jî, derbas dibe.

– Carinan muneqaşeya hebûn û nebûna romana kurdî tê kirin. Tu dikarî bi kurtî behsa dîroka romana kurdî bikî. Rewşa romana kurdî îro çawa ye?

– Ez bawer dikim ku muneqaşeyên hebûn û tunebûna romana kurdî ne ku ji ber romanên kurdî bi hejmar tune ne, ev muneqaşe-

yan zêdetir li ser "tunebûna romanên çê" tên kirin. Eger em pêşketina romanê li Fransayê, Ingiltereyê, Spanyayê, Rûsyayê û Kurdistanê bidin hemberî hev, rûberî hev bikin, hem ji aliyê jimarê, hem ji aliyê bilindbûna qenciya van berheman de cudayiyeke mezin heye. Kesên ku dibêjin "romana kurdî tune ye", baweriyên xwe li ser van rûberîhevkirinan ava dikin. Baweriyên wan ji gazin, lome û rexnan pêk tên. Ev kesan pey "kvalîtê" digerin û baweriyên li ser vê pîvanê formule dikin.

Bi baweriya min, ne tenê roman, di her warê hunerî de pêwîst e mirov rewşa wî welatî, îmkan, mecal û mercên wî welatî jî bide ber çavan. Li her welatî, çand, huner û edebiyat, angorî pêşketina civatê ya dîrokî, civakî û aborî ji xwe re tempoke meşê bi dest dixe. Ji ber rewşa Kurdistanê ya siyasî, civatê ev firseta pêşketinê dereng bi dest xistiye an jî hewl dide, tekoşînekê dide ku xwe bigihîne vê firsetê û bi dest bixe. Bi kurtî rewşa welatên bindest wek Kurdistanê timê ji pêşketineke çandî re bi dest nade. Ji ber ku di jiyana rojane de çawa em dibînin şerê hebûn û tunebûnê, mirin û jiyanê li vî welatî dajo. Helbet di nav van dubendiyên jiyanê yên tûj de karên çandî, hunerî û edebî jî, ji îmkanên pêşketinê û xurtbûnê bêpar dimînin. Eger em muneqaşeyên "romanên baş" û "romanên xirab" bavêjin alîkî, em dibînin ku wek destpêk ceribandinên romannivîsê kêm bin jî, hejmara romanên ku bi kurdî tên nivisîn bi şermî be jî, roj bi roj zêdetir dibin. Di vî warî de çend nivîskarên kurdên "Sovyet" wek Erebê Şemo, Heciyê Cindî, Eliyê Evdilrehman, Seyîdê Îbo, Egîtê Xudo wek roman çend berhem pêşkêşî xwendevanan kirine. Ji der vê, nivşê li dervayî welat jî çend ceribandinên mayîn hatin weşandin, wek romanên Bavê Nazê, Mahmud Baksî, Nurî Şemdîn, Mehmet Uzun, Şahînê Sorekî, Hesenê Metê... Eger em romanên ku li Kurdistana Iraq, Îran û Sûriyê hatine weşandin jî, li ser van romanan zêde bikin, hejmara wan ji niha ve bîstî derbas dibe.

Ji ber van "statîstîkan" mirov nikare bêje ku romana kurdî tune ye. Ji aliyê din çawa em dibînin milletekî wek kurdan ku ji bîst mîlyonan zêdetir e, jê re bîst roman dikevin. Dema mirov vê tabloya reş dide ber çavan, baweriya "romana kurdî tuneye" xwe dispêre kîjan dîwarî, mirov vê yekê jî baş dibîne. Mirov vê carê gelek dilsar, bînteng û qudumreş dibe. Ne tenê baweriya "romana kurdî tuneye", baweriya qet tiştekî me tune ye, bi vî tehrî ji xwe re starekê dibîne.

Rast e, gelek tiştên me tune ne. Xwendevan, rexne, teşvîk û adetên xelatdayînê û gelek tiştên mayîn jî di nav me de tune ne. Kurd hela hê kulikekî bidin ser tîpa "U" û tîpa "I" an na, bi salan vê yekê munaqeşe dikin, rewşa me ev e, ya baştir mirov vî kulikî bide serê xwe, rûnê û bifikire. Ji ber ku alfabeyeke ku milletek li ser li hev bike, tune be, wê demê mirov têdigihê ku em ne tenê ji romana kurdî, hê ji gelek tiştan bêpar in. Ev e rewşa romanê û rewşa me kurdan.

HESENÊ METÊ:
"EDEBIYATA KURDÎ XWE SERAST NEKIRIYE"

Nûdem: *Tê gotin ku çîroka kurdî ya nûjen cara pêşî di destpêka salên nozdehan de hatiye nivîsandin. Çîroka kurdî îro di çi merhelê de ye?*

Hesenê Metê: Kî çi dibêje bila bibêje. Zêde ne girîng e ku bi kurmancî çîroka pêşîn di kîjan dem û sedsalê de hatiye nivîsandin. Bêguman weke dîrokî mana xwe heye, lê wisa diyar e ku mîna hemû beşên edebiyatê vê çîroka pêşîn jî cî negirtiye, rûneniştiye. Ez ne serbilindê vê yekê me ku çîroka kurdî nod û çar sal beriya nuha hatiye nivisandin, lê ez hêvîşikestî dibim ku piştî van nod û çar salên xwe jî vê çîroka kurdî ciyê xwe ne girtiye. Û di rewşa îro de bi qasî ku ez dibînim, çîroka kurdî di merheleyeke serxew de ye. Mîna teralê ku nû ji xew rabûye û hîn ruyê xwe jî ne şûştiye. Ne tenê ji bo çîroka kurdî, ez ji bo edebiyata kurdî jî dibêjim.

– *Wekhevî û cudayiyên roman û çîrokê çi ne? Kîjan karakter wan ji hev vediqetîne?*

– Wekheviya roman û çîroka tradisyonel ew e ku ev herdu babet jî prosa ne, ev herdu babet jî kêm zêde bi hev re derketine qada lîteraturê, ev herdu babet jî bûyerekê vedijîne û lehengên bûyerê bi cî û wext dike.

Ku em werin ser cudayiya roman û çîrokê, di vî warî de jî heta îro gelek tişt hatine gotin. Lê cudayiyeke berbiçav ne diyar e û li ser vê yekê li hev jî nekirine. Li ser karekterê çîrokê weke karekterê bingehîn: Kurtbûyîna çîrokê ye, dibêjin. Lê ez ne bawer im ku ev jî cudayiyeke rastîn be. Ji ber ku çîrokên bi qasî dirêjayiya romanekê jî he-

ne û hatine nivisîn.

Lê tiştekî din heye: Tradisyona romanê daye xuyakirin ku romaneke bi qasî du rûpelan kurt nehatiye nivisîn. Lê çîrokeke bi qasî sed û bîst rûpelan dirêj û zêdetir jî hatiye nivisîn. Bi kurtî tiştê ku ez ê bibêjim, mijar, hûnandin, heta derekê forma çîrok û romanê dikane weke hev bibe. Dirêjayiya çîrokê jî dikane bi qasî romaneke piçûk berfere bibe, lê... lê heta nuha romanek bi qasî çîrokekê kurt nebûye. Ez dibêjim cudayî ev e û çîrok zelalê romanê ye.

– Rewşa romana kurdî îro çawa ye? Di pîvanên romana navnetewî de meriv dikane behsa romana kurdî bike?

– Kêm zêde romana kurdî jî di rewşa çîroka kurdî de ye. Ne tenê çîrok û romana kurdî, ez dikanim bibêjim edebiyata kurdî xwe serast nekiriye. Karekterên edebiyatê ne karekterên bi serê xwe ne. Bi gotineke din edebiyat karekterên xwe ji ziman û kultureke, ji dezgeh û akedemiyekê, ji perwerdeyiya xelkê werdigire.

Ciwamêr an jî ciwanikek li mala xwe rûdine, bi tena serê xwe tiştina li hev siwar dike, bi navê romanekê dide çapê û herweha ew berhem belav dibe. Lê dema ku zanistî û otorîta zimanekî tunebin, akademiyên ziman û edebiyatê tunebin, rexnegir û maqûlên vî karî tunebin, xwendevan û baleke pêwîst tunebin... meriv ê behsa kîjan edebiyat û kîjan romanê bike! Ez dibêjim, ji bo me hîn gelekî zû ye ku em behsa van tiştan bikin. Ji ber ku bi awayekî pêwîst tradisyoneke me û danûsitendina edebiyateke niviskî pêk nehatiye.

Em vegerin ser romanên xwe. Min berhemên hêja bi kurdî jî xwendine. Lezeta roman û novelên ku min ji pênûsên biyanî girtiye, di berhemên kurdî de jî ez rastî wan lezetan hatime. Lê mixabin, hebûna niviskarekî û romaneke bi vê lezetê ji bo min têr nake ku ez behsa romana kurdî bikim û bidim ber romanên navnetewî.

– Rexne çi ye? Karên rexnegirên edebiyatê çi ne?

– Ez baş nizanim bê rexne çi ye. Lê ez baş dizanim bê çi ne rexne

ye. Serqisê: Rexne ne ew tişt e ku meriv piştî xwendina sê romanan dest bi rexna romana çaran bike. (Ez ne bawer im ku Xwedê ew jîrî dabe evdekî xwe î dunyayî.) Rexne ne ew tişt e ku meriv rika xwe li niviskarekî girêde û bibêje ewko ne realîst e, derewan dike. Rexne ne ew tişt e ku rexnegir ji ber şerm bike... ji ber şerm bike û bi navên veşartî li ser pirtûk û nivîskaran tiştina bibêje. An jî bi awayekî bêmane pesnê nivîskaran bide û bêsedem wan rakin ezmanê heftan.

Bi qasî ku ez dizanim rexne tiştekî mîna neynikê ye. Neynikek wisa ye ku nivîskar dikane li pêş bisekine, xêr û gunehê xwe di wir de bibîne, bipîve û dûre xwe serast bike... Lê mixabin... di roja îroyîn de me neynikên weha tunene. Heta nuha bi navê van neynikan çend şûşên derizî derketine û di wan şûşan de nivîskaran xwe nedîtine, xwendevan veciniqî ne.

Dema ku rexnegirekî xwediyê fonksiyona xwe hebe, ew ê bi karên xwe jî bizane. Ne pêwîst e ji min an jî ji yekî weke min bibîhize ka karên wan çi ne.

– Di avakirina edebiyata kurdî de tunebûna rexnegiran çi tesîrên neyînî dikin?

– Ji bo nivîskar alîkariyek çênabe ku başî an jî çewtiyên xwe bibîne û xwe serast bike.

Ji bo xwendevan alîkariyek çênabe ku ji valayî û veşartiyên berhemê haydar bibe.

Ji bo çêbûna edebiyatekeke kurdî bextreşiyeke bêyom e. Dema ku rewş ev be pêşketina edebiyatê jî êdî xwe disipêre nivîskar. Nivîskar û bextê xwe, nivîskar û hunera xwe, nivîskar û zanebûna xwe...

– Ji bo pêşdexistina edebiyata kurdî rola wergerê çi ye?

– Gotineke mamoste Celîlê Celîl heye. Dema ku peyv tê ser wergerê hertim ev gotina wî tê bîra min. Digot:" Kubariya her miletekî ye ku Shakespeare bi zimanê wî hebe" . Beriya hertiştî werger: kubariya zimanê kurdî ye, pêşxistina edebiyata kurdî ye, dewlemendi-

ya ferhenga kurdî ye. Ziman tê dapejinandin, ziman li bêjingên zimanê biyanî dikeve, bi wan zimanan re dikeve qayişê û di edebiyata biyanî de dibe xwedîpar, peyvikên jibîrbûyî an jî nû têne peydakirin... ev hemû tiştên ha bi rola wergerê dibe...

Nûdem, No: 10, 1994

MAHMÛD BAKSÎ:
"HER STRANEKE KURDÎ ROMANEK E"

Nûdem: *Tu dikarî bi kurtî behsa romana kurdî û rewşa ziman û edebiyata kurdî biki?*

Mahmût Baksî: Romana kurdî ji hebûna Memê Alan û vir ve heye. Ger îro romana kurdî bi pêş neketibe, zexelî ne zexeliya romana kurdî ye, zexelî ya nivîskarên kurd e. Yanî keçik heye, lê kesî neçûye ew nexwestiye, kes nêzîkî keçikê nebûye; keçik di mala bavê xwe de pîr bûye, bê mêr maye. Di keçikaniya xwe de xelkê xerîb dest avêtiyê, xelkê ew ji xwe re biriye.

Romana kurdî jî wilo ye, xelkê xerîb ji xwe re biriye, ji xwe re kiriye mal. Yanî divê em sûc nexin stûyê romana kurdî. Her straneke kurdî romanek e. Lê mixabin, em li folklora xwe, li zimanê xwe xwedî demeketine. Me ji ziman û edebiyata xelkê re xizmet kiriye. Me fedekariyên mezin ji bo ziman, folklor û kultura xerîban kiriye. Loma zimanê kurdî jî îro tola xwe ji me hiltîne. Dibêje, binêr, hûn li min xwedî demeketin, ez jî li we xwedî demakevim. Rewşa ku îro em tê de ne, ew tolstandina zimanê kurdî ye.

Niha têtе gotin ku li Tirkiyê zimanê kurdî qedexe ye, ji ber vê yekê me nikarîbû bi zimanê kurdî binivîsanda. Ez ne di wê baweriyê de me. Çunkî li Tirkiyê sosyalîzm û komunîzm jî qedexe bû û di gel ku me dizanîbû qedexe ye û li gor madeyên 141-142 ku heft sal û nîv ceza wê hebû, lê ji bo zimanê kurdî mirov tenê du salan ceze dixwar. Ger te pirtûkek bi kurdî binivîsanda, cezayê wê du sal bûn, lê ger te meqaleyek an jî pirtûkek li ser sosyalîzm û komunîzmê binivîsanda, heft sal û nîv cezayê wê hebû. Me radibû ji bo komunîz-

mê heft sal û nîv dida ber çavan, lê em ji du salan direviyan.

Ya dudan jî digotin û dibêjin nivîsandina bi kurdî zehmet e, em nikarin fêr bibin.

Ev jî ne rast e, mirov dikare di hefteyekê de, nebû di mehekê de fêrî nivîsandina bi kurdî bibe, lê mirov nikare di sê salan de fêrî Kapîtala Marx bibe.

Wilo, me ê biçûya li ku derê çi pirtûkek zehmet bi zimanê xelkê hebûya, peyda bikira; girtin, zîndan û îşkence bida ber çavan, lê em li zimanê xwe hûr nedibûn, digel ku me dizanîbû ew li ber mirinê ye, me guh nedidayê.

Baş bû ku em derketin derve. Me li welatekî mîna Swêdê xwe nas kir, şexsiyet û nivîskarên kurd bêhna xwe berdan, tirsa wan ji partî û rêkxistinan neman, ew êdî ne bi serê siyasetên xwe, lê bi serê xwe fikirîn û berhemên hêja afirandin.

Swêdê jî qîmet da vî karî, sazgehên wê bersiva pirsên aborî dan û îro zimanê kurdî roj bi roj geş dibe.

Nûdem, No: 10, 1994

MEHMED UZUN: "ROMAN HUNERA CIVATÊN PÊŞKETÎ Û MODERN E"

Nûdem: *Pirsa yekemîn ez dixwazim em ji ronesansê dest pê bikin. Di van demên dawî de terma "ronesans" gelekî di nava kurdan de tê bikaranîn. Di ziman û edebiyata kurdî de behsa ronesansê tê kirin. Tu dikarî ronesansê şirove bikî? Di dema ronesansê de çi guhertin di huner û edebiyatê de çêbûne? Ronesansa ku kurd behs dikin çi ye?*

Mehmed Uuzun: Em ji ku dest bi vê pirsa gelekî zehmet bikin? Ji ronesansê, tarîx û tevgera ronesansê? Yan ji rewşa aloz, kambax û tevlihev a kurdan? Heye ku ya herî baş destpêkeke basîd e. Hin rastiyên kurdan ên basîd û berbiçav hene; kurd jihevketî ne, welatê kurdan perçe ye, ferq û nakokî di navbera navçe, dever, cîh, eşîr, malbat û hêzên siyasî yên kurdan de bêhejmar in. Loma jî di tu meseleyî de, tu carî, yekitîyeke xurt a kurdan nehatiye pê. Loma tiştên ku em li ser rewşê û celebên pêşketinê bibêjin, tu carî, ji bo hemû Kurdistanê, derbas nabe. Heye ku ew ji bo hin mintiqeyan rast bin, lê ne ji bo hemû welêt. Ev rastiyek ji rastiyên basîd (lê nexweş) ên kurdî ye. Em bên ser ronesansê...

Ronesans? Ronesansa ziman û edebiyata kurdî? Ronesans ku gotineke latînî ye, "mot a mot" zayîn û vejîn e. Nûkirin û ji nû ve avakirin e. Ronesansa ku di qirnên 15-16-an de, li Îtaliyayê hate pê û pê re li hemû Ewrûpayê belav bû, meriv dikare bibêje, ev tişt kir; cîhanê ji dewr û dewranên kevn qulipand ser dewr û dewranên nû. Bi her awayî, di her aliyê jiyanê de. Wê rûpeleke kevn a tarîxî girt û yeka nû vekir, riyên nû pêşkeşî însaniyetê kir, cîhan bi pêş de, ber bi

serfiraziyê bir. Cîhana kevn ji eşîr, mal, malbat, mîrekî, bajar û navçeyên biçûk hatibû pê. Dewletên neteweyî (nasyonal) nîn bûn. Axa, beg, mîr û serekên dînî di wê cîhana kevnde hespê xwe taw didan. Cîhan, ya wan bû. Ronesansê ev yeka hanê, ji binî, guhert. Wê civat guhert, ziman guhert, rabûn û rûniştin, edet û ûsila civatê guhert, çand û hunera civatê guhert, heş û bîrê civatê guhert, hîs û nêrînên merivan guhert, pêwendiya serdestî û bindestiyê guhert. Ronesans têkoşîneke piralî û bêhempa bû, -li hember cîhana kevn. Voltaire di kitaba xwe "Essai sur les moeurs et l'esprit des nations" (Ceribadin li ser edet û ruhê neteweyan) de behsa vê guhertinê dike. Di cîhana kevn de însan ne azad bû, ew bi gelek celeb qeydan hatibû girêdan. Însan, mîna şexş û kes, nîn bû, ew mensûbê cîhekî, tiştekî bû. Ronesansê însan kir însan, însan kir şexs û kes (indiviud). Kitab û ansîklopediyên li ser ronesansê weha dibêjin; peydakirin û pêkanîna kesahî û şexsiyeta meriv, bi serê xwe, şoreşeke bêhempa bû. Makyaveli ku bi kitaba xwe "Mîr" bû ramangirê siyaseta gerandina karên dewleta nû, teoriyên xwe li ser ev kes û şexsiyeta nû ava kir. Rêber û pêşewayên heyama ronesansê, mîna Columbus, Copernicus, Luther, Kalvîn, Rabelais, Montaigne, Shakespeare, Cervantes û hwd. hîmên bingehîn ên cîhana ku li ser pişta kes û şexsan e, lêkirin. Bê guman bi hezaran zehmetî. Bê guman tevî muxalefeteke çavsor û dijwar a hêz, quwet û berdevkên cîhana kevn a rizyayî. Hingî? Hingî, meriv dikare bibêje, ku ronesans şoreşeke guhertinan bû. Wê zikê eva tarî a avis qelaşt û şoreşeke bêrawest anî pê.

Esas û qayideyên vê şoreşê gelek in. Lê me, li vir, ew hemû navên, ji bo bersîva pirsa we, bi tenê yek, dido divên; humanîsm , kitab û lixwevegerîn. Eger ronesans û tevgereke cîhanî û hemû cîhan, hêdî hêdî guhert, ev yeka bi saya humanîsmê û kitaban bû. Humanîsmê dinyaya civat û merivan pir firelı kir, civat û merivan ji qalibên eşîrî, malbatî, mîrekî, navçeyî, berberî û dijminahiya hundirî

rizgar kir. Humanîsmê cîhana bêser û bêdawî pêşkeşî meriva kir. Wê kirasê pir teng ê hesûdî, fesadî, dexesî, berberî ku ji nezanî, paştemayin û cehaletê dihatin pê, çirand û kiraseki nû yê "modernité" li civatê û merivan kir. Wê civata merivan û hemû cîhan nêzîkî hev kirin. Herçî kitab bû, ronahî reşand ser civatê, dinya biçûk kir, civat û merivan perwerde kir, rê li îlîm, çand, edebiyat û hunerê vekir; bîr, heş, hest, ziman û ruhiyeta meriv nû kir. Kitabê edebiyata cîhanê ji ser lêvan veguhest ser tîpan, edebiyateke nivîskî ya hemû civatê anî pê, qata zanîn û bîrbirinê bilind kir, pîvanên îlmî û muspet ava kirin... Û lixwevegerîn, lixwevegerîna ku ji bo kurda jî pir pêwist e; ronesans şoreş bû, nûbûn û nûkirin bû, lê li ser heyin û medeniyeta kevn a pozîtîv. Nivîskar, alîm û ronakbîrên ronesansê li reh û rêçên xwe jî hûr bûn da ku "merivê/a nû yê/ya ronahiyê" bînin pê. Zanîna ronesans û pêşketina tevger û heyama ronesansê ji bo kurdan û rewşa ku ew tê de ne, gelekî girîng e. Hem ya giştî hem jî ya her welatê taybetî. Mesela tevgera ronesansa Alemanyayê ku bala rêberê tevgera vejandina ziman û edebiyata kurdî Celadet Alî Bedir-Xan jî kişandiye, gelekî balkêş e. Alemanya ku ji mîrekiyên bûçûk dihate pê û ne xwediyê dewleteke neteweyî bû, bi xêra ronesansa alemanî, yekitiya xwe ava kir. Alemanan pêşî ji zimên dest pê kirin. Wan yekitiya zimên ava kirin, paşê yekitiya edebiyatê û bîr, şiûr û fikra neteweyî ava kirin û paşê jî yekitiya welatê xwe. Loma eger em bibêjin ku ronasans destpêka yekîtiya ziman, çand, welatan e, ez bawer im, ew ê ne şaş be.

Baş e, rewşa kurdan? Bi ya min, heye ku ez şaş bim, lê bi qasî ku ez dibînim, Kurdistan îro, bi awayekî giştî, di heyameke gelekî reş de ye. Tevgera çekdar li hersê perçên welêt, li perçê Turkiyê, Îran û Iraqê, xurt e. Bêguman, berxwedana gelê kurd pîroz e, rabûna gelê kurd li Turkiyê heyameke nû ye. Lê digel vê yekê, perçebûn, berberî, dijîtî, ji her carê, zêdetir e. Şer li perçê Turkiyê qata hişyarî û hest

û zanîna kurdî, gelekî bi pêş biriye. Îro kurd li piyan in, li pey mafên xwe ne. Lê li milê din, herwekî perçên Îran û Iraqê, îro, perçê Turkiyê jî kavil dibe, xelk ji ber zulm û zordariyê, koç dike, welat wêran dibe. Di rewşeke weha de ku gelekî zîz e û jê xwîn dirêje, behsa ronesansê kirin, hinekî ji rastiyê bi dûr e. Pêla bilind a hişyariya kurdî li Turkiyê gelekî pîvanên nû yên lebata civatê û bilîbûna şixulên edebî, çandî, hunerî anîne pê. Ji bo vejandina jiyana kurdî, bi hezaran xort û keçên kurd bedenên xwe yên tezebişkovî gorbehîşt kirine. Li Turkiyê rojnameyeke kurdî ya hefteyî "Welat" û hin rojname û kovarên kurdî/tirkî derketine, weşanxanên kurdî hin kitabên kurdî weşandine, hin dezgehên çandî yên kurdî jî ava bûne. Ev hemû gavên hêja, baş û nû ne. Lê li milê din zimanê kurdî, bi leza birûskê, dihele û winda dibe. Edet û ûsilên kurdî, edebiyata devkî a kurdî, tarîx û medeniyeta kurdî, ji ber van pêşketinên dawî yên teknîkî, winda dibin. Civata kurdî û piraniya tevgera kurdî, îro, bi zimanê tirkî, xwe îfade dike. Hejmara nivîskarên ku bi kurdî dinivîsin, bi tiliyên destan tên hijmartin. Hejmara kitaban pir û pir kêm e. Meriv nikare bibêje ku jiyaneke felsefî, îlmî, hunerî û ronakbîrî ya kurdî hatiye pê.

Herçî derveyî welêt û Ewrûpa ye, meriv dikare bibêje, tevgera çandî, edebî, hunerî û zimên a kurdî, kêm-zêde bi tenê li Swêdê hinekî xurt e. Lê li Swêde jî, hejmara kitabên ku di salekê de derdikevin, hemû bi hev re, nagihên sedî. Rast e, di warê standardîzasyona zimanê kurdî de hin gav hatine avêtin, navên nû yên edebiyata kurdî derketine; roman, kurte-çîrokên modern, şano û kitabên çeşnên nû yên edebiyatê weşiyane, hin kovar û rojname çap bûne, klasîkên kurdî qulipîne ser tîpên latînî, folklora kurdî heta radeyekê hatiye nivîsîn. Lê ka humanîsm, ka civat û jiyana kurdî ya kitaban, ka yekîtî û hevkariya civat û însanê kurd, ka kûrahiya tevgerên îlmî yên kurdî, ka tevgera vejandina reh û rêçên kurdî? Ka seferberiyên xwendin

û nivisîna zimanê kurdî?.. Ev pêşketin, kar û şixulên hêja ku min li jorê qal kirin, têra tevgereke ronesansa kurdî nakin Heye ku ev, di rojên pêş de, bibin tovê (embriyon) ronesansa kurdî. Lê ne îro. Hevalên ku îro ji ronesanseke kurdî behs dikin, ji realîtê bêtir, behsa daxwazekê dikin, ew daxwazekê tînin zimên. Roja ku zimanê tevgera ronakbîrî bû kurdî, yekitiya ziman û edebiyata kurdî hate pê, hejmara kitabên kurdî gihîşte deh hezaran, hejmara nivîskar, zane û ronakbîrên kurdan gihîşte hezaran, kitabxanên kurdî ava bûn, akademî, enstîtu û yekitiyên îlmî, çandî, edebî yên hemû netewayê kurd hatin pê, wê rojê, belê wê rojê, em ê behsa ronesansa geş a kurdî, ronesansa ku îro pir pêwist e, bikin...

– *Di şaxê edebiyatê de hunera romanê ne zûde ye, nû ye. Don Qujote a Cervantes ji romana pêşî têtе hesibandin, ev jî bi kultura burjûvazî û civaka kapîtalîzmê ve tê girêdan. Gelo ji bo çi roman berhemeke civaka kapîtalîzmê ye? Sedemên wê yên dîrokî û civakî çi ne?*

– Di warê hunera romanê de, mîna destpêk, kitabên tarîxa edebiyata cîhanê navê 5 nivîskaran hildidin; Cervantes (Îspanya), Grimmelshausen (Alemanya) Defoe û Swîft (Engilistan) û Le Sage (Franse). Gelo van nivîskarên ku bûne nemir, çi kirine? Eger meriv pir bi kurtahî qal bike, wan ev tiştên nû di edebiyatê de anîne pê; şêweyên nû yên vegotinê ava kirine, jîn û ruhekî nû dane vegotinê, hîs, pejn, bîr û ruhiyeteke nû jenandine, risandine û hûnandine... Wan edebiyatên xwe yên neteweyî derxistine qateke bilind, lê herweha pîvanên nû jî dane edebiyata cîhanê, bi berhemên xwe, cîhan biçûktir kirine. Ew hem neteweyî hem jî navneteweyî bûne. Li ser riya ronesansa neteweyî û navneteweyî, wan ziman, edebiyat û şêweyên vegotina edebî nû kirine. Wan hîmên çeşneke nû ya edebî danîne roman...

Mîna her tiştî, edebiyat jî bi wext û heyaman ve girêdayî ye. Her wext û heyam awa û şêweyên xwe yên taybetî yên edebî tîne holê.

Her pêwendiyeke nû ya civakî, her guherîna şexs û şexsiyetê çeşnên xwe yên taybetî yên edebî tînin pê. Roman encameke riya ronî û dirêj a ronesansê, zaroka heyameke nû ya însaniyetê ye. Mîna ku hûn jî dibêjin, roman hunera nûjen a edebî ya heyama kapîtalîzmê ye. Ev nivîskarên ku min li jorê qal kirin, hêz û quweta xwe ya guherîn û nûkirina ziman, huner û vegotinê ji ku stendin? Naxwe wan hêz û quwetek, bîr û şiûrek, hîs û hesteke nû diviya da ku wan bikaribiya çeşn û hunereke nû ya edebî ava bikira? Wan ev tişt ji guherînên heyama xwe wergirtin. Ew dûrbîn û rêber bûn, li pêşiya civatê bûn. Hê di destpêka guherînan de, wan bîhn, tahm û rengên nû yê guherînan dîtin û berhemên xwe li gora wan ava kirin.

Ne hewce ye ku ez wan guherînan, li vir, bi dûr û dûrêjî binivîsim. Haya me hemûyan ji wan heye; cîhana feodalîzmê hildiweşiya, çîneke nû ya desthilat dihate pê, burjuwazî. Digel burzuwazî, cêwikê wê proleterya jî dihate pê. Çîn û komên din ên nû yên civatê dihatine pê. Hem burjuwazî hem çîn û komên nû, tevî tiştên din, hewcedarî şêweyên nû yên vegotinê bûn. Şêweyên welê ku bikaribûna guherînan salix bidana, ziman û ûslib nû bikirina, nûbûn û vejînê nîşan bidana, "merivê/a nû yê/a ronahiyê" taswîr bikirina, xwe bi gel, çîn û komên din ên civatê bigîhandina, lê di eynî wextê de, ji berhem û eserên heyamên kevn, ji şêwe û çeşnên vegotinê yên kevnar jî destkevtî bûna. Çi? Kîjan?

Roman...

Belê, roman, hunera romanê, celeba nû ya vegorinê, weha hate dinê. Romanê weha dest bi jiyana xwe ya dirêj, geş, balkêş û rengîn kir. Roman nû ye, nûyitî ye, lê ew li ser hîmên çeşnê kevnar rawesta ye. Roman vedibêje, lê ew agahiyên civakî, tarîxî, siyasî, çandî û edebî jî dide. Roman tevger, şoreş, guherîn û dewr û dewranên kevn/nû salix dide, lê ew li ruh û hestên şexs û kesan jî hûr dibe. Roman xwendevanan dibe cîhanên cîhê, lê armanc analîz û lêhûr-

bûna ruhiyeta xwendevan bi xwe ye. Roman şihîrî ye lê ne şihîr e; destanî ye, lê ne destan e; şanogerî ye, lê ne şano ye; çîrokî û efsanewî ye, lê ne çîrok û efsane ye; îlmî ye, lê ne îlm e, felsefî ye lê ne felsefe ye; psîkolojîk e, lê ne psîkolojî ye... Ne hewce ye ku meriv lîstê dirêj bike. Roman ev hemû tişt in, lê ne tiştek ji van e jî. Roman, roman e. Roman hunera civatên pêşketî û modern e, şêweyê vegotina merivên heyamên nû ye...

– Roman çawan ji destanê tê veqetandin? Ferqîyeta wan çi ye?

– Roman hunera heyama kes û şexsên nû ye, lê destan ya heyama kom û komikên kevnare ye. Roman ji aliyê şexs û kesekî tê nivisîn, lê destan avahiyeke civatê ye. Xwediyê romanê diyar e, lê yê destanê hemû civat e. Roman bi hizr, bîr, zanîn, ked û quwera şexsekî ava dibe, lê di destanê de keda hemû civatê û nifşên civatê heye. Roman encameke xebata şexsî ya nivîskarekî ye, lê destan encameke salan, sedsalan a lebata civatê ye. Roman, di destpêkê de, tê nivîsîn, lê destan tê gotin. Roman tê nivîsîn û karê wê xelas dibe, lê desta tê gotin û veguhestin û guhertin, ji nifşekî kevn ra nifşekî nû. Di romanê de her celeb şêweyên vegotinê hene, realîst ne realîst, çêkirî, neçêkirî, û hwd. lê destan, bi giştî, xwediyê şêweyekê ye; nerealîst û efsanewî. Deh, panzdeh, bîst, sîh, çil, sed şêwe û variyantên romaneke nivisî tune ne û nabin, lê yên destanê hene û dikarin hebin. Eger ne bi qesta rabûna karê hunerî û estetîkî be, kes nikare li romaneke nivîsî zêde bike û awayê xwe bidiyê, lê meriv dikare li destanekê zêde bike, bi gotin û ûsliba xwe bibêje, rengê xwe bidiyê. Roman vegotina hîs, pejn, deng, bîr, şiûr û hestan e, lê destan vegotina bûyer, pêwendî û qewimandinan e.

Lê bêguman, gelek roman hene ku bi şêweyê destanê hatine nivîsîn. Meriv nikare wan mîna destanê qebûl bike û bisinifîne. Ew, bi zanîn, bi ziman û ûsliba destanê, bi awa û şêweyên vegotina destanê, hatine nivîsîn. Lê kesê ku wa nivîsiye, diyar e, armanc û hedefên

wî diyar in. Eger ez hin mîsalan bidim, nivîskarên mîna Hermann Broch, Per Lagerkvist, I. B. Singer, Christa Wolf, Îtalo Calvino, Michel Tournier, Yaşar Kemal û hwd. jî ev celeb nivîskaran in. Ew di romanên xwe de destanan, ji nû ve vedijînin. Lê destanên wan, ji nû ve, ava bûne; ew roman in.

Kurd jî dikarin, bi rengên nû, destanên xwe vejînin. Destanên kurdî ku mîna lehiyekê diherikin, dikarin bibin kahniyeke bêpayan ya romana kurdî. Gel û netewayên din ên cîhanê destanên xwe vegustine ser çeşnên nû yên edebî. Îlyada û Odesa bûye kahniya, heye ku, bi hezaran romanan. Destanên latînî, cihû, file, çîrokên Încîl û Tewratê bûne bingehên hêja yên romana ewrupayî. Çima kurdên bi van metodan romanên xwe ava nekin? Kurdên ku ji herkesî bêtir hewcedarê romanan in, dikarin, bi alîkariya destanên mîna Memê Alan, Siyabend û Xecê, Zembîlfiroş, Cembeliyê Hekarê û Binevşa Narîn, Ker û Kulik û yên din, edebiyateke nûjen a gelekî xurt, di demeke kurt de ava bikin.

– Mîna ku roman di sedsalên 18 û 19'an de xurttir bû. Fransizan, rûsan, emerîkiyan gelek deha derxistine. Berhemên wan hê jî bi zewq têne xwendin, problemên ku wan anîne ziman hê jî aktuel in. Gelo teknolojî û îndustrîalîzma ku bi lez bi pêş dikeve, romanê qelstir, xwendevanên wê bi sînortir dike; an jî postmodernîzm, bikaranîna stîl û uslûb, tema û naveroka romanê êdî ji bo piraniyê ne balkêş e?

– Ev pirsiyara we, îro, pirsiyara cîhana rojava, welatên endustriyê û civatên xwende ye. Pirseke weha, bêşik, ji bo kurdan ku hê nû hunera romanê dinasin û ava dikin, xerîb e. Mîna civat, civata kurdî ne civateke pêşketî ya endustriyê ye û kurd jî, mîna civat, ne xwende ne, eger xwende bin jî ne yên hunera romanê. Loma pirsên weha ji bo kurdan gelekî luks in. Lê civatên rojava vê pirsê, îro, bi xurtî munaqeşe dike.

Berî niha bi du salan, Akademiya Swêdê konferanseke du rojî li

ser vê pirsê amade kiribû. Gelek nivîskar û şahîrên navdar ên cîhanê hatibûn wê konferansê. Roja duwemîn, gava dor hate şahîr û feylesofê navdar ê meksîkî Octavio Paz, mîna niha tê bîra min, wî di dereke gotara xwe de, weha got; "Heta ku ev cîhana kevnar li dora royê bizivire û însan û însaniyet bijîn, hera ku haletên însanî hebin, rewşên xweş û nexweş, rind û kirêt ên însanî hebin, hewcedarî bi gotin, vegotin, edebiyat û çeşnên edebî hebe. Ne roman xelas dibe, ne jî şihîr. Ji ber ku herdu jî neynika însan û însaniyetê ne. Însan jî her hewcedarê neynikan e..."

Kî çi dibê bila bibê, kahniya romanê nemiçiqiye. Ji bervajiyê, îro ji her carê bêtir roman diweşin. Xelk ji her carê bêtir dixwînin. Lê tiştek heye; civatên ewrûpa û welatên rojava, di nav van çend salên dawîn de, guherînine mezin ên tekuolojiyê tînin pê. Civat, ji nû ve, li gora van guherînan, bi rê dikevin. Bêguman e ku nivîskar û xwendevanên van civatan jî, li gora guherînan, xwe diguherînin, li celebên nû yên xwendin û nivisînê digerin, wan diceribînin, dixwazin di warê nivîsîn û xwendinê de heyamên nû ava bikin. Edebiyara cîhanê û hunera romanê dewrên weha gelek dîtine. Di her destpêka heyameke nû de, munaqeşe û guftûguh bûne, gelek caran hatiye gotin ku roman hew tê xwendin. Lê romanê hertim, bi kirasekî nû (geh bi kirasê modernîzmê, romantîzmê, geh bi yê naturalîzmê, realîzmê...) xwe daye xwendin û îspatkirin. Rast e, êdî kes îro mîna romana Tolstoy, romaneke bi çend hezar rûpelan nanivisîne, lê hejmara romannivîskarên îro, heye ku hezar car ji dema Tolstoy zêdetir be.

Bila kes meraq neke, çawan Dante, Shakespeare, Cervantes, Hugo, Goethe, Flaubert, Dostoyevski, Proust û hwd. do û îro nûjen bûn/in, herweha sibê roj jî ew ê ji nûjeniya xwe tu tiştî winda nekin û bên xwendin, -tevî nivîskarên heyamên nû-.

– *Di cîhaneke ku klasîzm, realîzm, naturalîzm, romantîzm û bi*

dehan îzmên din munaqeşe kiriye û jiyaye de, rewşa edebiyat û hunera kurdî çawa ye?

– Klasîzm, naturalîzm, romantîzm, realîzm û bi dehan îzmên din ku hûn qal dikin, ne ji bo kurdan e. Edebiyata kurdî, tu carî, heyamên edebî yên weha nejiyaye, tê re derbas nebûye. Ji destpêkê heta îro, edebiyata kurdî bûye edebiyata xweparastin û berxwedana bingehîn. Mîna her tiştê kurdî, ziman û edebiyata kurdî jî bûne hedefên xedar ên serdestên biyanî. Heye ku di dereca yekemîn de. Dijminên kurdan ku hertim hebûne, êrîşên gelekî xedar birine ser ziman û edebiyata kurdî. Di ser de, civata kurdî jî her girtî maye û pêwendiyên xwe yên eşîrî domandiye. Ji lewre, ne zimanê kurdî bi pêş ketiye, ne jî edebiyatê karibûye gavên nû bavêje û xwe bi heyamên nû yên edebî bigihîne. Gava meriv piçekî çavê xwe li edebiyata kurdî digerîne, meriv dibîne ku tema, daxwaz û armancên edebiyata kurdî her parastina ziman û huwiyeta kurdî bûye. Ji ber rewşa kambax a "konstant", nivîskarên kurdan fersend û îmkan nedîne ku pênûsa xwe di war, çêşn û şêweyên nû yên edebî de bi kar bînin. % 99'ê edebiyata kurdî ya nivîskî, bi teknîk û estetîkeke gelekî qels û sivik, li ser berxwedan, serîhildan, zulim, zordarî, hebûn û mayinê ye. Loma bi ya min, edebiyata kurdî edebiyata man û nemanê ye. Meriv nikare edebiyata kurdî bide ber edebiyatên din ên cîhanê. Şert û mercên ku edebiyata kurdî tê de ye, ji yên din gelekî cihê ye. Edebiyata kurdî ji îmkan, pêwendî, sazgeh, zanîn û perwerdeyî û bazarên edebiyatên din bêpar e.

Edebiyata kurdî, zaroka sêwî û stûxwar a edebiyata cîhanê ye.

Herçî rewşa îro ye, meriv nizane çi bibêje. Ez pirsa we li we vegerînim; hûn rewşa ziman û edebiyata kurdî çawan dibînin?.. Ez ne bawer im ku tu kes bikaribe bibêje ku rewşa ziman û edebiyata kurdî baş e. Eger yek bibêje jî, meriv divê pê bawer neke. Ew wê yekê, ji bo dilxweşiyê, dibêje. Bi baweriya min, li dinyayê tu edebiyat nîn

e ku mîna edebiyata kurdî di nav rewşeke zîz, nexweş û kambax de be. (Eger em welatên mîna Riwanda ku bi şerên eşîrî, bi sed hezaran meriv tê de hatine kuştin, li aliyekî bihêlin...) Em divê qebûl bikin ku civata kurdî (bi giştî) û ronakbîrên wê civatê, bi şûnde mane, di warê pêwendiyên navneteweyî de pir girtî ne û nikarin xwe bi leza wext û dewranê bigihînin. Ji ber rewşa ku kurd tê de dijîn, meriv nikare behsa jiyaneke xurt a edebî û ronakbîrî ya kurdî bike. Bêguman hin lebat hene, lê ev jiyana edebî û ronakbîrî pir û pir qels e. Hejmara nivîskarên kurd bi qasî tiliyên destan in, kovar û rojname pir kêm in û pir kêm belav dibin, kitab (her celeb) pir kêm diweşin. Kurd bi zimanê xwe pir kêm dixwînin. Pêwendiya ku di navbera ronakbîr, nivîskar, kovar û rojnameyan de hene, ne baş in...

Jixwe li welêt rewş li ber çavan e. Zordarî û dijminahiya dijminên gelê kurd bêhidûd e. Hema çi bigire li her aliyê welêt şer heye. Li cîhên ku tê de şer nîn e jî, bandûra şer hilawestiye. Di rewşeke weha de, meriv nikare jiyaneke edebî û ronakbîrî ava bike. Li derveyî welêt jî, kurd peregende û jihevketî ne. Problemên wan ên civakî, siyasî û kulturî bê hejmar in. Mixabin wan bi civatên ku tê de dijîn re, pêwendiyên baş û bikêr ava nekirine, bi xurtî neketine nav ziman, çand û edebiyatên din ên cîhanê. Ew îzole dijîn û ecizî û esebiyeta xerîbiyê û surgûnê her li ser wan e. Ev acizî û esebiyet tesîrê li ziman, uslib, pêwendî û berhemên wan dike. Gava meriv nikaribe xwe nû bike û bikeve nav ziman, çand, felsefe û edebiyatên nû û bi ava dewlemendî û tecrubên wan ku ji bo kurdan pir pêwist in, xwe bişo, hingê meriv li xwe û li yên xwe vedigere û ji bo ku bikaribe xwe biparêze û hebûna xwe nişan bide, wê ecizî û esebiyeta xwe, bê pîvan û bê payan, di serê der û dora xwe de, dibarîne. Loma dijîtî û berberiyên şexsî, siyasî, komeletî yên kurdan pir in. Kurd di nav derya dijîtiyan de dijîn. Di rewşeke weha de jî meriv nikare jiyaneke xweş û bikêr a edebî, felsefî û ronakbîrî ava bike. Û gava jiyaneke

weha jî neyê pê, bêguman, meriv nikare eser û berhem jî biafirîne. (Eger îro, carina, hin eser derdikevin, em divê ji bîr nekin ku ew bi hezar zehmetiyan diweşin.)

– Di romanê de bikaranîna zimên girîng e. Gelo bi zimanekî mîna kurdî ku bi sedsalan e nebûye zimanê nivîsandinê, avakirina romaneke modern ne zehmet e? Romana modern çi ye?

– Bê guman e ku her kar û şixulê nû yê ziman û edebiyata kurdî zehmet e. Heta meriv dikare bibêje, pir zehmet e. Ne romaneke modern, bi zimanê kurdî, nivîsîna romanekê bi xwe, bi serê xwe, karekî gelekî dijwar e. Nivîsîna şihîra nûjen jî zehmet e, şano jî zehmet e, ceribandi jî zehmet e. Zimanê kurdî, cîhana zimanê kurdî, bîhn, tahm û rengên zimanê kurdî ne yên îro û civata îro ne. Ew yên do û civata bihurî ne. Zimanê kurdî, ji ber sebebên nas, nikaribûye xwe bi heyamên nû bigihîne. Ev jî rastiyên basîd ên zimanê kurdî ne.

Lê belê, meriv divê çi bike?..

Bi qasî ku ez ji tecrubên xwe dizanim, rê li ber merivan ne zêde ne; ya meriv ê israr bike û bi kurdî binivîse, yan jî merivê zimanekî din ku ji kurdî gelekî pêşketûtir e, tercîh bike. Kîjan? Di hilbijartinê de gelek faktorên şexsî, exlaqî, siyasî, civakî, edebî, aborî û psîkolojîk hene. Piraniya kurdên Turkiyê, hema çi bigire, % 95'ên wan zimanê tirkî tercîh dikin. Çima ew weha dikin? Berî ku meriv rexneyên tûj li wan bigire û wan tawanbar bike, divê meriv li ser sebeban serê xwe biêşîne.

Eger em vegerin ser kesên ku zimanê kurdî hildibijêrin, berî her tiştî, meriv divê bibêje ku ew hem bi karekî gelekî hêja û giranbiha yê exleqî tadibin, lê di eynî wext de, ew Donkîşotiyeke bêpayan dikin. Bi zimanê kurdî nivîsîn, zimanê kurdî parastin û pêşxistin, berî her tiştî, ji bo ronakbîrên kurd, wezîfeyeke exleqî ye. Hez û evîna parastin û pêşxistina zimanê kurdî, hez û evîna însan û însaniyetê

ye. Lê digel pîroziya vî karî, jiber rewşa ku min li jorê qal kir, karekî Donkîşotî ye; ziman ne standard e, yekîtiya zimên çênebûye, hê ferheng, ansîklopedî, kitabên berdest ên bingehîn nîn in, dezgeh û mueseseyên neteweyî yên ziman û edebiyatê nîn in; civîn, civat û hevûdudîtinên neteweyî yên ziman û edebiyatê nayên pê, mîsalên nûjen ên nivîskî bi qasî tiliyên destan in...

Rewş weha ye, lê pirsiyar dîsan eynî ye; meriv divê çi bike?.. Eger meriv biryar daye ku rahêje pênûsê û bi zimanê kurdî binivîse, hingê rê yek e; nivîsîn, nivîsîn û nivîsîn... Herkesê ku bi kurdî binivîse, di destpêkê de û heta demeke dirêj, ê pergî zehmetiyên mezin were. Ev weha ye. Ji bo min jî weha ye, ji bo kesên din jî weha ye, ji bo bavê tevgera vejandina zimanê kurdî Celadet Alî Bedir-Xan jî weha bû. Heta destpêka salên 1930-î jî, C. A. Bedir-Xan nikarîbû nameyek bi kurdî binivîsanda. Lê bi saya nivîsîn, nivîsîn û dîsan nivîsînê, wî bîhn û nefeseke nû da zimanê kurdî.

Ez li ser xwe bibêjim, gava min dest bi nivisîna zimanê kurdî kir, tiştên ku min dinivîsîn, bêyî zimanê kurdî, bi her tiştî dişibiyan. Meriv dikarîbû ew bi her tiştî bi nav bikirina, lê ne mîna "nivîsarên zimanê kurdî..." Hûn nizanin ka rebenê zimanê kurdî ji destê min çi kişandiye, bi destê min çend caran qetl bûye! Çendîn car min zulim lê kiriye û nezanî û qelsiyên xwe xistine ser stûyê wî! Lê ez bawer im ku îro rewş gelekî cihê ye. Di destpêka salên 80-an de, gava min dil hebû, dest bi nivisîna romanekê bikira, hin heval û dostên min, bi dostî bala min kişandin û gotin, "ma tu dîn bûyî, ma meriv dikare bi zimanê kurdî tu romanan biafirîne? Çima tu bi swêdî yan jî bi tirkî nanivîsî? Tu dê bi van zimanan, bi hêsanî, miyeser bî..." Lê min, bi zimanê kurdî, dest bi nivîsîna romana xwe kir. Ji ber du sebeban;

Yek: Ji ber wê berpirsiyariya exleqî ku min qal kir û bi baweriya min divê hemû ronakbîrên kurd hîs bikin. Dido: Baweriya min bi

nivîsîna kurdî hebû. Ez pê bawer bûm ku meriv ê bikaribûya, bi zimanê kurdî, romanek ava bikira. Berî min, kesin din ev şixul bi ser xistibûn. Çima min ê nekira?

Îro jî ez di eynî baweriyê de me; meriv dikare, bi zimanê kurdî, romanan, heta romanên modern, binivîse. Îmkanên zimanê kurdî hene, avahî, vokabuler, rêziman, qayideyên nivisînê û xurtiya zimanê kurdî rê dide vê yekê. Meriv dikare edebiyateke bedew ava bike, bi her awayî xwe bi zimanê kurdî îfade bike, pê bixwîne û binîvîse. Lê bêguman, jê re wext, sebir, xebat, azîm, zanîn, lêger, temrîn û nivîsîn, nivîsîn û dîsan nivîsîn divê... Ji xwe eger weha nebe, eger nivîskar û ronakbîrên kurd nikaribin bi zimanê kurdî xwe îfade bikin, edebiyateke bedew bînin pê, roman, kurte-çîrok, piyes, şihîra nûjen, ceribandinan binivîsînin, hingê tu mana nivisîna kurdî namîne. Hingê zimanê kurdî dê ne zimanê civatê yê zînde, lê zimanekî mirî yê muzeyan be.

Helbet, barê nivîskar, zimanzan û ronakbîrê kurdan pir giran e. Li milekî ew divê ziman biparêzin û wî bi kar bînin, li milekî ew divê li xwe, li gencîneyên folklora kurdî vegerin û li dewlemendiyên zimanê kurdî ku îro ji bîr bûne, hûr bin û wan ji nû ve vejînin, di berhem û eserên xwe de bi kar bînin. Li milekî jî ew divê kirasekî nû yê modern li zimanê kurdî bikin, bîhn, tahm û rengên modern bidinê. Yanê ew divê zimanê kurdî biguhezînin roja îro, dema nû û bikin zimanê îro yê civat û her celeb tevgerê. Eger weha nebe û zimanê kurdî dernekeve qata zimanên cîran û yên din ên cîhanê, tu xelasiya zimanê kurdî nîn e. Ew ê winda be. Îro gelek netewe û gel bi vî karî mijûl in. Hinên wan li ser riya serketinê, hin jî binketinê ne. Welatên erebî yên Mixribê, îro, gelekî hewl didin ku zimanê erebî, di warê xweîfadekirina jiyana edebî, felsefî û ronakbîrî de derkeve qata zimanê fransizî û li hember zimanê fransizî, xweserîbûna merivê ereb nîşan bide. Gelek ji welatên Afrîka û Asya Dûr jî li

hember zimanên ewrûpî seferberiyeke neteweyî îlan kirine. Heye ku ev şer û xebata wan pûç û vala ye. Lê ew vî karî dikin. Çima kurd ê nekin?

– Problemên edebiyata kurdî yên bingehîn çi ne? Ji bo başkirin û geşkirina wê divê çi bêne kirin?

– Her cara ku pirseke weha ji min dibe, Platon û şikefta wî tê bîra min; di binê axê de şikeft heye. Deriyê şikeftê ronî ye û riyeke ronî ji ber devê şikeftê derbas dibe. Di şikeftê de merivin hene, dest, pî, pişt, stû û lingên wan bi zînciran hatine girêdan. Pişta wan ne bi dîwarê şieftê, ji bervajiyê, ber bi deriyê şikeftê ye. Ew deriyê şikeftê, rê û ronahiyê nabînin, çavên wan bi tenê dîwarên tahtên şikeftê dibînin. Ew nikarin serê xwe jî bizivirînin da ku derî û ronahiyê bibînin. Her û her ew di şikeftê de ne, haya wan ji derve nîn e. Meriv di riya ber devê derî re derbas dibin, ronahî siya wan li dîwarê şikeftê dixîne. Lê kesên şikeftê, bi tenê, siya meriva dibînin.

Rewşa kurdan jî, kêm-zêde weha ye; dest û piyê wan li qeydan ketine, bi qehîmî, ew bi hev re hatine girêdan, rûyê wan ji derî, rê û ronahiyê hatiye zivirîn, rê û ronahî li pey wan in. Ew bi tenê dîwar û siyên li ser dîwêr dibînin. Û di ser de jî, ew li hev nakin, ji hev hez nakin û bi dest û piyan li hev dixin, -dewsa ku alîkariya hevûdu bikin da ku ji wan qeyd û zincîran xwe rizgar bikin.

Problemên bingehîn ên civata kurdî û herweha yên edebiyata kurdî di nav vê tabloya kambax de veşartî ne. Problemên herî mezin tarîtî, nezanî, cehalet, berberî û bêgavî ne. Pêşî kurd divê dev ji berberiyên xwe yên bêmane û bêsebeb ku pirî caran ji nezaniyê tên holê, berdin. Ev berberî û dijîtî di her warî de, edebiyat jî tê de, hêz, quwet, daxwaz û besta kurdan dadixe nikta sifirê. Bi van probleman, ne mumkin e ku meriv bikaribe edebiyateke geş û bedew ava bike. Û ne mumkin e ku meriv xwe bi derî, riya ronî û tîrêjên ronahiyê bigihîne. Hin gavên pîroz tên avêtin, li vir, li wir, kesin,

komin hin tiştên hêja dikin û hin berhem û eser diafirînin. Ew li ber dilê min pir ezîz û bi qîmet in. Lê ew nikarin xwe li ber pêlên berberî û perçebûnê rabigirin.

Edebiyata kurdî, îro, hewcedarî germahî û samîmiyetê, biratî û dilsoziyê, zanîn û pisporiyê, rabûn û geşbûnê, hebûn û yekitiyê ye. Ji bo vê yekê jî kampanya û seferberiyên mezin û boş pêwist in. Karên weha jî ne karê şexs û kesan in; divê civat, hêz û quwetên civakî, siyasî û aborî bi karên weha rabin.

Em divê xwe bi mêjî, şêwe, ziman û ûslibên xebatê yên medenî bigihînin. Îdeolojî û siyasetên wan çi dibe bila bibe, lê yên medenî. Me dezgeh û mueseseyên medenî, xebat û lebatên medenî, hedef û armancên medenî divên.

Nûdem, No: 10, 1994

TEYRIKÊ ÇEMÊ XERZAN

Nûdem: *Bi fikira ku wê dema zaroktî û xortaniya Mahmûd Baksî ji bo xwendevanên me balkêş be, ez dixwazim gotinê bi-hînim ser wê demê. Jiyana te ya wê demê çawa bû? Gelo tu dikarî hinekî li ser wê demê bipeyvî?*

Mahmûd Baksî: Ez heta heft saliya xwe li gundekî Xerzan dimam. Weke pir zarokan, min jî ji sewalan(heywanan) hez dikir, nemaze ji cewrikan... Şeş heft cewrikên min hebûn. Min ji her tiştî bêtir ji wan hez dikir. Hema bibêje, min bi wan re dixwar, ez bi wan re radizam, di zaroktiya xwe de, gorî ku mezin dibêjin, ez zarokekî şûm bûm. Ez ne zarokekî mulahîm bûm. Pir caran min û zarokên gundiyan li hev dixist, me serê hevûdu dişikand. Ji ber ku kalikê min axayê gund bû, gelek caran zarokan newêrîbûn bela xwe li min bidana. Zarokên mezin ji tirsan xwe di bin min de davêtin erdê.Wan dikaribûn li min bixistana, lê li min nedixistin. Qaweta wan hebû, lê qaweta wan nedigihîşte min. Di heft saliya min de me gundê xwe terk kir, bavê min berê me da bajarê Bismilê. Bavê min dixwest em jî wek xalê xwe, kalikê xwe, bapîrê xwe feodal bimînin, di bin tesîra dîn de bimînin. Min di sala 1952'an de li Bismilê dest bi dibistanê kir. Cara pêşî, wê çaxê ez têgihîştim, ku zimanekî min yê taybetî heye. Li dibistanê kurdî qedexe bû. Rojên pêşî ez di sinifê de şaş û matmayî mam, min şok derbas kiribû. Ne mamosteya min ji min fêhm dikir, ne jî min ji wê fêhm dikir. Loma jî wê bi xetkêş û şîmaqan li min dixist. Min hezkirina xwe ya zimanê kurdî ji zilma wê girt. Min fêhm kiribû ku ez ne yek ji wan im. Paşê dîsan

me bar kir, em çûne Bîtlîsê. Min li wir dibistana destpêkê xelas kir. Piştî wê ez çûme Ergeniyê, dibistana mamostetiyê. Di sala 1963an de êdî ez xortekî nûgihîştî, 18-19 salî bûm. Min çavên xwe ne tenê li pirtûk û rojnameyan, lê herwisan min çavên xwe li keçikan jî digerand. Kêfa min gelekî ji Diyarbekirê û ji keçikên Diyarbekirê re dihat. Bîranînên Diyarbekirê li ba min zahf in. Digel wê germa Diyarbekirê ya dijwar, gava mirov li kuçe û kolanên wê çav li keçikekê diket û li hev dinêhêrt, ew germa wê bi carekê ve sar dibû, dilê mirov hênik dibû.

Di salên 63- 65'an de ne xêr û ne bi ahlen, me çû ji tirkan re leşkerî kir, li wir jî me têr lêdana xwe xwar. An wê bigotana, zimanê te ne baş e, an wê bigotana tîpa te ne wek tîpa me ye... Bi kurtebirî ez bi kude biçûma, bela min bi min re bû. Bela min jî zimanê min bû, zimanê min jî kurmanciya min bû... Piştî ku min leşkerî xelas kir, di sala 1966'an de li Batmanê rojnameyek derdiket. Ew rojname ji heftê carekê bi navê" Batman Gazetesî" derdiket. Cara pêşî min di quncika wê rojnameyê de nivîsî. Wê çaxê, bayê sosyalîzmê jî li ba me pêl dibû, min jî xwe jê nehişt û bûme sosyalîst. Êdî li derûdora me çiqas axa, beg û şêx hebûna, min ê tep û rep li dijî wan binivîsiya. Ew jî li gorî wê demê tiştekî mantiqî bû. Heger min wê demê li dijî pepûkên karkeran binivîsiya, wê kesî ji min re negota, bijî. Min bela xwe li yên herî qerase dida. Ez di sala 1968'an de li Batmanê bûm serekê TİPê(Partiya Karkerên Tirkiyeyê). Di eynî salê de jî ez bûm kandîdatê reîsê belediyê. Lê ji ber ku temenê min piçûk bû wan destûr nedan ku ez bibim reîsê belediyê. Paşê min berê xwe da Stenbolê.

Cara pêşî di sala 1969'an de romana min ya bi navê "Mezra Botan" li Stenbolê derket. Roman bi tirkî bû, lê li ser rewşa kurdan bû. Di salên 70'î de jî pirtûkeke min ya din derket. Ew pirtûka min li ser rewşenbîrekî tirk, bi navê" Şadî Alkiliç Davasi" derket. Gava

ew herdu pirtûkên min derketin, di derheqa min de ji 141-142 dadgeh vebû. Ji ber hevpeyvîna min ya bi Mihrî Belî re jî dîsan dadgeh vebû. Min di pir konferans û civînên xwe de doza kurdayetiyê dikir. Danûstandinên min bi DDKO'yê re pir xurt bû. Di navbera 1968-70'yî de ez di DÎSKê de sendîkayî bûm. Ji ber ku ez bi karkerên endamên DÎSKê re bi kurdî dipeyvîm, Kemal Turkler îfada min stand û ez ji kar avêtim. Ji aliyekî ve ez ji kar avêtim, ji aliyekî jî ve rîskeke mezin hebû ku wan ez tewqif bikirama. 26'ê tebaxa 1970'yî, min xwe bi paseporteke sixte, bi otomobîla hevalekî xwe avête Almanyayê. Ez yanzdeh mehên gurover li Almanyayê mam û ez di 25'ê gulana 71'ê hatime Swêdê. Ew roj e, ev roj e ew keçika delal ya Diyarbekirî, ku min pir jê hez dikir, li wir, di bin germa Diyarbekirê de ma, ez jî li vir ketime binê sifirê, yanî di bin serma Swêdê de mame.

– *Gelo ji derketina derveyî welêt wêdetir tu riyên din tune bûn? Te nikaribû nivîskariya xwe li welêt bidomanda?*

– Na, ji xwe ez hê di sala 68'an de ji welatê xwe hatibûm dûrxistin.

Ez li Stembolê bi cih bûbûm. Stembol ne welatê me ye. Li ba min ferqa Stembol û Atina, ferqa Stembol û Stockholmê tune ye. Yanî îmkanên min ku ez bikaribûma vegeriyama Batmanê, Sêrtê an jî Diyarbekirê bimama, bijiyama, tune bû. Baş bîne bîra xwe, ez di 1968'an de serokê TÎPê bûm, min xwe sosyalîst îlan kiriye, xelkê wê çaxê bi ayet û quranan newêrîbûn xwe nêzikê kesên sosyalîst bikirana, ya din jî çiqas kurdperestên wê demê hebûn, danûstandinên min bi wan hemûyan re hebû. Ji ber wê yekê ji çavên MÎTê jî hertim li min bûn û dixwestin min winda bikin.

Ya din jî romana min,"Mezra Botan" erê bi tirkî bû, lê hemû li ser kurdan bû. Vê yekê jî gelek bala Mîtê dikişand. Sê rê hebûn; an ez dê bihatama girtin, di girtîgehê de biriziyama, an ez ê ji aliyê

MÎTê ve bihatama kuştin, an jî min ê welatê xwe terk bikira. Min ev riya sisiyan ji xwe re hilbijart û ez derketim derveyî welêt, ez hatim Ewropayê. Ji aliyekî ve jî, derketina min ya Ewrûpayê gelekî baş bû. Bi rastî hewcedariya kurdan bi dîplomasî û naskirina Ewrûpayê heye.

– *Diyar e ew roj e ev roj e, tu venegeriyayî welêt...*

– Erê, ez venegeriyame...

– *Di civîn û civatan de, di şahî û dîlanan de, di sohbetan de, gava qala welêt, qala zozan û çiyayên welêt, qala xweşiya welêt dibe, tu axînên kûr ji dil dikişînî; di awirên te yên melûl de mirov hesret û hezkirina salan dibîne. Gelo tu çima riyekê nabînî û naçî vî welatê ku tu li wir ji dayikê bûyî û evqasî jê hez dikî?*

– Min digot ez ê di jiyana xwe de keçika Diyarbekirî, ya Fatih Paşayê ji bîr nekim. Min digot, heger ez bi wê keçikê re nezewicim û ez rojekê wê winda bikim, ez ê xwe bikujim. Ne gengaz e, ku ez bê wê bikaribim bijîm, piştî salekê du salan min ew keçik ji bîr kir. Ez wisan bawer im, ku wê jî niha ez ji bîr kirime. Piştî wê, min digot, xwedê neke bavê min bimire, diya min bimire, êdî jiyan ji min re namîne, ew ê jiyan li min bibe zîndan. Ne gengaz e ku ez bikaribim bê dêûbavê xwe jiyanekê bidomînin. Dê, lo! Naxwazim bijîm lo! Ew dayika ku mirov mezin kiriye. Ew dayika ku min di her şerd û şûrûdan, di her perîşanî û belengaziyê de, di ber pêsîra xwe de mezin kiriye. Di sala 1986'an de bav çû, di 1988'an de jî dê çû. Lê helbet mirov dêûbavê xwe ji bîr nake, ew tiştekî din, lê ez gihîştim wê baweriyê, ku evîna welêt di ser hemû evînan re ye. Ji ber vê yekê jî gava qala Kurdistanê dibe, ez axînên kûr dikişînim. Ji ber ku bîst û du sal in, ku ez nikarim herim welatê xwe. Lê ez dikarim vê bibêjim ku rojekê jî Kurdistanê ji bîr nakim Ez bawer nakim, ku ew înkanên Kurdistanê yên dilpak, ew zozan û çiyayên wê jî min bîr bikin. Yanî sax, an jî mirî, bivênevê ez ê rojekê vegerin wan diyaran.

– Ev demek dirêj e, ku tu li xerîbiyê yî, tu ji welatê xwe dûr î. Jiyana xerîbiyê carina mirovî dike dilê hin tiştan, hin adetên kevn yên mirov bi mirov dide jibîrkirin û mirov hînî hin tiştên nûh dike. Gelo tu di van salên xwe yên xerîbiyê de hînî çi bû û te çi ji çanda xwe ya neteweyî winda kir?

– Berî her tiştî hurmet û hîsên mirovayetî li ba min kêm bûn, qels bûn. Min li Kurdistanê gelekî ji mirovan hez dikir. Ew hîsên min li vir hebekî qels bûn, zeyif bûn. Ya diduyan, ji bo ku ez asîmîle nebim, winda nebim, ji bo ku tu car Kurdistan ji serê min û ji dilê min dernekeve, heta ji min hatiye ez weke kurmancekî jiyame. Piraniya Ewrûpiyan û hevalên min dibêjin;" malxerabo, ev bîst û du salên te ne ku tu li Ewrûpayê yî hîna jî mirov dibêje, qey tu niha ji çayxaneke Batmanê derketiye û hatiye". Ji ber ku ez ji jiyana xwe ya kurdî hez dikim. Ez ne bi wê niyeta ku ez bibim swêdî hatime Swêdê. Na, ez bi wê niyetê hatime, ku ez rojekê zûtir şerdên Kurdistanê bidime guhertin, bila para min jî tê de hebe û ez paşê vegerin welatê xwe. Lê vê yeka han dirêj ajot, dîsan jî ez ê her vegerim. Hê stranên min, çîrokên min, romanên min ji bo keç û xortên kurdan hene.

– Weke hin xwendevanên me jî pê dizanin û weke ku te jî niha gal kir, nivîskariya te digihîje dîrokeke kevn. Te di salên xwe yên xortaniyê de romanek bi tirkî, lê li ser kurdan nivîsî. Bîska din te hezkirina xwe ya makzimanî anî zimên. Gelo ji bo çi te romana xwe bi zimanê dayika xwe, bi kurdî nenevîsî? Sedem çi bû?

– Yek, sedem ew bû ku min nikaribû binivîsiya, ne ku min nikaribû, min nizanibû... Didu; di şerdên 1968'an de ez bawer im ku min binivîsiya jî dê tu çapxaneyekê nexwestana çap bikira. Sisê; min alfabeya kurdî nizanibû. Bêalfabe û bêgramatîk jî bi rastî zehmet e, ku mirov romanekê binivîsîne. Lê ez bi kurdî hizirî me û min ew bi tirkî nivîsiye.

– Wek tê dîtin ev salên te yên li biyanîstanê gelek bi ber û aktîf buhurî ne. Nivîskariya te li Swêdê xurtir û geştir bû, tu zû ketî nav civata swêdiyan, te welatê wan zû nas kir, te welatê xwe bi wan da naskirin te di kovar û rojnameyên wan de nivîsand, te bi zimanê wan pirtûk derxistin, nivîsên te di dibistanên wan de bûn dersên şagirtên wan. Çawa dibe, ku kurdek ji civatek ewqas paşmedayî were civateke weke Swêdê, ku yek ji civatên cihanê ya herî pêşketiye û di vê civata han de ewqas bilind bibe?

– Ez bawer dikim, ev meseleke baweriyê ye. Pir kes hene tên van welatê Ewrûpayê, dixine serê xwe, dibêjin, em ê bibin milyoner, dibin jî... Hinek hene, tên dibêjin, em ê bibin muhendîz, dibin jî... hinek hene, dibêjin em dê bibin doktok, dibin jî. Yê min jî gava ez hatime Swêdê, min got, çi dibe bila bibe, ez dê nivîskariya xwe bidomînin. Gava bi zimanê swêdiyan pirtûkên min derketin, di antolojiyên wan de nivîsên min derketin, min di rojnameyên wan de nivîsî, min tu caran nijada xwe înkar nekir. Min tu caran ji wan re negotiye, va ez êdî bûme swêdî, ez ne kurd im, min weke swêdî qebûl bikin. Ez vê ji bo çi dibêjim, li bakurê Kurdistanê, mixabin hin nivîskarên kurd ji ber ku bi tirkî nivîsîne û di nav civata tirkan de hatine naskirin, ew nijada xwe winda dikin. Yê min, min ev bêşerefiya ha li Swêdê nekir. Ez ta niha li Swêdê weke kurdekî xebitîme û min weke kurdekî xwe bi vê civata Swêdê daye qebûlkirin. Ji xwe swêdî jî ne weke tirkan bûn, wan ez bi nasnameya min ya kurdî qebûl kirim. Min li vê civata swêdiyan bi azadî nivîsiye.

– Mahmûd Baksî carinan bi pirhêliya xwe Hasse Alfredssonê swêdî tîne bîra min. Tu ne tenê nivîskar î, tu herweha derhêner, komedyen û stranbêj e jî. Carinan tu di şevên kurd û swêdiyan de spîkeriyê dikî, tu guhdar û temaşevanên ji ken lal dikî. Herweha tu bi stranên xwe û bi dengê xwe yê zîz jî mirov dajoyî kûraniya hesret û evîniyê. Niha jî tu amadekariya xwe di warê li darxistina radyoyeke kurdî

de dikî. Ji bo çi tu pêwîstiya vê pirhêliyê dibînî?

– Ya rastî heger spîkerên me hebûna, min ê spîkeriyê nekira. Derhênerên me hebûna, min ê derhênerî nekira. Stranbêjên me yên baş hebûna, min ê stranbêjî nekira. Lê ez çi bikim, ez dixwazim binivîsinim, aliyê din vala dimîne. Ez xwe davêjim yê din, yê din nîvco dimîne. Gava ez van karan heniyan bi hevre dikim, hemû jî nîvco dimînin. Romannivîskariya min nîvco dimîne, stranbêjiya min nîvco dimîne, ez ji birayê xwe re bibêjim, gava ez spîkeriyê dikim, henekan dikim, erê ez xelqê dikenînim, lê dilê min bi xwe ne şa ye. Ev karên ha divê hemû bi profesyonelî bêne kirin. Yê me jî heger dewleteke me hebûya, wê di van şaxan de mirovên me derketina û karên xwe bi jîrî bibirana serî. Ya din jî ev karekterên ku te qal kirin, hemû jî di nav gelê kurd de hene. Kurd ji stranan hez dikin, ji ken û qerfan hez dikin. Jiyana gelê kurd bi xwe şano ye. Heger mirov bala xwe bidiyê, kîjan kurd dibe bila bibe, xwarina wî, vexwarina wî, sonda wî, rabûn û rûniştina wî, çûyin û hatina wî bi xwe şano(tiyatro) ye. Ev yeka ha jî weke hemû kurdan ji bo min jî tabiî ye. Lê bi xêr ku Kurdistan çêbibe, wê çaxê kesek pênc- şeş karan bi hevre nake.

– *Wek piraniya xwedevanên me jî pê dizanin, ku tu bi sê zimaman dinivîsînî. Gava tu li Tirkiyê bû, te bi tirkî dinivîsî, piştî ku tu hatî Swêdê jî te dest bi nivîsîna swêdî û kurdî kir. Gelo te kîjan salê dest bi nivîsîna kurdî kir?*

— Gava ez di sala 1970'yî de hatim Berlînê, cara pêşî min pirtûkên kurdî dîtin, min alfabeya kurdî dît, min makaleyên ku bi zimanê kurdî hatibûne nivîsandin dîtin. Wê yeka han hîkariyeke mezin li min kir. Lê mixabin, ji bo ku ez hînî kurdî bibûma, wext girt. Ya diduyan, min nikarîbû doza kurdan bi kurdî bi swêdiyan bidim naskirin. Min xistibû serê xwe, min gotibû, ez ê pêşî du sê pirtûkan bi swêdî binivîsim, ji bo ku ez xwe bi swêdiyan bidim qebûlkirin,

paşê jî ez ê dest pê bikim û bi zimanê xwe binivîsînim, da ku ew alîkariya çapkirina pirtûkên min bikin. Wisan jî bû. Di 77'an de gava min pirtûka xwe ya bi navê "Ihsans Barn" bi swêdî nivîsand, swêdiyan gotin, ev pirtûkeke gelek baş e, gelo tu nikarî ji bo zarokên kurdan jî bi kurdî binivîsînî? Di dibistanên me de zarokên kurdan hene, lê bêpirtûk in. Ji aliyekî ve gelek kêfa min hat, ji aliyekî ve jî ez hebekî tirsiyam, ji ber ku ta wê demê min tu tişt bi kurdî nenivîsîbû. Ez hebekî hizirîm, paşê min ji wan re telefon kir, min got baş e, ez dê binivîsînim. Camêran mafê nivîsîna wê jî dane min. Ez jî rûniştim û min ew nivîsî. Min paşê ew nîşanî hin zimanzanên kurdan da, xwedê ji wan re razî be, alîkariya min kirin, zimanê min rast kirin. Ez serê te nehêşînim, pirtûka min ya pêşî "Zarokên Îhsan" û ya diduyan jî "Keça Kurd Zozan", pêşî bi swêdî û dû re jî bi kurdî derket. Di 1983'an de min romanek bi navê" Hêlîn" ji bo xortan nivîsî. Ew romana min jî pêşî bi swêdî derket, paşê jî di 1984an de bi kurdî derket. Weke tu dizanî, di 89an de jî romana min ya bi navê" Gundikê Don" bi kurdî derket. Ta niha çar pirtûkên min bi kurdî derketine.

– *Pirtûkên te yên ku pêşî bi kurdî derketine li ser zarokan bûn. Ji bo çi te hewcedariya nivîsîna li ser zarokan dît?*

– Du sedem hebûn. Yek jê pirtûkên zarokan li Swêdê dihatin xwendin, ya diduyan jî min xwest, ez jiyana zarokên kurdan bi swêdiyan bidime nasin. Sisê jî, ji bo ku zarokên kurdan di dibistanên swêdiyan de stûxwar nemînin, ew jî bibin xwedî pirtûk...

– *Pirtûka te ya dawî jî romaneke bi navê" Gundikê Dono" ye. Di vê romanê de mirov aboriya Kurdistanê ya civakî dibîne. Mirov bermayên feodalîzmê, hem jî peywendiyên sermiyandariyê(kapîtalîzmê) dibîne. Lê bi gotina te, te ev roman li ser kalikê xwe nivîsiye. Gelo mirov dikare bibêje, ku ev romana te perçeyek ji rewşa Kurdistanê ya aborî û siyasî ye?*

– Erê, rast e, Gundikê Dono navê gundekî ye, li ber qiraxa çemê Xerzan hatiye avakirin. Ew gundekî kevin e. Gundikê Dono niha jî bi mulkdariya xwe yê mala kalikê min Hecî Husên e. Min xwest ez di kesîtiya Hecî Husên de axa û gundiyên Kurdistanê bînim zimên. Ji aliyekî ve mirov dikare bibêje, ku Gundikê Dono strana Çemê Xerzan ya şahîdê dîroka Kurdistanê ye. Ji aliyê din ve jî min xwest ez nîşanî bidim, ku mirov dikare romanê bi zimanê kurd binivîsîne. Zimanê kurdî zimanekî xweş e, lîrîk e. Lê mixabin, neyarên gelê kurd nehiştine, ku em bi vî zimanê xwe yê xweş û delal binivîsînin, wî vejînin...

– Wek pirtûkên te yên berê, Gundikê Don jî li derveyî welêt derket, ew li derveyî welêt belav bû. Tu di hemû pirtûkên xwe de rewşa Kurdistanê, rewşa kurdan ya siyasî û civakî tînî zimên, tu ji bo çareserkirina problemên wan li riyekê digerî. Lê mixabin, gelê kurd, xwendevanên kurd li Kurdistanê ji xwendina van pirtûkên te bêpar in. Gelo tu xwestina te ku tu van pirtûkên xwe li welatê xwe çap bikî û wan di nav gelê xwe de belav bikî, tune ye?

– Weke tu dizanî, ta niha ne gengaz bû, ku ez bikaribim van pirtûkên xwe li welêt bidim çapkirin. Ji ber ku naverokên pirtûkên min hemû welatparêzî ne, ew kurd û Kurdistanê tînin zimên. Lê ez dixwazim tiştekî bibêjim ku bi rastî ez ji Gundikê Dono hesidîm. Gundikê Dono ji min mêrxastir derket, ew berî min çû welêt, ew niha li welêt çap dibe.

– Ez bawer im, wê Gundikê Dono te jî bikişîne welêt, tu jî niha amadekariya xwe û vegerê dikî. Piştî ewqas salên dirêj li derveyî welêt, tu dixwazî bi çi aawayî vegerî?

– Vêga programeke min ya ewqas berfireh tune ye.

– Berî niha bi kurtedemekê planên te yên li darxistina radyoyeke kurdî li Diyarbekirê hebû. Gelo tu hê jî tiştekî wilo dihizirî?

– Niha şerdên wê hemû hatine cih, makîne hatine kirîn, pere hatine dîtin. Roja ku firsenda dahîna radyoyê li Diyarbekirê têkeve destên min, ez ê tavilê radyoya xwe deynim.

– Tu di derheqa pêşeroja edebiyata kurdî de çi dihizirî?

– Ez bawer im, ku edebiyata kurdî êdî kefenê xwe çirandiye. Ji ber ku ev heftê sal in, ku tirk bi şûr û mertalên xwe, bi derew û fesadiyên xwe, bi her îmkanên xwe êrîş hanîne ser zimanê kurdî, da ku zimanê kurdî bikujin, lê qeweta wan negihîştiye. Îro em dibînin, ku Mehmed Uzun çar pirtûk nivîsîne(M. Uzun di hevpeyvîna me de amade bû), te çar pirtûk nivîsîne, min nivîsîne. Êdî zimanê kurdî hew dimire.

– Wek çawa ku te jî qal kir, nivîskariya te ya bi kurdî li derveyî welêt dest pê kir. Herweha edebiyata kurdî bi tevayî li derveyî welêt û bi taybetî jî li Swêdê geş bû. Ev salek du sal in, ku hin îmkanên nivîsîna kurdî li welêt peyda bûye. Bi ya te berpirsiyariyên nivîskarên me yên derveyî welêt çi ne? Divê ew vegerin welatê xwe, di nav gelê xwe de cihê xwe bigirin, li wir binivîsînin, an jî ew her jiyana xwe ya biyanistanê berdewam bikin?

– Rast e, me li derveyî welêt nivîsîna kurdî geş kir, lê heger em bixwazin çîrok û romanên nemir biafirînin, divê em rojekê berî rojekê berê xwe bidin welêt. Em li welatê xwe, di nav gelê xwe de cihê xwe bigirin.

Bi ya min divê nivîskarên kurd bi kurdî binivîsînin. Didu; divê pêywendiyeke xurt di navbera wan de hebe. Sisê; divê ew pirtûkên hevûdu bixwînin. Çar; hergav ku nivîskarekî kurd pirtûkekê binivîsîne, divê berî ku ew çap bike, ew nîşanî çend nivîskarên kurd yên din bide. Em xwe nexapînin, ji ber ku ev heftê salên zimanê me ye ku nehatiye xebitandin, loma zimanê me li paş maye. Ji ber vê yekê

divê em ji xwe re nekin kompleks, her yek nebêje, ez ji yê din zanetir im. Ez dixwazim vê jî bibêjim, divê em nivîskarên kurd rahêjim pênûs û defterên xwe û em berê xwe bidin Kurdistana xwe. Êdî dem hatiye, divê em vegerin...

– *Em ê pirsa xwe ya dawî bi programa Mahmûd Baksî ya pêşerojê ve girê bidin. Gelo programa te ya pêşerojê çi ye?*

– Di bîst û du salan de şanzdeh pirtûkên min derketin. Êdî bi serê dê û bavan di tûrikê min de du rêz jî nema ne. Divê ez herim Kurdistanê dîsan tûrikê xwe tije bikim. Ez herim li ba Zibêrê Emihê rûnihêm, li ba Perîxanê rûnêm, herim ba Aso, herim ba yên din, neh deh tûrikan bi dev re tijî bikim û rûmihêm binivîsînim. Heta ez neçim Kurdistanê, ez wan nebînim, ez bawer nakim ku ez bikaribim tiştekî binivîsînim. Lê di programa min de ev heye; heger ez herim Kurdistanê, ez dixwazim çend salan rûnêm û li ser mala Eliyê Ûnis romanekê binivîsînim.

Ez dixwazim vê jî bibêjim; derketina Nûdemê çirûskek hêviyê da me, tîrêjên hêviyê bera nav civata me ya tarî da. Lê dil dixwest, ku ew bi hejmara xwe ya pêşî ve li welêt, li nav gelê xwe derketa. Ji ber ku mirov li nav gelê xwe bi rûmetir e, mirov bêtir bi qîmet e. Nûdem valahiyeke dîrokî dagirt, ez ji Nûdemê re ji dil pêşerojek rohnî daxwaz dikim û ew li gelê me pîroz be!

Nûdem, No: 2, 1992

HEVPEYVÎN BI OSMAN SEBRÎ RE

Ruknedîn taxek ji taxên Şamê ya herî bilind e, di quntara çiyê de ye. Wek çiyayekî Kurdistanê asê ye, bêdar û ber e; rût e, lê bi heybet e, ku navê Şamê ne lê biwa, ji rûniştevanên wê, mirov dê bigotaya Kurdistan e. Piraniya kurdên Şamê li wir bi cih bûne, li wir mal avakirine û li wir dijîn. Di dilê hemiyan de hêviya Kurdistaneke azad heye, û li wir kalek dijî; kalemêrekî bejinkurt, awirtûj, mêrxas û wek çiyayên Kurdistanê bi heybet... Kalemêrekî ku ji bo azadiya welatê xwe bi qasî qirsekî tiştek ji hêviya xwe winda nekiriye... Ez êvareke biharê li mala vî kalemêrî bûme mêhvan. Vî mêrxasê gotinxweş, nefsbiçûk, jêhatî û dinyadîtî carna bi gazin, carna jî bi hêrsbûn ji min re qala paşeroja xwe, dema borî û qala pêşeroja me kir. Ji bo ku ez gotûbêj û sohbeta vî welathezê mezin tenê ji xwe re nehêlim û bigihînim hevwelatiyên xwe jî, min jê pirsî û wî jî bersîvand:

Firat Cewerî: *Apê Osman, em dixwazin bizanibin ku te çawa dest bi nivîsa kurdî kir. We bi çi hawayî dixwest girêdana xwe bi kurd û Kurdistanê ve bikin?*

Osman Sebrî: Nivîsîn, rehma Xwedê lê be, Celadet xwest "Hawarê" derbixîne, min jî dest bi nivîsînê kir. Hevalekî bi navê Qedrîcan di hejmara pêşîn de ji min re tiştek nivîsîbû, di hejmara diduyan de min jî, jê re nivîsî. Wilo me dest bi nivîsê kir. Lê nivîsa ku min di Hawarê de nivîsî gelek kêm bû, Hawara ku bi alfabeya kevn derdiket... Hingî hebekî nexweşî ketibû navbera min û rehmetî Celadet. Wî bi nivîsên min dileyist. Ji ber vê yekê, ez jê xeyidîbûm û



Osman Sebrî û F. Cewerî



F. Cewerî, Osman Sebrî û Ezîz Akrewî

min hew tê de nivîsî.

Gava ku Hawara nûh dest bi weşanê kir, hingê çend camêr hebûn, em gihandin hev, xwest ku em dîsan bi hev re bixebitin û ez bi wan re xebitîm. Wê gavê min hebekî nivîsî.

– *Welo diyar e ku te li Şamê, an jî li Sûriyê dest bi nivîsê kiriye.*

– Erê, min li wê dest pê kir. Ma li welêt nivîsîna kurmancî hebû? Me nedizanî ku kurmancî têtе nivîsandin û neketibû serê me jî.

– *Tu di bin tesîra kê û çi de mayî?*

– Gava ku Celadet dest bi derxistina Hawarê kir, di dilê me hemûyan de kerameta nivîsê çêbû. Lê paşê Celadetî ji min re pirsek jî gotibû, ew baş ketibû serê min. Wî ji min re weha gotibû: "Ez dibînim çavên te li çîrokên şoreşê ye, lêxistinê... Em ferz bikin ku tu bi tenê bikaribî Kurdistanekê çêbikî. Lê ew Kurdistana ku mirovek çêbike, mirovek dikare xerab jî bike. Lê nivîsîn tu çi bikî ew ê ji xelkê re bimîne." Ev gotinên rehmetî di serê min de cih girtibûn û ez li ser zimên dixebitîm. Lê, li pêşiya me tiştek tune bû, destên me vala bûn. Di destên me de tiştên ku min berê bihîstibû; Dîwana Melayê Cizîrî û Mem û Zîna Ehmedî Xanî bû. Ji van pê ve ji kurmancî, me tiştek nebihîstibû. Ev jî tijî peyvên erebî ne, yanî ne kurmanciyeke xwerû ye. Zimanê kurdî nehatiye xebitandin, nehatiye xwendin. Ev jî bextê me yê reş e. Bav û kalên me gunehkariyeke mezin kirine ku bi zimanê xwe nexwendine. Di welatê me de ermenî hebûn, suryanî hebûn, hindik bûn, lê wan bi zimanê xwe dixwendin. Me bi zimanê tirkî û erebî dixwend. Ev hemû sûcê bav û kalên me ne, em hîn nekiribûn ku em bi zimanê xwe bixwînin. Heger rehmetî Celadet nebiwa, mumkun bû ku me bi xwe jî guh nedaya vî karê gitanbiha. Ji ber ku em ne xwediyê vê baweriyê bûn, ev bawerî ji wî derket, mala wî hezar car ava... û yê rê li ber min vekir û berê min da nivîsê dîsan ew bû. Yanî wî berê min dida xebatê, dil dida min û ez li pey dikişiyam. Belê...

– Tiştê ku tê zanîn, te hem helbest, hem jî nesir (prosa) nivîsiye, wek; li ser Napolyon, hin çîrokên lawiran, li ser hin eşîran... Bêtir kîjanê tu têr dikir, helbestê an nesrê?

– Ezbenî, biçûkî min gelekî ji şîrê hez dikir. Min sê- çar dîwanên şîiran ji ber kiribûn. Mem û Zîna Ehmedê Xanî, Dîwana Melayê Cizîrî û ji aliyê din ve jî, ji tirkî jî min sê-çar dîwan ji ber kiribûn. Kêfa min ji xwendinê re dihat. Îcar, ji ber vê yekê, dema ku min dest bi nivîsê kir, bi min re şîr derket. Tiştê pêşî ku min nivîsiye şîir e.

– Weke ku tu jî dizanî, em nivşên nûh hê jî li ser riya Hawarê diçin. Tu dikarî ji kerema xwe re bi kurtebirî qala dema Hawarê ya hewa edebî bikî?

– Destpêk, yanî her wekî destpêk bû, tiştekî hêja bû. Lê zimanê kurdî yê Hawarê bi tenê têr nake, divê em gelekî bixebitin. Îro ku Kurdistanek çêbibe, komeke zanistî bête danîn, divê ew kom her eşîrekê peyayekî xwe têxe nav, bi gundiyan re, bi jin û mêrên gundiyan re bide û bistîne û pirsên kurmancî ji wan hîn bibin. Yên berê zimanê me xerab kirine xwendayên kurdan bûn, îro jî dîsan xwenda zimên xerab dikin.

– Hewa edebî çawan bû, danûstandinên we nivîskarên Hawarê bi hev re çawan bû?

– Ezbenî pêşî bû. Ziman bi dewra mirovekî pêş de naçe, çend zik jê re dixwaze.

– Gava ku mirov dibêje "Hawar" çend nav têne bîra mirovî. Wek; Celadet Bedirxan, Osman Sebrî, Nûredîn Zaza, Cegerxwîn û Qedrîcan. Danûstandinên di nava van kesan de çawan bûn, we bi çi awayî alîkariya hevûdu dikir?

– Bi rastî danûstandinên me digel hev ne ewqas baş bûn, danûstandinên me ne xurt bûn.

– Sedem çi bû?

–Sedem bêaqiliya me bû. Di warê siyasî de em her yek bi awayekî difikirîn. Niha tu hinek nivîsarên min bibînî, tu ê bizanibî ku ez bi gelekî ji wan dûr im. Yanî hinek ji me weke berê difikirîn, hinekan ji me jî nedixwesrin ku wek berê bifikirin. Ev bû û zêdeyî vê jî ez bawer im ne durist e ku em tiştekî bipeyvin, ez naxwazim...

– *Çap û belavkirina Hawarê çawan bû, we alîkarî ji ku digirt?*

– Hawar pêşî bi alikariya xelkê derket. Paşê şer dest pê kir. Gava şer dest pê kir, hingî alîkarî bi Hawarê re jî kirin. Ronahî jî derket, lê Ronahî bêtir cih dida nûçeyên siyasî. Gengaz bû ku zêde pêş de biçûya; lê peyayên me tune bû, xelkê nedixwend. Kesên ku me ji wan re dişandin jî nedixwendin. Yanî mîna ku tu ji yekî re niviştekî çêbikî û têxî stûyê wî, ma ew ê wê niviştê bixwîne? Yê me jî wilo bû.

– *Alîkariya aborî ji ku dihat?*

– Alîkariya aborî hinek aborneyên me hebûn peyda (temîn) dikirin. Xwendayên me di Hawarê de bi şûn da bûn. Xelkê me negihîştibû, zimanê xwe hîn nedibûn. Ji ber vê yekê jî di warê aborî de me hebekî tengasî dikişand. Paşê kesên ku bikaribana binivîsiyana jî gelekî kêm bûn. Niha gava ku mirov Hawarê dixwîne, mirov dibîne ku nivîskarên wê gelekî kêm bûn.

– *Ew nivîsarên ku ji Hawarê re dihatin şandin, berî ku bihatana weşandin kesî ew di ber çav re derbas dikirin?*

– Na.

– *Kurdiya wan jî her weke xwe diman?*

– Belê, herkesî gorî xwe dinivîsî, bi nivîsên wan nedihate leyisrin.

– *Belavkirina Hawarê çawan dibû, ew bi tenê li Sûriyê dima, an sînor gav dikirin û digihîşte perçeyên Kurdistanê yên din jî?*

– Ez bawer im, ku çend nisxe digihîstine Îraqê, çend nisxe dihatin Bêrûdê û qamîşloyê û dawiya maye jî li vir, li Şamê diman, ne min got, xelkên ku digirtin jî nedixwendin. Ew hînî xwendina zarê

xwe nebûbûn û nedixwestin hîn jî bibin. Îro! Îro xwendayên me naxwazin hînî zimanê xwe bibin! Li vir ez belaş dersê didime wan. Tenê nezan tên dixwînin, lê yên zana nayên. Wan dixwestin ku ez ji jorê de dest pê bikim. Ji jorê de nabe. Ji jêrê de divê mirov dest pê bike. Ku mirov ji jêrê de dest pê bike, mirov ê bi pêş de biçe. Zimanê me nehatiye xwendin, nehatiye nivîsandin, pir gotinên kurdî hene ku me nebihîstine. Ez, hê jî yên ku tête ba min dersê dibînin, ji wan hînî gotinên kurdî dibim. Ew çend zimanê me bi şûn de maye. Ev jî ne gunehê me tenê ye, gunehê bav û kalên me ne. Îro, xwenedayên me yên ku xwe welatparêz dizanin, bi zimanê xwe naxwînin.

Niha ez dizanim mirovne hene li ser hin şaxan doktora xwe kirine, çar-pênc zimanên ewrûpî dizanin, lê bi zimanê xwe nizanin. Ev ji bo me gelekî şerm e, lê camêran(!) dikin. Pir tiştên giran kurdan kirine, ji bo vê yekê em bi şûn de mane. Em negihane warê ku em bikaribin neteweyên ku mafê me dixwin tirk in, ereb in, ecem in; lê xwendayên me berên xwe dane Amerîkayê, bi wê re diewitin. Amerîka pîs e, dewleteke koledar e, lê pîsitiya wê bi hindiktirî xelkê digihîje me. Yên ku pîsitiya xwe digihîje me ereb, ecem û tirk in. Çima em nikarin bibêjin ew pîs in? Hinek ji me bûne peyayên ereban, hinek bûne yên tirkan û hin jî yên eceman. Rewşa me wilo ye...

– *Baş e apo, em dîsan vegerin ser Hawarê. Gelo ronakbîrî di nava we nivîskarên Hawarê de çawan bû? Kesî ji we bi zimanên biyanî; mîna Îngilîzî, fransizî û almanî dizanibûn?*

– Yanî ji bo îro gava ku em bixwazin bipeyivin, di warekî teng de bû. Yên ku dixwestin binivîsin gelekî kêm bûn. Nûredîn Zaza bû, Cegerxwîn bû, ez bûm, Qedrîcan bû... Lê min seriyekî dirêj nenivîsî, ez û Celadet bi hev ketibûn. Paşê min dest pê kir û ez pê re meşiyam. Ronakbîr û ne ronakbîr, em ev kes bûn.

– *Haya we nivîskarên Hawarê ji edebiyata dinyayê hebû? Ji klasî-*

kên rûsî, fransî, almanî, emerîkî...

– Ezbenî, em di warê zimên de, gelekî bi şûn de bûn. Ziman nûh dest pê kiribû. Em nikarin îdîa bikin û bibêjin ku me tiştek ji edebiyatê fehm dikir, an me bi edebiyatê dizanibû. Yanî me gişkan nûh dest pê kiribû. Ez hêvîdar im ku ji îro şûn de xortên me bi zimanê xwe hîn bibin û edeba kurdî pêş de bibin.

– *Yanî haya we zêde ji edebiyata dinyayê çênedibû û we nedixwend?*

– Na, heger hebû jî me nedikarî bi kêrî zimanê xwe bihaniya. Min bi xwe edeba ereban xwendibû, ya tirkan xwendibû. Min sê-çar dîwanên wan ji ber kiribû. Lê vê yeka ha ez têr nedikirim, diviyabû em hê zêde bixebitiyana. Bîrê ku em tê de dimeşiyan jî, ji me re ne musahît bû. Em di bin destên xelkê de bûn. Gava ku mirovek 52 salî be 18 caran têkeve girtîgehê, dê çi tê de bimîne?

Ez 18 caran ketime girtîgehê. Carekê dadgêrekî ereb ji min re got: " Ev cara çendan e ku tu dikevî girtîgehê" Hinga min lê vegerand û got:" Ev cara min ya 17'an e." Di wê demê de ez tenê 17 caran hatibûm girtin. Dadgêrê ereb got:" Xwedê mala te wêran bike!". Hinga min lê vegerand û got: " Bila Xwedê mala we wêran bike lawo! Kîngî ez hatime, min li deriyên we xistiye, min gotiye mala min tune ye, cih bidine min? Hûn tên min digirin û davêjin girtîgehê û di ser de jî mala min wêran bibe! Bila mala we wêran bibe! Gava ku min ev gotin, mêrik keniya...

– *Di dema Hawarê de rewşa we ya siyasî çawan bû?*

– Dîsan wilo, wek niho bû; me li hev nedikir.

– *Ew nejihevûdurebûyina we tesîreke çawa li jiyana we ya edebî dikir?*

– Tabî dikir, ezbenî, aqilê me ne bi hevre bû. Yên ku beg û axa bûn jî aqilên wan ne bi hevre bûn û yên ku pale û gundî bûn jî aqilên wan ne bi hevre bûn. Em dûrî hevûdu bûn.

– Sedem çi bû, ji bo çi hûn dûrî hevûdu bûn?

– Sedema xwe ji bo ku em negihîştibûn. Çima xelkê kurd bi şûn de maye? Ma em ji ku hatine? Em ji Ewrûpayê hatine? Em jî, ji nav neteweya kurd derketine! Ez lawê axayekî bûm. Merheba axa(!) Ez di nava aqilê axan de rabûn. Paşê ku min pîsitiya wan dît, ez ji wan bi dûr ketim. Yên mane jî kurên axa û began bûn. Nedixwestin ku xelk têkevin nava xebatê. Ji xwe li ser wê ez û ew ketine gewriya hev. Min got, divê xelk têkevin nava xebatê; wan got, xelk bi siyasetê nizanin. Min got, me jî nezanîbû, em hîn bûn. Wan dixwestin ku xelk kor bimîne. Dixwestin ku ew di pêşiyê de bin, xelkê li dû xwe bikişînin û keda wan bixwin. Ji ber ku bav û kalên me jî holê kiribûn, dixwestin li ser riya bav û kalan bimeşin.

– Wek ku em dizanin di ser Hawarê re gelek sal derbas bûn. Ta bi niho jî tu nivîskarên Hawarê ji me re tu eserên edebî, ku em bikaribin wergerînin zimanên biyanî û pê serên xwe bilind bikin, nehiştine. Gelo ji bo çi?

– Na, tiştek wisan tune ye. Ez bi xwe jî tiştekî ku mirov bikaribe wergerîne zimanên biyanî û pê serê xwe bilind bikin, nabînin. Maalesef, em nikarin li ber xelqê serên xwe bilind bikin. Em nedixebitîn, em ne ji xwe re bûn. Bav û kalên me peyayên xelkê bûn... Me çavên xwe vekir, me dît ku her kes şerê yê din dike. Bi rastî me tiştek nekir. Hê em kurên peyayên ku xulamiya xelqê dikirin. Em niha rabin, derewan bikin û bibêjin, ku me tiştek kiriye, na.

– Kesên ku îro dinivîsin, dikarin çi bikin?

– Yên ku îro dinivîsin, hê nûh dest pê kirine. Hê gelek wext ji wan re dixwaze; mirov zû nikare zimên pêş de bibe. Ev pênc sal in ku ez li ser zimên dixebitim, hê jî ez negihîştime tu deverê.

– Ji nifşê nû yên ku dinivîsin, dikarin çi bikin?

– Dikarin tiştên kevn bixwînin, nas bikin, jê sûd wergirin û li ser zêde bikin.

– Wek me berê jî got, di her warî de xwenûhkirin heye, civat tê guhertin û tiştên nû derdikevin. Digel wê, rewş û jiyana mirovî, awa û babetên edebiyatê jî têne guhertin. Bi ya te divê edebiyata kurdî, an jî helbesta kurdî îro çawan bête nivîsandin? Bi awayê klasîkî, an bi awayekî nûjen?

– Divê her du alî jî hebin. Divê helbesta kurdî ya bi wezin û kafiye jî hebe û ya bêsaz û serbest jî... Divê ku mirov herdu babetan jî binivîsîne. Gava mirov aqilê xwe bide ser nivîsînê, nivîsîn hêsan e. Ez ne bawer im ku her mirov bikaribe vê bike, hin kesên ku qabîlyeta wan hene dikarin û ew kesên wisan divê çi ji destên wan bê ew bikin. Gava çi ji destên wan bên û ew nekin, ew gunehkariyeke mezin dikin. Îro divê em fedî bikin, ku em neteweyeke bêziman in. Niha pir xortên me hene, xwenda ne, bi erebî jî xweş dizanin, dibêjin,"Em ê ji neteweya xwe re xizmetê bikin", lê naxwazin hînî zimanê xwe bibin û ez ê çawan ji wan bawer bikim? Zanayek dibêje: "Gava ku tu bixwazî dereca welatparêziya mirovekî hîn bibî, binihêre bê ew çiqasî bi zimanê xwe ve girêdayî ye". Kesekî ku ji me bi zimanê xwe ve girêdayî be, nîn e; kêm in, pir kêm in...

– Çi jî xortên nûh, yên ku dixwazin edebiyata kurdî nûjen bikin, dikeve serê te?

– Baş e, bila bikin, ma kê rê li ber wan girtiye? Ma kesek li pêşiya wan rawestiyaye? Zimanê kurdî, zimanê me gişkan e? Ne yê yekî yan yê diduyan e. Gava ji bo zimanê xwe bixebitin qenciyê bi xwe dikin. Ku ji bo zimanê xwe nexebitin ji wan re dibe kêmasiyeke mezin. Lê heyf e, yên ku ta bi niha bi zimên mijûl dibin gelekî kêm in. Divê mirov gelekî di vî warî de bixebitin, da ku çend kesên xort û jêhatî ji nav wan derbikevin. Ta niha mecal tune bû, niha li Ewrûpayê hinek birayên me bi vî karî re mijûl dibin. Li Îraqê nahêlin, li Îranê nahêlin, li Tirkiyê nahêlin, li vir nahêlin. Vêca em di vî warî de ne, Lê hê jî hin ji peyayên me dixwazin bi destên ereban, eceman û

tirkan welatê xwe azad bikin. Wey xwelî li serê me be!

– Bi ya te ji bo pêşxistina zimanê kurdî, çîrok û roman an helbest...

– Ezbenî, çîrok baştir in ji helbestan... Çîrok bi zimanê rastesere têtе nivîsandin. Helbest ne wilo ye. Vêca gelekan ji xortên me çavên xwe berdane nivîsîna helbestan, ev ne tiştek hêja ye, divê nivîsên rastesere bêne nivîsîn. Belê, helbest tiştek ji edebê ye, lê ne tevayiya edebê ye. Divê mirov bizanibe bi zimanê xwe binivîsîne, lê nizanin. Hemû ji min re helbestan dinivîsînin. Ha wê rojê yekî bîst- sî helbestên xwe nîşanî min dan, lê ew jî kurdî ne. Cegerxwîn heşt dîwanên wî hene, ew jî dixwazin mîna Cegerxwîn bibin. Cegerxwîn heşt dîwanên wî hene, lê Cegerxwîn qet nizanîbû rasterê binivîsiya. Gelekî çewtiyên wî hebûn. Paşê helbestên ku hatine nivîsandin jî hemû ji hev dizîne. Pirsên ku ji Ehmedê Xanî an ji Melayê Cizîrî standine jî hemû ew ne di cihê wan de bi karanîne. Belê, wezin û kafiye di helbestên wî de temam in.

Ez nivîsên we yên ku dikevin destên min dixwînim, baş in, cewher di we de heye. Lê divê hûn bêwestan her bixebitin.


* * *

Em wê êvarê heta bi nîvê şevê peyivîn. Di rabûnê de herçiqas min nehişt jî dîsan apê Osman bi min re rabû heya ber derî. Li ber derî jî em bîskê li ser lingan peyvivîn. Dû re, bi xatirxwestinê re wî ji min re got:

– Bi hev re bixebitin, neyartî û dijminatiya hevu nekin û nebin peyayên xelkê. De, Xwedê bi te re be!

Şam, 1987

HEVPEYVÎN BI XORTEKÎ 75 SALÎ RE



Musa Anter û F. Cewerî

Ez cara pêşî di sala 1978'an de çûbûbe Stilîlê, mala Mûsa Anter. Ji wê çaxê de vî camêrî bala min kişandibû. Lixwekirina wî, rabûn û rûniştina wî, tevgera wî, nefspiçûkahiya wî, hizir û ramanên vî ronakbîrê nûjen tesîreke pir erînî li ser min hiştibû. Wî hingî ji me re behsa astronomiyê, felsefê, medeniyeta girêkiyan, dînê Zerdeşt û dîroka mirovantiyê kiribû. Lê romantîkbûna wî jî ji ber çavan nereviyabû. Estetîka bexçê wî, dar û gulên wî yên têvel, cihokên di hewşê de çêkirî û tijî masiyên cûrbecûr, Mûsa Anter bi sed salî ji

gundiyan bi dûr dixist. Lê digel wê zanebûn û nûjenbûna xwe jî, Musa Anter tu caran xwe ji gundî û mirovên xwe bi dûr nedixist; kul derdê wan, êş û jana wan, kêf û şahiya wan bi xwe re par ve dikir. Bi sed salî di pêşiya wan de lê mil di milê wan de, bi wan re dimeşiya.

Min Musa Anter piştî serîhildana Nisêbînê, di nehê tîrmeha 1990'î de dîsan dît. Di ser re tam donzdeh sal derbas bûbûn. Ew ji şêst û sê salî bûbû heftê û pênc salî. Min di serê xwe de Musa Anterekî kal, ku nikane bimeşe, nexweş, bi êş û elem û xurifî çêdikir. Lê ne wilo bû. Ew bi her awayî weke xortekî bû, xortekî 75 salî...

Bi baweriya ku wê jiyana vî xortê 75 saî ji bo hevwelatiyên min balkêş be, min xwe negirt û jê pirsî:

– *Çi bigire tro navê Musa Anter ji aliyê hemû kurdan ve tête zanîn, nemaze ji aliyê kurdên Tirkiyê ve... Hin kes wî weke nivîskarekî, hin kes jî wî weke siyasetvanekî dizanin. Gelo tu bi xwe wî çawan didî naskirin?*

– Ez dikarim bêjim ku ez nivîskarekî siyasî me. Heta ji min hatiye jî, min xwestiye ez siyasetê bi awayekî mîzahî bikim. Ji ber ku heta niha me firsenda ku em bikaribin fikir û ramanên xwe eşkere û vekirî bibêjin, nedîtiye, min ji xwe re riya mîzahê neqandiye. Nivîskarê Hindî jî wilo kiriye. La Fontaine jî di dema xwe de siyaseta Fransayê bi heywanan, yanî bi fabel îzah kiriye.

Mirovên min, der û dora min kurd in; dinya min Kurdistan e. Kurdistan jî perîşan e. Ez bawer im ger ez ne kurd bûma jî, min ê dîsa li ser kurdan binivîsanda.

– *Ji bilî xebatên te yên siyasî, ez te bi Çimil, Birîna Reş, Tarasalar û ferhenga te nas dikim. Ji bo çi te hewcedariya nivîsandina van pirtûkan dît? Kê tu ajot ser vî karî?*

– Yê min ez ne sîlahşor bûm. Tu ordiyên min jî tunebûn. Ji ber ku min neheqî qebûl nedikir min hewcedariya nivîsandina van

pirtûkan dît. Şaîrekî arnawid heye, dibêje: Mirov di bin lingan de be jî, divê mirov bibêje wilo ye, xebara min e. Gerçî ez jar bûm, ez yekî bi tenê bûm. Eyb e ez bibêjim, lê ez dikarim bibêjim ku piştî Cumhûriyetê min dest pê kiriye. Niha ez ne poşman im. Hin bi hin hevalên min li min gîhan û niha yên ku ez derbas kirime jî hene. Mirov her dixwaze ku lawê minrov ji mirov çêtir be. Niha ez dibînim xortên kurdan dest avêtine vî karî, gelekî kêfa min tê. Di dema me de xortên xwende kêm bûn, çi bigire, tunebûn, li Nisêbînê kesên ku biçûna dibistana navîn û lîseyê, tunebûn, ez bi tenê bûm.

Vêca fêda min ya herî mezin ew bû, ku pir ji malbata me, mala apê minew, hemû li binxetê bûn. Havînan gava ez ji mektebê dihatim, ez diçûm Sûriyê. Li wir Hawar derdiket, Ronahî derdiket, ez di bin tesîra van kovar û nivîskarên wan, wek Celadet Bedirxan, Kamûran Bedirxan, Cegerxwîn, Qedrîcan û Osman Sebrî de mam. Tu ya rastî bixwazî, meraqa min jî ji nivîsandinê re pir hebû, ji ber vê yekê min dest pê kir û min xwest ku ez wê valahiya ku heye dagirim.

– *Wek tê zanîn tu wek nivîskarekî aktîv di pir kovar û rojnameyan de xebitîyî. Tu dikarî ji kerema xwe re bi kurtayî behsa wan kovar û rojnameyan bikî ?*

– Jiyana min ya weşanê, di sala 1948'an de, li Stembolê dest pê kir. Hingî me "Dicle" derdixist. Piştî ku ew hate girtin, ,me di sala 1950'î de kovareke bi navê "Şark Mecmuası" derxist. Piştî hatina qaşo demokrasiyê, ez vegeriyam welêt. Li welêt ez dîsan nesekinîm, me li Diyarbekrê "Şark Postası" derxist. Piştî wê bi çend salekî ez ji bo eskeriyê dîsan çûme Stembolê. Bi dû xelaskirina eskeriya xwe re gava ez vegeriyam welêt, îcar me di sala 1958'an de "İleri Yurt" derxist. Piştî derxistina İleri Yurt'ê û me çapxane kirî û me dest bi weşandina "Mezopotamya" kir. Derketina "Mezopotamya" bû se-

dema girtina me. Ji 58'an heta 60'î ez girtî mam. Gava ez hatim berdan, min di kovara Ahmet Akif Başar ya -li Stembolê derdiketde nivîsand.

– Baş e, di ser derketina wan pirtûkan re demeke dirêj derbas bûye. Ew dema dirêj di ser kovar û rojnameyên ku tu bi wan xebitî ye jî derbas bûye. Tiştê ez dixwazim bibêjim ev e; bi salan tu xebatên te xuya nekirin. Ji bo çi? Sedema ku te nenivîsand çi bû?

Min nivîsand. Pir kes jî bi vê yekê dizanin. Çar kitêbên min yên ku ji bo çapê amade bûn, hebûn. Herçar kitêb jî ji aliyê polîsan ve hatin girtin. Yek ji wan kitêban ferhengek bi kurdî û tirkî bû. Yek jê jî bi navê "38 Numaralı Hücre" b. Navê kitêbekê jî "Diyarbekir wê şevê çiqasî reş bû" bû. Min bîranînên xwe jî nivîsandine, ew niha ji çapê re amade ne. Ez hêvîdar im ew ê ji niha û demeke nêzîk berpêşî xwendevanan bibe.

Wek tu dibînî ez nesekinî me, tiştê ji destê min hatiye min texsîr nekiriye.

– Ji bo çi tu ji Stembolê vegeriya, te xwe ji jiyan û hewaya întelektuelî bi dûr xist û li gund bi cih bûyî?

Ji 70 heta 75'an ez sî û sê mehan girtî mam. Piştî ku ez hatim berdam ez hebekî nexweş ketim û ez têra xwe jî westiyabûm. Ez hewcedarî bêhnberdanê bûm. Min xwe li gund baş rehet kir. Vê yekê heta 1987'an dom kir. Di 87'an de ez careke din rabûbe sergovendê, min dîsan dest bi nivîsandinê kir.

Ez ê ji te re çîrokeke Rustemê Zal û bavê wî bibêjim. Hîn Rustem zarok bû, bavê wî rojekê bang dikiyê û dibêje were lawo, ez ê vê şerîeta xwe, karê xwe hemûyî bispêrim te. Dijmin bi vê yeka han dihese, tê ser wan û li talanên wan dixe. Hatin ji Rustem re gotin, dijmin li talanên me xistin. Rustem got, tişt nabe, me jî li talanên wan xistiye. Paşê hatin gotin, kuro bi şerîtên konê me ketine, konan bi ser me de xerab dikin, dîsan got, tişt nabe, me jî konê wan

bi ser wan de xerab kirine. Dawî dawî hatin gotin, heyran dest davêjin namûsa me. Hingî Rustemê Zal hêrs bûye, gotiye, îcar nebû, kanî hespê min û gurzê min ji min re bînin. Rustemê Zal xwe avêtiye ser pişta hespê xwe û bi hêrs û rik li hemberî dijmin rabûye.

Yê me jî li me xistin, îşkence bi me kirin, bawer bike gundiyên me hemî bi daran ve girê dan û tiştên nemayî anîne serê wan, rezalet kirin, zarokên me hemû girtin, kezeba me şewitandin, me deng nekir. Hetaa ku êdî gûyê me dane me, dest avêtin namûsa me, şerefa me anîne perakî. Wê çaxê min hew xwe girt. Yê min tu gurzê min wek yê Rustemê Zal tuneye, lê qelema min heye. Niha min rahiştiye qelema xwe û min bi vê kalîtiya xwe xwe avêtiye meydana şer.

– Di vê meydana şer de pir xort jî hene ku hespên xwe dibezînin. Me bîska din li ser nifşê kevin, yanî nivîskarên der û dora Hawarê sohbet kiribû. Ger tu nivşê nû û nivşê kevin bidî ber hev, çi ji nifşê nû dikeve serê te? Tu, tu hêviyê di nivşê nû de dibînî an na?

– Yên berê hem hindik bûn, hem jî kevin bûn, yanî klasîk bûn. Lê xortên niha, an jî nivşê niha moderntir in. Nivîskar dibe, şaîr dibe, her kes li gorî kultura xwe dinivîsîne. Mesele yên kevin, pir ji wan ne xwedî kultureke kûr bûn, di medresan de, bi xwendina dînî gihîştibûn. Rebenan negeriyabûn, nedîtibûn. Cegerxwîn li Qamîşlokê dinivîsand, hûn li Swêd dinivîsînin, ferq ev e.

– Îro kêm zêde mirov dikare behsa zimanekî kurdî yê standart bike, an jî behsa edebiyateke kurdî. Wek tu jî dizanî, îro bi zimanê kurdî roman, helbest, lêkolîn û heta em dikarin bêjin ku nivîsên felsefî jî derdikevin. Lê piraniya vê xebatê li derveyî welêt dibe. Rola vê xebata han di têkoşîna gelê me de çi ye? Ger li welêt îmkanê vê xebatê çê bibe, wê pêşketin xwe bi çi awayî nîşan bide?

– Rola vê xebatê ya hêja û giranbuha nayê munaqeşekirin. Ma gelo kî bêî tiştên wilo dikarin bi ser bikevin? Edebiyat, an jî nivîs ri-

ya têkoşînê rohnî dike. Lê mixabin, zimanê me hê ewçend bi pêş neketiye. Heta ku zimanek nekeve warê nivîsandinê, ew ziman bi pêş nakeve. Niha her kes wek malbata xwe dipeyivin. A niha ku jinek were gund û zarokek jê re çêbibe, ew zarok wê ne wek gundiyan, lê ew ê weke diya xwe bipeyive. Ji ber vê yekê ye ku zaravayên me pir bûne, ji hev bi dûr ketine. Ez bawer im gava ku zimanê kurdî têkeve warê nivîsandinê, ew ê dûrbûna zaravayên kurdî roj bi roj nêzîktir bibe. Em û zaza û soran em ê bikaribin bi hêsanî ji hevdu têbigihên, ew ê bibe zimanek. Tiştekî din jî heye ku em kurd ji her kesî bêtir birçiyên ilim û nivîsandinê ne. Niha, gava yekî têr û yekî birçî li ser sifreyekê rûnên, ma ew ê weke hev bixwin? Yê me jî wilo ye. Ger kurmancî serbest bibe, em bikaribin çapxane û weşanxaneyên xwe li dar bixin, em ê di demeke nêzîk de ji cîranên xwe derbas bibin. Ez bi xwe di vê baweriyê de me.

– Çi ji siyaseta Tirkiyê ya îro dikeve serê te? Şiyarbûna kurdan di çi dereceyê de ye?

– Li Tirkiyê ebeden siyaseta ilmî tuneye. Qeşmerî heye. Ew bi xwe jî dizanin ku êdî bi yasaxan, bi girtin û îşkencê ev kar naçe serî. Ew jî mecbûr in ku xwe biguherin. Ji aliyê din ve jî em kurd şiyar bûne.

Min di dema xwe de çûrokek di "Dicle Kaynağı" de nivîsandibû. Hingî ez hatim girtin, li min xistin, îşkence bi min kirin, gotin, kuro tu kî yî, tu çi teba yî? Em ê serê te bipelçiqînin. Axirê piştî hezar zehmetiyan gava ez hatim berdan min dîsan nivîsand. Kurteçîroka min wilo dest pê kiribû: Jinek, zilamek û zarokekî wan ê çar-pênc salî hebû. Ew karker bûn, jin û mêr di xew de bûn, lawikê wan jî razayî bû. Lê gava diz dikevin hundur, lawik şiyar dibe. Yek ji dizan diçe li ser serê lêwik disekine, kêra xwe dikişîne û dibêje: "Deng ji te derkeve ez ê te bikujim." Dizê din jî diçe sindoqa diya wî dişkîne û hemû firaxên wê dixe kîsekî. Kezeba lêwik dişewite, lê ma wê re-

beno çi bike, kêr jî di ser serê wî re kişandiye. Ji bo ku lawik dê û bavê şiyar bike, ew bang dike, dibêje: "Avnê, avnê, avnê!" Yek ji dizan dibêje: "Hiş be kuro!" Yê din jî dibêje:"Tiştek nabe lawo, zarok e, tirsiyaye, avnê bidiyê". Ew tasek av dide lêwik. Gava lawik avê vedixwe, dîsan ji bo ku ew dê û bavê xwe şiyar bike, bi dengekî bilind dibêje:"Oxx, ooxx, ooxx" yanî av çiqas xweş e. Lê dê û bav dîsan şiyar nabin. Yê diz destê xwe bilind dike û dibêje:"Hiş be kuro! Ez ê kulmekê li devê te bixim ha!" Îcar lawik bi dengekî bilind bang dike, dibêje:"Ay devê min! Ay devê min! Ay devê min!" Hingî dê û bavê lêwik şiyar dibin û diz jî direvin.

Min jî got "Lawo, ez dizanim ku ez wekî wî zarokî me, kêr di ser serê min re ye, ez nikarim bi we û dê û bavê min jî razayîne. Armanca min ew e ku ez wan şiyar bikim.

Îcar niha dê û bav şiyar bûne, dilê min rehet e. Di destên dizan de bi tenê rev maye. Dûr nêzîk ew ê birevin.

– *Şîret û pêşniyarên te ji karkerên kulturê yên derveyî welêt re çi ne?*

– Ez xebata we ya li derveyî welêt gelekî diecibînim. Mesele Jön Türkan jî li Ewrûpa karê xwe dikirin. Gandî li Ingiltere, Ben Bela li Fransayê xwe gihand. Em jî hêvîdar in ku hûn ê rojekê vegerin, li welatê xwe xwedî derkevin û karîna wê têxine destên xwe.

Divê ku hûn tu caran bêhêvî nebin. Tarîxa miletan dirêj e. Va ye emrê min bûye 75 sal, ev 55 salên min in ku ez di nava vê xebatê de me, min hê jî bi qasî qirşekî tiştek ji hêviya xwe winda nekiriye.

Tiştên ku hûn dikin pir bi qîmet in. Belkî niha xatirê wê nayê girtin, lê wê rojek were, ev hemû tiştên ku we nivîsandine, dê mîna beyreqan li ba bibin.

Kurdistan Press, 1990

ENSTÎTUYÊN KURDÎ

Civaka kurdî bi her awayî di hundirê guhertin û xwenûkirinê de ye. Sîstema feodalîzmê bi lez difeşkile, têkîlî û danûstandinên bermayê wê hêdî hêdi ji navê radibin. Di şûna vê sîstema ku bi sedsalan e li welatê me hebûna xwe parastiye, sîstemeke kapîtalîst lê bi cih dibe. Bi pêşketina vê sîstema nû, rewşa miletê me, nêrîna mirovên me ya dinyayê, rabûn û rûniştina me, rewşa me ya psîkolojîk jî tê guhertin, li gorî hewcedariyên jiyana vê sîstema nû em gavên xwe davêjin. Em dixwazin tola xwe ji dîrokê bistînin, loma jî em qeyd û merbendên tarîtî, zulum, paşdemayin û nezaniyê dişkînin û em gava xwe davêjin cîhaneke nûdem; em dikevin nava refên welatên hemdem. Em ji têkiliyên bermayên feodalîzmê, yên ku ji bo pêşketina civaka me bûbûne asteng, ji şer û pevçûna eşîrtî, ji dijminatiya li hemberî hev, hêdî hêdî azad dibin, em dikevin ser riyeke nû, riya bajarvanî û medeniyetê. Em êdî bi her awayî li hebûna xwe xwedî derdikevin; em xwe tenê bi riyekê, bi nêrînekê, bi hêzekê ve girê nadin, di her warê jiyanê de, em li gorî hewcedarî û xwestekên xwe tevdigerin. Nezaniya malkambax, ku hetanî niha mîna kabûsekî xwe bi hemû giraniya xwe berdabû ser dilê me, em çavgirtî û bêçare hiştibûn, niha em hêdî hêdî zora wê dibin, em hew dikevin xefka wê, lê em xefkê li ber wê vedigirin. Rê û metodên ku welatên azad û serbixwe berî bi sedsalan ji bo rohnîkirina civaka xwe bi kar anîne, em hê nû bi wan dihesin, ev rê û metodên ku nîşanên bajarvanî û pêşketinê ne, hê nû bala me dikişînin, qîmeta wan ya bilind hê nû ji me ve xuya dibin. Sazgehên demokratîk, akademî û enstîtu

ku cihên xebatên kolektîv û dibistanên zanistî yên pêşdexistina ziman, edebiyat, çand û her celeb toreya welatekî ye, li ba me (mebesta min Kurdistana Tirkiyê ye) hê nû girîngiya van celebsazgehan dixuye. Ev sazgeh ji bo çand û edebiyata miletekî cihên xebata nûdem e, ji bo azadî û ji nezaniyê rizgarkirina miletekî jî tûrêjên hêviyê ne. Digel gelek derengmayin û kul kêmasiyan em îro xwediyên van sazgehan in, em xwediyên enstîtuyan in. Enstîtu cihên xebatên ilmî û zanistiyê ne, nîşana bajarvaniyê ne.Enstîtu, akademî û sazgehên di van celeban de ronahiya civaka xwe ne. Yên me jî ronahiyên me ne. Lê barên yên me pirr giran in. Divê ew ji me re gelek tiştan bikin. Ew tiştên ku diviyabûn berî niha bi sedsalan bihatina kirin, divê ew îro bikin. Lê derengmayîn ji qet nekirinê çêtir e. Derengmayîn û heta niha nekirina me ji rewşa me ya siyasî tê. Rewşa me ya wêran ku piraniya caran me ji bo bêhnek azadî û çirûskek hêvî serê xwe daye. Rewşa me ya ku nehiştiye em çavên xwe vekinû mîna gelên dinyayê bi avakirin û pêşdexistina civaka xwe dakevin. Serdestên me nehiştine ku em kultura xwe vejînin, bi zimanê xwe bipeyivin, stranên xwe bistirên, romanên xwe binivîsînin... Loma jî em heta niha civateke jihevdeketî mane. Me cihê xwe di nava civatên hemdem de negirtiye, em nebûne xwediyê rûmet û serbilindahiyê. Wek me got, em îro di destpêka vî karî de ne. Barê giran li ser milên enstîtu û sazgehên kurdan in. Stranên ku heta niha nehatine gotin, zimanê ku nehatiye vejandin, edebiyata ku nehatiye nivîsandin, klasîkên ku nehatine çapkirin û belavkirin, kultura ku nehatiye nasandin û gelek tiştên din di dorê de ne. Gelo enstîtuyên me yên ku îro hene di çi rewşê de ne? Planên wan yên pêşerojê çi ne?

Me ev pirsên han ji serokê Enstîtuya kurdî ya Parîsê Kendal Nezan, berpirsiyarê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê Feqî Huseyn û sekreterê Enstîtuya Kurdî ya Brukselê Derwêş M. Ferho kirin.

Nûdem, No: 6, 1993

SEROKÊ ENSTÎTUYA KURDÎ YA PARÎSÊ; KENDAL NEZAN

Nûdem: *Gava we li Parîsê Enstîtuya kurdî vekir, gelekî nav da. Hem ji bo kurdên li welêt, hem jî ji bo kurdên li derveyî welêt bû hêviyek. Gelo fikra lidarxistina Enstîtuyê çawa bi we re çê bû ? Ji bo çi we pêwîstiya lidarxistina sazgeheke wilo dît?*

Kendal: Gotineke filozof Pascal heye: xweza (tebîet) ji valahiyê nefret dike. Di destpêka salên 1980'an de gele ronakbîr û hunermendên kurd ji ber zordestiya rejîma eskerî ya Tirkiyê, ji ber şerê Îran û Iraqê xwe avêtibûn Ewrûpa Rojava. Hin ji wan di nav partî û rêxistinên siyasî de dixebitîn û gelek ji wan, ji ber sedemên cihê, bi serê xwe mabûn; bêî ku dev ji xebata welatparêziyê berdin nedixwestin bikevin nav xirecira stewr û şerê fraksiyonan. Piraniya partiyên kurdan, nexasim ên kurdên Tirkiyê, mirîdê stalînîzmeke hişk bûn; hin berê xwe dabûn "Moskovaya Sor!, hin "Pekîna Semawî", hin "Tîranaya Enwer Xoce", bi serê wan sond dixwarin û carna nedixwestin silaveke Xwedê jî bidin pismam an merivekî ku ji îman û baweriya wî ya îdeolojîk şik dikirin. Mînakek ji salên ku her xwendevanên we pê dizane; ez xwişk û brayan dinasim ku bi salan li Ewrûpa dijîn, xwende û ronakbîr in, welatparêz "şoreşger" û "sosyalîst" in; ji ber ku yek ji fraksiyona yê din nebû, bi salan li hev nedipirsîn, silav nedidan hevûdu. Hin xortên ku ji Kurdistanê nû hatibûn Fransayê, paqij, bi edeb û qedirşînas bûn, me arîkarî dida wan, ew bi cîh dikirin, ji wan re kar an bûrs didît ji bo ku bigihên, xwe pêş ve bibin, gava ku diketin nav yek ji wan fraksiyonên "şoreşger" ên hişk, êdî bi carekê hevaltî û dostayetî jî ji bîr dikirin, carna eşkere

an paşpênî dijminahî dikirin. Navê danûstanên mirovî yên bingehî danîbûn "peywendiyên ehbab-çawiş", tiştekî cîgehê şermezariyê! Qedirnasî û spasdarî ji bo kesên ku rojek di tengasiyê de destê arîkariyê dirêjî te kiriye bubû "tirşikçîtî". Bi kurdî peyivîn û nivîsîn ji riya pîroz a "şoreşgerî" û " enternasyonalîzmê" derketin bû, "nasyonalîzma burjuvaziya biçûk" bû, bi kurtî kufreke mezin bû! Bi hezaran kesên ku ji bo rizgarî û azadiya gelê kurd tade û êşandin dîtibûn, derbeder bûbûn, di nav vê tora stalînîzmeke iptîdaî û totalîter de, çavtirsiyayî, terorîze bûbûn, ji rûmetên bingehî yên çanda xwe re, ji zimanê xwe re, ji orf û adetên piraniya gelê xwe xerîb û bêgane bûbûn, dûr ketibûn. Dikaribûn bê tirs herin mirinê, lê newêribûn zincîrên terorîzma fikrî bişkênin, bi serê xwe bifikirin, bi çavekî din li cîhanê binêrin. Ji çandê heta sporê, komelên xwendekaran û sendîkayan, fraksiyonên Stalînîst dixwastin hemû warên jiyana civakî têxin bin kontrola xwe û herwekî nikaribûn hemiyan bi hev re bimeşînin, her tişt tevlihev dibû, di wê geremol û tevliheviya giştî de doza kurdî pêşve nediçû. Em, her yek di destên me de Mishefên pîroz ên Mezhebên me û pirtûkên me yên şerîetê, bi tirkî bi hev ketibûn, şerê hev dikir, mala hev wêran dikir. Her yek jî bawer dikir ku şev û roj ji bo qenciya gelê kurd vî karê ha dike û di dawiyê de ne ji alî çandî, ne ji alî nasandina doza kurdî bi raya giştî û ne ji alî siyasî ve pêşveçûnek tunebû. Di fizîkê de ji tevgerê re dibêjin "livandina brownî": molekul timî dilivin, diçin, tên, li hev dikevin, lê ji bilî îsrafa enerjiya xwe tiştekî pêşve nabin. Rewşa kurdan li derveyî welêt hêwirzeyeke brownî bû.

Di rewşa wilo de meriv dikare du tiştan bike; an bêje gelên din berî 40-50 salan di vê dema mîstîk de derbas bûne, niha dora Kurda ye, tiştekî kirinê tune ye; ya çêtir ew e ku li mala xwe rûnên heta ev lehiya han derbas be; an jî bêje, ez wekî kesekî bi serê xwe, heye ku bi çend kesên din re jî, bicêribînim dervayî vê xirecira giştî xeba-

tek ku bi me dibe bikin ji bo an ziman û çanda kurdî an ji bo nasandina doza kurdî li derveyî welêt.

Wekî gelek hevalên kurd ên din, ên ku baweriyên wan nêzîkî ên min bûn, ez alîgirê riya duwem bûm. Li gora vê baweriyê me di salên 1974-1980 an de Komela Fransa-Kurdistan danîbû, tê de ronakbîrên fransiz ên navdar wekî Jean Paul Sartre, Simone de Beauvoir, Maxime Rodinson civandibûn, li ser kurdan pirtûkan çap kiribû, di radyoyan de bername belav kiribû. Ez di ber karên xwe yên profesyonel de bi salan, di nav Partiya Sosyalîst a Fransa û partiyên sosyal-demokratên hin welatên Ewrûpa Rojava de ji bo nasandina gelê kurd û doza wî xebitîbûm, semîner û konferans dabû. Gava ku di gulana 1981'ê de li Fransa, Sosyalîstan helbijartin kar kirin, çend kesên ku min baş nas dikir bûn wezîr. Wê demê pirsa kurdên Îranê aktuel bû, min di hin waran de ji bo wan arîkarî peyda kirin. Lê di ciyekî de dema xebata şexsî derbas bûbû, pêwîstiyek mezin bi avakirin û danîna mueseseyên serbixwe yên domdar hebû. Min di wefata rehmetî Kamuran Bedirxan de jî ev rastî gelek xurttir dît. Ez dostê nêzîkê wî bûm. Di sala 1980 an de, çendeyek berî mirina xwe, ji min re got: "dawiya rê êdî xuyan e; em gelek xebitîn lê tiştek hêja me neqediya. Lewra ez tu bîranînan nanivîsim, ez dê bê wêris herim û naxwazim gora min jî hebe. Mal û milkekî min î hêja nîne; çend tiştên biçûkên ku hene ewê bigihên keça Celadet Beg, Sînem Xan û zarokên wê. Lê ez kitêb û arşîvên xwe dispêrim te, min ne dît, heye ko tu bibînî, rojekê kitêbxaneyek, merkezek ji bo kurdan bê danîn, an perçeyek ji welatê me azad bibe, kerem ke ewan ji bo hînkirina nifşên nû bide wêderê". Welatparêz û şerkerekî me yî mezin diçû, li pey wî, li welatekî girîngê wekî Fransa tiştek nedima. Ewî li vî welatî, di nav hezar dijwariyan de, xwestibû çend keviran deyne ser hev; diçû, ên li pey wî divê çibigire ji nû ve dest pê kirina; di dema ku gelên din, ên wekî ermeniyan bê dewlet jî, bi sedsalan

berê ji xwe re hin muesese danîbûn, tê de arşîv û kitêbên xwe, zanîn û cêribandinên xwe didan serhev û digihandin nivşên nû. Biyaniyên ku dixwestin ji dîrok û çanda wan gelan agahdar bibin dikaribûn bi serbestî herin wan ciyan, hîn bibin, bixwînin, binivîsin. Lê ku rojnamevaneîk biyanî bixwasta li ser rewşa Kurdistanê hînî tiştekî bibûna diviyabû bi dijwariyên mezin temsîlkarekî rêxistineke siyasî ya kurd peyda bike ku bi zimanekî ewrûpî bizanibe, li cem wî çend pirtûk û belge hebin.

Ev valahî û hewcedarî him ji alî kurdan ve him ji alî biyaniyên dilxwazên gelê kurd ve hebû. Hewcedarî organan çê dikin. Ji bo dagirtina vê valahiyê du tiştên bingehî pêwîst bûn: dirav û kesên karzan û têgihiştî. Piştî bêtirî salekê çûnûhatin û axaftinan, sê wezaretên fransiz qebûl kirin ku hinek arîkariya diravî bidine me. Lê pirsa kadran dijwartir bû: di nav kurdên Ewrûpa bi deh hezaran kes kebûn ku dikaribûn bimeşin, afişan li dîwara xin, govend û dîlanan bigirin, bi sedan kes bi karên komeletî dizanîn, lê ên ku bikaribin baş bi kurdî binivîsin an zimanekî ewrûpî yê sereke baş bipeyivin û binivîsin gelek kêm bûn û ji me re jî kesên wilo pêwîst bûn, ji ber ku karê bingehî yê ku me dabû ber xwe parastin û pêşvebirina çanda kurdî û nasandina doza kurdî bi raya giştî ya Ewrûpa bû. Gihandina kadran karê salên dirêj e; loma em bi kadrên hebûyî bi rê ketin, bi hêviya ku di salên pêşiya me de emê bikaribin keç û xortên kurd ên jêhatî bidin xwendin û ku ji nav wan kesên bikêrhatî derkevin.

Enstîtu wek projeyeke çandî ya serbixwe, ji siyasetê cihê lê ne hember, ne jî bindestê wê, wek ramaneke welatparêz a berhevkir, li dora xwe hin ji zane û hunermendên mestirîn ên gelê kurd, wekî Yilmaz Güney, Hejar, Nûredîn Zaza, Cegerxwîn, Qanatê Kurdo, Tewfîq Wehbî, civand. Ev civandineke bêtir sembolîk bû, mesaja wan ev bû: em welatparêzên ji perçeyên cihê yên Kurdistanê ziman

û çanda gelê xwe di talûkê de dibînim, doza parastin û pêşvebirina wan pîroz e, li ser cihêtiyên bîr û baweriyên siyasî ye, divê ku em li dora vê dozê bicivin. Danîna Enstîtuyê di demeke dîrokî ya taybetî de, lêdana vê defa hewarê bû. Dengê defê hate bihîstin û ji wê demê ve, kurd girîngiyeke mestir dan doza çand û zimanê xwe. Wekî kesên realîst, me tu car xewna civandina hemû nivîskar û hunermendên kurd di nav rêzên Enstîtuyê de nedît. Realîteyên cihêreng ên salan wilo bi hêsanî nayên guhartin. Lê heke di nav komele, navend an kovarên cihê de be jî îro, deh sal piştî danîna Enstîtuyê, xebatên çandî gihîştibin otonomiyek, xwe ji serwariya siyasetê rizgar kiribin, bi kurdî nivîsîn, belav kirin, minaqeşe kirin, îro êdî "şermezarî" û "biçûkbûn" na, lê serbilindî be, bi zimanên ewrûpî li ser kurdan bêtir pirtûk, tezên doktorayê û xebatên zanistî hatibin çêkirin, Enstîtuya kurdî, bi awayek yekser an bi peydakirina hemberiyê, di vê guherandina hil û zihniyetan de pardar e û ta dereceyekê gihiştiye amanca xwe.

– *Piştî vekirina Enstîtuya kurdî ya Parîsê, we beşek bi navê "Enstîtuya kurdî ya Bonnê" jî vekir. Lê ew beşa ha ji nişkê ve winda bû. Gelo çîroka wê çawa bû?*

– Almanya Rojava ji bo xebatên kurdî welatekî gelek girîng e. Nêzî nîv milyon kurd li wî welatî dijîn. Lewra me di destpêkê de xwest ku beşeke Enstîtuyê li Bonnê bê danîn, him ji bo weşanên Enstîtuyê bigihîne kurdên Almanya, him doza kurdî ji getoyên ramanî yên radîkal derxe, bi hêz û mueseseyên almanî yên fireh bide nasîn û qebûlkirin, lobiyeke kurdhiz çêbike li Parlementa almanî û di nav rojnameyan de, hebûna kurdan wekî cemaeteke neteweyî ya cihê bi awayekî resmî bide qebûlkirin û mafên wan ên civakî, ên xwendegah û radyo û televizyonê bi dest xe. Hin parlementerên sosyal-demokrat piştgiriya vê projeyê kirin, lê ji ber tezyîqa mezin a Tirkiyê li ser hikûmeta almanî, me nikaribû îmkanên malî yên ferz

peyda kin. Ji alî danîna ekîbê de jî, me gelek dijwarî dît. Çend ronakbîrên ku ewê bikaribûna ji heqê vê xebatê bihatana di nav partiyên siyasî de kar dikirin; mixabin me nikaribû 5-6 ronakbîrên serbixwe, şareza, kurdî û almanîzan peyda kin. Lewra beşa Enstîtuyê piştî salekê xebatê û çend çalakiyên hêja (wekî meha çandî ya kurdî li Dortmundê), hate girtin. Ciyê wê xuya û vala ye. Ji ber ku komele û rêxistinênen kurd ên ku li Almanya hene hê tenê xitabê baskê çep ê partiya sosyal-demokrat (SDP) û Keskan dikin; Ji sedî 80 gelê alman li dervayî van herikanan e. Di van rojên reş û dijwar de gelê kurd hewceyê arîkarî û piştgiriya her kesê demokrat e. Tenê dijminên gelê kurd ji vê valahiyê û getokirina pirsa kurdî îstifade dikin.

– Tê bihîstin ku pirtûkxaneya we pirtûkxaneyeke dewlemend e. Gelo ew bi çi celebî dewlemend e?

– Pirtûkxaneya Enstîtuyê dewlementirîn pirtûkxaneya kurdî ya dervayî welêt e. Ku hebe tenê ya Korî Zanyarî ya Bexdayê jê dewlemendtir e. Tê de bi bîst û pênc (25) zimanan pirtûk, bi deh hezaran belge, belavok, foto û diyapozîtîv hene. Bend û meqaleyên ku ji sala 1915 bi vê de bi zimanên ewrûpî li ser kurdan derketine hene, kolleksiyonên kovarên kurdî yên li Iraq, Îran, Sûriye, Libnan, Tirkiye û Ermenistanê derketî, ên kovarên rêxistin û komelên kurdî an kurdparêz hene. Lêger, xwendekar, rojnamevan ji Fransa û ji gelek welatan - Japon, Awistralya, Amerîka, Hindistan, Çîn jî tê de- tên, jê kel digirin ji bo nivîsar û xebatên xwe yên li ser Kurdan. Xwedîkirin û dewlemendkirina pirtûkxaneyekê yek ji amancên sereke yên Enstîtuyê ye. Enstîtu tu karekî din neke, tenê vê pirtûkxaneyê xwedî ke û vekirî bihêle, ewê xizmeteke mezin bike ji bo çanda kurdî.

– Di salên pêşî yên vekirina Enstîtuyê de gelek aktîvîteyên we dihatin bihîstin. Wek mînak; we pêşangehên resamên kurd li dar xistin, kursên zimên didan, kovareke lêkolînê bi navê "Studia Kurdica" derdixist, kovareke berfireh ya kulturî bi navê "Hêvî" û we salê gelek

nin.

Heçî kovar, bultenên agahdariyê û *Kurmancî* bi pergal derdikevin. Di 1992'an de hejmareke Hêvî derket. Îsal hêviya derxistina du hejmaran heye. Mixabin potansiyala nivîskariya bi kurdî kêm e; ya ku heye belawela ye, têra çend kovaran nake û kovara Hêvî jî sirf ji bo ku bêtir derkeve nikare her nivîskarî çap bike. Lewra bi pergal derketina wê dijwar e. Ev dijwarî ji bo *Studia Kurdica* jî heye. Lê îsal hejmareke wê ya erebî di çapê de ye û ewê hejmareke wê ya tirkî, du hejmarên wê yên erebî yên din jî derên.

– Lê tiştên xuyayî xebatên we yên li ser zimên her berdewam in. Hûn salê du caran zimanzanên kurd dicivînin û li ser zaravayê kurmancî lêkolînan dikin, gotinên nû çêdikin. Wek tê zanîn ev xebatên we li derveyî welêt dibin. Gelo çima hûn berê vê xebata ha nadin welêt?

– Xebateke wilo niha tenê li derveyî welêt mimkin e. Ji ber gelşeyên siyasî û tevliheviya giştî, li beşek li Kurdistanêpêkanîna vê xebatê ne mumkun e. Heye ku di pêşerojê de, mecal hebin, em ji welat gazî çend kesan bikin. Di milê din de, ji bo ku encamên van civînan baştir li nav Kurdên Kurdistana Bakûr belav bin, emê 10 hejmarên pêşîn ên Kurmancî (rojnama taybetî ya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê li ser pirsên zaravê kurmancî) li Stembolê bidin çapkirin. Heye ku paşiyê Kurmancî bi xwe jî li wir bê çapkirin. Xebata kirî, zû an dereng, ewê bigihê destên gel. Em çawa niha pey xebatên salên 1930 an ketine, ewê Kurdên ku bixwazin encamên xebatên me peyda bikin.

– Wek tu jî dizanî ku piştî we, du Enstîtuyê din jî vebûn; yek li Brukselê, ya din jî li Stembolê. Danûstandinên we bi hev re çawa ne?

– Danûstandinên me bi hevalên Brukselê re baş û germ in, lê haya me zêde ji Enstîtuya Stembolê tuneye.

– Bi a we çand û edebiyata kurdî di çi rewşê de ye? Di warê çand û

bûrs ji bo xwendevanên kurd derdixist. Gelo ev xebatên we hê jî berdewam in? Ger ne berdewam bin sedem çi ye?

– Di salên 1986-1987'an de, hikûmeta fransiz a rast, li ser daxwaziya Iraq û Tirkiyê arîkariya malî ya ku ji Enstîtuyê re dihate dayîn birrî. Ji ber kêmasiya îmkanan weşanên me û xebatên me di van du salan de kêmtir bûn. Lê ji 1988'an bi vê de xebatên me di her warî de, ji salên destpêkî gelek xurttir in. Ji bo nimûne Enstîtu ta niha bi zimanê kurdî 18 filmên vîdeo, bi zimanên din (îngilîzî, fransizî, tirkî) jî 3 videoyên li ser Kurdan, 22 kasetên musikiya kurdî weşandiye, bi fransizî, kurdî, tirkî, îngilîzî, erebî pirtûk dane çapkirin. Tenê di 1992 an de ji bo xwendegehên destpêkî û navîn ên Kurdistana Iraqê li ser hev 290 hezar pirtûkên xwendinê, bi kurdî daye çapkirin û ji 130.000 zarokên kurd re defter-qelem hwd. şandiye. Heçî çalakî yên wek pîşangeh, konferans, semînar, hwd. lîsta wan dirêj e, di rapora me ya xebatê ya 1992 an de 7 rûpel digre. Di dema ku em vê hevpeyvînê çê dikin li çar bajarên îtalî yên navçeya Emilia Romagna em bi şaredariyan re pîşangehên hunermendên kurd çê dikin. Ji 15 ta 30'yê nîsanê li Eustîtuyê pîşangeheke hunermendekî kurd (Rêbwar) tevî Fransiz û Poloniyek bi navê "Barana Çivîkan" çê dibe. Emê di meha 11'an de li mestirîn galeriya hunerî ya Parîsê (Galerie Internationale, bêtirî 1.000m2) pîşangeheke pirr mezin çê kin ji bo hunermendên kurd ên Iraqê û ên dervayî welêt. Rojname û kovarên van welatan li ser van çalakiyan dinivîsin, heye ku dengê me heta welatê we neyê, ji ber ku hûn li serê dinyayê ne. Ji ber aktualîta giran û dramatîk a Kurdistanê em bi xwe jî di weşanên xwe de pirr qala van çalakiyan nakin.

Enstîtu hersal dîsa, û ji berê bêtir, bûrsên xwendinê dide xwendekarên kurd. Par me tevîhev 24 bûrs dan. Ta niha, di 10 salan de, Enstîtu 196 xwendekarên kurd dane xwendin, ji wan 32 kes xwendina xwe nîvcû hîştin, neqedandine; ên din temam kirine an dixwî-

edebiyata kurdî de Enstîtuya we dikare çi bike û planên we yên pêşerojê çi ne?

– Bersiva giştî ya vê pirsê, bawer nakim hebe. Rewşa Kurdistana Başûr gelek cihê ye. Li wir, kurdî di her warên jiyanê de tê bikaranîn, talûka windabûn an jihevketina ziman û çanda kurdî kêm e; pirsa pêşvebirin, nûkirin û dewlemendkirina wê heye. Ev pirs bi sewiya pêşveçûna giştî, bi taybetî ya entellektueliya civaka kurdî ve girêdayî ye. Civaka kurdî ya Iraqê, civakeke Cîhana Sêwem e, ji ber hoyên siyasî danûstanên wê û cîhana derva bêtirî 30 salan e pirr kêm bûne, ketiye nav getoyeke teng. Divê ku derî û paceyên wê ji dinya derve re vekirî, hewayek nû bikeve hindûr, haya wan ji bayên nû yên dinê hebe. Danûstanên bi cîhana derve dikare bi riya vegera ronakbîrên kurd ên dervayî welêt, bi şandina kovar û pirtûkên ewropî, a çûna Ewrûpiyan ji bo semînar û konferansan an bi hatina ronakbîr û nivîskarên kurd ên Iraqê ji bo Rojava dibe. Di vî warî de Enstîtu niha dixebite ku tevî Zanîngeha Hewlêrê rêzeke konferansan amade bike, ronakbîr ji Ewrûpa herin; kovar û pirtûkên nû herin. Ez bawer im, di nav salan de, ewê kurd paşdemayina xwe telafî bikin.

Heçî rewşa çand û edebiyata kurmancî, rewş di dîtinê ji berî 10 salan gelek çêtir e. Bi kurmancî bêtir pirtûk û kovar dertên; hejmara kesên ku bi kurmancî dixwînin û dinivîsînin bêtir e. Lê mixabin di eynî wextê de li welêt bi xwe, ji ber bûyerên siyasî - koça bi milyonan Kurdan ber bi Tirkiya Rojava, valabûna gundên kurd, weşanên televizyonên tirkî - , gelê kurd ketiye nav gîrdaba bişivîna neteweyî û asimilasiyonê. Ta niha jiyana gundîtiyê ziman û çanda kurdî ta dereceyekê diparast. Ev jiyan îro ji ber bûyerên siyasî ji hev dikeve, winda dibe. Hebûna kurdan wekî gelekî cihê, xwedî ziman û çandeke serbixwe dikeve talûkeyeke mezin. Ku pêşî li vê çûyinê neyê girtin ta du nifşên (neslên) din li Kurdistana Bakûr ziman û çanda

kurdî namînin, çawa Îrlandî îro ji sedî not û dido bi îngîlîzî dipeyivin, ewê kurd jî bi tirkî bipeyivin, bêjin, "pêşiyên me kurd bûn". Karên ku em di vê rewşê de bikaribin bikin, weke bi şûr ajotina ser top û tankan e. Carna hin hevalên biyanî dibêjin, hun wek eskerên poloniyên ku di şerê cîhanî yê duwem de bi hespên xwe dajon ser panzer û balafirên Hîtler. Ez nizanim ta çi derecê ev muqayese li cî ye. Lê, tiştê ku ez dizanim ew e ku ta jiyan hebe, hêvî heye, berxwedan heye. Berxwedan ferz e. Agirên gurr jî bi çirûskekê an pêtiyekê dest pê dikin. Em ê di demek munasib de li Tirkiyê dest bi weşandina ferhengên kurdî, rêzimanên kurdî, nivîsar û pirtûkên klasîk ên kurdî bikin, vîdeo û kasetên kurdî derxin. Hin projeyên din jî hene ku dem hat emê car din belav bikin. Em ê tevî hemû welatparêzên kurd bixebitin, hewl bidin, sernivîsa xwe ya reş biguhêrin ta ku paş vê zivistana xedar a jiyana me ya gelêrî û çandî, tovên xesarnedîtî hêşîn bibin, geş bibin, bihareke geş û rengîn dest pê bike di ziman û çanda kurdî de.

Nûdem, No: 6, 1993

BERPIRSIYARÊ ENSTÎTUYA KURDÎ YA STEMBOLÊ; FEQÎ HUSEYN

Nûdem: *Ger em Enstîtuya Kevnesovyetê nehesibînin, di dema nêzîk de li Parîsê Enstîtuyeke kurdî vebû. Piştî girtina ya Bonnê, vê carê jî li Brukselê Enstîtuyeke kurdî vebû. Niha jî vaye we li Stembolê Enstîtuyeke kurdî vekiriye. Ji bo çi we hewcedariya avakirina Enstîtuyeke nû dît? Tiştên we ji Enstîtuyên din vediqetînin çi ne?*

Feqî Huseyn: Her çiqas di hinde enstîtuyan de hînkirin, ders û perwirandin hene jî lê mebest ji enstîtuyan lêgeran û vekolan e. Gava enstîtu di peywira (wezîfa) xwe ya misogerî (heqîqî) da bêne bikaranîn, gelek karên qenc ji wan têne dîtin. Hêvîdar im ku enstîtuyên kurdî hemî jî di peywirên xwe yên binyatî da bêne xebitandin. Ne du enstîtu, bîst enstîtu jî têra lêgeran û vekolana windayên kurdî nakin. Vaye hûn dibînin ku çendîçend sal in vegirtox û mijoker, bi çi rewş û awayî li windakirina dîrok, wêje (edebiyat), folklor û hemî hêjanên kurdî dixebitin. Bi windakirina van hêjayan jî tenê ranawestin, li hinekan jî xweyî derdikevin û "yên mene" dibêjin. Bi min be ji her zanîneke kurdî ra sê-çar enstîtu pêwîst e. Ew jî her yek ji wan bi zimhêrekê (butçeyekê) giran bêne destek kirin.

Ji hevcihêbûna enstîtuyan xebata tekûse. Ango kîjan qenc û tekûs bixebite û karên qenc bike ew ji yên din çêtir e. Hêvîdar im dê hemî enstîtuyên kurdî jî qenc bixebitin û menzîla vekirî dadin. Dîsa hêvîdar im hê gelek enstîtu jî bêne vekirin û xwe bigihînin hewara hêjanên kurdî yên windayî.

– Wek hûn jî dizanin ev herdu enstîtuyên ku hene, herdu jî li derveyî welêt in. Lê we jî li derveyî welêt, li Stembolê enstîtuya xwe ava

kir. Ji bo çi we ev bûyera dîrokî ne li Diyarbekirê, lê li Stembolê li dar xist?

– Çawa hûn jî dizanin, ne li Diyarbekrê û ne jî li tu bajarên Kurdistana bakur, îro çara damezirandina zanîngeh, dibistan û enstîtuyên kurdî nîn in. Li Stembolê damezirandina van pûngalên zanîna kurdî ne hêsan in. Ango ew hêsaniyên li derveyê Tirkiyê heyî, hemine ku li vir nayê hizirîn û ji xwe em li pê wê jî nagerin. Tenê di nav bêçareyî, bê ewleyî de û di bin stemkariya giran da ev kar hatiye bikaranîn. Meşandina wê jî pir zehmet e. Kêmasiyên aborî, kêmasiyên pispor û mirovan têrê nake, di ser da jî di bin hincirandina polîsan da tête meşandin. Heker Enstîtu li bajarekî Kurdistanê hatibûya damezirandin, li Diyarbekrê enstîtuya kurdî bihata vekirin ka dê çi bihata serî û dê çi bihata serê damezirandoxan? Belê em dizanin welat benda me ye û benda vekirin û damezirandina dibistan û enstîtuyan e. Qenc dizanim ku welat ji me pir xeyidî ye lê di îro da çara me ev digihîjê. Divê welat jî li kêmasiya me nenêre. Hêvî û gumana me ew e ku demek zû em hemî û digel enstîtuyên xwe bi şahî biçine welat, nav welatiyan. Em jî welatê xwe mîna welatên biyaniyan ava bikin û welatiyên xwe jî bi çand û teknîk bigihîjînin. Heya em bigihîjin vê daxwaza bilind, bi hezaran kîlometre dûrê welat be jî li ser çanda netewî xebata me pêywîst e.

– Piştî avakirina enstîtuya we me ji çapemaniyê bihîst ku polîsan tabelaya we daxistiye, hûn di bin taqîba wan de ne. Gelo ev êrîşên wan hê jî berdewam in?

– Belê çawan we ji çapemaniyê bihîstiye, roja me enstîtu vekir, polîs hatin bi destê zorê tabeleya me daxistin û redestê me kirin. Dûre bi devkî ji me ra "Heger îşareteke Mezopotamya Kültür Merkezi li ser tabeleya we hebûya, hemine ku me nedikariye daxista. Lewra ew şîrketeke bazirganî ye" gotin. Me jî bi navê : "Mezopotamya Kültür Merkezi limitet şîrketî" tabelek nivîsand û li ser tabe-

leya "Enstîtuya kurdî" monte kir û daliqand. Êdî tabeleya enstîtuya me wilo bû: "Mezopotamya Kültür Merkezi Ltd. şti. Kürt Enstitusü, Enstîtuya kurdî". Lê cara dudan dîsa polîsan tabeleya me daxistin. Vê carê êdî dijwartir bi ser me ve hatin.

Divê bête zanîn, gava me neh damezirandoxan teşebusa damezirandina Enstîtuya kurdî kir, pêşî ji alî me ve rêzikên (qanûnên) Tirkiyê hatin dahûrandin. Hate dîtin ku di rêzikan da bi serê xwe enstîtu nayên vekirin. Tenê ji alî zanîngeh, weqif û şîrketan ve têne vikirin. Me jî gorî rêzname û destûra Navenda Çanda Mezopotamyayê û bi navê wê vekir. Ango enstîtuya me çiqekê şîrketeke bazirganî ye. Dîsa jî destûra daliqandina tabelayê (lewhê) nadin û enstîtu di bin çavnêriyê da ye.

Belê em di bin taqîba wan da ne û êrîşên wan bê kêmasî didomînin. Çûna enstîtuyê di dest me da ye lê hatin ne kifş e ka di dest kê da ye. Çen roj berî niha polîs hatin enstîtuyê û mêhvan jî birin. Di polîsxana siyasî da gelek îşkence kirin. Dûra jî hatin bi nêhanî deriyê Enstîtuyê şikandin. Ango ji bo xebata enstîtuyê hîç ewleyî tune. Her roj îhtimala girtin, birin û pelixandinê heye. Xebat di nav bêçareyê de tê kirin. Tirs û welwele tu carî ji dilê karmendên di enstîtuyê da dernayên.

Herwekî ev têrê nake, em dane mehkemê jî. Heya niha du-sê mehkeme li me hatine vekirin. Dawiya mehkeman dê çawan bibin em nizanin. Ya tê zanîn, ev mehkeme welê rêzanînin û gorê rêzaniya dewletê ya rojanî biryar têne dan. Hemine em bi perûyên qenc neyêne perû kirin. Ji xwe gava doza kurdan tê himatê (holê) her kes huqûqê ji bîr dike. Zêde dirêj kirin naxwaze lewra her kes van bûyeran dizane û hûn jî dizanin.

– Di bin tirseke psîkolojîk de hûn çawan dikarin bixebitin?

– Di van salên dawî da tirs êdî zêde bûye. Her dem girtin, êşandin cenceserî, cincirandin û avêtina zîndanên ne ciyên mirovanî he-

ye. Di nav tirs û welwela giran da kar tê meşandin. Em jî ditirsin, lê pêwîstiya kirina van karan tirsa me mat dike û serdikeve. Hevalan ji bandora (tesîra) bûyeran zêdetir berê xwe dane kamiran û bextiyariya dawî. Bi vî awayî xwe jêhatî û psîkolojiya xwe derman dikin û qasî çare heye xebara xwe dimeşînin.

– Xebatên we yên sereke çi ne? Hûn dikarin mînakan ji çalakî û berhemên xwe bidin?

– Peywira enstîtuyan ya hêmanî lêgeran û vekolan e. Hemine ku gava dest bi lêgeran û vekolanên ji dil bêne kirin, zûbuzû afirînek (berhemek) nayên hizirîn. Nemaze lêgerana zanînên kurdî. Hûn jî dizanin, bi çi awayî zanîn û çanda kurdî hatiye taromarkirin û dabelandin. Heker tabir dirist be, çanda kurdî di devê zîha (ejderha) da ye. Hemin, derxistina wê ne hêsan e û ne jî zû pêktê. va neh mehe enstîtuya me hatiye vekirin. Di enstîtuyan da lêgeran û vekolînên zanistî neh meh demeke pir kurt e. Divê demek dirêj hewî bête kirin.

Di nav van bêçareyî û kêmasiya pisporan da, me ji bo kursiya dîrokê encûmenek daniye û dest bi xebatên hêja kirine. Ji bo kursiya ziman û wêjeyê jî, ji her yekê ra encûmanek hatine danîn û her yek dest bi xebatên xwe kirine û didomînin.

Ji bil van xebatan, gelek afirînekên destnivîsên kevnare yên wêjeyî hatine peyidandin û li ser hinek ji wan xebat dest pê kirine. Hêvîdar im di demek ne pir dirêj de çara çapandina hinek ji wan bi dest me bikevit. Tenê ji bo mihtaciya rojane, ji alî enstîtuya kurdî û weşanxana Komalê ve elfabek hatiye amade kirin û radestê weşanxanê hatiye kirin. Di hezra min da ew elfabe dê di demek nêzîk da derkevit û ji bo demek kurt, dê ewlatî havil jê bibînin.

– Piştî bêdengiyeke dirêj ya heftê salan, ji nû ve îmkanekî wilo ketiye destên kurdan. Loma jî wê barê we giran be, wê gelek tişt ji we bêne xwestin. Di nav van heftê salan de ziman, edebiyat û her celeb

çanda kurdî qedexe bûye, zimanê kurdî carina ketiye talûka windabûnê. Ji bo ji nû ve vejandina ziman, edebiyat û çanda kurdî plan û programên we çi ne? Hûn dikarin çi bikin?

– Em bi giraniya barê xwe dizanin. Ne ku giran teniya pişta mirov jî dişkîne, em bi vê jî dizanin. Lê em bi ezm û karîna derketina ji bin vî barî derketine li ser vê rêyê. Baweriya me bi serketina me heye.

Plan û programên me ew in ku pêşî em dest navêjine mijarên girîng, em dest davêjine yên girîngtir. Me dest avêtiye gramer û rastnivîsa zaravayê kurmancî. Ji bo destavêtina zaravayê zazakî (dimilî) jî em li mirovên pispor digerin lê hê jî têra danîna wî, mirov bi dest me nekitine. Di rojên nêzîk da dê encûmena ferhengê jî bête damezirandin. Pêşî gorê mihtaciya ferhengeke basît, dûra dê ferhengên ji dil bêne nivîsandin. Ji bo rizgarkirina jîna efiranekên me yên wêjeyî (edebî) yên destnivîs, di bernameya me da hatiye cî kirin û berhevkirina wan despê hatiye kirin. Xwezayî, bi berhivandin û cildkirinê tenî kar naqede, divê xebatek giran li ser wan bêne kirin û bêne çapandin. Bi vî awayî ew afiranek bikevine bin xizmeta gel.

Lêgeran, vekolan, dahûrandin û nivîsandina dîrokê jî bernamek ji bernameyên me ye. Bi kurtasî di bernama me da xebat li ser dîrok, wêje û zimanê kurdî ye.

Ew dîrok û rêzimana me yên ku heya niha hatine nivîsandin, ji ber ku di encûmanên zanistî ra derbas nebûne û ji alî encûmanan va jî nehatine nivîsandin, wan hemî em hiltînin destê xwe, ji wan havil dibînin. Hemine ku ew rêzimanê min nivîsandiye (Hêmana Rêzimana kurdî) ew jî yek ji van afiranekan e. Ji wî jî tenê dê havil bête dîtin.

– Peywendiyên we bi Enstîtuyên Parîsê û Brukselê re çawa ye? Gelo tunebûna peywendiyên Enstîtuyên kurdan ji bo me ne zerarek e?

– Mitliq zerareke pir mezin e. Gereke weha nebûya. Di welatê

me da rêzikeke heye: Gava mirov malekê datîne an jî kargehekê vedike, dost ehbab, heval, hogir û hevkar diçine seredana wî. Em bendî vê yekê jî ranewestan. Di dema vekirina enstîtuyê de ji enstîtuya kurdî ya Parîsê ra me xundname verê kir, tu kes ne şandine mihricana vekirinê. Em ji vê yekê aciz nebûn, me got, belkê çara wan nîne kes neşandiye. Pîrozbahiyek jî ji me ra neşandin. Dûra jî ne pîrozbahiyek din ji me ra şandin û ne jî bi me ra temas kirin. Vêca me got belkî bi me ra diyalog danîn ji xwe ra zerar dizanin, an jî naxwazin.

Dawiya meha berfanbara 1992'an ez ji bo karekî çûbûm Elmanyayê. Di navekra karê min sivik bû, ez derbasî Holandayê bûm. Ji wir min diyalog bi Enstîtuya kurdî ya Brukselê re danî û ez çûme seredana wan. Bi nêzîkahî min Perwîn û Derwêş nasî, em gelek peyivîn û me bi hev ra şîvek xwar. Hemine ez mêhvanê wan bûm. Bi dilxweşî û bextiyarî me xatir ji hevdu xwast.

Bernama me ne tenê ji enstîtuyên kurdî ra, ji hemî enstîtu û zanîngehên cîhanê ra yên bixwazin bi me ra kar bikin vekirî ye.

Nûdem, No: 6, 1993

SEKRETERÊ ENSTÎTUYA KURDÎ YA BRUKSELÊ; DERWÊŞ M. FERHO

Nûdem: *Piştî avakirina Enstîtuya kurdî ya Parîsê, we jî li Brikselê Enstîtuyek vekir. Ji bo çi we pêwîstiya avakirina Enstîtuyeke nû dît? Tiştên ku we ji Enstîtuya Parîsê vediqetînin çi ne?*

Derwêş M. Ferho: Wek tê zanîn bingehê Enstîtuya kurdî ya Brukselê ne nuh e. Bingehê wê kevintir e. Di sala 1978'an de hîmê Têkoşer, Yekîtiya Karker û Xwendekarên kurd li Beljîka hat danîn. Di bin wî navî de me yanzdeh salan xebat kir.

Têkoşer di van yanzdeh salan de xebatek hêja kir. Ew neket bin tesîra partiyên kurd yên siyasî. Vê rêxistinê armanca xwe ji roja pêşî ve diyar kir. Divabû ev rêxistin Kurdistanî ba. Ne girêdayî tu hêz an partiyê siyasî ba. Me xebata xwe jî weha domand. Herçend ev xebata me ne di bin tesîra partiyên siyasî de bû jî endamên rêxistinê xwedî bîr û baweriyên cihê bûn. Hin ji wan jî di nav hin partiyên siyasî yên Kurd de xebat dikirin. Lê mafê tu kesî nebû ku siyaseta partiya xwe li ser xebata rêxistinê mecbûr bike. Û endaman jî li ser vî bingehî xebat dikirin. Rojeêk problem li ser vê yekê derneket û xebat nefeşkilî. Her roja ku diçû xebat û nêzîkahî di nav hevalan de xurttir dibû. Prensîba karê bi hev re li nav rêxistina Têkoşer, lê di nav partiyên xwe de xebata siyasî li gor programa partiya xwe hatibû qebûlkirin.

Eger em amancên Têkoşer bi kurtayî li vir bêjin emê bibînin ku ev xebata bi hev re ne dijwar e:

Jîndarkirin, pêşvebirin û nasandina xebata çandî li ser ziman, dîrok, edebiyat û hunera kurdî. Alîkirina kurdan ji aliyê civakî û çandî

ji bo hêsankirina entegrasyona wan di civata Beljîkî û Ewrûpî de, bê ku ew şexsiyeta xwe ya kurdî winda bikin. Ev her du amancên ha bi xebata agahdarî û gihandinê di warên cihê yên civakî û çandî de bi cî dibin. Hevkarî bi kes û rêxistinên ku bi pirsên civakî û çandî yên kurdan û derhatiyan mijûl dibin re.

Bi van amancan xebat diçû. Roj bi roj xebat pirtir, bar girantir dibû. Xebata me ya çandî û agahdarî zêde dibû. Li nav Beljîka rêxistin baştir dihate nasîn. Têkoşer bûbû xwedî navekî girîng. Ev jî bû sedema ku em navê xwe biguherin.

Di destpêka sala 1989'an de di kongra xwe de me biryar stend ku em navê rêxistinê biguherin. Wê çaxê me Enstîtu navê herî meqbûl dît. Bi biryara kongrê me navê rêxsitinê kire Enstîtuya kurdî ya Bruksel. Lê xebara me li ser eynî bingehî dibe. Ev raste ku xebata rêxistinê deh qat zêdetir û girantir bûye, lê bingehê amancên me eynî ne.

Ne berê û ne niha tu girêdanên Enstîtuya Brukselê bi Enstîtuya Parîsê re nîne. Wek du rêxistinên Kurd, her yek xebata xwe li welatê ku ew lê ne li gora şertên xwe dike. Dibe ku xebata herdu Enstîtuyan nêzî hev be, lê nayê wê manê ku ew girêdayî hev in. Bi temamî û di her xebata xwe de tu girêdanên wan bi hev re nîne.

– Herçiqas xwendevanên me ji hebûna we haydar in jî, lê haya gelekan ji wan ji xebatên we tune ne. Xebatên we çi ne?

– Xebatên Enstîtuyê bi kurtayî ev in:

Xebata rojane: Ji duşem heta înê, fêrên ziman, alîkariya civakî, weşana bultena agahdariyê, dosya û pirtûk bi zimanên cihê, berhevkirina dokumentasyonê li ser kurdan, pêkanîna konferans, şev û rojên agahdariyê, hevkarî bi zanîngehên cihê re û hwd.

Di aliyê weşanê de:

Bultena agahdariyê bi kurdî, îngilîzî, frensî û holandî û nêzîkî deh pirtûkan...

– Berî ku hûn bibin Enstîtu hûn komeleyek bûn. We li ser navê komela xwe bi navê "Têkoşer" kovareke edebî û çandî derdixist. Lê piştî vekirina Enstîtuyê ev xebata we rawestiya. Ji bo çi?

– Me kovara TÊKOŞER heta jimara 43'an weşand. Lê piştî ku em bûne Enstîtu û xebat zêdetir bû me hew dikarîbû ew bar jî hilgirta ser milê xwe. Di cihê kovara Têkoşer de me dest bi weşana BULTENA AGAHDARIYÊ kir. Weşana vê bultenê di aliyê xebatê de girîngtir e. Feyda wê mezintir e. Me 300 heb Têkoşer ji kurdan re dişand, lê em vê kêliyê 900 Bultena Enstîtuyê bi çar zimanan poste dikin. Ji bo agahdariya civaka ne Kurd bultenên weha pirr muhîm in.

– Çend pirtûkên ku li ser navê Enstîtuya we derketine gihîştin me. Gelo ev xebata we ya çapkirina pirtûkan hê jî berdewam e? Hûn çi celeb pirtûkan çap dikin?

– Amanca Enstîtuyê weşan û belavkirina pirtûk û xebatên din yên çandî, dîrokî, civakî û edebî ye. Heta niha me çend heb pirtûk weşandine. Gelek jî li benda weşanê ne. Lê ji ber sedemên malî em nikarin wek daxwaza dilê xwe bikin. Her cara ku îmkan çêbûn emê vê xebata xwe berdewam bikin.

– Bi a we çand û edebiyata kurdî îro di çi rewşê de ye? Di vê derheqê de plan û programên we çi ne?

– Çand û edebiyata kurdî zengîn e. Em hemî vê yekê baş zanin. Lê problem li ba me ye. Em Kurd bi xwe, qedir nadine çanda xwe, edebiyata xwe û hebûna xwe. Pirr kes ji me kurdan temamiya enerjiya xwe didin ser çand û edebiyata dewletên ku me wek gel, çanda me, edebiyata me dipelçiqînin. Di eynî demê de ew çand û edebiyata me jî ji wan dewletan re werdigerînin û ji wan re diyarî dikin. Wek çand û edebiyata wan didin nas kirin.

Lê dîsa em bê hêvî nebin. Bîlakîs, hêviyên me pirr mezin in. Çand û edebiyata me hingî zengîn û xweş e besî me jî û diz û tala-

keran jî dike.

Nivîskarên Kurd li her alî peyda bûne. Li ser her babetê weşan derdikevin. Roj naçe ku meriv pirtûkên nuh, navên nivîskarên nuh û xebatên nuh nabihîze.

Ev meriv pirr şah dike.

– Wek hûn dizanin ji derveyî we du Enstîtuyên din jî hene; ya Parîsê û ya Stembolê. Peywendiyên we bi hev re çawan e? Ger peywendiyên we bi hev re tunebin sedem çi ye?

– Wek me li jor jî got Enstîtuya me serbixwe ye. Enstîtuya Brukselê li gora şertên xwe li welatê ku lê ye, Beljîka, xebata xwe didomîne. Enstîtuya me rêxistineke çandî ye û Kurdistanî ye. Tu girêdanên me, ne bi hêzên siyasî û ne bi rêxistinên din re heye. Lê nayê wê manê ku em ji xebata bi hev re deriyê xwe digirin. Dibe ku di salên pêş me de em hin tiştan bi hev re bikin. Lê dîsa ev xebata bi hev re jî ew ê li ser bingehê serbixwebûna her rêxistinê be.

Nûdem, No: 6, 1993

KOVAR Û ROJNAMEYÊN KURDÎ

Berî niha bi sed salî, gava rojnameya kurdan ya pêşî derketibû, gelek neteweyên ku îro xwedî dewlet in, ew jî mîna kurdan bê dewlet bûn, ji rojname û çapemeniyê bêpar bûn. Lê îro ew netewe ji bin nîrê zordestiyê azad bûne, dewletên xwe ava kirine, bûne xwediyên welat, çapxane, kovar, rojname û pirtûkan. Heçî em in, em îro jî, bi dengê rojnameya xwe ya ku berî niha bi sed salî li biyanîstanê derdiket, bang dikin. Doz û armanca rojnameya me ya pêşî hişyarbûn, zanebûn û azadiya kurdan bû. Niha, piştî bi sed salî, bi sedan kovar û rojnameyên kurdan, li derveyî sînorên Kurdistanê, bi wê armancê derdikevin.

Hişyarî, zanyarî û azadiya miletekî bi xwendin û nivîsandinê, bi çapemenî û ilim dikare mimkun be. Xwendin û nivîsandin mirov medenî û nûjen dike, mirov ji cîhana nezanî û tarîtiyê vediqetîne, dixe cîhaneke hemdem.

Hejmara ronakbîrên kurd, yên ku ji bo vê cîhana hemdem li ber xwe didan, kêm bûn. Lê wê hejmara kêm jî gelekî guh didan xwendin û nivîsandinê, zanebûn û hişyariyê. Loma, hema kengî fersend ketiye destên wan, wan xwestine ew bi riya çapemeniyê bigihîjin miletê xwe, wî ji wê nezaniya kirêt rizgar bike, bike xwediyê rûmet û serbilindahiyê.

Hin ji wan zana û ronakbîrên kurdan ji bo vê doza pîroz serê xwe dan, hin di zîndanan de riziyan, hin li welatên xerîbiyê di nava tenêtî û bêdengiyê de bi hesreta dîtin û vegera welêt, li goristanan bûne mêvan.

Ew rewşa kambax hê jî berdewam e. Hê jî kurd bindest in, hê jî kurd bê welat û dewlet in. Ronakbîrên kurdan hê jî têne kuştin, ew hê jî ji ber fikrên xwe yên pak, di zîndanan de dirizin, ew li welatên xerîbiyê hê jî bi hesreta vegera welêt û bi çavên tijî hêsir serên xwe datînin. Pirraniya weşanên kurdan hê jî li derveyî sînorê welatê wan derdikevin, bang û qîrîna wan ya ji bo zanebûn, hişyarî û jiyaneke azad hê jî di guhan de dikine zingînî.

Rewşa weşanên kurdan, rewşa kovar û rojnameyên wan her bi rewşa wan ya siyasî ve girêdayî ye. Ji bilî Kurdistana Iraqê, li perçeyên din yên Kurdistanê, kurdan tu caran bi firehî firsend nedîtine ku ew bi ziman û edebiyat, weşan û çapemeniya kurdî dakevin, ji bo têkûzkirin û bi pêşdebirina wan sazgehên xwe yên mîna akademî û enstîtuyan ava bikin.

Mixabin, welatên ku Kurdistan dagir kirine, biyaniyê demokrasî û mafên mirovatiyê ne, ew pirraniya caran bi sîstemên yekpartî û nedemokratîk, an jî bi îdeolojîne kufukgirtî hatine îdarekirin. Di bin van sazûmanên nedemokratîk de, ger carinan çirûskên demokrasiyê pê ketibin, kurdan lez dane xwe, li gorî îmkanên xwe kovar û rojnameyên xwe derxistine. Ji ber berxwedana dirêj û bidestxistina otonomiyê li Kurdistana Iraqê, liv û tevgerek di edebiyara kurdî de çêbûye, gelek kovar û rojname derketine, gelek pirtûk hatine çapkirin. Kurdên me yên Kevne-Sovyetê jî, li gorî îmkanên ku ji wan re hatibûn dayîn, tevgeriyane, di warê çapemeniyê de xebatên baş kirine. Herçî kurdên Sûriyê ne, wan jî di warê çapemeniyê de gavên baş avêtine. Ji bilî kovara Hawarê, di van salên dawî de di warê çapkirina kovar û pirtûkan de teqînek heye, ev teqîna han jî hêviya edebiyateke xwirt û nemir dide me. Li perçê herî mezin yê welatê me, li bakurê Kurdistanê, ji ber ku îro qanûnên taybetî hene, destûra çapkirina kovar, rojname û pirtûkên kurdî tune ne. Lê kurd mîna dema Meşrûtiyetê, ji Kurdistanê dûr, li bajarên mîna Stembol û welatên

Ewrûpa karên xwe yên întelektuelî dikin; kovar, rojname û pirtûkên xwe çap dikin. Ji ber dûrbûna ji welêt, ji ber stem û qanûnên taybetî yên li welêt, weşanên kurdan nagihîjin Kurdistanê, xelkê li welêt ji xwendina berhemên xwe bêpar dimînin. Sedema vê yekê vekirî û eşkere ye. Dev ji derxistina weşanan berde, jiyan li hevwelatiyên me hatiye herimandin, welatê me seranser bûye mîna zîndaneke tarî. Li derveyî sînorên vê zîndanê hin mafên demokratîk ketine destên kurdan, wan di demên kurt de gavên mezin avêtine. Ev mafên demokratîk yên bi sînor jî bi surgûna kurdan ve girêdayî ye. Wek tê zanîn dîroka rojnamevaniya kurdî bi dîroka surgûn û ji welêtderketina kurdan ve girêdayî ye. Rojnama kurdan ya pêşî Kurdistan û bê hejmar kovar û rojnameyên kurdan ên din bi hezaran kîlometre ji Kurdistanê dûr derketine.

Lê, digel ku ev sed sal in di ser rojnameya kurdan ya pêşî re derbas bûye jî, hê rojnameyeke kurdî ya rojane derneketiye. Rojnameyeke rojane ya xwerû bi kurdî, wê bibe neynika civaka me, wê zimanê me bi me şêtîn bike, wê bal û meyla me bikişîne ser çand û edebiyata me, wê bibe destpêka şikandina zincîra koletî û nezaniyê.

Ji bo fêrbûna rewşa kovar û rojnameyên kurdan yên îro, rewşa xwendin û nivîsandina kurdî û îmkanên derxistina rojnameyeke kurdî ya rojane, me nêtînên berpirsiyarê *Armancê* M. ELÎ, berpirsiyarê giştî yê kovara *Newrozê* Remzi BİLGET, xwedî û berpirsiyarê *Azadî* İkramettîn OĞUZ, berpirsiyarê giştî yê kovara *Nûbihar* R S. KARA girtin.

Nûdem, No: 7, 1993

BERPIRSIYARÊ ROJNAMEYA ARMANCÊ; M. ELÎ

Nûdem: *Wek tê zanîn, berê Armanc bi du zimanan; bi tirkî û kurdî derdiket. Lê ev demeke dirêj e ku ew tenê bi kurdî derdikeve. Gelo we ji bo çi guhertina vê pêwîstiyê dît?*

M. Elî: Armanc kovareke kurdan bû, ji bo xwendevanên kurd derdiket. Çapbûna wê ya bi kurdî û tirkî belkî ji ber hin zerûretan bû, lê ne tebîî bû. Ya tebîî ew e ji bo kovar an rojnameyekê ku xwendevanên wê bi çi zimanî diaxivin ew jî bi wî zimanî derkeve. Sedemê guhertinê yek jê ev e: me xwest Armanc were ser rewşa xwe ya tebîî.

Sedemê din jî ew berpirsiyarî ye ku rewşa civaka kurdî dixe ser milên ronakbîrên kurdan û çapemeniya kurdî.

Kurd miletekî bindest e. Ji maf û azadiyên xwe bêpar e. Riya avakirina dezgehên civakî ku civakekê dikin milet li ber hatiye girtin. Loma jî ji alî kultur, edebiyat û ramanwerî de Kurdî hîn hema hema dewra berî dîroka nivîskî dijîn. Ji ber vê yekê jî zimanekî yekgirtî yê Kurdî ya nivîskî zêde pêş de neçûye, nekemilî ye. Di demeke wiha de çawa li ser hemû ronakbîr û çapemeniya kurdan her wisa jî li ser Armancê berpirsiyarî bû ku ji bo pêşdeçûna xwendin û nivîsandina Kurdî, avabûna zimanekî yekgirtî yê nivîskî çi ji destan bê bike. Di vî warî de tiştê ku ji destê Armancê dihat, ew bû ku dev ji kurdî û tirkîtiya xwe berde, hemû rûpelên xwe heta ku dikare bi Kurdiyeke sade, durist û rojane dagire da ku kurdên sade bikaribin jê fehm bikin. Hewes û hêviya xwendin û nivîsandina kurdî li ber wan vebe. Bi awayekî gelekî basît Armanc bibe yek ji wan wasiteyên xwendin,

nivîsandin û pêşdexistina zimanê kurdî.

– Di van 10-12 salên dawî de gelek gelek kovar û rojname derketin, lê dîsan hatin girtin, di jiyana çapemeniyê de jiyaneke kurt jiyan. Lê Armanc hê jî berdewam e. Tu dikarî bi kurtî behsa çîroka Armancê ya ji derketina wê û bi vir ve bikî?

– Heke mirov li gorî rewşa dinyayê bifikire, jiyana Armancê ne tu jiyaneke dûr û dirêj e. Lê li gor rewşa me kurdan rast e Armanc yek ji wan kovar û rojnaman e ku bi dijwarî, tahl û tûjî be jî heta îro li ser piyan maye.

Çîroka Armancê jî wek çîrokên kovar û rojnamên kurdan yên din e. Kêm zêde berî panzdeh salan, bi biryardana çend xortên kurd ên dilsoz, fedakar û hêvîpirr dest bi jiyanê kiriye. Pêşiyê bi kurdî û tirkî derdiket. Kovareke siyasî û kulturî bû. Organa Komeleyeke Kurdan bû, lê xeteke siyasî ya partiyeke kurdî ji bo xwe kiribû esas. Gava Darba Leşkerî ya 12 ê Îlona 1980'yî hat rola wê ya siyasî û partîzanî diyartir bû, heta şerê wê bi lihevnekirinên grubî û fraksiyonî gelek êşiya. Carnan ji ber sedemên siyasî an aborî yan teknîkî yan jî bê kadrotî çend mehan li ser hev derneket. Lê demek hat ku, kadroyên Armancê rûniştin, biryara guhertin û riyeke nû ya bi îstîkrar ji bo Armancê girtin. Ji wê rojê vir de Armanc, kêm zêde bi îstîkrar dijî. Her ku diçe gurtir xwe nêzî rojnamegeriya rastîn dike, her ku diçe xwe nuhtir dike.

Yên ku Armancê heta niha jiyandin çend tişt in:

1-Fedekarî û realîstiya xebatkarên Armancê.

Xebatkarên Armancê, ew kesin ku hem li aliyekî bi awayekî kar dikin ji bo domandina jiyana xwe hem jî bê heq, bi dilxwaziya dilê xwe û berpirsiyariya ronakbîriya xwe ji bo derketina Armancê kar dikin. Gelek dijwarî û bêîmkaniyet derdikevin pêşberî şexsê wan bixwe û pêşberî dezgeha Armancê jî lê ew tehamulî van dijwarî û bêîmkaniyan dikin, dev ji muhawela derxistina Armancê bernadin.

Ji aliyê din ve jî realîst in. Di rewşa îro de Armanc dikare bi çi awayî û ji çendê carekê derkeve, wê didin berxwe. Dizanin cîh û rola Armancê di rojnamegeriya Kurdî de li ku ye. Wê ne ji vê piçûktir dixin ne jî mezintir dikin. Ne xwe û ne jî xwendevanên xwe dixapînin.

Sedemê duduyan jî piştgiriya xwendevanên Armancê û xwendevanên Kurd bi giştî ye. Ew bi vî yan wî awayî didin nîşandan ku Armanc ne rojnameyek bêfêde ye, xizmeta ziman, edebiyat û kultura Kurdî dike, jê tê hezkirin. Ev yek piştgiriyeke manewî ya mezin e ji bo xebetkarên Armancê.

Sedemê sisiyan jî ew e ku, ji alî aborî, pisporî û tiştên maddî yên din de çend kêmasî û bêîmkanî hebin jî derketina Armancê ya li Ewrûpayê bivê nevê Îmkana jiyanê li ber hiştiye. Heke li hundirê welêt bûya, ji sedî sed ev îmkan tunebû.

– Rola kovar û rojnameyên kurdî di pêşdexistina ziman û edebiyata kurdî de çi ye? Ew divên di vî warî de çi bikin? Armanc dikare çi bike?

– Rola kovar û rojnameyan di pêşdexistina ziman û edebiyatê de li nik her miletî roleke esasî ye. Lê ji bo Kurdan rojname û kovar hema hema tenha ew wasite ne ku ziman û edebiyata me tê de dijîn Kurdistana Iraqê ne tê de, ji bilî rojname, kovar û çend çapxanên me tu dezgeh û wasiteyên din nînin ku ziman û edebiyata me di warê nivîskî de bijî û pêşkeve.

Di warê zimanî de du berpirsiyariyên esasî li ber ronakbîriya Kurd in. Yek jê, berfirehkirina xwendin, nivîsandin û axaftina Kurdî ye. Ya din jî pêşxistin û dewlemendkirina zimanê nivîskî ye û berbelavkirina vê dewlemendiyê ye di nav xelkê de ku insan karibin di hemû warên jiyana madî û manewî de xwe tam îfade bikin, ji yê îfadekirî tê bigihên.

Helbet rojname û kovar nikarin barê hemû ronakbîriya Kurdî

bigrin ser milên xwe û xwe têxin şûna her tiştî. Lê dikarin bi rola xwe ya kovar û rojnamegeriyê ya rastîn rabin û di vê riyê re muhawela çareserkirina herdu pirsiyarên zanîn bikin. Ji bo wê jî divê berî her tiştî, kovar û bi taybetî jî rojnameyên kurdan bi zimanê kurdî derkevin. Ya duduyan kurdiyeka, durust, rast û gelek sade bikarbînin, bi navê xwerûtiyê ji kurdiyeka, çêkirî ya naylon birevin. Ji bo ku ji alî kurdiyeka mezin a hemwelatiyên xwe bên xwendin, ziman sade bin, xebatkurt, girrwêne û hw.d. bin. Ji bo pêşdexistina ziman û berfirehkirina wî di nav miletî de, dikarin wan wasite û wesîleyên teşwîqkirinê jî (musabeqe, konferans, munazere, pêşanga û h.w.d. amade bikin. Ev tiştên me gotin her ji bo Armancê jî likar in.

– *Xwendevanên we kî ne? Tîraja Armancê çiqas e?*

– Xwendevanên Armancê, ew Kurd in ku dikarin bi elfeba latînî bixwînin û binivîsin. Ji alî meslekî û unsur ve xwendevanên wê gelek têvel in. Heta van salên dawîn kutleya esasî ya xwendevanên me Kurdên welatên Ewrûpa bûn, lê Armanc kêm be jî digihaşt destê hin Kurdên her çar perçên welêt û yên Cumhuriyetên Sovyeta kevin. Îro berfirehtir digihîje destê Kurdên hundirê welêt. Giraniya xwendevanên wê yên dewamîn, ronakbîr û şagirtên medresan yên Kurd in. Lê Armanc yek ji wan (belkî jî tenha) rojname ye ku dikare ji alî hemû kutleyên civakê bi azamî bê xwendin. Loma jî hezkiriyê wê di nav civakê de gelek in.

Tîraja Armancê ne zêde ye. Li gor şertên Ewrûpayê dertê. Li dora 2000 re tê çapkirin. Lê warê belavkirin û hejmara xwendevanên wê bi gelek qatan ji vê zêdetir e.

Rojname û kovarên ku nîvî bi kurdî û nîvî bi tirkî dertên xuya ye, Ji ber zerûretan û bêîmkaniyetan dertên. Lê heta ew xwe bi tevayî nekin kurdî ew nikarin rola xwe ya siyasî û kulturî ya kurdîtiyê bilîzin. Têkoşîna rizgarî û serxwebûnê ji bo me kurdan êdî ne ew e ku bi riyên klasîk, şoreşekê bikin, dijmin ji welatê xwe bavêjin, dewlete-

ka serbixwe avabikin û piştre dezgehên xwe yên kurdîtiyê damezrînin. Em kurd divê ji nihave, di her war û hucreyên civakê de, di şûna dezgeh, wasite û wesîleyên tirkî de yên kurdî avabikin, dezgeh bi dezgeh wasîte bi wasîte, (yanî malik bi malik) xwe rizgar bikin, bi vê rêveçûnê serxwebûna civaka xwe ya rêkxistî bi destxin. A mesela tirkî-kurdîbûn û bi tevayî kurdîbûna rojnamên kurdî jî divê di vê çerçowê de bê fikirîn.

Nûdem, No: 7, 1993

SEKRETERÊ ÇAPEMENIYÊ YÊ KOVARA NEWROZÊ; REMZÎ BÎLGET

Nûdem: *Hûn dikarin Kovara NEWROZ'ê bi me bidin naskirin? We kengî dest bi weşandina wê kiriye, tîraja wê çiqas e, hûn xîtabî kê dikin?*

Newroz: Newroz kovareke konevanî û çandî ya mehî ye. Hejmara wê ya taybetî ya nasandinê di hezîrana 1991'ê de derket. Hejmara yekemîn jî di tebaxa 1991'ê de derket.

Kovara me 10 000 heb tê çap kirin. Firotin net 5000 e. 1000 jê li Ewrûpa tê firotin.

Bêşik ji ber zordestiya dewletê, tîraja me ne bilind e. Tabloya jêr, di derheqa nebilindiya tîraja me de dê fikrekê bide we:

Me bi temamî 7 hejmarên taybetî derxistine. 5 heb hatin berhev kirin û dawekirin. Salnama ku me ji bo sala 1992'an derxistibû hate qedexekirin û hate dawekirin.

Kovara me heta niha bi temamî 18 hejmar derketiye. 14 hejmar tavilê hatin berhev kirin û bû mijara dawan. 2 hejmar bê berhev kirin hatin dawekirin. Tenê du hejmar berhev nebû û dawe li wan venebû. Hera niha li dijî kovara me 33 dawe hatine vekirin. 4 dawe dûmayik bûn. Ji wan dawan çar nivîskar û rêvebirên berpirsiyarên nivîsaran yekun 40 heyv heps û nêzî 650 milyon lîra ceze xwarin.

Vê paşiyê jî, ji bo girtina kovarê du dawe hatin vekirin. Ji ya pêşîn rêvebirê berpirsiyarê nivîsaran yê kovara me Adil Kurt, ji 19'ê tîrmehê virde di hepsxana Bayrampaşa de girtî ye.

Bi kurtî, ji bo kovara me negihîje Kurdistanê û li wir belav nebe û neyê firotin, dewlet bi hemû cûran zordestiyê pêk tîne. Evên han li

ser tîraja kovara me bêşik tesîr dike.

Newroz, di wê baweriyê de ye ku her çiqas ruxiya be jî, ji bo milyonan karker, zehmetkêş û gelên bindest yên têne mêtin, ji sosyalîzmê pêve tu riyek rizgariya rastîn tune ye. Newroz dizane ku "serfiraziya" sîstema kapîtalîst-emperyalîst muweqet e. Kapîtalîzm, ji bo pêşdeçûna civakî, humanîzmê û geşbûyina rastîn astengekî herî mezin e. Kaniya her xerabiyê dikare di kapîtalîzmê de bê dîtin.

Serxwebûn ku piraniya civakê ji bindestiya biyaniyan rizgar bike, lê belê bixe bin destê dîktatoriyek dîmatî, bi wateyek rastînî civak rizgarbûyî nayê berisandin. Bi vê armancê kovara Newroz, bawer dike ku Kurdistaneke serbixwe û demokratîk divê di eynî demê de pişta xwe dabe azadiya rastîn ya karkeran, gundiyên xizan û gelê kedkir. Kovara Newroz xîtabî gelê karker û xebatkar yên dixwaze ku wan li dora ramana serxwebûn û sosyalîzmê bi rêkxistin bike, dike. Rizgariya çîna karker bi gelemperî bi rizgariya civakî, bi rizgariya neteweyî dê gengaz bibe. Ji ber vê yekê kovara Newroz, li ser navê çîna karker û gelê kedkir, xîtabî hemû netewê kurd dike.

– Wek piraniya kovar û rojnameyên kurdan yên ku li Tirkiyê derdikevin, Newroz jî bi du zimanan; bi tirkî-kurdî derdikeve. Ji bo çi ?

– Newroz di bingehê xwe de kovareke konevanî ye. Ji konevaniyê re, nîsbeten zimanekî pêşdeçûyî divê. Piraniya gel li alîkî, di cehwara rewşenbîrên me de jî, ji 300-400 bêjan bêtir tunin. Bi ewqas bêjan ne gengaz e ku mirov konevaniyê ragihîne gel, ew li alîkî, mirov nikare bigihîne rewşenbîran jî. Evên han rastîniya me ye û heta neyê guhartin jî dê wiha bidome.

Di nava armanca me de, guhertina vî tiştî jixwe cih digre. Ji bo zimanê kurdî bibe zimanekî konevanî, zanistî û felsefî; perwerde, çand, xîret û dem divê. Ev jî encax tedrîcen dê pêk were.

– Ziman û edebiyata kurdî li Tirkiyê di çi rewşê de ye? Hûn pêşeroja ziman û edebiyata kurdî çawa dibînin? Ji bo başkirin û bipêşde-

xistina wan planên we çi ne?

– Xebata di derbarê wêje û ziman de belav bûyî ye. Xebatên kesîtî ji ber bêderfetên daringî nayên nirxandin.

Di vê gehînekê de, xebateke kurdî, ji bo xwediyê xwe dibe kulfetekî daringî. Banekiya xwendinê ya gelê me tune ye. Divê mirov jiparremayina zimanê kurdî û zordestiya dewletê jî bîne ber çavan. Ji ber van sedeman firotina berhemeke kurdî ji 300-400 hebî derbas nabe. Di bin van mercan de, ji çapkirina berhemên kurdî re, fedekariyeke kesîtî û mezringeyî divê. Ji bo kesan rewşeke teşwîqî jî tune ye.

Ferheng, rêziman û rastnivîsek ku her kes li ser tifaq bike tune ye. Yên ku hene jî ji alî her kesî ve nayê pejirandin, an jî baş nehatine geşkirin. Niha her kes çawa dizanin wisa dinivîsin. Weke ku hûn jî dizanin li ser tîpan, heta li ser dengan jî lihevhatinek nîne. Gengaşiya li ser alfabeyek standart hê jî berdewam dibe.

Pêşeroja wêje û ziman bi çarenûsa gelê kurd ve girêdayî ye. Li gorî xurtbûna têkoşîna netewî, zêdebûna baweriya bi rizgariyê û paşê sewiya nêzhatina serxwebûnê dê geşbûnî bibin.

Em dibînin ku çarenûsa gelê kurd hêdî hêdî diguhere. Destyariya ku ji têkoşînê re heye, baweriya bi rizgariyê, beşdariya têkoşîna azadiyê roj bi roj zêde dibe. Ev rewş, bivê nevê bandûra xwe di alî wêje û ziman de jî dide xuyakirin. Hêdî hêdî hîmên mezringan yên netewî têne avêtin ku ew jî xwe ji bo çapkirin, belavkirin û firotina berhemên wêje û ziman amade dikin. Li ser hin pirsgirêkên ziman, bi beşdariyek fireh civîn pêk tên. Pirsgirêk çiqas giran bin jî, ji bo pêşeroja wêje û zimanê kurdî em xweşbîn in. Heta li gorî deh sal berê, gelek kes bawer dikin ku em niha ronesansekê dijîn. Ji bo vê yekê maf û sedemên me yên objektîf hene. Lê belê ji ber ku navend ne azad e, di vê derbarê de, xebata ku niha li Ewrûpa dibe, ji ya li welêt bi pêşdetir e.

Em piştdidin xebata ji bo pêşdeçûna ziman, huner û wêjeyê. Di vê mijarê de çi ji destê me tê em dikin. Kovara Newroz, her çiqas bi giranî kovareke konevanî be jî, dîsa cih dide helbest, şano û çîrokên kurdî. Helbestvan, wêjevan û hunermendan destek dike. Ku derfet dest bide, dixwaze kovareke seranser ya wêjeyî, hunermendî jî çap bike, an jî ji kovareke wiha re bibe alîkar. Kovara Newrozê van mijaran raserî partiyan dibîne. Ango naxwaze van mijaran raste rast di bin bandûr û siya partiyan kin. Em wer diramin ku xebata ji bo çand, wêje, ziman û hunermendî ku di binê dagera konevaniyê de ye, ne pêşveçûn ne jî afrendêrî pêk nayê.

Em rûmetê didin hemû xebata di derbarê ziman, wêje û hunermendiyê û ji bo alîkariyê em amadekariya xwe diyar dikin.

Ji bo vê hevpeyvînê em gelek spas dikin. Em serketina we dixwazin.

Nûdem, No: 7, 1993

XWEDÎ BERPIRSIYARÊ AZADÎ; ÎKRAMETTÎN OĞUZ

Nûdem: *Weke pirraniya kovar û rojnameyên kurdan, rojnameya we jî nêvî bi tirkî û nêvî bi kurdî derdikeve. Ev ji tradisyoneke kevin ya çapemaniya kurdan li Tirkiyê bi pêş dikeve. Sedemên vê yekê çi ne? Ji bo çi hûn dixwazin vê tradisyonê bidomînin?*

Îkramettin Oguz: Her çapemeniyek xwedî komek xwendevan e. Sedema vê yekê pêwîst e çapemenî li gor hewceyî û çaverêniya xwendevanan bi çelengî kar û barê xwe sererast bike. Koma xwendevanan bi kîjan zimanî baştir mesajan bigire, pêwîst e bi wî zimanî gazî lê bê kirin. Lewra weşanên siyasî her yek armancek xwe heye. Ger bi weşanê mesaja ku rojname dixwaze rabigêne, sedemên ziman negêje armancê, dikarin bêjin ku rojname jî nagêje armanca xwe.

Di vir da dijraberiyek tê xuya. Rojnama kurdan divê bi kurdî be, bes mixabe ku kurd bi xwe nikarin baş kurdiyê bixwînin, yan binivîsînin. Ev rewş li ser rêya çapxaneyên kurdî astengek mezin e.

Ji ber vê yekê îro, sedem ku rojname bikaribe li gel xwendevanan pêwendiyên xwe bidomîne, bivê-nevê lazim e di nav rûpelên xwe da cî bide zimanê tirkî jî. Lewra heftê sal zêdetir e ku Komara Tirkiyê bi siyaseta pişaftin (asîmîlasyon) û înkarê, xwestiye hebûna ziman, çand û edebiyata kurdî bihelîne, zimanê kurdî bide jibîrkirin. Hewce ye bêjin ku ev siyaset îro gelek serketî jî bûye, lewra kurd ji ruhiyeta millî û ziman, gelek dûr ketine. Ziman tenê di warê xeberdanê da û zêdetir li gundan û li nav malê bi kar tê. Tîpên cuda yên alfaba kurdî, ji gelek kurdan ra nenas in. Ger îro, kitêb û kovar û

rojnameyên xwerû bi kurdî kêm têne firotin, ev ne ji kêmasiya wan e, lê ji nezaniya ziman e.

Lewra îro du wezîfe li pêşiya weşanên kurdî hene. Wezîfa yekem ew e ku di warê maf û berjewendiyên millî û demokratîk da, hewl bidin ku rojek zûtir gel rizgar bibe, herwiha baştirîn û zûtirîn gel hişyar bike û millet bi rê bixe. Îro di misogeriya rojê da ev rê zimanê tirkî dide pêş.

Wezîfa duduyan jî ew e ku di warê ajdana ziman û edebiyata kurdî da xebatek da ku millet ji nû va fêrî xwendin û nivîsandina zimanê kurdî bibe, xwedî li çand, huner û edebiyata xwe derkeve, berhemên netewî biparêze. Ger wezîfa duduyan bi başî were cî, wê demê rêya weşanan xweştir dibe, di rûpelan da beşê kurdî roj bi roj zêdetir dibe, weşan dikare bi bernameyek baş xwe bi temamî vegerîne ser zimanê kurdî.

Diyar e xwestina dil û rewşa jiyanê her tim ne wekî hev in. Mirovên welathiz mumkun e bixwazin ku xwerû bi zimanê kurdî di hemû warê jiyanê da kar bikin. Baştirîn tişt ev e. Lê gelo ev rê wê çiqas serketî bibe, wê millet bikaribe bi başî ji weşanê kelk wergire? Di mercên îro da, ku kurd û tirk teklihev dijîn û di nav hev da belav bûne, ma ne hewce ye ku kurdên ku xwe "tirk" hisab dikin, ew jî li doza xwe xwedî derkevin û pirsa kurdî li dor berê xwe munaqeşe bikin?...

– Îro hindik be jî li Tirkiyeyê bal û meylek li ser ziman û edebiyata kurdî heye. Kovarek mehane, rojnameyek heftane ya xwerû bi kurdî û gelek kovar û rojnameyên bi kurdî/tirkî derdikevin. Gelo bi hevkariyek di navbera van kovar û rojnameyan de, derxistina rojnameyeke rojane ya xwerû bi kurdî li Tirkiyê ne mumkun e? Hûn ji xebateke wilo re çi dibêjin?

– Îro li Tirkiyê, kurdî-tirkî, yan jî xwerû bi kurdî gelek kovar û rojname çap dibin. Kovarek mehane û rojnameyek hefteyî xwerû bi

kurdî ne. Lê ewên din bi kurdî-tirkî çap dibin. Her yek ji wan fonksiyonek xweser bi cî tînin. Îro zirûfên rojnameyek rojane ku bi temamî bi kurdî be, mixabe tune ye. Lewra koma xwendevanên kurd îro nikare barê rojnameyek wiha hilgire û rojnameyê li pê ragire.

Wekî din rojnameyek rojane valahiya kovar û rojnameyên hefteyî a mehane bi temamî tijî nake. Mesaj û miqale, lêkolîn û şiroveyên siyasî, rojnameyê ji aktualîteyê dûr dixe. Lê pêwîst e bêjin bê guman karekî wiha di warê çand û ziman da feydeyek berçav dixe dest. Lê dibe ku armancên siyasî bi başî negêjin raya giştî. Dîsan jî lazim e weşanxaneyên kurd bi hevkariyek dirêj xayên cehd bikin ku rojnameyek xwerû kurdî û seranserî derxin. Ev karekî gelekî baş e. Him zimanê kurdî pêş dikeve, him jî ruhê hevkariyê geş dike. Karekî wiha, dibe gavek baş di rêya yekîtiya gelê kurd da. Xebatek wiha di gel xwe sazûmanên millî jî pêk tûne. Sazûmanên çandî, ziman, wêje û hunerî yên millî îro gelek pêwîst in. Tenê bi riya sazûmanên wiha doza kurdayetî bi berçavî pêş dikeve û ziman perwerde dibe. Em hazir in ku di karekî wiha de bixebitin. Her çend rewş pir xweş nebe jî, lê dîsan eger xebatek baş hebe, mirov dikare rojnameyek aktuel derxîne. Ne şert e ku di destpêkê da rojane be. Lê 15 rojî, yan jî hefteyî dest pê bike, bere-bere bibe rojane. Lê dil dixwaze ku karek wiha bi hevkariya hemû çapxaneyên kurd pêk were.

– Gelo em dikarin îro behsa rojnamevaniyeke kurdî ya profesyonelî bikin? Profesyonalîzm li ba we çawa ye?

– Mixabe ku, rojnamevaniya kurdî îro ne bi tehrekî profesyonelî ye. Heta ez dikarim bêjim ku şertên rojnamevaniya profesyonelî jî îro hê peyda nebûne. Îro çapkariya li Tirkiyê zêdetir di warê kitêb û kovaran da pêşda çûye. Xuya ye, kitêb û kovar derxistin ne wekî rojname derxistinê ye. Kovar jî zêdetir siyasî bûne. Ango weşanek pirreng, pirdeng û piralî hetanî niha derneketiye. Kovarê siyasî, yan çandî ne bi profesyonelî der çûne. Dîsan jî dikarim bêjim ku di warê

kovaran da tecrubeyek berçav civiya ye, lê ji bo rojnamevaniyê îmkanekî wiha tune ye.

Wekî din jî, baş tê zanîn ku, profesyonelî hewceyî lêzanîn û pisporiyê ye û perwedebûnek jê ra divê. Lê hemû ciyê cîhanê şert û zirûfên profesyonaliyê kivş in. Em ji ber xwe va nikarin şertên nû damezrînin. Rojnameya kurd, divê, xeberbêjiyek rast li pêş xwe bigire, ji bo zanebûna civakî bixebite, bûyerên welat bi zûyî û rast bigêjîne raya gîştî.

– Hûn rewşa ziman û edebiyata kurdî li Tirkiyê çawa dibînin? Çi ji pêşeroja wan dikeve serê we?

– Îro di warê ziman û edebiyata kurdî da xebat heye, lê ne bes e. Lê lazim e bêjin çend problem jî îro çaverêyê çareserkirinê ne. Wekî rastnivîsîn, rêziman û alfabeyê da problem hene. Ji ber ku sazûmanek gîştî û bawerpêkirî di warê rêzimana kurdî da tune ye, teklihevî têne pêş. Serkirdayetiyek millî, çavederiyek zanyarî hewce ye. Ev kêmasî hînbûna ziman bi paşve dixe, hewesa millet dişkêne. Lewra her weşanek bi gora baweriya xwe, yan jî zanîna xwe li ziman xwedî derdikeve. Lê ya rast çi ye, kî ye, ev ne xuya ye. Lewra otorîteyê baş tune ye ku herkes pirs û pîvana xwe bi gora wê safî bike. Di nav kurdên Tirkiyê da jimara xwenda û nivîskaran gelekî kêm e. Yên ku hene ew jî dema temaşe dikin ku, ziman her yek e lê alfabe û rastnivîsîn cuda ye, vêca dimînin di navberê da. Gelo kîjan rast e, kîjan baş e... Xwestina wan bersivê nabîne. Lazim e ferheng, alfabe, rêziman û kitêbên zanîn û hînbûnê zêdetir çap bibin, ziman û alfabeyên wan hev bigre. Dersxaneyên ziman û semînerên fêrbûnê çê bin. Sazûmanên millî, wekî weqf û enstîtu û komelên kurd jî alîkariya vê xebatê bikin. Wê demê ziman û edebiyata kurdî bê guman dikeve ser riya pêşveçûyinê. Xebatek wiha seranserî dibe sedemê ajdan û perwerdekariya çand û zimanê kurdî. Rojek zûtir divê kurd cehd bikin ku di vî warî da gavê girîng bêne avêtin.

Lê, di gel van hemî kêmasî û probleman, dîsan ez dikarim bêjim ku îro li ser pêşdabirina ziman û edebiyata kurdî xebatek heye û roj bi roj geş dibe. Dil dixwaze ku, pêşdabirina ziman û edebiyatê bi hevkariya hemû hêzên millî ber bi pêş here, lewra ev kar ne wezîfa grûbekê ye, lê wezîfa hemû kes û grûbên kurd e. Hêvîdar im ku yekîtiyek netewî çêbe û agadarî li pêşketina ziman û edebiyatê jî bike. Rewş ber bi başiyê ve diçe.

Nûdem, No: 7, 1993

BERPIRSIYARÊ GIŞTÎ YÊ NÛBIHARÊ; SABAH KARA

Nûdem: *Fikra derxistina kovareke îslamî ya xwerû bi kurdî çawan bi we re çê bû? Ji bo çi we pêwîstiya kovareke bi vî celebi dît?*

Sabah Kara: Berî her tiştî gereke ez nîşan bidim ku ji mefhûma "kovara îslamî" ez çi tiştî fehim dikim.

Bi baweriya min gereke kovar xwe zencîr nekin, xwe bi îdeolojiyekê bi tenê girê nedin. Kovar gereke cihê munaqeşe, kêşîn, diyarkirin û helsengandina her cure raman û îdeolojiyan bin. Yan kêm î kêm, gereke deriyê xwe bi rûyê tu raman û pêşniyarî ve negrin, tim li hîkmet û heq û xweşiyê bigerin û heqiyê li kûderê bibînin, gereke qebûl û tecrîh bikin.

Ji aliyê din, ela kullî hal, her kes li derekê ye û ji derekê dest pê dike. Meriv nikare di hengamekê de li çend cihan be.

Ez naxwazim vê behsê dirêj bikim...

Naxwe diyar e ku ji aliyê ewil, ez ji mefhûma "kovara îslamî" hez nakim. Lêbelê ji aliyê din ve, ev mefhûm pêwîstiyek e. Lewra em li vir in û em ji vir ve dest pê dikin...

Yanê mefhûma "kovara îslamî" li cem min bi hîç wechî naye maneya berçavika filan an bêvan rengî...

Ev mefhûm, bi tenê cihê me nîşan dide; îhtirama me bi bawerî, çand û adetên gelê me nîşan dide.

Naxwe piştî ku îslambûna kovara me bi vî şiklî hate diyarkirin, gereke ez li ber vê pirsiyara we, li ser vê yekê bisekinim ku fikra derxistina kovareke xwerû bi kurdî çawa bi me re çê bû?

Weke ku min di sernivîsara hejmara heştan a Nûbiharê de jî gotiye, axaftin, xwendin û nivîsîna bi zimanê zikmakî, ji her mirovî re pêwîstiyek e devjênayêberdan e.

Çawa ku dar bê kok nabin û li ser kokên xwe hêşin dibin, mirov jî nikarin bê ziman bin û ew jî li ser zimanê xwe şîn tên. Erê; peywendiya dar û kok çi be, peywendiya ziman û mirov jî ew e. Çawa dara bê kok nikare şîn bibe, mirov an gelê bê ziman jî nikare bi pêş de bikeve û di cihê xwe de pûç dibe. Lewra meriv bi ziman "difikire". Her çi beriya ziman, qeweta fikrê bi şiklê "bilquwwe" di nefsa meriv de mewcûd be jî, pêkhatin û derhatina fikir, bi sayeta ziman e. Naxwe em karin bibêjin ku zimanê meriv çiqas qewî be, fikra meriv jî ewqas qewî dibe.

"Mana" bi sayeta ziman têtе wucûdê. "Çibûn" û "çawabûn" a her tiştî bi sayeta ziman têtе famkirin û îdrak dibe û cardin bi sayeta ziman têtе famdan û îdrakdan.

Ziman ji cîheta nijadî, irsî, enanetî û tarîxî jî pir muhîm e. Nijad, berî her tiştî, ji cîheta ziman ji hevûdu cuda dibin. Lewra xusûsiyeta eslî ya her nijadî, zimanê wî nijadî ye.

Ziman, di mêjiyê her şexsî de weke dews, şop û rêçê ye û ev dews, şop û rêç, wî şexsî bi hevnijadiyên wî yê berê û yê îroyîn ve girêdide. Loma dibe bête gotin ku ferqa di nav însan, civak û çandên curbecur de, ferqa zimanên wan ên curbecur e. Yanê jihevcudabûna zimanan, însan û civak û çandan ji hevûdu cuda dike.

Ma eger Aristo ne yunanî, lê çînî bûya, wê bikaribûya felsefa xwe pêk bîne? Yan Mewlana eger ne parsî, lê meselen bi tirkî nivîsandibûya, ma wê bikarîbûya Mesnewî biafirîne? Ma kes kare Qur'ana Mecîd a ne bi erebî bîne ber çavê xwe?

Ez naxwazim behsê duvdirêj bikim û qala wergêrê û mumkin nebûna wergêra mutleq ji tu zimanî, bînim holê...

Ji aliyê din, gereke em li ser vê yekê jî bisekinin ku Xweda çima di

Qur'anê de diferme ku: "Afirandina azmanan û erdê û curbecurbûna ziman û rengên we, ji ayetên Wî (:Xweda) ne. Bê şik, di vê yekê de ji zaneyan re delîlin hene," (Sûreta Rûm/30:22)

Gereke em dîhna xwe bidinê ku di vê ayetê de, afirandina ziman û rengan, yanê mirovên ji rengên curbecur; bi afirandina azman û erdê ve pevre zikir dibin.

Naxwe piştî van hemû îzahan, ma tu lizûm dimîne ku ez bibêjim, fikra derxistina kovareke xwetû bi kurdî çawa bi me re çêbû?

Em kurd in û kurd gereke berî hemû zimanan, bi zimanê xwe biaxivin, bixwînin û binivîsin. Eger em dixwazin li ser piyê xwe bêpayende bisekinin, tu rêke din li ber me tuneye.

Kovara me li ber çava ye. Ev celeb kovar baş e, nebaş e? Di vê babetê de ez naxwazim tiştekî bibêjim. Ya ku ez karim bibêjim ev e ku di van şertan de tiştên ku ji destê me têt, ev e.

– Zehmetiyên sereke yên derxistina kovareke xwerû bi kurdî li Tirkiyê çi ne? Astengiyên çilo derketin pêşiya we?

– Weke ku hun zanin, weşandina kovarekê bi xwe, zehmeteke pir mezin e. Kovar bi çi zimanî be wisa ye. Lê bi ser de, em kovara xwe xwerû bi kurdî diweşînin. Êdî her kes wê bizanibe ku karê me çiqas bi zehmet e. Lêbelê zehmetiyên sereke yên derxistina kovarê, ne ev tenê ne. Li aliyê din, xwendevanê me jî pir di haleke nacurî de ne. Kurdên Kurdisrana bakur ên ku em xîtabî wan dikin, ev zemankî pir dirêj e ku ji xwendin û nivîsandinê bi dûr in. Hê ne hazir in ku bikaribin têra xwe kovar û kitêbên bi zimanê xwe bixwînin. Çand û zanîna vê mintiqê bi gotin û bihîstinê ve girêdayî maye. Gelê me, gotin û kelîmeyên ku dizane jî, hê têra xwe ne amedeye ku ji sembol û herfan bixwîne. Di mintiqa me de "nivîs" a bi zimanê kurdî tiştekî pir nû ye. Yanê em hê di destpêka kar de ne û weke gelek karan, destpêka vî karî jî bi zehmetiyan ve tijî ye. Lêbelê lazim bû ku me ji derekê ve dest bi vî karî bikira û me kir. Roj bi roj em bi pêş

ve jî dikevin.

Du zehmetiyên herî mezin li ber me ne. Em ji alîkî dinivîsin û ji aliyê din ve jî xwendevanên xwe çêdikin, xwendevanên xwe ji cîheta axaftin û xwendin û nivîsandinê ve bi pêş de dibin. Lê astengî pir in. Dev ji kêmasî û bêîmkaniyên me biqerin, asteng û maniên herî mezin jî li ber me hene. Astengiya herî mezin jî, ev dewleta ceberrût e. Hinin ji mirovên me ditirsin ku bibin abone û kovar û sayir weşanên xwe bixwînin. Îro di bin vê dewleta ceberrût de weşanên tirkî jî bi hêsanî nikarin werin xwendin. Ev dewleta ceberrût li kitêb û sayir weşanan weke dijmin dinihêre. Kitêb û sayir weşanên mewqûf û zencîrkirî, di nav çekên mewqûf û girtî de teşhîr dikin û vî karê necîs ê xwe mîna îftîxarekê ji televizyonan diweşînin û nîşan didin. Hema ji her mehekê du mehan, bihayê kaxizan giran dikin. Wextê ku halê weşanên tirkî wisa be, êdî halê weşanên kurdî, hun bifikirin.

– Hûn xîtabê kê dikin? Xwendevanên we kî ne? Tîraja we çiqas e?

– Em dixwazin xîtabî hemû kurdan bikin. Em dixwazin hemû xwendevanên kurd, xwendevanên me jî bin. Em yên ku niha Nûbihar naxwînin jî xwendevanên sibe yê xwe dihesibînin. Lêbelê piraniya xwendevanên me yên niha, dînparêzên kurd in.

Me heta niha Nûbihar di nav 5.000 û 2.500 hebî de çap kiriye. Hejmarên me yên ewil 5.000 hatine çapkirin. Heta hejmara heştan, Nûbihar dighêje destê dor 2.500 xwendevanî. Lê tadada xwendevanên me ber bi pêş ve diçe. Ji aliyê din, li gor malûmata ku dighêje destê me, cihê ku kovarek me diçiyê de, kovar ji terefê gelek xwendevanan ve tête xwendin. Lê cardin jî em vê tadadê pir kêm dibînin. Hedefa me, di merhala ewil de 5.000, di merhala hinek dirêjtir de jî 10.000 xwendevan e.

– Rewşa weşan û çapemaniya kurdî li Tirkiyê çawa ye? Çi ji pêşeroja wê dikeve serê we?

– Ev pirsiyara we bi pirsiyara diduya ve girêdayî ye. Min li wira tiştin di heqê vê pirsê de zikir kirin. Lê meriv çiqas behs bike, cardin jî ev pirs naqede.

Rewşa weşan û çapemaniya kurdî li Tirkiyê, hê di halê zaroktiya xwe de ye. Lêbelê diyar e ku ev zarok pir bi hêz e. Naxwe heqê me heye ku em ji hatiya xwe umêddar bin.

Ez van cûr xebatan mîna bizir dibînim.

Darin hene di nava latan de şîn tên. Ba, bizrê wan biriye êxistiyê di nava latekê de û ew dar di wir de şîn hatine.

Wextê ku ez li ser çapemaniya kurdî li Tirkiyê difikirim, ew dar têne bîra min.

Ez umêddar im ku eger ev ax be, lê lat jî be, wê ev dara mazlûmiyetê, wê ev dara tûba, şîn were.

Ma wê çima şîn neyê?

Va ye ev ziman, şikir ji Xweda re ku êdî ne bêxwedî ye. Ev dar di nav cesedên bimbarek ên mazlûmên dîrokê de hatiye çandin û xwîna mazlûman weke baran û rehmetê bi ser de dibare.

Eger şîn neyê, bila dîrok fihêt bike.

Erê maniên pir û çetîn li ber me ne. Lê êdî ronahî, sînga tarîtiyê qelaştiye. Xwîn bi ser şûr de niqutiye û şûrê zaliman rizandiye.

Weke ku min got, asteng pir in.

Astengên nivîsandinê li ber me ne, yên belavkirinê li ber me ne, yên xwendinê li ber me ne.

Xusûsên belavkirinê...

Gerek ez vê yekê bibêjim, cihê ku em kovarê dişîninê ne pir zêde ne. Yanê hê kovara me neçûye gelek cihên ku kurd tê de dijîn. Naxwe wextê em bikaribin kovarê qenc belav bikin, ez bawer im ku em ê bi zûyî bigihêjin 10.000'an.

Yanê pêşeroja me rohnî xwiya dike. Em umêddar in. Ne mumkin e ku tu giya di bin kevir de bimîne. *Nûdem, No: 7, 1993*

CUMHÛRIYETA KURDÎ YA MEHABADÊ

Cihekî bajarê Mehabadê yê taybetî di dilê me de heye. Ew di nava kurdên her çar perçeyên welêt de tê naskirin û hezkirin û ji bo ku ew di nava nivşê nûhatî û nûgihiştî de neyê jibîrkirin, navê wê li zarokan tê kirin.

Berî ku ewrekî reş yê şînê bi ser vî bajarî de bigire, di 22'ê çileyê paşîn 1946'an de, Xwedê li vî bajarî tê rehmê, ji piştçiyan rojeke bêhawe xweş bilind dibe, bi germî û tîrêjên xwe zivistana sar û dijwar bi dûr dixe, di şûna wê de bihareke geş tûne. Gava xelkê Mehabadê, ji bo xweamadekirina roja pîroz sibehê zû radibin ser xwe û çav li wê roja xweş dikevin, dilê wan geş dibe, kêfa wan difûre û ji bo wê roja xweş ya pîroz ji Xwedayê xwe duan dikin. Her ku roj bilind dibe Mehabadî dikevin tevgerê, keçên Mehbadiyan, yên ku bi spehîbûna xwe navdar in, cil û bergên bi reng, bi ser bejnên xwe yên zirav û bilind de berdidin, çavên xwe yên mezin, bi kilên Suphanî kil dikin, mîna ku ew ê herin dîlanekê û li wê dîlanê pêrgî hezkiriyên di xeyalên xwe de werin, xwe li ba dikin û bi geşî dadikevin meydana Çarçirayê. Pîr û jin jî cil û bergên xwe yên kevin davêjin, derd, kul, êş û elemên malbat û eşîrê ji bîr dikin, xwe mîna bûkên nûzewicî dixemilînin û bi zar û zêçên xwe, di kuçeyên Mehabadê yên zîvironekî de tevlî pêla keçên ciwan dibin û xwe berdidin Meydana Çarçirayê. Xort û peyayên Mehabadî yên bejinbilind, şal û şapikên xwe bi ser bejnên xwe de berdidin, piştên kesk, sor û zer li piştên xwe girêdidin, bi coş û heyecan xwe di kuçe û kolanan re berdidin Meydana Çarçirayê. Wê rojê, li Mehabadê tu kes di hun-

duran de namînin. Meydana Çarçirayê dibe mîna deryayeke bi reng, tevgera mirovan mîna pêlên deryayê dibin. Wê roja xweş, ya ku biharê ji zivistanê dizîbû, bajarê Mehabadê kiribû mîna seyrangehekê. Li wê meydana ku gelê kurd hem xweşî hem jî dilêşiyê jiyaye, te ax biavêta li erdê nediket. Ew qerebalixa geş, bi kincên bi reng, bi rûyên bi ken û bi heyecan li benda peyayekî bûn. Ew ê peyayek bihata, ji wan re bipeyiviya û mizgîna azadiya wan bigihanda wan. Wî ê ji wan re behsa girîngiya wê roja pîroz bikira. Û ew peyayê ku ew li bende bûn, di nava çend peyayên din de, bi bejna xwe ya bilind û bi cubeyê xwe yê fireh bi jor ket, çû ber maseyeke dirêj û li pişt masê li ser lingan rawestiya. Ew peya Qadî Mehemed bû. Wî demekê bi dilekî geş çavên xwe li ser wê qerebalixa mirovan gerand, hîsên wî yên neteweyî bilind bûn, kêf û heyecana wî fûriya û bi dengekî nizim û giran dest bi peyva xwe kir: "Gelê kurd, gelekî serbixwe ye, divê li ser axa xwe, bi azadî bijî, qedera xwe bi xwe rayin bike, loma îro ez du huzûra we de Cumhûriyeta Kurdî ya Mehabadê îlan dikim".

Pêla mirovan diheje, keç û jin dilîlînin, mêr tivingan ber bi hewa ve berdidin. Coşî û geşiyek dikeve nava wan mirovan, bang dikin, diqîrin, destmalên bi reng li ba dikin...

Di îlankirina Cumhûriyeta Mehabadê de piraniya axa û serokeşîrên kurd jî beşdar dibin. Serok û nûnerên eşîrên mîna; Mahabad, Mameş, Mingûr, Kevork, Zerza, Herkî, Beyzade, Barzan û hwd...

Qadî Mehemed zêde napeyive. Ew di wê kurtepeyivandina xwe de ji bilî îlankirina Cumhûriyetê, ji kurdan re behsa yekîtî, hevkarî û miletbûna kurdan dike. Hêviya wan ya çilmisî geş dike. Paşê dadikeve jêr, cubeyê xwe yê fireh ji xwe dike, bi tena unîformayekî Sovyetî û şaşika xwe ya spî dimîne.

Lê xelkên Mehabadê wê roja han mîna karnevalekê pîroz dikin, dehol û zurnevanên bajêr lêdixin, Mehabadî jî bi destên hev digirin

û direqisin.

Hema piştî îlankirina Cûmhûriyetê, di bin serokatiya Qadî Mehemed de serokeşîr û pêşevanên kurdan li hev dicivin û bi alîkariya Sovyetiyan hukûmetekê ava dikin. Qadî Mehemed dibe serokcumhûrê vê hukûmetê û wezîrtî û serokwezîrtî jî di navbera pêşevanên kurd yên din de têne belavkirin.

Cumhûriyeta Mehabadê di dîroka Kurdistanê ya nêzîk de yek ji bûyerên herî girîng e. Civateke feodalî, ku hê nenasê kapîtalîzmê û îndustriyê bû, hêdî hêdî ber bi bajarvaniyê ve gavan diavêje, bi alîkariya Sovyetiyan Cumhûriyeteke nûdem pêk tê, ji bo liserlingan mayina Cumhûriyetê artêşek tê avakirin, lê belê li gorî artêşê welatên dorhêlê artêşeke qels, bi sîlehin sivik ku ji Sovyetê tê şandin. Lê belê dîsan jî, serok û birêvebirên Cumhûriyetê bi enerjî û baweriyeke xurt ji bo Cumhûriyeta xwe dixebitin, dixwazin ji civaka eşîrtî bi dûr bikevin, elemanên xwe hînî ajotina otomobîlan, hînî şer û xweparastinên modern dikin, ji bo pêşdexistina civaka xwe, xwendevanên xwe ji bo xwendina dibistanên bilind dişînin Sovyetê. Herweha bi çapxaneya ku Sovyetî dide wan, pê rojnameya xwe ya rojane *Kurdistan*, kovarên mîna *Hawar, Agir, Hîlale* û hwd. derdixin, pirtûkên dersan yên bi kurdî çap dikin û dibistanên kurdî vedikin. Bi weşandina kovar û rojnameyên bi kurdî bal û meyleke baş ji ziman û edebiyata kurdî re çêdibe, cih bi cih navên hin şaîr û nivîskaran tê bihîstin. Yek ji şaîrên wê demê Hejar e. Hingî mamosta Hejar ji bo marşa Cumhûriyetê bi zaravayê soranî helbestekê dinivîsîne û ew helbest bi alet û awazekî nûjen tê gotin.

Cumhûriyeta Kurdî ya Mehabadê ji bo hemû kurdan dibe hêviyek, loma Barzanî digel hêzeke xurt ya çekdar berê xwe dide Mehabadê û li wir û der û dora wir bi cih dibe, dixwaze ji avakirina Cuhûriyetê re bibe piştgir û alîkar.

Digel ku temenê Cumhûriyeta kurdî ya Mehabadê gelekî kurt e

jî, dîsan em dibînin ku kurdên me yên ku qet tradisyoneke wan ya dewletbûn an dîplomasiyê tune bû, dîsan ew zû adapte dibin, di wê kurtedemê de gelek danûstandinên dîplomatîk datînin. Lê mixabin ku danûstandinên wan yên dîplomatîk jî di hundurê sînorên Îranê de dimînin. Ji ber ku tiştê em dizanin danûstanên wan bi dinyaya derve re qet çênebûye. Ji xwe ger danûstandinek bi dinyaya derve re hebûya û dinyaya derve an yekîtiya neteweyan Cumhûriyeta wan bipejirandina, ew ê ji bo hilweşandina Cumhûriyeta Mehabadê nebûna alîkar.

Kurdên Îranê saleke bi hêvî buhurandin û ji bo ku ew jî êdî sermiyanê xwe bûn, wan xwe gelekî serbilind û bi rûmet hîs dikirin. Lê belê hêdî hêdî hêviya wan diqurmiçî, kêf û şahiya wan di qirika wan de dima, her ku diçû cih li wan teng dibû. Li gorî peymana Îngilîz û Sovyetiyan û li gorî biryara yekîtiya neteweyan, diviyabû Sovyet di demeke kurt de ji Îranê derketa. Ji Îranê derketina Sovyetê dibe dawîhatina Cumhûriyeta kurdî ya Mehabadê. Piştî bipaşdevekşandina Sovyetê ya ji Îranê bi demeke kurt, Cumhûriyeta Azerbeycanê hildiweşe û paşê jî Faris berê xwe didine Kurdistanê.

Qadî Mehemed, birayê wî Sadrî Qadî û pismamê wî Seyfî Qadî, 31'ê adara 1947'an, saet sisê sibehê ji mal têne derxistin û berê wan didine Meydana Çarçirayê. Bajar kerr e, xelkê bajêr di xew de ne, Qadî Mehemed, bira û pismamê xwe li Meydana Çarçirayê, di bêdengî û kerrîtiya şevê de, bi sêpiyên cihê cihê ve têne daliqandin. Laşên wan yên pak, ji hemû xerabî û kirêtiyan dûr, di hênkahiya sibeha adarê de li ba dibin. Dawiya çîroka Cumhûriyeta kurdî ya Mehabadê tê.

Nûdem, No: 9, 1994

HESENÊ QAZÎ:
"QAZÎ MIHEMED Û HEVALÊN XWE ŞEREFA SERBIXWEYIYA BIRYARA KURDAN PARASTIN"

Nûdem: *Tu dikarî bi kurtî behsa avakirin û sedemên hilweşandina komara Mehabadê biki?*

Hesenê Qazî: Berî ku ez bersivên pirsyarên we bidim, ez dixwazim spasî we bikim, ku hûn bi munasebeta 48 saliya vê bûyera mezin di dîroka me de, di kovara xwe de bîranîna wê dikin.

Yekem tiştê ez bibêjim ev e, ku navlêkirina "Dewleta Cumhûriyê Kurdistan" bi "Komara Mehabad" ne rast e, çunkû avabûn û tesîra vê Komarê tenê li bajarê Mehabadê û dor û berê wê nebû ye, belkû beşeke berbiçav li Rohelata Kurdistanê, di jêr nifûsa vê Komarê de bûye.

Rast e Komar di 22'ê çileyê paşîn 1946'an de hat îlankirin, lê di rastî de, piştî hilweşandina hukmê Reza Şah Pehlewî di tebaxa 1942'an de û belavkirina artêşa Şahenşahî li pirr cihên rohelata Kurdistanê û demokratîzebûna prosesa siyasî, gelê me bi lez îqtidar girte destê xwe û ji birêvebirina kar û barên xwe bi destên xwe difikirî û xwedî derket.

Ew xebatên ku bi awayekî nihênî û veşartî ji aliyê "Komela J-K" dest pêkiribû, bi riya geşkirina bîr û hestên netewî, bi weşandina kovarên "Niştiman" û her wisa rêkxistina tiyatroya "Dayika Niştiman" êdî hêdî hêdî gerek berfirehtir bibûya, loma bangewaza wîstên milî gereke konkretir bibûya, ew proses bi avakirina "Hizbî Demokratî Kurdîstan" bêtir aliyê gelemperî da xwe. Pêşewe Qazî Mihemed ku bi salan berê xwe dabû doza kurdan, bi taybetî bi pêkanîna tebayî û aştî di komelegeha eşîretiyê kurd de, dewrek berbiçav

di bilezkirina damezrandina îqtidara kurdî de lihîst.

Piştî şerê cîhanê yê duhemîn, qezencên siyasî û aboriya Sovyetê îcab dikir ku piştgiriya hêzên demokratîk li Îranê û rojhelata Kurdistanê bike, lê wexta ku hukûmeta merkezî ya Îranê karbidestên Sovyetê xapand, îcar wan qezencên xwe li aliyê din dîtin û ji qewlên xwe yên li hember kurd û azeriyan vekşiyan.

Hizba Qazî Mihemed bawerî bi hêzên Sovyetê anî û bi heq derfet, bi wext dît ku komara kurdan damezrîne.

Ew karên wan însîkasek tebiî bû. Yanî lew furstê dîrokî îstîfade kirin û hakimiyeta kurdan îlan kirin.

Heke mirov berê xwe bide ser dokument û belgeyên dema Komarê, mirov dibîne ku serokên me prosesa damezrana hakimiyeta kurdan bi awayekî tespît kirî, nedîtine, wana zanîne ku ew tişt, gerek faktorên cîh cîh bide ber çavan.

Em bi kurtî dikarin bibêjin ku piştî vekişandina Sovyet, Komara Mehabadê jî têk çû.

Qazî Mihemed û hevalên xwe şerefa serbixweyiya biryara kurdan parastin, loma ew nereviyan. Ew ji nifşên kurdan yên îro re jî derseke mezin e.

– *Di dema Komara Mehabadê de tevgera kulturî û edebî çawan bû?*

– Mirov bi dilqayimî dikare bibêje ku, ew tevgera kulturî ku berî îlankirina Komarê û her wisa di mudetê 11 heyv temenê Komarê de hat kirin, ta nuha jî ji kurdan re nimûneyeke geş û cihê serfiraziyê ye.

Min qala tiyatroya "Dayika Niştiman" kir. Her di wê wextê de li çend şûnan hatibû nîşandan. Di komelegeha (Patriarchal) ya kurdî de, Komarê mafên jinên kurd bi damezrandina "Hizbî Yayan" - Partiya Jinan- pêş xist, jin jî gihîştin mafên xwe.

Ew karekî mezin yê kulturî bû. Di çaxê berî damezirandina Ko-

marê de, yanî havîna 1943'an kovara "Niştiman" dihat weşandin. Di çaxê Komarê de li Mehabadê rojnama "Kurdistan" mîna organa partiyê derdiket, kirêkarên çapxana Kurdistanê rojnama "Girr û Galî Mindalanî Kurd" bi taybetî ji bo zarokan derdixistin. Hizib kovara "Kurdistan" jî derdixist ku babetên wî bêtir edebî û tarîxî bûn. Komela Lawên Demokrat organa xwe bi navê "Hawarî Niştiman" diweşandin.

Li Bokanê ronakbîrê hêja Hesenê Qizilcî kovara "Helale" wek organa liqa hizbê derdixist. Di rojnama Kurdistanê de behsa roja derxistina kovarek bi navê "Zanist" ji aliyê 'wezareta Ferhengê' tê kirin, ku ez nizanim derketiye an na.

Yek ji karên herî efektîv yê Komarê di aliyê kulturî de, vekirina xwendegehên kurdî bûye.

Pêşewe Qadî Mihemed zarokên xwe şandiye mektebê bo ku xelkên din jî berê xwe bidine girîngiya xwendinê di nav kur û keçên kurd de.

Di dema Komarê de du şaîr û edîbên mezin ên kurd Hêmin û Hejar dest bi geşbûna xwe dikin û naznawên şaîrên milî destînin.

Kemayetî cihû li Mehabadê medreseyên taybetî ji wan re hebû da ku ew bikaribin bi zimanê xwe bixwînin.

Núdem, No: 9, 1994

KERÎM HUSAMÎ:
"AVAKIRINA KOMARA KURDISTANÊ BERHEM Û TÊKOŞÎNA GELÊ KURD BÛ"

Nûdem: *Tu dikarî bi kurtî behsa avakirin û sedemên hilweşandina komara Mehabadê biki?*

Kerîm Husamî: Avakirina komara Kurdistanê li Mehabadê di dîroka neteweya kurd de ewçend girîng e, ku bi kurtî behskirina wê dijwar e.

Avakirina komara Kurdistanê berî her tiştî berhema xebat û têkoşîna gelê kurd bû, ku bi dirêjahiya dîrokê di bin destan de bû.

Di şerê cihanê yê duwemîn de têkçûna hukûmeta Pehlewî û hatina rûs û îngilîzan bo Îranê, ji bo avakirina komara Kurdistanê wek hokarekî tête hejmartin.

Piştî rûxanî hukûmeta Pehlewî, gelê kurd li rojhelatî Kurdistanê de bi xurtî û zû bo xebata siyasî hate ser xwe û di 16 apríl 1943'an de rêxistina xwe ya bi navê Komel J. K. avakirin.

Komela J.K. zû di nava xelkê de belav bû, li hemû bajarên Kurdistanê liqê xwe damezirand. Kovara Niştiman wek organa komelê hate weşandin.

Komela J.K. ligel şoreşa Barzanî bi serok Mustefa Barzanî re peywendî çêkir.

Piştî seferî hende le serokeşîr û roşenbîrên kurd bo Baku, le 16 abî 1945 Partiya Demokrat ya Kurdistan bi serokatiya Gazî Muhemed hate avakirin û navê J.K nema Partiya Demokrat, di programa xwe de daxwaza otonomî dikir.

Partiya Demokrat li Kurdistanê karîn girte dest û di 17'ê desembera 1945'an de li şûna alaya Îranê, alaya Kurdistanê hate danîn.

Roja 22 yanuarî li Mehabadê bi beşdariya 20 hezar kesan komara Kurdistanê hate avakirin û Qadî Muhamed bû serokkomar. Piştî avakirina Komarê, hukûmeta millî ya Kurdistanê ji 14 wezîran pêkdihat:

Serokwezîr: Hacî baba Şêx

Wezîrê bergrî: Mohamed Husenxanî, Sefî Gazî

Wezîrê Navxo: Mohamed Aminî Moînî

Wezîrê Aborî: Ahmadî Îlahî

Wezîrê Kar: Xalîlî Xosrevî

Wezîrê Ferheng: Menafî Kerîmî

Wezîrê Post û Telegraf: Kerimî Ehmedein

Wezîrê Teblîqat: Sidîk Haydarî

Wezîrê Ticaretê: Hacî Musteyai Dawidî

Wezîrê Keşawerzî: Mehmûdî Welîzade

Wezîrê Mişawir: Abidrehmanî Elxanîzade

Wezîrê Rêga û Ban: Îsmaîlî Elxanîzade

Wezîrê Behdarî: Seyid Mohamed Eyubiyan

Wezîrê Adliye: Mela Huseynî Mecdî

Komara Kurdistanê tenê 11 mehan dewam kir. Di vê navê de ji bo pêşdexistina Kurdistanê gelek gavên mezin hatin avêtin, wek;

- Pêkanîna leşkeriya millî ya Kurdistan
- Avakirina weşanxaneya kurdî
- Avakirina medreseya kurdî
- Danîna qanûnên pêşketî
- Girêdana peymanê ligel Azerbeycanê
- Beşdarkirina jinan di karê çandî û hwd...

Hilweşandina Komara Kurdistanê berî her tiştî gerek le paşkêtî komelî avsay kurdewarî bête bijartin. Bêî biryara rêberê Komara Kurdistan, xiyaneta hinde axa û serokeşîrên kurd, deskewtî xebatî gelê Kurdistan be firo da.

Çûyina leşkerên Sovyet ji Îranê, viray reberanî bizava kurdan kiz kir û li hemberî leşkerên Îranê teslîm bûn.

Avakirin û hilweşandina Komara Kurdistanê azmûnî pir baexiyan ji bo gelê kurd bi cî hişt.

– *Di dema Komara Mehabadê de tevgera kulturî û edebî çawan bû?*

– Bizava rizgarîxwaziyê li rojhelatî Kurdistanê li melbendî mukriyan, bo bujanewey ziman û kultura kurdî gaveke girîng avêtine.

Di dema hukûmeta Pehlewî de ziman û kultura kurdî qedexe bû. Heta kesî nikarîbû kincên kurdî li xwe bikin.

Piştî rimanî hukûmeta Pehlewî, gelek ji mela û xwendayên kurd, bi nivîsîn û belavkirina şîr nivîsa kurdî zulm û zordariya hukûmeta Pehlewiyan dianîn ziman.

Komeleya J. K. kovara Niştiman da weşandin û wê di hişyarkirin xelkê û belavkirina zimanê kurdî de roleke berbiçav leyist.

Bo yekem car xortên kurdan şanoya Dayika Niştiman anîne ser şano.

Piştî avakirina Komara Kurdistanê, bujaneve û pere pê danî ziman û kultura kurdî cihekî girîng ya siyaseta hukûmeta millî ya Kurdistanê bû. Di wê navbera kurt de, hukûmeta Kurdisranê di aliyê kulturî de gavên mezin avêtin. Wek:

- Avakirina Weşanxaneya Kurdistan
- Derxistina Rojnameya Kurdistan, kovara Kurdistan, Hawarî Niştiman, Hawarî Kurd, Kovara Helale, Girûgalî Mindalan.
- Avakirina Stasyona radio
- Avakirina Kitêbxaneya Millî
- Avakirina Sînemaya Kurdistanê

Bujanewe û perepêdanî ziman û kultura kurdî beşekî girîng ji têkoşîna Komara Kurdistanê bû.

MAHMÛD MOLA EZAT:
"ZIMANÊ KURDÎ BÛBÛ ZIMANÊ XWENDINÊ"

Nûdem: *Tu dikarî bi kurtî behsa avakirin û sedemên hilweşandina komara Mehabadê bikî?*

Mahmûd Mola Ezat: Di durmên anormal û pirr û tijî li ajawa û astengan mezinên abûrî, siyasî û civakî di axirên şerê dûhem yê cîhanê de, di wextê sazbûna zemîne ji destpêkirina şerê sar û destxistina çekên atomî û her wisa reqabet û berberekanîyn vekirî û veşartîyn zilhêzan, fersendek dîrokî ji kurd re çêbû û komara Kurdistan de beşeke Kurdistana Rohelat de hat damezrandin û li du rêbendana sala 1324 (Hetawî) (1946-01-22) li Paytext -Mehabad- hat îlankirin. Ew bar û hal û mercên ku hebûn, rûdaw û fênomenên wilo çêkirin ku di tekmîlkirina wê prosesê de pir rol leyistin, wekî: Dagirkirina pir navçên Îranê ji aliyê hêzên Birîtanya û Yekîtiya Sovyet, -ku ew Kurdistan jî dida ber xwe- ew dagir kirin bûwe sebebê helweşana demû dezgehên îdarî û ordiya Îranê li hinek bajar û bajarok û gundên ew beşa Kurdistanê û çêbûna serdemek azad, avabûna Komela Jêkaf ku piştre Hîzba Demokrata Kurdistanê cihê wê girt. Mêj de bû ku cemawerên (selemper) kurd xewna rojek azad û serbixwebûna Kurdistanê didîtin. Piraniya xelkê kurd amadebûn bi serokatiya pêşewa Qazî Mihemed xebat bikin û xizmeta Komarê bikin...

Çend faktor û ji hemiyan girîngtir û rasterastir Yekîtiya Sovyetê bû. Egerçî armanca sereka wî ew bû ku zext bixate ser rejîma Taranê da ku naçar bibe îmtiyaza neftê bide wî.

Ca, wextek ku wî xwastê Sovyet hat cî û kompaniyek hevbeş li ser

petrolê tewafuq li ser wî hat kirin û peyman jê re hat îmzekirin (1946-04-04), Sovyet leşkerên sor ji Îranê derxist û ew çekên qursên ku dabûn Azerbeycanê - lê Komara Kurdistan ji wan hatibû bêparkirin- vekişandin. Ew bûyer yek sebebên bingehîn yê helweşana Komarê bû, helbet sebebên din jî hebûn, mîna: Pregezperistbûna rejîma Îranê, harîkariyên zirhêzên xorawa û dagîrkerên dinên Kurdistan bi wê re, nebûna mercên bi hêz ji bo seqamçîrkirina Komarê û ew asteng û herreşen ku tim û tim li ser riya Komaraê bûn, mîna : Ew peymanên ku di navbera dewletên Yekbûyî yên Emerîka û Birîtanya û Yekîtiya Sovyetê hat morkirin ku li gor wê gerek hêzên giş wan di mudeta şeş mehên piştî şerê gerek ji Îranê derketana û her wisa desteberbûna wan ji bo parastina yekîtiya ax û xelkê Îranê, bi taybetî li gor van peymanên li jêr:

- Peymana sê alû ku bi peymana "Hevgirtin" tê naskirin.

Di 29'ê janvîye a 1945'an de.

- Kongra Taran di 27-29 dêsembra 1945'an de.

- Civîna Postdamê ji 17'ê meha jûîya ta 3'ê a ûta 1945.

- Peymana îmtiyaza neftê di hember Taran û Moskovayê de li 4'a aprîla 1946'an de.

- Le wejî seyrtir ew bû ku rêberên kurd hêviyek mezin dabûne rageyandina peymana Atlantîk (Nêwerastî Otî 41) ku di navbera Rozvelt û Çorçîl de hate îmzekirin, lê di rastî de her bi qezenca rejîma Taranê bû.

Li sebebên din mirov dikare bêje nizimbûna sewiya şiyarî û eqla dîplomasî li cem pirr ji serkirdan qelsbûna dahat û aboriya Komarê, nebûna çekên qurs û amrazên pêwîst ên şer. Nizim û qelsbûna hestên netewayetî ta cihên wisa ku ji aliyê netewa kurd karekî mezin nehat kirin û ji rûxan û helweşan bê parastin.

Kêmasî û nakokiyên hundurî, helweşana bi lez a Komara Azerbeycanê, mewqivên hinek serokeşîr û karbidesran ta ew astî ku giya-

na teslîmbûnê belav bikin û tesîr bikin bo ser mewqîfa pêşewa û hevalên wî, li gel çend zahîreyên din bûne sebebên çêkirina trajediya rûxana Komar û şehîdkirina pêşewa, Seyfî Qazî, Sedrî Qazî û bi dehan heval û têkoşerên din ên netewa kurd.

– Di dema Komara Mehabadê de tevgera kulturî û edebî çawan bû?

– Herçend jî ku Komara kurdistanê di nav girêh û astengên mezin de dijiya û li serî d e hatibû ecbûrkirin ku di haletek leşkerî de be da ku bikaribe mudafea xwe bike û li ser asteng û boşayiya hundur û herêmî û nav dewletan jî, Komar çirayeke bi pirsinga nav cîhana tariya Kurdistan û hêviya mezin a netewa kurd bû. Pir aliyên jiyanên edebî, ziman, huner û kultura netewayetî di Komarê de pêş diket. Dab û nerîtên pozîtîv ên kurdî dîsan diket jiyanê. Bo cara yekem bîranîna cejna Newrozê li ser zemîneke azad bi zemawend (govend) û civînan dihat pêşwazîkirin. Gelek rojname û kovar mîna: Rojnama Kurdistan, Kovara Kurdistan, Helale, Girruçalî Mindalanî Kurd, Hawarî Kurd dihatin çapkirin. Şaîr û nivîskarên mîna Hejar, Hêmin, Qanî, Heqîqî, Xalemîn û hwd... di wan kovar û rojnameyan de berhemên xwe diweşandin.

Zimanê kurdî bûbû zimanê xwendinê. Xwendina bi zorê ji zarokan re û şer li dij nexwêndewarî li cem salmezinan destpêkir. Damezrandina çapxane û stasyona radyo, hebûna teatr, şanazîkirin be cilûberg û dab û rewiştên netewayetî pêşdiketin. Nivîsîn û berhevkirina jiyan û serpêhatiyên gewre û mezinên kurd, damezrandina kitêbxane û qîmetdayina bi jiyana xwendewarî, çêkirina neşîda netewayetî, hildan û hurmet dan (rûmetgirtin) ji ala sê rengên Komarê ku bûbû sembol û alaya hemî Kurdistanê, çêkirina gard, muzîk û selama Komarê, şanazî bi niştiman û netewe, bi ziman û edeb û kultura xwe şûnên fenomenên anormal bi darê zorê bi ser kurd de tehmîlkirî girtin û pir qanûn û rê û têkûzên jiyana civakî, ronakbîrî

CAN YÜCEL:
"EZ JI MÊJ VE NÊZÎKÎ PIRSGIRÊKA KURDÎ ME"

Di meha yanzdehan ya 1994'an de bi navê Projeya Derya Reş ji sî welatên cihê çarsed nivîskar beşdarî gereke Derya Reş bûn. Ev gera ku bi giranî ji aliyê Yekîtiya Nivîskarên Swêdê ve hatibû amadekirin, mîna yek ji projeyên nivîskaran ya herî mezin hate dîtin. Cihê hevdudîtina nivîskaran Atîna bû û ji wir jî bi keştiyê tûreke sê-çar welatan; Ukrayna, Bûlgarîstan, Romanya û Tirkiye bû. Di nava vê rêwîtiya dehrojane de zêdeyî deh nivîskarên tirk jî beşdar bûbûn. Me jî hema ku firsend didît, bi nivîskarên tirkan re li ser pirsgirêka kurdan û pêşeroja Tirkiyeyê sohbet dikir. Di van sohbet û gotûbêjan de min ferq kir ku guhertinek di nivîskar û rewşenbîrên tirkan de çêbûye. Mîna ku wan hebekî xwe ji îdeolojiya Kemalzîmê şuştine û êdî li dû azadî û mafên mirovan in. Herweha ew amade ne ku bi nivîskar û rewşenbîrên kurdan re têkevin diyalogê. Di danûstandinên deh-donzdeh rojan de çi Can Yücel, çi Orhan Pamuk, çi Vedat Türkali, çi Arif Damar, çi Feridun Andaç li hember pirsgirêka kurdan pir ji dil xuya dikirin.

Bi fikra avakirina pirek danûstandinê di navbera nivîskarên tirkan û kurdan de, me bi Can Yücel, Vedat Türkali û Arif Damar re hevpeyvîn çêkirin:

Nûdem: *Ez pêşî dixwazim nêrîna te ya di derheqa vê rêwîtiyê de bipirsim. Bi ya te ev rêwîtiyeke çawa ye? Ma tu bi serketî dibînî?*

Can Yücel: Tu ya rastî bixwazî ez bawer nakim ku tu rêwîtiyên wilo qerebalix bi serketî bin. Lê belê bi sînor be jî mirov dikare bi-

bêje hebekî bi serketî ye. Qet nebe ji bo min. Ji ber ku min gelek kesên nû naskirin. Min hin ji Swêdê nas kirin ku niha şîrên min werdigerînin. Lê gava mirov bi tevayî lê dinihêre, hinek ji wan polîtîkvanên hunerê, an jî teknokratên hunerê ne, hinek jî ji welatên kevne sosyalîst in, ku ew jî tradisyoneke wan ya li dijî komunîzmê heye. Li vir jî li ser wê polîtîkayê dikin.

– *Gelo te firsenda muneqeşeyê bi nivîskarên ku ji welatên kevne sosyalîst; mîna bulgariyan, rûsan, ukraniyan û hwd. re dît? Di derheqa wan de te çi fikir bi dest xist?*

– Ez nizanim bê rûs jî hene?

– *Erê, delegasiyonek ji Rûsyayê jî hatiye.*

– Min nizanîbû. Lê ew jî tê de, ev di hundurê kirîzeke weha de ne ku hemû peyvên wan di derheqa antî komunîzmê de ne. Ew ji derveyî wê jî tiştekî din nafikirin. Hemû ewqas şoven bûne, jê pê ve tiştekî nabînin. Em çûn Odessayê. Odessa bajarekî Ukrayniyayê tê hesab. Ya rastî Odessa bajarekî tataran e. Û ger li mafê mirovan û yê etnîk were pirsîn, ev der Kirim e û bajarê tataran e. Du dêrên yunaniyan hene, te dît me bi hev re çû ziyaret kir. Erê, dêrên yunaniyan hene, lê min ratarek jî nedît. Madem ew ji Stalîn hêrs dibin, bi heq nebiheq Stalîn tatar maliştin, ew jî ji ber ku tataran di dema şerê cîhanê yê yekemîn de piştgiriya Nazîstan kiribû, Stalîn jî hêrs bûbû, ew bi zar û zêçên wan ve paqij kiribûn. Ev jî rast e, ne rast e, mirov dikare li ser vê jî munaqeşe bike. Lê ger îro em li rastiyê bigerin, divê Odessa ya tataran be. Em bi hev re li Odessayê geriyan, ma me tatarek jî dît? Yanî ger li mafê her kesî yên milî were pirsîn, divê Odessa bibe bajarekî tataran.

– *Hîn ku gotin hatiye ser mafên neteweyan û problemên etnîk, ez dixwazim vê bi pirsgirêka kurdan ve girê bidim. Mîna tu dizanî ji sî welatên cihê, nêzîkî çarsed nivîskar beşdarî vê gerra Derya Reş bûne. Di nava van çarsed nivîskaran de sê nivîskarên kurd jî hene. Gelo tu*

vê çawan dibînî?

– Ez vê yekê baş dibînim. Di nava vê qerbalixa nivîskarên dinyayê de hebûna nivîskarên kurd jî tu bêjî nebêjî baş e. Ez ji mêj ve nêzîkî pirsgirêka kurdî me. Ez mafê kurdan ne mafekî etnîkî, lê ez "self determinationê" diparêzim. Lê ev bi hevdudîtin û peyv û munaqeşeyê çêdibe. Ger li ser vê pirsgirêkê neyê peyivandin, ez bawer nakim ku wê ev pirsgirêk were çareserkirin. Ez bawer im ku kurd li Tirkiyeyê mafê biryara xwe bistînin, azadiya fikr û peyivandina xwe bi dest bixin, wê nexwazin ji Tirkiyeyê veqetin. Lê ger ev neyê ceribandin û qedera kurdan tirk biryar bidin, şaş e. Li Lozanê biryarek hatiye dayin, ew ne emrekî Xwedê ye ku neyê guhertin, ger qanûna ku Xazî Mustefa Kemal derxistibû, hatibe guhertin, ev wê nîşan dide, ku ne emrê Xwedê be dikare were guhertin. Biryara Lozanê, tenê ber bi parastina mafê hindikahiyên ne musulman ve çerixî, bi min ev biryareke şaş e. Ev cihêyiya biryara konferansa Lozanê ne ku nayê guhetin, ev dikare were guhertin.

– Baş e, wê çawan were guhertin? Ji bo guhertina wê divê çi were kirin?

– Mesele, berî niha bi demekê konferanseke navneteweyî di derheqa hindikahiyan de çêbûbû. Ji Tirkiyeyê jî wezîrê dervekarî Mümtaz Soysal jî beşdar bûbû. Wî di wê konferansê de gotibû ku li Tirkiyeyê mafê etnîk di dema Lozanê de hatine çareserkirin û li welatê me problemeke wilo tuneye. Di vê konferansê de, ew welatên ku beşdarî konferansa Lozanê bûbûn, îtiraza xwe anîne ziman. Ez bawer nakim, ew welatên ku îmzeyên xwe avêtine binê peymana Lozanê, li dijî bidestxistina mafê kurdan derkevin.

– Lê xuyaye bi tenê Tirkiye, ku wê jî îmze avêtiye binê peymanê, li dij derdikeve.

– Erê.

– Li Tirkiyeyê hem partiyên di îktîdarê de, hem jî yên muxalefetê di

pirsgirêka kurdan de di eynî nêrînê de ne. Gelo ev ji ber çi wilo ye?

– Ger tu bala xwe de bidiyê, hemû ne di eynî nêrînê de ne. Peyayê ku îro serok cumhûr e, gava ku serokwezîr bû, digot, ez realîta kurdî nas dikim, lê niha hatiye guhertin.

– Ma bi rastî ew realîta kurdî qebûl dikin, nas dikin?

– Yanî wê çaxê nas kir. Turgut Özalê ku li dû hin hesaban bû, wî jî nas kir. Ew mir, yên ku piştî wî hatin jî eynî ne.

– Gelo bi naskirina nasnav an jî realîteya kurdî çi têtê fêhmkirin?

– Wele tu dikanî vê pirsê ji Süleyman Demirel bikî. (Em herdu jî dikenin.)

– Lê belê li navê rastiyek heye, problemek heye, pirsgirêkeke kurdan heye, her ku diçe jî ev pirsgirêka han germtir dibe, êdî ji pirsgirêka dewlet û xelkê kurd derdikeve, berberiya herdu gelan; gelê kurd û tirk dest pê dike. Em îro dibînin ku li gelek deverên Tirkiyeyê organîzasiyonên ekstrem yên rast xurt dibin, ev yeka han dikare bibe sebeba rijandina gelek xwîn. Gelo ji bo ku mirov pêşî li vê yeka han bigire û vê problemê bi riyên aştî çareser bike, bi ya te divê çi were kirin?

– Ji bo pêşî li vê yeka han bête girtin, di gava pêşî de divê hebûna miletekî bi navê miletê kurd were qebûlkirin û naskirin. Û bi destxistina mafê kurdan jî dikare li ser vê naskirinê were avakirin. Lê destpêka vê dikare qet nebe bi bidestxistina mafê kulturî dest pê bike. Mafê perwerdeya bi zimanê kurdî, avakirina enstîtu û sazgehên kurdan... Digel vê, di rojên pêş de dozeke gelê kurd ya mezin heye. Ev jî di hundurê projeya GAP'ê de tayina qedera tirkan e. Ev tayin, tu dixwazî bibêje etnîk, tu dixwazî bibêje milet, lê ev çareserkirina problema mirovên ku xwe cihê dibînin, xwe bi serê xwe dibînin e. Divê mirov li rêne hevgihîştinê bigere. Ger mirov li van riyên hevgihîştinê negere wê çi bibe? Wê dewlet bixwaze ji bo ku xelk alîkariya lojîstîk nede gerîla gundan vala bike, gundan bişewitîne, wê gundî bi ku de herin, ew ê jî werin li bajaran bi cih bibin. Gava ew

werin bajaran, ew bê mal in, bê kar in, û ji aliyê din ve rastên tirkan tijî dibin, wê berberî û şerekî vekirî li her derê Tirkiyeyê, di nava kurd û tirkan de dest pê bike û gava ku li bajaran şerekî wilo dest pê bibe, gelo wê çaxê dê Tirkiye têkeve çi rewşê? Ev tê wê manê ku wê Tirkiye winda bibe. Ê li vir pirs çi ye? Divê riyeke aştiyê peyda bibe. Ew riya aştiyê jî naskirin û qebûlkirina kurdan e û herweha li ser vê naskirinê azadbûna kurdan e. Mîna ku tu jî dizanî, Tirkiye pereyekî ecêb li vî şerê hundur xerc dike. Ji xwe pişta Tirkiyeyê di bin deynên hundur û derve de wilo tewiyaye ku ew dike têk here. Berdewamiya şerekî wilo, dawîhatina ekonomiya Tirkiyeyê ye.

– Ê baş e, digel ku pirsgirêk evqas cidî ye, hîna jî li Tirkiyeyê hinek siyasetvan, hinek rewşenbîr, hinek alim û zimanzan hebûna kurdan qebûl nakin, wan tirk dibînin, zimanê kurdî zaravayekî zimanê tirkî dibînin, gelê kurd ji tirkan dibînin. Gelo ev ji ber çi tê? Ma bi rastî ew nizanin ku kurd hene, zimanê kurdî cihê ye; kurd xwediyê kultureke cihê ne?

– Ev ji fikra Mustefa Kemal ya ku hema em ji dewleta Osmanî çi xelas bikin, û em ê vê bi dewleteke neteweyî ve girê bidin, tê. Lê ew fikir bi ser neket. Niha, pirsgirêka dewleta neteweyî bi cidî di çerçeweya eyaleta federatîf de divê dîsan li ser bête fikirandin ku ew sînorên mîsakî-milî yên ku Xazî Mustefa Kemal kişandibû, xerab nebe. Li vir, bi perspektîveke fireh, bi seriyekî vekirî, bi tolerans divê em vê di ber çav re derbas bikin û di vê çerçewê de kurd bigihîjin hemû mafên xwe. Ger karbidest destên xwe bi lez negirin û vê yekê nekin, xerabiyên mezin li pêşiya Tirkiyeyê ne.

– Kî ê bîra vê bibin? Kî ê bixwazin xwe bidin ber çareserkirina vê pirsgirêkê? Rewşenbîrên welêt, partiyên siyasî, îktîdar, muxalefet; kî?

– Niha, hê li Tirkiyeyê nasnava kurdî nayê qebûlkirin, tu ji min re behsa çareserkirina pirsgirêka kurdî dikî. Divê li Tirkiyeyê pêşî ronakbîr gavan biavêjin. Ronakbîrên ku dikarin bifikirin, bi rûmet in,

ji welatê xwe hez dikin. Seyr e, li Tirkiyeya ku di her warî de Emerîkanîzm lê hakim e, bi navê li dij Emerîkayê derketin, vê pirsê bincil dikin. Ger ev wilo here û em li ser vê pirsgirêka ku li Tirkiyeyê pirsa herî girîng e, nepeyivin, siyasetvan nexwazibin vê pirsgirêkê bi riyeke aştî çareser bikin, wê di pêş de şerekî hê dijwartir dest pê bike, wê xwîn biherike û wê ev ne li fêda Tirkiyeyê, lê wê zerareke gelek mezin bigihîne gelê wê. Herweha wê gelê kurd jî vê zerara mezin bijî û wê hingî bi hev re jiyana herdu gelan zehmet bibe. Lê ger îro nivîskar, tenê ji bo ku behsa vê pirsgirêkê dikin werin girtin, li nava kuçe û kolanan werin kuştin, wê çawa ev pirsgirêk çareser bibe? Ev ne bi tenê ji bo we kurdan wilo ye. Ev ji bo me nivîskarên tirk jî eynî ye. A niha, ez di rojnameyekê de nivîseke ku piştgiriya xwe ji gelê kurd re nîşan bidim, binivîsînim, ez di çavên dewletê de terorîst im. Yanî ferqa min û ferqa gerîlayekî ku sîlah di dest de ye, namîne. Berî herî tiştî divê demokrasiyeke rastîn were Tirkiyeyê. Divê azadiya gotinê were Tirkiyeyê, qanûnên hilbijartinê werin guhertin, qanûn were guhertin, divê ev qanûna bi terorê re têkoşîn rabe ku îmkanên kesên ku ji piraniyê cihê difikirin û gotinê were holê.

– *Tiştê xuyaye, di rewşa îro de, gava ku sîleh bipeyivin, destpêkirina diyalogê ne hêsan e. Gelo bi nêrîna te, ji bo ku ev sîleh rawestin û rojekê berî rojekê diyalog dest pê bike, divê çi were kirin? Yanî ji bo ku diyalogek di navbera gelên kurd û tirk de dest pê bike, di navbera rewşenbîrên kurd û tirk de dest pê bike û di navbera siyasetvanên kurd û tirk de dest pê bike, divê mirov çi bike?*

– Weleh, îro zehmetiyeke mezin heye. Berî her tiştî, divê biryareke agirbirrê were dayin, baş e, lê gorî ku dewleta tirk, yê ku li dijî xwe şer dike, mîna eşqiya îlan kiriye, tê vê maneyê ku dewletek wê nikanibe bi eşqiyan re rûne. Yanî wê çaxê, wê ev agirbirr ne duhêl be, lê wê agirbirreke yekhêl be. Ev jî tê wê maneyê ku riya agirbirrê girtî ye. Ê ji xwe agirbirr bi vî awayî çênabe. Piştî ku agirbirra berî

niha bi çend salan xera bû û bi vir ve, rewş xerabtir bûye, hemû riyên diyalogê hatine girtin.

– Di eslê xwe de mijara hevpeyvîna me wê ziman û edebiyat bûya. Lê ez dinihêrim ku ji edebiyatê wêdetir, sohbeta me ber bi siyasetê ve diçe. Ez bawer im ev jî ji ber ku em hê jî, di vê sedsala bîstan de bêî ziman in. Hê jî mîna ku tu jî pê dizanî, li Tirkiyeyê zimanê kurdî qedexe ye, kurd nikanin bi riyên fermî zimanê xwe bi kar bînin, kovar û rojnameyên xwe bi azadî û bêtirs derxin, kanalên xwe yên radyo û televizyonan li dar bixin. Ji ber van sedeman e, ku em hema derbasî siyasetê dibin.

Îro, gelek rewşenbîrên tirkan, gelek serok û birêvebirên partiyên siyasî; hem yên li îktidarê, hem jî yên muxalefet, dibêjin, bila li Tirkiyeyê terorîzm raweste, em ê hingî dest bi munaqeşeya vê pirsgirêkê bikin, em ê hin mafên kurdan yên demokratîk û mirovî bidine wan. Bi ya te ev fikreke çawan e?

– Heq ji jor ve, tenê bi biryaran nayên dayin. Ger heq muşterek bin, wê çaxê heq par ve dibin. Gava hukûmeta tirk dibêje bila teror raweste û ez ê paşê heq bidim, qet baweriyê nade min, hişê min nagihîje vê mantiqê.

– Îro, gelek partî û rêxistinên kurdan û herweha gelek şexsiyet û rewşenbîrên kurdan jî dibêjin, em niha Kurdistaneke serbixwe naxwazin, lê di hundurê sînorê Tirkiyeyê de, gelê kurd were qebûl kirin û mafê xwe yê bikarênna zimên, vejandina çanda xwe û her celeb mafên xwe yên mirovî bi dest bixin. Bi gotineke din, li Tirkiyê tirk xwediyê çi bin, kurd jî mîna kurd bibe xwediyê wê. Wekî din jî hin pêşniyazên otonomî, federasyon û hwd. ji cepheya kurdan tê. Lê belê, ji cepheya tirkan jî, dibêjin, ger em îro zimanê wan bidin wan, ew kultura xwe bi pêş bixin, wê sibe jî doza Kurdistaneke serbixwe bikin. Gelo tu di vê derheqê de çi difikirî?

– Ez bawer im, ger îro kurd Kurdistaneke serbixwe bixwazin, di-

vê xwe gelekî organîze bikin, lê belê ev şerekî dûr û dirêj dixwaze û ez pêşeroja vê fikra han jî rohnî nabînim. Ji ber ku belavbûna kurdan ya li seranserî Tirkiyeyê vê nîşan dide. Yanî li gor hesabên ku îro têne kirin, kêm-zêde ancax li Kurdistanê çar milyon kurd mabin. Yên din jî li hemû Tirkiyeyê belav bûne. Niha, di rewşeke weha de xwestina otonomiyê, çawa ku mîna li îsraîlê bû û ji her derê dinyayê cihûdan berê xwe dane Îsraîlê, divê hemû kurdên ku li nava Tirkiyeyê belav bûne jî, vegerin Kurdistanê. Yanî ev otonomiya ku ji kurdan re were dayin, bi qasî ku wê sînorên wê teng bin, wê ekonomiya wê jî ewçend qels be. Bi ya min kurd dixwazin bi tirkan re li hev bikin, ev pêşniyaza kurdan red dibe.

– Gelo ev xwesteka kurdan ji aliyê kîjan hêzê ve tête redkirin?

– Wele ev ne tiştekî ku mirov bi gotinekê bibersivîne.

– Îro li Tirkiyeyê hêzek an jî partiyeke ku bixwaze bi kurdan re rûnê heye?

– Mesele îro partiya Refahê hin pêşniyazên nerm tûne. Turgut Özal jî hin tişt digotin. Süleyman Demirel ev dît, Erdal İnönü dît.

– Gelo Sosyaldemokrat di vê derheqê de çi difikirin?

– Îro sosyaldemorat li Tirkiyeyê qet tiştekî nafikirin.

– Tiştê xuyayî di navbera partiyên kurd û tirkan de diyalog tune ye. Gelo diyalogek di navbera rewşenbîrên kurd û tirkan de dest pê bike, wê çi tesîra wê ji hatina demokrasiyê û çareserkirina pirsgirêka kurd re çêbibe.

– Berî her tiştî, divê hebûna zimanê kurdî ji aliyê hemû rewşenbîrên tirkan ve were qebûlkirin û kurd jî bi riya bikaranîna zimanê kurdî di pratîkê de nîşanî hem rewşenbîrên kurdan, hem jî raya giştî ya Tirkiyeyê bidin. Yanî divê kurd bi riyên zanistî zimanê xwe bicivînin, giramereke bingeh amade bikin, ferhengên bingeh amade bikin, enstîtu û akademiyan ava bikin û di wan de karên zanistî bidomînin. Yanî divê dîroka ziman û kultura kurdî bêî ku zêde bête me-

zin kirin, bêî mubalaxa, bi rûyê rastîn têkeve ortê. Ha, divê rewşenbîrên kurdan ji vê bi rê bikevin, hem di warê navneteweyî de, hem jî li Tirkiyeyê nîşan bidin ku zimanê wan zimanekî kevin û yê nivîsandinê ye. Ev jî, ji bo ku nivîskar û rewşenbîrên tirkan ji vê haydar bibin, şaîr û nivîskarên kurdan şîr û kurteçîrokên xwe di kovarên tirkan de biweşînin, da rewşenbîrên tirkan wan nas bikin, bibînin ku zimanê kurdî jî mîna zimanê îngilîzî, pê helbest û bi tevayî edebiyat têtе nivîsandin. Lê, wê mîna xelkekî ku tê pelçiqandin, problemên devok û zaravan derkeve. Gava mirov bi awireke gelemperî lê dinihêre, mirov dibîne ku li Tirkiyeyê du zaravayên kurdî hene. Yek jê kurmancî ye, yek jî zazakî. Zaravayê zazakî, li gorî ku ez dizanim ji aliyê sedî panzdehên kurdan têtе peyivandin. Herçî zaravayê kurmancî ye, li nava kurdên Tirkiyeyê zaravayê mezin e û piraniya kurdan bi vî zaravayî dipeyivin. Yanî, gava rewş weha be, jihevtêgihîştina kurdan ne ewqas zehmet e. Piraniya caran ji cepheya tirkan tê gotin ku ev hevdu fêhm nakin, ger em kurdî serbest bikin jî wê hevdu fêhm nekin. Bi ya min ev behane ne û kes bi van behaneyan jî naxapin. Di vê çerçeweyê de, kurmanc û zaza dikarin li hev bikin û bi zimanê xwe perwerde û weşana xwe bikin. Ev, nayê wê manê ku wê zaza ji heqê xwe bêpar bimînin. Ji xwe gava destûra bikaranîna zimên were dayin, her ku here wê ferqiyeta di navbera zaravayan de jî kêm bibin û wê dawî ji hev tê bigihîjin. Yanî yekkirina van zaravayan nebêîmkaniyek e. Li Tirkiyeyê yek jî pirsa paşeroja medreseyên kurdan e. Medreseyên kurdan bi sedsalan e mîna sazgehên pir bi bingeh dixebitin. Di hundurê van medreseyan de di çerçeweya îslamê de ji bo danasîn û belavkirina nasnava kurdan gelek xebat hatine kirin. Di van medreseyan de bi xwendina dînê îslamê re klasîkên kurdî jî dihatin xwendin.

– Îro, li welatên Ewrûpayê mirov dibîne ku danûstandinek di navbera rewşenbîrên kurd û tirkan de heye. Ev dibe ku ji ber tesîra de-

mokrasiya Ewrûpayê be jî. Gelo li Tirkiyeyê danûstandineke weha di navbera rewşenbîrên kurd û tirk de heye?

– Erê, komek hevalên me yên kurd hene. Komek şaîrên me yên bi eslê xwe kurd hene.

– Tu ê bikaribî navên hin şaîr û nivîskarên ku bi eslê xwe kurdin, bidî?

– Erê, ez dikarim navekî du navan bidim. Mesele Cemal Süreya kurd bû. Niha Murathan Mungan kurd e. Tu kes îro ji bo ku Murathan Mungan kurd e, nikanin bibêjin, ew şaîrekî xerab e. Ji ber ku Murathan Mungan hînî nivîsandina bi tirkî bûye, ji dengê kurdî bêtir hînî dengê tirkî bûye, ew bi tirkî dinivîsîne. Yek jî, divê berê kurd bi xwe jî biryara xwe û nivîsandina bi kurdî bidin da ev pirsgirêka han zelal bibe. Ger zimanek neyê bikaranîn, ew ziman mehkûmê mirinê ye.

– Niha em dizanin, gelek rewşenbîr û nivîskarên tirkan jî ji ber pirsgirêka kurdan, ji ber ku wan rastiya Tirkiyeyê nivîsandine, ew di zîndanan de ne. Wek mînak, em dikarin navê İsmail Beşikçi, Haluk Gerger, Fikret Başkaya û hwd. bidin. Lê em dinerin ku ev gavên îndividuel in, ji girseya rewşenbîrên tirkan deng dernayê. Îro li Tirkiyeyê sendîkaya nivîskarên tirk heye, klûba PEN'ê heye. Ev herdu sazgeh jî bêdeng in, berpirsiyariyên xwe naynin cih. Lê em dev ji wê jî berdin, ez dixwazim vê bipirsim, gelo li Tirkiyeyê nivîskarên ku bi kurdî dinivîsînin, an jî nivîskarên kurd bi nasnava xwe dikarin bibin endamên van sazgehan? Ev sazgeh wan mîna endam qebûl dikin?

– Niha yekî ku derkeve û bibêje ez şaîrekî kurd im tuneye. Hemû li derve ne. Lê ez bi neh–deh hevalan re li ser vê pirsgirêkê peyivîme û me cidî cidî jî munaqeşe kiriye. Ez bala te bikişînim ku ez bi xwe jî ne endamê klûba PEN'ê ya Tirkiyeyê me. Lê, li hember klûba tirkî ya kurdî jî vebûye. Ez bi xwe nizanim bê PEN'a kurdî wê bixwa-

zibe were ba PEN'a tirkî û ji bo çareserkirina vê pirsgirêkê tiştekî bike an na. Ez bi xwe vê nizanim. Lê belê mesele ne meseleya PEN'ê bi tenê ye. Mixabin, li Tirkiyeyê hemû sazgehên hunerî naxebitin, berpirsiyariyên xwe naynin cih. Gava nexebitin wê bal û meyla xwe jî bernedin ser problemên weha. Yanî, mixabin ev jî nîşan dide ku sazgehên hunerî û edebî li ser problema ziman û edebiyata kurdî serê xwe naêşînin, nêzîk nabin. Gava ew nekin, dîsan ev li ser gavavêtin û fedekariyên şexsî dimîne.

– Em dizanin ku niha nexweşiyek di navbera Tirkiye û Yunanîstanê de heye. Herweha di vê keştiyê de delegasiyona tirk û yunan jî heye. Mîna ku tu jî dizanî di navbera van herdu delegasiyonan de hevdudîtinek çêbû. Herdu grûban biryar girtin ku ji bo aştî û hevkariya herdu gelan belavokekê binivîsînin. Em dizanin ku di navbera gelê kurd û tirk jî berberiyek heye, herweha ev berberî di navbera rewşenbîrên kurd û tirkan de jî heye. Ji bo berbihevhatina herdu gelan û berbihevhatina rewşenbîrên van her du gelan, gelo hevdudîtineke rewşenbîrên kurdan û tirkan jî ne hewcedariyek e? Yanî ji bo ku rewşenbîr bikaribin serkêşiya vê yekê bikin, bi ya min divê mîna peymanekê di navbera rewşenbîrên herdu welatan de çêbibe, wek mînak mirov dikare fonekê ava bike û bi piştgirî û alîkariya rewşenbîrên her du gelan, berhemên wan wergerin zimanên hevdu. Yanî berhemên tirkî wergerin kurdî û berhemên kurd jî wergerin tirkî? Tu jî pêşniyazeke weha re çi dibêjî?

– Ev pêşniyazeke gelekî baş e. Lê ez bawer nakim ku wê ev pêşniyaza han niha ji aliyê sazgehên me yên nivîskaran ve were qebûlkirin. Ev bi tenê dikare ji aliyê yek û yek nivîskar û rewşenbîran ve were qebûlkirin. Ev rewşenbîr û nivîskar dikarin li dor vê pêşniyazê bicivin û bi hev re vê daxwazê ji raya giştî re bînin ziman. Ger sazgehên me yên nivîskarî û rewşenbîrî mîna Sendîkaya Nivîskarên Tirk û PEN'a Tirk wê çiqasî bikaribin ji vê yekê re bibin asteng, ez

nizanim. Lê ev pêşniyazeke baş e û divê em li dor maseyekê li hev rûnên û ji bo pêşeroja gel û welatê xwe fikrên hevdu bistînin, li hev werin. Ev ewqas rast e ku, em mîna nivîskar jî, ji bo çapkirin û belavkirina berhemên me jî bicîhanîna vê pêşniyaza han pêwîst e. Sibe du sibe, mîna hin nivîskarên tirkan bawer in wê xwendevanên kurd her tim yên wan bin, ne rast e. Em di talûkeyke ku xwendevanên kurd winda bikin de ne. Loma, ez bawer im, ev pêşniyaza te ya ku em berhemên hevdu wergerînin zimanê hevdu gelekî di cih de ye. Yanî gava em xwendevanên kurd mîna xwendevanên tirk winda bikin, em vê carê xwendevanên kurd mîna xwendevanên kurd bi dest dixin. Divê em bi rastî vê pêşniyazê qebûl bikin û bi xurtî berhemên tirkî wergerînin kurdî û berhemên kurd jî wergerînin tirkî. Van di planeke fireh de, di planeke rexnegirî de, ez nabêjim rexnegiriya zanistî, lê em ji aliyê dîroka edebiyatê ve, ji aliya rexneya rojane ve jî, em biryarê bistînin û em mîna qîmetên objektîv bixine ortê. Ji ber vê yekê hem di nava kurdan de hem jî di nava tirkan de, rexnegirên ku bikaribin di bin vî barî de rabin divê derkevin. Tirk edebiyata kurdî, kultura kurdî nas nakin. Gava mirov ji wan dipirse, ma tu Mem û Zîn çawan dibînî? ji wan we ye ku mirov dibêje, Lîmozîn. Ji bo ev nezanîn ji navê rabe, divê em bi çavekî rexnegirî berhemên hev bidin naskirin û bi hev re têkevin diyalogeke kûr.

– Kî ê gava pêşî biavêje, an jî divê kî gava pêşî biavêje?

– Ger bi hev re gav bête avêtin wê baştir be.

– Ji ber ku pirsgirêka kurdan, pirsgirêka ziman û kultura kurdan her tim derdikeve plana yekemîn, loma me qet behsa te, behsa şaîrtiya te nekir. Em dizanin ku tu yek ji şaîrên Tirkiyeyê yê herî baş e ku li jiyanê yî. Gelek şaîrên baş ji Tirkiyeyê derketine. Mîna Nazim Hikmet, Cemal Süreya, Ahmed Arîf, Hasan Huseyin, Enver Gökçe û gelekên din. Evên ku me navê wan hejmartin yek jî ne sax in. Gava mirov vê jî bide ber çavan, gelo rewşa helbesta tirkî îro çawa ye? Helbesta tirkî

di çi rewşê de ye?

– Hemû entelegsiya tirkî, mîna ku tête dîtin, di hundurê xwe de darbeyeke mezin xwar. Yekî hebekî aqil li serî, dikarîbû bibûya şaîr, bi milê wî girtin avêtin zîndanê. Van kesan firsenda xwendinê, firsenda ku ew xwe bi rêk û pêk bigihînin, nedîtin. Geleg salan di zîndanan de man. Loma di helbesta tirkî de tevliheviyek çêbû.

– Ma mirov nikane klasifikasiyoneke helbesta tirkî îro çêbike.

– Na. Pirr zor e. Ji ber mîna ku weke tendens tiştek derneketiye, bi tenê yek yek şaîr derdikevin, hin derdikevin, dîsan binav dibin, zemîna îro zemîneke pirr leqleqokî ye. Lê bi ya îro ev ber bi cihekî baş ve diçe. Armanca min bi cihê baş ev e, ku her kesî serê xwe xistiye ber xwe û difikire. Ez texmîn dikim wê di hundurê helbesta tirkî de sentezek derkeve. Ev, ez bawer im wê di hundurê çar–pênc salan de bibe. Yê ku ji Nazim dest pê bike, mecbûr e ku xwe bibîne, berevajiya wê, wê helbesta tirkî bimire. Armanca bi Nazim ne ew e ku divê ew rûnên û weke Nazim helbestên xwe raxînin, helbestên xwe binivîsînin. Divê Nazim di tirkî de çawan were nivîsandin. Ger Nazim di tirkî de xwediyê cihekî be, belkî du qatan tesîra wî heye. Ger mirov li hemberî vê rewşê di hundurê xwe de nejî, di hundurê xwe de gotinên xwe nehûnin. Nazim jî hem gava di hundur de bû hem jî gava derkete derve, di hundurê xwe de helbestên xwe hûna. Tu îro nikanî rabî li Tirkiyeyê mîna Nazim helbestan binivîsînî. Ji ber ku şerd hatine guhertin. Suret hatine guhertin. Danûstandinên mirovan hatine guhertin. Şiklê bikaranîna zimên hatiye guhertin. Gelek tişt li der û dora me hatine guhertin. Tesîra vê jiyana mîna trafikeke xurt li helbestê jî dibe. Ev jî di helbestê de guhertinan tîne. Ev guherîn wê ne bişibe Nazim, ne bişibe *Nuhîtiya Duwemîn*, dikare neşibe tu yekê jî, yanî pêşiya me vekiriye. Helbest bi mirovan re peyivîn e. Û divê mêjiyê helbestkar bi planên nû ve bixebite, pîvanên nû bibînin. Wê ev pîvanên nû derbas bibin. Gava

ev pîvanên nû rûniştin, tu bêjî nebêjî wê hingî tevgerên nû, di helbestê de gotinên nû derkevin. Êdî dema wê hatiye. Ez bawer im, di hundurê çar-pênc salan de wê li Tirkiyeyê di warê helbestê de teqandineke mezin çêbibe.

– Gelo îro mirov li Tirkiyeyê helbestê û prosayê, an jî helbestê û romanê bermaberî hevdu bike, kîjan di pêş de ye?

– Bi qasî ku ez dibînim, li Tirkiyeyê her tim helbest di pêş de ye. Yanî, îro jî, ne ku edebiyata Dîwanê miriye. Tradisyoneke helbestê li Trikiyeyê heye. Lê romana me bi sînor e. Ez wê yeka han ji bo pîvana hevalên me yên romannivîs nabêjim. Roman hunereke burjuvazî ye. Burjuvazîbûna Tirkiyeyê, bajarvaniya wê ne bi rêk û pêk e. Tesîra wê yeka han li ser romanê jî heye. Mesele bi serketina Yaşar Kemal, bi nostaljiya hebûna tirkmeniya windabûyî û kurdan e. Ya rastî Yaşar Kemal di derheqa Tirkiyeya îro de tu berhem nedane. Yek ji sedemên biserketin û hezkirina Yaşar Kemal ya li derve ew e ku ew perçeyek ji edebiyata nostaljî ye.

– Baş e, digel vê nostaljîbûnê li Tirkiyeyê beshsa Postmodernîzmê tête kirin. Nêrîna te ya di vê derheqê de çi ye? Li Tirkiyeyê romana postmodern, an jî hunera postmodern heye?

– Me do bi hev re bi Orhan Pamuk re sohbet kir, wî got ku ew ne nivîskarekî postmodernîst e. Min jê pirsî: Ma tu Avant-Gard î?" Got: "Ez Avant-Gard im." Tiştê ku ez dixwazim bibêjim, ji bo ku mirov bibe Postmodernîst, divê mirov di modernîzmê de derbas bibe. Yanî, divê gazinên mirov ji modernîzmê hebe, wê çaxê mirov hewcedariya derbasbûna Postmodernîzmê dibîne. Bi qasî ku ez dizanim, Postmodernîzm ji edebiyatê wêdetir termeke mîmarî ye. Ez bawer im li dinyayê pir kêm mirov hene ku xwe bi Postmodernîst bi nav dikin.

– Em bixwazin nexwazin, êdî li Tirkiyeyê nivîskarên ku xwe dixin kategoriyên cihê cihê, yên mîna; Modernîst, Postmodernîst an jî

Avant-Gard hene. Lê belê ev celebmirov hê jî li Tirkiyeyê hebûna kurdan, hebûna zimanê kurdî qebûl nakin. Tu reva van ya ji rastiya kurdan bi çi ve girê didî? Yanî ez vê meraq dikim, çawan dibe ku di vê sedsala bîstan de mirovekî bi fikir û ramanên modern, postmodern û avant-gard bi rê dikevin, dikarin miletekî bi nifûseke zêdeyî bîst milyonî înkar bike? An jî ji yên ku înkar dikin re, li çepikan bixin?

– Ev yeka han, di gava pêşî de, pirseke wijdan e. Ya dudan, pirsa zanebûnê ye. Ger ev herdu negihîjin hev, wê çirok weha be.

– Niha, ez dibînim ku di navbera me rewşînbîrên tirk û kurd de tu problemeke zêde tuneye. Yanî problema me bi rewşenbîrên tirk yên ku hebûna me qebûl dikin re tuneye. Me li jor behsa diyalogeke berdewam kiribû. Yanî diyalogeke berdewam di navbera nivîskarên kurd û tirk de. Em ê bi riya kovara xwe NÛDEM'ê hem pêşniyaza vê diyalogê bigihînin rewşenbîr û nivîskarên kurdan, hem jî li ser wergerandina berheman, wan haydar bikin. Gelo hûn ê jî, ji raya gişti ya Tirkiyeyê re bi riya çapemeniyê behsa hebûna kurdan, hebûna ziman, edebiyat û kultura wan û herweha behsa pêşniyaza ku berhemên kurdî wergerin tirkî û berhemên tirkî jî wergerin kurdî bikin?

– Danûstandina min ya bi çapemeniyê re ew e ku ez carinan di rojnameyan de dinivîsînim, carinan jî hin kovar li min digerin û fikra min ya di derheqa mijarên cihê cihê de dipirsin. Herçî televizyon e bi tenê li ser helbestê bi min re dipeyivin. Tu çapemeneya ku di derheqa welêt de mafê gotinê bide min, nîn e. Tiştê ku ez dikarim bikim, gava ez herim ez dikarim bi kovara Evrensel Kültür re rûnêm, em bi hev re metnekê binivîsînin, tê de behsa fê fikra hevbeş bikin û vê metna han bi tirkî di Evrensel Kültürê de û bi kurdî jî di kovara we de biweşînin. Bi vê yeka han re em dikarin dest pê bikin û helbestên bi kurdî jî di Evrensel Kültürê de biweşînin. Yanî ji bilî vê jî, ez ji dil nêzîkî pirsgirêka kurdî me. Lê gava ez di çapemeneyê de bixwazim bibêjim, peyva min dibirrin, nahêlin ez bipeyivim.

Tu ya rastî bixwazî li Tirkiyeyê ne bi tenê ji bo edebiyatê cihêtî heye. Ev cihêtiya han ji bo muzîkê jî weha ye.

A niha stranbêjekî we tê bîra min, Şivan, dengbêjekî gelekî baş e. Demekê hin celebhunermendan li Tirkiyeyê bi gelemperî stranên kurdî û bi taybetî jî stranên Şivan kirin bi tirkî û stran û negotin ku ev stran yên bi kurdî ne. Û ev yeka han ji xwe re marîfetek hesibandin. Ev yeka han jî asîmîlasiyona berheman e. Binêr, niha Şivan hemû stranên xwe bi kurdî distirê. Ger ew çend stranan bi tirkî jî bistirê ew ê wê çaxê bibîne bê kasetên wî çawan werin firotin. Lê belê Şivan jî di israrkirina bi kurdî gotinê de mafdar e. Û bi ya min baş jî dike. Lê bala xwe bidinê, ji bo şahî û konsera vekirina ava Heranê bang Şivan nakin. Ji bo çi bang Şivan nekirin, ne wilo? Yanî wan bang Şivan jî bikirana û Şivan çend stranên xwe yên bi kurdî li wir bigota, ma wê çi bibûya? Ma wê bobelat rabûya? Naa, tiştek jî nedibû.

Ji aliyê din ev ji bo resaman jî weha ye. Divê resamên kurdan jî wetin û êdî pêwîstiya ku ew mîna Cemalê me (Cemal Süreya) bibêjin em tirk in û heta demekê eslê xwe winda bikin jî nema ye. Bila bi serbilindî wetin, bibêjin em resamê kurd in û li Tirkiyeyê pêşangeha xwe vedikin. Ji bo ku ew resamê kurd in, kes nikare têkilî wan bibe. Herweha hêkeltraşên kurd dikarin werin, destanbêj dikarin werin, grûbên folklorê dikarin werin.

– *Niha ev rêwîtiya han hebekî cihê bû. Nivîskarên beşdar zêde rastiya Tirkiyeyê nedîtin. Gelo mirov rêwîtiyeke biçûk jî ji bo Kurdistanê amade bike wê çawan be. Yanî mirov bi otobusekê, çil-pêncî nivîskarên ji deh-panzdeh welatan û herweha çend nivîskarên tirk jî tê de here Diyarbekirê, here Mêrdînê, here Hekariyê, here Şirnaxê... Tu ji gereke wilo re çi dibêjî?*

– Ez bi xwe, ez ê bixwazim bi kêfxweşî beşdarî rêwîtiyeke wilo bibim. Ez bawer im wê hebekî zehmet be. Ji ber ku gava heyetên

Ewrûpayî ji bo lêkolînên mafên mirovî têne Tirkiyeyê, zilamên me destûr nadin ku ew herin cihê cih. Ew nahêlin kes herin cihê cih. Gelek ji giregir û siyasetvanên mezin yên tirk jî nikarin herin hin cihên Kurdistanê. Ji wezîr û serokwezîran re jî destûr tuneye, Amnesty International nikare herin wan deran. Li Tirkiyeyê rewşeke weha heye. Loma ez bawer im wê bicihanîna vê pêşniyaza te hebekî zehmet be.

Nûdem, No: 13, 1995

SENARÎST Û ROMANNIVÎS; VEDAT TÜRKALÎ

Vedat Türkali yek ji rewşenbîrên tirkan yê bijarte ye. Ji bilî xebatên xwe yên siyasî ew mîna romannivîs û senarîst jî gelekî navdar e û xwediyê cihekî taybetî ye. Fîlmên ku wî çêkirine hem li Tirkiyeyê hem jî li derveyî Tirkiyeyê bûne xwediyên xelatan. Giraniya vê hevpeyvîna me ya bi Vedat Türkali re ji hunera nivîskarî û sînemavaniya wî wêdetir li ser kurdan, rewşa kurdan û riyên çareserkirina pirsgirêka kurdan e.

Nûdem: *Mîrza Türkali, em dizanin ku tu li biyanistanê, li Îngîltereyê dijî, tu hesreta welatê xwe dikişînî. Gelo ji bo çi tu venagerî Tirkiyeyê?*

Vedat Türkali: Ez bi birayerekê çûme Îngîltereyê. Bi rastî li Tirkiyeyê êdî şerdê min û xebatê nemabû. Hin karên min yên biçûk piraniya wextê min digirt. Mîna tu dizanî li Tirkiyeyê tibabek problemên siyasî hene. Ez jî mîna kevneşoreşgerekî nikarîbûm li derveyî vê yekê bimama û ez tu carî jî nemame. Paşê ez têgihîştim ku êdî hin tiştên bêmane zêde wextê min digirin, ez nikarim nivîskariya xwe bidomînim. Êdî ji karê bêtir, mayîna li Tirkiyeyê zerar gihande min. Sohbet, civîn û tiştên weha zêde wextê min digirtin. Ev yeka han jî ji nivîsandina min re dibû asteng. Paşê min biryara xwe da ku ez herim Îngîltereyê. Ji xwe zaroyên min û neviyên min jî li wir bûn. Wan jî xwestin ku ez herime ba wan, min jî biryara xwe da û ez çûm. Berî ku ez vê biryara xwe bidim, ez bi hinek dost û hevalan şêwirîm, wan jî biryara min di cih de dîtin û dan zanîn ku wê ji bo min London cihekî baş be. Bi rastî ez niha dikarim li wir bi rehetî

bixebitim. Ez niha li wir, romaneke ku ez ji mêj ve li ser difikirim, dinivîsînim.

– Roman li ser çi ye, behsa çi dike?

– Roman behsa Tirkiye ya salên çilî dike. Ji xwe piraniya pirtûk û romanên min li ser Tirkiye û rewşa Tirkiyeyê ne. Ger tu bala xwe baş bidî romanê min tu ê bikaribî panoramayeke Tirkiyeyê tê de bibînî. Ez bawer im ger ez vê romana xwe jî xelas bikim, mirov ê bikaribe bi hêsanî rewşa Tirkiyeyê ya heftê salên dawî tê de bibîne.

– Tu ê hê demeke dirêj li Îngîltereyê bimînî?

– Heta ez romana xwe xelas bikim. Ji xwe biryara min jî ew bû ku ez bikaribim li wir romana xwe binivîsînim. Ez bawer im wê ev karê min hê salek du salên din dom bike. Yanî mirov çiqasî bi bawerî û bi biryar be jî, ne hêsan e ku mirov li gora dilê xwe bixebite. Yanî gelek astengî derdikevin pêşiya mirov, mirov hin nivîsên din dinivîsîne. Tu dizanî ku ez carinan mecbûr dimînim û di rojnameyan de dinivîsînim. Mîna ku tê zanîn îro li Tirkiyeyê pirsgirêka sereke pirsa kurdî ye. Esil ev ji mêj ve pirsgirêka Tirkiyeyê ya herî girîng e. Berî niha bi demekê nivîseke min ya di derheqa kurdan de di rojnamê de derketibû. Heta ku ev pirsgirêka han çareser nebe, Tirkiye nagihîje rehetiyekê. Yanî wê ne ji kurdan re rehetî hebe, ne jî ji tirkan re rehetî hebe. Heta ji min tê ez di derheqa vê pirsgirêkê de dinivîsînim. Di eslê xwe de divê ez di derheqa vê yekê de hê bêtir binivîsînim, lê wextê min tuneye. Wek min got, xebatên weha jî ji bo xelaskirina romana min dibin asteng. Lê ez bawer im ez ê vê romana xwe di hundurê salek du salan de xelas bikim. Hema ku ez xelas bikim jî ez ê vegerim Tirkiyeyê.

– Te got ku tu ê piştî romana xwe vegerî Tirkiyeyê. Herweha te behsa pirsgirêka herî girîng, yanî behsa pirsgirêka kurdan ya li Tirkiyeyê kir. Gelo gava tu vegerî welatekî ewqas bi problem û ku tu nikanibî ji van probleman re temaşevan bimînî, tu difikirî çawan jiyana xwe

plan bikî?

– Gava ez romana xwe xelas bikim û vegerim Tirkiyeyê, ez ê êdî di derheqa vê pirsgirêkê de her roj di rojnameyan de binivîsînim. Yê min sîlaha min pênûsa min e. Heta ku ji min bê ez ê vê sîlaha xwe bi kar bînim. Ez dizanim ku wê ev yeka han belayê jî bi xwe re bîne. Girtin heye, nizanim çi heye... Lê divê em vê jî qebûl bikin. Ji ber ku li her derê dinyayê her car wilo bûye. Her rim serê nivîskaran, nivîskarên ku rastiyê tînin zimên bi dewleta wan re ketiye belayê. Yê ku vêya li ber çavan negire ne nivîskar e. Ez ne siyasetvan im, ez nivîskar im. Tu dikarî bibêjî, tu evqasî bi siyasetê re mijûl dibî tu çawan ne siyasetvan î. Ez wê jî dikarim wilo şirove bikim. Ji ber ku armanca siyasetvanekî hatina îktîdarê ye, lê bi ya min heqê nivîskarekî û îktîdarê tuneye. Ger ew xeta ku nivîskar parastiye jî were îktîdarê, divê ew di muxalefetê de bimîne. Divê nivîskar ne bi berçavkên îktîdarê li meseleyan binihêrin, lê bi berçavkên xwe, bi berçavkên xelkê lê binihêrin. Divê ew mîna yekî ku bi problemên xelkê re mijûl dibe, derdên wan bi xwe re par ve dike, li meseleyan binihêrin. Wê çaxê jî ew dibe muxalefet. Ji ber ku tu îktîdar ji sedî sed bi ser nakevin. Lê belê hemû îktîdar jî dixwazin xwe ji sedî sed rast nîşan bidin.

– Te got ku li Tirkiyeyê pirsgirêka herî girîng pirsgirêka kurdan e. Gelo ji bo çi heta niha ev pirsgirêka han çareser nebûye. Ma ev pirsgirêk herê tune bû?

– Niha, bersiva vê pirsê pir dirêj e. Min bersiva vê pirsa te dûr û dirêj di nivîsên xwe de aniye ziman. Nivîsên min yên ku di Özgür Gündem û Özgür Ülkeyê de derketine hene. Di nêzîk de ez dixwazim wan di bin navê "Nivîsên Li Ser Kurdan" bicivînim û mîna pirtûkekê derxînim.

Ger ez niha behsa van sedeman bikim, ez bawer im wê rûpelên kovara we têr nekin. Lê dîsan jî ez ê hin tiştên biçûk bibêjim. Gava

em herin pirsa kurdan ya dema cumhûriyetê, yek jê divê ji aliyê kurdan ve ev pirsgirêk were nirxandin, yek ji aliyê tirkan ve û ji aliyê Sovyet û dinya emperyalîst ya wê demê ve... Divê mirov bi van çar nêrînan li meselê binihêre. Ez bawer im gelek bûyer û sebebên dîrokî li ser hev kom bûn, çareserkirina pirsgirêka kurdan, jinavêrakirina zilma hezar salane ya li ser kurdan deyne aliyekî, ev di dema cumhûriyetê de hê jî girantir bû. Hûn dizanin bi çareserkirneke împeryalîst kurd li rojhilata navîn hatin perçekirin. Ez dixwazim careke din jî binê wê xêz bikim, ku ez dûr û dirêj di wan nivîsarên xwe de li ser vê pirsgirêkê rawestiyame. Lê ger ez li vir behs bikim, ez bawer im belkî rûpelên kovara we têr nekin.

Mumkun e kurd jî ne hazir bûn. Ji ber ku rewşa kurdan ya eşîrî ji vê yeka han re ne musahît bû. Piraniya xelkê li dû şêx û axan bûn. Gava danûstandinek bibûya jî ne bi xelkê re dibû, lê bi şêx û axan re dibû. Ji ber ku di navbera şêx û axan de jî berberî hebû, ew nikanîbûn di vê de bi ser biketana. Gelek sebebên çaresernebûna vê bûyerê hene. Ev pirsgirêk çareser nebû. Ji xwe gava Kemalîst jî hatin ser hukum, wan Tirkiye bi navê "dewlet-netewe", "netewe-dewlet" bi nav kirin. Bi vî awayî dewlet di hundurê şovenîzma tirkî de hate avakirin. Ji berdêla dewleteke ji bo hevwelatiyan, dewleteke li ser hîmê şovenîzma tirkî hate avakirin. Di sînorên dewleteke weha de ne mafên kurdan, ne yên çerkezan, ne yên ereban wê tune be. Ancax mafên tirkan hebe.

Loma jî pirsgirêka kurdan nehate çareserkirin. Di eslê xwe de gavavêtina sazûmana Kemalîzmê ya ber bi Kapîtalîzmê kir ku Kurdistan bibe koloniyeke Tirkiyeyê ya milî. Kurdistan ji Tirkiyeyê re bû çavkaniya keda erzan û cihê madeya xav ya erzan. Vê îdeolojiyê xwest ku gelê kurd winda bike, asîmîle bike, ji navê rake. Rewşa îro jî ji ber wan kirinan û wê îdeolojiyê ye. Lê belê îro ew gelê ku bi hezar salan li ser wê erdê jiya bû, gihîştiye zanebûna xwe ya nete-

weyî.

– Karbidestên Tirkiyeyê ji bo ku kurdan asîmîle bikin, heme hema hemû medot bi kar anîn. Bi şidetê çûne ser kurdan, bi riyên nerm mîna em birayên hev yên hezar salan in û hwd çûne ser kurdan. Tu dizanî ku enstîtuyek bi navê "Enstîtuya lêkolîna kultura tirkî" li Tirkiyeyê heye. Vê Enstîtuyê rêzek pirtûkên ku kurdan înkar dikin, derxistin. Bi ya vê Enstîtuyê miletekî cihê bi navê "kurd" tuneye. Navê kurd ji berfê hatiye û kurd bi eslê xwe tirk in. Zimanê kurdî ne zimanekî serbixwe ye, lê ew devokeke tirkî ye. Herweha îro jî gelek rewşenbîrên Tirkiyeyê tunebûna kurdan îdia dikin. Dibêjin zimanê kurdî tuneye, an jî zimanê kurdî bi tenê ji sî gotinî pêk tê.

Em dibînin digel vê zilm û zorê, digel vê polîtîkaya înkar û asîmîlasiyonê, hê jî kurdan hebûna xwe parastine, zimanê xwe parastine, heta cihekî kultura xwe parastine. Ev nêrîna me ye. Ez ê ji wan rewşenbîrên kurdînkar bi rê bikevim, gelo bi rastî jî zimanê kurdî ewqasî jar e ku bi tenê ji sî gotinî pêk were? Tu di vê derheqê de çi difikî?

– Mixabin, ji ber ku haya min zêde ji ziman û edebiyata kurdî tuneye, ez ê nikanibim dûr û dirêj li ser vê mijarê bipeyivim. Zanebûna min ya di vê derheqê de gelekî bi sînor e. Lê ez vê dizanim, ku edebiyateke kurdan ya gelekî kevin heye, Ehmedê Xanî heye, Cegerxwîn heye... Herweha me bihîstiye ku edebiyata kurdî di zaravayê soranî de jî gelekî dewlemend e, lê mixabin min tiştek jê nexwendiye, loma ez ê nikanibim di vê derheqê de jî tiştekî bibêjim. Rast e, ev rastiyek e ku kurd nehatine asîmîlekirin. Tu dev ji asîmîlekirina kurdan berde, Tirkiyeyê gelê xwe jî asîmîle nekir. Li Tirkiyeyê kultura îslamî heye, kultura Asyaya Navîn heye û gelek tiştên weha. Em îro li Tirkiyeyê hezar perçe ne. Li gora ku em fikirîbûn, me nikarîbû nasnavek bidaya gelê xwe. Vê yeka han gavên berepaş bi xwe re anîn. Tirkiyeyê di cihê xwe de hejmart. Ew ji aliyê kulturî ve bi pêş neket. Niha tu bala xwe bidî wan welatên ku ne ji çaran yekê

me ne, tu ê bibînî ku ew bi her awayî di pêşiya me de ne. Ew ji aliyê demokrasî di pêşiya me de ne, ji aliyê xwendina pirtûkan di pêşiya me de ne, ji aliyê çûyina tiyatro, konser û galeriyên resim di pêşiya me de ne û gelek tiştên weha. Di bin sazûmaneke stemkar de, xwestin unîforma li me bikin û em yek tîp bifikirin. Asoya me teng ma. Asoya gelek rewşenbîrên Tirkiyeyê teng ma. Loma îro, nemaza di pirsgirêka kurdan de gelek rewşenbîrên tirkan teng difikirin. Peyveke Marx heye, ez dixwazim li vir dubare bikim. Marx dibêje, gelekî ku azadiya gelekî din ji destê wî bistîne, ew bi xwe jî ne azad e. Îro çawan ku kurd ne azad in, tirkî jî ne azad in. Loma, heta ku li Tirkiyeyê pirsgirêka kurdan çareser nebe, ne pirsa tirkan ya kulturî, ne pirsgirêka demokrasî, ne pirsgirêka mirovî, bi kurtî li Tirkiyeyê tu tişt çareser nabe. Her tiş bi pirsgirêka kurdan ve girêdayî ye.

– *Te ji edebiyata kurdî ya klasîk navê Ehmedê Xanî û Cegerxwîn da. Ji derveyî vê jî, nemaze ji aliyê xwende û têkoşerên kurd ku mecbûr man welatê xwe terk bikin û koçî Ewrûpayê bikin, îro edebiyatek pêk tê. Em navê "edebiyata kurdî ya sirgûnê" li vê dikin. Di nava vê edebiyata kurdî ya sirgûnê de gelek berhemên hêja; mîna roman, çîrok, helbest, lêkolîn, piyes û hwd. bi kurdî derketine û derdikevin. Gelek ji van berheman hêdî hêdî werdigerin zimanên biyanî jî. Ji ber ku tu bi xwe jî li Ewrûpayê dijî, ez bawer im wê hebekî haya te jê hebe, lê piraniya nivîskar û rewşenbîrên tirk ji vê yekê bêhay in. Ji bo ku diyalogek di navbera nivîskarên kurd û tirk de çêbibe, an jî pirek danûstandinê di navbera wan de ava bibe divê çi bête kirin? Di vê deheqê de tu pêşniyazên te hene?*

– Niha ku ez li xwe mikurr werim, digel ku ez li Ewrûpayê dijîm, zêde haya min ji edebiyata kurdî tuneye.

Berî niha bi çend mehan di rojnameya Özgür Ülkeyê de nivîseke min ya bi navê "Lihevhelalkirin" derketibû. Min di wê nivîsa xwe de ji Sendîkaya Nivîskarên Tirk re pêşniyazek biribû Min ev pêşni-

yaza xwe ji mêj ve bi riya nameyan ji hevalên xwe yên nivîskar re şandibû. Lê belê, ji ber hin hînbûyinên xwe wan zêde guh nedan vê pêşniyaza min. Niha li Tirkiyeyê sazgehên nivîskaran mîna Sendîkaya Nivîskarên Tirk û PEN hene. Ez bawer im ji bo ku mirov bibe endamên wan divê mirov hevwelatiyên Tirkiyeyê be. Lê çawan be formulek dikare jê re were dîtin û kurd jî bibin endamê van sazgehan. Ez bawer im, hemû problemên ku hene pêşî ancax di navbera kurd û tirkan de çareser bibe, ew dikarin problemên xwe çareser bikin. Ev dikare polîtîk be, hunerî be, edebî be; di her waî de hevkariya me pêwîst e. Ger em vê hevkariya xwe bi derengî bixînin, em bi girîngiya wê nizanibin, ji gelê kurd re jî wê guneh be, ji gelê tirk re jî. Ez bawer im, ji me pê ve, ji me herdu gelên ku bi hezar salan bi hev re jiyaye pê ve, wê tu kes, tu hêz nikanibin me li hev bînin. Ger em baweriya xwe bi hêzin din bînim, em ê li gelê xwe xiyanetê dikin. Rojava pirsgirêkên me çareser nake. Rojava pirsgirêkên me ji bo çareserkirina pirsgirêkên xwe bi kar tîne. Ev wilo ye, di huner û edebiyatê de jî wilo ye. Ji ber vê yekê, pêşniyaza min a vekirî ev e: divê em pêşî di eynî rêkxistinê de bicivin, wek mînak di Sendîkaya Nivîskarên Tirk de, di PEN'ê de û hwd. Ev yek, ya dudan, ev bi taybetî dikeve ser milên we, divê hûn bêî ku hêrs bibin û li ber xwe bikevin, berdewam danûstandinên xwe bi van rêkxistinên nivîskarî re çêbikin û li ser xwe agahdariyan bidin wan. Ev dikare bi riya broşuran bibe, bi riya civîn û konferansan bibe; lê digel vê jî wê ji aliyê wan ve gelek astengî derkevin, lê divê nivîskarên kurd ji bo van danûstandinan bi înad bin û qet hêrs nebin. Ger em pêşî baweriya xwe bi pêwîstiya çareserkerina vê yekê bînin, hingî mirov dikare gelek formulên cuda bibîne.

– Gelo ev ji aliyê hin nivîskar û rewşenbîrên kurdan ve şaş neyê fêhmkirin. Dikare wilo were fikirandin, ku divê siyasetvanên kurd jî dev ji rêkxistin û partiyên cûda berdin û werin di partiyên tirkan de

bixebitin?

– Bi destûra te be ez dixwazim dîsan behsa Sendîkaya Nivîskarên Tirkiyeyê bikim. Ya pêşî ew ne li gorî navê xwe ye, yanî navê wê şaş e. Navê wê Sendîkaya Nivîskarên Tirkiyeyê ye lê bi tenê mirov bi nasnava tirkî dikare bibe endamê wê. Ya rastî ew ne Sendîkaya Nivîskarên Tirkiyeyê, lê belê ew Sendîkaya Nivîskarên tirk e. Divê gelên din jî yên li Tirkiyeyê dijîn, bikaribin bi nasnava xwe bibin endamê sendîkayekê, an jî yekîtiyeke nivîskaran. Divê ew bikaribin li zimanê xwe, li berhemên xwe xwedî derkevin. Nizanim, min bi te da fêhmkirin?

Lê îro SHP partiyeke tirkan e, DYP partiyeke tirkan e, kurd jî digel gelek astengiyan dikarin di nava van partiyan de bixebitin, lê belê heqê wan heye ku ew partiyên xwe jî ava bikin. Ez ji wê re tiştekî nabêjim.

Lê di bingeh de şaşiyek heye. Navê sendîkaya me Sendîkaya Nivîskarên Tirkiyeyê ye, lê bi tenê tirk dikarin bibin endam, ji bo endambûna kurdan, zehmet e. Divê em li ser bingehên demokrasiyê Sendîkayeke Nivîskarên Tirkiyeyê ku kurd, çerkez, ermenî û hwd. bikaribin bibin endam û xwe tê de bibînin ava bikin. Ger hûn bixwazin yekîtî an jî sendîkayeke nivîskarên kurd ava bikin, ez ne li dijî wê me jî. Lê wê ew bibe Sendîkaya Nivîskarên Kurd, wê nebe Sendîkaya Nivîskarên Tirkiyeyê. Ger îro gotina TIRKIYE mîna gotina TIRK we aciz dike, dikare di pêş de li ser bête fikirandin. Lê îro li Tirkiyeyê ji bilî tirkan jî miletên din hene û pêwîst e Sendîkaya Nivîskarên Tirkiyeyê hemûyan hemêz bike.

– *Niha, mîna kurd, mîna nivîskarekî ku bi kurdî dinivîsîne, yek dikare bibe endamê vê sendîkayê?*

– Ji xwe pêşniyaza min jî ew e, ku kurd bikaribin bi nasnava xwe ya kurdî bibin endam. Ji mêj ve ye ez vê diparêzim û vê yekê bi hevalên xwe yên nivîskar re munaqeşe dikim. Min berî niha bi salekê

du salan ji serokê duwem re nameyek nivîsand. Pêşniyaza min ev e. Îcar wê Sendîkaya Nivîskarên Tirkiyeyê vê yekê qebûl bikin, qebûl nekin, kî nêzîkî fê fikrê hene, ez nizanim. Ev pêşniyazek e û min kiriye, lê gelo nivîskarên kurd di vê derheqê de çi dibêjin, divê mirov li wê jî bifikire.

Gava min di vê derheqê de ji serokê duwem yê sendîkayê re name nivîsandibû, wî di bersiva xwe de gotibû, em li eslê endaman napirsin, min jî di rojnameyê de nivîsand ku divê mirov li eslê wan bipirse. Ger yek bi kurdî dinivîsîne û xwe mîna nivîskarekî kurd dide naskirin, ew nivîskarekî kurd e. Na, tu dîsan rabî bibêjî, na Wele tu tirk î, çênabe. Ger nivîskerek dibêje, ez kurd im, ji bo çi tu ê wî mecbûr bikî ku ew bibe tirk? Divê ew bikaribe bibêje, ez kurd im, bi kurdî dinivîsînim, lê ez endamê Sendîkaya Nivîskarên Tirkiyeyê me. Mirov di sendîkayê de dikare maseyên cûda ava bike. Mîna maseya yên bi tirkî dinivîsin, yên bi kurdî dinivîsin, yên bi ermenîkî dinivîsin û hwd.

Di dema xwe de li Tirkiyeyê gelek rojnameyên ermeniyan derketine, gelek nivîskarên jîr derketine, lê ev polîtîkaya me ya şoven ev hemû înkar kirine. Min tiştek bihîst, ku berî bi salan piyeseke nivîskarekî ermenî ku li Stembolê rûdinişt, li Londonê leyistiye û suksêyek mezin jî kiriye, lê haya me ji nivîskarê wê tune ye. Bi ya min ev hemû berhemên hevbeş yên welatê me ne. Bihêlin bila mêrik bi kurdî binivîsîne, bihêlin bila mêrik bi ermenîkî binivîsîne, bihêlin bila mêrik bibêje ez kurd im, lê ez dixwazim bi tirkî binivîsînim.

– *Mirov carinan wilo difikire, ji bo ku danûstandina nivîskarên kurd û tirk xurttir bibe, diyalogek di navbera wan de dest pê bibe, mirov foneke wergerê ava bike. Yanî mirov berhemên kurdî wergerînin tirkî û berhemên tirkî jî wergerînin kurdî. Gelo tu vê nêrînê çawan dibînî?*

– Pir baş e, pir baş e. Lê tu dizanî ku nivîskarên tirk di nav feqîrî û

belengaziyekê de ne. Ew nikanin li ser berhemên xwe bijîn. Ji bo ku ew bikaribin jiyana xwe bidomînin, ew mecbûr in ku ji derveyî nivîskariyê karekî din bikin. Niha li Swêdê gelek îmkanên we hene. Loma, normal e ku pêşniyazeke weha ji aliyê we ve were kirin. Min her xwestiye ku romaneke min, pirtûkeke min wergere kurdî û gelê kurd wê bixwîne. Ez dizanim ku gava pirtûka min wergere kurdî wê di aliyê madî de zêde fêdeyekê negihîne min, lê ji bo ku ez dixwazim dengê xwe bigihînim gelekî ku ev hezar sal in em bi hev re dijîn, gelekî tadeyiya me gihîştiyê û me zulm lê kiriye, wê hingî rehetiyekê bide min. Ev pêşniyaza te pêşniyazeke baş e, lê belê ka kî ê wê fonê peyda bike? Ger hûn li bende bin ku wê Tirkiye foneke weha ava bike, vala ye, çênabe. Lê ger foneke weha peyda bibe, berhemên kurdî wergerin tirkî û berhemên tirkî jî wergerin kurdî, bi ya min gaveke pir girîng e.

Nûdem, No: 14, 1195

ARÎF DAMAR: "EZ DOSTÊ MUSA ANTER BÛM"

Arîf Damar yek ji şaîrên Tirkiyeyê yê bi ber û bijarte ye. Wî heta niha zêdeyî deh pirtûkên şiîran nivîsandiye. Herweha ew yek ji çepên Tirkiyeyê yê kevin e. Me ji bo xwendevanên Nûdemê ev hevpeyvîna li jêr pê re çêkir:

Nûdem: *Di kovara Yeni Düşün de rûniştinek li ser helbesta tirkî hebû. Ez bawer dikim tu bû, Kemal Özer bû, Can Yücel bû. Hûn li ser helbesta tirkî ya piştî 1980 û berî wê peyivîbûn. Ger mirov helbesta berî 1980 û ya piştî wê beramberî hevdu bike, bi ya te çi pêşketin, an jî çi guhertin heye?*

– Niha, berî darbeya 1980 li Tirkiyeyê helbestkar û nivîskarên sosyal-realîst hebûn, pir bûn, lê belê piştî hatina cûntayê, gelek ji wan hatin girtin, îşkence dîtin, pirr asteng derketin pêşberî wan. Gelekan ji wan jî xwe kişandin quncikên xwe û bêdeng man. Yanî darbeya eskerî darbeyek li hunera pêşverû jî xist.

Gotina min ya sosyal-realîst bila şaş neyê fêhmkirin. Di eslê xwe de huner îndîvîduel e. Helbestkarên mezin mîna Nazim Kikmet û Pablo Nerûda jî îndîvîduel bûn. Lê belê îndîvîduelên ji pirraniyê bûn. Ez jî helbestkarekî weha me. Lê ez perçeyek ji gel im. Dilşahiyên min, xemgîniyên min bi temamî bi bûyerên civakî ve girêdayî ne.

– Rewşa helbesta tirkî ya di plana navneteweyî de çawa ye?

– Ez dikarim vê bibêjim, berê edebiyata dinyayê, helbesta dinyayê li Tirkiyeyê zêde nedihate zanîn. Lê îro êdî ji edebiyata dinyayê gelek berhem têne wergerandin. Di nava van wergeran de helbest jî

cihekî berbiçav digire. Îro helbesta dinyayê li Tirkiyeyê baş tête taqîbkirin. Îro ji helbesta Emerîka Latînî, ya Emerîka, ya Fransayê bigire, heta ya Îtalya û Yunanîstanê li Tirkiyeyê tête zanîn. Gava mirov li van helbestan dinihêre, helbesta tirkî qet ne kêmî wan e. Ji ber ku tradisyoneke hunera helbestê jî li Tirkiyeyê heye. Tradsiyona edebiyata Dîwanê, ya hozanên gel mîna Pir Sultan Abdal, Dadaloğlu, Köroğlu û hwd. heye. Loma, ji xwe li Tirkiye di nava şaxên edebiyatê de helbest ya herî li pêş e. Helbesta tirkî ji çîrok û romana wê pêşdetir e. Ger îro helbesta tirkî di plana navneteweyî de mîna helbesta yunanî, ya îtalî, ya fransî deng nedabe, ji ber zimanê tirkî tê, ji ber ku ew bi zimanê tirkî hatine nivîsandin. Şansê zimanê tirkî mîna yên zimanên din tune ye.

Li Tirkiyeyê helbestkarên mezin hene, lê haya dinyayê ji mezinahiya wan tuneye.

– Gelek nivîskar bi helbestê dest bi nivîsandinê dikin û paşê derbasî şaxên din yên edebiyatê mîna çîrok, roman, piyes û hwd. dibin. Lê yê te, mîna xortekî heftê salî tu hê jî helbestan dinivîsînî. Ji bo çi tu derbasî prosayê nebûyî?

– Ji bilî helbestan min hin tiştên din jî nivîsandine. Xebata min ya li ser romanan jî çêbûye, min hin çîrok jî nivîsandine. Lê belê mijûliya min ya sereke helbest e. Ji ber ku şerdên zehmet yên jiyanê destûr nedida ku ez bikaribim bi salan li ser berhemekê rawestim. Ji bo jiyanê diviyabû min ji bilî edebiyatê karin din bikira. Ez gelek salên dirêj di fabrîkayan de mîna midûr û ekonom xebitîme. Ev karên zehmet in, mirov pê diweste. Îcar digel vê zehmetî û westandinê, şerdên xerab yên siyasî rê li ber gelek tişran digirt. Di sala 1963'an de, ji ber hezkirina min ya pirtûkan, min pirtûkxaneyek vekir, lê belê wê jî gelek wextê min digirt û hatina wê pir kêm bû. Di nava van hemû bêîmkanî û teşqeleyan de, min helbestnivîsandina xwe dom kir, ez têk neçûm, min li ber xwe da û heta îro jî ez her helbestan

dinivîsînim. Îro nêzîkî deh pirtûkên min yên helbestan hene.

– Ez dizanim ku tu yek ji çepên kevin î, ji ber fikrên xwe yên siyasî tu di girtîgehan de razayî. Gelo cara dawî tu kengî hatî girtin û sedema girtina te çi bû?

– Cara dawî ez ji ber helbesteke xwe hatim mehkemekirin. Ew helbesta min jî helbesteke kevin bû, min di salên şêstî de nivîsandibû, lê ew di sala 1982'an de di kovarekê de hate weşandin. Ji ber wê ez dame mehkemê lê ez nehatim girtin. Ez di sala 1984'an de jî hatim girtin. Ew jî hinan li min gilî kiribûn, ku min di pirtûkxaneya xwe de propaganda kiriye. Li ba polîsên siyasî îfadeya min hatibû girtin. Ez hingî di hucreya siyasiyan de dimam. Di wan hucreyan de tije xortên şoreşger bûn ku îşkenceya nedîtî li wan dihate kirin. Yê min jî çavên min girê didan, ez dibirim odeya îşkencê û ji min pirs dipirsîn. Ji min re digotin ku ez endamê TKP me. Lê ger TKP'yiyan bibihîstana ew ê bikeniyana. Ji ber nivîseke ku min di kovara Yılmaz Güney de nivîsandibû de, wan çûyina min ya welatên sosyalîst qedexe bûbû. Ez bi antî Sovyetîzmê ve sûcdar dikirim.

Dewletê xwest min ji madeyên 141 û 142'an ceze bike, gava bi ser neketin, vê carê jî bi qanûnên sazûmana leşkerî, ez sê mehan mehkûm bûm, ez di 84'an de du mehan razam. Piştî ku ez derketim min pirtûkeke din nivîsand, min bi wê pirtûkê xelat wergert û wê yeka han jî azadiyek da min.

– Niha di ser wê dîrokê re deh sal derbas bûne. Gelo li Tirkiyeyê di warê azadiya fikrê de tu guhertin çêbûne?.

– Ez dikarim vê bibêjim, madeyên 141 û 142 hebûn ku li Tirkiyeyê azadiya mirovan bi sînor dikir. Yek jî madeyek 163'an heye ku ew jî li dijî şerîetparêziyê ye. Gava rewşenbîran xwestin madeyên 141 û 142 rabin, wan herweha xwestin ku madeya li dijî şerîetparêziyê, 163 jî rabe. Bi a min ew li vir xapiyan. Ji ber ku şerîetparêzî ne demokratîk e, ew li dijî sîstema medenî ye. Vê carê jî, ji bo ku dew-

let valahiyekê dagire, madeya *bi terorê re têkoşîn* derxistin. Ji aliyekî de mirov dikare bibêje ku madeyên 141 û 142 rabûne. Ez niha mirovekî ku wextî têkeve 70 saliya xwe, û hinekî jî navê me tê zanîn. Ez bawer im wê ji ber vê yekê be, ku êdî piştî 1984'an ji ber pirtûk û nivîsên min, tu ceze ji min re nehat, an jî tu mehkeme di derheqa min de venebû. Lê belê, nivîskar û şaîrên ciwan hene, hê kes wan nas nake, ew ji bo nivîsên xwe û şiîrên xwe dikevin girtîgehan.

– Mumkun e, tesîra bi emirbûn û navê te hebe, lê îro di girtîgehên Tirkiyeyê de gelek xortên kurd, nivîskarên kurd û heta nivîskarên tirk ku behsa pirsgirêka kurdan dikin, hene. Bi taybetî di vê dema dawiyê de, gelek rewşenbîrên tirkan jî dest bi munaqeşeya pirsgirêka kurdan kirine, heta serokcumhûr Süleyman Demirel jî behsa realîteya kurdî filan kir, lê belê em dibînin ku di vê dema dawî de mîna ku li dijî kurdan jenosîdekê dest pê kiriye, gundên kurdan têne şewitandin. Ev çawa ye, hem realîteya kurdan qebûl dikin, hem jî tavilê înkar dikin. Hem dibêjin kurd birayên me ne, hem jî malên birayên xwe dişewitînin, bajarên wan wêran dikin, êgir bi daristanên wan dixînin. Nêrîna te di derheqa vê yekê de çi ye?

– Ez bi vê rewşa han ji dilxemgîn dibim. Ez pir li dijî vê yeka han im. Li gorî nêrîna min ev pirsgirêkeke demokrasiyê ye. Li Tirkiyeyê hemû însanên ku difirin, di bin zulmê de ne. Rast e, gund têne şewitandin. Wezîrê mafê mirovan Azîmet Köylüoğlu bi xwe mukur hat, wî got gund hatine şewitandin. Hin wezîrên SHP'yê mukur hatin ku gund têne şewitandin. Lê serokwezîr, wezîrê karê hundur vê yekê înkar dikin, qebûl nakin. Îro li Tirkiyeyê eskerî çi bibêje, meclîsa Tirkiyeyê nikare li dij derkeve, qebûl dike. Mesele "Milli Güvenlik Kurulu" naxwaze "Olağan üstü hal" rabe, meclîs jî mecbûr vê qebûl dike. Yanî li Tirkiyeyê meclîs bê tesîr e, eskerî Tirkiyeyê îdare dike.

– Di dema Özal de ji bo kurdan termên mîna otonomî, federasyon

û hwd. hatin bi kar anîn, mîna rewşenbîrekî tirk ez bawer dikim tu dizanî ku li Tirkiyeyê pirsgirêkeke kurdan heye. Ji bo çareserkirina vê pirsgirêkê, çi celeb pêşniyazên te hene?

– Bi a min kurd miletî cihê ye, divê ew li Tirkiyeyê bikaribin bi zimanê xwe bixwînin û binivîsînin, di radyo û televizyonan de weşana bi zimanê kurdî bête kirin, zilma li ser kurdan rabe. Lê ger mirov pirsgirêkê ne weke kurd, lê weke Tirkiyeyê bigire dest, wê baştir be. Mesele gava mirov dibêje Emerîkayî, di nav wan de îngilîz hene, alman hene, îtalî hene, spanî hene, cihû hene û hwd. Ev hemû Emerîkayî ne. Gava em bêjin Tirkiyeyî, kurd jî dikevinê, çerkez jî, laz jî, ereb jî. Gelo min bi te da fêhmkirin? Yanî ger mirov bibêje Tirkiyeyî wê baştir be.

– Gelo bi ya te, rewşenbîrên tirkan bi qasî ku pêwîst e zilma li ser kurdan, zilma li ser ziman û edebiyata wan, zilma li ser kultur û folklora wan protesto dikin?

– Tu bala xwe bidiyê, li Tirkiyeyê yek ji wanên ku herî pir li ser pirsgirêka kurdan radiweste, Îsmaîl Beşîkçî ye û ew bi xwe tirk e. Ez îro ne bawer im ku li Tirkiyeyê, tu nivîskarên tirk, tu alim û rewşenbîrên tirk bixwazibin ku kurd bêne pelçiqandin. Lê hinek kovar û rojname, hinek kanalên televizyonan vê pirsgirêkê nabînin û bi navê rewşenbîran tevdigerin, ez bi xwe dibêjim, ew ne rewşenbîr in. Ji xwe pirsgirêka kurdî li Trikiyeyê heta tabu bû, kesî newêribû behsa vê pirsê bikira. Ev tabuya han di dema Özal de şikest. Lê ew jî di vê pirsê de çiqasî cidî bû nayê zanîn. Ez bi xwe ne bawer im ku wê pirsa kurdan bi riyên eskerî were çareserkirin. Yanî tu rabî gundên kurdan bişewitînî, kurdan ji cih û warên wan koçber bikî, ev ne çareseriya pirsgirêkê ye, ev pirsgirêka ku heye mezintir dike. Ez bi xwe li gel çareseriyeke siyasî me. Divê pirsgirêka kurdan bi awayekî aştî, bi riyeke siyasî çareser bibe.

– Piraniya tirkan, piraniya siyasetvan û rewşenbîrên tirkan dibê-

jin ku ew bi sedsalan bi kurdan re jiyane, keç dane wan, ji wan zewicî ne. Pirsa min ev e, gelo haya rewşenbîrên tirkan çiqasî ji edebiyat û kultura kurdan heye? Tu bi xwe çiqasî edebiyat û kultura kurdî nas dikî?

– Ez bi xwe bi kurdî nizanim. Lê hindik be jî haya min ji edebiyata kurdî heye. Demekê Mem û Zîn dihate firotin, min ew kirî û xwend. Min hin şîrên Cegerxwîn jî ku wergeriyabûn tirkî xwendine. Wekî din li Tirkiyeyê gelek nivîskarên ku bi eslê xwe kurd in lê bi tirkî dinivîsînin, hene. Wek mînak, Cemal Süreya kurd e, Ahmed Arîf kurd e, Yaşar Kemal kurd e, lê wan berhemên xwe bi tirkî nivîsandine. Gelo bi kurdînivîsandin ji wan re zehmet bû, wan çima bi kurdî nenivîsandine, ez nizanim. Min Cemal Süreya baş nas dikir, wî bi kurdî nizanîbû. Lê ger nivîskarên bi eslê xwe kurd, bi kurdî binivîsandina, wê îro zanebûna me ya di derheqa ziman, edebiyat û kultura kurdî de zêdetir bûya.

– Gava min xwe bi we mîna nivîskarekî kurd ku bi kurdî dinivîsîne, da naskirin, we çi hîs kir? Hûn li Tirkiyeyê pêrgî mirovên wisa tên?

– Ez bi xwe dostê Musa Anter bûm. Min di salên sihî de ew di nava TIP'ê de nas kir. Demekê mala wî pir nêzîkî dikana min ya pirtûkan bû, me gelekî hevdu didît. Min pir jê hez dikir.

– Bi taybetî piştî salên 80'ê, bi hatina cûntayê û bi derketina kurdan ya derveyî welêt re, di ziman û edebiyata kurdî de geşbûnekê dest pê kir. Îro li Swêd û li hin welatên din yên Ewrûpayê di warê şiîr, çîrok û romanê de mînakên baş têne pêşkêşkirin. Gelek kovarên xwerû bi kurdî derdikevin. Digel vê jî, hê li Tirkiyeyê ji hin der û doran, hin nivîskar û rewşenbîr dibêjin ku zimanê kurdî tuneye, ew bi tenê ji sî gotinan pêk tê. Tu ji van celebmirovan re çi dibêjî?

– An hinek ji wan bi rastî nizanin, an jî ew pir di bin tesîra îdeolojiya fermî de ne. Çawa dibe ku mirov di roja îro de kurdan û zima-

nê wan înkar bike. Bi cildan pirtûk li ser dîrok, ziman û edebiyata wan hatine nivîsandin. Bi cildan pirtûk li ser gramera kurdî hatine nivîsandin.

– Bi ya te têkiliyeke têrker di navbera rewşenbîrên kurd û tirk, nivîskarên kurd û tirk de heye?

– Ez bawer im ger li Tirkiyeyê nivîskarên kurd hebin, wê di navbera me de jî têkiliyeke baş hebe. Lê tiştê ez dizanim li Tirkiyeyê, kesên ku bi kurdî dinivîsînin an tunene, an jî gelekî hindik in. Loma em qet pêrgî wan nehatine. Lê kesên ku bi eslê xwe kurd in lê bi tirkî dinivîsînin, hemû dostên me ne, em di nava hevdu de ne. Tirkiye ne mîna Ewrûpa ye. Va ye hûn dibêjin ku li Ewrûpa şîrên kurdî, çîrokên kurdî, romanên kurdî têne nivîsandin. An jî hûn kovareke weha berfireh mîna Nûdemê derdixin. Lê li Tirkiyeyê tiştekî wisa tuneye. Ev dibe ku jî ji ber qedexebûna zimanê kurdî tê. Yanî îro ez li Tirkiyeyê der û doreke edebî, komeke edebî ya kurdan nabînim ku têkilî di navbera me de çêbibin.

Nûdem, No: 18, 1996

AVAKIRÊ KURDISH ROCK; CIWAN HACO

Nûdem: *Tê gotin ku mirov hînî hunerê nabe, lê mirov hunermend tê dinyayê. Tu ji vê yekê re çi dibêjî?*

Ciwan Haco: Bi baweriya min huner di dereca yekem komeleyek hest e û hest jî ew tiştin ku nayêne hînbûn. Behremendî (talant) bê goman nabe nesîbê her mirovî, loma jî mirov dikare bêje ku mirovê hunermend gava tê dinyayê di cewherê wî yan wê de rayê hunermendiyê heye. Kî dizane belkî niha zanyarên teknolojiya gênan (gentekuologi) dikarin bizanibin ka kî ê bibe hunermend û kî nabe?! Lê em hemû jî dizanin kn behremendî dereceyên wê jî hene, hin kes biserdikevin û tiştên hêja diafirînin û hin jî li paş dimînin. Her çawa be, behremendî nagihije pêpelûka hunermendiya baş eger bandûra hişmendî û zanînê lê çênebe, eger neyête şahîkkirin û bipêşve nekeve.

– *Muzîk ji bo te çi ye, tê çi maneyê?*

– Muzîk ji bo min îro pîşe û wateya hebûnê ye. Ez xwe pê xwedî dikim û bi xêra wê maneyekê ji jiyanê re dibînim. Lê belê eger pirs ew be gelo muzîk çi ye, ez ê hinekî bi şûn ve vegerim. Muzîk mîna fênomeneke civakî her û her û bi dezgehên olî ve girêdayî bû. Di civakên prîmîtîv de jî herweha hişk bi teqsên (ritual) cihêreng ve girêdayî bû. Paşê di civakên derebegî de, ji bilî wezîfeya ayinî, muzîk bû xwedî wezîfeyeke bêhtir dinyayê û motîvên ji olê der di muzîkê de peyda bûn û navê vî şêweyê muzîkê ku ta roja îro pir belav e, muzîka gelêrî ye, ku bi xêra dengbêjan jîndar maye. Li welatê me ji sedê salan ve, û belkî jî ji hezarê salan ve, ev rengê muzîkê serdest e

û her weke xwe maye. Li welatên xelkê û yên cîran ji hemdema navîn ve muzîkvanên kuhne, yanî komponîst, peyda bûne û îro li piraniya dinyayê muzîk amojgeheke (institution) bi serê xwe ye. Loma muzîk berî her tiştî fênomeneke civakî ye, û rewşa wêran ya muzîka kurdî ji rewşa wêran ya civata kurdî tê.

– Tu muzîka xwe çawan çêdikî? Tu li ser notayê dixebitî an mîna gelek hunermendên kurd bê nota dixebitî?

– Ez carcaran notayê bikartînim, lê baweriya min bêtir bi îlhamê heye, yanî eger bû û awazek hate hişê min, bere pir kurt be jî, ez yekser tomar dikim û li ser bingeha wê kurteawazê stranê dihûnim. Gelek caran jî bi tevayî, ez û sazbendên ku bi min re lêdixin, bi hev re dixebitin û rengê stranê yê dawî didinê.

– Girîngiya notayê di muzîkê de çi ye?

– Girîngiya notayê bi ya min ew e ku muzîk li ser kaxezê were qeydkirin û bi vî awayî her kes li her deveta cîhanê bikaribe bixwîne û lêbixe. Ev nirxa bêhtir di muzîka orkestralî û koralî de tê xuyakirin, ji ber ku parçeyên muzîkê pir dirêj in û wekî din jî hejmara sazbendan yan jî dengbêjan pir zehf e. Di muzîka min de ev pir ne girîng e, lê ez dîsa jî dibînim gaveke bi pêş de ye dema muzîkvan bi notayê bixebite.

– Di stran û awazên kurdî yên klasîk de dewlemendiyeke xurt xuya dike. Gelo hêza vê dewlemendiyê ji ku tê?

– Dewlemendiya muzîka kurdî ya klsakî li ba piraniya kurdan hatiye pejirandin û hinek rastî di vê îdiayê de heye. Pirrengiyeke ku nayê înkarkirin di zargotina kurdî de heye û ev jî cihê serbilindahiyê ye. Lê belê tiştekî diyar e ku muzîka kurdî di warê miqamên muzîkê de ji muzîka cîranên xwe, çi ereb, tirk, yan farisan dewlemendtir e. Pirrengîtî jî bi baweriya min nêzîk bi siruşta Kurdistanê ve girêdayî ye. Çiya û şaxên bilind, newal û geliyên kûr hiştine ku komeleyên biçûk û belav li seranserê welêt, ta radeyekê, bi awayekî ji hev-

qut û otonom bijîn. Pirrengîtî di muzîkê de, mîna gelek aliyên din yên jiyanê, ji vê tê.

– Lê te xwe ji tradisyona muzîka kurdî ya klasîk qut kiriye. Çima?

– Ev îdiayeke ne rast e. Bê goman muzîka min ne tradisyonî ye, yan jî kevneşopî ye mîna hin dibêjin, lê belê min xwe ji muzîka kurdî qut nekiriye. Ez li Kurdistanê mezin bûme û li ser muzîka kurdî hatime perwerdekirin û zargotina kurdî di xwîna min de ye û nikarim xwe jê bişom. Tona bingehî di muzîka min de her kurdî ye, wekî din jî êlêmentên folklorî di muzîka min de pir in û diyar in, çi newhirandin yan jî qîr kirin. Wekî din jî stranên xurû gelêrî, mîna "Ziravê" ya Miradko, dibêjim.

– Edebiyata modern, hunera modern, muzîka modern bi piranî ji civatên modern dertên û xîtabî mirovên civatên modern dikin. Gelo ger em ji muzîka te bi rê bikevin, em ê bikaribin bibêjin ku ev celebê jiyana modern di civata kurdan de jî peyda bûye?

– Bê goman, erê. Îro belkî zêdeyî ji sedî heftêyê kurdan li bajaran dijîn, çi li Kurdistanê û çi li metropolên dagîrkeran. Nêzîkî nîv mîlyon kurd jî li Ewrûpa û Emerîkayê dijîn. Jiyana modern bi xêra teknolojiya taze gihîştiye ta bi gundan jî. Wekî din jî xwendin di salên dawî de pir belav bûye û hejmara kurdên xwedî tehsîla akademî her diçe zêde dibe. Tevî vê qasê, eger jiyana modern di nava kurdan de hewqasî ne belav bûbe jî, sedema wê rewşa konevaniya ku taqeta gelê kurd û potansiyela wê ya modern difetisîne. Lê nîşanê jiyana modern li ba kurdan di her warî de xwe didine der, di muzîkê de, di sînemayê de, di warê ragihandinê de (MED TV), di siyasetê de û di warê çapemenî û rojnamevaniyê de, kovara we jî nîşaneke vî tiştî ye. Lê pêwîst em ji bîr nekin ku em li gora xelkê hîn pir lipaşmayî ne.

– Lê belê motîvên civatên modern ne şer û pevçûn, kuştin û koçkirin e; problemên îndîvîd, psîkolojiya civatê, evîn, erotîzm û lwd e.

Çima motîvên di vî babetî de di muzîka kurdî ya îroyîn de kêm in?

– Ev tişt rast e. Muzîk mîna şêweyekî xwederbirînê (te'bîrê), helbet wê problemê civakê ji xwe re weke motîv bigire. Promlemên ku te li jor anîne ziman, problemên civakên îndustriyalîst in. Civaka me jî mîna civakeke li ser riya modernîtiyê pirsgirêkên wê yên bi vî hawî hene, lê ne bi dijwariya wan civakan. Li welatê me dagîrkerî sedema her tiştî ye, em wisa bawer in ku rizgarbûna Kurdistanê dê hemû probleman çareser bike. Îndîvîd di vê merhelê de ne hewqasî di navenda mitalan de ye, û ev jî tê famkirin. Ger tu îro bala xwe bidî Bosnayê tu yê bibînî ku rewşa welatê wan gişt hema motîva tenha ye ku hunermendê wan pê mijûl dibin, digel ku Bosna berê ne wisa bû û hunermendên wan mîna yên her civakên modern mijûlî pirsgirêkên din bûn.

Wekî din jî hêja ye bêjim ku motîvên muzîka roavayî ne tenê ewên te li jor gotî ne, muzîkvanên Rock li Emerîkayê serêşayiyeke mezin ji hukûmetên welêt re çêkirin derbara pirsa şerê li dijî Vîetnamê; îro jî birçîtî, feqîrî li dinyayê û rewşa hawîrdorê têmayên germîn bona muzîkvanên roavayî ne.

– Gava mirov klasifîkasiyoneke muzîka te bike, mirov ê muzîka te têxe kîjan kategoriyê?

– Ev pirseke ku pir ji min tê pirsîn û bersiva wê ne hêsan e. Di muzîka min de elementên ji gelek texlîtê muzîkê hene, mîna blues, rock, jazz û hwd. Û weke min gotî muzîka min di hîmê xwe de kurdî ye, û ji her cûreyên muzîka kurdî element tê de hene. Li Ewrûpa van salên dawîn di nav komeleyên mahcir de, nemaze li Brîtanyayê, tevgereke muzîkê bi hêz peyda bûye. Bi vê re terma "ethnic rock" hatiye meydanê û di dinyaya muzîkê de cihê xwe girtiye. Muzîka min jî bi gelek awayan dişibe vê texlît muzîkê. Bi baweriya min terma "kurdish rock", yanî rocka kurdî, wê navekî di cihê xwe de be.

– Muzîka Emerîka Latînî, ya erebî, ya fransî, ya ewrûpayî bi giştî navneteweyî bûne; gelo sebebên ku heta niha muzîka kurdî navneteweyî nebûye, çi ne?

– Navnetewîbûna çi muzîkê û çi hunerên din pirseke piralî ye. Ew hem aborî ye, hem konevanî ye, hem zimanî ye, hem teknolojî ye, hem dîrokî ye û hem jî hunerî ye. Eger muzîka ewrûpayî îro navneteweyî ye, ew ji giranî û girîngiya Ewrûpa di qada dinyayê de tê. Çawa îro Roava hewl dide uslûbê jiyana xwe, nirx û baweriyên xwe bi cîhanê tevî bide qebûlkirin mîna norma herî rast û baş, û ta radeyekê bi ser ketiye, wisa jî hewl dide çanda xwe, di nav de muzîk, bi eynî şêweyî bide pejirandin. Bona vî tiştî ev welat her wesîleyan bi kar tînin, carnan bi xweşî û temakirinê û carnan bi tehdît. Lê helbet evê bi ser biketa eger muzîka wan nexwedî nirxekî hunerî baya. Ev nayê înkarkirin. Mebest ew e ku navneteweyîbûn şertên wê hene ku li ba kurdan hal hazir peyda nabin. Yek dezgeheke kurdan ya navneteweyî nîn e, di dinyayê de kurd hatine naskirin kn ne xwedî çandeke kevnar û berfireh in, muzîka kurdî şêweya wê ji her alî ve nizm e, muzîk nebûye îndustriyeke qayim, em hindik in û ji dinyayê îzole bûne.

– Têkiliyên huner û polîtîkayê divê çawa bin? Tu hunera ji bo polîtîkaya rojane çawan dibînî?

– Bi baweriya min huner û polîtîka ji hev nayên cudakirin. Tesîra polîtîkayê li ser jiyana ,mirovan ya rojane heye, û loma jî tesîra wê li ser hunerê jî pir mezin e. Li welatê me tenê ji ber ku dengbêj bi kurdî stranan dibêje tê girtin û kuştin. Hunermendî, eger bi kurdî be, ji aliyê dagîrkeran ve mîna çalakiyeke polîtîkî tê nirxandin.

Huner dê tu caran meda xwe nestîne eger ne azad be. Loma huner gereke dereceya yekem bona azadiya xwe li ber xwe bide. Azadiya huner jî bi ya netewê ve girêdayî ye. Lê kêfarata huner bona azadiyê û jiyaneke bi rûmet bi rizgarbûna welat dawî lê nayê, ew

kêfarateke bê dawî ye. Huner xwederbirîna wijdanê gel e, û wijdanê gel bi polîtîka rojane nalive. Polîtîka rojane pîşê siyasetmedaran e, ne yê hunermendan e.

Nûdem, No: 17, 1996

GULÎSTAN: "DI STRANÊN KURDAN DE LÎBERALÎZMEK HEYE"

Nûdem: *Gelo em dikarin hinekî Gulîstanê nas bikin? Gulîstan kî ye, ji ku ye, niha li ku dijî?*

Gulîstan: Zehmet e ku mirov behsa xwe bike, lê ez ê dîsa jî hewl bidim ku hinekî xwe bidim naskirin. Ez li gundekî di navbera Wêranşar û Siwêregê de hatime dinyayê. Ez heta şeş saliya xwe li wî gundî jiya me. Paşê me mal bar kir Wêranşar. Li wir jî em deh salan man. Piştî wê jî ez hatime Ewrûpa. Yanî ez di şanzdeh saliya xwe de derketim Ewrûpa û ew roj ev roj e ez li Ewrûpayê dijîm. Niha jî mala me li Swêdê ye, ez li bajarê Uppsalayê bi kurê xwe Serxwebûn re dijîm.

– Tu di şanzdeh saliya xwe de derketî derveyî welêt û her di şanzdeh saliya xwe de jî bi hunermend Şivan re zewicî. Berî ku tu derkevî derveyî welêt me tu dengê te nebihîstibû, me bêtir dengê te bi derketina te ya derveyî welêt re bihîst. Gelo hunermendiya te bi derketina te ya derveyî welêt re dest pê kir, an berê jî têkiliya te bi muzîkê re hebû?

– Mîna tê zanîn huner li Kurdistanê ne zêde populer bû. Bi taybetî hunera muzîkê li gelek deverên Kurdistanê tiştekî neyînî dihate dîtin û hunermend jî kesên di civatê de endamê sinifa dudan an sisiyan bûn. Bi gotineke din, ne malmezin û esilzade bûn, lê belê qereçî bûn, mitirb bûn. Di civatek weha girtî de geşbûna hunerê jî ne ewçend hêsan e. Ez jî ji malbateke şêx têm, ku xwediyê gelek mirîdan bûn. Di malbata me de bi erbanê qesîde û methiyeyên dînî dihatin gotin û diya min jî yek ji wan kesan bû an yek ji wan jinan bû ku bi dengekî xweş qesîde û methiye digotin. Gotina diya min tesî-

rek li ser min jî hişt. Min jî car caran bi wê re, an jî bi tenê qesîde û methiye digotin û dengê min dihate ecibandin. Lê ev nayê wê maneyê ku min ji muzîkê fêhm dikir, an jî ez bi zanebûn li ser hunera muzîkê hûr dibûm. Biçûktiya min di der û doreke weha de derbas bû.

– Te got kesên ku bi hunera muzîkê mijûl dibûn biçûk dikatin dîtin, heta cihekî şerm bû. Gelo ev ji bo jin û mêran eynî bû?

– Ji xwe di civata kurdan ya kevin de, ji bilî hin tesadufên weke Eyşe Şan û Meyremxanê, huner ji jinan re şermek bû. Ger ji mêrên bi hunera muzîkê re mijûl dibûn re, mitirb an jî qereçî bihata gotin, ji jinan re gelek tiştên din dihatin gotin û gelek neheqî li wan dihatin kirin. Ji jineke esilzade û eşîr re ne hêsan bû ku bi hunera muzîkê daketa. Wek mînak, li herêma me çend jin hebûn ku di civatan de û di odeyên gundan de distiran, lê kesî ew nas nedikirin, eşîreke wan ya xuyayî tune bû, ew bêesil dihatin dîtin.

– Baş e, te got ku di mala we de muzîha dînî dihate gotin û guhdarî kirin...

– Ne bi tenê muzîka dînî, mesele diya min pir li Eyşe Şanê jî guhdarî dikir. Tê bîra min sêlika wê kirî bû û lê guhdarî dikir.

– Lê te bi xwe çavên xwe bi muzîkeke dînî vekiriye. Yanî li mala we, di malmata we ya şêx de qesîde û methiye dihatin gotin û tu jî bi wan gihayî. Lê mirov qet vê tesîrê di destpêka hunermendiya te de nabîne. Ji muzîka dînî wêdetir, tu bi muzîkeke şoreşgerî, serîhildanî û ya protestoyê derketî. Ji bo çi te hewcedariya muzîkeke bi vî babetî dît?

– Rast e, destpêka min ya muzîkê bi celebê ku te anî ziman, dest pê kir. Û diviya bû jî wilo bûya. Ji ber ku dema me, dema tevger û berxwedaneke xurt bû, diviya min jî mîna hunermendekê cihê xwe di wê berxwedanê de bigirta, ne bi tenê cihê xwe bigirta, herweha diviya bû min bi muzîka xwe jî di refê pêşî de cih bigirta. Wekî din

jî protestoyeke civaka kevnar bû û di şûna wê de avakirina civakeke nû û bê sinif û berberî bû.

– Wek me got, mîna muzîkkar cara pêşî te li Ewrûpayê dest pê kir. Tu dikarî ji me re behs bikî, gelo tu cara pêşî kengî derketî ser sehneyê û derketina ser sehneyê ji bo te hîseke çawan bû?

– Gava ez derketim Ewrûpayê, hejmara jinên stranbêj gelekî hindik bû, piraniya wan mêr bûn. Li Ewrûpayê hin xebatên grûp û partiyên kurdan yên kulturî û hunerî jî hebûn. Wan dixwestin bi riya hunerê jî xelkê şiyar bikin û vê yeka han jî destûr dida ku hunermend bi riyên çêkirina şevên kulturî derkevin ser sehneyan û bi stranên xwe hem temaşevanan bicoşînin, hem jî wan bêtir ber bi xebata siyasî ve bikişînin. Tu ya rastî bixwazî, hunermendiya min ne tiştekî plankirî bû, bi tesadufî bû. Ji xwe xwendin û zanebûneke min ya li ser muzîkê jî tunebû. Lê cara pêşî gava ez li Almanyayê derketim ser sehneyê, stranên min bala temaşevan û guhdaran kişand, wan ji min re pir li çepikan xistin û çepikên wan hîsin hunermendiyê dane min. Her çiqas ez nebêjim piştî derketina wê şevê bû destpêka hunermendiya min jî, dîsan ez bawer im ew bû tesadufek ku min di hunera muzîkê de xebata xwe berdewam kir. Tiştekî din jî heye ku divê ez ji bîr nekim, ew jî alîkarî, piştgirî û teşwîqa nas û dostên nêzkî min bûn. Ez bawer im bêtir wan ez ajotim ser muzîkê. Ji bo berdewamkirina karekî piştgirî pir muhîm e.

– Bi a te hezkirina kurdan ji muzîkê re çawa ye? Yanî nifşê îro, ji bo ku muzîka îro rewşa wan tîne ziman jê hez dikin, an jî bi rastî ji bo ku muzîkeke baş tête çêkirin jê hez dikin? Gelo têgihîştineke muzîkî, çi ji aliyê hunermendên kurd ve, çi jî ji aliyê guhdar û muzîkhezên kurd ve heye?

– Gava mirov çavekî davêje kultura kurdan, ji ber ku kurdan firsenda nivîsandina bi kurdî nedîtine û ji jiyana nivîskî bi dûr mane, wan her tim hîsên xwe, kulên xwe, elemên xwe, kêf û şahiyên xwe

bi riya muzîkê û stranan anîne ziman. Ez dixwazim di vir de mînakekê bidim, bi taybetî di şînên kurdan de, yanî gava ku hinek dimirin, jineke ku xisûsî li ser yê mirî distirê û stranan çêdike heye. Şerek ku di navbera eşîran de çêdibe, li ser egîdî û şervaniya şerkeran tê gotin, li ser mêrxasiyê tê gotin, li ser tirsonekiyê tê gotin, li ser hezkirin û evînê tê gotin. Bi kurtî di her şahî û şînên kurdan de stran heye.

Lê ji ber ku bazara kurdan ya muzîkê tune bû û civata kurdan civateke girtî bû, îmkanên pêşdexistina muzîkê jî bi sînor bûn. Ev muzîka gundî lokalîk dima û şansê wê yê ku li seranserî Kurdistanê belav bibe kêm bû. Ji ber ku wê çaxê ne radyo hebûn, ne televizyon hebûn; ger hebûna jî deriyên wan ji kurdan re girtî bûn, îmkanên kurdan ku bikaribin xwe di wan de bînin ziman tune bûn. Lê digel vê jî, bi awayekî klasîk mirov dikare bibêje ku hunereke xurt di nava kurdan de hebû. Ew ne bi tenê stranbêj bûn, herweha lîstikvanên tiyatroyê jî bûn.

– Te got ku di stranên kurdî yê klasîk de mijara evînê jî cihekî digire. Lê berdewamiya evînê mirov di stranên kurdî yên klasîk de pir pêrgî stranên erotîk jî tê. Dibe ku mirov vê pirsê ji hunermendekî mêr bike, ew bi celebekî din bibersivîne. Gelo ji bo çi ewqas erotîzm, ewqas gotinên vekirî di stranên kurdî yên gelêrî de hene? Hejmara vê celeb muzîkî ne yek û dudu ne, hema çi bigire, mijarên piraniya stranên kurdî yên klasîk erotîzm e. Tu dikarî mîna hunermendeke jin, sebebên ku di civateke ku di jiyana rastî de gelekî girtî û kevneperest e, ewqas bi xurtî erotîzm derdikeve pêş, bînî ziman?

– Ez bawer im piraniya stranên bi vî babetî ji aliyê mêran de hatine gotin. Ji aliyê din ve jî, berî îslamê, di jiyana kurdan de, di stranên kurdan de lîberalîzmek heye. Yanî kurd, civata kurdan li hemberî nûyîtî û guhertinan ne ewqasî hişk bûn. Lê belê, divê mirov vê jî ji bîr neke, yên ku erotîzm dianîn ziman bêtir mitirb bûn. Ew jî

kesî ji wan re eyb nedidît. Kêfa xelkê jî ji wê yeka han re hatiye û wilo belav bûye. Ger yekî cidî rabûya di civatê de tiştekî wilo bigota, belkî pir eyb bihata dîtin, loma civatê ew wezîfe dane wan însanên ku dikarin wê yekê bikin.

– Lê mirov di gelek stranan de dibîne ku jin bi xwe jî dibêjin, heta ji bo ku hezkirên xwe bi dest bixin, an jî xwe bêtir ji bo hezkirên xwe balkêş bikin, pesnê sîng û berên xwe didin û wan pêşkêşî hezkirên xwe dikin.Em dibînin ku ev temaya erotîzmê ji aliyê jinan ve jî gelekî hatiye bi kar anîn.

– Lê em nizanin gelo ev mêran li hev anîne, an jinan bi xwe gotine. Mirov di gelek stranên kurdî de dibîne ku, mêr dibêje, keçê weha got. Yanî, ew li ser navê keçikê jî dipeyive. Îcar bi rastî keçikê weha gotiye negotiye, em nizanin.

– Şika te ji wê ye ku wê mêr li pişt vê erotîzma di stranên kurdî de bin?

– Nizanim, lê mîna ku bêtir bêhna mêran ji vê temayê tê.

– Baş e, bi taybetî ji salên heftêyî û vir ve, bi gotineke din, li bakurê welêt ji hişyarbûna kurdan û gurrbûna tevgera şoreşgerî û kurdayetiyê û vir ve di muzîka kurdî de jî guhertineke bingehîn çêbûye. Muzîka kurdî ya îro ji aliyê tema û naverokê ve ji muzîka kurdî ya do hatiye birrîn. Muzîka evînî cihê xwe ji muzîkeke şoreşgerî re hiştiye.

– Di eslê xwe de, bingeha muzîka îro jî, dîsa muzîka kurdî ya klasîk e. Ew kesên ku îro dibêjin em muzîkeke kurdî ya nû çêdikin jî, dîsan ew ji muzîka kurdî ya klasîk xelas nebûne, praniya wan tradisyonel in. Ger tu vê sermayeya klasîk ji destê wan bigirî, tiştek di destên wan de namîne. Ew bi tenê gotin û mesajê diguherin, yanî ew bi tenê gotinên ajîtatîv lê zêde dikin, lê bingeh dîsa muzîka kurdî ya klasîk e.

– Ma ev ne şaşiyek e ku mirov naveroka stranên sedsalane bigubre û gotinên vala têxiyê û bi vî awayî stranên kurdî yên klsakîk biheri-

mîne?

– Me gişan ev şaşî kiriye. Ji ber ku sermayeke me ya zanebûna muzîkê tune bû. Ji me re gelekî hêsan dihat ku em bi tenê gotinên stranan biguherin û wan ji nû ve bistirên. Ji ber ku sazî û mueseseyên me jî yên ku pêşî li vê yekê bigirtina tunebûn, ev şaşiya han bi hêsanî dikarîbû bihata kirin. Ez bawer im, ev tiştê han ji feqîrî û ji nezaniya kulturê çêdibû û hê jî çêdibe.

– Baş e, ji bo ku ev were guhertin û ev zanebûna kulturî ku tu behs dikî pêk were divê çi bêne kirin?

– Divê pir tişt werin kirin. Ger tu bala xwe bidiyê, îro dinya gelekî li ser kulturê radiweste. Gelek dewlet hene ku butçeyên mezin ji kulturê û bi taybetî jî ji muzîkê re vediqetînin. Butçeyên ku ew ji kulturê re vediqetînin, ne kêmî butçeyên din in. Ew kulturê an jî muzîkê luks nabînin, berevajiya wê, ew tiştekî bingehîn dibînin û loma jî butçeyeke mezin ji muzîkê re vediqetînin. Tabî ez vê yekê ne ji bo welatên dinya sêyemîn dibêjim. Rewşa welatên dinya sêyemîn kêm zêde mîna rewşa kurdan e. Lê li Ewrûpa û li Amerîkayê, gelekî li ser muzîkê tête rawestandin û pir qîmet jî didinê. Çawa ku ji bo mirov bibe doktor û muhendîz xwendina dibistanê pêwîst be, ji bo ku mirov bibe muzîkkar jî xwendina dibistanan pêwîst e. Lê mixabin li ba me ne wilo ye. Ji bilî çend kesan, piraniya muzîkkarên kurdan li ser mîrata awaz û stranên kevin hunermendiyê dikin.

– Carinan ger yek stranekê bibêje û dengê wî an jî wê hinekî xweş be, civat wan teşwîq dikin, dibêje dengê te xweş e, çima tu kasetan çênakî. Bi rastî çêkirina kasetan bi tenê bi dengxweşiyê ve girêdayî ye, an jî zanebûneke din jî lazim e? Pirsa min ev e, gelo hunera muzîkê ewçend hêsan e ku her kesê dengxweş bikaribe kasetan çêbike?

– Mîna tê zanîn, muzîk beş bi beş in. Muzîka klasîk, jaz, pop, rock, ya gelêrî û hwd. heye. Li Tirkiyeyê gelekî munaqeşeya muzîka taybet tête kirin. Lê ez bi xwe ne di wê baweriyê de me, ew muzîka

ku ew jê re dibêjin *taybet* jî, dîsan bingeha xwe ji muzîka gel distîne, gelek motîvên muzîka gel tê de heye. Çêkirina muzîkeke nû ne tiştekî hêsan e. Kesên ku dixwazin muzîkeke nû çêbikin, divê her tiştê xwe bi xwe çêbikin. Lê mirov dikare ji muzîka kevnar jî destkewtî bibe û wê bi pêş bixîne. Loma jî divê zanebûneke mirov ya kûr ya muzîkê hebe. Mirov dikare bi alîkariya hin enstrumanên nû şiroveyên xwe yên nû tevlê bike. Lê divê mirov pir bi dîqet be, awazên kevin, stranên kevin bi gotinên nû yên vala xera neke. Bi a min divê mirov kesên ku dixwazin bi erzanî bibe hunermend teşwîq neke.

– *Carinan bi min wisa tê ku nemaze di van demên dawî de, di muzîka kurdî de rîtm berî gotinê tê. Lê belê di muzîka kurdî ya klasîk de, gotin navend e. Yanî di muzîka kurdî ya îroyîn de, bi gotinên rijandina xwînê, şewitandina gundan, kuştina zarokan, koçkirina kurdan, wêrankirina welêt, bi alîkariya çepik û govendê tê gotin. Ev ji çi tê? Ji bo çi wisa ye?*

– Ev ji wê nezaniya ku me berî niha behs kir, tê. Awaz û muzîka govendan bi gotinên şoreşgerî û siyasî ve distirên. Gava rewş wilo be, wê şaşî xwe beloq nîşan bide. Ev jî bi ya min ji bo humora kurdan, ji bo kultura kurdan tiştekî ne baş e. Ne bi tenê ne baş e, herweha tiştekî xerab e.

– *Gava mirov guh dide muzîka kurdî ya klasîk, ew mîna meknatîzê mirov ber bi xwe ve dikişîne. Mirov rehetiyekê, bêhnberdanekê bîs dike. Mirov pê re digirî, pê re dikene. Mirov pê re dilşa dibe, pê re xemgîn dibe. Herweha mirov vê tesîra han, vê jidiliya han di stranbêjan de jî dibîne. Ew bi rastî pê re dijîn...*

– Rast e, loma jî divê hunermendên îroyîn, çavekî biavêjin muzîka kurdî ya do û li ser wê bikaribin hîmekî xurt ava bikin. Bi rastî dengbêjên kevin bi stranên xwe guhdaran dibin dinyayeke din, bi gotineke din wan hîpnotîze dikin.

– *Lê tiştekî din jî heye, êdî em di demeke din de dijîn, dema bajar-*

vaniyê; an jî dema komunîkasiyon û teknolojiyê. Jiyana gundîtiyê li paş dimîne, ji berdêla wê celebê jiyaneke nû derdikeve hemberî me. Sinif û kategoriyên civatê karakter diguherin, li gorî vê jî stîla jiyaneke nû, daxwazên muzîkeke nû jî derdikeve holê. Di şûna muzîka yekdeng de, muzîka pirrdeng dibe daxwaz û armanca nivşê nû. Gelo ji kurdan yên ku bixwazin bersiva vê demê bidin hene?

– Belê, hene, yek ji wan jî kurê min e. Wî niha bi her awayî bala xwe berdaye ser muzîka nû. Ji ber ku kurd jî perçeyek ji dinayayê ne, divê ew jî di nava guhertinên dinyayê de bêne guhertin. Ne bi tenê ji aliyê şikil ve, bivê nevê ji aliyê stîla jiyanê ve jî têne guhertin. Ev yeka han xwe di muzîkê de jî nîşan dide. Divê wilo jî bibe. Ji ber ku îro bi hezaran, bi deh hezaran, heta ez dikarim bibêjim bi sed hezaran xortên kurdan li bajarên mezin dijîn. Ev nivşê han daxwaza tiştê nû jî dike, ew nikarin di nava jiyana bajarvaniyê de, mîna gundiyan bijîn. Xwestekên wan, armancên wan, dinyaya wan cihê ye. Ez bawer im hunermendên ku bikaribin bersivên hewcedariyên wan bidin, wê dîsa ji nav wan derkevin. Ji ber ku ez ne bawer im ku wê hunermendekî gundî, bi kulureke gundîtiyê li gor daxwaz û hewcedariyên jiyana bajarvaniyê rabe.

– Yanî di nava jiyana bajarvaniyê de, di stresa jiyana bajaran de, êdî hew muzîka folklorîk mirov têr dike. Divê muzîkeke li gora vê jiyanê hebe ku mirov têr bibe.

– Mirov dikare bibêje ku muzîk terapiya ruh e. Mirov dikare bi muzîkê bigirî, bi muzîkê şa bibe. Hemû babetên ku mirov pê ruhê xwe terbiye dike, rehet dike, têr dike, muzîk e. Ez dixwazim vê bibêjim, jiyana ku em rojane dijîn û muzîk pir bi hev ve girêdayî ne. Gelek caran gava ku dilê mirov teng be, mirov li muzîkê guhdarî dike, dilê mirov pê fireh dibe, jiyana reş li ber çavên mirov xweş dibe, mirov ji diltengiya xwe azad dibe.

– Tiştekî din jî heye ku gelek caran bala min dikişîne. Hin komên

muzîkê, an jî hin stranbêj bi enstrumanên modern, lê belê bi kincên folklorîk derdikevin ser dik û sehneyan. Tu ji vê re çi dibêjî?

– Gava civatek were pelçiqandin, hebûna wî were înkarkirin, ew milet, ew civat jî dixwaze xwe nîşan bide, dibêje va ye ez heme, ez dijîm, tu çawa dikarî min înkar bikî? Heta niha ev kompleksa hebû, ez bi xwe vê yekê weke kompleksekê dibînim. Me jî ev yeka kir. Lê ez bawer im divê êdî kurd xwe ji vê kompleksê xelas bikin. Gava ku mirov govendên folklorîk bigire, an jî stranên folklorîk bibêje, ev tiştekî tabiî ye ku divê mirov kincên folklorîk li xwe bike, lê gava mirov stranên nû dibêje, qet jî pêwîstiya lixwekirina kincên folklorîk nake.

– Îro em dibînin hin keç û xortên kurdan hewl didin ku muzîkeke modern çêbikin; enstrumanên kurdî û ewrûpayî, an jî cîhanî tevlihev dikin û muzîkekê derdixin. Ev muzîk jî ji aliyê gelek xortan ve tê girtin û hezkirin. Gelo tu hewldanên te û çêkirina muzîka nû heye? An jî tu hê li ser riya xwe ya berê yî?

– Tu bêjî nebêjî piştî evqas sal mirov hewcedariya hin guhertinan dibîne. Ji xwe jiyana me ya li Ewrûpa jî me dajo ser vê yekê. Roj tuneye ku em muzîka nû nebihîzin. Bi gotineke din guhên me fêrî muzîka nû bûye. Ez bi xwe ji muzîka ku îro kurd çêdikin re nabêjim muzîka modern, lê ez dikarim bibêjim ev tecrube ne. Di pêşerojê de dikare tiştên baş derkeve holê. Ez bi xwe jî dixwazim hin biharatên dinyayê tevlî xwarina xwe bikim. Yanî zewqa ku ez ji muzîka kurdî digirim, ez ji pop, jaz û bluz jî digirim. Muzîk zimanekî navneteweyî ye. Ji aliyê din ve ez bawer im ku mirov muzîkê li gora kultura xwe çêdike. Ger hunermendek xwediyê kultureke kûr be, ew ê li gorî wê jî muzîka xwe çêbike.

– Gelo tu bi xwe muzîka xwe çawan çêdikî. Tu li ser notayê dixebitî an jî tu mîna piraniya muzîkkarên kurd bê nota dixebitî?

– Na, ez li ser notayê naxebitim. Ez bi xwe ne kompozîtor im û

min ilmekî muzîkê yê kûr û dûr jî nexwendiye. Ez bawer im di cavata kurdan de pir kêm kes li ser notayê dixebitin. Lê ez hêvîdar im di pêşerojê de ez ê xwe di warê muzîkê de kûrtir bikim û bixwazibim muzîkeke baş û bi demê re çêbikim.

– Gava tu bi muzîkê re mijûl nabî tu çi dikî? Entresa te û xwendinê çawa ye?

– Ez hewl didim ku pir bixwînim. Ez bi kêmanî rojê çend saetên xwe didim xwendinê. Ez bi piranî edebiyata bedew; roman, çîrok û helbestan dixwînim. Lê ev nayê wê maneyê ku ez dûrî xwendina felsefe, psîkolojî û sosyolojiyê me. Ez vê xwendina xwe bi sê zimanan dikim.

Nûdem, No: 16, 1996

SEÎD YUSUF: "EZ AŞIQÊ TIŞTÊN XWEŞIK IM"

Nûdem: *Seîd Yûsûf kî ye?*

Seîd Yûsûf: Bavê min bi eslê xwe Rimî ye, ji hêla Bişêriyê hatiye. Bişêrî li serxetê ye. Weke hûn dibêjin, li Kurdistana Tirkiyeyê ye. Malbata min ji wir hatine binya xetê, ez bi xwe li binya xetê, li bajarê Qamîşloyê çêbûme. Ez di sala 1947'an de, li kolana Qudûrbegê hatime dinyayê. Di yanzdeh saliya xwe de, em çûne Enteriyê, em neh-deh salan jî li wir man.

– *Gelo tu niha li ku dimînî?*

– Ez niha li Qamîşloyê dimînim.

– *Di malbata we de tu hunermend hebû?*

– Di malbatê de tu hunermendên wilo bi nav û deng tunebûn, lê yên ku ji stranan û dengbêjiyê hez dikirin, hebûn. Bavê min bi xwe gelekî nêzîkî hunera stranbêjiyê bû. Ew hostayê xaniyan bû, lê wî li tembûrê jî dixist.

– *Te bi xwe kengî dest bi muzîkê kir?*

– Hema bêje min di hifdeh-hîjdeh saliya xwe de dest bi muzîkê kiriye. Lê min berê di dibistanê de distira û gelekî kêfa xwendevan û mamsoteyan ji dengê min re dihat. Lê bi profesyonelî min di hufdeh-hîjdeh saliya xwe dest bi muzîkê kir.

– *Em dizanin ku tu li tembûreke xweş dixî. Tu bi xwe fêrî lêdana tembûrê bûyî, an tu çû dibistanên muzîkê?*

– Na na, ez neçûme tu dibistanên muzîkê. Ez xwe bi xwe fêr bûm. Min radihişt tembûra xwe, ez diçûm malê û min bi saetan lê dida. Ez di pratîka lêdanê de xwe bi xwe fêr bûm.

– Te got ku te di hufdeh-hîjdeh saliya xwe dest bi muzîkê kir. Wilo xuyaye ku ew roj ev roj e tu di nava cîhana muzîkê de yî?

– Belê...

– Heta niha çend kasetên te derketine? An jî sêlik û CD?...

– Heta niha 27 kasetên min derketine û ez dikarim bibêjim ku stranek naşibe yeka din, strana ku di kasetekê de heye di yeka din tuneye. Ji bilî van jî çi bigire neh-deh kasetên min yên bi tenê enstrumen hene. Ev ji muzîka tirkî, ya erebî û ya kurdî pêk tên û piraniya wan yên reqsê ne. Ger em van jî bixine ser, zêdeyî sî kasetî çêdibe.

– Baş e, bi tevayî mijara muzîka te çi ye?

– Ez ji destpêkê ve pir ji stranên folklorî hez dikim. Bi taybetî ez ji yên li ser gilî û gazinan, yên evînî û evîndariyê pir hez dikim. Di kultura me kurdan de li ser şer, pevçûn û kuştinê jî heye, ez ji wê hez nakim. Ez dikarim bibêjim ku mijara stranên min ji sedî not li ser evînê ye.

– Ji xwe tiştê ku bal dikişîne, ji bilî stranên evînî ku te bi xwe çêkirine, ew stranên folklorî û gelêrî ku tu distrê jî, yên evînî ne.

– Ez jê hez dikim.

– Ji bo çi?

– Ez nizanim hemû mirov wilo ne an na, lê yê min ez her tim aşiq im. Ez aşiqê tiştên xweşik im, aşiqê tiştên delal im, aşiqê tiştên rindik im.

– Gelo ev evîndariya te ne berdewamiya hezkirineke ciwaniyê be?

– Tu bêjî nebêjî berdewamiyeke wilo heye. Lê nayê wê maneyê ku ez ê ji xwe re yekê bînim û pê re bizewicim. Lê çi ye, ez ji tiştên spehî hez dikim. Ez psîkeke xweşik bibînim ez ê jê hez bikim. Ez çavekî xweşik bibînim ez ê jê hez bikim. Ez guleke xweşik bibînim ez ê jê hez bikim. Bi taybetî jî jin tiştekî Xwedayî ye. Ne di destê mirov de ye ku mirov ji jina xweşik hez neke.

– Yanî mirov dikare bibêje ku naveroka piraniya stranên te civakî ne, lê ne polîtîk in.

– Rast e, stranên min bi piranî evînî û civakî ne, lê ne siyasî ne.

– Tu qet nafikirî ku stranên polîtîk jî bistirê?

– Ma ez ê çi stranên polîtîk bistirêm? Gerçî bi dehan stranên min yên polîtîk ku hê min belav nekirine hene, lê nêrîna min ya şexsî xuyaye. Ez kurd im û bi her awayî yekîtiya kurdan dixwazim. Gava yekîtî û hevkarî di nava kurdan de çêbibe, wê kurd ji bin zilm û zorê jî xelas bibin û welatê kurdan jî azad bibe. Lê belê karê min çêkirina muzîkê û gorina stranan e, ne kirina şoreşê ye. Ez nikarim weke hinekan bi hum û gum bibêjim Kurdistan ha Kurdistan, an jî digel ku gelekî hurmeta min ji şehîdan re heye, bîst û çar saetan li ser şehîdan bistirêm.

– Te bîska din got ku te heta niha 25-30 kaset çêkirine. Tu van kasetên xwe çawan çêdikî; gotinên wan kî dinivîsîne, kî meqam didiyê?

– Piştî ku min dest bi stranê kir bi demeke kurt, min dest bi nivîsandina helbestan jî kir. Min dest pê kir û gorinên xwe bi xwe nivîsandin. Nivîsandina stranan ne weke ya şîîran e, stîleke wan ya taybetî heye û bi ya min nivîsandina stranan ji nivîsandina şîîran zehmettir e.

– Ev taybetî an jî zehmetiya nivîsandina stranan ji ya şîîran çi ye?

– Ya yekem divê armanceke wê ya nêzîk hebe ku her kes têbigihîje. Ya duduwan divê xeberên wê jî vekirî bin, yanî ne aloz û tevlihev be û bi zehmetî neyê fêhmkirin. Ya sisiyan divê ne gelekî dirêj be. Ya çaran divê bi hêsanî bête fêhmkirin. Gava gotinên stranê hêsan bin, zarok jî dikarin têbigihîjin, mezin jî dikarin têbigihîjin, her kes dikare têbigihîje. Lê gava dirêj be, tevlihev be, aloz be û piştî sed rêzî ji nû ve mirov armanca wê fêhm bike ka bê mebest çi ye, bi rastî xelkê me ji stranên vî babetî re ne amade ye.

– Yanî piraniya stranên xwe tu dinivîsînî...

– Ne piraniya wan, ez hemûyî dinivîsînim.

– Baş e, tu çawa muzîkê çêdikî?

– Muzîk jî her mîna gotinan e. Ev hebekî jî bi îlhamê ve girêdayî ye. Carinan ez ji nişka ve ji nava nivînan radibim û gotinên stranekê dinivîsînim. Ez herweha carinan bi nivîsandina stranê re awazê wê jî didimê. Yanî dengdayina stranekê an jî çêkirina awazekê carinan nîvsaet digire, carinan jî bi rojan ez li ser dixebitim, heta ku li hev tê.

– Tu muzîka xwe li gorî notayê çêdikî, an jî tu mîna gelek hunermendên kurd bê nota çêdikî?

– Ma bê nota dibe? Muzîka bê nota ne tu muzîk e, bi ser nakeve. Nota bingeha muzîkê ye, muzîkeke baş ancax bi notayê çêbibe.

– Yanî tu stranên xwe li ser notayê çêdikî?

– Tabî, tabî...

– Mîna tê zanîn gelek hunermendên kurd muzîkê bê nota çêdikin, gotina te ji wan hunermendan re çi ye?

– Niha hin hunermend hene ku bê nota jî bi ser ketine, lê belê ev hejmareke pir hindik e. Heta gava mirov baş guhê xwe bide stranên wan û hebekî jî ji muzîkê agahdar be, mirov ê fêhm bike ku kêmaniyek di stranan de heye. Ji ber ku ew ne li ser notayê çêbûne.

– Mirov dikare bibêje ku tu dixwazî bibêjî, hunermendên ku muzîka bê nota çêdikin jiyankurt in?

– Belê, belê. Ji xwe ez dikarim bibêjim ku ji niha ve nîvê wan rawestiyane, kaniya wan miçiqî ye, êdî hew dikarin tiştekî nû biafirînin. Lê dikarin kurtedemeke din jî li ser muzîka tirkî, farisî û tirkî bijîn û bêjin ev muzîk me çêkiriye. Lê ma heya kengî ew ê li ser kîsê xelkê bijîn?

– Muzîka hin miletan dişibin hev, nêzîkî hev in. Gelo muzîka ku tu çêdikî nêzîkî ya kîjan miletî ye? Nêzîkî ya tirkî ye, ya farisî ye, ya erebî ye an jî xweser e, ya kurdî ye ku te bi xwe afirandiye?

– Tabî divê mirov rast bibêje, stranên kurdî her heye, bingeha muzîka kurdî her heye û dewlemend e jî, lê perçeyên ku kurd lê dijîn, di bin tesîra wan de jî dimîne. Em bixwazin nexwazin, em di bin tesîra tirkî, erebî û farisî de dimînin, hin deng û awazan ji wan digirin. Ew jî di bin tesîra muzîka kurdî de dimînin, bêhna kurdî ji gelek stranên wan tê. Bi ya min ev yeka han tiştekî pir tabiî ye. Weke însan jî gava mirov bi însanekî din re bijî û pê re bimîne, mirov gelekî ji rabûn û rûniştina wî, ji tevger û hereketên wî digire. Ez bi xwe li Sûriyê me, gava ez meqamekî çêbikim, dibe ku ereb jî eynî meqamî çêbikin, ji ber ku em şerqî ne, gelek tiştên me dişibin hev; herweha muzîka me jî dişibe hevdu.

– Ji bo te muzîk çi ye?

– Ji bo min, wek hunermend Seîd Yûsûf, muzîkê weke av û hewayê ye. Çawa ku mirov nikare bê av û hewa bijî, ez jî nikarim bê muzîk bijîm. Muzîk bûye perçeyek ji min, perçeyek ji jiyana min, bi gotineke din ew bûye hevaleke min ya bêdawî. Ez bi muzîkê re dijîm. Gava ez carinan li jiyana bê muzîk difikirim, ew jiyana ji min re gelekî bê mane û pûç tê. Jiyana bê muzîk ji bo min jiyaneke vala ye. Ez çiqas aciz bibim, problemên min çiqas çêbibin, an jî çi bobelat bi serê min de werin, muzîk min jê rizgar dike, ew ji bo min piştgirek e, hevaleke ku destê alîkariyê dirêjî min dike.

– Tu ji muzîka xwe hez dikî? Yanî gava tu bi tenê bî, tu li dengê xwe guhdarî dikî?

– Erê, bi taybetî jî gava ez tiştekî nû çêdikim, ez li dengê xwe guhdarî dikim. Piraniya sebeba guhdarîkirina min jî, ji bo ku ez fêr bibim ka gelo min baş çêkiriye an na, ka gelo weke ez fikirîme, muzîka min çêbûye an na. Piştî wê jî ez hew zêde lê guhdarî dikim û êdî hewl didim muzîkeke nû çêbikim.

– Gelo ji muzîka kurdî tu bêtir li kê guhdarî dikî? Tu ji çi celeb muzîka kurdî zewqê distînî?

– Divê mirov heqê tu hunermendî nexwe, her yekî stîleke wî ya xas heye, lê ez nikarim bibêjim ku ez gelekî li yên nû guhdarî dikim. Hinek ji hunermendên îro hene, mirov carekê lê guhdarî bike, bes e. Hinek jê hene mirov nikare carekê jî lê guhdarî bike. Lê di nav yên nû de hinekî jîr jî hene. Ji yên kevin ez bêtir li Mihemed Arifê Cizîrî, Hesenê Cizîrî, Meyremxan û Tehsîn Taha guhdarî dikim. Van bi rastî muzîkeke baş çêdikirin û muzîka wan xweş û temendirêj e. Lê evên nû, ne ku xerab in, lê ji wan re gelek divê ta ku ew bikaribin mîna hunermendên rastîn derkevin qada hunera kurdî.

– Ji derveyî muzîka kurdî tu li muzîka biyanî jî guhdarî dikî? Yanî çi oriyental, çi jî ewrûpayî û emerîkayî?

– Ez bêtir li ya oriyental guhdarî dikim. ya tirkî, erebî û farisî... Bi taybetî hin hunermendên ereban hene ku ez gelekî guhdariya wan dikim. Ew ne bi tenê di dinyaya ereban de, herweha li hemû dinyayê navdar in. Ez bawer im hinekî wilo di nava tirkan de jî hene, weke hunermend navdar in. Ew ê li ba farisan jî yên wilo hebin.

– Te got ku tu zêde li muzîka hevçaxên xwe guhdarî nakî. Gelo têkiliyên te bi wan re çawa ye? Danûstandinên te bi wan heye?

– Mixabin, çi li vir û çi li deverin din, wilo bû ye, ku divê her kes muxtarê mala xwe be. Çi bigire kes kesî qebûl nake. Komeleyek çêbibe, divê ew serok be, komek çêbibe divê ew di serî de be, şevek çêbibe divê her tişt di destê wî de be, xwarineke xweş hebe divê ew pêşî bixwe, heger tu li makîneyekê siwar bibî divê ew şifêr be. Loma jî xebata bi hev re ne rehet e. Gava rewş wilo be ji min re jî naserife. Bila kes pesnê xwe nede û nebêje em dikarin bi hev re bixebitin, nebêjin têkiliyên me bi hev re baş e. Ji ber ku ne wilo ye?

– Ev ji çi tê gelo? Mirov dikare bibêje ku di navbera hunermendan de dexesî û çavnevbarî heye? Bi gotineke din reqabet heye?

– Erê, ev ji dexesiyê tê, ji zikreşiyê tê, ji xweparastinê tê. Gava ez bibînim yekî nû derketiye û xelk lê guhdarî dikin û jê hez dikin, di-

vê ez şerê wî bikim, ji ber ku bi derketina wî re êdî hew kes li min guhdarî dike. Loma ji bo ez xwe biparêzim divê ez bi her awayî şerê wî bikim.

– Digel ku têkiliyên we hunermendan zêde bi hev re tune ye jî, dîsan xwestekên we mîna hev in. Hûn çi bigire hemû ji rewşê gazinan dikin, hûn dibêjin kurd li hunermendên xwedî dernakevin, kasetên wan nakirin, naçin şevên wan. Hûn çi dixwazin? Divê kurd bi çi awayî li we xwedî derkevin? An jî gava hûn dibêjin, "kurd" hûn gelê kurd qest dikin, an jî rêxistin û partiyên kurdan?

– Gava em dibêjin kurd, ji xwe qesta me rêxistin û partiyên kurdan e. Bi kêmanî ji sedî not û heşt ew in. Ji ber ku her partî û rêxistinek dixwaze hunermendan ber bi xwe ve bikişînin. Dixwazin ku hunermend di behra wan de melevaniyê bikin. Ji bilî wî ne ji keseki din re be. Ger tu bi yan wan nekî, ew ê kevir û kuçan li te bibarînin, tu di çavên wan de dibî kafir. Daxwaza min ji partiyên kurdan ev e ku divê ew hunermendan ji xwe re nekin pir û di ser wan re neçin. Daxwaza min ji wan ew e ku ew hunermendên xwe azad bihêlin. Ne ku ez herim ba rêxistinekê rêxistina din şerê min bike. An jî gava hunermendek bixwaze ji xwe re şeveke taybetî çêbike, partiyên kurdan ji wan re dibin asteng, naxwazin xelk herin şeva wan, ji ber ku hunermend ne bi wan re ne. Ez kurd im û xelas. Ew ê çima min mecbûr bikin ku ez bidim dû wan? Ne hewce ye ku ez rast bim, çep bim, komunîst bim, an jî hevalbendê filan û bêvan partiyê bim. Ew dixwazin hunermend mîna topekê di destên wan de bin.

– Tu dixwazî bibêjî ku divê mirov huner û polîtîkaya rojane zêde bi hev ve girê nede...

– Erê, huner huner e û polîtîka polîtîka ye. Gava huner bi polîtîkayê ve bête girêdan, ew sax be jî, dîsan miriye.

– Tu bi tevayî rewşa muzîka kurdî çawan dibînî?

– Mixabin, ez rewşa muzîka kurdî pir nebaş dibînim. Muzîka kurdî bi tevayî li paş e û bipêşneketiye. A îro tu hemû hunermendên li Ewrûpayê bicivînî ser hev, tu ê nikaribî ji wan komeke baş derxînî. Rewş gelekî xerab e. Ev delîlek û îşaretek e ku muzîka kurdî gelekî fireh nebûye û muzîka kurdî bûye hêsîrê herêma ku ew hunermend jê ye. Ji ber ku piştgiriya gel jî ji hunermendan re kêm e, muzîka kurdî seqet û bawî dimîne. Em îro bi kêmanî çil milyon in, çil hunermendên me yên baş tuneye. Lê nifûsa Lubnanê çar milyon e, tunebe tunebe bîst hezar hunermendên wan hene û piraniya wan jî di konservatuwar û enstîtuyan de xwendine, ji muzîkê fêhm dikin. Muzîkkarên wan yên herî nezan ji notayê fêhm dikin. Lê mixabin, mirov nikare eynî tiştî ji bo muzîkkarên kurd bibêje. Ji aliyekî ve muzîkkarên kurd bi tenê ne, bê pitşgirî ne, yên ku wan ber bi muzîkeke baştir teşwîq bikin tune. Divê hêz û partiyên kurdan bi her awayî alîkarî û piştgiriya hunermendên xwe bikin. Ji ber ku biserketina hunermendan, biserketina siyaseta kurdî ye jî.

– Belê, mîna di her warê jiyanê de dibe, gava tiştekî nû derdikeve, yê kevin li dij derdikeve. Îro em dibînin li Kurdistanê jî guhertinin bingehîn çêdibin. Di şûna jiyana gundîtiyê de, celebê jiyaneke bajarvaniyê dest pê dike. Di jiyana bajarvaniyê de jî folklor populertiya xwe winda dike, êdî hewcedariyên muzîkeke nû ku bikaribe bersiva civakê bide, tê kirin. Em dibînin hinek hunermendên kurd bi vî karî radibin. Bi a te, di çêkirina muzîka nû de divê li çi bête fikirandin?

– Ez ne bawer im ku îro kurd muzîka modern çêdikin. Kanî muzîka modern? Ger yekî wek Ciwan Haco bi stîleke nû derketiye, ew bi tenê ji çend milyonan yek e. Lê wekî din ez bi xwe yên ku muzîka modern çêdikin, nabînin. Rast e, civata me hatiye guhertin û li gorî guhertinên vê civatê jî divê muzîkeke nû çêbibe, lê belê ev pirseke aborî ye jî. Niha, gava em muzîka xwe çêdikin, em radihêjin darê tembûra xwe û an em li ber teybekê dadigirin, an jî em diçin

studyoyeke feqîr. Lê ji bo ku tu bikaribî kaseteke muzîka modern û pirdeng çêbikî, divê bi kêmanî bîst-sî kes bin. Ji van bîst-sî kesan ewqas aletên muzîkê lazim e. Tu rabî van bîst-sî kesan bibî studyoyekê, dagirtina kasetekê bi kêmanî wê çend hefteyan bigire. Ê kanî mesrefê evqas însan, mesrefê studyoyê û paşê jî mesrefên kaset, sêlik an jî CD'yê? Ev hemû pere ne, hemû mesref in. Gava kaset neyên firotin û piştgirî û alîkariya hunermendan neyê kirin, ez bawer nakin ew ê bikaribin bi xwe ji bin mesrefekî ewqas giran rabin.

– Em dizanin ku îro bazereke weşanên bi kurdî tuneye, gelo bazereke muzîka kurdî jî tuneye?

– Ji xwe ev pirsgirêka hunermendên kurd ya herî mezin e. Ev jî dîsan bi rola partiyan ve girêdayî ye. Ger partiyek kasetekê derxe, ew dikare bi riya endamên xwe bifiroşe an jî endamê wê bi xwe mecbûr dimînin û dikirin. Lê ger ne wilo be, yanî mirov kaseta xwe bi xwe derxe, mirov bîstan datîne Uppsalayê, pêncî datîne Stockholmê, sedî datîne Londrayê û hwd. Gava tu telefon bikî û li wan bipirsî, ew hatibin firotin jî pere tuneye. Yanî li te venagerin. Gava pere venege, mirov ê çawa bikaribe amadeyiya kaseteke din bike?

– Yanî di rewşa îro de hunermendek nikare li ser hunera xwe bijî?

– Na, ebeden nikare. Ev sê mehên min in ku ez li Swêdê me lê ez nikarim kasetekê çêbikim. Rewşa hunermendiya kurdî ne hêsan e. Ne ku ne hêsan e, pir zehmet e!

– Ji bo ku bazereke muzîka kurdî çêbibe divê çi bête kirin?

– Bi ya min ji bo ku bazareke muzîka kurdî çêbibe, divê sazgeheke bi armanca tîcarî ava bibe. Sazgeheke profesyonel ku bikaribe bi xwe li ser xebata xwe bijî, hem jî bike ku hunermendên kurd bikaribin li ser hunera xwe bijîn. Em bêjin wê kasetekê çêbikin, bila ji xwe re ji sedî heftê-heyştê hilînin, dawiya maye bide hunermend. Ev li gelek deverên dinyayê wilo ye û wilo jî muzîka xelkê bipêş dikeve. Gava rewş wilo bibe, wê li ba hunermendan berdewamiyek jî

çêbibe. Bi berdewamiyê re wê muzîkeke kurdî ya baş jî derkeve holê. Gava kasetên kurdî bi rêk û pêk bin û di studyoyan de bi muzîka baş bêne çêkirin, wê xelkê biyanî jî bixwazin lê guhdarî bikin. Bi gotineke din wê muzîka kurdî kirasê xwe yê teng biçirîne û hebekî jî bibe dinyayî.

– Te berî niha got ku hunermendek nikare li ser muzîka xwe biji. Baş e, ev bîst-sî salên te ne ku tu bi muzîkê re mijûl î, tu çawan dijî? Gelo ji bilî muzîkê tu mijûliyên te yên din hene?

– Na, niha ez ji bilî muzîkê bi tiştekî din re nalebikim. Berê ez diçûm dawet û şahiyên kurdan, hinek pere ji wir dihat. Demekê ez derketim şevên kurdan li Ewrûpayê. Ji wir jî tiştek dihat. Lê vê têr nedikir. Dikaneke min ya kasetan li Qamîşlokê hebû. Niha ew jî tuneye. Lê belê, bi qasî ku ez bikaribim li ser bijîm, na!...

– Niha em nêzîkiyê li dawiya hevpeyvîna xwe dikin. Ez dixwazim vê bipirsim; gelo navbera te û xwendinê çawa ye? Tu pirtûkan dixwînî? Pirtûka dawî ku te xwendiye kîjan e?

– Belê, ez pir dixwînim. Ez bi piranî jî pirtûkên kurdî dixwînim. Ne ku bi tenê dixwînim, ez herweha dinivîsînim jî. Niha pirtûkeke min li ber xelasbûnê ye. Navê pirtûkê *Derew* e. Ez di vê pirtûkê de, behsa derewên di her warên civatê de dikim. Tiştên ku min herî dawî jî xwendiye kovara Hawarê ye. Hawar çavkaniyeke çand û edebiyata kurdî ya herî baş e.

Nûdem, No: 16, 1996

RIZA TOPAL:
"EZ GELEKÎ JI LÊKOLÎN Û LÊGERÎNÊ HEZ DIKIM"

Riza Topal ji Dêrsimê, ji gundê Hulmenê ye. Wî dibistana pêşî li nehiya Moxindî û li gundê xwe xwendiye, dibistana mamostetiyê jî di sala 1950-57'an de li Axcedaxê, Meletê kuta kiriye. Wî li gundê Bîngolê, Ankarayê û Hekariyê mamostetî kiriye. Ew di sala 1968'an de hatiye Almanyayê û di sala 1969'an de li Munîxê dibe şagirtê akademiyê. Ew di sala 1975'an de akademiyê diqedîne û dest bi mamostetiya zarokan dike.

Heta niha du katelogên Riza Topal digel helbestên wî derketine. Resimên wî gelekî têne ecibandin û pesinandin û ew îro yek ji hunermendên kurd yê baş têtе qebûlkirin. Me ji bo xwendevanên NÛDEM'ê di derheqa hunermendiya wî de çend pirs jê pirsîn.

Nûdem: *Çawa bû ku te wênekarî ji xwe re hilbijart? Kê tavsiyeyî te kir?*

Riza Topal: Min bi çûkî gelekî hêkel ji heriyê çêdikirin. Lê fikreke ku ez bibim wênekar di serê min de tune bû. Wê demê ez gelekî li ser îcadan dixebitîm. Hin îcadên ku ez li ser dixebitîm ev bûn; erebe, tifeng, ding, aş, pişto û hinekê din. Ji ber ku bal û hewesa min gelekî li ser îcadan hebû, min dixwest ez herim dibistana dûlgeran. Lê ew nebû nesîbê min. Destpêka wênekariya min li Meletê dest pê kir. Li Meletê mamosteyên min wêneyên min baş dîtin û ez girtim atolya wênekaran. Ez li wir navdar bûm û min wênekariya xwe bi pêş ve bir.

Min li Ankarayê du caran wêneyên xwe raxistin. Wêneyên min

bala rojname û hunermendan kişandin. Di navbera salên 1960-1968'an de gelek wêne û desenên min di kovarên tirkan mîna Varlik de derketin. Bi wê riyê jî ez di nava hunermend û wênekaran de hatime naskirin.

– Hunera wêne li Kurdistanê gelekî giring e, lê gelekî jî zehmet e. Tu dikarî tiştekî di derheqa resamiya kurdan de bibêjî? Tu rewşa Kurdistanê çawa dibînî?

– Li Kurdistanê çi hunera wêne tuneye. Lêgerîna wê jî karê dîrokvanan e. Ev jî demeke dirêj jê re divê. Gava mirov li dîroka Mezopotamyayê dinêre, hinek hunera kevin heye, wek hunera Sumeran, Akadan, Babîlan, Asûriyan, Elaman, Qasîtan (Kardûnyaşan), Huriyan, Mîtaniyan hene. Hunera Gudeya ji yên Sumeran û Akadan bi ferq e. Yên Qasîtan herçiqas di bin tesîra Babîlên kevin de maye jî, dîsa di navbera wan de ferqiyek konkret heye.

Dema Medan û Farisan huner ji bin tesîra Sumeran, Asûran û Akadan derketiye. Herdu jî piçekî nêzîkî hev in.

Dema ku Îskenderan cih û der zeft kirin, dewamiya Medan, Partan di bin tesîra hunera Girêkiyan de formên nû afirandin. Ew huner (sanat) heta dema Buxyaran berdewam bû.

Di dema îslamê de destûra wêneçêkirinê tunebû, di nava hizb û şiîyan de mînyatûr hunerekî wêne yê gelekî ber ve paş bûn. Ew tenê bi navên cuihderan yên ekolan de diharin navdayin. Dibe ku di nav wan de jî wênekarên kurd hebin.

– Te kîjan hunermend ji xwe re kiriye wekok, tu di bin tesîra kîjan tevgerên hunermendiyê de mayî?

– Pêşî klasîkên Ewrûpayî, paşê împresyonistan li ser min tesîreke mezin kirin. Paşê gelek wênekarên mezin û gelek tevgerên hunerî mîna kubîsm, futurîsm, dadaîsm, nabî, ekspresyonîsm, surealîsm û metafizîkan cih bi cih li ser min tesîr kirine.

Lê min di sala 1960-64'an de wêneîstikama xwe guhert. Ez ke-

tim ser riya prîmîtîvîzmê. Hewesa min li ser hunera Mezopotamya û Misra kevin gelek zêde bû. Ez ji bo xwe li riyeke teze geriyam û min navê wê jî bi ARKAÎSMÛS navand. Formên kevnar, rengên qedimmayî bi kontrastxetan ew çêdikirin. Min ji wan hinek motîfên Hatiyan (Hetav- Hetîtan) çêkirin.

Piştî tahsîla Akademiya Munixê ez dîsan ketim ser riya rengan. Min dît ku ew rê diçe ser riya abstrakê û bi wê min nikarîbû motîfên xwe û yên kurdan çêbikim, bi îfade, bi mane bikim. Hêdî hêdî ez vegeriyam ser îstikameta realîzm û surealîzmê. Ez niha li ser wê îstikametê dixebitim.

– Rewşa te û hunera te çawa ye? Gelo tu gihîştiyî mexseda xwe, te hunera xwe kemilandiye?

– Min nikarîbû wênekariya xwe gelekî bikemilînim. Ez di xwe û hunera xwe de gelek qisûr û kêmasiyan dibînim. Ez merivekî ji xwe ne razî me. Ez gelekî ji lêkolîn û lêgerînê hez dikim. Lê karê min yê mamostetiyê gelekî dema min digire. Ku ew nebûya asteng ez bawer im min ê bikarîba wênekariya xwe hê jî bi pêş de bibira û hunera xwe bikemilanda. Lê ez bi emrekî dirêj hertim destgirêdayî mame. Ez car caran ji xwe re dibêjim, ma qey ez di zîndana jiyanê de dijîm.

Lê ez dîsan bi hemû îmkanan digerim û ez li kuderê firsendekê dibînim ez tavilê dest bi xebatê dikim. Ku ew îmkana min ya wêneçêkirinê kêm dibe, ez dixwînim, an jî bi kurdî tiştan dinivîsînim. Ev yeka ha ji min re bûye xûy, bûye bingeheke qedîm.

– Tu îro rewşa wênekariya cîhanê û ya kurdan çawa dibînî, an jî wêne bi çi rengî xwe xurt û kamil dike?

– Wênekarî jî îro weke çandê, muzîkê xwe vekiriye, li hemû riyan digere û diceribîne. Ji klasîk heta pop-aksiyon huner hemû hatine ceribandin. Bi rastî ev yeka ha bûye weke nexweşiyekê di nav hunermendan de. Hemû dixwazin zû navdar û dewlemend bibin. Ji

ber vê yekê gelek hîle, dubare û sextekarî jî ketiye nav wan, loma hinek di quncikan de dimînin û şerpeze dibin. Di dîrokê de em li navê gelekan ji wan rast tên,mîna; Van gogh, Rembrandt, Vadelf...

Weke hemû gelên cîhanê îro kurd jî ketine vê govendê û wênekarên me jî hemû riyan diceribînin. Hunera wêne li Kurdistanê tiştekî nû ye, ew hê li Kurdistanê tam bi cih nebûye. Hinek wênekarên kurdan dixwazin bi motîfên kurdan yên nû senetekî derxînin, rewş û karekterên kurdan bidin naskirin. Ev tiştekî ne xerab e. Divê em jî derkevin, derdora xwe nas bikin, neteweya xwe nas bikin, problemên me yên polîtîk, bindestî, tade bi reng û motîfan bînin ziman. Em bi xwe jî hê gihîştkamil nebûne, ku em tiştên bi qîmet û giranbuha biafirînin û pê navdar bibin. Hin wênekarên me bawer dikin ku ew ê vî karî zû hal bikin û bi nav û deng bibin. Wekî din di cîhanê de nexweşiyeke mezin heye, ku her kes dixwazin modern bibin. Ji ber wê jî ew xwe zû davêjin nav hunera mode û ji ber wê jî ew qabîliyeta xwe ya rastî berhewa xerc dikin.

Ez bi xwe dibêjim gelek rêgerîn, hunera nû tiştekî ne mumkun e, çêtir e mirov hunera xwe ji dîroka xwe bigire, wê xurt bike û ber bi pêş ve bibe. Ez dibînim yên ku dibêjin em modern in, lingên wan erdê nagirin, ew nikarin tiştekî baş biafirînin. Sebeb ew e, ku bingehzanîna wan ya wênekarî ya kûr nîne û gelekên wan kêm kultur in.

Divê em civata wênekaran saz bikin. Hêdî hêdî hemû xwe bi cih û bingeh bikin. Ne di bin tesîra partî û grûbên polîtîk de bin, xwe li cîhanê bidine naskirin. Ji vê re jî alîkariyeke madî lazim e. Heta îro ev mesele çareser nebûye. Partî û sîyasetvan jî dixwazin bi me bileyizin û careke din jî me di goşan de xerc bikin. Bi rastî min tu caran nedîtiye ku ew bi me re alîkariyekê bikin, an ji me re bibin piştîvan. Berevajiya wê, ji xerckirinê pê ve tişt di bin fikrên wan de tune ye. Yên zeyif û naîv teslîmî wan dibin, da ji xwe re di goşeyan

de bibin xwedî nav û şohret. Ez vê yeka han xelet dibînim. Ew mirovên wilo hem xwe û hem jî hunerên xwe pûç dikin.

– Te heta niha di vî warî de çi kiriye? Çi kar û zerara te di hunermendiya te de çêbûye?

– Wênekariyê tenê madî zerar daye min. Min di jiyana xwe ya mamostetiyê de çi pere bi dest xistibin, min ew hemû di riya hunermendiya xwe de xerc kirine. Min hemû zemanê xwe di riya hunermendiya xwe de xerc kiriye. Ji ber vê yekê jî ez heya îro qet teslîmî çi kesî nebûme. Min gelek zerar jî ji polîtîkayê kişandiye. Ji xeynî çend humanîstan min tu fêde ji kesî nedîtiye. Ez tevlî siyasetvanên me jî xebitî me, piraniya wan jî zerara madî dane min.

– Ji bilî wênekariyê çi xebat û mijûliyên te hene?

– Ez gelekî ji çand û edebiyatê jî hez dikim. Ez dikarim bibêjim ku min gelek pirtûkên klasîk û yên modern xwendine. Ji wana gelek jê edebî, helbest, ilmzanî û yên felsefî ne. Min hinek ji wan wergerandine zimanê kurdî, zaravayê kurmancî. Weke çîrokên Isaak Bashewis Singer, Oscar Wilde, H. Böll, Wilhelm Busch û 75 çîrokên din. Ji hozanên Almanan jî ji Luther heta Günter Grass nêzîkî sed helbest min wegerandine.

Min bi xwe jî nêzîkî 200 helbest û 20 fabil, çîrokên zarokan yên dirêj nivîsandine. Ji bilî van jî min zêdeyî 3500 helbest nivîsandine. Hemû jî bi kurdî,bi zaravayê kurmancî ne. Ji van helbestên min hinek polîtîk, çîrokders, fikrî, ilmî, felsefî û di her cûreyî de hene.

– Çi gotina te ji wênekarên kurd re heye, pêşniyarên te ji bo wan çi ne?

– Gotina min ew e ku her wênekar divê haya wî ji dîroka wan hebe û xwe di aliyê zanebûn û ilim de bigihîne. Piştre bila li ser klasîkan bixebitin, ji wênekarên bi nav û deng gelek kopiyan bikin, ku ew tê de şareza û zanehuner bibin. Bi vî awayî lingên wan dikarin erd bigirin û bibin wênekarên baş. Tabiî qabiliyet jî roleke mezin

dileyize.

Gotina min hemû ev e. Ez kovarê û xwediyê kovarê gelekî spas dikim û serfiraziya we dixwazim.

Nûdem, No: 5, 1993

EDÎP POLAT: "DIVÊ BI HEZARAN NIVÎSKAR Û BI SED HEZARAN JÎ XWENDEVANÊ KURD BIGIHÊN"

Edîp Polat, di sala 1962'an de li Bismilê hatiye dinyayê, di 1987'an de unîversîteya Diyarbekirê beşa biyolojî xelas kiriye û yek ji biyologên Tirkiyeyê yê herî zîrek e. Wî heta niha gelek pirtûk nivîsandine û ji bo pirtûk û nivîsên xwe yên di rojnameyan de, hatiye girtin û di girtîgehên Tirkiyeyê de raza ye. Me ji bo xwendevanên Nûdemê ev hevpeyvîna jêrîn pê re kir:

Nûdem: *Tiştê ku em dizanin, heta niha pênc pirtûkên te bi tirkî, bi navê; Diyarbakir Gerçeği, Newrozladık Şafakları, Afganistan'da Halk Demokrasisi Mücadelesi, Devletsiz Ülkeden Îzdüşümler û Bilim Dilinde Kürtler ve Kürdistan derketine.Di derheqa hinekan ji van de cezayê girtîgehê û yê peran ji te têne xwestin. Li hin deveran ev pirtûkên te hatin hevdan. Gelo kîjan ji van pirtûkan in? Çend sala ceze û çiqas pere ji te têne xwestin? Mehkeme çi sedeman nîşan dide?*

Edîp Polat: Pirtûka min a yekemîn Dıyarbakır Gerçeği (Rastiya Diyarbekrê) di sala 1988'an hate çap kirin. 3 mehan bi azadî hate firotin, lê belê piştî sê mehan hate qedexekirin. Min di vê pirtûkê de qala serpêhatiyên xwe yên girtîgeha Amedê kiriye. Behsa çend îşkencevanan (Yekî mîna E. Oktay Yildirim) di wê pirtûkê de tê kirin. Di wê demê de Q. K. T (T. C. K) de 141 û 142 hebûn. Ez ji 142'an derketim dadgehê. "Sûcê" min ev bûn: "Bölücülük propagandası yapmak, devletin güvenlik kuvvetlerini teröre hedef göstermek". Ez ji ber vê pirtûkê hatim girtin. Sê mehan di girtîgeha Ankarayê de mam.Piştî salekê bi şûn de ez

beraat bûm.

Piştre min kîjan pirtûk nivîsî hate qedexe kirin. Berhemên min bi pirranî di derheqa pirsgirêka kurd û Kurdistanê de ne. Ji wê yekê dozger û dadgerê Ankara xişma min kişandin. Di sala 1991'ê de bi navê "Newrozladık Şafakları" (Me berbang bi Newroz kirin) pirtûkeke min hate weşandin. Ev pirtûk jî di derheqa zarokek keça kurd ku li girtîgehê ji diya xwe welidîye de ye. Ev pirtûk pêşî li Stembolê hate weşandin û 8 mehan bi serbestî hate firotin. Paşê çapa duwemîn li Ankara hate kirin. Vêca di meha sibatê de, di sala 1992'an de hate hevdan. Piştî qedexebûnê li min dawe vekirin. Li gora qanûna antî-terorê (qanûna 3713) beşa 8'an em hatin darazdandin. Di 23'ê çileyê pêşîn de darazdan xelas bû. Min du sal cezayê girtîgehê û pêncî milyon cezayê peran xwar. Xwediyê weşanxana min Hîkmet Koçak jî milyarek û 728 milyon cezayê peran xwar. Li gora wan sûcê me: "Bölücülük propagandasi yapmak" bû (Kirina propaganda cihêkirina Dewletê bû). Me ev ceze şande dadgeha bilind (yargitay). Ev ceze di Komara Tirkiyê de ji bo pirtûkekê REKOR e.

Di meha çûyin de daweyek din li min hate vekirin. Ev dawe jî di derheqa pirtûka min a ku bi navê "Bilim Dilinde Kürtler Ve Kürdistan" tê nasîn de vebû. Pirtûk hêja nehatiye hevdan. Xwedê giravî min di vê pirtûkê de "Propaganda cihêkirina Dewletê" kiriye. Li gora qanûna 3713 (Bi navê anti-teror tê nasîn) beşa 8'an dawe li min û li Dr.Îsmail Beşikçi (Mamosta Beşikçi ji vê pirtûkê re pêşgotin nivîsandiye) û li xwediyê weşanxanê Vedat Yenîçerî hate vekirin. Di 23'ê sibatê de em ê derkevin dadgehê. Ji bo vê pirtûkê jî di nava 2 û 5 salan cezayê girtîgehê û 50 milyon jî cezayê pere dixwazin. Ji Dr.Beşîkçî re jî ewqas ceze dixwazin û ji xwediyê weşanxanê Wedat re nêzîkî 5 milyara cezayê pere dixwazin.

Mijara vê pirtûkê zanyariya biyolojî ye. Nebat û giyandarên (heywanên) Kurdistanê ku bi navê "Kurdî" di zimanê latînî de cîh girtine di pirtûkê de tên behs kirin. Mînak: Vulpes vulpes kurdistanicus- roviyê Kurdistanê ye.

– Mijarên pirtûkên te bi tevayî çi ne? Tu dikarî bi kurtayî ji naverokên pirtûkên xwe mînakan bidî?

– Mijarên pirtûkên min bi pirranî pirsgirêka kurdî û çanda kurdî ye. Pirtûka min a yekemîn di derheqa îşkenca Amedê de ye. Kuştinên ku tu kesî behs nekiribû pêşî me di vê pirtûkê de nivîsî. (Li gora şerdên sala 1987'an bifikirin). Ji bona çi nêzîkî 60 mirovên welatparêz hatin kuştin? Gelo di deverek dinyayê de ev bûyer çêbûne? Ji ber ku me RASTIYA DIYARBEKIR da nîşandan em ji wan re bûn armanc. Pirtûka min a "Newrozladik Şafaklari" du birr e. Birra pêşîn ji bûyera Şêx Seîd dest pê dike heta Newroza sala 1991'ê, di rojên Newrozan de çi tiştên girîng bûbin hatiye zimên. Ev axaftin bi keçek biçûk re tê kirin. Navê keçikê Hêlîn e. Ev keçik li girtîgehê di nava îşkencê de ji diya xwe re çê dibe. Ji sedemê wê yekê çi bela tê serê diya wê, wisa tê serê wê jî. Keçik mezin dibe, dertê derve û dibe şahidê xweşewitandina *Zekiya Alkan*. Zekiye li serê bircên Amedê di Newroza 1990'î de canê xwe ji Newrozê re kir alav. Xweşewitandin di sala 1988'an de jî li Amedê çê bûbû, vêca Salîha Şener û Rahîme Şahîn li kolanê agir bi xwe ve danîbûn.

Birra duemîn qala serîhildan û berxwedanên girtîgeha Amedê dike. Şeş berxwedan tên zimên. Birra pêşîn bi zimanê romanekê hatiye nivîsîn.

Mijarê pirtûka "Bilim Dilinde Kürtler ve Kürdistan" bersiva zanyariya biyolojî bo îdeolojiya fermî ye. Di vê berhemê de ez li ser 83 nebat û 9 giyandaran disekinim, ku evan di latînî de li gerdûnê bi navê "Kurdistanica, kurdicus, kurdicum, kurdistanicum,

kurda, carduchorum û hwd." tên nasîn. Ev niha li unîversîteyan tên bikaranîn. Lê li unîversîteyên Tirkiyê têne veşartin. Ez bîyolog im. Min ev pirtûka li gora prensîbên zanyariyê nivîsî ye. Mêjiyên genî û yê "konikê pîrê" lê danîne, tehamula biyolojî nakin.

Pirtûkek min bi navê "Devletsiz Ülkeden İzdüşümler" tê zanîn. Ev pirtûka di derheqa pirsgirêka netewî û sosyalîzmê de çend nivîsar civandiye ser hev. Nivîsarên min yên ku di kovaran de derketine tê de cîh girtine.

Pirtûkek di sala 1988'an de min da weşandin. Ev pirtûk di derheqa Afganîstanê de ye. Li gora hal û mercên wê demê hatiye nivîsîn. Weke ku tê zanîn li Afganîstanê gelek şer li dar ma. Rêkxistinên olperest li wir gelek xurt in. Rêveberiya Afganîstanê ya kevin û van rêkxistinan tên şirovekirin. Di derheqa vî welatî de bi tirkî pirtûk zaf hindik in. Şerdên Afganîstanê niha hatine guhertin. Sedemê vê yekê dîtin û ramanên min jî ne yên berê ne. Ez niha ne di wê fikra xwe ya kevin de me.

– Gorî çîroka te ya bi navê "Şorbe" ku di hejmara NÛDEM'ê ya çaran de derketibû, kurdiya te ya nivîsandinê baş e. Gelo tu nafikirî ku tu berê nivîskariya xwe ber bi kurdî ve bizîvirînî, berhemên xwe bi kurdî biafirînî?

– Belê ez dixwazim. Ev nêzîkî salekê ye ku ez li ser kurdiya xwe dixebitim. Gelek nivîsarên min bi kurdî di kovarên mehane de derketine. Mînak: rexneyek li ser fîlmê Mem û Zîn hate weşandin. Çend helbestên min yên ku anonîm in di kovaran de weşiyan. Du meh berê min pirtûkek bi navê "Gundê Şano" nivîsî. Di vê pirtûkê de 12 çîrokên pêkenîn hene.Ev çîrok ji nava gelê me hatine civandin. "Şorbe" ya ku di Nûdemê de derket yek ji çîrokên wê pirtûkê ye. Ev pirtûk wê di meha adarê de di nava weşanên Koral de derkeve. GUNDÊ ŞANO di şaxa xwe de berhemek ji alî pêkenînî ve bi serê xwe ye.

Ez dixwazim pirtûkên xwe yên bi tirkî jî bikime bi kurdî. Lê mixabin wextê min tune ye. Divê wergervanên kurd vî karî bi cih bînin. Ez destûr didime wan. Ez dikanim bi kurtî bêjim ku nivîsandina min ya bi kurdî wê bidome.

– Rewşa çapemaniya kurdî li Tirkiyê çawa ye? Çi ji pêşeroja ziman û edebiyata kurdî li Tirkiyê dikeve serê te?

– Pêşî bi navê ROJNAME kovarek hefteyî derket. Tenê hejmara taybetî weşiya û sekinî. Niha hûn jî dizanin ku WELAT dertê û ew jî rojnameyek hefteyî ye. Ez wê diecibînim. Kêmasiyên wê jî hene, çawa be yek berdewamî dertê, ev yek zaf baş e. Ji alî din ve AZADÎ heye ku ew bi kurdî û tirkî dertê. Gramera wê li gora min çewt e. Li Tirkiyê rojname an jî kovarên li derveyî polîtîkayê tune ne. Serketin, Newroz, Newroz Ateşi, Medya Güneşi, Rewşen, Nûbihar, Deng û Welat... û hwd. Ev hemî her yek ya rêçekê ye. Îro du alfabe têne bikaranîn. Alfaba Celadet Bedir-Xan û alfaba ku rêça Deng û Azadî bikartînin. Feqî Huseyn Sagniç jî mîna beşa diduya dilive. Alfaba Celadet Bedirxan ji bo zimanê kurdî bingeh e. Ev divê neyê guhertin.

Ji alî din ve çend weşanxane hene. (Mînak: Melsa, Pelê Sor, Deng, Koral, Komal; Doz, Med û hwd.) Ev weşanxane pirtûkên bi kurdî derdixin, lê mixabin ew hindik tên firotin. Pirtûka bi nav û deng pirr pirr hezar hebî difiroşe. Ev jî ne tiştek e. Xwendevanên nivîsandina kurdî hindik in. Rewşenbîrên me sersariyê dikin, zexel in, xwe hîn nakin. Li qehwan, li ser masan pirr diaxivin, lê gava tê livandinê tune ne. Ez hêvîdar im ku wê hêdî hêdî nivîsandin û xwendina bi kurdî li gel belav bibe. Biponijin, heta du sal berê ev jî tune bû. Em ji ku hatine ku?

Heta ku bi sedhezaran xwendevanên kurdî û bi hezaran jî nivîskarên kurdî negihîjin em nabin netewe. Em ji talûka windabûnê xelas nabin. Ji alî din ve ev pirsgirêkên me yên li jor, gava tê-

koşîna neteweyî baş û rast here wê çareser bibin. Pirsgirêka çandî, wêjeyî û zimanî bi polîtîkayê ve girêdayî ye. Divê têkoşîna niha têk neçe, bi serfirazî here serî.

Rewşa çapemaniya kurdî wê baş bibe. Lê çalakiyên ji dil divêt. Ji bona ziman û pirsgirêka gramera kurdî di pêşerojê de konferansek divêt. Civatek zanyarî ji pisporan divêt ku bicive û biryarên girîng yên ku zexm û qet nayên guhertin bistîne. Ew biryarên li ser ziman û gramerê divêt ku li hemî aliyên Kurdistanê bê birêvekirin. Li gora dîtina min alfabeyek latînî (niha ya C. Bedir-Xan baş e) standard me divêt.

Nûdem, No: 5. 1993

KEMAL BURKAY:
"EDEBIYAT DINYAYEK DELAL DIXWAZE"

Nûdem: *Gava navê Kemal Burkay tê gotin, pêşî siyasetvaniya wî û paşê jî şaîrtiya wî tê bîra mirov. Lê mîna tê zanîn, te heya niha ji şaîrekî profesyonel bêtir pirtûkên şîran derxistine. Mîna siyasetvanekî profesyonel, tu çawan wexta nivîsandina ewqas şîr dibînî?*

Kemal Burkay: Ez him ji şiêr hez dikim, him jî ew bo min rê û olaxek e bo eşkerekirina bîr û baweriyên xwe. Di vî warî da siyaset bo min çi ye, şiêr jî ev e.

Bi raya min, meriv çiqas bi, karên din, wek bi siyasetê mijûl be jî, bo mijûliyên wek şiêr dîsa waxt dibe. Bes dil û daxwaz hebe. Bo hemû tiştan, heya bo siyasetê bi xwe jî usa ye. Zeman bi tena xwe ne bes e. Ger ew daxwaz, ew şewat ne be, çiqas waxtê merivan hebe jî pere nake.

Rast e, siyaset karek e, divê bê kirin. Divê tu waxta xwe vala derbaz nekî, berpirsiyariyên xwe bi cî binî. Bi raya min ez karê xwe yê rêxistinî di waxtê da dikim; mijûliya min li ser şiêr nabe astengek li pêş wan. Her usa jî meriv nikare tim, rojê bîst û çar saet bi siyasetê mijûl be. Meriv diweste û guhartin jî divê. Meriv dikare bimeşe, bi hevalekî ra suhbet bike. Meriv dikare li filmekî binêre, yan roman û çîrokekê bixwîne. Meriv dikare bi hunereke xweşik, wek muzîk, resim û şiêr mijûl be.

Helbet şiêr jî merivan diwestîne û gelek caran qasî babeteke siyasî û felsefî diwestîne. Divê tu bala xwe li ser kom bikî, kûr bifikirî, bidî û bistînî. Şiêr gelek caran wek zayînê ye û zayîn bê êş û zehmet nabe. Lê westana karê siyasî û ya şiêr cure cure ne. Çawa ku meriv ji

xwarina goşt û sawar bêzar be jî, dikare li ser baqlewekî bixwe..

Lê di vî warî da sal ne wek hev in. Hin salên min, heya hin demên salê bo şiêr bi bîhn û bereket e; têr diçinim, berhev dikim. Lê hin caran jî dem û sal hişk in, bê ber in. Ger tu bêjî çima, bersîvek hazir li ba min tune; ew ji bo min jî wek pirs e.

– Tu dikarî ji kerema xwe re hinekî bi firehî behsa pevgirêdana siyaset û edebiyatê bikî?

– Di welatê me da, gelek kes şiêr û siyasetê wek du tiştên dijî hev dibînin. Helbet ne tenê şiêr, bi awayekî giştî, edebiyatê, hemû hunerên xweşik û siyasetê. Ji ber ku, li welatên şundamayî wek Tirkiye û Kurdistanê siyaset gelek qirêj bûye. Pir kes siyasetê bo pere û post dikin. Navê merivên siyasî wek derewîn, durû û xweperest derketiye. Dema xelk dibîne, yekî siyasî bi hunerên xweşik mijûl dibe, yan jî, yekî hunermend karê siyasî dike, ecêb dimîne. Dibêje, ev herdu tişt çawa bi hevra dimeşin?.

Lê, siyaseta ku em dikin ne bi wî rengî ye. Şerê me dijî zulmê, bo azadiyê ye. Em bi xwe bindest in û refê me jî ya bindest û belengazan e. Ev siyaset merivan nake xwedî pere û post. Ev siyaset ne hêsan e; bi êş e, bi zor û zehmet e, bi xeter e. Lê ev siyaset, her usa jî pak û delal e. Hozanên gel, hunermendên baş, ger di rêxistineke siyasî da nebin jî, azadî û aşitiyê, û sazûmaneke delal dixwazin û bo van tiştan dibêjin, dinivîsin û berheman didin. Hingê, çima hozaniyeke han û siyaseteke han bi hevra ne meşe?

Di dinyayê da gelek nimûne hene ku mirovan karên edebî û siyasî bi hevra meşandine. Helbet hin bi giranî edîp bûn, yan jî usa hatin naskirin. Wek Gorkî, Lorka, Brecht, Neruda û Nazim. Gorkî bolşevîk bû û di nav bahoza şoreşê da cî girt. Lorka ji bo bîr û baweriyên xwe yên siyasî bi destê faşîstan hat kuştin. Brecht sosyalîstekî dilsoz bû, berhemên wî bo guhartina civakê ne. Berhem û jiyana Nerûda û Nazim jî usa bûn. Li Tirkiyê kîjan hozan û nivîskar ji si-

yasetê dûr maye? Demekî di komîta rêvebirê Partiya Karkerên Tirkiye da (TIP) Yaşar Kemal, Samîm Kocagöz, Can Yücel, Şükran Kurdakul û ez hebûm.

Di nav hozan û edîbên Kurdan da meriv dikare navê gelek kesan bide. Cîgerxwîn ji vê yekê ra nimuneyekî baş e. Heya dawiyê li nav siyasetê û tevî karê rêxistinî bû.

Hin caran siyaset derdikeve pêşiyê. Rêberekî wek Mao, Ho Şî Mîn, her usa jî şair bûn. Lê şairiya wan li himber karên wan ên siyasî gelek di siyê da ma.

Lê Pîr Sultan? Em wî bi kîjan alî binasin, ji serokiya serhildaneke gelî, yan ji hozaniya wî?

Meriv dikare ji dema berê û ji dema nu pir nimûneyan bide.

Siyaset helbet mijûliyek xurt dixwaze û waxt digre. Her usa jî, bo edebiyatê gelek tiştan hazir dike. Hin caran dar li hev sî dikin û hin nahêlin yê din mezin bin; lê hin caran jî, dar di saya hev da mezin û bilind dibin. Carcaran difikirim: Gelo, ger siyaset ne bana, dikaribûm ewqxas şiêr binivîsim?.

Bi kurtahî pêwendiyên siyaset û edebiyatê xurt in. Siyaset, bi rûyekî xwe, bo guhartina dinyayê ye. Xasima, siyaseta şoreşger. Edebiyat jî dinyayeke delal dixwaze, him jî, bi efrandinên xwe dinyayê delal dike. Merivên edîp dema têkilî siyasetê bin, du tişt dibe: Yan qirêjiya siyasetê di ser wan da jî digre, yan jî ew siyasetê delal dikin..

– Pirtûka te ya pêşî bi navê Prangalar di sala 1967'an de bi tirkî li Tirkiyeyê derket. Piştî wê jî te gelek şitrên bi tirkî nivîsandin. Lê belê, te paşê dest bi nivîsandina şitrên bi kurdî kir. Gelo ji bo çi te girîngiya nivîsandina şitrên bi kurdî dît? Ya ku tu ajot ser nivîsandina şitrên bi kurdî çi bû?

– Kurdî zmanê min ê zarotiyê, ango zmanê dê ye. Lê malûm e, me firsend ne dît di waxtê da hînî xwendin û nivîsandina kurdî bin, edeba kurdî nas bikin. Me di mektebên tirkan da xwend. Di zema-

nê me da li Kurdistana Bakûr kitêb, kovar û rojnamên kurdî bi dest ne diketin.

Piştî salên şêstî, di hin kovar û rojnaman da, ku bi destê Kurdan dihatine derxistin, bi Kurdî jî yek-du şiêr, yan kurtenivîs derketin. Piştra elîfba M. Emîn Bozarslan derket.

Ez di sala 1972'yan da derketim der welat û hatim Ewrûpa. Heya vegerê du sal li Ewrûpa mam û di wê demê da min li vir kovar û kitêbên kurdî dîtin. Min xwe da ber hînbûna xwendin û nivîsandina Kurdî. Romana Erab Şemo, Destana Memê Alan û nivîsên Kamran Bedirxan tesîrek mezin li ser min kirin. Bi Kurdiyeke zelal û xweş bûn.

Min nivîs û şiêrên kurdî yên pêşîn wê demê nivîsandin. Min ev kar ji xwe ra wek berpirsiyarî dît. Wek kurdekî doza azadî û rizgariyê dikim, divê zmanê dayîk jî baş bi kar bînim. Wek kesekî ku şiêr dinivîsim, çima kurdî nebe?. Min kurdî bi kar anî û hînî delalî û dewlemendiya zman bûm.

– Dewlemendbûna şitra kurdî ya klasîk diyar e. Gelo mirov dikare ji bo şitra kurdî ya nûdem jî eynî tiştî bibêje? Şitra kurdî tro di çi rewş û qonaxê da ye?

– Şiêra kurdî ya klasîkî berhemê hezar salî ye. Şiêra kurdî ya nudem hîn teze ye. Îro asteng li pêş edeba kurdî pir in. Yê herî mezin ew e ku, kurd hîn ne azad in û di hemû parçan da şerê man û nemanê dikin. Bo pêşveçûna çand û edebê, bo pêşveçûna hunerên xweşik azadî û aşitî divê. Da ku zman serbest be; xwendegeh, radyo, têlevîzyon, têr kitêb û rojname hebin; xelk hemû hînî xwendin û nivîsandina zmanê xwe be û yekitiya zman pêk bê. Da ku firsend çêbe û ji nav mîlyonan mirovên jîr û jêhatî, mirovên xwedî huner bikaribin xwe nîşandin. Da ku kitêb, kovar û rojname bêne xwendin, resim bêne frotin û nivîskar û hunermend jî hewes bikin, giranî bidin karê xwe. Ango divê bazar vebe.

Îro gelek kes şiêr dinivîsînin. Lê him bazar teng e, him jî şiêr bi cure cure zaravan û devikan têne nivîsandin. Mixabin yekitiya zman tune û meriv nikare bigihîje tama gotinê.

Tiştekî eyan e, di hemû deman da nivîskar gelek bûn. Lê ji sedsalan, ji nav gelekan navê kêm kesan heya îro hatiye. Îro jî, ku bo nivîsandin û çapkirinê firsend gor zemanê berê gelek zêde ye û nivîskar pir in, helbet, hemû berhem di warê edebî da giranbuha nabin. Ji wan gelek kêm wê bimînin sibê. Divê ji ser sal û dem derbaz bin ku bê dîtin, çi diçe, çi li ser bêjingê dimîne.

Bi raya min, îro jî di edeba kurdî da şairên hêja û berhemên hêja hene. Lê hêyf, ew bazar tune. Hin caran miştêrî heye, mal tune; hin caran jî mal heye miştêrî tune..

Her usa jî, bihar teze hat, ewê berhemên xwe bide û bigihîne.

– Şiîr ji bo te çi ye?

– Şiêr bo min zmanê delaliyê ye. Meriv bi gotinên şiêr delaliyê dide nasîn. Hin kes vî karî bi firçe û reng dikin, hin kes bi şiklê tîmsalan, cure bi cure..

Delalî di jiyana hemû mirovan da heye. Ew şîweyekî hezkirinê ye. Delalî hin caran jinek e, hin caran gulek e, roj û baran e. Daristanek, çemek, behrek te heyran û hijmekar dike. Meriv dixwaze vê delaliyê bîne ser zman; bi reng, bi şikl, bi gotin bêje. Şiêr, wek hemû hunerên xweşik parvakirin e. Tu delaliyê nîşanî xelkê didî, dixwazî bi wan ra parva bikî.

Hîsên delaliyê di her mirovekî da heye. Lê herkesek xwe nade ber vî karî. Delaliyên çiyan li ser hemû mirovan, pir-hindik tesîrê dike. Lê her kesek nabe çiyavan, vî tiştî ji xwe ra nake mijûlî.

Şiêr bo min, her usa jî, haletek e ji bo eşkerekirina bîr û baweriyan. Meriv dikare hîsên xwe, bîr û baweriyên xwe bi bendekî jî eşkere bike, bi çîrok yan şiêrekê jî. Hin caran tesîra du xetên şiêrekê ji bendekî dirêj mezintir e. Di çarîneke teze da usa dibêjim:

Hevalo, şiêr bo min şûr û mertal, tevger û al e
Şiêr bo min kilam e, stran e, yar û delal e
Merhemê birînan e, çilke roniyê şevereşan
Xem û şîn, şahî û evîn, hawar, hêvî û heval e

Ma tenê bo min usa ye? Di hemû berhemên edebî da, di hemû berhemên hunerên xweşik da, wek şiêr, çîrok, roman, resim, tîmsal, mîmarî, muzîk û yên dinê; di van hemûyan da tevî hîs, raman jî heye; meriv bi riya van tiştan bîr û baweriyên xwe jî dibêjin. Mirov bi riya van tiştan di derheqa xwe da, di derheqa dorber û jiyana xwe da dibêjin.

Helbet, bo herkesekî hîs cuda ye, bîr û bawerî cuda ye. Ji ber ku jiyan cuda ye. Bona vê yekê, delalî bo herkesekî ne yek e.

Ew guftugo û lec ku dibêjin, huner bo hunerê ye, yan jî huner bo civatê ye. Ew ji bo min leceke bê mane ye. Ji ber ku jiyana mirovan jiyaneke civakî ye. Ew bi vê civakê heye, di nav wê da şikil digre û bi wê ra dide û distîne. Berhemên hunermendî, her usa jî berhemên civakî ne. Lê merivê hunermend e ku can û şikil dide wan û wan dike xweşik. Ger berhem xweşik nebe, -bo huner, yan bo civakê- bi çi navî dibe bila bibe, hîç e.

Berek, ya kulîlkek li merivan xweş tê, meriv li ser wê dibêje; lê meriv dikare li ser şoreşê jî tiştên delal bêje.

– Mîna tê zanîn di van demên dawî de muneqeşeya şîra kurdî û şairên kurd tête kirin. Tu rola zimên di edebiyatê de çawan dibînî û berhemên edebî ku ji aliyê kurdan ve bi tirkî hatine nivîsandin, aîdî kîjan pirtûkxaneyê dibînî?

– Şiêr yan jî berhemên din ên edebî, bi kîjan zmanî hatine nivîsandin malê wî zmani ne. Şiêr û romanên ku kurdan bi tirkî, farisî, erebî, yan jî bi zmanên dinê nivîsandine, meriv nikare bêje ku ew

malê Kurdî ne.

Lê ger ew kes kurd in û xwe kurd dihesibînin, pêvendiyên xwe bi çand û tevgera gelê xwe winda nekirine, divê em wan di nav "nivîskarên kurd" da bihejmêrin. Nivîsên wan bi kurdî nebe jî, tesîra çand û ruhiyeta Kurdan di berhemên wan da jî xuya dike û pir caran armanc û daxwazên netewî tînine ser zman. Ango para gelê kurd di wan berheman da heye.

Li welatên Afrîqa û Amêrîka Latîn gelek millet fransî û spanyolî bi kar tînin. Lê nivîskarên van welatan ne yê Fransa û Spanya ne, yê wan in.. Heya tirkan, romanên Xalîde Edîp ku bi zimanê fransî nivîsandibûn li ser pirtûkxana xwe hesibandin.

Nûdem, No: 17, 1996

ŞÊRKO BÊKES:
"DIVÊ JI ŞAÎR RE SÎNOR NEYÊN DANÎN"

Şêrko Bêkes di sala 1940'î de li başûrê Kurdistanê, li bajarê Silêmaniyê hatiye dinyayê. Ew kurê şaîrê navdar Faîq Bêkes e. Şêrko Bêkes xwendina xwe ya destpêk, navîn û lîse li bajarê Silêmaniyê xelas kiriye. Cara pêşî wî di hufdeh saliya xwe de, li Silêmaniyê, şiîrên xwe di kovara "Jîn"ê de belav kirine. Di salên 1964-65'an de tevlî refê şoreşê dibe û di wan salan de di radyoya şoreşê de dixebite. Di 1968'an de dîwana xwe ya pêşî "Tîrêjên Heyvê" li Bexdayê çap dike. Di sala 1970'ê de bi komek hevalên xwe re, ji bo nûkirin û ji kevintiyê rizgarkirina şiîra kurdî, bi navê tevgera Ruwange îmzeya xwe davêje bin manîfestoyekê. Di sala 1975'an de ji aliyê rejîma Iraqê ve tête surgûnkirin û sê salan li jêrî Iraqê jiyana surgûnê dijî. Ji sala 1984'an û hera 1986'an dîsan di nava refê şoreşê de dimîne û di dawiya 86'an de mecbûr dimîne welêt terk dike, diçe Îranê, ji wir diçe Sûriyê û paşê di ser Îtalyayê re xwe davêje Swêdê. Di sala 1987'an de xelata PEN'a Swêdê ya Toxolskî digire û dibe edebiyatvanê kurd yê pêşî ku xelateke edebî ya navneteweyî digire. Wî heta niha zêdeyî deh pirtûkên helbestan çap kirine û şiîrên wî wergeriyane zimanên tirkî, farisî, erebî, swêdî û niha jî ji çapkirina îngilîzî re amada ne.

Piştî serhildana 91'ê dîsan Şêrko Bêkes vedigere welêt. Di hilbijartina 91'ê de dibe endamê parlementoya Kurdistanê û paşê bi dengên parlementan dibe wezîrê kulturê. Ew nêzîkî du salan wezîr dimîne û bi gotina wî, ji ber nedemokratîkbûna parlementoyê ew ji wezîrtiya xwe îstifa dike.

Me Şêrko Bêkes li kafeteryayeke li navenda Stockholmê dît, bi qehwevexwarinê re û di nava dixana cigara wî ya şaîrane de ji bo xwendevanê Nûdemê pê re sohbetek kir.

Nûdem: *Em dizanin ku tu kurê şaîr Faîq Bêkes î. Zarokên gelek navdaran an dibin berevajiyên wan, an jî bi wan re dikevin qayişê, dixwazin bibin wek wan. Gelo mirov dikare bibêje ku te dilbijokiya jiyana bavê xwe kir?*

Şêrko Bêkes: Gava bavê min mir, ez hê biçûk bûm, şeş-heft salî bûm. Mîna zarokekî şeş-hef salî min bîr nedibir ku ez di derheqa şiîrê û cîhana şiîrê de bi bavê xwe re bipeyivim. Lê tê bîra min gava bavê min radihişt pirtûkan û pirtûk dixwendin an jî gava tiştin li ser kaxezan dinivîsand. Lê ev yeka mîna xewnekê tê ber çavên min. Di jiyana min de sê tişt hene ku tesîra mezin li min kirine da ez ber bi cîhana şiîrê de herim. Yekem bavê min e ku mîna şaîr di nava xelkê de dihate naskirin û hezkirin û xelkê jê re hurmet digirtin. Dudu; xwezaya Kurdistanê, spehîtiya wê, şax û dax, çem û daristanên wê. Sisê; ew çîrokên ku diya min ji min re digotin. Van her sê tiştan ji bo nivîsandina min tesîrên mezin li min kirine. Rast e, gelek şaîr hene ku kurê wan nebûne şaîr û ji xwe re dane ser riyeke din, an jî gelek hunermend hene ku zarokên wan dûrî hunerê ne. Ne şert e ku mirov şaîr be divê zarokên mirov jî şaîr bin. Wek mînak du xwişkên min hene ku qet têkiliya wan bi şaîrtî an jî edebiyatê te re tunene. Lê tesîra bavê min ya li ser min bêtir tesîreke manewî bû, tesîreke ruhî bû. Tê bîra min ku xelkê digotin kurê Faîq Bêkes e, bavê min jî di nava xelkê de xwedî xatir û qîmet bû, loma ew ji min re bû nîşana qenciyê, ji min re bû çirayek. Min jî dixwest ez mezin bibim û weke bavê xwe werim hezkirin, di nava xelkê de bibim xwediyê xatir û qîmet. Bavê min ji min re şiîrek nivîsandibû, digot, hêvîdar im tu ê şûna min dagirî, bibî dengê qencî û rastiyê. Wan gotinên wî jî

ez ber bi cîhana şaîrtiyê ve ajotim.

– Mîna tê zanîn du demên giring di guherandina şiîra başûr de xuya dibin; dema pêşî di navbera herdu şerên cîhanê de û bi serkêşiya Evdila Goran û dema dawî jî piştî serhildana tevgera Ruwange bi serkêşiya Şêrko Bêkes. Gava tu van herdu deman beramberî hevdu bikî tu çi hêlên wekhev û yên cûda di navbera van herdu deman de dibînî? Tu dikarî hinekî bi van deman ve girêdayî behsa rewşa şiîra kurdî bikî?

– Ez dixwazim bibêjim ku şiîr li başûrê Kurdistanê, berî niha bi du sed salî, di dema Baban de. Li ser destên sê şaîrên mezin Nalî, Salim û Mustefa Beg geş bû. Herçî şiîra nû, bi şêweya nû, mîna ku te jî behs kir, di navbera herdu şerên cîhanê de bi serkêşiya Evdila Goran dest bi gulvedana xwe kiriye. Tiştekî din jî heye ku nivîskar û rewşenbîrên kurd yên wê demê, an jî avakerên wê dibistanê bi kapasîte bûn, bi kêmanî her yekî ji wan bi sê zimanan dizanîbûn, wek erebî, tirkî, farisî û tirkî û herweha gelekan ji wan bi gelek zaravayên kudî jî dizanîbûn. Nûhîtiya şiîr û edebiyata Ewrûpayî zûtir, yanî berî ku bigihîje Kurdistanê, gihîşte Tirkiyeyê. Tesîrê wê ji Tirkiyeyê derbasî rohilata navîn bû û ji wir jî derbasî Kurdistanê bû. Ez dikarim bibêjim ku Şêx Nûrî Şêx Salih ku berî Goran e, bi riya tesîra edebiyata Ewrûpayî û edebiyata tirkî xwest guhertin û nûyîtiyekê di şiîra kurdî de çêbike. Lê herçî Goran e, tiştê ku Şêx Nûrî Şêx Salih xwestiye bike, wî bi awayekî firehtir xistiye jiyanê, di form û zimanê şiîrê de guhertin û nûyîtî anîne. Evdilah Goran, bi qasî ku bi zaravayên kurdî dizanîbû, wî bi zimanên biyanî, mîna erebî, farisî, tirkî û hinekî jî bi îngilîz dizanîbû. Zanebûna wî ya bi îngilîzî jê re deriyê îmkanan vekir ku zû ji şiîra îngilîz ya romantîk haydar bibe. Bi taybetî Byron û Schiller nas kir û di bin tesîra wan de ma. Evdila Goran xwest bi riya wergerandina şiîra îngilîzî deriyê şiîra modern li ber zimanê kurdî veke. Wî di dema xwe de şiîrên Byron, Schiller û

La Martin wergerandine kurdî û hem pê zimanê kurdî kiriye şirîkên zimanên dinyayê, hem jî berê şîra kurdî ber bi nûkirinê ve kiriye. Zanebûna Goran ya bi gelek zimanan, herweha zanebûna wî ya bi zimanên biyanî kir ku ew bêtir di şîrê de kûr here û şîra kurdî ji qalib û kêşana şîra erebî rizgar bike û bi folklora kurdî ve girê bide. Ew kapasîteya ku di wê serdemê de bi Goran re hebû, kir ku ew bikaribe di şîra kurdî de guhertinên bingehîn çêbike, berê şîra kurdî ber bi dinyayeke nûtir ve bike. Yanî yek ji kirinên Goran yê girîng û biserketî ew e ku wî şîra kurdî ji kêşan û qaîdeyên şîra erebî qut kir û ew bi celebê folklora kurdî ve girê da. Ji xwe folklora kurdî ji cerg û hinavê civaka kurdî derketiye û serbestiyeke hunerane tê de heye. Lê belê Goran ne bi tenê tiştên nû xiste nav şîra kurdî, wî herweha fikrên nû jî di nava civata kurdî de belav dikir. Bê fikrên nû, guherînên nû ne di jiyana mirovan de dibe, ne jî di şîrê de...

Ferqiyeta serdema me ji ya serdema Goran ew bû, ku em komek xort bûn, em bêtir li Bexdayê dijiyan, Bexda jî wê demê yek ji navendên huner û kulturê bû. Em li Bexdayê bi riya zimanê erebî ketin nava cîhana edebiyatê; çi roman, çi çîrok, çi şîr... Herweha em ketin nava meseleyên fikrî û îdeolojî jî. Em bi riya kovar û rojnameyên ji welatên ereban yên cihê cihê haydarî guhertinên dinyayê, siyaset û civatên dinyayê jî dibûn. Ji bilî vê jî, li Bexdayê, pêwendiyên me bi şaîr û edîbên ereban re hebû; şaîr û edîbên ku ji gelek welatên ereban yên cûda. Ev şaîr û edîbên han jî çi di warê zimanê erebî de, çi jî di warê zimanê îngilîzî de, gelek şareza bûn, kovar û rojnameyên pir bi kalîte derdixistin. Têkilî û danûstandinên me yên digel şaîr û edebiyatvanê ereban kir ku em careke din li şîra kurdî hûr bibin, dîsan wê nû bikin, jê re zimaneki nû, resimên nû û formeke nû û hemdem bînin. Di vê serdemê de ne ez bi tenê bûm, li gel min hin hevalên din jî hebûn. Bo nimûne; çîroknivîs Husên Arif, kak Botanî ew jî çîroknivîs e, rehmetiyê Celalê Mîrza Kerîm ku berî bi

çend salan wefat kir û hin hevalên din... Me van hevalan bi hev re manîfestoyek derxist, manîfestoya Ruwange. Manîfestoya Ruwange ji bo tazekirina şiîra kurdî hawarek bû, bangek bû. Mirov dikare bibêje ku ev manîfesto digel nûkirin û azadiya şiîrê, nûkirin û azadiya fikir û ramanê jî bû. Herweha di civatê de azadî û serbestiya jinan bû jî. Ji bo vê yekê hin meleyên kevneperest êrîş anîne ser me, vê êrîşa wan kir ku em beyaneke din jî derxin. Tevgera Ruwange tazekirina fikrê, tazekirina nêrîna cîhanî, nûkirina şiîra kurdî û ji bo azadiya jinê gavavêtinek bû. Herweha tevgera Ruwange pakkirna zimanê kurdî ji gotinên biyanî, pakkirina naveroka çîrok û şiîra kurdî bû. Em bawer dikin ku her tim pêwîstiya guherandin û nûkirina huner û edebiyatê heye. Me bi xwe li gorî hêza xwe ew guhertin kirin. Nivşê li dû me jî li gora xwe guhertinan dikin. Çi ji bo çîroka kurdî, çi ji bo şiîra kurdî û bi giştî ji bo pexşana kurdî dewreke me ji bo guherandin û nûkirinê hebû, me ew kir, lê niha hinek ji me westiyane, rûniştine, hinek di vê riyê de berdewam in.

Ferqiyeta di navbera tevgera me û ya Goran de, ew e ku du nêrînên cuda li ser jiyanê û cîhanê, du nêrînên cuda li ser şiîr û edebiyatê û du felsefeyên cuda bûn.

– *Dîroka Kurdistana başûr ya nêzîk bi şer û berxwedanan ve derbas bûye. Gelo şiîra kurdî jî di meydanên şer de bû, an jî xwe kişandibû quncikan û ji şer re temaşevan bû? Bi gotineke din çi testra şiîra kurdî li şer û berxwedanên kurdan bûye, an jî çi testra şer û berxwedanan li şiîra kurdî bûye?*

– Serdema nivşê min, serdema şer û berxwedanê bû. Ev jî serdema me ji ya Goran vediqetîne. Derketina me tûşî demeke teqînê bû, tûşî demeke şerê germ bû. Di sala 1961'ê de temenê min bîst û yek sal bû gava şoreşa kurdî li Kurdistana başûr dest pê kir. Xort bi kêf diçûn şer, ev çûyîn û hatina şer însanekî nû afirand, ku ew jî di dîrokê de û ji bo guherandina dîrokê însanê kurd yê şoreşger e.

Helbet vê yekê tesîreke mezin li me kir. Ev tesîr ew bû ku em tiştê xwe yê taybetî bi bîr bînin. Ew tiştê taybetî jî ziman bû, huner bû, edebiyat bû, dîrok bû. Azar ne bi tenê azara şaîran e, ji ber ku azara xak e, azara av e, azara welat e. Durustbûna pêşmergeyên kurd, durûstbûna însanekî ye ku divê dîrokê biguhere, divê jiyaneke nû ji bo milet ava bike, tesîreke van ya gelek mezin li ser me hebû. Ez bi xwe heta vê saetê jî di bin tesîra wê gavavêtinê de me. Lê şîîra me jî li Kurdistanê mîna sîlehekê ye. Rola şîîrê li Kurdistanê ne mîna ya Ewrûpayê ye, li Kurdistanê şîîr jîndar e, li nav xelkê ye. Çawan li malan nan heye, av heye, xwarin heye, wilo jî şîîr li malan heye, li nav xelkê, di dilê xelkê de heye. Li Silêmaniyê di şahiyeke şîîrê de ne kêmî du hezar mirov beşdar dibin. Lê li Ewrûpayê ne wilo ye. Ger şaîrekî baş li Kurdistanê dîwaneke xwe çap bike, wê kêmî heftheyşt hezar liban neyê firotin. Bo nimûna gava ez di sala 1991'ê de çûbûm Silêmaniyê, di şeveke xwendina şîîran de zêdeyî sê hezar kes hatibûn, ji van belkî hezar kes li derve rawestiyabûn. Bi kurtayî em şaîrên demekê ne ku barût, teqîn û xwîn hebû. Em şaîrê demekê ne, ku malên me dişewîtin, daristanên me dişewitîn, asmanê welatê me her duxan bû. Bêguman, ew dûkela, ew xwîna, ew wêrankirina hemû li ser şîîr û edebiyata serdema me tesîr kiriye. Herweha tesîra me jî li ser şerkerên welêt gelekî hebû. Wan şîîrên me digel çekên xwe bi xwe re dibirin serê çiyan, bi xwe re dibirin qada şer. Tiştek heye ku ez qet ji bîr nakim, carekê pêşmergeyekî nameyek ji min re nivîsandibû, di nameya xwe de gelekî kêfa xwe ji şîîrên min re anîbû û gotibû, 'ez dixwazim şehîd bibim da tu ji bo min şîîrekê binivîsînî'. Ew şehîd ket û min jê re şîîrek nivîsand. Ev tişekî mezin e. Ez dikarim bibêjim ku em nikarin şîîra xwe ji şerê azadî û serbestiyê cuda bikin, şîîra me jî her tim bi pêşmergeyan re di cepheyê de bû. Ez bi xwe sê caran ketime nava refê pêşmergeyan. Carekê temenê min bîst û sê-çar sal bû, carekê di 74'an de çûm, carekê jî ji 84'an ta

86'an di nava şoreşê de mam. Vê yekê tucrebeyeke zindîtir da min. Gelek ji hevrêyên min ku pêşmerge bûn, şehîd ketin. Li ber çavên min gund dişewitîn, zarok, jin, kal û pîr dişewitîn, bê guman ez nikarîbûm ji van re temaşevan bimama. Van hemû tesîr li min dikirin. Tesîra şiîra me jî li şoreşê hebû, lê divê ez bibêjim ku her dem hêza pêşmerge di pêşiya şiîra me de bû, şer û berxwedan ji şiîra me xurttir bû.

– Ji bo hin şaîran şiîr evîn e. Ji bo hin kesan jî şiîr şeraba tenêtiyê ye, çûkekî baskokirî ye. Ji bo te şiîr çi ye? Şiîr çi dide te, an tu dixwazî bi gotinên xwe yên hundurîn çi bidî dinyaya derve?

– Ez şiîrê ji bo jiyanê dinivîsînim. Ez şiîrê ji bo rehetiya ruhê xwe dinivîsînim. Ez şiîrê bi zimanekî taybetî dinivîsînim da ez xoşewîstiya xelkê ya ji bo şiîrê bêtir bikim. Şiîr di eynî demê de hem ez im hem jî xelk e. Şiîr xoşewîstî ye, şiîr ezmanekî ji gotinan e, ku hemû însan pêwîstî bi ezmanekî weha heye. Şaîr ew ezmanê xoşewîstî yê gotinan e. Bi ya min şiîr ji bo her şaîrî cûda ye. Gava mirov dibêje şiîr evîn e, ev ne bi tenê evîna jinekê ye, ev dikare evîna dayikekê be, evîna zarokekî be. Zarok, jin û dayik hemû bi hev re evîn e, ev evîna wicûd e, evîna jiyanê ye. Bi ya min şiîr berdewambûna jiyanê ye. Şiîr berdewambûna evînê ye. Gava ez şiîrê dinivîsînim, ez dixwazim bi riya ziman xweşîtiyekê bînim pê, di giyanê xwe de xweşîtiyekê ava bikim.

– Gelek kes bi şiîran dest bi nivîsandinê dikin lê paşê derbasî prosayê (nesirê) dibin. Tiştê ku dixuye tu hê jî li ser şiîrê berdewam î. Gelo ferqiyet an jî hêlên wek hev yên şiîr û nesirê çi ne? Çi pevgirêdan an jî çi cûdayetî di navbera wan de heye?

– Bi ya min di hemû zimanên dinyayê de girantitîn şêwezimanê edebî şiîr e, zimanê şiîrê ye. Zimanê şiîrê di hemû zimanên dinyayê de xweştirîn, zehmettirîn ziman e. Helbet şiîr ne bi tenê beşek e, şiîr dinyayeke mezin e. Şiîr heye weke kaniyê ye, biçûk e, şiîr heye

weke çem e, mezin e, şiîr heye weke golê ye, kûr e. Şiîr heye, şanonameya şiîrî ye û şiîr heye qesîdeya dirêj e, drama ye, dramaya mezin e. Yanî şiîr ne bi tenê şêweyek e, şaîr dikare di nav şiîra xwe de hemû dinyayên din bihundurîne.

Rast e, gelek şaîran bi şiîrê dest pê kirine û paşê derbasî nivîsandina romanê, an jî pexşanê bûne. Yê min rast e ku ez şiîrê dinivîsînim, lê ez çawan şiîrê dinivîsînim? Şiîra ke ez îro dinivîsînim, ne şiîra ku min berî niha bi deh-panzdeh salan dinivîsand. Şiîra ku ez niha dinivîsînim, tecrubeyên zêdetir tê de hene, naverokeke dewlemendtir tê de heye. Wek nimûne min "Derbendî Pepûne" nivîsî, ev berhema min qesîdeyeke diramî ye ku ji du sed û bîst û pênc rûpelan pêk tê. Du sed û bîst û pênc rûpel ne bi tenê şiîr e; roman tê de heye, çîrok tê de heye, serpêhatî tê de heye, lê belê bi zimanê şiîrê ye. Gava ez dixwazim bi zimanê nesir binivîsînim, her tim dibe şiîr, ji ber vê yekê ez nikarim bi nesîrê binivîsînim. Zimanê nesîr zêdetir zimanê aqil û mantiq e, lê zimanê şiîrê ne weha ye. Her çiqas ez carinan dixwazim nesîrê binivîsînim, ez dîsan dadigerim ser şiîrê. Lê, ev ji şaîrekî bo şaîrekî din, ji edîbekî bo edîbekî din tê guhertin. Bêguman şaîr hene ku roman û çîrok jî nivîsandine û biserketî jî bûne. Hin şaîr jî hene ku her şaîr mane. Min jî carinan xwestiye ku ez romanekê binivîsînim, lê her tim xwesteka min ber bi nivîsandina şiîra dirêj a dramî, an jî ber bi nivîsandina destanê çûye.

– *Digel perçeyên din jî, tu bi gelemperî rewşa edebiyata kurdî û bi taybetî jî rewşa şiîra kurdî çawan dibînî?*

– Pîvana şiîr û edebiyata kurdî, an jî ya dinyayî bi serbestiya wan miletan ve girêdayî ye. Mirov nikare serbestî û ziman ji hev cûda bike. Rewşa Kurdistanê ya jeopolîtîkî û dabeşbûna Kurdisranê, kiriye ku rewşa şiîr û edebiyata kurdî bi gişti wekî rewşa siyaseta kurdî û rewşa civaka kurdî be. Bo nimûne, ji bo ku li bakurê Kurdistanê, rojek ji rojan meseleya zimanê kurdî, serbest nebûye, azad nebûye,

pê nehatiye xwendin û nivîsandin, pê kovar û rojname nehatine derxistin, pê pirtûk nehatine derxistin, bûye sebeba nederketina edebiyateke bi hêz, şîreke bi hêz. Rast e, niha li Ewrûpayê hin kovar û rojname derdikevin, hin kes şîran dinivîsînin, lê ev ne weke rewşa başûrê Kurdistanê ye. Ji ber ku li başûrê Kurdistanê, ne ji niha ve, ji salên bîstî û heta niha her tim zimanê kurdî bi awayekî serbest bû. Ger li Kurdistana başûr rewşa siyasî carinan xerab bûbe jî, bi zimanê kurdî her tim tiştin derketine, ziman qedexe nebûye; rojnameyek du rojname, kovarek du kovar û pirtûk derketine. Ev ji Kurdistana bakur pir guheriye, ku qet mecala xwendin û nivîsandina kurdî lê nebûye. Li Kurdistana Îranê bi zimanê kurdî xwendin nebûye, bi tenê di mudeteke yeksalene de, di dema komara Mehabadê de bûye. Lê di van demên dawî de kovarek bi navê Sîrwe li wir derdikeve. Vê rewşa han kiriye ku ezmanê şîra kurdî, ezmanê edebiyata kurdî ezmanekî teng be, ezmanekî biçûk be, ezmanekî tengeber be, edebiyatvan û şaîrên baş dernakevin. Meseleya ziman weke mesela erdê ye. Ger erdek nebe, tu ê çawan karê xwe bikî, çandiniya xwe bikî. Ziman jî weke erdê ye. Ev ferqiyeta siyasî û civakî, ferqiyeteke edebî jî aniye holê. Bo nimûne li jêrê Kurdistanê şîr gelekî bi pêş ketiye, gelek şaîrên mezin derxistiye. Ez bawer dikim ger li Kurdistana bakur azadiyek hebûya, qedexebûna li ser zimanê kurdî tunebûya, me ê bikarîbûya bi hêsanî ji wî beşî jî şaîrên mezin, romannivîsên mezin, edebiyatvanên mezin bidîta. Gava mirov vê rewşê bi bîr tîne, mirov tavilê têdigihê ku edebiyat û şîra kurdî bi azadî û serbestiya kurdan ve girêdayî ye. Ger azadî tunebe, edebiyata kurdî jî nabe, ger serbestî tunebe, şîra kurdî jî nabe. Ev hemû bi hev ve girêdayî ne. Bedaxewe hin şîrên ku bi kurmancî hatine nivîsandin û min xwendine, şîrên pir lawaz in, pir sivik in, ne şîrên vê serdema me ne. Ev celeb şîr li şîrên milî diçin, ne şîrên hunerî ne. Şîra dinyayê ya îro li cihekî din e. Şîrên bi vî babetî li

başûrê Kurdistanê dibe ku di salên bîstî, sihî, çilî de dihatin nivîsandin. Li Kurdistana Îranê rewşa şîîra kurdî baştir e. Şaîrên weke Hêmin û Hejar û nivîskarê wek Zibêhî derketine. Herçiqas şîîrên van şaîrên me bi dizî, yanî bi nihênî hatine belavkirin jî, lê tesîreke baş li nav cîlê xwendevanan kirine. Herweha ji şaîrên ku piştî Hêmin û Hejar e, ku Siware ye, Siwarê Irxanî Zade yek ji wan şaîrên herî baş e bi raya min. Lê bedaxewe wî zû wefat kir. Ez bawer dikim temenê wî li dor sî salî bû gava wefat kir. Ew gelekî nêzîkî edebiyata Ewrûpayî bû, bi zimanên ewrûpayî dizanîbû. Herçî şaîrên Kurdistana Sûriyeyê ne, piraniya wan bi erebî dinivîsînin. Lê mijar û naveroka şîîrên wan hemû kurdî ne. Wan şaîr û edîbên gelekî mezin derxistine, lê ew bi kurdî nizanin, bi kurdî nenivîsandine. Bo nimûne Selîm Berekat heye. Bi baweriya min Selîm Berekat îro yek ji edebiyatvanên dinyayê yê mezin e. Selîm Berekat digel şîîrê roman jî nivîsandiye, lê hemû romanên wî, navên kesên tê de, navên teyr û teba, navên deşt û çiyan hemû bi kurdî ne, mijara romanên wî dîroka kurdî ye, lê ew naçar maye ku bi zimanê erebî binivîsîne. Ji xwe ev yek ji problemên me yên girîng in. Ev problemeke me ye ku divê em gelekî bi cidî li ser rawestin û munaqeşe bikin. Gelo em ê kurdên ku bi zimanin din dinivîsînin mîna edîbên kurd qebûl bikin an na? Ev problem dişibe problema ku ereban li ser edebiyat û edebiyatvanên Cezayir, Tûnis û Mixrib munaqeşe dikirin e. Ji ber ku piraniya edebiyatvanên van welatan ne bi zimanê erebî lê bi zimanê firansizî dinivîsandin. Em çawan li van binihêrin? Bi a min edebiyat ziman e, ger berhemek bi kurdî nehatibe nivîsandin mirov ê nikaribe wê mîna berhemeke bi kurdî an jî edebiyara kurdî bihesibîne. Ji ber ku ev rastiyek e, îro çi li Sûriyê û çi jî li Tirkiyeyê gelek şaîr û nivîskarên baş hene, pir baş dinivîsînin, lê mixabin ji ber ku ew bi kurdî nanivîsînin, ew nabe edebiyata kurdî.

– *Wek kovara Nûdemê me ji mêj ve dest avêtiye vê pirsê. Pirsa gelo*

kî nivîskarê kurd e kî û ne nivîskarê kurd e. Ev demek e di rojnameyên rojane de jî ev pirs tê munaqeşekirin. Piraniya yên bi kurdî dinivîsînin dibêjin yên ku bi tirkî dinivîsînin ne edebiyatvanên kurd in, yên ku bi tirkî dinivîsînin û kurdayetiyê jî dikin, her xwe mîna edebiyatvanên kurd dibînin. Tu ê bi kurtî di vê derheqê de çi bibêjî? Ma rast e ku ziman nasnava berhemeke edebî ye?

– Ez bawer dikim ew nîv û nîv in. Yanî nîvî edebiyatvanên ereb nîvî yên kurd, nîvî edebiyatvanên tirk, nîvî yên kurd in. Lê bi raya min pirsa girîng ev e; gava mirov bibêje şaîrê kurd, divê şiîrên wî bi kurdî bin, bi kurdî hatibin nivîsandin. Lê yên ku bi tirkî an jî bi erebî dinivîsînin, qey nake ku mijara berhemên wan li ser kurdan bin, an jî hin navên kurdî di berhemên xwe de bi kar bînin, ew dîsan jî nabe edebiyata kurdî. Wek nimûne em bibêjin Yaşar Kemal, Selîm Berekat, Mihêdîn Zengene ev hemû nivîskarên mezin in, lê bi zimanên ku nivîsandine, dibe malê pirtûkxaneya erebî, malê pirtûkxaneya tirkî, ew naçin pirtûkxaneya kurdî. Mesele kî edebiyatvanê kurd e, kî ne edebiyatvanê kurd e, ew ziman tesbît dike, ne ku hîsên nivîskar çawa ye. Şertê bingehîn ziman e.

– *Nayê bîra min ku edebiyatvanên kurdan xelatên navneteweyî girtine, ez bawer dikim tu yê pêşî yî. Wek tê zanîn te di sala 1987'an de ji aliyê PEN'a Swêdê ve xelata Toxolskî girt. Ev ji bo te hîseke çawan bû û çi tesîr li şaîrtî û şexsiyeta te kir?*

– Xelata Toxolskî, ji salê carekê ji aliyê kluba PEN'a Swêdî ve tê belavkirin. Divê xelatgir, edebiyatvanekî li sirgûnê be, yanî eksîl be. Min di sala 1987'an de ew xelat girt û ew xelat berdewam têtе belavkirin. Xelata Tokoloskî tesîreke mezin a edebî li min nekir, lê xelata Toxolskî ne bi tenê ji Şêrko Bêkes re bû, xelata Toxolskî, ji bo şiîra kurdî, ji bo edebiyat û zimanê kurdî, ji bo danasîna edebiyata kurdî bi ya cîhanê re ye. Ya girîng bi vê xelatê ew e ku xelk dibihîzin ku bi zimanê kurdî şiîrên baş tên nivîsandin, îcar ev şaîr Şêrko

– Bêguman na. Min qet bawer nedikir ku ez ê rojek ji rojan Kurdistaneke azad bibînim. Gava ez di nava refên pêşmergeyan de bûm, ez gelek caran nêzîkî mirinê bûme. Loma me bawer nedikir ku wê guhertineke weha mezin li herêmê bibe, kurdê xwe bi xwe xwe îdare bikin, wê parlementoyeke me çêbibe û hukûmeteke parlementoyê hebe, bêguman na, me bîr nedibir. Lê, em ji bo pêşerojê û nivşê dahatû difikirîn.

Gava li welêt ev guhertin çêbûn, ji bo ez jî berpirsiyariya xwe bi cih bînim, ez çûme welêt. Bi hilbijartinên demokratîk yên giştî ez pêşî mîna parlementer hatim hilbijartin, paşê jî bûme wezîr. Ji bo ku cara yekem ez bi navê kurdan bûme wezîr hîseke xweş e, lê li ba min şaîrek ji wezîrekî pir pir mezintir e. Piştî wezîrtiya du salan, ji ber nedemokratîkbûna parlementoyê min îstifa kir û dîsan vegeriyam Swêdê.

– Tu vegeriya Swêdê û niha jî her li Swêdê dijî. Ji bo îlhama afirandinê Swêd an jî Kurdistan?... Jiyana li biyanîstanê çi tesîrên erênî û neyînî li te dike?

– Bêguman ez bi tenê çûbûm Kurdistanê, jin û zarokên min li Swêdê mabûn. Gava min ji wezîrtiyê îstifa kir, tu kar ji min re nema, tu tişt tunebû ku min pê debara xwe bikira, loma ez vegeriyam Swêdê, ba jin û zarokên xwe. Tu ya rastî bixwazî, ez niha hîs nakim ku ez li Swêdê me, ez wilo hîs dikim ku ez li Kurdistanê me. Yek ji probleman ew e ku ez heta niha nikarim tevlî jiyana Swêdê bibim. Ez nikarim hevalekî Swêdî peyda bikim, ez nikarim tam têkevim nava kultur û adetên swêdiyan. Ne ji ber ku ev kultura swêdiyan xerab e, na, pir tiştên wan yên baş hene, gelek tiştên wan yên pêşketî hene; ew bi sedan sal di pêşiya me de ne. Lê heta niha xewnên ku ez dibînin jî hemû li Kurdistanê ne, ez xewnên zarokên xwe dibînim, xewnên welatê xwe û hevwelatiyên xwe dibînim. Ji ber vê yekê şîrên min jî her perçeyek ji welat e. Ew li ser welat, li ser heval û

Bêkes e an jî yekî din e, ne zêde girîng e. Ev li ber şîra kurdî deriyekî vedike, li ber ziman û edebiyata kurdî deriyekî vedike. Bi a min xelata Toxolskî yekem pênasîn e ku şîra kurdî dike şirîkê şîra dinyayî. Bivê nevê, vê xelatê ji bo min jî deriyek vekir, kir ku ez gelek şaîr û nivîsakrên swêdî nas bikim, ew min dawetî civînên xwe dikin û bi wê riyê jî îmkanê min çêdibin ku ez bikaribim şîra kurdî, edebiyata kurdî bêtir bi wan bidim nasîn. Hêvîdar im ku wê îmkanên wilo ji bo edebiyatvanên kurd yên din jî çêbibin û bi vî awayî dê kurd di qada navneteweyî de bêne naskirin û bibin xwedî gotin.

– Tu di edebiyatê de rola xelatan çawan dibînî?

– Bêguman xelat ji kevin ve awirdanek e da tiştên qenc û bi qîmet wenda nebin, neyên jibîrkirin. Xelat ji bo mirovatiyê, ji bo aştî û xoşewîstiyê ye. Edebiyat jî beşek ji vê ye ku pêwîst e li ber çavan were girtin. Bo nimûne gava Gabriel Garcia Marquez xelata Nobel wergirt, ne ku ew xalat bi tenê ji bo şexsê Marquez e, ew xelat herweha ji bo edebiyata Emerîka Latînî bi giştî ye. Ew xelat dibe sebeb ku edebiyata Emerîka Latînî bêtir li dinyayê belav bibe.

– Nebûna xelateke edebiyata kurdî ne kêmasiyeke e? An jî xelateke edebiyata kurdî wê ji bo geşkirin û bipêşdexistina edebiyata kurdî roleke mezin û berbiçav neleyize?

– Belê, ger yekîtiyeke me ya nivîskaran hebe, nivîskarên hemû perçeyan bi bîr û baweriyên siyasî yên cûda tê de hebin û ev xelat bi durustî ji aliyê yekîtiyê ve were belvakirin, bêguman wê roleke gelekî baş bileyize.

– Piştî ku te xelata Toxolskî wergirt û çend salan li Swêdê rûniştî, paşê bi guhertinên li welêt û avakirina hukûmeteke federel, te jî mîna parlementer û paşê jî mîna wezîrê kulturê di hukûmetê de cih girt. Çet dihate bîra te ku tu ê rojekê li Kurdistanê bibî wezîrê kulturê? Piştî ku tu bûyî wezîr, tu bawer dikî ku te berpirsiyariyên xwe bi cih anî?

hogirên min yên li welat, li ser tecrubeyên kevin, li ser bîranîn û av û hewa welat ava dibin. Tesîra Swêdê çi bigire li ser şîrên min tuneye. Ji ber ku min hê tiştekî bi vî welatî ve girêdayî be nenivîsandiye. Hemû tiştên ez dinivîsînim bi welat û paşeroja min ya li welat ve girêdayî ne. Bêguman biyanîtî, xerîbî ji bo şaîran carinan dibin çavkaniyên baş. Ji ber ku biyanîtî dike ku mirov piraniya caran li ser xewn û xeyalan bijîn. Ev jî ji bo şîrê tiştekî pir baş e. Gava ez li vir bi tenê dimînim, ez di xewnerojka xwe de diçim Kurdistanê, diçim nava refên pêşmergeyan, diçim gund û bajarên Kurdistanê, diçim zaroktî û xortaniya xwe. Ev jî dike ku ez bîranînên xwe bi gotinan bihûnim.

– Tu pevgirêdana edebiyat û siyasetê çawan dinirxînî? Nêrîna te li ser termên "Huner ji bo huner, an jî huner ji bo partiyê û civakê çi ye?"

– Gava em dibêjin siyaset, ger armanc fikrên siyasî be, li vê dinyayê tiştek tuneye ku ne siyasî be. Hemû têkiliyên civakî, têkiliyên mirovan, jiyan bi xwe siyaset e. Ger armanceke me ya guherandinê hebe, tê wê maneyê ku em siyasetê dikin. Lê divê mirov siyaset û îdeolojiyê ji hev veqetîne. Divê mirov ferqa îdeolojiya ji bo grûbekê an jî ji bo partiyekê û ya siyaseta giştî bibîne. Bêguman edebiyata ji bo grûb û partiyan jî hebû û wê her hebe jî. Bi baweriya min ya girîng ew e ku edebiyatvan çawan dinivîsîne. Ew bi grûbekê ve, bi partiyekê ve girêdayî ne, ne girêdayî ne, zêde ne girîng e, ya girîng şêweyê nivîsandina nivîskar e. Bo nimûne şaîr hebûne ku ji bo meseleya siyasî nivîsandine, lê şîrên pir baş nivîsandine. Herweha şaîr hene ku qet ne siyasî ne, lê şîrên pir xerab nivîsandine. Herçî em kurd in, em çi bi partiyan ve girêdayî bin çi ne girêdayî bin, em hemû siyasetê dikin. Em di romanên xwe de, di çîrokên xwe de, di şîrên xwe de behsa kurd û Kurdistanê dikin, behsa azadiya kurdan dikin, behsa pêşeroja Kurdistanê dikin, ev hemû siyaset e.

Lê, ev ji şiîra propoganda û sloganan cihê ye. Di vir de tiştê girîng ne nivîsandina ji bo kê û ji bo çi ye, lê nivîsandineke çawa ye. Ez li ser keçekê, li ser çemekî, li ser şehîdekî, li ser bajarekî dinivîsînim, lê ez çawan dinivîsînim, bi ya min ya girîng ew e. Min ji bo gelek şehîdan şiîr nivîsandine, lê ya girîng ew e min ew çawan nivîsandine.

Lê tiştekî din jî heye, divê şaîr ne bi emir û fermanan şiîran binivîsîne. Şaîr çawan hîs dike, dixwaze çawan binivîsîne, divê ew wilo binivîsîne. Divê ji şaîr re sînor neyên danîn. Ger ew dixwaze ji bo partiya xwe binivîsîne, bila binivîsîne, dixwaze ji bo evînê binivîsîne, bila binivîsîne, dixwaze li ser xwezayê binivîsîne, bila binivîsîne, dîsan jî ya girîng ew bi çi awayî û çawan dinivîsîne. Pîvan ne mijar, lê kalîteya şiîrê ye.

Nûdem, No: 17, 1996

FERHAD SHAKELY:
"ŞI'RA BAŞ LI SER HUNDURÊ MIROV DIPEYIVE"

Ferhad Shakely di sala 1951'ê de li Kerkûkê hatiye dinyayê, li unîversîteya Baxdadê ziman û edebiyata kurdî xwendiye, di eynî demê de di rojnameya "Birayetî" de xebitî ye. Di navbera salên 1974-1975'an bûye pêşmerge. Paşê mecbûr maye ku welatê xwe terk bike. Ew di sala 1978'an tê Swêdê û ji wê salê de li Swêdê dijî.

Shakely di panzdehsaliya xwe de dest bi nivîsandina şiîran dike. Di 73'an de pirtûka wî ya pêşî "Pirojey Kûdetayekî Nihênî" derdikeve. Bi nivîsandin û wergerandinê Shakely nêzîkî bîst pirtûkan çap kiriye. Ew ji deh salan û vir ve xwedî û berpirsiyariya kovara "Mamostayê Kurd" e û herweha li unîversîteya Uppsalayê dersên kurdî dide.

Nûdem: *Ez berê dixwazim em vê terma "şîrê" zelal bikin. Hin kes dibêjin helbest, hin kes dibêjin şiîr, hin kes şêr û hin kes jî şi'êr dinivîsînin. Gelo kîjan ji van rast e?*

Ferhad Shakely: Pirsa (bêjeya) şi'rê, di eslê xwe de wuşeyeka erebî ye û ji rêgeha kultûra îslamî hatiye nav zimanê kurdî û ketiye nav ziman û kulturên gelek miletên din ên li Rojhilatê. Mirov dikare bêje ku niha bûye pirseke Rojhilatî, pirseke îslamî. Ne tenê pirsa "şi'r"ê, gelek pirsên din jî hene ku ji rêgeya ziman û kultûra erebî hatine nav zimanê me û yê gelên din. Bo nimûne: *Qelem, kitêb, edeb, edebiyat* hemû ji zimanê erebî hatine. Lê rastiyeke din heye, ev pirs niha ne tenê pirseke erebî ye, belkû pirsin merov dikare bêje kurdî ne, farisî ne, ordû ne û di zimanê gelek

miletên din de jî bi kar tên. Pirsên weha êdî bûne pirsên rojhilatî.

Ez bi xwe pirsa şi'r pirseke baş dibînim. Eger çî gelek nivîskarên kurd, bo nimûne: Mamosta Goran di çend ciyan de pirsa "helbest" bi kar aniye jî, lê ez bi xwe pirsa *şi'rê* baştir dibînim. Lê kîjan rast e, ew navên ku te bi xwe nivîsîne, rastî ew e ku hîç yek bi xwe jî ne rast in. Lê eger em li orgînala wê binerin "şi'r" e û navên din ne rast in.

– Şiîra kurdî kengî û bi çi zaravayê kurdî hatiye nivîsandin? Sebebên ku bi taybetî şiîr li wê deverê hate nivîsandin çi bûn?

– Eger em bixwazin destpêka edebiyata kurdî pêşan bidin ku ji ku derê dest pê kiriye, karekî ne hêsan e û zehmet e. Ew zehmetî ji çend tiştan tê: Dîroka edebiyata kurdî bi temamî nehatiye nivîsîn. Eger hatibe nivîsîn jî, bi şêweyekî zanistî û baş çênebûye.

Ya din jî, mesela diyalekt û zaravayên zimanê kurdî ye. Bê guman em wan kesan tev kurd dihesibînin, lê hin xelk hene ku nîşana pirsê dadinin ser zaravayên kurdî. Bo vê jî destpêka edebiyata kurdî dibe meseleyeke munaqeşê û behs in ku zimanzanî û zimanwanî ne. Ev du sebeb in bawer dikim ku diyarîkirina destpêka edebiyata kurdî ne hêsan be. Lê dîsan jî em kurd dikarin bêjin, eger ev diyalektên ku ji zû de edebiyat, şi'r pê hatine nivîsîn yek-yek li ber çav bigirin. Ez bawer dikim ku diyalekta goranî û ya hewramî berî diyalektên din bo nivîsîn û şi'rê hatine bikaranîn. Bo vê jî mirov dikare bêje: edebiyata kurdî bi zaravayê hewramî dest pê kiriye.

Pirsa ku *bo çi ji herêma Hewramanê dest pê kiriye?* Ez bawer dikim ev girêdayê bi meseleke dînî ve ye. Ji ber ku navçeya herêma Hawramanê, dînekî xwe yê taybetî hebûye ku "*Dînê Ehlê Heq*" e, niha jî jê re dibêjin "*Kakeyî*" û piraniya stran û ayînên wan ên dînî bi vê diyalektê çêbûne. Mumkin e ku ev jî bûye sebeb ku mirov ne tenê stranên dînî, jê zêdetir jî stiranên "ruhî", behsa

ruh û jiyana xwe kirine û formek dîtine ku bûye forma şi'rê. Ew jî dibe destpêkek bo edebiyata kurdî.

Şa'irên gelek mezin bi zaravayê Hawramî hene. Niha navê gelek ji wan jî winda bûye ku mirov nizane kî ne û çi wext jiyane. Tiştên ku wan nivîsîne jî niha kêm li ber destên me hene. Lê dîsan di nav klasîkên edebiyata kurdî de, bi dîalekta goranî, navên mezin mane, wek; Xanay Qubadî, Seydî, Mewlewî, Bêsaranî û gelekên din.

Paşî wê, mirov dibîne ku edebiyat bi şêweya -zaravayê kurmanciya jorîn- dest pê kiriye. Piştî wê jî bi zaravayê diyalekta kurmanciya başûr dest pê kiriye. Lê mirov îro nikare bêje ku edebiyat bi zaravayê hawramî heye. Mumkin e ku hin kes li mala xwe pê binivîsin, lê wek edebiyat êdî rola wê nemaye. Zaravayê hawramî di edebiyata kurdî de bûye beşek ji klasîkên me. Lê em dibînin ku edebiyat bi du zaravayên kurmanciya jorîn û ya jêrîn pir xurt bi pêş dikeve, geş dibe û pê edebiyateke dewlemend tê nivîsîn.

– *Em dizanin ku dewlemendiyeke şiîra kurdî ya klasîk heye, tu vê dewlemendiyê bi çi ve girê didî?*

– Edebiyata me ya klasîk, pir dewlemend e. Ev dewlemendî bi dîtina min, meseleyek kulturî û ferhengî ye. Kultur û ferhenga kurdî di qirnên 17, 18 û 19`an de bûye beşeke zîndû, beşek pirjiyan ji kulturên Rojhelat û kultura îslamî.

Edebiyata kurdî ne tenê bi serê xwe jiyaye û ne jî ji edebiyatên dewrûberên xwe û kultûra miletên din hatiye birrîn. Bi dîtina min sebebekî vê dewlemendiyê jî ev e: Sebebê ferhengî û yê kultûrî ye. Lewra em dibînin ku piraniya şa'irên me yên klasîk, sêçar ziman zanibûne. Em Cezîrî bigirin, Ehmedê Xanî, Nalî, ya Mewlewî bi kêmanî her yekê wan bi sê zimanan kurdî-erebî-farisî caran jî bi turkî şi'r nivîsîne, hem jî şi'ra baş a bilind nivîsîne.

Nimûneyên ku li ber destên wan hebûne, wek standard ji ede-

biyata erebî û mirov dikare bêje zêdetir ji edebiyata farisî bûne. Lê nimûneya berz, nimûneya edebiyata farisî bûye, wek berhemên Mewlana Celaledînê Romî, Hafiz, S'adî û wekî din. Şa'irê kurd xwestiye ku ew jî bibe wek yekî mîna Hafiz, yekî wek Mewlana. Em vê meselê bi aşkira di şi'ra Melayê Cizîrî de dibînin ku dibêje:

Ger lû'lû'yê mensûrê ji nezmê tu dixwazî
Wer şi'rê Melê bîn, te bi Şîrazê çi hacet?

Yanî (Mela) xwe ji Hafiz kêmtir nabîne. Mirov dikare bêje ku ew xwe ji Hafiz mezintir jî dibîne. Ev xwemezinbînî yan xwekêmtirnedîtin bi dîtina min dewlemendiya kultûr û edebiyatê pêşan dide. Lewra Melê û wan şa'iran, xwe beşek ji vê edebiyat û kultûrê dîtine.

Nalî jî di şi'reke xwe de dîsa eynî mane, eynî pirs bi kar aniye, dibêje:

Faris û Kurd û Ereb hersêm be defter girtuwe
Sahibî sê mulka emro, Nalî dîwanî heye!

Weke ku em dibînin, yanî şa'irê kurd ê klasîkî xwe di nav edebiyateke zengîn, edebiyateke dewlemend de dîtiye ku mirov dikare bêje: "Edebiya Rojhelat"ê û "Edebiyata Îslamî" bûye. Her yek ji gelên Rojhilata îslamî, bi edebiyat û bi kultur bi ronakbîrên xwe ve tê de beşdar bûye.

Îro mixabin edebiyata kurdî û herweha edebiyata miletên din jî ji hev dûr ketine; gelek sînor di nava miletan de çêbûne, sînorên siyasî, yên ekonomî, yên ferhengî jî çêbûne. Îro mirov nikare bêje ku ronakbîrekî kurd bi gişti edebiyata erebî, ya turkî û ya fa-

risî nas dike. Lê mumkin e ku ronakbîrekî ji Bakûrê Kurdistanê edebiyata turkî nas bike, lê edebiyata farisî û erebî nas nake. Herweha ronakbîrekî ji beşên din jî, xeyrê edebiyata farisî û erebî edebiyatên din nas nake.

Lê weke em dibînin di sedsalên 17, 18 û 19`an de ronakbîrên kurd, ronakbîrên wê serdemê bê (ji xeyn) edebiyata kurdî bi kêmanî edebiyatên sê miletan -faris, edeb û turk- baş naskirine. Ev dewlemendî(ya klasîkan) ji vê hatiye.

– Ji ber ku ez dizanim tu ji nêzîk ve li ser Ehmedê Xanî dixebitî, ez ê bixwazibim tu çend kurtepirsên min bi bersiveke fireh bibersivînî. Mîna tê zanîn di sala 95'an de kurdan sêsedsaliya nivîsandina Mem û Zîna Ehmedê Xanî pîroz kirin. Ji bo wî civîn û konferans li dar ketin, bend û pirtûk hatin nivîsandin; gava mirov vê jî li ber çavan bigire, gelo bi rastî kurd îro Ehmedê Xanî nas dikin? Ya ku Ehmedê Xanî kiriye Ehmedê Xanî çi ye? Mem û Zîna wî behsa çi dike? Felsefeya wî çi bû? Wî xwestiye bi vê beytê çi bibêje: Şerha xemê dil bikim fesane/Zînê û Memê bikim behane.

– Berî her tiştî, divê ez çewtiyeke ku di nava me de belavbûye rast bikim. Ev çewtî ji kur û ji kê hatiye, nizanim lê mirov dikare bêje "Çewtiyeke teknîkî, çewtiyeke zanistî ye: Piraniya Kurdan sala 1995`an wek *Sêsedsaliya Mem û Zînê* danîne. Lê ev rastiya xwe ji aliyê tarîxî û 'ilmî ve tune, tiştekî ne rast e.

Lewra Ehmedê Xanî sala 1061`ê Koçê-Hicrî ji dayîk bûye, ku dibe hemberê 1651`ê Zayînê. Ev tiştekî rast e û kes nikare bêje ne wuha ye. Paşê, Ehmedê Xanî di **Mem û Zîna** xwe de gotiye:

Îsal gehişte çil û çaran
Wî pêşrewê gunehkaran

Eger em 44 bêxin ser 1061'ê ku Xanî ji dayîk bûye, dibe

1105'ê Koçê. Îro em nikarin bi zor tarîxa Zayînê li ser Ehmedê Xanî ferz bikin. Lewra wî hisaba Koçê kiriye. Bi hesaba Koçê ku 1105 e, dike hemberê 1693. Yanî Mem û Zîna Xanî di 1693'an de hatiye nivîsîn. Eger em *Sêsedsaliya Mem û Zînê* li gor tarîxa Zayînê hisab bikin, sala 1993 dikaribû bibûya tarîxa *Sêsedsaliya Mem û Zînê*. Ev jî, li gor hisabê me, lê li gor hisabê Ehmedê Xanî dîsa ne rast e. Eger em li gor tarîxa Hicrî 1105 ku *Mem û Zîn* hatiye nivîsîn hesab bikin, sêsedsaliya wê dike 1405'ê Koçê, hemberê wê (tarîxa Zayînê) 1984 dike. Eger em li gor dilê Xanî sêsedsaliya wê hesab bikin, bi rastî sala 1984 dibe sêsedsaliya nivîsîna *Mem û Zînê*. Ev meselake teknîkî ye kn cara yekem e ez bi nivîs behs dikim.

Li ser pirsyara ku *"Gelo Kurd Ehmedê Xanî nasdikin?"* ez dikarim bibêjim ku piraniya Kurdan îro Ehmedê Xanî nas nakin. Ne tenê piraniya Kurdan, bê tirs ez dikarim bêjim ku %5'ê ronakbîrên Kurdan -ez nizanim ku çend ronakbîrên Kurd hene, lewra statîstîk li ba min tune- *Mem û Zîn* an Ehmedê Xanî nas dikin. Ewên din -%95- Ehmedê Xanî nas nakin, felsefeya wî nas nakin û *Mem û Zînê* nas nakin. Rast e ku xwendine, rast e ku her yekê sê-çar caran jî *Mem û Zîn*a Ehmedê Xanî xwendine, lê nas nekirine.

Ez niha naxwazim bi dûrûdirêjî bêjim ku çima nas dikin û çima nas nakin, lewra meseleyeke dirêj e û mirov dikare li cihekî din behs bike.

Di mesela Ehmedê Xanî û *Mem û Zîn*a wî de, du nuqteyên giring hene; yek forma/ şêweya *Mem û Zînê* ye. Piraniya (kesên) ku behsa *Mem û Zînê* dikin, yan dibêjin "beyt" yan "çîrok", lê pirsa wek termekî edebî ku pir girîng e mesela "mesnewî" yan "mesnevî" ye kêm kes behs dike. *Mem û Zîn* bi xwe *mesnewî* ye û çîrokek e ku bi forma mesnewî hatiye nivîsîn.

Mesnewî ji qernê 14 heta yê 18 jî di edebiyata Rojhelatê de formeke gelekî meşhûr û populer bûye. Berî Ehmedê Xanî gelek şa'irên faris û turk jî bi mesnewî nivîsîne. Reng e ku yek ji wana yê herî naskirî jî Nîzamî Gencewî ye ku Ehmedê Xanî gelek-gelek di dibê tesîra wî de bûye. Pênc mesnewiyên Nîzamî Gencewî hene ku her jê re "xemse" yanî "pênc Mesnewiyên Nîzamî" dibêjin.

"Mesnewî" di nava Kurdan de hatiye naskirin, bi taybetî li ba Ehmedê Xanî û hin şa'irên din. Lê di roja îro de kes "mesnewî" nanivîse û wek formeke edebî rola wê jî nemaye. Lê ev girîng e ku mirov bizanibe *Mem û Zîn*a Ehmedê Xanî ji aliyê form ve "mesnewî" ye û beşek e ji edebiyata Rojhelatê.

Ya din, mesela feylesûfbûna Ehmedê Xanî ye ku di nava Kurdan de pir mezin kirine. Bi rastî Ehmedê Xanî ne feylesûf bûye, lê wî felsefeya serdema xwe baş naskiriye. Û diyar e ku felsefe di rojgarên Ehmedê Xanî de ne gelek belav bûye. Sebebên wê gelek in ku çima û çiqas felsefe di nava Kurdan de belav bûye. Lê felsefeya ku zêde hatiye naskirin, ya *tesewufê* -sofîzm- ye. Ehmedê Xanî sofiyekî mezin bûye, mirov dikare bêje ku wî felsefeyê bi riya tesewufê nas kiriye. Ehmedê Xanî gelek di binê tesîra felseya "Wehdet-ul Wucûd"ê de bûye ku felsefa Muhyedîn Îbn-ul Erebî ye. Mirov vê felsefê bi aşkira di piraniya beşên Mem û Zînê de jî dibîne. Bê vêya Ehmedê Xanî felsefene din jî naskirine; felsefa îslamî naskiriye û çi ketiye ber destên wî jî xwendiye.

Her kes Mem û Zîna Ehmedê Xanî bi şêweyê xwe, li gor îdeolojiya xwe, li gor dîtina xwe tefsîr kiriye. Berî 15-20 salan ku piraniya Kurdan çep bûn, Marksîst bûn, gava ku behsa Ehmedê Xanî dikirin weke çepekî (yekî çep) behs dikirin û dixwestin ku bêjin: "Ehmedê Xanî alîgirê çepîtiyê bû, alîkarê karker, cotkar û proleteran bûye." Ev gotin bi nivîsîn jî hene, ne ku me bihîztiye.

Bêguman ev ne rast e, ne rast bû û niha jî ne rast e. Herweha îro ku modela çep nemaye, îcar gelek kes dixwazin ku Ehmedê Xanî tenê wek kesekî neteweyî nişan bidin, ev jî ne rast e. Erê rast e ku ev tişt, ev bîr û baweriî di *Mem û Zînê* de hene, lê mirov nikare bêje ku felsefe û baweriya wî nişan didin.

Felsefe û îdeolojiya herî serdest a di Mem û Zînê de tesewuf û sofîzm e. Lê wek însanekî hişyar, yekî têgihîştî derd û kulên miletê xwe jî naskiriye û xwestiye ku miletê kurd jî wek miletên din rizgar bibe, azad bijî û xwestiye ku rêyekê nîşanî wan bide.

– Bi qasî Ehmedê Xanî, tu li ser Melayê Cizîrî jî dixebitî. Ger tu huner, felsefe û zimanê herdu şaîran beramberî hevdu bikî, kîjan şaîr bêtir biserketî ye? Kûraniya felsefeyê bêtir bi kîjanî re heye?

– Ev pirsyareke pir zehmet e. Bi taybetî jî, bo min gelek zahmet e. Rast e ku min li ser Ehmedê Xanî jî û li ser Melayê Cizîrî jî kar kiriye û niha jî kar dikim. Zehmetiyên min ji xwe ji vê tên. Ez hez ji herduwan dikim, bo min herdu jî mirovên gelek mezin û pîroz in. Lê bi kurtî eger ez karibin bersiva vê pirsyarê bidim; Ehmedê Xanî ji aliyê fikir û felsefeyê ve firehtir e. Mirov di *Mem û Zînê* de ronakbîriya wî, firehalîbûna wî baştir dibîne. Lê aliyê herî mezin ê Melayê Cizîrî *tesewuf* e û sofiyekî mezin bûye. Eger em weke şi'r lê binerin, bêguman ez dikarim bêjim ku hunera Melayê Cizîrî ya şi'rê gelek ji ya Xanî bilindtir bûye. Mebesta min ne ew e ku ez Xanî biçûk bikim. Rastî ev e ku ji aliyê hunerî ve formên cuda li ber destên Melayê Cizîrî hebûne. Lewra wî *qesîde, xezel, ruba'î* (çarîne) û gelek formên din bi kar anîne. Lê Xanî yek form bi kar aniye ku ew jî *mesnewî* bûye û pê *Mem û Zîn* nivîsiye. Çend şi'rên Xanî jî hene, lê ne gelekî xurt û bilind in. Bila jibîr nebe ku *Mem û Zîn* ji ewel heta axir yek wezin, yek kêşe şi'r tê de bi kar aniye. Lê bo Cizîrî ne wuha ye, Cizîrî her nebê 100-120 xezel û qesîde û ruba'î nivîsîne. Bêguman formên

Melê zêdetir bûne ku hest, his, bîrbirin, îdeolojî û felsefeya xwe pê nîşan bide.

– Em dizanin ku di edebiyata kurdî ya klasîk de bi qasî şiîrê nesîr (prosa) nehatiye nivîsandin. Sebebên wê çi ne?

– Rast e ku di edebiyata klasîk a kurdî de pexşan (nesir) nebûye, yan dereng dest pê kiriye. Eger mirov li sebebê wê bigere, ez bawer dikim ku desthelatiya siyasî sebebekî girîng e. Em dibînin ku miletên ku desthelata wan ya siyasî hebûye, pexşan li ba wan zûtir bi pêş ketiye, weke faris û turk. Şa'irên kurd ji xeyrî şi'rê tiştên xwe yên din pexşan nivîsîne weke name yan tiştên dînî, lê piranî zimanekî din bi kar anîne. Bo nimûne: Şa'ir û sofiyê mezin Mewlana Xalidê Neqişbendî, gava şi'r nivîsiye bi kurdî nivîsiye, lê nameyên wî yên ku niha li ber destên me hene -nêzî 300 nameyên wî mane- bi farisî û erebî nivîsîne. Ez dikarim bi dilniyayî bêjim gava Melayê Cizîrî jî name nivîsîne bi farisî nivîsîne. Herweha Ehmedê Xanî jî... Lê şi'r bi kurdî nivîsîne.

Çewa ku min îşaret kir, bawer dikim ku desthelata siyasî hoyekî mezin e ku edebiyata pexşan dereng dest pê kiriye.

– Di sedsala dawî de, rewşa edebiyata kurdî ya li bakurê Kurdistanê li ber çavan e, di heftê salan de heft pirtûkên bi kurdî derneketine, gelo rewşa edebiyata kurdî li başûr çawan bû? Ger tu resimekî heftê salane yê başûrê welêt, digel siyaset, şer, şoreş û demên aştiyê raxî ber çavan, wê resimekî edebiyatê yê çawan derkeve meydanê? Di vî resimî de şiîr cihekî çawan digire?

– Li Başûrê Kurdistanê di van 150 salên dawiyê de û ta radeyekê li Rojhelata Kurdistanê jî, edebiyat roj bi roj bi pêş ketiye. Ji ber hindê mirov nikare muqayesa rewşa başûr û bakûr bi hevûdu re bike. Sebebên siyasî, sebebên dînî weha kirine ku li başûr edebiyat bi pêş bikeve. Bi taybetî ji sala 1918-19 heta niha jî li başûr jiyaneke kulturî ya dewlemend hebûye û roj bi roj dewlemendtir

bûye; rojname û kovarên kurdî ku di serdema Şêx Mehmûd de dest pê kirine, bûne sebeb ku edebiyat û ziman bi pêş bikevin. Herweha ji wan salan ve ye ku li başûr zimanê kurdî bûye zimanê xwendinê, zarokên kurd beşeke mezin ji xwendina xwe di mekteban de bi kurdî xwendine. Ev tiştekî giring e. Jiyana rojnamegerî ji 1918-19'an dest pê kiriye û heta niha jî berdewam e.

Rast e şi'r di nava edebiyata kurdî de forma herî mezin bûye, lê ev heta salên 40 û ber bi 50 weha bûye. Lê paşê rewş hatiye guhartin, êdî pexşan; çîrok, şanogerî, rexne, gotar, nivîsarên siyasî û gelek şêweyên din yên edebî di edebiyata kurdî de dest pê kirine.

Niha gelekî zehmet e ku ez bikaribim di cihekî weha de wêneyeke giştî li ser ferheng û kultûra kurdî li başûrê Kurdistanê karibim pêşan bidim û ne hêsan e jî ku dîroka ferhenga kurdî ya 70-100 salan di nava çend deqîqeyan de kurt bikim, lê bi giştî ez dikarim bêjim: Eger zordesî li ser Neteweyê Kurd hebûne jî û rewşa siyasî gelek jî xirab bûye; her şoreş bi girtin û kuştin hatine domandin, lê şanaziyeke mezin e ku ziman û edebiyat roj bi roj bi pêş ketine, geş bûne û berdewam bûne. Ev xaleke geş û girîng e di dîroka ferhengî û kulturî de. Lê rastî jî ev e divê em gelek mexrûr nebin, ji xwe bayî jî nebin û nebêjin ku *edebiyata me bi pêş ketiye û em gihîştine qonaxeke mezin.* Divê em bi çavekî waqi'î û realîstî li edebiyata xwe binerin. Em dibînin ku em di gelek buwaran de, di gelek mecalan de li paş mane. Erê rast e şi'ra kurdî bi pêş ketiye lê edebiyat ne wisan e. Bo nimûne ez dikarim bêjim ku rexne bi giştî di edebiyata kurdî de li paş maye û mirov dikare bêje ku rexne di edebiyata kurdî de tune. Herweha edebiyata zarokan jî paşketî ye û hin aliyên din jî hene ku paşketî ne. Lê dîsan jî mirov kêfxweş e ku Kurd roj bi roj dixwazin edebiyata xwe dewlemendtir bikin.

– *Ger mirov behsa demeke aktîv ya edebiyatê li başûrê welêt bike,*

mirov ê bikaribe di navbera kîjan salan de bike? Di wan salan de rewşa şîrê çawan bû? Munaqeşeya tendensên edebî mîna; surealîzm, futurîzm, realîzm û îzmên din dihatin kirin? Tu bi xwe nêzîkî kîjan îzmê bû?

– Gava em li dîroka edebiyata kurdî ya başûrê Kurdistanê dinerin, bi rastî em çend qonaxên-serdemên cihê dibînin. Qonaxên herî aktîv û baş, mirov dikare bêje ku salên 1940-50 bûne. Paşê 1959 heta 1962'an qonaxek pir dewlemend û baş bûye. Lê ji wan herî dewlemendtir û bi pêşketîtir bêguman salên 1970 heta 74'an bûne. Di wan salan de bi rastî edebiyata kurdî bi pêş ketiye û mecaleke baş ji bo ronakbîrên kurd vebûbû ku berhemên xwe binivîsin û belav bikin, munaqeşe bikin û behs bikin. Di vê qonaxa dawîn de gelek meseleyên fikrî û îdeolojî di teoriyê de hatin behskirin.

Jiyana min a edebî jî, di wan salan de dest pê kiriye. Di destpêkê de çi dikete destên min, min ew dixwendin weke şi'r, teoriya edebiyatê, rexne û her çi hebûya, şi'r û meqaleyên min jî di kovar û rojnameyan de dihatin weşandin.

Wê çaxê min tenê du ziman -kurdî û erebî- dizanibûn. Paşê di salên dawiyê de îngilîziya min baştir bû û ez farisî jî hînbûm. Di destpêkê de bi rastî ez pir nêzîkî *surealîzmê* bûm û beşek ji wê qonaxê jî *dadaîzm* bû ku min hez jê dikir. Lê ew qonaxeke kurt bû. Paşê sebebên siyasî-îdeolojî weha kirin ku ez şi'reke vekirîtir binivîsin da xelk jê rind fêm bike. Ew jî îzmeke din bû. Lê van 15-20 salên dawî êdî ez nikarim bêjim ku ez ji aliyê edebî ve nêzîkî çi îzmekê me. Eger mirov îzmekê bi kar bîne, ez zêdetir nêzîkî edebiyata tesewuf û sofîgeriyê me ku behsa hundurê însan dike û ku edebiyata beşên veşartî yên di ruh û giyana mirovan de tîne zimên.

–Tê gotin ku li welatekî Emerîka Latînî şaîr belaş li otobusan si-

war dibûn, yanî ew ji nivîskarên nesîrê bi qîmettir bûn. Li hin welatên şerqê jî şaîr mîna pêxemberan dihatin dîtin. Li Kurdistanê rewşa we bi gel re çawan bû, an jî gel û civakê çi qîmet didan şaîran?

– Bi giştî li Rojhilatê û li Kurdistanê jî, bêguman, ciyê şa'ir ciyekî bilind e û xelk bi çavekî rêz û xoşewîstî lê dinêre, lê ne hemû kes, kesên ku şi'r nas dikin û ku şarezayîya wan li ser kultûr û edebiyatê hebe.

Ciyê şa'ir li Kurdistanê jî ciyekî mezin bûye, bi taybetî di serdemên klasîk de û heta salên 1920-30 jî. Lê ciyê şa'irên klasîk ji ciyê şa'irên îro mezintir bûye. Îro bi xwe jî li Kurdistanê ciyê şa'ir ciyekî baş e û xelk jê hez dike. Lê rastiyeke din heye ku divê mirov behsa wê jî bike ku siyaset an nirxên siyasî îro cihê nirxên edebî girtine.

Di salên 70`yî de çaxê em li unîversîteya Bexdayê xwendkar bûn, li wir em sê-çar şa'ir hebûn ku li eynî beşê dixwendin. Çi xwendekaran û çi xwendekarên beşên din ku edebiyat nas dikirin, ji me hez dikirin û bi çavekî rêz û xoşewîstî li me dinêrîn. Ne tenê wan, mamostayên me jî bi çavekî taybetî li me dinêrtin. Herweha şa'irên din ku di civata kurdî de nirx û cihê wan hebû û ku xelkê hez ji wan dikir, pêşan dida ku ciyê şa'ir li Rojhilatê heye, lê ne wek berê.

– Min gelek caran ji te bihîstiye ku tu Goran mîna bavê şîra kurdî ya modern dibînî? Tu dikarî hinekî behsa modernîzma Goran bikî û tesîra wî ya li ser nivşê li dû wî binî ziman?

– Li ser destên mamosta Goran çend aliyên nûkirin yan tazekirina şi'ra kurdî hene. Aliyê ku pir girîng e, mesela zimên e. Yek, mamosta Gotan şi'rên xwe zimanekî nivîsiye ku zimanê kurdiya petî, kurdiya pak e. Duhem, ji aliyê form ve: Şa'irên klasîk hemû "erûz" an weznên "behr" ên klasîk ên erebî û farisî bi kar anîne.

Cara yekem mamoste Goran e ku li dijê wan forman derketiye û formine kurdî bi kar aniye û wan forman ji folklor û stranên kurdî girtine. Ev guhartina formê ji bo şi'ra kurdî gaveke mezin bû. Sêhem jî bêguman naverok e. Goran şa'irekî romantîk bû, bi taybetî beşeke dûr û dirêj di jiyana wî de wek şa'irekî romantîk pir serketî û mezin bû. Naveroka şi'ra kurdî ji wesfên klasîkî, ji wêneyên klasîkî, ji derbirrînên klasîkî rizgar kiriye û aniye qonaxeke din ku tazebûn û modernîzm tê de aşkira bûne. Ev çi ji aliyê bikaranîna zimên ve be, çi ji aliyê derbirrîn û ji aliyê wêneyan û metaforên şi'rî ve be ji gelek aliyan ve taze kiriye.

Di destpêkê de tesîra mamosta Goran li ser nifşên an neweyên taze, mezin bû. Yanî şa'irên genc bixwazin û nexwazin jî, di destpêkê de diketin binê tesîra wî. Lê çawa ku zarokek gava mezin dibe hem şexsiyeta dê û bavê xwe digire, herweha şexsiyeteke taybetî bo wî jî çêdibe, bo me jî weha çêbû. Rast e ku di destpêkê de tesîra mamosta Goran li ser me hemiyan hebû, lê paşî her yekê me şexsiyeteke edebî, ya şa'irî peyda bû û bû sebeb jî ku em hêdî, hêdî ji binê tesîra mamosta Goran derbikevin. Lê îro mirov nikare bêje ku êdî tesîra mamosta Goran li ser nifşa me û nifşên ku li paş me hatine maye.

– *Mîna em dizanin niha gelek ji şaîrên kurdiya jêr li derveyî welêt, li Ewrûpayê dijîn. Li Ewrûpayê jî prosa di pêşiya şiîrê de ye. Gelo tesîrên vê yên erînî û neyînî çi ne? An jî jiyana sirgûnê tesîrên çawan li şaîrekî dike?*

– Em kesên wek şa'ir ku me di salên 70-yî de dest pê kiribû, bawer dikim ku em şeş-heft kes bûn. Lê seyr ew e ku piraniya me ji Kurdistanê derketin û li dinyayê belav bûn. Bawer dikim ku niha tenê yek li Kurdisranê maye. Bêguman awareyî û tarawge tesîreke mezin li şa'irî dike. Bi dîtina min ev tesîr jî du alî ne. Yek tesîra wê kultûr û ferhenga ku mirov dikeve navê ye. Eger em roh-

nîtir bikin, zimanên ku mirov fêr dibe û pê dixwêne, tesîr dike. Lewra mirov bi riya zimanan kultur, ferheng û edebiyatên miletên din nas dike. Her yek ji me jî, ezmûneke (tecrûbeyeke) me ya taybetî çêbûye. Ji ber ku her yekê me, em ketin welatekî cuda û çend zinanine cihê fêr bûn, çend edebiyatine din nas kirin. Ji ber hindê jî, ev meseleyeke girîng e. Îcar mirov bi hêsanî kare wê tesîrê di berhemên wan şa'irên kurd ên li derveyî welêt de bibîne.

Giringiyeke din jî ev e ku psîkolojî ye; his û tecrûbeyên mirov di warê hunerê de zêdetir dibin. Mesela bo min tarawge (eksîl) tecrûbeyeke pir dûr, dirêj û mezin e. Her nebe tesîr kiriye ku êdî ez şi'rê bi new'ekî din dinivîsim û bo min ne girîng e jî ku xelk şi'rên min fêm bike yan na. Bo min ne girîng e ez behsa tiştekî bikim ku li ber çavên xelkê be jî, lewra ez behsa tiştekî dikim ku ne li ber çavên xelkê ye, dixwazim bîr û hestên hundurê mirov pêşan bidim û derbirrim.

– *Gotina alimekî heye, dibêje carinan pirtûkek dikare ji şerekî mezintir bibe. Bi hêlên vê yên erînî û neyînî re, şîrek jî dikare ji şerekî mezintir bibe. Di welatên ku di şerê azadiyê de ne, doza şi'ra şerker ji şa'iran tê kirin. Herweha şi'r ji bo yên ku ji bo azadiya wan welatan an jî sinifan bûne sembol jî hatine nivîsandin û tê nivîsandin. Mîna tê zanîn, di dema şerê siyasî û civakî yê Bolşevîkan de li ser Lenîn gelek şi'r hatine nivîsandin. Serkêşê tevgera Futurîzma rûsî Mayakovskî bi xwe gelek şi'r li ser Lenîn nivîsandine. Di dema şerê xelasiyê li Tirkiyeyê û piştî wê bi heftê salan jî ji aliyê şa'irên Tirkiyeyê yên bijarte mîna Nazim Hikmet, Atilla Ilhan, Fazil Hüsnü Dağlarca û bi dehan şa'irên din li ser Mustefa Kemal gelek şi'r nivîsandine. Li ser Mustefa Berzanî jî gelek şi'r hatine nivîsandin. Îro jî li ser hin serokên din jî gelek şi'r têne nivîsandin. Tu şi'ra bi vî babetî çawan dibînî? Tu dikarî hinekî bi firehî*

behsa têkiliyên huner û polîtîkayê biki?

– Ez li virê naxwazim ku teoriyeke din bînim meydanê û ji xelkên din, ji ronakbîr û şa'iran bixwazim ku li gora vê teoriyê bifikirin û kar bikin, ez tenê behsa bîrûbaweriyên xwe dikim. Ew mesela ku "nivîskar bo kê dinivîse" û "divê ku pêwendiyên nivîskar û xelkê çewan be" bawer nakim ku taze be û ev mesele ji zû ve heye û pir jî hatiye behskirin. Lê ewên ku hemîşe xwestine û kar jî kirine ku ev mesele jîndar bimîne, kesine wisan bûne ku li meselê bi ruwange û çavên siyasetê nihêrtine. Di nava wan de bi taybetî ji hemiyan zêdetir bo marksîstan girîng bûye ku bo mebestên xwe yên siyasî edebiyatê jî, şi'rê jî û hunerê jî berdest bikin û ji xwe re bikin mîna nerdewanekê. Hemîşe jî yek beyan û yek belgeyê wan hebûye ku xizmeta milet, ya kesên hejar, feqîr û belengaz bikin, lê wek yasayeke qanûneke polîsî bi kar anîne bo îşkencekirina hunermend, bo dîlkirina hunerê da bêxin nava çarçeveyekê. Yanî pîvaneke ne edebî û ne hunerî, bo meseleyeke edebî û hunerî bi kar anîne.

Ez nikarim bêjim ku şi'ra baş bila bo hemû kesî be û her kes jê têbihegîje. Gotina ku"çima bila hemû kes jê fêm bike" jî, lewra her kes li şi'rê nagere, naxwîne û jê fam jî nake. Herweha hêsanbûna şi'rê jî nabe delîl û belge bo başbûn û çakbûna wê. Eger şa'ir bi azadiya xwe arezû be ku aliyekî bigire û ji xwe re bereyekî hilbijêre, bila bike û ez ne li dijim jî. Lê kesekî din eger şa'ir mecbûr bike ku ew aliyekî hilbijêre, ne rast e û dijî hunerê ye jî.

Ez ê ji edebiyata kurdî behsa çend nimûneyan bikim: *Mem û Zîn*a Ehmedê Xanî di nava hemû berhemên edebiyata kurdî de zêdetir hatiye naskirin. Lê çewa ku min berê jî behs kiriye, ez bawer nakim ku ji ronakbîrên Kurd ên ku *Mem û Zîn* fêm kirine, ji sedî pênc zêdetir bin. Lê *gelo ev tê wê manê ku Mem û Zîn ne edebiyateke bilind e?* Yan *ne baş û ne giring û ne mezin e!* Na, ez

weha nabînim! Herweha nayê wê manê jî ku *Mem û Zîn* ne bo mirovê Kurd, ne bo Neteweyê Kurd, ne bo hejar û belengazên kurd hatiye nivîsandin. Ev mesele ne tenê bo *Mem û Zînê*, bo şa'irên din jî wek şi'rên Melayê Cizîrî, yên Mewlewî û yên Nalî jî her weha ne; edebiyatine pir bilind û berz in, lê gelek kêm xelk wana fêm û nas dike. Ev kêmnaskirin û kêmfêmkirin hergîz nabit belge ku qîmeta wan ya edebî jî kêm dike.

Eger mirov nimûneyên şi'ra hêsan û sade bixwaze, ew jî gelek in: Şi'rên Qani' yên Cegerxwîn bibîne, yên Hejar, ta hedekê yên Hêmin jî.

Mesela ferheng û edebiyatê ku bi xelkê re bin û bibin pêşeng û rêşanên xelkê jî, ji aliyê logîkî ve ne rast e û gotineke ne zanistî ye. Ev derbirrîn û gotineke siyasî ya rût e. Ev derbirrîna siyasî jî weha dibîne ku *dinya hemû di nava şer de ye û mirov hemû ber bi şerekî mezin ve diçin, divê ku ronakbîr û hunermend jî digel şi'r û dîwanên xwe bikevin pêşiya wan û herin şer.* Lê eger ferheng û edebiyat ku bixwazin bibin pêşeng, komel û civatê biguherînin herweha bibin sebebê bipêşketina bîr û têgihîştin û eqlê mirovan, ne karê rojekê-du rojan e, ne karê salekê-du salan e jî. Ev bi dehan sal û bigire bi sedan sal jî digire. Ev meseleyeke şaristaniyet e, meseleyeke kultûrî û ferhengî ye ku jê re wextekî dûrûdirêj dixwaze.

Li ser şi'ra berengarî yan berhelistî ya siyasî, bêje nebêje ku bo şerê rizgarî bi kar bêt, diyardeyeke (fenomeneke) ku li ba miletên bo rizgarî û serbixweyîya welatê xwe xebat dikin heye û bi pêş dikeve. Tebî'et û siruşta dagirkirina welatan ji aliyê hêzên bêgane ve û xebata gelên bindest bo rizgariyê, ji gelek aliyan ve weke hev in. Ev fenomen û bagera gelek miletan ku hene, bûne sebeb ku şi'ra berhelistî û şi'ra xebatkarî çi ji aliyê form ve û çi ji aliyê naverokê ve li cem miletên cihê-cihê wek hev in. Bi gotinên wek

"Em can û ruhê xwe dibexşînin, em dar û kevirên welat bi xwîna xwe dixemilînin, em axa bab û bapîran rizgar dikin, em serbazên dijmin ji welatê xwe derdixînin" hin wêne ne ku em di edebiyata gelek miletan de jî dibînin. Lewra ev cûre şi'r erkekî xwe yê siyasî heye, da bi giştî xelkê germ bikin û wan bo xebatê amade bikin. Ev bikaranîn kareseyeke hunerî ye bo mebesteke siyasî.

Hin welatên ku paşê rizgar bûne û ku hêzeke siyasî, şoreşgêr û xwedanê îdeolojiyeke radîkal ku desthelatî girtiye destên xwe, ev fenomen û diyarde pileyek e û dereceyeke din jî bi ser dikeve. Wê gavê şi'r ne tenê dibe şi'reke siyasî, herweha dibe mîkrofona îdeolojiya desthelatdaran û şa'ir jî di dezgehên masmediyayê de dibin karmendên wê îdeolojiyê. Ev jî eger şa'ir, şa'irekî baş be karmendî dikeve destên wî, lê eger ne baş be wê gavê şa'ir tenê dibe polîs.

Siruşta şi'ra berhelistî ya şerker û cengawer bi xwe weha ye ku kêm caran cih bo nirxên hunerî û estetîkî dihêle. Lê dîsan jî şa'ir hene ku dikarin aliyê estetîkî û siyasî bi hevûdu ve girêbidin, şi'reke hunermendane û şoreşger binivîsin. Lê gava mirov li dîroka edebiyata miletan dinere, bi rastî yên weha gelek kêm in. Mumkin e Nazim Hikmet nimûneyeke baş be ku mirov behsa wî bike, lewra wî siyaset û huner bi hevûdu re guncandiye û kiriye berhemeke serketî ya baş.

Ger ez bi kurtî bêjim, ez weha dibînim ku ciyawaziya di navbera çend nirxên cihê-cihê de ji hev dûr in; nirxên estetîkî, nirxên hunerî, nirxên îdeolojî û siyasî... Bi dîtina min, nirxên îdeolojî û siyasî zû dimirin û temenê wan kurt e. Lê temenê nirxên hunerî, nirxên estetîkî dirêj e û zêdetir dijîn. Herweha mirov dikare ji wan re bêje ku nemir in. Lewra hin nirxên însanî hene ku ji deh hezar salan ve ye hêjî wek xwe mane û nehatine guhartin. Lê kîjan nirxê siyasî hebe, nikare ji sed, sed û pêncî salan zêdetir bijî.

Me di vê sedsala dawîn de dît ku hin deyan û siyaset hatin û heta ku nêzîkê nîvê dinyayê jî girtin, lê paşê rûxiyan û mirin. Ew, tenê bûn beşek ji dîrokê û mirov kare wan êdî di muzexaneyan de bibîne.

Bi dîtina min, çi şa'irê ku bixwaze şa'irekî baş be nêzîkê nirxên nemir, nirxên estetîk û yên hunerî dibe, ji nirxên ku zû dimirin jî dûr dibe.

– Ger tiştekî din ku tu bixwazî lê zêde bikî, tunebe, ez dixwazim em hevpeyvîna xwe bi pirseke ku ji mêj ve tê munaqeşekirin ve girê bidim. Şaîrê kurd kî ye? Yên ku bi kurdî nanivîsînin û bi zimanin din dinivîsînin, mirov dikare wan mîna şaîrên kurd bihesibîne? Bi gelemperî di edebiyatê de û bi taybetî jî di şiîrê de ji bo te rola ziman çi ye?

– Li vir gelek faktorên siyasî, îdeolojî û yên din hene ku rola xwe dilîzin. Îro li dinyayê gelek sînor hene û bûne hoyek ku bo nirxên me jî sînor bêne danîn. Eger em piçekî di dîroka edebiyatê de berepaş biçin, em dibînin ku giringîya zimên li ba şa'irekî berî hezar salî weke îro tune bûye. Ez ê nimûneyek ji edebiyata Rojhelatê bînim: Şa'irekî weke Mewlana Celaledînê Romî û wek Nîzamî Gencewî. Dirokvanên edebî dibêjin ku Mewlana Celaledîn ji aliyê etnîkî ve "turk" bûye. Lê rastî ew e ku wî ş'irên xwe bi farisî nivîsîne. Ez bi xwe gava şi'rên Mewlana dixwînim, ez nafikirim ku ew turk bûye, faris bûye yan wekî din, ji ber ku şi'rên wî gelek girîng in, gelek bilind in, hunerî û nemir in, ji ber hindê ez ji wan hez dikim.

Ez keçeke Emerîkî nas dikim ku edebiyata Rojhelatê, bi taybetî jî ya farisî baş nas dike. Ew ji du aliyan e; aliyek Cihû ye û aliyek jî Fileh e. Rojekê me behsa edebiyata Mewlana Celaledîn dikir ku gava mirov şi'rên wî dixwîne, mirov tê de sînor û neteweyan nabîne; mirov dinyayeke pir fireh a unîversal dibîne. Wê got:

- Ez bi xwe Emerîkî me û ji du kultûran têm. Gava ez jî si'rên Celaledîn dixwînim, li ba min jî eynî his û şu'ûr çêdibe.

Wê keçê jî mîna min, Mewlana wek mirov, wek şa'ir didît û li ziman, etnîk û baweriya dînî nedifikirî.

Herweha Nîzamî Gencewî jî, em dizanin ku diya wî kurd bûye û mumkin e ku bavê wî -wek Azerbêcanî dibêjin- turk bûye. Lê bi farisî şi'r nivîsiye. Ev yek jî bo min nabe sebeb ku ez nirxa Nîzamî kêm bikim, lewra ew bo min şa'irekî mezin e.

Ev meseleyên ku min behs kirin, di dinyaya me ya îro de hatine guhertin. Îro dinya parçe-parçe bûye û sînor zêde bûne. Bo vê jî îro nebûna zimên, bikarneanîna zimên, yan perçiqandina zimên netîce û encamên xwe yên din hene. Bo nimûne: Eger zimanê miletekî bête qedexekirin, ew milet jî ber bi mirinê ve diçe û dibe sebeb jî ku ji azadiya xwe dûr bikeve. Niha ziman bo milet êdî bûye meseleke jiyan û mirinê. Bo vê jî mirov nikare êdî wek berê li zimên binere.

Îro bo min şa'irê Kurd, ew kes e ku bi kurdî dinivîse. Ji ber ku roleke girîng a zimên heye û bo her miletekî, bo her neteweyekî jî bûye nasname.

Şa'ir û nivîskar eger bi kîjan zimanî binivîsin, di encamê da berhemên wan dibe milkên wî zimanî. Ev mesele îro êdî eşkera ye, lê hin sebeb hebûne ku şa'ir û nivîskarên hin miletan nikaribûne zimanê xwe bi kar bînin. Mesela miletê Cezayîrê çendî ku Ereb e jî, lê baştirîn şa'ir û nivîskarên wan bi frensizî dinivîsin. Li Senegalê şa'irê mezin Léopold Sédar Senghor ku paşê bû serekkomar jî, bi zimanê frensizî dinivîsî, niha jî endamê akademiya Frensî ye.

Berhemên şa'ir û nivîskar, du aliyên xwe hene: Aliyek ew e ku wek însan ji kîjan miletî ye pir girîng e. Eger em nimûneyekê bidin wek Yaşar Kemal, tu bixwazî û nexwazî jî ew kurd e. Ew bi

xwe jî, xwe kurd dibîne. Lê aliyê edebiyata wî, turk e û bi turkî berhem dinivîse. Herweha Selman Ruşdî jî hindî ye, lê edebiyata wî îngilîzî ye.

Lê ji bo min, di nav çarçewa dîroka edebiyata kurdî de, nivîskarê kurd ew kes e ku bi zimanê kurdî dinivîse.

Nûdem, No: 18, 1996

M. MALMÎSANIJ: "CELADET BEDIRXAN YEK JI PÊŞENGÊN KULTURA ME YA NIVÎSKÎ YE"

"Ên ku du roj (e) dest bi ziman kirine xwe feylesûf dihesibînin. Karê nezana holê ye. Ziman wek asoyê behrê ye, nêzîk xuyanî dike lê tu çiqas diherî tim ew e..."

Osman Sebrî

Nûdem: *Di dîroka rewşenbîrî û hişyarbûna gelê kurd de rola Celadet Alî Bedir-Xan û kovarên wî çi ne?*

M. Malmîsanij: Herçiqas ji pirsa te re bersiveke dirêjtir divê jî li ser daxwaza te ya nivîskî ez dê hewl bidim ku gotinên xwe bi rûpelekê bi sînor bikim.

Ji ber ku Celadet Bedirxan di warên cihê-cihê de xebitiye û ber û berhemên wî li ser babetên cihê ne, rola wî jî di hişyarbûna gelê Kurd de pirralî ye. Tê zanîn ku wî demeke dirêj xebata siyasî kiriye, di nav tevgera rizgarîxwaz a milletê Kurd de ciyê xwe girtiye; gelek nivîs û kitêb nivîsandine, nivîskar e; çend kovar derxistine, rojnamevan e; elîfba Kurdî ya li ser hîmên elîfba Latînî daniye; li ser gramer û ferhenga Kurmancî xebitîye, zimannas e; gelek tişt ji zimanên din wergerandine Kurmancî, wergêr e. Ev xusûsîyetên wî - heke em xebatên wî yên din nehesibînin jî - nîşan didin ku di nav kulrura siyasî û nivîskî ya Kurdî de xwedî ciyekî girîng e. Bi van xebatên xwe wî tesîr li tevgera Kurdî kiriye û şopek li pey xwe hiştiye ku nayê înkarkirin.

Bêguman ew ne Xweda ye. Kêmasî û şaşiyên wî jî hene. Em bêjin îro di hin pirsên siyasî de ez bi xwe wek wî nafikirim lê tevî

viya jî rola wî ya musbet eşkere ye. Ez dixwazim li ser pirsekê bisekinim: Gava gotin tê ser roşinbîr, nivîskar, şaîr û bi taybetî lîderên polîtîk ên Kurd, hin Kurd tenê pesnê wan didin, bi çavê rexnegirî lê nanêrin. Pesnên wisa, tim telqîna meleyan û zikra mirîdan tînin bîra min. Na, divê em bêpozbilindî qedrê wan - ên ku layiq in- bizanin lê divê em bi "telqîn" û "zikra mirîdên polîtîk" nesekinin; eger hebin - ku kesek bêkêmasî û şaşî tune- divê ku em kêmasî û şaşiyên wan jî bibînin, bibêjin û binivîsin. Yan na em dê çawa pêşkevin? Lê gotin û nivîsîna kêmasî û şaşiyên kesên wisa, divê nebe sebebê înkarkirina kar û xebata wan a hêja. Bêguman bona ku em derheqê kesên wisa de bigihîjin qenaeteke rast, divê em dem û şertên jiyana wan a şexsî û civakî jî ji bîr nekin.

Gelek caran behsa rola Celadet Bedirxan a di warê elîfba Kurdî û gramera Kurmancî de tê kirin. Bi a min tevî vana di hin pirsên din de jî rola wî girîng e. Ez dixwazim bala xwendevanan bikşînim ser hinek ji vana:

- Xebata wî ya di warê Kurmancîya nivîskî de, bi taybetî di warê pexşana (nesra) Kurmancî de
- Di warê kultura nivîskî ya Kurdî de
- Di warê ferhenga Kurdî de
- Di warê folklora Kurdî de
- Di warê tarîx û belgeyên Kurdî de

Kurmanciya nivîskî bi taybetî pexşana Kurmancî bi wî çend gavên girîng avêtin.

Kultura devkî ya Kurdî xurt e lê kultura nivîskî qels e. Celadet Bedirxan yek ji pêşengên kultura me ya nivîskî ye.

Ferhenga wî baş naye naskirin. Min bi xwe li ba hevalekî beşek ji musweddeya vê ferhengê dîtibû; ferhengek gelek hêja ye. Ez hêvî dikim ku di demek kin de ev ferheng bête çapkirin.

Wî di warê tarîxa Kurdî û weşandina hin belgeyan de jî ji me re mîrasek hiştiye lê bi a min wî dikarîbû di vî warî de gelek tiştên baştir bikira. Ez vê yekê wek kêmasiyeke wî dibînim. Ji ber ku ew bi xwe di nav de bû, di warê tevgera welatperwera Kurdî ya organîzekirî de (wek nimûne Kürdistan Teali Cemiyeti, Kürt Teşkilat-ı İctimaiye Cemiyeti, Xoybûn) dikarîbû gelek tiştan binivîse û biweşîne. Heyf e ku di vî warî de zêde tişt neweşandiye.

Tevî her tiştî, bi xizmeta xwe ew hêjayî pesnê ye. Berhemên wî yên ku îro li welatên cihê cihê ji nû ve tên çapkirin him hêjayiya xebata wî him jî rola wî ya musbet nîşan didin.

Heçî kovarên wî ne, ev beşek girîng in ji xebata wî. Xuya ye ku bi taybetî di zaravê Kurmancî de tesîra van kovaran gelek musbet e. Çi heyf ku heta îro ji alî ziman ve ji wan baştir kovarên me tunin. Ev rastî alîkî de xurtîya wî, alîkî de jî qelsiya nivîskarên me yên îro nîşan dide. Bêguman derxistina Hawar û Ronahiyên nû yan jî derxistina kovar û rojnameyên ji wan baştir ne tiştekî hêsan e lê ne bêîmkan e jî.

Bi hêviya ku di warê zimên de Celadetên me zêdetir bibin.

Tevî silavên min.

Nûdem, No: 8, 1993

HAVIZ QAZÎ: "ŞAHSIWARÊ QADA ZANÎNÊ CELADET BEDIR-XAN"

Nûdem: *Di dîroka rewşenbîrî û hişyarbûna gelê kurd de rola Celadet Alî Bedir-Xan û kovarên wî çi ne?*

Haviz Qazî: Şahsiwarê qada zanînê, xemxwarê peyva resen, xetûre-hilgirê bizav û xebatên di şevên reş û tarî de, fedekarê xaka welêt, dilşewitiyê zimanê û torê dêrîn û hunerê rengîn, cihgirê kursiya şe-refê li sîngê koşka niştimanperwerên Kurdistanê Mîr Celadet Alî Bedir-Xan, dihêt danan mîna pêşeng û serkêşê bizava rewşenbîrî li sereta sedê bîstan de. Wê bizavê ji bo gelek xortên kurdan bizava riya rast rohnî kiriye, ku ew hest bi girîngî û tam û lezeta jiyana serbest bikin û xemê ji çanda netewa xwe bixwin.

Di destpêka çerxa bîstan de nivîskar, ronakbîr û torevanên kurd hindik bûn, têra dermankirina birînên civakî nedikirin. Di wê dema teng de, welatparêzê nemir Mîr Celadet, wek xortekî miletperwer bi rewşeke pir bi baweriî û xwîngermî hat pêş bi pîvana (ew gelê ku nikaribe bi zimanê xwe binivîse û bixwîne, bêqîmet e û bêkesayetî ye) û wî di gulana 1932'an de li Şamê kovara Hawarê derxist, rûpe-lên wê bi nivîsên zêrîn xemilandin, xem, keser, kovan, derd, êş, arî-şe û kêşên gelê kurd bi awayekî bihagiran tê de xuya kirine, xizme-teke hêja gihandiye ziman, tore û folklora kurdî. Herweha dema ku wî alfaba kurdî bi tîpên latînî weşandiye, wî di rênivîsa kurdî de şoreşeke mezin kiriye. Wî behsên dîrokî, edebî, zimanvanî, folklorî û gelek babetên din belav kirine.

Şarezayî û pisporiya Mîrî, di zimanê biyanî de, wek zimanê alma-

nî, rûsî, fransizî, yunanî, tirkî, erebî, farisî û paşê jî îngilîzî, xezîneyeke dewlmend e ji zanyariyan bo Mîrî berdest kirine û bûye fêrisê meydana nivîsînên siyasî û civakî di wê demê de.

Wî heta meha tebaxa sala 1943'an kovara Hawar domandiye, paşê kovara Ronahî cihê wê girtiye. Van kovaran di pêşveçûna bîr û baweriya neteweyî de û bi giştî hişyarbûna gelê kurd de roleke bêhempa leyistine; nexasim di warê ziman, dîrok û rewşenbîriya giştî de... Alfabeya latînî ku Celadet Beg bingehê wê avêtiye, îro ji kurdên Sûriyê bigire, heta kurdên Iraqê, Îranê, Tirkiyê û Ermenîstanê bûye bingeh.

Siwarçakê nemir, çawan meha nîsana 1893'an li Stenbolê hatiye dinyayê, herweha roja 15 tîrmeha sala 1951'ê ketiye bîra gundê Hîcane, nêzîkî Şamê û ruhê pak ji giyanê wî derçûye û li goristana Xalid Neqşebendî de li Şamê hatiye veşartin.

Hejmareke çak ji kitêb û belavokan li dû xwe hiştiye, kitêbxana kurdî pê dewlemend kiriye.

Nûdem, No: 8, 1993

ROJEN BARNAS: "ZANAYÊ MEZIN MÎR CELADET"

Nûdem: *Di dîroka rewşenbîrî û hiyarbûna gelê kurd de rola Celadet Alî Bedir-Xan û kovarên wî çi ne?*

Rojen Barnas: Di dîroka neteweyan de hin kes hene ku berê herikîna dîrokê diguhêrin, herikînê bi lez dixînin, an jî wê herikîna bêserûber û kêmbikêrhatî tînin pîr û pergalekê didinê da bêtir bi kêrî daxwazê bê. Ev dîrok dibe ku bi tenê a leşkerî, a siyasî an jî ya çandeyî be.

Di dîroka çandeyî ya kurdî (kurmancî) de Mîr Celadet yek ji van kesan e, ku berê herikîn û meşa nivîsara kurmancî guhartiye, bergehê wê fereh kiriye, xwendin û nivîsandina wê di nav piraniyê de belav kiriye û berî her tiştî zimanê nivîskî li ser hîmên tekûz daye rûniştinê.

Ev nûvejîna (renaissance) çandeya kurmancî ye, meydan û navgîna vê nûvejînê jî kovara HAWAR e.

Di vê pêvajoya nûvejîna çandeyî de Hawar, hem bi maneya edebî û hem jî bi maneya perwerdeyî xwendegeh (école) e. Bi maneya perwerdeyî xwendegeh e: Lewra ji şair û nivîskar Osman Sabrî [1] û nivîskar Dr. Nûredîn Zaza [2] bigirin gelek kesên wê demê di dezgehê xwendegeha Hawarê de hînî nivîsandinê bûn û dest bi nivîsandinê kirin. Bi maneya edebî xwendegeh (école) e: Lewra bi alfabeya xwe ya kurdî-latînî, bi sîstema rastnivîsînê, bi termînolojiyê, bi gramerê, bi zengînî û curbecuriya naveroka xwe Hawar ji kovar û rojnameyên berî xwe vediqete, di riyeke ber bi

gel ve, ber bi piraniyê ve lê bi senteza neteweyîtiyê-neteweyîtîke nûjen- belav dibe.

Hawar meydana çandeyî ya pêşerojên kurd e, ku li wê derê berhemên antîk û nûjen, rojhelatî û rojavayî, kurdî û biyanî, dînperwer û laîk bêî ku hevûdu biêşînin bi hev re dijîn.

Zanayê mezin Mîr Celadet Beg vê meydanê bi zanîn vekir da ku xwendevanên Hawarê digel Tefsîra Qur'anê nûçeya "Kitêba Totê Reb", li rex "Hedîsên Cenabê Pêxember" "Nivêjên Êzidiyan" jî bi dilfirehî bixwînin. Ji alîkî ve wergerandinên Xeyam û li alîkî ve yên Victor Hugo. Ji alîkî ve şi'rên klasîk ên kurdî yên tefsîr û şerhxwaz ji aliyê dinê ve dûrik, dîlok, bêlûte û stranên gelêrî.

Û di van berhemên folklorîk de mezinahiya zanatiya Mîr ev e, ku gotin çawa ji devê dengbêj, çîrokbêj an gotinbêj derketiye bêguhertin û destlêdan bi navê bêjerê wê, bi bilêvkirin û devoka wan a herêmî her wisa çap kiriye.

Zimanê kurdî herçend li gora axaftina rojane dewlemend bû jî dîsa bersîva hewcedariya nav û termên teknîk û zanistî nedida, ku ev valahî jî ji aliyê Mîr Celadet Bedir-Xan ve li gora şert û hewcedariyên rojê hate dagirtin: Gelek termên gramerê, yên teknîkî û zanistî afirandinên wî ne, ku ji kurmancî re bi diyarî mane.

Bi alfabeya kurdî-latînî, bi Gramera Kurmancî di dîroka çandeya kurdî de Mîr Celadet Bedir-Xan kesê pêşîk e û herdû afirandinên wî bi tekûzîke wisa hatine çêkirin ku di warê xwe de bingeh in. Hawar û Ronahî di rojnamegeriya kurdî de du nimûneyên wisa ne, ku di navberê de ev çend zeman bihuriye, bi dewlemendiya naverokê, bi serûberiyê û bi sergiraniya xwe, hê jî gelek kovar û rojnameyên me yên roja îroyîn negihîştine sewiya wan. Ji bilî vê, ev herdû hê jî kana (xezîne) bêje û termên kurmancî û embara berdest a berhemên klasîk, gelêrî û yên wê demê ne, ku

gava em di tengiyê de dimînin an hewcedariya me çêdibe serî li wan dixin.

Ew rewşenbîrekî wisa bû ku mamostayiya rewşenbîrî ya gelek rewşenbîprên kurd kir. Di gelek waran de ew hê jî mamostayiya me dike. Ez wisa bawer im ku di sedsaleyên pêşeroje de jî ewê mamostayiya gelek zana û rewşenbîrên gelê kurd bike.

---

(1) Zaza, Dr. N. , Osman Sabrî nivîsevan û helbestvan, Apo(berhevoka şi'îrên Osman Sabrî ji aliyê Hemreş Reşo ve. Sal, cih û weşanxane nehatine nivîsandin)

(2) Zaza, Dr. Nûredîn: , Pêşgotin "HAWAR" û çanda kurdî, berhevoka Hawarê a hejmar 24-57 ji aliyê Hemreş Reşo ve. Sal, cih û weşanxane nehatine nivîsandin.

Nûdem, No: 8, 1993

ÇÎROKA JIYANA MIN

Ez di sala 1959'an de an jî di sala 1960'î de, li gundekî Dêrika Çiyayê Mazî, li berrriya Mêrdînê hatime dinyayê. Di sê-çar saliya min de, bavê min bi malbata xwe ya mezin re malê bar dike Wêranşarê. Em zêde li Wêranşar neman, lê ew salên li Wêranşarê mîna xewnekê tên bîra min. Xuyabû jiyana Wêranşarê bi malbatê hêsan nehatibû, bi firsenda reformeke erdan ya piştî salên 1960'î em dîsan berepaş vegeriyabûn gund û li gund perçak erd para me jî ketibû. Ew erdê neavî û bi kevir digel kêfxweşiyê zehmetiyek jî dabû me. Em hûr û gir ji rohilat heta roava di nava erd de dixebitîn û me bi teskeran kevirên di nava erd de li ser qûç û şikêran kom dikirin. Bi xwedîerdbûnê em dilşa bûn, hêviya me ya pêşerojê xurt bû, tevdîra me baş bû...

Di gundê me yê bê av û dar û ber de, axa tunebû. Hemû gundî bira û pismamê hev bûn û herkes axayê mala xwe bûn. Di warê aborî de jî çend malbat ne tê de, hema hema hemû gundî nola hev bûn. Gorî ku mezin behs dikin, demekê rewşa malbata me ya aborî baş bûye, lê rojekê sofiyek li malbatê dibe mêvan; gava sibehê zû endamên malê radibin, dibînin ku deriyê êxur li ser piştê ye û sofiyê nenas hemû dewarên di êxur de bi xwe re birine û çûye. Ji ber vê yeka ha diya min a dilovan gelekî li ber dikeve, zaroka wê ji ber diçe û ew ji kerban dikeve nava nivînan.

Li gund min û birayê xwe yê mezin bi hev re dest bi dibistanê kir. Me jî mîna hemû zarokên gund bi tirkî dest pêkiribû. Digel ku em bi mêjiyê xwe yê terr û teze tavilê hînî zimanê tirkî bûbûn û ge-

lekî kêfa me ji dibistanê re hatibû jî, dîsan bi a min di hin cihan de kêmasîne hebûn. Her ku ez mezin bûm min ew kêmasiyên ha bêtir fêhm kirin. Polîtîka dewleta Tirk ya asîmlasyonê wê demê ecêb xurt bû. Dewletê bi zilm û zor û stema xwe gelê kurd bêhawe çavtirsandî kiribû. Di dibistanê de ji bo her gotineke kurdî me cezayê peran dida. Heta car caran em newêrîbûn li malê jî bi hev re bi kurdî bipeyiviyana. Pirrê caran li gund ji devê hin zarokan dihate bihîstin ku ew tirk in. Perwerdiya ku me ji mamostê xwe yê tirk stendibû, kiribû ku em gelekî kêfa xwe ji Mustafa Kemal Atatürk re bînin. Tê bîra min ku me zarokan di 23'ê nîsanê de helbestên li ser Atatürk li hewşa dibistanê bi deng dixwendin. Stranên ku mezinan jî davêtin ser Atatürk hê di bîra min de ne. Yek ji wan wilo bû:

Kemal bavê me tê, Kemalo
Reîsê Cumhûriyetê, Kemalo...

Rojek ji rojên biharê ya herî xweş, sibehekê zû, hê berî rohilat eskeran ji nişkê ve girtibûn ser gundê me û her eskerek çûbûn ser xaniyekî. Cemseyên eskeran jî bi dengên bilind û bi sureteke xurt di nava gund de geriyabûn û tirseke psîkolojîk di nava gund de belav kiribûn. Piştî ku roj hebekî bilind bûbû, me ji lawikekî cîranê me bihîstibû, ku eskeran hemû zilamên gund li meydana gund dane hev û bi dar û qamçiyan li wan dixin. Ka bê çawa bûbû, wan li deriyê me nexistibûn û bavê min nebiribûn. Bavê min yê dîndar û di halê xwe de, hema rahiştibû qurana xwe, xwe avêtibû bextê wê û bi duan ketibû. Em zarok jî ji tirsa diricifîn û me çîrok fêhm nekiribû. Piştî kurtedemekê eskeran bi pehînan deriyê me jî vekiribûn, weke kuliyan li hundur belav bûbûn, kulîna me ji jor de anîbûn xwarê, kîsên genim yên ku spartî dîwêr bûn çirandibûn, sindoqa diya min ya neqişandî, ya bûkaniya wê şikandibûn; gava tiştên ku ew lê dige-

riyan nedîtibûn, bi milên bavê min girtibûn, ew bi dû xwe de kişkişandibûn û ew jî biribûn nava peyayên gund yên ku li meydana gund hatibûne civandin. Gava me dîtibû ku ew zêde guh nadin zarokan, tenê bi dengên xwe wan ditirsînin, ez jî piştî bavê xwe ji mal derketibûm, çûbûme maleke nas ya nêzîkî dibistanê û me zarok û pîrekan di pencerê re li wê koma zilam û eskeran nihêrîbûn. Esker bi hêrs bi wan re dipeyivîn, carê yek ji nava rêza zilaman derdixistin, sê-çar heb lê diciviyan û heya ku ew ji ser hişê wî dibirin lê dixistin. Carna jê wan dudu ji nav rêzê derdixistin, dar dixistin destê yekî, li ser wî disekinîn û dixwestin ku ew bi wî darî li gundiyê xwe bixe. Ji gundîtiyê jî wêdetir li bavê xwe bixe, li birayê xwe bixe.Gava mêrikê dar di dest de protesto bikira, esker lê diciviyan û heta ku ew ji ser hişê wî dibirin lê dixistin. Me zarokan, ku me hê bi kûraniya mirinê nizanîbû, ji me webû ku ew dimirin. Gava wan apê Hecî jî ji nava rêza gundiyan derxistibûn, bi riha wî ya dirêj girtibûn û ew avêtibûn erdê, ez ecêbmayî mabûm. Apê Hecî li gund pirr bi qîmet bû. Biçûk û mezinan xatirê wî digirtin. Gava ew danê êvaran diçû ber siya dîwêr, hemû kes ji ber wî radibûn, ên cigare jê re dipêçan û davêtin ber wî û yên ku kîsê xwe yê tûtinê keremî wî dikirin. Lê qey eskeran nizanîbûn ku ew ewqasî di nava gundiyan de bi qîmet û xwedî xatir e. Heta eskerekî ji wan kirasê wî kişandibû serê wî û derpiyê wî yê spî jê şeqitandibû. Hingî lawikê hevalê min keniyabû, lê pîreka malê tepek di nava pişta wî de lêxistibû. Dawî, berî ku ew ji gund derkevin jî, wan muxtarê gund şilfî tazî kiribûn, keç û jinên gund bi zorê ji hunduran derxistibûn der û muxtar wilo tazî di nava gund de gerandibûn.

Ez, zarokekî heyşt salî li hember vê zilma han ecêbmayî mabûm. Ez çiqas fikirîbûm min tu sedem ji wê zilma wan re nedîtibû. Lê kîn, nefret û girrekî ecêb di dilê min de çêbûbû. Dilê min ji ber van hê jî diperpite.

Gava min sedema wê yekê ji mamosteyê xwe pirsîbû, digel ku wî gelekî ji min hez dikir, dîsan jî erza min şikandibû. Ji ber şikandina erza xwe ez gelekî li ber xwe ketibûm, rûyê min sor bûbû, min bi dizîka serê xwe danîbû ser masê û ez bi îskîn giriyabûm.

Min gelekî guhên xwe didan dibistanê. Loma jî ez di dersên xwe de gelekî jîr û bi serketî bûm. Jîrîtiya min di dersên min yên dînî, li ba melê jî navdar bû. Gorî mezinên ku behs dikin, min gelek caran dersên suxtên pêşiya xwe jî dida. Lê jîrîtiya min ya li ba melê bi pirranî ji bo anîna kêfa bavê min bû. Bi serketina min ya di dersên dînî de bavê min dilşa dikir. Yê min jî ji bo ku ez bikaribim dibistana xwe bidomînim, min xwe bi jîrbûna xwe dixiste çavên bavê xwe. Pirr neajotibû ku min quran xitim kiribû û mewlûda Melayê Batêyî ya bi kurdî, ya ku hê jî ez pirraniya wê ji ber dizanim, min wê çaxê ji ber kiribû.

Hemdê bê hed bû Xwedayê alemîn
Ew Xwedayê daye me dînê mubîn

Em kirine ummeta xeyrulbeşer
Tabiê wî muqtedayê namuwer

Di salên heftêyî (1970) de me ji gund barkire Nisêbînê. Nisêbînê wê çaxê bi min pirr xweş hatibû. Hebûna tirênê, nêzîkbûna Qamîşlokê, herikîna çemekî mezin di nava bajêr de, darên li sûka wê çikandî em tavilê bi xwe ve girê dabû û ew roj ev roj e malbata min li vî bajarê xweş, delal û bijîn rûdinê. Min xwendina xwe ya ku nêvcî mabû li Nisêbînê dom kir. Di ber xwendina xwe re jî geh ez li çayxana bavê xwe dixebitîm, geh jî min li firnan nanpêjî dikir. Min sinifa pêncan bi serfirazî li Nisêbînê qedand. Ez êdî bûbûm xortik, min porê xwe şeh dikir û çavên xwe li keçikan digerandin.

Nisêbînê, ew bajarê biçûk û delal roj bi roj mezin dibû. Bi mezinbûna xwe re jî problemên wê zêdetir dibûn. Berberiya di navbera Nisêbînî û gundiyan de roj bi roj serî hildida. Vê yeka han çend salên baş ajotin. Di sala 74'an de ez ji bo kar çûme bajarên mîna Manîsayê, Izmîrê û Kuşadasiyê. Tiştê ecêb, nêrîna kurdayetî û welatheziyê li wan bajaran bi min re çêbû. Ji dil çûyina xortên kurdan ya şerê Qibrisê ez gelekî diêşandim. Tê bîra min, gava xortekî Diyarbekirî ev stirana ku wê demê ji devên nasyonalîstên tirkan dernediket,

Allah Allah deyip geliyor Türkler
Çekil Kıbrıs bizim ey kahpe Yunan

Gotibû, ji bo ku ez şûşa di destê xwe de li serê wî nexim min bi zorê xwe girtibû.

Piştî şikandinên serîhildanên Kurdistanê bêdengiyekê li welatê me dest pê kiribû. Ji kuştin, bidardekirin, îşkence û girtinê gelê kurd çavtirsyayî bûbû, li ber pêla asîmîlasiyonê ya polîtîkaya Tirkiyê ketibû û diçû. Herçiqas di navbera van salan de ronakbîrên kurd li bajarên mezin yên Tirkiyê dest bi xebatên siyasî û întelektuelî kiribûn jî, dîsan ji bo hemêzkirina zirecêba gelê kurd têr nekiribû. Zulum pirr bû, xelk razayîbû, ronakbîrên kurd bêçare bûn.

Ew xebat û keftelefata wê kulma ronakbîrên kurd hêdî hêdî reh û şaxên xwe berdida Kurdistanê, keç û xortên nûgihiştî hemêz dikir; li dibistanan, li nav erdan, li çayxanan, li kuçan, li dawet û dîlanan êdî pirsgirêka gelê kurd û welatê wan Kurdistan bi her awayê xwe ve dinate munaqeşekirin.

Bi zixtikên vê pêla hişyarbûnê ez jî hişyar bûbûm; li dijî neheqî, zulmê û stemkariyê bi ciwanî û dînamîkbûna xwe, ez bi şev û roj dixebitîm. Gorî pêwîstiyên wê demê ez ji felsefeya îdealîst bi dûr

ketibûm, min ji xwe re felsefeya materyalîst hilbijartibû.

Di sala 77'an de pirtûkeke helbestan ya rehmetiyê Cegerxwîn ketibû destên min. Wê pirtûkê dilê min şa kiribû, hêvî dabû min, zimanê min bi min şêrîn kiribû. Ew pirtûka Cegerxwîn bû sedema nivîsandina min ya bi kurdî. Di eynî salê de min dest bi nivîsandina helbestên kurdî kir. Min xwe li helbesta nûjen rakişand. Gava li daweteke kurdî, li hemberî bi sedan kes min helbestên xwe xwendibûn, dengê çepikên guhdaran di dilê min de pêl dabûn.

Li welêt tevger xurt dibû. Ew pirsa ku tenê ya xortan (teleban) xuya dikir, êdî bûbû ya gelekî. Digel vê yekê zulm jî pirr bûbû. Min ew zulma ha bi nivîseke tirkî, li ser navê komeleya xwe di sala 1979'an de da rojnameyekê. Ji wê bendê pê ve min êdî hew bi tirkî nivîsand. Min bi hemû hêza xwe zor dabû nivîsandina kurdî. Çîroka Malbata Evdo ku ji 134 rûpelan pêk hatiye û bi kêşan e, min hê wê demê nivîsandibû. Ev pirtûka min ya ku neçapkirî ye, da sala 1981'ê de, li bajarê Uppsalayê kek Reşo Zîlan ji kurdiya wê re gelekî bûbû alîkar.

Bêî ku ez dîploma xwe ya lîseyê bistînim, ez di sala 1980'ê de sibeheke gulanê ya xweş, bi çenteyekî biçûk û bi sernavên 25 helbestên xwe yên di bin pizya derpiyê min de veşartî, min xatir ji endamê malê xwest, ew di nav şîn û girî de hiştin û bi stûxwarî derbasî Sûriyê bûm. Ez demeke kurt li wir mam. Paşê ji wir ez bi hevalekî xwe re çûme Almanyayê. Li Almanya jî ez nêzîkî du mehan mam. Dawî dawî min xwe avête vî welatê sar, yê ku ji salekê carekê roj lê naçe ava, Swêdê.

Ez her ku ji welatê xwe bi dûr ketime, welatê min ewçend bi min şêrîn bûye, ez ewçend pê ve hatime girêdan. Heta niha ez li nêzîkî bîst welatan geriyame, lê tu welatan jî weke welatê min cihê xwe di dilê min de çênekiriye. Ax û ava welatê min, hewa welatê min bi min xweş e. Mirovên welatê min bi min şêrîn in. Loma jî ez ê vî

emrê xwe yê ku maye jî ji bo bidestxistina vê xweşiyê bibuhurînim.

Ev panzdeh salên min in ez têgihîştime, ku welatekî bê ziman ne tu welat e, gelekî bê nivîs, bê kovar, bê rojname û pirtûk gelekî ji medeniyetê bêpar e. Gelê kurd, ku xwediyê gelek medeniyetên kevnar e, îro jê bêpar e. Min riya rohnîkirina civata kurdan ji xwe re hilbijartiye. Ji bo vejandina zimanê kurdî, lêkolîna çanda kurdî, pêkanîna edebiyateke kurdî a nûjen ev panzdeh sal in ez bi îmaknên xwe yên bi sînor li ber xwe didim. Min heya niha quruşek ji nivîskariya xwe bi dest nexistiye, lê ez gelek caran ji ber nivîskariya xwe di bin deynên mezin de mame. Ji bilî hin kesan, ez bawer dikim pirraniya nivîskarên kurd nola min in. Digel pirr zehmetiyan ew bê rawestan dinivîsînin. NÛDEM ya ku me firsenda danasîna xwe tê de dîtiye, berê xebata van nivîskaran e. Ked û xwêdana me ye. Em bi vê ked û xwêdanê dixwazin tovê jiyaneke xweş li axa welatê xwe ya bi ber bireşînin.

Heya niha digel pirr zehmetiyan pênc pirtûkên min derketine. Ya pêşî di sala 1980'ê de, ya dawî jî di sala 1992'an de derket. Ji vana sisê helbest, dudu jî kurteçîrok in. Wekî din min di gelek kovar û rojnameyên kurdî û swêdî de nivîsandiye û ez niha endamê Yekîtiya Nivîskarê Swêdê me. Xwendina min ya lîseyê ya ku li welêt nêvcî mabû, min li Swêdê xelas kir û ji bilî wê jî min li ser psîkolojî û pedagojiya zarokan xwendiye. Min karê wergervaniya sê zimanan, mamostetiya dibistana destpêk ya Swêdê, mamostetiya kurdî ya zarokên kurdan û xwedîtiya restoran û markêtê kiriye.

Nûdem, No: 4, 1992

Şahînê Bekirê Soreklî: "Edebiyat divê di nava xelkê de biji" 173

Rojen Barnas: "Pêşeroja edebiyata kurdî girêdayî pêşeroja gelê kurd e" 179

Rohat Alakom: "Edebiyat ji nû ve afirandineke estetîk e" 184

Hesenê Metê: "Edebiyata kurdî xwe serast nekiriye" 188

Mahmûd Baksî: "Her straneke kurdî romanek e" 192

Mehmed Uzun: "Roman hunera civatên pêşketî û modern e" 194

Teyrikê çemê Xerzan 210

Hevpeyvîn bi Osman Sebrî re 221

Hevpeyvîn bi xortekî 75 salî re 231

Enstîtuyên kurdî 238

Serokê Enstîtuya kurdî ya Parîsê; Kendal Nezan 240

Berpirsiyarê Enstîtuya kurdî ya Brukselê; Derwêş M. Ferho 256

Kovar û rojnameyên kurdî 260

Berpirsiyarê rojnameya Armancê; M. Elî 263

Sekreterê çapemeniyê yê kovara Newrozê; Remzî Bilget 268

Xwedî û berpirsiyarê rojnameya Azadî; Îkramettîn Oguz 272

Berpirsiyarê giştî yê kovara Nûbiharê 277

Cumhûriyeta kurdî ya Mehabadê 282

Hesenê Qazî: "Qazî Mihemed û hevalên xwe şerefa serbixweyiya biryara kurdan parastin" 286

Kerîm Husamî: "Avakirina Komara Kurdistanê berhem û têkoşîna gelê kurd bû" 289

Mahmût Mola Ezat: "Zimanê kurdî bûbû zimanê xwendinê" 292

Can Yücel: "Ez ji mêj ve nêzîkî pirsgirêka kurdî me" 295

Senarîst û romannivîs; Vedat Türkali 312

Arif Damar: "Ez dostê Mûsa Anter bûm" 322

Avakirê Kurdish Rock; Ciwan Haco 329

NAVEROK

Sedsaliya Celadet Alî bedir-Xan 7

Mûsa Anter 22

Nûredîn Zaza û çîrokên wî 40

Li mala Cegerxwîn 49

Li mala Osman Sebrî 52

Li mala Rewşen Bedir-Xan 55

Şoreşgerê kurd Edîp Karahan 60

Swêd, Alfred Nobel û xelata wî 63

Şaîrê kurd kî ye? 76

Çend gotin li ser zimanê kurdî 80

Divê em edebiyateke kurdî ya neteweyî biafirînin 86

Em hewcedarî rojnameyeke kurdî ya rojane ne 90

Çîroka kurmancî di kovarên Hawar, Ronahî û Roja Nû de 94

Edebiyata kurdî ya sirgûnê 110

Edebiyata kurdî 134

Rewşa edebiyata kurdî 147

Tosinê Reşîd: " Dêmê her edebiyatê bi pexşana wê xuya dibe" 151

Şerefxan Cizîrî: "Felsefe evîn bi xwe ye" 159

Nacî Kutlay: "Ez ji ber pêşeroja edebiyata kurdî ne xemgîn im" 166

Seîd Yusuf: "Ez aşiqê tiştên xweşik im" 345

Riza Topal: "Ez gelekî ji lêkolîn û lêgerînê hez dikim" 355

Edîp Polat: "Divê bi hezaran nivîskar û bi deh hezaran jî xwendevanên kurd bigihên" 361

Kemal Burkay: "Edebiyat dinyayek delal dixwaze" 367

Şêrko Bêkes: "Divê ji şaîr re sînor neyên danîn" 374

Ferhad Shakely: "Şi'ra baş li ser hundurê mirov dipeyive" 389

M. Malmîsanij: "Celadet Bedirxan yek ji pêşengên kultura kurdî ye" 409

Haviz Qazî: "Şahsiwarê qada zanînê Celadet Bedir-Xan" 412

Rojen Barnas: " Zanayê mezin Mîr Celadet" 414

Çîroka jiyana min 417



Firat Cewerî û Mûsa Anter (1990)

Gelî ronakbîrên kurd ên bi rûmet! Li xwe vegerin, xwe nas bikin, bi zimanê xwe tevbigerin! Li ser hîmê xwe rabin, li ser koka xwe geş bibin! Mirov ancax di nava miletê xwe de serbilind e, di nava miletê xwe de serbilind bibin! Biratiya bi gelên dinyayê re bi hebûna mirov dest pê dike, li hebûna xwe xwedî derkevin! Hebûna we zimanê we ye, kultura we ye, edebiyata we ye! *Firat Cewerî*